# Mêjûwa Dewlet Û Mîrnešînîyên Kurd Di Pêla Musulmantîyê De

Bergê Duwem Ji Kurtîya Mêjûwa Kurd Û Kurdistan

Mohemed Emîn Zeki Beg

Werger Dr. M. S. Cuma

# Navrok

Pêdeçûna li ser Dewlet û Miletên Kevnar de, yên ku pêwendîya wan ligel koka Kurd de tête bidîtin ..............................................................7
1. Dewleta Lollo ..........................................................................8
2. Dewleta Goti..............................................................................9
3. Dewleta Kasay.......................................................................10
4. Dewleta Mîtanî .................................................................15
5. Dewleta Xeldî-Orarto ...........................................................16
6. Dewletên Sobarî ....................................................................17
7. Dewletên Nayri......................................................................17
8. Dewleta Mîdya .......................................................................17
Kar û barên Cengînîyî Kîaksarês ...................................20

Bešê Yekem ...........................................................................26
Derîyê Yekem..........................................................................27
Dîlkirin û Rizgarkirina Salar-Merzeban..........................32
Li dawîya Dîlkirina Merzeban de.......................35
Wahsozan û Kurên Merzeban ............................36
Ibrahim Salar..................................................................39
Wahsozanê duwem ........................................................40
Mîr Ahmedîl ..................................................................42
Aq Songor Ahmedîl.......................................................43
Aq Songorê duwem .......................................................44

Derîyê duwem .........................................................................48
Derîyê Sêyem .........................................................................59
Hesnewî...........................................................................59

Ebu Necim Nasir El-Dele Bedir ....................................63
Siyaseta Bedriyî Diravî......................................70
Nav û Nîšanên wî ..............................................71
Derîyê Çarem ...............................................................76
Derîyê Pêncem ..............................................................81
A. Dewleta Dostekî........................................................81
B. Dewleta Merwanî......................................................87
Bavê Seîd Mensur Mumehed El-Dewle............91
Melek Adil Nasir El-Dewle Ehmed ...................94
Qasim Bavê Nasir............................................104
Mensur.............................................................106
Derîyê Šešem..............................................................108
Mîrnešînîya Derteng ....................................................111
Mîrnešinîya Mahîdešt...................................................111
Derîyê Heftem.............................................................112
Derîyê Heštem.............................................................116
1. Bavê Tahir Mohemed ...............................................117
2. Etebik Hezar Esp......................................................117
3. Etabik Tîgele............................................................119
4. Etabik Šems El-Dîn Alp Ergon...............................121
5. Etabik Yusif Šah ......................................................121
6. Etabik Efrasyab........................................................122
7. Etabik Nesret El-Dîn Ehmed ..................................123
8. Etabik Rikin El-Dîn Yusiv Šahê duwem .................124
9. Muzefer El-Dîn Efrasyabê duwem ..........................124
10. Nur El-Wedud.........................................................125
11. Šems El-Dîn Pešeng...............................................125
12. Pîr Ehmed ..............................................................125
13. Bavê Seîd ...............................................................126
14. Šah Husên ..............................................................126
15. Xeyas El-Dîn Kawis ..............................................126
Rûnkirin .......................................................................127

Derîyê Nehem..............................................................128
1. Šuca El-Dîn Xuršîd...................................................129
2. Etabik Seyf El-Dîn Restem.......................................130
3. Šeref El-Dîn Bavê Bekir ...........................................131
4. Ize El-Dîn Geršasb....................................................131
5. Husam El-Dîn Xelîl ..................................................131
6. Bedir El-Dîn Mesud..................................................132
7. Tac El-Dîn Šah..........................................................133

8. Felek El-Dîn û Ize El-Dîn........................................133
9. Cemal El-Dîn Xidir..................................................133
10. Husam El-Dîn Umer..............................................134
11. Semam El-Dîn Mohemed......................................134
12. Ize El-Dîn Ehmed..................................................135
13. Dewlet Xatûn..........................................................135
14. Ize El-Dîn Husên....................................................136
15. Šuca El-Dîn Mehmud............................................136
16. Mele Ize El-Dîn Kurê Šuca El-Dîn.........................136
17. Melek Seyid Ehmed...............................................137
18. Šah Husên..............................................................137
19. Šah Restem............................................................138
20. Ogoz Xan...............................................................138
21. Cîhangîr.................................................................139
22. Šah Restemê duwem..............................................139
23. Šah Wirdî...............................................................141
Rûnkirin.......................................................................143

Derîyê Dehem..............................................................144
1. Kî Bav û Bavpîrê Sazmendê vê Serdarîyê ne û ew ji ku hatine?................................................144
2. Çilo ew bipêškevtin?................................................146
3. Çawan Mîr Selah El-Dîn pê hate bigihaštin.............148
4. Çûna wîyî pêšî ji bona Misrê....................................149
5. Çûna Selah El-Dînî duwemî Misrê...........................151
6. Çûna Sêyemî Misrê..................................................152
7. Wizareta Mîr Selah El-Dîn......................................154
8. Li dawîya mirina Šehrîyar Nur El-Dîn.....................160
9. pêla Šehrîyarîyê........................................................166
10. Šehrîyar Selah El-Dîn û Xaçperest.........................175
11. Mizîša Šehrîyar Ligel Leškerê Ingilîzî de...............187
12. Mirina Šehrîyar Selah El-Dîn................................194
13. Nîšanên wiyî bilind, Sincî û Perwerdebûna wîyî baš............................................................196
14. Šopên wîyî Avanîyê û Bajartîyê.............................202
15. Kurên Šehrîyar Selah El-Dîn..................................204
Melek Efdel, Melek Ezîz û Melek Adil........................204
Šehrîyarîya Melek Adil...................................207
Rewš û Rûçikên wî..............................209
Šehrîyarîya Melek Kamil.................................209
Nîšan û Rûçikên wî.............................212

Melek Adilê duwem ......................................... 213
Melek El-Salih Necim El-Dînê Eyubî ...................................... 216
pêla Šehrîyarîya Toranšah ............................................ 222
Payînbûna serdarîya Eyubî li Misrê de ......................... 224
2 . Serdarîya Eyubî li Helebê de (579-685 k. de). ................................................... 226
3. serdarîya Eyubîyî Šamê ............................... 229
4. serdarîya Eyubiyî Hema. .............................. 231
5. Mîrnešînîya Eyubîyî Humsê ......................... 232
6. Mîrnešînîya Eybuiyî Yemen ......................... 232
7. Serdarîya Eyubiyî Cezîrê ............................. 234
Dîtineke Gištî ............................................................... 234
Derîyê Yanzdehemîn ............................................................... 236
Derîyê Duwanzdehemîn ........................................................... 248
Derîyê Sêzdehemîn .................................................................. 251
1. pêla Kerîm Xan ........................................................ 253
A. Sincî û Nîšanên wî ....................................... 262
B. Li dawîya mirina Kerîm Xan de. ................. 265
2. Rojgarîya Lutif Elî Xan ........................................... 275
Dîtineke Gištî derbarê Zînetên vê Dewleta hanê de ..................................................................... 294
Derîyê Çardehemîn .................................................................. 296

Bešê duwem ........................................................................................ 300
A. Mîrnešînîyên di navbera Cezîrê û Dêrsim de ....................... 303
1. Mîrnešînîya Cezîrê .................................................... 303
2. Mîrnešînîya Xêzan ..................................................... 306
3. Mîrnešînîya Šêrwan .................................................. 306
4. Mîrnešînîya Bedlîsê .................................................. 307
5. Mîrnešînîya Sason ..................................................... 308
6. Mîrnešînîya Siwêdî ................................................... 310
7. Mîrnešînîya Bazokî ................................................... 310
8. Mîrnešînîya Mîrdesî-Merdasî-Merdisî ...................... 311
9. Mîrnešînîya Cemšukuzk ........................................... 312
B. Mîrnešînîyên di navbera Cezîrê û Keles de .......................... 313
10. Mîrnešînîya Hesen-Husin Kêf ................................ 313
11. Mîrnešînîa Sulemanî-Silêvanî ................................. 314
12. Mîrnešînîya Zerakî .................................................. 315
13. Mîrnešînîya Keles û Ezazê ..................................... 315

C. Mîrnešînîyên di navbera Cezîrê û Xoyê de ............ 320
14. Mîrnešînîya Hekarê ............ 320
15. Mîrnešînîya Mehmudî ............ 321
16. Mîrnešînîya Binîyanîš ............ 322
17. Mîrnešînîya Dunbulî ............ 322
18. Mîrnešînîya Biradost ............ 330
1. Xanedana Mîrnešînîya Somay ............ 329
2. Xanedana Mîrnešînîya Tergever ............ 329
19. Mîrnešînîya Mukrî ............ 330
20. Mîrnešînîya Istonî ............ 331
D. Koma Jêrî Hekarê ............ 333
21. Mîrnešînîya Badînan: ............ 333
22. Mîrnešînîya Dasnî ............ 339
23. Mîrnešînîya Soran ............ 340
Serdarîya Pašayê Kor ............ 345
24. Mîrnešînîya Baban ............ 356
Mîrnešînîya Bebeyî Dawî: ............ 357
25. Mîrnešînîya Bane ............ 362
26. Mîrnešînîya Gelbaxî ............ 364
27. Mîrnešînîya Kelher ............ 364
1. Begzadeyên Pelenkan. ............ 365
2. Begzadeyên Derteng ............ 365
3. Begzadeyên Mahî Dešt-Maydešt. ............ 366
E. Mîrnešînîyên Îrana Rojhilat ............ 366
28. Mîrnešînîya Siyah Mensur ............ 366
29. Mîrnešînîya Çeknî ............ 368
30. Mîrnešînîya Zengene ............ 369
G. Mîrnešînîya Xuresan: ............ 369
1. Mîrnešînîya Koçan ............ 369
2. Mîrnešînîya Bocnord ............ 370
F. Mîrnešînîyên Çiyayê Libnanê ............ 371
1. Šêxên Îmadîyî Durzî ............ 371
2. Mîrên Kurên Šêfayên Kurd ............ 372
3. Mîrên Rees Nehašê Kurd ............ 375

## Pêdeçûna li ser Dewlet û Miletên Kevnar de, yên ku pêwendîya wan ligel koka Kurd de tête bidîtin

Her mîna ku me li bergê yekemî vê mêjûwê de dayite biaxivtin, hinek ji Miletên herema Zagrosê li gora šop û belgeyên tanî êsta dozandî de û herwehajî bi dîtin, lêvenerandin û encamgirtina Zanistvanên Šûnwarî û mêjûwê ve ligel koka Kurd de pêwendîyeke bi xurt ve tête biderkevtin. Ev pêwendîya hanê, heger ku em bi çavekî ve bê alî û bi zanistî ve baš lê bidin bitemašekirin, dê emê wê bidin bidîtin, ku ew pêwendîyên Miletê Akad û Emorî ligel koka Ereb de û yên Miletê Hûn-Qon ligel Turk de ewende cudabûn nedihate biderkevtin.

Caême jî heger weku van herdu Miletan li nivîsandina mêjûwa xweyî kevnar de li ser šûna van herdû Miletan de herin, ez bawernakim, ku hîç Têgihištvanek û Xwedanbextek li me dê bergîrîyekê bide bigirtin. Bi xwe jî ve nêta me li vê jî de bi tenya ve me divê, ku em reman û dîtina hinek ji Zanistvanên šûnwarî û mêjûwê ji bona ser kaxezê bidin bixistin. Ligel vê jî de divê bête bizanîn, ku ev kanîyên mêjûwa kevnin, herwehajî mîna ku ew hêjî ji bona hin Miletê tir jî hêsta jî bi carekê ve nehatine birûnkirin. Ji bona me jî dîsan ew kanîyên mêjûwa Miletên Kurd tanî radeyekî tarî têtin bidîtin. Ji bona rûnkirina wê mêjûwê pêwist bi xebateke zor û demeke dirêj ve têtê bikirin.

Lêbelê ev zîneta hanê weku çawan Miletên tir li lêgerandina mêjûwa xweyî kevnar de rê li ber wan de nedaye bigirtin, ku ew li ser mêjûwa Miletên Kevnar û pêwendiyên wan de ligel koka Miletên xwe de bêtin biliberkevtin. Wehajî ev jî divê yarmetîya me jî bide bikirin, da ku em jî li ser wê šopa wan de û weku wan herin, tanî servajî wê neyête biderkevtin. Ême jî mêjûwa wan Miletên kevnar, yên ku šop û

lêvenerandinên tanî êsta wan bi koka Kurd didin bidanîn yanjî ligel Kurd de pêwendîdar wan didib bidîtin, bi pêšekîya mêjûwa xwe ve didin bikirin.

Ew Miletên Kevnar, yên ku ligel koka Kurd de kêm û zor pêwendîyên wan tête biderkekevtin, di bergê yekem de me li ser wan de daye biaxivtin. Di vî bergê duwem de li gora yarmetîya šop û belgeyan bi tenha ve em li ser pêkhatinên siyasî ango li ser dewletên wan de bidin biaxivtin.

## 1. Dewleta Lollo

Mexabin, ku mêjû hêstajî derbarê vê dewletê, dûrbûna desthilatîya wê û sînorê wê de tištekî zor nehatîye bizanîn. Li gora belgeyên dema Sargon û Naram Sînê Akadî de divê, ku ev dewleta hanê ligel Arafa-Kerkuk û welatê Kasay de hevsînor bête biderkevtine. Heger weha bû, divê liwaya Sulêmanîyî niha, navçiya Horin-Šêxan, Xorarto û herema Zehaw-Halman bi welatê Lolloyî kevnar bête biderkevtin.

Miletê Lollo ligel bešekî Gotî de dewleteke serbixwe dihate biderkevtin. Navînîya wêna li gora hinekan ji Mêjûvanan bi Zemrî ve tête biderkevtin. Lêbelê li gora Pirofêsor Spayser-Sipayzer Navînîya wêna Arakadî bû. Ev Mêjûvanê hanê bi xwe jî ve dibêje, ku Annobanîni Qeralê Lollo welatê Halman-Arman daye bizeftkirin, ku ev jî di nava sedsalê bîst û heštemînî pêš zayînê (p.z.) de tête bikevtin.

Mistir Hall-Hol di nivîsta xwe de mêjûwa Rojhilata Nêzîkî Kevnar de dibêje, ku li duwayî Annobanîni Qeralek bi navê Lasîrab ve ji bona ser Textê welatê Lollo hatîye bihatin. Weha têt biderkevtin, ku Sargonê[1] Akadîyî bi nav û bang ve di pêla vî Qeralî de ji bona ser welatê Lollo hatîye bidakevtin.

Dewleta Lollo tanî heyamê Šelmanaserê sêyemê Qeralê Ašurî daye bidirêjkirin. Dawîya wê li mêjûwa 828 p. z. de hatiye bidîtin, di dema ku Leškerê Ašuri ew daye bidagîrkirin.

[1] Evaya Qeralê Pêšî ye, yê ku ew ji Malbata Qeralên Akadî ye (2550-2332 p. z. de). Vî Qeralî 55 salan daye biserdarîkirin. Delîl El-Methef El-Îraqî R. 48, Bexdad sala 1943. Muhemed Ewni (M. E.)

## 2. Dewleta Goti

Rewš û zîneta vê dewletê jî nediyare. Weha diyare, ku ev Miletê hanê li dor û berên Zeyê Koye de dihate birûništin. Ji wêderê de bere bere ew ber bi ber xuwarê ve hatine bidakevtin û li dawîya mirina Šarkalê Šareri Šûngirê Naram Sîn de li nêzîka nîvê sedsalê 26 p. z. de ew ji bona nava welatên Akad û Somer hatine bikevtin. Ew ligel wan Miletan de hatine bišerkevtin û hêdî hêdî ew li ser herdu Miletan de hatine bizalbûn û wan dewletên Bajarên Somer û Akad bi bin çengên xwe ve dane bixistin.

Li gora lîsteyekê de, ku ew li Nîpor de hatîye bidozandin, 21 Qeralê Goti 125 salan û cil rojî li Babil de serdarî dane bikirin. Nemaze ji van Qeralan Enridapizir zor bi hêz û hiner bû. Sînorê desthilatîya wî bi carekê ve mîna sînorê desthilatîya Naram Sîn dihate biderkevtin. Di dawî de Qeralê Erîx-Arkê bi nav û bang ve Utukhegal-Utuxegal kês li Dawîvanê Serdarê Gotîyî Babil de date bidîtin û wî ew ji Akad date biderkirin û dewleta Babil di sala 2524 p. z. de date bizeftkir[2].

Miletê Gotî li dawîya vêna de ew ji bona welatê xweyî kokî de li herema Zeyê Koye û Kerkuk-Arayxa de hate bivegerandin. Êtir yekitîyeke siyasî giring nema dikarîbûn bidana bipêkanîn[3].

---

[2]Dibe, ku evaya Binemala Arakê Pênceme. ya ku ew ji bal Utuxegal de di sala 2282 p. z. de hatîye bipêkhatin

[3]Di Delîlê Methefa Îraqî de di Rûpelê 48 de hatîye binivîsandin:
Binemala Goti bigir ji sala 2370-2282 p. z. de daye bidirêjkirin.
1. Embiya 3 salan. 2. Engîšo 6 salan. 3. Nikil Lecab 6 salan. 4. Šelmi 6 salan. 5. Elolomš 6 salan. 6. Enimabkeš 5 salan. 7. Ecîšoši 6 salan. 8. Iyar Leceb 15 salan. 9. Embate 3 salan. 10. Eyar Leceš 3 salan. 11. Korm 1 Salê. 12. ... 3 salan. 13. ... 2 salan. 14. Irarm 2 salan. 15. Iranim 1 salê. 16. Xablim 2 salan. 17. Bozresin (Ibin) 7 salan. 18. Eyar Lenceda 7 salan. 19. Lasirab 7 salan. 20 Terîkan 40 Rojî. (M. E.).

## 3. Dewleta Kasay[4]

(Li ser Kasay de di wê Kanîyê bi xwe de, R. 51 de hatîye: Binemala Babil, Kasay 1746-1669 yanjî 1750-1170 p. z. de.1.Cendaš, 2. Ecemê Yekem, 3. Kaštilyašê Yekem, 4. Oši ... Ebi Retaš. ... Kaštilyašê duwem. ... Tazîcermaš. ... Xerba-Šibak. Ecemê duwem (1598-1579). Korîca Lezwê Yekem (1578-1560). Milîšbakê Yekem (1559-1541). Nazîmrtaš (1540-1522). Yernabiryašê Yekem (1521-1503). Kaštilyašê Sêyem (1502-1484). Ecemê Sêye (1483-1465). Kere Endašê Yekem (1445-1427). Kedešmanê Herbi Yekem (1426-1408). Korîca Lezwê duwem (1407-1389). Kedešmanê Inlîlê Yekem (1388-1370). Yernabiryašê duwem (1369-1368). Kere Endašê duwem (1367-1355). Kedešemanê Herbi(1355-1345. Korica Lezwê Sêyam (1344-1320). Nazimrtašê duwem (1319-1294). Kedešman Terco (1293-1277). Kedešmanê Inlîlê duwem (1276-1271). Kodir Inlîl (1270- 1263). Šeciketê Šeryaš (1262-1250). Kaštilyašê Çarem (1249-1242). Inlîl-Nadîn-Šomi (1241-1240). Kedešmanê Herbi duwem (1240-1239). Edad-Šem-Idin (1238-1233). Idad-Šem-Nasir (1232-1203). Milšbakê duwem 1202-1188). Merdex Ebal Edenê Yekem (1187-1175). Zibaba-Šem-Idin (1174). Inlîl Nadin-Exi (1173-1171). (M. E)

Li zemanê Yezdehemînê Qeralê dawîyî Samîyî-Emorîyî di Babil de bi navê Samsor Dîtana Miletê Khatti-Xati ango Hêtit hêrîšek bi ser Qeralitîya Babilistan û dewletên dinî Binemala yekem ve ango Emorî ve date bibirin û wan ew di sala 1926 p. z. de dane bilinavbirin. Li gora hinekan ji Mêjûvanan de li dawîya talan û wêrankirinê de vî Miletê Xati Babilistan date bicîhištin û ew ji bona welatê xweyî Rojavayî Furatê hate bivegerandin. Li dawîya vêna de li Babil de

[4] Dewleta Kasay di Mêjû û Nivîsandinên kevnar de bi Sêyem Binemal di Babil de hatîye bidanîn. Binemala Yekem Dewleta Emori bû, ya ku wêna ji 2225-1926 p. z. de daye bidirêjkirin. Hemorabîyê bi nav û bang Šešemîn Serdarê vê Binemalê bû. Di vê Pêlê de li Bajarên Somer de hinek dewletên Serbixwe hebûn, ku Pêkhatinên Encûmenên wanî Gištî bi Binemala duwem dihate bidanîn.

dewleteke xweyî welatî hate bidamezirandin û wê nêzîka sedsal û nîvekî date bidirêjkirin. Di dawîya vê pêlê de Miletê Kasay ji bona ser xwe hate birabûn û wî hêrîš bi ser vî welatî ve date bibirin û wan Babilistan di sala 1760 p. z. de date bizeftkirin. Herwehajî wan welatê kenarê Somer jî di sala 1710 p. z. de ji destê Qeralê dawîyî Somerî bi navê Ea-Gamil-Ê Gamil ve dane bisitendin. Bi vî rengî ve wan welatên Somer û Akad li jêr nav û nîšana Kar-Dunyiash-Kar Dunyaiš[5] de dane biyekkirin û herwehajî dewleta wan jî bi wê nav û nîšana hanê ve hate binavkirin.

Danînvanê vê dewletê Qeral Gandish-Gandiš yanjî Gaddash-Gaddaš bû; belam derbarê bi rûdanên zemanê wî agehdarî nînin.

Dema desthilatîya Gandiš šazdeh sal bû. Mistir Hall-Hol li nivîsta xwe de Mêjûwa Kevnarî Rojhilata Nêzîk, r. 199 de dibêje, ku Ulam Buriash-Buryašê Kasî, yê ku ew Kurê Qeralê Babil Burnaburariash-Burnaburaryaš bû, welatê Kenar di sala 1710 p. z. de li Ê Gamilê Somerî de date bizeftkirin. Agumê sêyemê Nevîyê Ulam Buryaš dawî bajarê Dur-ea-Dur-î yê pir xurtî Somerî date bigirtin.

Mistir Hol di r. 200 de dibêje, ku derbarê Qeralên Kasay agehdarîyên me zor kêm têtin bidîtin. Li dawîya Gandiš Ushshi-Ušiši, Eby Ratash-Ebi Rataš, Tashshigurmash-Tašišigurmaš û Agumê duwem yanjî Agum Kakerîm hatine biderkevtin.

Li gora vêna de Mêjûwa Gištîyî Mêjûvanan bergê 1, r. 328 de destpêkirina desthilatîya Agum Kakerîm di sala 1700 p. z. de dide binîšandan.

Weha derdikeve, ku li dawiya Gandaš de -mîna ku Hall-Hol dibêje, sê çar Serdarên tir tanî dawiya vê mêjûwa hanê dirêjî bi desthilatîya xwe ve dane bikirin. Di pêla dewleta Agum Kakerîm de Kasayî šerekî zor gewre ligel Hêtitan-Hêsisin de dane bikirin û ew

[5]Rojhilatnas Sêr King li Nivîsta xweyî Mêjûwa Babilistanê de, Rûpelê 244 de dibêje, ku peyva Kardonyaš ji bona herdu welatên Yekgirtîyî Somer û Akad dihate bigotin, tevî ku Parvekirinên Ciyografîyî van herdu Welatan jî hatibûn biparastin.
Li gora remana Sêr Sidni Simis de bingehê peyva Kardonyaš eveye: Donyaš Yekek ji Perestên Kasay bû û Kar bi têgihiština Zemîn û yanjî Welat tête bidîtin. Ger weha bû, Kardonyaš bi têgihiština welatê Xwedanê Donyaš tête biliberkevtin. Ev têgihiština hanê bi mebesta pîrozyê û perestyê hatîye biwergirtin.
Li gora nivîsta Miletên Mizopotamya, Rûpelê 98 de peyva Kardonyaš ew navekî kasayî ji bona Bajarê Babil hatîye bigotin.

dane bišikenandin. Wan Gewdeyên Perestên welatê Marduk-Merduk û Sarpanitum ji Hêtitan dane bisitendin, yên ku Hêtitan ew di pêla dewleta dawîyî Binemala yekem de yanî di zemanê Šûngirê dawîyî Hemorabî de di gava girtin û talankirina Babil de ligel xwe dabûn bibirin.

Dewleta Kasay li zemanê vî Qeralî de zor firehî ji xwe re date biwergirtin. Agum Kakerîm hemû welatên Somer û Akad datin bigirtin û ew bi yek welat di bin nav û nîšana Kardunyaš de bi jêr destên xwe ve dane bixistin. Herwehajî wî Miletê Hêtit date bišikenandin û Jorî wî date bizeftkirin û tanî dema vegirtinên Misrî di sedsalê šanzdehemînî p. z. de ew bi ser Miletê Emorî ve hatibû bizalkirin. (Mêjûwa Kevnarî Rojhilata Nêzîk, r. 201).

Li duwayî Agum Kakerîm de Burnaborayaš (Renege, ku ew yê duwem be), Kashtiliash II-Kaštilyašê duwem û Agumê sêyem hatine bipeydabûn. Belam derbarê van de tu agehdarî niye. Di pištî derbasbûna pêleke din de navên Kadashman Kharabe I-Kadašman Xerabê I, Kurigalzu I û Meli Shpak I-Meli Šipakê I têtin bidiyarkirin. li dawîya van de tanî zemanê desthilatîya Kara Indash-Kara Indaš[6] de, ku li gora Mêjûwa Gištîyî Mêjûvanan de di sala 1450 p. z. de dide bidestpêkirin, tu agehdariyên me ninin.

Li dawîya pêla dewleta Agum Kakerîm de, ya wê 22 salan daye bidirêjkirin, tanî zemanê Kara Indaš nêzîka du sed û bîst û du salan rûdanên wê demê nediyarin.

Belam ji destpêka sala 1450 p. z. de ji serdariya Agum Kakerîm de mêjûwa Kasay tanî radeyekî tête bidiyarkirin û kurtîya wê jî eve ye:[7]

1. Kara Indašê yekem di sala 1450 p. z. de: Di zemanê vî Qeralî de dewleta Babil ligel dewleta Ašur de pêwendîyên siyasî date bipeydakirin. Wî ligel Serdarê Ašurîyê bi navê Ašur Bel Nîš Ešo ve peymaneke

[6]Ev Qeralê hanê hemdemê Qeralê Tehmetisê Çaremî Feronîyî Misrî bû.

[7]The historians history of the world-Mêjûwa Gištîyî Mêjûvanan, bergê 1, R. 3283-29.

taybetî derbarê Sînor de date bigirêdan. Wî Perestgehek ji bona Xwedanê E Anna date bidurustkirin.

2. Kadshman Bel yanjî Kadashman Enlil I-Kadašman Bel yanjî Kadašman Enlilê I di sala 1430 p. z. de: Ew ligel Feronê Misrî Amen Hotepê sêyem de hemdem bû.

3. Burnaburiash I- Burnaburyašê I di sala 1420 p. z. de: Ew ligel Qeralê Ašurî de Pozor Ašurê çarem de li ser Sînor de hate bišerkevtin. Wî li bajarê Larsa de ji bona Xwedanê Šems Perestgehek date bidurustkirin.

4. Kurigalzu II di sala 1410 p. z. de: Di pêla serdarîya vî Qeralî de navê wî li ser bajarekî hate bidanîn. Bi pirbûn ve, wî navê wî bajarî bi navê xwe ve date bidanîn, pištî ku wî ew date binuhkirin. Ev bajarê hanê bi Xirbeyê Uqir Qof ve tête biderkevtin.

5. Burnaburyašê II di sala 1400 p. z. de: Šûngirê Kurigalzu bû. Pêla desthilatîya wî dirêj û bextiyar bû.

6. Kharakhardash-Xaraxardaš[8] di sala 1370 p. z. de: Wî Keça Qeralê Ašur Obalitê Ašurî date bimarkirin. Kurê wî Kadašman Xarbê yekem šerek li ser Miletê Sutu date bivêxistin û wî zora wan date bibirin. Wî hinek ji xelkên xwe di nava wan de date biwarkirin.

7. Di sala 1360 p. z. de bi hoyê gewrebûna destdirêjîya Ašurî ve di nava welatê Kasay de Miletê Kasay li ber Qeralê xwe de hate birabûn û wan ew date bikuštin û li šûna wî de wan Nazi Burgash-Naziburgaš li ser Text de dantin bidanîn. Belam ev Qeralê hanê jî ji bal Qeralê Ašurî Ašur Obalit de hate bibezandin û bikuštin.

[8]Mîna ku di Delîl de tête biderkevtin, ku ew yê duweme. (M. E.).

8. Kurigalzu sêyem di sala 1350 de ji bal Serdarê Ašurî de li ser Textê Welêt de hate bidanîn. Vî Qeralî welatê Êlam date bivegirtin û bajarê Susa yanjî Šuša jî date bizeftkirin. Wî ligel Bel Nirari Qeralê Ašurî de date bišerkirin.

9-13. Nazi Maruttash- Nazi Maruttaš di sala 1340 p. z. de, Kadashman Turgu-Kadašman Turgu di sala 1330 p. z. de, Kadašman Enlilê duwem yanjî Buryaš di sala 1330 p. z. de, Kudur Bel di sala 1304 p. z. de û Shagarakti Buriash-Šagarakti Buryaš di sala 1298 p. z. de. Di zemanê van her pênç Qeralan de šerekî dirêj û no di navbera Babilistan û Ašur de hate bivêkevtin.

14. Ji sala 1285-1270 p. z. de: Qeralê Ašurî Tukulti Ninibê yekem Babilistan date bidagîrkirin û ew ji bona nava bajarê Babil hate bikevtin. Wî Xiznên Perestgehên Babil dane bizeftkirin û Pûtperestê Merdok ji bona Ašur date bibirin. Ev vegirtina hanê renge, ku ew di pêla Qeralê Kasay Bibeiasho- Bibeyašo de hatibe bikirin. Lidûvanên vî Qeralî Bil Šom Îdîn, Kadašman Xeribê duwem (1277-1275 p. z. de) û Edadšom Îdîn (1274-1269 p. z. de) evan bi Qeralê Ašurî vegirêdayî bûn, yê ku ew heft salan bi rast û durustî ve Serdarê Babilstan bû.

15. Di sala 1270 p. z. de xelkê Babilistanê li ser Ašurîyan de dabe bišûreškirin û ew ji nava welatê xwe dane biderkirin. Wan Dadšom-Osor dane biserdarkirin. Li zemanê vî Qeralî de Babilistan gešbû. Wan hêrîšî ser welatê Ašur dane bikirin. Wan Qeralê Bel Kudur- Asorê Ašurî dane bikuštin û hinek ji welatên Ašurî bi ser Babilistanê ve dane bivekirin.

16. Di sala 1238-1224 p. z. de Meli Shipak-Meli Šipak beramber bi Qeralê Yenib-Apal-Îšarra Qeralê Ašurî ve cengek bi serkevtî ve date bivêxistin. Bi vî rengî ve di zemanê Mardok-Apal-Îdinê Kasay de ji sala 1223-1211

p. z. de Babilistan tûšî hêrîšên Qeralê Ašurdanê Ašur bû.

Di sala 1207 p. z. de li encamê serhildaneke Samî de dewleta Kasay hate bilinavcûn, pîštî ku vê dewleta hanê 576 salan û neh mehan date bidirêjkirin[9].

## 4. Dewleta Mîtanî

Mîtani ew Bereke jiberên Netewên Arî (Hindo-Ewropî) ne. Di Nava Xwedanên wan de Endera û Orona bûn, ji yên ku ew Xwedanê Arîyî pêšî bûn.Mesud, yê ku ew di sala 345 K. de mirî ye, di Nivîsta El-Tenbîh Wel-Îšraf, R. 78 de li ser Cihê Milet û Navên Êlên Kurd de dibêje: "Ji wan Bazincan, Šohcan, Šazincan, Nešawert, Bozikan, Lorî Cozqan, Celwanî, Parsiyan-Pars, Celalî, Mestekan (yanî Metîkan - Metînanê nihayî dorhlêa Mêrdînê ne. Hîç gûman têde niye, ku ev peyva Mestekan ji peyva Metîkan hatîye. M. E.), Cabarqe, Cirogan, Kîkan, Macerdan, Hezbanî û yên din têtin bidîtin, yên ku ew li Faris, Kerman, Sicistan, Xuresan, Isfehan û li Xakê Çiyan de ji Mahat: Mah

---

[9]Mistir Kong dibêje: Renge, ku navê Qeralê Kasayî dawî Ea-Nadin-Ê-Nadin be. Sêr Sidni Simis di mêjûwa Kevnarî Ašurî de, R. 294 de dibêje: Navê vî Serdarê Kasayê dawî Enlil-Nadin-Akhe -Enlil-Nadin-Axe ye. dewleta Kasay li ser hêrîša Qeralê Êlamî Šotrok-Nafxerend de û Dîlkirina Serdarê Kasayî dawî de hatîye binabûdkirin. Li dawîya çuna Êlamiya Dewleteke Cihî hate bipêkhatin.

Li gora Lista Sêr Sidni Simis de Jimara Serdarên Kasay divê bîst û yek bin.

Xwedîyê Mêjûwa Kevnarî Rojhilata Nêzîk di Rûpelê 286 de dibêje: ku Serdarê dawîyî Kasay Bel-Nadin-Akhi-Bel-Nadin-Axi Kurê Zammama-Šom-Îddîna bû. Ew pištî sê salan ji Serdarîya xwe bigir di sala 1180 p. z. de mirîye, yanjî ew hatîye bikuštin. Li dawîya wî de li Babil de dewleta Pashe-Paše Binemala Çarem hatîye bidamezirandin.

Li gora vê Goyîna hanê de dewleta Kasay bi hêrîša Êlamîyan linav nehatîye biçûyîn; belkî ku ew li dû bi serketina Ašurdanê Ašurî bi ser Zammayê Kasay de xelkê Babil Serhildanî dabin bikirin û dewleta Kasaya hatibe binabûdkirin.

Kofe, Mah Besre, Mah Sebzan, Igareyn ji Burc û Kercê Ebi Delef, Hemedan, Šehrezor, Derabad, Samgan, Ezirbêcan, Ermînya, Eran, Belîqan, Bab Wel-Ebwab - ji Czîrê, ji Šam û Sixur têtin bikevtin".Ji vê di derbarê nišankirina welatê Kurdî Mêjûyî û Perçe û Miletên Hindo-Ewropîyî de, yên ku ji wan Netewê Kurd tête pêkhatin, diyartir niye, yên ku ew hêjî tanî niha jî bi rêwend, Rabûn, Rûništin û Evsanên xweyî kevnar didin biparastin. (M. E.)

Ev dewleta hanê divê Qolek ji Kasay bête bidîtin û ew ji Komela Subarî tête biderkevtin. Mîtanîyan li Jorî Cezîrê de dewleteke gewre dane bidamezirandin. Ew ji çar dewletên mezin di dema xwe de dihatin biderkevtin, yên ku ew Misir, Hêtit, Kasay û Mîtanî bûn. Paytextê vê dewletê Wašoganî bû.

Di mêjûwa 1580 p. z. de Feronê Misrî Tehutimesê yekem di çûna xweyî Asya de li dewleta Mîtanî hatîye birasthatin û li šerekî ser sînorî de ew daye bišikenandin. Ji vê mêjûwê û pêve pêwendî di navbera herdu dewletan de hatîye bipeydabûn. Li sala 1522 p. z de dewleta Mîtanî bi jêr desthilatîya Misrî ve hate bikevtin.

Di sedsalê çardehemînî p. z. de Mîtanîyan ligel dewleta Hêtitan peyman dane bigirêdan û ligel vegirtinên Miletê Hêtit de pišk û pareke wanî pir bi nîšan û rûmet ve têtê biderkevtin.

Li dawîya sedsalê sêzdehemînî p. z. de Qeralê Mîtanî Košan Rîš Asayîm sipahê Misrî ji welatê Emorî date biderkirin, Bešê layê Jorîyî Surî date bidagîrkirin, Miletê Israîl hešt salekî bi jêr destên xwe ve date bixistin, Bešê zorî Kurdistan, welatê Ašurî û Arafa jî bi jêr desthilatîya dewleta Mîtanî ve date bixistin.

Li dawî de dewleta Mîtanî bere bere bi bê hêz ve hate bikevtin. Welatên Rojavayî Furatê bi destên Hêtîtan ve hate bikevtin û Jorî Surî bi destên Feronên Misrî ve hate bikevtin. Welatên Rojhilat jî ji bal Tiglat Pilayzerê Yekemê Qeralê Ašurî ve hatin bizeftkirin.

Li zemanê Ašur Nasir Palê sêyem de di sedsalê heštehemînî p. z. de welatên din jî ji destên dewleta Mîtanî hatin biçûyîn û dawîya vê dewletê pê hate bide derkevtin.

## 5. Dewleta Xeldî-Orarto

Em li ser vê dewleta hanê de didin bitêrkirin, mîna ku li ser wê de di bergê yekem de hatîye biaxivtin.

## 6. Dewletên Sobarî

Weha diyare, ku Sobarîyan dewleteke yekgirtîyî xurt nedane bidamezirandin. Dewletên wan her li dewletên biçûk biçûk de dihatin bipêkhatin.

## 7. Dewletên Nayri

Ev Miletê Nayrîyî Nevîyên Subarî jî dîsan dewleteke wanî gewre û yekgirtî nebû. Belam wan dewletên biçûk biçûk bi rengê Confidartion - Konfederasyon - Hevgirêdayî ve û ligel yekhevbûn hebûn.

Qeralê Ašurî Tîgalt Pilayzerê yekem li dešta Melazgurd de li Kurdistana Jorî de ligel bîst û sê Qeralên Nayrî de daye bšerkirin. (Sindi Simis, Mêjûwa Ašûr).

## 8. Dewleta Mîdya

Bavikê mêjûwêyî bi nav û bang ve Herodot-Hêrodotê Yunanî[10] derbarê bi bingehê danîna dewleta Mîdya ve bi kurtî ve dibêje:

"Li paš ku dewleta Ašurî 520 salan li Asya Jor de (dibe, ku ew Asya Rojava be) serdarî dane bikirin, Miletê Mîdya jî li pêš de li jêr destên wan de bû. Wî serê xwe beramberî Ašurîyan date birakirin û di šerê yek de Mîdîyan bi carekê ve serxwebûna xwe date biwergirtin. Miletên tir jî, yên ku ew li jêr destên Ašuriyan bûn, çav li Mîdyan de dane bikirin û ew jî bi šer ve yek li dû yek de hatin biserxwebûn.

[10]Herodot-Hêrodot li Halîkarnas de, ya ku ew Yekek ji Avedanîyên Vegirtinên Yunanîyî Rojavayî Enedolê de bû, di sala 484 p. z. de bi Dunyayê ve hatîye û ew di sala 425 p. z. de ji vê Dunaya Gewrik çûye. (M. E.)

Di pêlekê de Deioces-Dêyosis[11]-Kîqibad di nava Miletê Mîdî de hate bipeydabûn, yê ku ew Kurê Feraort- Ferartes bû. Ew Koxayê Dêyekê-Keyê gundekî bû. Ew Peyakî zor bi hîš bû. Medyayî ji bona îš, kar û pirspêkirinê ji bona nik wî dihatin biçûyîn. Bi vî rengî ve wî li hemû Mîdya de nav û bang ji xwe re date bipeydakirin.

Li dawî de wî date bigotin, heger hûn ji min re dîwan û seran nebidin birêkxistin û min bi Serokê xwe ve nedin bikirin, êtir nema ez ji we re pevçûn û mevçûnên we didim biçarekirin û ji we re hew amojgarîyan didim bipêškeškirin. Milet bi van mercan ve hate bipêrûništin. Gava ku ew bi ser wan ve hate biderdarkirin, wî gundên wan bi wan ve dane biçolkirin û bajarê Aqbatan-Akbatan-Hemedan[12] bi wan ve date biavakirin. Wî ev bajarê hanê bi paytextê xwe ve date bidanîn. Li dawîya 53 salên Serdarîyê de Kurê wîyî bi navê Feraort ve šûna wî date bigirtin. Bi vî rengî ve dewleta Mîdya hate bidurustkirin".

Bi rastî jî ev goya hanê ewende rast niye. Welatê kokîyî Miletê Med bi banîya Îranê ve tête biderkevtin. Renge, ku ligel Miletê duwayîyî Îranê de bi xizimên- merovênhev ve bêtin biderkevtin. Dibe, ku Zimanê wan bi zaravayekî Îranî ve bête biderkevtin. Ew di koka xwe de gerok bûn, belam li šax û kîvan de bere bere cîgîr bûn. Rabûn û rûniština bajaran ji xwe re dane biwergirtin. Wan bajarên xwe li ser çiyayên zal de bi ser dol û newalan de didan bidirustkirin. Jîyaneke wanî Ešîrîyî sade hebû. Di lîsta navê Gewreyên vî Miletî de çend Gewreyên Ešîran bi nav û bang bûn. Hîç serdarîya yekî ji wan li ser yên din de nebû. Hemû di mafe û desthilatîyên de mîna hevbûn. Navên wan mîna navên Iranîyan bûn. Zimanê wan di peyv û têgihiština xwe de ew mîna zimanê Ešîrên Kasay bû. Di nava navên wan de hîç nîšanek ji bona Ahora û Mazda nebû. li vêna de têtê biderkevtin, ku Ayîna Zerdeštî li dawî de li nava vî Miletî de hatîye bicîgîrkirin.

---

[11]Serdarîya wî ji 708 yanjî 701-655 p. z. de daye bidirêjkirin. Têtê gûmankirin, ku ew Kîqbade, yê ku Goyên Rojhilatî ji Erebî û Farisî li ser didin biaxivtin. (M. E.).

[12]Di Goyên Ašurî de Emdana hatîye. Di Goyên Hêxamenîyan de Henk Metan bi têgihiština Cihê Civînê hatîye. Ew niha bi navê Hemedan têtê binavkirin û li Kurdistana Iranê de têtê bikevtin. (M. E.).

Qeralê pêšîyî Mîdya Dêyosis-Kîqibad bû, yê ku ew Kurê Duiaukku-Dayoko[13] bû. Dayoko Walîyê Manay- Manda bû. Wî Kurê xwe bi giraw ve li nik Russash-Rusaš Serdarê Orarto de danîbû bidanîn. Ev Kurê hanê di šerekî Ašurî de ligel Orartîyan de bi dîlîtî ve bi nava destên Ašurîyan ve hate bikevtin. Wan ew di sala 715 p. z. de ji bona Hamat- Hema Sûrî dane bidûrkirin. Ji nav û cihê wî weha tête biderketin, ku ev Mîrê Biçûk Danîvanê dewleta Mîdya Dêyosis-Kîqibad bi xwe ve tête biderkevtin[14]. Xanedana wîna demeke dirêj hate bimayîn û ew bi xwe jî ve bi Bavpîrê Serdarên Mîdya ve hate biderkevtin, ku dewleta wan di serdema xwe de bi xurttirîn dewleta dunyayê ve dihate biderkevtin.

Bi kurtî Deioces-Diyosis li dawîya kirina Šarê Aqbatanê-Akbatanê bi paytextê dewleta xwe ve wî ew šarê hanê zor date bisengînkirin û wî ew pir date bixemilandin. Wî dema desthilatîya xwe bi bê ceng û šer ve date birabuhurandin. Wîna ji bona bi yekkirina Ešîrên Med gelekî date bixebatkirin û ew têde hate biserketn. Senherîbê Qeralê Ašur çunke, ku ew di vê navê de ligel Babil û Êlamî de xerîk bû, wî nedikarî vê kêsa damezrandina bi yekkirina Ešîrên Med rê li ber de bide bigirtin.

Diyosis li gora Hêrodot de ew li dawîya serdarîya 53 salan hatîye bimirin. Li gora goyeke din de ew li dawîya serdarîya 46 salan de (ji 701-655 p. z. de) hatîye bimirin. Fravartish yanjî Phraortes-Feravartiš yanjî Feraortisê Kurê wî ji bona cîgehê wî hate bidanîn.

Feravartiš-Feraortis di gavekê de ligel dewleta Ašurî de didate binirînkirin. Li dawî de hinek ji Miletên Arîyî tirjî. yên ku ew ji Rojhilat hatibûn û ew ligel Med de hevrehbûn, ew ji bona jêr serdarîya Feravartiš hatin bikevtin. Herwehajî Miletê Faris, yê ku bi çavekî sivik li wan de dihate bitemašekirin, ew jî dîsan bi Med ve

[13]Goya Mušîr El-Dewle di Mêjûwa Îran de, mîna ku ew ji bal Hêrodot de hatîye biveguhestin, tête bicudakirin. Ew dibêje, ku ev Dêyosis bi xwe ew Kurê Feraorte. Ew Dayoko herdu Yek mirovin. Li ser vêna de divê ew bi xwe û ne Kurê wî ji bona nava destên Ašurîyan ve hatibe bidîlkirin. (M. E.).

[14]Renge, ku ev Mîre li dawî de bi alkarî Medê Surî de bi her rengekî hatibe birizgarîkirin û ew ji bona Mîdya hatibe bivegerandin. Bi Rastî jî ve Tîglat Pilayzerê Sêyem li ser hin ji navên Eširên Mîdî li Surî de dide biaxivtin. (mêjûwa Ašur, Olmistêd, R. 516).

hatin bivegirêdan. Bi vî rengî ve hêz û hinera dewleta Med zor bêtir bû. Patîšahê Med xwest, ku ew ji vê zînetê sûd ji xwe re bide biwergirtin û êtir bi hîç navekî ve bac û bêšan nema ji bona Ašurîyan dide bidan. Li ser vê de ew ligel dewleta Ašurî de bi ceng û šer ve hate bikevtin. Di encam de ew hate bišikenandin û ew ligel bešê zorî Mîr û Peyên xwe ve di sala 633 p. z. de hate bikuštin.

Li dawîya Feravartiš Birayê wîyî bi navê Huvakhshatara û yanjî Cyxares-Huvaxšatara yanjî Kîaksarês[15] ve ji bona çîgehê wî hatîye bidanîn.

Ev Mirovê hanê Rêberekî pirî baš bû û Serdarekî wirya û zor têgihištî bû. Karê wîyî pêšî bi bêxistn û çakkirina sipahê xwe wî date bidestpêkirin; çunke, ew li šikenandina Feravartiš de hate bitêgihaštin, ku bi sipahekî Eîrtî û têkel û pêkel ve šerkirin ligel aipahekî bi rêxistîyî Ašurî ve nikare bête bikirin. Jibervêjî wî sipahekî li ser bingê tazeyî wê demê de date birêkxistin. Koma Peyade û Sûwarî jihev date ^bicihêkirin. Peyade wî ew bi Šûr, Tîr û Kevan date biçekkirin. Koma Sûwarî bi jêhatîbûn û kêrdarî wî ew date bipêkanîn, ku ew li pir taybetîyên xwe de bi ser Sûwarên Ašurî ve dihate biserkevtin.

## Kar û barên Cengînîyî Kîaksarês

Gava ku Cyaxares-Kîaksarês Pêkanîn, Fêrkirin û Perwerdekirina Sipahê xwe bi dawî ve date bianîn û beramber bi dewleta Ašur ve ligel Nabopolassar-Nabopolasarê Qeralê Babilistanê de di befirbar sala 615 p. z. de hate birêkevtin, wî rûwê xwe ber bi Ašur ve date bivedan.

Weha diyare, ku ew bi ser welatên Namrî û Mazamoa de hatîye biderbasbûn û wî welatê Arrapha-Arafa û bajarê wî jî daye bizeftkirin. Ev bajarê hanê ji bona koka welatê Ašur zor giring bû. Weha diyare, ku Kî Aksarês-Kî Aqsarês ev bajarê hanê bi wargeha xweyî cengê ve ji xwe re daye bidanîn.

---

[15]Mêjûwa Gištîyî Mêjûvanan, bergê 2.
(Lêbelê ev Bîr û Bawerîya hanê ligel Hêrodot tête bicudakirin. Hêrodot Cyaxares ne bi Birayê Feravartiš dide bidanîn, belam ew wî bi Kurê wî dide bidanîn. (M. E.).

Sipahê Mîdî di sala 614 p. z. de berê xwe ber bi Nîneva ve, ya ku ew paytextê Ašurî bû, date bivekirin[16]. Wî bajarê Tabrîzê jî date bidagîrkirin. Li paš de ji bona girawkirina pêwendîyên xwe ligel sipahê Babil de wî rûwê xwe ber bi Jêr ve date bivekirin û bajarê Ašur-Šerqatê, yê ku ew di kevnar de paytextê Ašurî bû, date bizeftkirin û biwêrankirin. Qeralê Babil li dawîya zeftkirina vî bajarî de bi cîh ve hate bigihištin. Li wêderê de wî ligel Kî Aksarês de peymaneke tazeyî nuh derbarê sînorê ayinde de di navbera dewletên xwe de date bigirêdan. Ji bona xurtkirina pêwendîyên siyasî di navbera herdu dewletan de Kî Aksarês Keça Kurê xwe Istiyag, ku navê wê Amyitis bû, ji bona Nabuchadnezzar-Nebuxadneser data bidan, yê ku ew Kurê Qeralê Babil bû[17].

Di mayîna sala 614 p. z. de û di sala diwayî de derbarê tevger û jêhatîyên sipahê Medî de agehdarîyên me nînin.

Belam Herodotus-Herodotê Mêjûvanê Yunanî dibêje, gava ku Kî Aksarês cara yekem bi ser Nîneva de hate bidakevtin, wî bihîst, ku Êlên Scythian-Sîtîyan bi ser Mîdya ve dane bidadan; jiber vê ew hate bivegerandin. Ew ligel Miletê Sîtî de hate bišerkevtin û di encam de ew hate bišikenandin û welatê Mîdya 28 salan li jêr serdarî û vegirtina Miletê Sîtî de hate bimayîn. Li paš de Kî Aksarês bi fêl ve herên Gewreyên Sîtîyan dane bikuštin û ew ji Mîdya dane biderkirin. Li dawî de ew ji nûve careke din bi ser Nîneva ve hate birakišandin.

Ev goya Hêrodot ne bi šopên kevnarî dozandî ve lê tête bipištgirtin û ne jî li gora rastîyê de tête biderketin; jiber di navbera hêrîša

---

[16]Mistir Hall-Hol di nivîsta xwe de Mêjûwa Kevnarî Rojhilata Nêzîk de, R. 511 de dibêje: Li dawîya dewleta Ašur Banîbal de Qeralê Mîdya Kî Aksarês ligel Ešîrên Hevgirtîyî Oman-Mandan de, yên ku ew ji Sipahên tevlihevî Sît, Manay û Kîmmerê Ermenî dihatin bipêkhatin, li pišt Çiyayê Cudî-Gotî de bi serhev de hatin bikombûn û wan di sala 626 p. z. de hêrîša xwe bi ser Nîneva de dane berdan. Belam Bajar bi wan nehate bigirtin.
Herodot-Hêrodot dibêje: ku Feravartišê Mîdî jî di sala 634 p. z. de bi ser Ašur de hatîye, belam ew hatîye bišikenandin. Kî Aksarês- Kî Aqsarês li sala 630 p. z. de bi ser Nîneva ve hat û Çardorî lêdate bivedan, belam li layê Miletê Sîtê ve, yê ku ew di bin Rêberîya Madayis de bû, ew neçarî vegerê kir. Ev herdu Goyên hanê ji Hîš dûr nînin. Weha tête biderkevtin, ku Mîdya û Sît her û her bi rêk nebûn. Kuština Serokê Sît Madayis li ser destê Kî-Aqsarês de vê rastîyê dide biderxistin.

[17]Mêjûwa Ašur, Olmsitêd, R. 636.

yekem de û ketina Nîneva de bes û bi tenha sê sal hebûn. Heger weha ba, ku welatê Mîdya 28 salan li jêrî vegirtina Miletê Sîtî de bû, bi serûtšî ve ne dibû, ku Qeralê Mîdya ji bona ser Nîneva bide bihêrîškirin, yaxud inca li dawîya van 28 salan de ango di sala 586 p. z. de divê wî Nîneva dabe bizeftkirin.

Bi kurtî ve Kî Aksarês li 612 p. z. de dîsan bi ser Nîneva ve hatîye birakišandin, sipahê Babil jî bi wî ve hate bigihištin û hinek ji Ešîrên Sîtî[18], yên ku ew di hewara Ašurî de hatibûn, bi wî ve hatin bigihaštin, pištî ku wî ew Ešîrên hanê bi talanîya welatê dewlemendî Ašurî ve dane bidilbijandîkirin. Ev Ešîrên hanê jî ligel sipahê Mîdya û Babilistanê de hev dane bigirtin. Pištî vê hevgirtina hanê Kî Aksarês Qeralîtîya xwe bi navê Oman-Manda date binavkirin[19].

Di navbera sîwan-gulan û gelawêj de sê hêrîš ji bona ser Nîneva hatin bikirin. Di Encam de ev bajarê gewre û ciwan û ev paytextê bi nav û dewlemend ve bi destên Hevalbendan ve hate bikevtin û Qeralê Ašurîyî bedbext Sin-Shar-Ishkum -Sîn-Šar-Iškum jî wî xwe ligel mal û Peyên xwe de date bisûtandin.

Hevalbendan bajarê Nîneva dane bitalan û biwêrankirin. sipahê Babilî bi dû bešekî ji Ašurîyên ji bajêr revyayî ve hate bikevtin. Komeke Ašurî di bin Rêberîya Ašur Obalit de xwe bi Heran ve date bigihandin û wan li wir de ser li nû de ji xwe re dewletek dane bidamezirandin.

---

[18]Ev Miletê Sîtî kokazin-Qoqazin. Di sedsalê Heftemînî Pêš Zayînê de ew li Jorî Orarto û li Jêrî Derya Reš de hatine bidîtin. Weha tête biderkevtin, ku ev Miletê hanê li ser tengavkirina wan de ji bal Ešîrên Kîmmer-Gumer ji Jêrî Rûsya de hatine biderkirin. Li zemanê Aser Hadonê Qeralê Ašurî de (di sala 681-669 p. z. de) wan hêrîšî sinorê Jorîyî Ašur dane bikirin. Li dawî de Yekekî ji Serokên Sîtî bi navê Bartatwa ji tirsa Kîmmerîyan ji bona Manay hatibû û wî ligel Manay de bermber bi Sebaka-Ešbaka û Kasterît yanî Qeralê Sîtî û Kaskaši peyman date bigirêdan. Ev Bartatwa li gora Herodot de ew bi xwe Pirototiyose, yê ku ew Bavê Madayise, yê ku wî li paš navekê de hemû welatên Surî û Felestin tanî sinorê Misrê dane bivegirtin û wêrankirinê. Qeralê Ašurî Bartatwa li Cihê Sebkayê šikestî de bi Qeralî û Rêberê sipahên Sîti li Ermîna û Manay de date bidanin. (Mistir Hall-Hol, R. 497).

[19]Oman-Manda Navnîšaneke Gišti ye, ku ew ji bona Hevgirtina Ešîrên Jorî dihate bigotin, yên ku ew ji Med, Manay, Sît û ji Hinek ji Kîmmer dihatin bipêkhatin. Mistir Hall-Hol dibêje, ku Têgihiština Manda ji bona Med û Sîtî navnîšaneke hevbešbû. Babilîyan Hevgirtina Gištîyi Eširên Hovîyî Jorî bi vî navî didan binasîn.

Kî Aksarês ligel Sît de di meha kewçêrînkê de ji bona Mîdya hate bivegerandin. Li ser hewara Nabopolasar de pê wî rûwê xwe ber bi paytextê tazeyî Ašur ve date biveda, yê ku ew bajarê Heran bû. Wî ligel sipahê Babil de paytext date bizeftkirin û wî ew dîsan date biwêrankirin.

Li gora Mêjûwa Îrana Kevnar de[20] Lidûhištinên Ašurî di navbera Mîdya û Babil de hatin biparvekirin. Vegirtinên Ašurî di Asya Biçûk de bi destên Mîdya ve hatin bikevtin. Ji Jêrî rûbarê Dicle tanî digha bi Diyarbekir ve di navbera Mîdya û Babilistanê de sînor bû. Ji Diyarbekir tanî Furat jî xêzeke din herdu dewlet jihev didan bicihêkirin. Ji kenarê rastî Furatê bi pirbûn ve tanî Jorî Meletya sînorê dewleta Kilîkya bû. Renge, ku sînorê dewleta Mîdya û dewleta Lîdya jî ji dešta Ozin Yayla-Bana tanî Halyas-Qezil Îrmîq û ji wêderê de tanî derya Reš diçû.

Li paš gavekê de û li gora Îrana Kevnar de li ser reva hinekan ji Mêrkujên Sîtîyan ji bona nik dewleta Lîdya û nehiština berdestkirina wan ji bona Mîdya agirê šer di nava wan deh ate bivêketin. Li gora goyeke din de šer li ser çavberdana dewleta Lîdya û dilbijandina wêna ji bona welatên Ašurî hate bivêketin, yên ku ew ji bal Mîdya hatibûn bigirtin, di dema ku wan Nîneva dane bigirtin û biwêrankirin. Di navbera sipahên Mîdya û Lîdya de li perê çemê Halyas de šerekî giran û dirêj ji sala 591 tanî 585 p. z. de hate bilidarkevtin. Di dawîya šer de di 28 gulana sala 585 de roj hate bigirtin û herdu Layan ev bi nîšana bîntengbûna Xwedê ve li ser xwe de datin bidîtin. Li ser navcîbûna Qeralê Babil Neboxed Nesir û Qeralê Kîlîkya Seyenesîs de ew hatin bilihevhatin û ew bi ava Halys bi sînor ve di navbera xwe de pê hatin birûništin.

Vê lihevhatina hanê bi Jindanê di navbera du Xanedanê Serdar de pêwendîyên wan ligel hev de date bixurtkirin. Keça Qeralê Lîdya Aryenis ji bona Astîyag[21] Kurê Kî Aksarês di sala 585 p. z. de hate bidan.

---

[20]Nivîsteke Farîsî ye. Ew ji bal Mušîr El-Dewle Bîrniya hatîye binivîsandin. Ew li Tehranê de di sala 1308 F. de hatîye biçapkirin. Têde hatîya: ku bi nabûdkirina Ašur pêwendiyên di navbera Mîdya û Babil de xurtir bûn, bi taybetî gava ku Qeralê Mîd-Mad Xuweha xwe bi Šûngirê Qeralê Babil Bexti Nesir da, yê ku ew di pišt re ji bona Babil bi Qeral bû. Vî Bexti Nasir di bajarê Babil de Baxên pêvekirîyî bi nav û bang û Yekek ji Heft Sersûrên Dunyayê date biavakirin. Wî ev Baxên hanê bi xelat ji bona Jina xweyî Mîdî date biavakirin. Ev Baxên hanê bi šašbûn di bin nav û nîšana Semirasîsê Qeralê Ašurî de bi nav û bang bû. (M. E.).

[21]Astîyag-Astak bi Zimanê Yunanî dihate bipeyvkirin. Bi Zimanê Babilî ew bi Îxto Wîko dihate bipeyvkirin. Di Kanîyên Rojhilatî de ji Farisî û Erebî de ew bi Kî Kawis dihate binavkirin, yê ku ew tête bigûmankirin, ku ew (Nerud) Ibrahîmê

Li dawîya vê lihevhatina hanê de bi salekê ve Kî Aksarês hate bimirin û Astîyag ji bona cihê wî hate bidanîn. Zemanê Astîyag bi bê šer û ceng ve hate birabuhurandin. Belam hoyên nešistî û linavçuna dewleta Mîdya bi pêškevtin û hêzbûna dewleta Faris ve dihatin biderkevtin. Vê rûdana hanê di zemanê Astîyag de date birûdan. Li layekî tirjî de hoyên linavçuna dewleta Mîdya šêweyê nebašbûna dan û sitenda Astîyag ligel gelekan de ji Peyan û Maqûlên Miletê xwe dihate biderkevtin, yên ku ew ji ber vê lê hatin bitûrekirin.

Di dawî de dewleta Pars-Farisîyî bi Mîdya ve girêdayî li Jêr serpereštîya Mîrên Binemala Achaimenes- Axmenî de bere bere hêz û hinera wan bêtir bû û wan ji bil Miletê Pars hin Miletên din de jî mîna Paris û Hêrekan ligel xwe de dane birêkxistin û ew li ber Mîdya de hatin birabûn. Rêberê vê liberabûna gewre Serdarê Parsîyî bi nav û bang Cyrus- Sirosê duwem yaxud Kurush-Korš yanjî Kî Xesrewê Gewre bû[22].

Cyrus II yaxud Kurush-Sîrosê duwem yaxud Koršê Mezin bi leškerekî zor ve bi ser Mîdya date bidadan. Wî ligel sipahê Astîyag de šerekî sengîn date bikirin. Qeralê Mîdya Astîyag liberxwedaneke pir gernas, mêrxas û bêhempa date bikirin, belam Harpagosê Serekê Xanedana Gewreyî Mîdya ligel wî de bêbextî date bikirin. Ew û bi Hevalbendên xwe ji bona layê Cyrusê duwem-Kî Xosro çûn. Bi serûštî ve li encamê vê

---

Xelîle, Silav li ser be. M. E.).

[22]Ev Xanedanê Axmenîyî hanê ji herema Anshan-Anšan û yaxud ji Anzanê ye. Renge, ku ev welatê hanê li Jêrî Rojhilatî Loristana îro de û li nêzîka welatê Êlam de bête bikevtin. Ev Xanedana hanê di pêšî de her ew bi ser Bešê Pars-Furs de serdar bû. Dibe, ku wê ji xwe re navnîšana Qeralitîyê di pêla nabûdbûna dewleta Ašurî de, yaxud di dawîya mirina Ašur Banîbal de û di pêla zeftkirina Elam de dabe wergirtin. Li paš de wêna welatên Paris-Furs û Hêrqan-Xuresan jî ji xwe re dane dagîrkirin. Li gora nivîsandina Behiston û Lêvenerandinên Mistir Hall-Hol de ev Xanedana hanê renge, ku ew di Navîna sedsalê Heftemînî p. z. de ji bal Hexmanîš-Axemen hatibe bipêkhatin. Li dawîya Serdarê duwem, yê ku ew Cîš-Pîš bû, Xanedan bi Du qol bû. Li gora Îrana Kevanr Qolek jê Parisî bû û yê din Anzanî bû. Mistir Hol dibêje, ku ji Qolê Anzanî Çar Serdar hatine û ji Qolê tirî Parisî Sê Serdar hatine. Cyrus-Sîrosê duwem ku pê Kurush-Koršê pêsî dibêjin û bi navnîšana Gewre ew tête binavkirin. Ew Heftemîn Serdare û wî ligel Istiyag de šer kirîye, wî Babil girtî ye û ew Cîhangîrekî bi nav û bang bû. Daryoš-Dayosê Yekem ew Nehemîn Serdarê vê Xanedanê bû.

çûnê de Astîyag pir xerab hate bišikenandin û Miletê Mîdya ew ji padšahîyê di sala 550 p. z. de ji ser Text date bidaxistin.

Kî Xosro beramber bi kar û yarmetîya Harpagos û Xanedanên dinî Mîdî ve dan û sitendineke baš ligel wan de date bikirin. Cîhên wan di nava sipah de yanjî wekhevbûna wan beramberî Xanedanên Pars zor kêm cuda dihate biderkevtin, ango di derbarê mafeyan û diserhevgirtinan re cudabûn di navbera Xanedanên Pars û Mîdya de ew bi mîna mafeyên Ingilîz beramber bi Iskotlandîyan ve û yanjî mafeyên Pirosîyan beramber bi Bavarîyan ve di pêla Šahînšahîya Elmanî de dihate biderkevtin[23].

Bi Kurtî ve bi vî encamî ve dewleta Mîdya li dawîya desthilatîya sed û pêncî salî û šurešeke mêjûyî giring de hate bilinavçûn. Li cîgehê wê de dewleta Axemenîyî Îranî hate bipeydakirin.

Li gora Mêjûwa Îrana Kevnar de ya Mušir El-Dewle Miletê Mad di koka xwe de ew li Azirbêcan, Kurdistan û Îraqa Ecem de[24] bû. Li dawî de ew fireh bû û bazinê desthilatîya wî ji çemê Halyas-Qezil-Irmaq ve tanî welatê Baxter yanî Afganistan û ji derya Xezer ve tanî Pras û Xuzistan dihate bizîvirandin.

Li dawî de Zanistîvanên ciyografîyî kevnar dane bigotin, ku Mîdya bi xwe ve ji du bešan dihate pêkhatin:

1. Mîdya Gewre ew ji Îraqa Ecem dihate bipêkhatin.
2. Mîdya Biçûk ew ji Azirbêcan dihate bipêkhatin.

---

[23]Mistir Hall-Hol, Mêjûwa Kevnarî Rojhilata Nêzîk, R. 555.

[24]Mušir El-Dewle di Mêjûwa Îrana Kevnar de, R. 56 de dibêje: ku Îraqa Ecem ji van Deveran dihate bipêkhatin."Keros, Hemedan, Kermenšah, Qezwîn, Îraq, Isfehan, Nehawend, Rê" û tanî Derbendê Derya Xezer diçû, ya ku ew bi sînor di navbera Mad û Prs de dihate bidîtin.

# *Bešê Yekem*

## Dewletên Kurd di Pêla Musulmantîyê de

Ev derîyê bi çardeh bešan ve tête biparvekirin: 1. Dewleta Rewadî ji 230-616 K. de, 2. Dewleta salarî li Azerbêcan ji 300-420 k. de, 3. Dewleta Hesnewîyî Berizkanî ji 330-405 li Hemedanê de, 4. Dewleta Šedadî li Aranê de ji 340-465 k. de, 5. Dewleta Dostekîyî Merwanî li Diyarbekrê de ji 350-380-476 k. de, 6. Dewleta Enzawîye li Helwanê de ji 380-446 k. de, 7. Dewleta Šibankarî-Šivankarî li Faris de ji 412-658 k. de, 8. Dewleta Lorê Mezin ji 550- 827 k. de, 9. Dewleta Lorê Biçûk ji 570-1250 k. de li Loristan de, 10. Dewleta Eyubî li Misir û Šamê de ji 567-685-950 k. de, 11. Dewleta Erdelan li Îranê de ji 617-1284 k. de, 12. Dewleta Padîšahîyî Kurd li Xuresanê de ji 643-785, 13. Dewleta Zendî li Îranê de ji 1167-1202 k. de û 14. Dewleta Biraxoyî li Bilucistanê de ji 1172-1300 k. de.

## *Derîyê Yekem*

## 1. Dewleta Rewadî[25] li Ezirbêcanê de (230-618 k.)

Li gora lêgeradinên Insiklopêdîya Musulmanitîyê de ev dewleta Rewadî ji kevintirîn dewletên Kurd tête bidanîn[26]. Ibin Xurdanî, yê ku wî

[25]Seyid Husên Mukriyanî vê dewleta hanê bi Orbaykan yaxud bi Musafir dide bidanîn. Ez nizanim, ku wî navê Yekem ji ku hênaye. Insiklopêdîya Musulmantîyê bi vê dewletê dewleta Rewadî dibêje, jiber ku Bavê Merzeban li Ešîra Rewadî bû û ew bi Mamelan bi nav û bang bû.

[26]Ev dewleta hanê bi rastî koka dewleta salarî ye. Biserdejî rûdanên wan di nava hev de ne. Na, hêjî bêtir ew bi xwe yekin. Bes û bi tenha Pêlek di nava wan de hate bidîtin, ya ku têde Texlib Beni Sac dewleta salarî di Azirbêcanê de date bipêkanîn. Weha bi bašî dê bihata bidîtin, ger ku ew herdu Dewlet bi Yek dewletê bihatana

di sala 232 k. de bajarê Tevrîzê serdanî date bikirin, bajar li jêr Serdarîya Mohemedê Rewadî de date bidîtin. Herwehajî li gora wî de di sala 280 k. de ev welatê Azirbêcan bi destên Sacid Mohemed Avšin Kurê Diyodad ve hatîye bikevtin û ew tanî sala 317 k. de bi destên Nevîyên Sacidê Mohemed hate bimayîn. Li duwayî Sacid de herema Meraxe bi destên Muzeferê Kurdê Dilêmîve, ango Nevîyê Rewadîyê Kevnar ve hate bikevtin. Ev kanî bi xwe jî ve dibêje, ku Merzeban û Birayê xwe Wahsozan jî ji Xanedana Rewadî bi xwe ve têtin biderkevtin.

Bi rastî jî ve tanî pêla Merzeban derbarê dewleta Rewadîyî Kurdî de tu agehdarîyên me nayêtin bidîtin. Kanîyên Erebî ji destpêka Merzeban û pêve bi dûr û dirêjî ve li ser vê dewleta hanê de didin biaxivtin.

Di axivtina me de li ser Deysem de di dewleta salarî de dê emê bidin bidîtin, ku Merzebanê Kurê Mamelan-Mohemed bi tep û alîkarîya Wezîrê Deysem Elî Kurê Cafer ve Azirbêcan date bidagîrkirin. Merzeban Nivîsvanekî wîyî taybetî bi navê Îskoye hebû, ku wî her û her li nik Merzeban de dijî Elî Kurê Cafer buxtan didan bikirin, di dawî de wî dilê Merzeban bi dilbijandina malê Elî Kurê Cafer date bidilbijandin. Gava Elî Kurê Cafer evaya date bizanîn, wî remana xwe ligel Merzeban de date biveguhertin. Wî xwest, ku ew bi dizî ve tepekê ji bona Merzeban bide bidanîn. Wî Merzeban bi vegirtina Tebrîzê ve pir date bidilbijandin, da ku ew mal û xizna wê ji xwe re bide bizeftkirin. Bi vî rengî ve Merzeban ji bona nava tora wî hate bikevtin. Di dawî de Merzeban Leškerek bi wî date bidan û ew ji bona ser Tebrîzê date binardin.

Elî Kurê Cafer ji bona ser bajarê Tebrîzê hate birakišandin û wî ji bona xelkê bajêr xeber date binardin, ku Merzeban bi dilbijandina talankirina mal û xizna bajêr lešeker bi ser de daye bikišandin û wî ew dane bišîretkirin, ku ew ji Deysem hewarê bidin bixwestin û Deylemîyên nava bajêr bidin bikuštin. Bi rastî jî ve xelkê Tebrîzê weha dane bikirin. Merzeban, gava ku wî xebera hatina Deysem date bibihîstin, bi leškerekî ve rûwê xwe wî ber bi Tebrîzê ve date bivedan û li nêzîka wê de ew tûšî Deysem bû û wî ew date bišikenandin.

Deysem bi xwe ve ligel lešekerê xweyî mayî de û ligel Elî Kurê Cafer de ji bona nava bajarê Tebrîzê çûn. Merzeban jî hat û wî çardorî bajêr date bigirtin. Wî bi dizî ve ligel Elî Kurê Cafer de da û sitend û wî

bidanîn. (M. E.).

ew ji xwe re date bigirawkirin. Li paš bêhnekê de Deysem ji bona çûna Erdebîl derçû û Elî Kurê Cafer jî ji bona layê Merzeban çû.

Di axivtina me de li ser Deysem de dê emê bidin bidîtinb, ku bi tepa Wezîrê Deysemî duwem, yê ku ew Kurê Neîme bû, Merzeban Erdebîl date bizeftkirin û Deysem date bidîlkirin û wî ew ligel mala wî de ji bona keleha Term date binardin.

Merzeban, pištî ku ew ji šer û merên Deysem hate birizgarkirin û wî Azirbêcan hemû ji xwe re date bivegirtin, wî berê xwe ber bi Çakkirinên Hundirê Welêt ve date bivekirin.

Di dema ku Merzeban bi van Çakkirinan di nava welatê xwe de dihate birabûn, di sala 332 k. de ew tûšî hera û talanîya Miletê Rus bû. Ji niškê ve ew bi gemîyan ve di rêya derya Xezer de bi devê ava Ker ve hatin bigihaštin û li wêderê de hatin bipeyabûn û ji wir wan berê xwe ber bi Azirbêcanê ve dane bivedan. Serdarê keleha Berzee, ya ku ew li ser sînorê Jorîyî Azirbêcan de dihate bikevtin, bi leškerekî baš ve rê li Rusan de date bigirtin. Belam ew pištî šerekî yek Demjimarî hate bišikestin. Rus bi šûn wî ve hatin bikevtin û wan di keleha Berzee de çardorî dane bigirtin. Wan ew li paš de datin bigirtin. Wan di nava kelehê de pir pîsîtî dane bikirin û wan hemû xelkên wê dane bikuštin.

Gava Merzeban ev xebera hanê hate bipêgihaštin, wî orduwekî sî hezar Kesî date  bikomkir û rûwê xwe ber bi Rusan ve date bivekirin. Rusan beramber bi Merzeban ve xwe nikarîbûn bidana bigirtin. Belam dîsan bi šerên biçûk biçûk ve wan ew date bixapandin û bešekî ji wan xwe bi Meraxe ve date bigihandin. Belam bi hoyê zor mêwê xav xwarin, ew tûšî verišandinê bûn û gelek ji wan hatin bimirin û yên mayî jî hatin bibazdan.

Gava Merzeban date bidîtin, ku ev šer û merên hanê dê pir bidin bidirêjkin, wî xwest, ku ew Rusan bi fêlbazîyekê ve bide bilinavbirin. Bešek ji leškerê xwe ji bona boseyekê li pêšîya Rusan de date bicîgîrkirin û ew bi xwe û hêza xweyî mayî ve ligel Rusan de hate bišerkevtin. Ji Qazî ve wî xwe date bišikenandin û ew bi hêza xwe ve tanî nêzîka bosê hate bigihaštin. Li wêderê de wî xwest, ku ew bi leškerê xwe ve bi ser wan ve bide bihêrîškirin. Belam leškerê wî tirs bi wan ve hate bikevtin û wan nedan bihêrîškirin. Gava Merzeban ev rewša hanê date bidîtin, ew pir dilšikestî bû. Wî dev ji canê xwe berda û wî xwe bi ser Rusan de date bikišandin. Birayê wî ligel hin ji Merovên wî û xelkên xwe de tev li wî bûn. Leškerê wî hatin bišermezarbûn, gava ku çavên wan bi vê azayî û mêrxasîya Merzeban ve hate bikevtin. Ew ji bona nava šer hatin biveger-

andin û yên di bosê de jî wan jî dest dane bihilanîn. Bi vî rengî ve Rusan xwe di nava du agiran de datinbidîtin. Kuštarekî zor li wan de hate bikirin û Sergirê wan jî hate bikuštin. Mayên wan jî bi hezar û yek dujwarîyê ve xwe bi keleha Šehristan ve dane bigihaštin. Hemû talan û Dîlên Musulmanan Rusan di wê kelehê de dabûn bikomkirin. Merzeban bi šûn wan ve hate bikevtin û wî çardorî kelehê date bigirtin.

Di vê bêhne de xebera hêrîša Ebu Ebdelahê Hemdanî bi ser Azirbêcan ve bi Merzeban ve hate bigihaštin. Ew neçar bû, ku ew bešekî ji leškerê xwe ji bona dorlêgirtina Rûsan bide bihištin û ew bi xwe jî ve ligel leškerê xweyî mayî de ji bona pêrgîbûna Ebu Ebdulahê Hemdanî çû. Kurê Hemdanî tanî Selmasê hatibû û wî ligel Serokê Ešîra Hezbanî de Cafer Kurê Šikoye hevgirtibûn.

Merzeban ji bona šerê Ebu Ebdelahê Hemdanî hate birêkevtin. Li dawîya šerekî kêm de Ebu Ebdulahê Hemdanî bi hoyê barîna befreke zor nema wî dikarîbû xwe bida bigirtin. Çunke, zorî leškerê wî Ereb bûn û berg û cilên wan, tirag û çaroxên wan xwe li ber sermê û berfê de nedidan bigirtin. Ew neçar bû, ku ew ji bona Musilê bête bivegerandin.

Debera em ji bona ser hêza Merzeban bêtin bivegerandin, ya ku wê Rus çardorîkiribûn. Rusan pištî demekê ji liberxwedanê ševekê ew ji kelehê de hatin biderçûn û wan xwe bi geštîyên xwe ve dane bigihaštin û ew li wan de suwarbûn û ew ji bona welatê xwe hatin bivegerandin.

Merzeban li dawîya rêk û pêkxistina kar û barên welatê xwe de xweset, ku ew welatên dirawsên xwe bide bidagîrkirin. Ev hewesa hanê jî li du tištan de hatibû biderkevtin:

1. Ji hêrîša dewleta Xuresanê ji bona ser Rikin El-Dewle Serdarê Rê,
2. Ji pîskirina Wênerê Merzeban ji bal Meez El-Dewle de. Bi serdejî ve hinek ji Sergirdên Rikin El-Dewle de bi Terefdarên Merzeban ve katibûn bikirin.

Yekekî ji van Sergirdan bi navê Elîyê Kurê Cuwa Nequle ve ji bona nik Merzeban hatibû û wî pê date bigotin, heger tu hêrîšê ji bona ser Rê bide bikin, dê hemû Sergirdên din jî ji bona te yarmetîyê bidin bikirin. Bi vî tonî ve wî ew hate bidilbijandîkirin.

Merzeban ligel Nasir El-Dewle Serdarê Musilê de da û sitend û wî ew ji bona çûna ser Bexdadê date bidilbijandîkirin, belam Naris El-Dewle bi vê dilbijandinê ve nehate bidilgîrbûn û wî bersiva Merzeban

date bidan: Di pêšî de divê bajarê Rê bête bizeftkirin û di dawîya vê de îšê Bexdê bi hêsan ve tête biderkevtin.

Merzeban li paš de Bav û Birayên xwe ji bona nik xwe dane bibangkirin. Wî ji wan li ser vîlika xwe de remana wan date bixwestin. Bavê Merzeban li ser çuna wî de bi dil ve nebû. Wî fermana neçûnê pê date bidan, belam Merzeban bi amojgarîya Bavê xwe nedate bikirin û ew ji remana xwe nehate bidakevtin. Bavê wîna, gava ku wî weha date bzanîn, wî dest bi giryanê ve date bikirin û wî date bigotin: Kurê xwe dê ezê pištî vî temenê dirêj li ku wî bidim bidîtin! Merzeban bi bê dudilî ve û bi mêrxasîyeke bê hempa ve wî bersiva wî date bikirin û wî date bigotin: Tu dê min li seraya bajarê Rê de yanjî di nava Kuštîyan de bide bidîtin.

Rikin El-Dewle li karxistina Merzeban de hatibûn bixeberdarbûn. Destbicî wî ji bona herdu Birayên xwe Îmad El-Dewle û Meez El-Dewle hewara xwe date binivîsandin. Ji layekîtirjî ve wî ligel Merzeban de date bipêwendîkirin. Wî dest bi šelafîyê ve date bikirin û date bigotin: Heger tu dest li min de bide bihelgirtin, ezê dê Zincan, Ebher û Qezwîn bi te bidim. Bi vê fêlbazîyê ve wî dixwest, ku ew Merzeban bide bixapandin, tanî ku hewara Birayên wî pê bête bigihaštin.

Îmad El-Dewle di bin Rêberîya Baš Hacib de du hezar Suwar di hewara wî de date binardin. Herwehajî Meez El-Dewle jî hêzeke wisa di bin Rêberîya Sebektegîn de ji wî re date birewankirin. Di vê bêhnê de Mohemed Ebdul-Rezaq jî bi hêzekê ve di hewara Rikin El- Dewle de hate bigihštin. Herwehajî Mohemed Kurê Makan jî bi hêzekê ve ji bal Hesen Fîrozan ji bona hewara Rikin El-Dewle hate birewankirin.

Bi Kurtî ve: Rikin El-Dewle orduwekî bi hêz ve date birêkxistin. Ew Sergirdên, yên ku ew li wan de bigûman dihate bikevtin, tevde dane bigirtin û bizindankirin. Wî bi leškerê xwe ve rûwê xwe ber bi Qezwînê ve date bivedan.

Gava çavên Merzeban bi lešekerê Rikin El-Dewle ve hate bikevtin, wî date nizanîn, ku ew deraqetî vî leškerî nayête biderkevtin. Tevlivêjî wî vegerandin ji bona xwe bi šermezarî ve date bidîtin. Ew ji bona nava šer hate bikevtin. Hêza wîyî rêxistî ji Kurd û Deylem nêzîka pênc hezar Kes bûn. Leškerê Rikin El-Dewle bi carekê ve hêrîšî ser destê rast û çepê wî date bikirin û wî ew date bišikandin. Merzeban li navrastê de xwe date biragirtin û šerekî merdane date bikirin. Bešê zorî Sergirdên wî hatin bikuštin û yên mayî bi dîlitî ve hatin bigirtin. Di dawî de Merzeban bi xwe jî ve bi dîlitî ve hate bigirtin. Rikin El-Dewle Merzeban

ji bona Wezîrê xwe Ebu El-Fedil date bisipartin û wî ew ligel wî de bi hêzekê ve ji bona keleha Simîrem date binardin[27].

## Dîlkirin û Rizgarkirina Salar-Merzeban.

Li dawîya gihaština Merzeban de ji bona keleha Simîrem û xistina wî di zindanê de wî destên xwe ji xwarinê date bikišandin. Bes û bi tenha ve wî ji bona jîyandinê tozek genim dide bixwarin.

Gava ku Rikin El-Dewle evaya date bibihîstin, wî ferman date biderkirin, ku çêkirvanê xwarina wî ji bona nik Merzeban bête birêkirin. Li dawîya hatina vî Xwarinçêkirvanî de Merzeban ligel wî de ji bona

[27]Wezir Ebu El-Fedil Kurê Emîd di vê çûyînê de li ser fêlekê de diaxive û ew dibêje: "Ew Komandarên Deylemîyên ligel min de bûn, ew ligel hevdû de lihevhatin, ku ew li rê de bi darê zorê Merzeban berdin û min jî bidin bikuštin. Gava ku min weha zanî. ez jî ji bona nik Merzeban çûm û min jî pê got: ku ez jî ji bona xizmeta te likarim. Merzeban hinekî ponijî û wî got: Heger tu rast dike, ez ji te dixwazim, ku tu vegere. Herçi arezû dike, ez ji bona te dikim. Min gotê: ez ditirsim, ku Hevalên min vê ligel min de nekin. Wî got: ku weha bû, tu Dost û Dujminên xwe ji hevdû nade binaskirin. Ewên ku dixwazin min berdin, ew bi xwe ne, yên ku ew dixwazin te bidin bikuštin.

Min gotê; bese êtir min birwakir û bi min bawer bike, ku ez ji her Kesekî bêtir li xizmeta te de likarim.

Li dawîya vê gift û goyê de ligel Merzeban de min ew hemû Komandar Yeko Yeko ji bona nik xwe dane bibangkirin û min bi wan date bigotin: ez jî ligel we de me. Ev peyva min bi wan zor xweš bû. Biryar me da, ku li gihaština Qonaxa pêši de vî karê hanê bi cî bînin. Bi rastî jî, gava ku em bi Qonaxê ve gihištin, Merzeban bang min kir û got: de min berdin. Min pêgot: ku Mala Rikin El-Dewle, Xizne û hemû Giranîya wî jî li bajarê Isfehanê de ye. Li layê min de weha ye, ku em bi vî rengî tanî Isfehanê biçin û li wêderê de wê Xiznê, wê Giranîyê û Malî ligel xwe de jî bidin bihilgirtin. Eve baštir dibe. Bi servajî vê de dibe, heger ku em li berdanê de lezbikin, Hinek ji Komandaran ligel me de bê bextîyê bikin. Ev gotinên hanê bi serê wî bikevtin. Bi vî rengî Merzeban hate bixapandin. Gava lingên me bi Isfehanê ve hatin bikevtin, min hebû Komandarên Bêbext girtin û Merzeban jî ligel Komandarekî rast û dilsoz ji bona Sîmirm date binardin.

rizgarkirina xwe bi kar ve hate bikevtin. Belam ev Merovê hanê gêj û gêl bû. Wî ev vešartina hanê pir date bibelavkirin. Parêzvanê kelehê Šêr Asfar Xwarinçêkirvan date bigirtin û wî ew ji Jorî ser dîwarê kelehê de ber Jêrî ve date biavêtin. Bi vî rengî ve wî ew hate bilinavbirin. Li layekî din de wî gerden li Merzeban de date bitengkirin.

Dayika Merzeban bi navê Xerasuye ve dihate binavkirin. Ew Keça Cestanê Kurê Wahsozanê Melek bû. Wê pir çavdêrîya xeberzanîn û rizgarkirina Kurê xwe dida bikirin. Wê ji bona vî karî pir dida bikardikirin û wê pir pere jî didatin birijandin.

Kurê Dabanî, yê ku ew ligel Merzeban de Dîl û Zindankirî bû, bi her awayekî ve wî xwe date birizgarîkirin û ew ji bona nik Xerasuye hate bigihandin. Wî ji bona Xerasuye bi pera ve sozê bi rizgarkirina Kurê wê ve date bidan. Di vê demê de jî Topan navê Pehlewanekî šerker û Qumarbazî jî, yê ku wî ji Meraxe dabû bibazdan, wî xwe ji bona layê Xerasuye dabû bihavêštin. Vî Mirovî jî sozdana rizgarîkirina Merzeban ji bona Dêya wî date bidan. Xerasuye bi hêz û jîrîtîya vî Peyayî ve zor bi hêvî bû. Wê ew ligel Kurê Dabanî de date birêkxistin. Wan xwe bi Bazirgan ve dane bikirin. Ewê ji bona likarxistina bazirganîyê pêwistbû, hemû wan ji xwe re dane bidurustkirin û bi rê ve hatin bikevtin.

Gava ku ew bi keleha Simîrem ve hatin bigihaštin, wan xeber ji bona Šêr Asfar datin binardin. Ku ew Bazirganin û ew ji bona destkarîyê li îš û karin. Di dema xwe de Merzeban hin ji mal ji wan kirîbû û perê wan hêjî nedaye. Tika ji te dikin, ku tu me û wî ligel hevdû de rû bi rû ve bide bikirin.

Parêzvanê kelehê dilê wî bi wan ve hate bisûtandin. Wî ji bona layê xwe bang wan date bikirin. Van Bazirganan li layê Šêr Asfar de gilî û gazinên xwe dane bikirin. Derbarê zordarî û bêbextîya Merzeban de wan gelek peyv û siqêv dane bikirin û wan date bigotin: Sipas ji bona Xwedan! Dunya ji sitembarîya vî Sitemkarî hate birizgarkirin.

Dilê Šêr Asfar bi wan ve hate bišewitandin û wî ew yeke yeke ligel Merzeban de dane birûbirûkirin. Merzeban di cara pêšî de di vê fêlê de nehate bigihištin. Ew tûre bû û wî cinêw bi wan ve date bidan. Bi deynê wan ve ew nehate bipêrûništin. Belam yekekî ji Bazirganan bi çavkirênê ve ew date bitêgihandin. Merzeban bi ser xwe ve hat bikevtin û ew nerm bû. Wî date bigotin: belê bi bîra min ve tête bikevtin. Belam ez nizanim, bê ka deynê we çend bû. Ez dixwazim temašeyî tomarkirina defterên wan bidim bikirin.

Bi vî tonî ve çûn û hatinê di nava wan de date bidestpêkirin. Xurasuye Navmalîyekî xweyî Deylemîyî jîr û dilsoz jî bi tengala Bazirganan ve date bixistin. Bazirganan diyarîyên pir bi ser Parêzvan û Karbidestên kelehê ve datin birijandin. Bi saya barandina van diyarîyan ve bi serbestî ve çûn û hatin ligel Merzeban de dihatin bikirin.

Šêr Asfar Peyayekî wîyî cuwan hebû. Wî her û her cil û bergên Deylemî li ber xwe de didate bikirin û wî rim û mertal bi destên xwe didan bigirtin. Merzeban ji vî Peyê hanê dilxweš bû. Wî ji bona wî pir pere û diyarî pê didane bidan û ew ligel wî de hatibû birêkkevtin, ku ew jê re destikên vekirina bend û zincîrên bide bipeydakirin. Vî Peyê hanê hemû destikên pêwist ji bona vekirinên bend û zincîran ji Merzeban re dane bianîn. Merzeban dest bi birîna bend û zincîrên xwe date bikirin.

Šêr Asfar her roja înê ew ji bona layê Merzeban dihate bihatin û wî temašeyî bend û zincîrên wî didate bikirin û ew dihate bivedigerandin. Rojekê înê Topan li layê Merzeban de hatîbû bidaništin, Bazirganê tir li layê Dergevan de hatibû birawestandin û Peyê bi cil û bergên Deylemî jî ve li teništa Merzeban de hatibû birûništin. Šêr Afsar hat û ew jî li kêleka Merzeban de hate bidaništin. Merzeban dest bi peyvê ve date bikirin û wî ji bona Šêr Asfar date bigotin: Heger tu min bide biberdan, tu çi bixwaze, dê ezê wî bi te ve bidim bidan. Šêr Asfar ev wernegirt û wî pê date bigotin: Ez hîç bêbextîyê ligel Rikin El-Dewle de nadim bikirin. Gava ku Merzeban wisa date bizanîn, ew bi ser pêyên xwe ve hate bihelsandin û wî rûwê xwe ber bi derî ve date bivekirin. Topan xwe bi ser Šêr Asfar ve date biçengkirin û wî ew li erdê de date bivegevizandin û wî ew bi Xinceran ve date bikuštin. Bazirganê tirjî Dergevan date bikuštin. Merzeban ligel Hevalên xweyî tir de hev dane bigirtin. Di vê bêhnê de Parêzvanên kelehê ji hev hatin bibelawelabûn. gava ku ev hera hate bihelsandin, ew bi serhev de hatin bikombûn. Gava ku wan date bitemašekirin, ku Serekê wan hatîye bikuštin, hemûyan xwe dane biberdestkirin. Hevalbendên Merzeban ji hemû hêlekê ve bi serhev ve (di sala 342 k. de) hatin bikombûn.

Merzeban name ji bona Dêya xwe, Birayê xwe û Dostên xwe date binivîsandin. Ew helsa û rûwê xwe wî ber bi Azirbêcan ve date bivedan. (Nivista Serpêhatîyên Netewan, bergê 2. El-Kamil, bergê 9).

## Li dawîya Dîlkirina Merzeban de

Li paš šikenandin û Dîlkirina Merzeban de hêzên wîyî di bin Rêberîya Cestan Kurê Šermezin, Elî Kurê Fedil, Šehir Feyruzê Kurê Kerduye û hinên ji Rêberên din ligel leškerekî de bi hezar Kesî ve ji bona Azirbêcanê hatin bivegerandin û ew li dora Mohemed Kurê Musafir Bavê Merzeban de hatin bikombûn. ji wir wan berê xwe ber bi Erdebilê ve dane bivedan. Ew ji bona nava bajêr hatin bikevtin û wan Mohemed Kurê Musafir bi Serdarê xwe ve datin bidanîn. Wahsozanê Kurê wî ji tirsa dan û sitendina Bavê xweyî ne baš ligel xelkê de ew ji bona keleha Term hate bibazdan. Ewende pêneçû, ku xelkê Deylemî ji nebašbûna dan û sitendina Mohemedê Kurê Musafir li ber de hatin birabûn û wan mebesta kuština wî dane bikirin. Ji tirsan wî ji bona nik Layê Wahsozanê Kurê xwe date bibazdan. Wî jî Bav date bigirtin û ew ji bona nava zindana keleha Sîscanê date biavêtin. Ew tanî mirina xwe di wê zinadanê de hate bihištin.

Rikin El-Dewle li dawîya girtina Merzeban de Azirbêcan bi Mohemedê Kurê Eb-Dul-Rezaq date bidan û wî ew bi leškerekî ve ji bona ser Azirbêcanê date binardin. Wahsozan beramber bi vê rewšê ve serî lê têkcû û ew bi berdana Deysem ve neçarbû. Wî ew xelatkir û wî ew ji bona šerê Mohemedê Kurê Eb-Dul-Rezaq date binardin. (Nivîsta Serpêhatîyên Netewan). Encamê karên vê rûdana Deysem dê emê li cihekî taybetî de li ser de bidin biaxivtin.

Gava Salar-Merzeban ji Sîmirmê hat û wî tevgera Deysem date bitemirinadin. Ewende pêneçû û ew di sala 345 k. de tûšî nexwešîyeke giran bû û wî temîniya xwe date bikirin: ku li dawîya wîna de Birayê wî Wahsozan bi Serdarê Rewadî ve bête bikirin û Kurê wî Cistan bi Šûngirê Mamê xwe ve bête bidanîn. Li dawîya vê temînîya hanê de pir pêneçû û ew mir.

## Wahsozan û Kurên Merzeban

Li paš mirina salar-Merzeban de Birayê wî Wahsozan hungulîsk û hin ji nîšanên tirî serdarîya Merzeban ji bona Serdarên bajer û kelehên Azirbêcanê date binardin û wî ji wan serdanîna wan ji xwe re date bixwestin. Belam hîc Kesekî ji wan serê xwe jêre nedan bitewandin; çunke, salar-Merzeban li pêš temînîya xweyî dawî de ji bona wan dabû bigotin: Heger ku ez linavçûm: Di pêšî de sertewadinê ji bona Kurê wî Cistan bidin bikirin, li dawîya wî de Padšayê Rewadî divê Kurê wîyî Ibrahîm bête bikirin, li paš Ibrahîm de divê Kurê wîyî Nasir bête bikirin. Heger ku ev Kurên wî hemû hatin bimirin, di wê çaxê de divê serdanînê hûn tev ji bona Wahsozan bidin bikirin. Hemû Sergird û Mezinan li gora temîniya pêšî de dane bireftarîkirin. Vê rewša hanê Wahsozan date bitûrekirin û wî ev temînîya Salar-Merzeban di ser guhên xwe re date biavêtin.

Di vê bêhnê de Mîr Ibrahîm Birazyê Wahsozan û Zavayê Wêlkîn Kurê Xuršîd Serokê Dilêmî, yê ku ew ji bal Merzeban de li Erdebîlê de hatibû bizindankirin, bi dilbijandina Jîna xwe ve ew ji bona Erdebîlê çû. Ibrahîm bêyî, ku ew destûrê ji Mamê xwe bide bixwstin, wî Xezûrê xwe Wêlkîn ji zindanê date biberdan.

Wahsozan li ser vê tevgera Mîr Ibrahîm û hin pêrabûnên din de tirs pê hate bikevtin. Bi dizî ve wî Erdebîl date bicîhištin û ew ji bona keleha Term çû.

Kar û barên serdarîyê û hevsarê desthilatîya welêt bi serxweyî ve bi destên Cistan ve hatin bikevtin. Birayên wî û hemû Sergirdan serên xwe ji bona wî datin bitewandin. Bes û bi tenha ve Cistanê Kurê Šermezin, yê ku ew Walîyê Erministanê bû, serê xwe jêre neda bitewandin û wî dest bi remana serxwebûna xwe ve date bikirin.

Pištî ku Wahsozan cihê xwe li keleha Term de date bixurtkirin, ew li ser xwe de hate birûneništin. Wî bi têkdana di navbera Birazayên xwe de date bidestpêkir û wî Dujminên wan li ser wan de datin bihelsandin. Gelacîyên wî wetov bikêrbûn, ku Kurên Salar-Merzeban bi Dujminên yektir bûn.

Wahsozan, ku wî îš û karê xwe bi vî pilîyî ve date bigihandin, wî Ibrahîmê Birazyê xwe ji bona nik xwe date bibangkirin û zor rû û rûmet pê date bidan. Li layekîtirjî de wî ligel Nasir de da û sitend û wî ew li ber Cistan de date birakirin. Nasir bi peyva Mamê xwe ve date bikirin û ew ji Cistan tefirî û wî devjê berda. Ew ji bona Moqan[28]-Mukriyan çû.

Bešekî ji lešker jî li ser timayê de ji Cistan cihê bû û ew ji bona layê Nasir hat. Li paš vêna de Nasir bi hêzeke baš ve ji bona šerê Cistan[29] çû. Wî rûwê xwe ber bi Erdebîlê de date bivekirin û wî ew bi hêsanî ve date bizeftkirin. Cistan neçar bû, ku ew xwe ji bona keleha Nîz bide biavêtin.

---

[28]Weha di Kokê de hatîye. Renge, ku ew bi šašî ve hatîye; jiber Moqan yanjî Mokan Mukriyan niye. Moqan-Mokan ew di navbera Erdebîl û gihandina Çemên Ker û Res de tête bikevtin. Mukriyan ew navê Welayeteke Kurdî ye, ya ku ew li Jorî Welayeta Erdebîlê û li Jêrî Gola Ormiyê de tête bikevtin. (M. E).

[29]Îšê pêšiyî Cistanê Kurê Merzeban kuština Deysem di sala 346 k. de bû. Ev Serdarê hanê jî li ser šûna Bavê xwe de rewešt. Wî guh bi Lešker ve neda û ew ligel jîyandin û Ešîrê de likarbû. Li paš bêhnekê de wî Neîmê Wezîrê xwe date bizindankirin. Wezîrê xwe Cistanê Šermezin, yê ku ew bi navê Ebu El-Hesen bi nav û bang bû û yê ku ew Xizmê Ebu Eb-Dulahê Neîmî bû. Ew li girtina Neîmî bi gûmanê hate bikevtin. Ew tûre bû û wî ligel Ibrahîm da û sitend. Wî dilê Ibrahîm ji bona Padšahiyê date bidilbijandin. Bi rastî jî ewende pê neçû, ku Ibrahim ligel Šermezin de ji bona ser Meraxa çûn û wan ew zeftkir. Çistan Šah Kurê Merzeban gava ku wî ev bihîst, wî ligel Kurê Šermezin û Wezîrê wî de da û sitend û wî Neîmî jî berda û ew lihevhatin. Li dawîya vêna de Kurê Šermezin êtir nema yarmetîya Ibrahîm kir. Fêlbazî û Bêbextîya Kurê Šermezin ji bona herdu Biran hate bidiyarkirin. Wan ligel hevdû de da û sitend û ew lihevhatin.

Gava Kurê Neîmî ji Zindanê rizgar bû, ew ji bona Moqanê çû. Li wêderê de wî ligel Ishaqê Kurê Îsa Kurê Muktefî Bil-Lahê Ebasî de da û sitend. Wî ew ji bona wergirtina Xilafetê date bidilbijandin. Wî ji bona wî date bisozdan, ku ew dê jêre Leškerekî bide bilidarxistin û jêre Azirbêçanê jî bide bizeftkirin. Bi rastî jî ew bi Sêsed Suwarî ve ji bona nik wî çû û wî Šermezin jî ji bona nik wî mêvandarkir. Šermezin jî dilsozîya xwe ji bona Xilafeta Îshaq date biderxistin. Cistan Šah ligel Mîr Ibrahîmê Birayê xwe de ligel vî Daxwazvanê Xilafetê de, yê ku wî navê xwe bi Mustecîr danî bû, datin bišerkirin. Wan ew date bišikenandin û girtin. Kurê Šermezin jî xwe ji bona keleha Ormiyê date avêtin. (El-Kamil, bergê 8).

Li paš de Serbazan Nasir ji bona nedana perên wan datin bitengavkirin. Nasir kir û nekir, ku ew wan bide bihajkirin, ew haj nebûn. Mamê wî di vêxistina vê gelacîyê de destgirî neda bikirin. Ew li kar û barên beramberî Birayê xwe de pešîman bû. Wî ligel Cistan de da û sitend û ew ligel hevdû de hajbûn. Ew bi Padšahîya Birayê xwe ve hate birûništin. Belam dîsan jî hîç bi wan ve nehate bikirin; jiber ku Serpereštîya Lešker pereyên wan nebû. Îš û karê Welêt bi hoyê van šer û meran ve têk û pêkçûbû. Sergirên wan nema bi gotina wan ve dane bikirin. Herdu Biran beramber bi vê rewša hanê ve xwe nedan biragirtin. Wan ji bona Apê xwe dane binivîsandin, da ku ew ji bona layê wî herin. Wan soz û peyman jê sitendin. Ew ligel Dayîka xwe de ji bona Wahsozanê Apê xwe çûn. Gava ku ew ji bona nik Apê xwe hatin bigihaštin, Apê wan bêbextî li wan de date bikirin. Dij bi sûnd, soz û peymanên xwe ve ew dane bigirtin û bizindankirin. Sermîyandarîya welêt bi destên xwe ve date bixistin û wî Ismaîlê Kurê xwe jî bi Šungirê xwe ve date bidanîn. Wî bešê zorî welatan bi destên Ismaîl ve date bixistin. Wî pareyekî zor bi ser lešker ve date bidabeškirin û wî ew pê dane bidilxweškirin.

Ibrahîm Salar di vê pêlê de ew ji bona Erministanê çûbû. Gava ku wî xebera girtina Birayên xwe date bizanîn, wî dest bi cî ve ligel Pismamê xwe Ismaîl de hate bišerkevtin û wî xwest, ku ew Birayên xwe bide birizgarkirin. Gava ku Wahsozan ev xebera hanê daze bibihîstin, ew šaš û mašo bû. Li layekîtir jî de hin ji xelkê û Leškerê Dêlemî jî lê hatin biwergerandin. Gava ku wî weha date bizanîn, wî Cistan, Nasir û Dayika wan date bikuštin. Wî ji bona Cistanê Kurê Sermezin date binivîsandin, ku ew ji bona šerê Ibrahîm biçe û wî jêre Pere û lešker jî date binardin. Evaya di sala 349 k. de hate bikirin.

Ibrahîm beramber bi vê zîneta hanê ve nema dikarîbû xwe bida biragirtin û ew ji bona Erministanê hate bivegerandin. Cistanê Šermezin bi ser leškerê wîyî mayî ve date bidadan û wî ew date bišikenandin. Wî Meraxe navînîya nîrnešînîya Ibrahîm û Ormîyê jî date bidagîrkirin. (El-Kamil, bergê 8, r. 209).

Mîr Ibrahîm Salar ji bona Erministanê hatibû bivegerandin. Ew demekê li wêderê de hate bimayîn. Wî di sala 255 k. de leškerekî baš date bipêkanînin. Wî xwest, ku ew dîsan ji bona ser Ezirbêcanê bête biçûyîn. Wî ligel Cistanê Kurê Šermezin de da û sitend û ew ligel wî de hate birêkkevtin. Bi vî tonî ve hêz û desthilatîya Mîr Ibrahîm bêtir bû. Lihev hate birasthatin, ku di vê bêhnê de Ismaîlê Wahsozan hate bimirin. Mîr

Ibrahîm ji vê zîneta hanê kar ji xwe re date biwergirtin û ew ji bona ser Erdebîlê çû û wî ew ji xw re date bizeftkirin. Wî xwest, ku ew xwîna Birayên xwe ji Mamê xwe bide bisitendin. Wahsozan ji tirsan revîya û ew ligel Kurê Miškî de ji bona welatê Deylemî çû. Mîr Ibrahîm hemû welatê Azirbêcan date bidagîrkirin û Mulkên Mamê xwe hemû date bizeftkirin.

Li dawîya demekê de Wahsozan bi leškerekî Deylemî ve ji bona ser Azirbêcanê hate biçûyîn û ew ji bona nava keleha Term hate bikevtin. Wî Ebu El-Qasim Kurê Miškî bi leškerekî ve ji bona ser Ibrahîm date binardin. Li dawîya šerekî qurs û giran de Mîr Ibarahîm hate bišikenandin. Pir bi derd û dujwarî ve Mîr Ibrahîm xwe bi keleha Rê ve ji bona nik Rikin El-Dewle Mêrê Xweha xwe ve date bigihandin. Rikin El-Dewle pir jêre rûmet û rêz date bigirtin.

## Ibrahim Salar

Di vê Salê bi xwe ve û li berrabûna Deylemî de di paytextê Rikin El-Dewle de Ibrahîm Salar karekî zor hêja ji bon Rikin El Dewle date bikirin. Ew têde birîndar bû, belam ew nemir. Li paš de Rikin El-Dewle leškerekî baš ji bona Wezîrê xwe Ebu El-Fedil date bidan û ew ligel Mîr Ibrahîm de ji bona ser Azirbêcanê date binardin. Ebu El-Fedil Kurê El-Emîd bi leškerê Bohêmî ve bi Azirbêcanê ve hate bigehaštin û wî ew date bizeftkir. Wî Cistanê Kurê Šermezin jî ligel Mîr Ibrahîm de date bilihevanîn.

Gava çavên vî Wezîrê jîr û zana bi dewlemendî û bêrên vî welatî ve hate bikevtin, wî bi lez û bez ve û bi dizî ve ji bona Rikin El-Dewle date binivîsandin: ku heyfe, ev welatê hanê bi destên Serdarekî mîna Salar Ibrahîm ve bête bikevtin, yê ku ew xwe di nava xwešîya jîn û jiyanê de dide bivegevizandin. Di encamê šêweyê vê jîyana wî de gerandina welêt bi bašî ve pê nayête bikirin.

Weha bi berjewendî ve tête bidîtin, ku ew li cîgehekîtir de heremekê ji bona serdarîya wî pê bide bidan û ew Azirbêcanê ji bona wî bide bihištin. Rikin El Dewle bi daxwaza Ebu El-Fedil nikir û wî fermana vegera wî date bidan.

Mexabin, ku di derbarê rûdanên pêla dawîyî Mîr Ibrahîm de tu agehdarîya me nîne. Belam li gora goya Belavoka Pêšbikevtinê 6 de divê dewleta Ibrahîm tanî sala 380 k. de dabe bidirêjkirin. Li paš wî de

Rewadîyê Kurê wî û li paš Rewadî jî de Kurê wî Gêlas[30] û li paš Gêlas jî Wahsozanê Kurê wî ji bona serdarîya Azirbêcan di sala 415 k. de hatin bidan.

## Wahsozanê duwem

Welatê Azirbêcanê li zemanê vî Serdarê hanê de di sala 420 k. de tûšî vegirtina Miletê Xez bû[31]. Wahsozan xwest, ku ew bi Mêvandarî ve û bi karkirinê ve ji bona wan welatê xwe ji vî šerê dir bide biparastin. Wî zor ji bona wan kar date bikirin, belam bê sûd bû. Nermbûn û karkirina Wahsozan û Êlên Kurd ji bona Xez ew bêtir pê hatin bipayekirin. Kurd xwe li hîç xerabî û pîsîya wan de nikarîbû bida biparastin. Wan Kurdistan tûšî zîyan û talankirineke zor gewre dane bikirin.

Li sala 429 k. de Xez xwe bi ser Meraxe de dane bikišandin. Wan xelkên bajêr hemû dane bikuštin. Mizgeftên bajêr wan datin bisûtandin. Ser bi ser ve wan bajar dane bitalankirin. Wan herçî ol û bext qebûl nedikir, wan ew didate bikirin. Elên Kurdên wan navan jî bi agirên wan ve hatin bišewitandin.

Li dawîya vê hovîtî û pîsîtîyê de Eširên Kurd xwe li dora Ebu El-Hîca Kurê Rîb El-Dewle de Serokê Ešira Hazbanî de dane bikomkirin. Wan ligel Wahsozan de ji bona dûrkirina belaya Xez havdû dane bigirtin. Gava ku çavên Xez bi vê yekitîyê û hevgirtinê ve hatin bikevtin, tirsê ew datin bigirtin. Wan rûwê xwe ber bi bajarê Rê ve dane bivekirin û ew ji hatin bihevbelawelakirin. Kurd bi šûn wan ve hate bikevtin û wî zor ji wan date bikuštin. Taqimekî tir ji wan, yê ku ew ji bona Erminstanê hatibûn bikevtin û ew bi kuštin û talanîyê ve hatibû bimejûkirin, bi bihîstina vê xeberê ve ew ji bona Ormiya welatê Ebû El-Hîcayê Hazbanî hatin bivegerandin. Li hêre de ew tûši hêrîša Kurdan bûn. Di encam de herdu Layan ziyanên pir gewre datin bidan. Ebû El-Hîca zora wan nebir.

[30]Mucem El-Bildan di Rûpelê 189 de Xulak-Gulak dibêje.

[31]Xez Ešireke Turkumanîyî Buxara bû. Ew zor dir û hov bû. Ew mêldarê kuštin û talanê bûn. Bi vê remanê Bešekî ji wan rûwê xwe ber bi Isfehanê ve date bivekirin. Bešekî din ji wan di welatê Xuwarzim de man. Bešekîtir jî rûwê xwe ber bi Azirbêcan û Kurdistanê de date bivekirin. Ev Bešê dawî li jêr Komandarîya Toqa, Koktaš û Mensur de bû.

Di sala 432 k. de Wahsozanê Mamelan[32] tepek ji bona Xez date bidanîn, da ku ew xwe ji wan bide birizgarkirin. Wî li bajarê Tebrîzê de cejnek date bilidarxistin û Gewreyên Xez dane bimêvandarîkirin. Bi fêl ve wî ew hemû datin bigirtin. Li dawî de wî leşker bi ser wan de date bidadan. Wî zor ji wan date bikuştin û ew ji xakê Azirbêcanê dane biderkirin.

Derbarê bi zîneta zemanê vî Serdarî ve êtir tu agehdariyên me nînin. Tanî dema hatina Toxurl Begê Silcoqî ji bona Azirbêcanê di sala 446 de kêm li ser zîneta vî welatî de hatîye biaxivtin.

Li gora Insiklopêdîya Musulmantîyê bergê 4, di sala 434 k. de hejandineke zor xurt bajarê Tebrîzê date biwêrankirin. Padşahê vî welatî Wahsozan ji tirsa Xez keleheke tir date biavakirin û paytextê xwe ji bona wêderê date biveguhestin.

Di sala 438 k. de Nasir Xisro[33] navê Serdarekî li Tebrîzê de serpereştîya desthilatîyê didate bikirin û ew bi nav û nîşana Seyf El Dewle û Şeref El-Mile Ebu El-Mensur Wahsozane Kurê Mamelan ve bi nav û bang bû û jêre jî Mewlana Emîr El-Muminîn dihate bigotin.

Li sala 446 k. de Sultan Toxurl ji Isfehanê berê xwe ber bi Azirbêcanê ve date bivedan. Mîr Ebu El-Mensur Wahsozanê Kurê Mohemedê Rewadî ji bona pêrgîbûna wîna bi lez û bez ve ew çû. Wî serê xwe jêre date bitewandin. Ji vê mêjûwa hanê û pêve dewleta Azirbêcanî Rewadî bi dewleteke pêgirêdayî ve dihate biderkevtin. Bi vî rengî ve dawîya serxwebûna vê dewleta Rewadî hate bidîtin. Jiber dema pêkhatina vê dewletê diyar niye, em nikarin dema dirêjbûna vê dewletê bidin bixuyanîkirin. Biçke li Azirbêcanê jî de beşekî ji Çiya jî li jêr serdarîya vê dewleta Rewadî de dihate bidîtin.

Derbarê dema dawîyî vê dewleta hanê de agehdarîyên me zor kêmin. Bes û bi tenha ve li ser Ahmedîl de hatîye peyivandin.

---

[32]Di dema vegirtina Xez de ji bona Azirbêcanê Wahsozan Serdarê wê bû. Ev Serdarê hanê li gora Insiklopêdîya Musulmantîyê, bergê 4, Rûpelê 584 de ew ji Xanedana Rewadî bû û ew bi navê Wahsozanê Mamelan ve bi nav û bang bû. Muncem El-Umran, bergê 9, Rûpelê 189 dibêje: Wahsozanê Kurê Xelan.

[33]Weha di Kokê de hatîye. Belam Cîhangervanê Farisîyî bi nav û bang Nasir Xusro dibêje, gava ku ew di bajarê Tebrîzê re derbas bû, Padşahê vî Bajarî Ebu El-Mensur Wahsozan Kurê Mohemed-Mamelan bû. Ew bi nav û nîşana Seyf El-Dewle û Şeref El-Mile dihate binav û bibangkirin. ji xwe re li Gera Nasir Xusro, Rûpelê 13, Çapa Hindî bide bitemaşekirin. (M. E).

Belam Seyid Hisên Mukriyanî dibêje: ku Wahsozanê duwem di sala 458 k. de hatîye bimirin û Ibrahîmê Kurê wî tanî sala 490 k. de Serdarî daye bikirin.

Wer tête bidiyarkirin, ku di pêla serdarîya Ibrahîm de Tebrîz ji destê dewleta Rewadî hate biderkevtin û ew bi jêr serdarîya Turkan ve hate bikevtin. Dewleta Rewadî bi rastî ve bes û bi tenha ve li Meraxe de dihate bidîtin. (El-Kamil, bergê 10, rûpelê 205).

## Mîr Ahmedîl

Ev Mirovê hanê bi pê Insiklopêdîya Musulmantîyê ve ew "Kurê Ibrahîmê Kurê Wahsozanê Rewadîyî Kurdî tête biderkevtin". Dibe, ku wî dewleta Meraxe dabe bizindîkirin, ya ku wê tanî mêjûwa sala 624 k. date bidirêjkirin.

Mîr Ahmedîl di sala 505 k. de, ya ku têde Sultan Mohemedê Kurê Melek Šah leškerek bi Ser dewleta Romê ve date bikišandin, ligel Mîrê Tebrîbzê Segman Qubti de, ligel Mîrê Musilê Modûd de, ligel Ebu El-Hica Serdarê Hewlêrê de û ligel hin Mîrên tir de bi leškerekî xwe ve ew di wî šerê hanê de hatibû bibešdarîkirin. Wî li Surî de ligel Padšahê Qudsêyî bi nav û bang ve Jaselîn date bišerkirin. (Mêjûwa Helebê).

Mîr Ahmedîl bi hoyê mirina Segmanê Qutbî Serdarê Diyarbekir û Azirbêcanê ve Surî date bicîhištin û ew ji bona Azirbêcanê hate bivegerandin. Mebesta wî ji vê vegerandina hanê sitendina Mulkê Bav û Bavpîran bû.

Ibin El-Cozi dibêje[34]: Ku Mîr Ahmed xwedan leškerekî pênc hezar Suwar bû û hatina welatê wîyî salane bi çarsed hezar dînar dihate biderbikevtin.

Di sala 501 k. de Etabikê Tuxtikînê Serdarê Šamê bi mêvanî ji bona nik layê Sultan Mohemed hatibû. Ji bona vê hatinê piranîya Mîr û Serdaran ji bona Bexdê hatibûn bimêvadarîkirin. Mîr Ahmedîl jî di nava wan Mêvanan de bû û ew li teništa Tuxtikîn de hatibû birûniština. Di vê gavê de Mirovek ji bona nava Jorê hat biderkevtin û kaxezek di destê wî de bû û ew digirya. Wî tika kir, ku yarmetîya wî bête bikirin, da ku ew

[34]Ibin El-Cozi di Mirat El zeman de dibêje, ku Mîr Ahmedîl ji bona Bexdadê bi Pênc Hezar Suwar hat. bergê 3, R. 32.

kaxeza daxwaza xwe bi destê Sultan ve bide bigihaštin. Mîr Ahmedîl berê xwe ber bi wî Mirovî ve date birastkirin û wî xwest, ku kaxeza daxwaza wî ji destê wî bide biwergirtin. Belam wî Mirovî bi xincera rûtî vešartî di destê xwe de bi ser Ahmedîl de hate bidakevtin û wî xincerek lê date bixistin. Ahmedîl pêgirt û ew ji bona nava erdê date biavêtin. Yekekî din xwe bi ser Ahmedîl ve date biavêtin û xincereke tir lê date bixistin. Bi kurtî ve Hevalekî wanî tirjî peydabû û wî jî xencerek li Mîr de date bixistin. Bi vî rengî ew hate bikuštin. Tuxtikîn weha date bizanîin, ku ev bi fermana Sultan ve hatîye bikirin. Belam li paš de diyarbû, ku ev Mêrkujên hanê Batinîbûn[35]. (Insiklopêdîya Musulmantîyê û Mucem El-Buldan).

## Aq Songor Ahmedîl

Ev Kurê Ahmedîl bû û ew li dawîya mirina Bavê xwe de bi Mîrê Meraxe ve hate bikirin. Di sala 514 k. de Serdarê Musil û Azirbêcanê Melek Mesûd beramber bi Birayê xwe ve Sultan Mehmud serê xwe date birakirin. Wî Qasim El-Dewle Buzurgiyê Etabikîyê kevnî xwe ji bona serdarîya Meraxe date binardin. Belam ev serhildana hanê zû hate bitemirandin. Di sala 515 k. de Mîr Ahmedîl dîsan ji Bexdê ji bona mîrnešînîya wî hate binardin. Di vê Salê bi xwe ve Kon Toxdi Serdarê Eran hate bimirin, yê ku ew ji bal Sultan Toxril de hatibû bidanîn.

Aq Songor xwest, ku ew xwe li layê Sultan Toxril de bide bi-pêšvexistin û ew cihê Kon Toxdi ji xwe re bide bigirtin. Sultan Toxril jêre xeber date binardin, ku ew bi deh hezar Kes ve ji Meraxe ji bona nik wî bête bihatin, da ku ew ji bona zeftkirina Erdebîlê yarîkirina wî bide bikirin. Belam çuna Aq Songor bê encam hate bimayî û di vê bihnê de Sultan Mehmud bi alîkarîya Ciyûš Beg Meraxe date bidagîrkirin.

Lêbelê li zincîra rûdanan de weha tête biderkevtin, ku Mîr Ahmedîl di dawî de dîsan ew ligel Sultan Mehmud de tête birêkkevtin. Sultan Mehmud ew bi Etabikîyê perwerdekirina Kurê xweyî Dawidê Šungirê xwe ve date bidanîn.

---

[35]Husnî Mukriyanî vê rûdana kuština Ahmedîl bi rengekîtir ve dide bivegerandin û ew vê ji bona ser Mucem El Buldan dide bivegerandin.

Di sala 523 k. de Mîr Aq Songor li çûna ser Duwîs Mizyad de date bibešdarîkirin. Pištî Salekê ji vê bešdarbûna hanê wî ji bona danîna Dawid li ser textê Seltenetê de gelekî date bikarkirin.

Di sala 526 k. de leškerê Sultan Toxril û leškerê Dawid li nezîka Hemedanê de tûšî yektirbûn. Dawid bi hoyê liberrabûna leškerê wî ve li ber wî de wî xwe nema dikarîbû bida biragirtin. Ew ligel Ahmeďîl de revya. Sultan Toxril Meraxe û Tebrîz date bidagîrkirin. Li dawîya demekê de Dawid, Mamê wî Melek Mesûd û Etabik Aq Songor ji bona Bexdê çûn. Li wêderê de Xelife yarmetîyek zor ji bona wan date.bipêškeškirin Di dawî de Melek Mesûd, Dawid û Aq Songor bi leškerekî ve rûwê xwe wan ber bi Meraxe ve dane bivekirin. Bi alîkarî û desthilatîya Ahmeďîlî ve Meraxe û Azirbêcan bi carekê ve dane bidagîrkirin. Li dawîya vêna de wan ruwê xwe ber bi Hemedanê ve dane bivekirin û wan li wêderê jî de hêza Sultan Toxril dane bitarûmarkirin û Hemedan bi jêr serdarîya Melek Mesûd ve hate bikevtin. Belam di dema girtina vî bajarê hanê de Aq Songor Ahmeďîlî mîna Bavê xwe jî ew ji bal Batinîyan ve di sala 527 k. de hate bikuštin. Ev Mêrkujê hanê ji bal Wezîrê Sultan Toxril de ji bona vî karê tawanbar hatibû binardin.

## Aq Songorê duwem

Aq Songorê duwem ew bi kurê Songorê Ahmeďîlê yekem ve tête biderkevtin. Belam hinekan ji Mêjûvanan bi çend navên tir ve li ser wî de dane biaxivtin. Dujminê vî Mîrê hanê Ozbekê Kurê Balnîkarê Dostê Sultan Mesûd bû. Wî ji bona zeftkirina Eran û Azirbêcanê kar didate bikirin. Mîr Ozbek di sala 541 k. de li Meraxe de dor date bigirtin. Belam pê ew nihate bigirtin.

Di sala 545 k. de Sultan Mesûd bi xwe ve bi leškerekî ve ji bona ser Meraxe hate biçûyîn. Wî ew date bigirtin û keleha wê jî wî date biruxandin. Belam pir pê neçû, Ozbek li ber keleha Ruwîn Diz[36] de ligel Mir Aq Songor de hate bihajbûn.

Kuština Ozbek di sala 547 k. de ji bal Sultan Mohemed de bi hoyê tûrebûna wî jê ve Mîr Îldegiz û Mîr Aq Songor pir hatin bibîntengkirin.

[36]Ruwîn Diz kelehek zor asê bû. Ew li ser Çemê Sofî de 16 Kilo Mitir li layê Jorî Meraxe de tête bikevtin.

Van derdu Mîran Melek Sulêman li cihê Sultan Mohemed de li ser Textê Hemedanê de dane bidanîn.

Lêbelê careke din Sultan Mohemed Hemedan ji bona jêr çengên xwe date bivegerandin. Wî Peyên xwe ji bona nik herdu Mîrên Azirbêcanê Îldegiz û Aq Songor ji bona hajbûnê datin binardin. Di sala 549 k. de di nava wan de hajbûn hate bikirin û welatê Azirbêcanê di nava van herdu Mîrên Gewre de hate biparbivekirin.

Sultan Mohemed li pêš mirina xwe de Melek Dawidê Kurê xweyî Biçûk ji bona bin çavdêriya Mîr Aq Songorê duwem date bidanîn, çunke, wî Sultan Arselan jî li jêr çavdêrîya Mîr Îldegiz de dabû bidanîn. Bi remana bi cîhkirina vî Kurî li šûna Bavê wî de Pehlewanê Kurê Îldegiz bi leškerekî ve ji bona ser Mîr Aq Songor çû. Belam Mîrê Meraxe bi yarmetîya Šahê Ermen li qeraxa çemê Sefîdrod de Pehlewan di sala 557 k. de date bišikenandin. Li paš de wî pênc hezar Kes ji bona yarmetîya Serdarê Rê Inyainc date binardin, yê ku wî ligel Îldegiz de didate bišerkirin. Belam ev leškerê nardî hate bišikenandin.

Belam wer tête bidiyarkirin, ku di nava demekê de Îldegiz û Aq Songor ligel hevdû de hatine bihajkirin; çunke, li çûna Îldegiz de ji bona ser welatê Gurcistanê Aq Songor yarmetîya wî dayite bikirin.

Di sala 562 k. de Mîrê Meraxe ji bona Bexdê çû. Li wêderê de ji bal Melek Dawid de pir rêz û rûmet ji bona wî hate bigirtin.

Di vê Salê bi xwe jî ve Pehlewanê Kurê Îldegiz Mîr Aq Songor li Meraxe de dor lê date bigirtin. Belam ew zû ligel hevdû de hatin bihajbûn.

Derbarê bi dawîya zînetên Mîr Aq Songor ve agehdarîyên me nînin. Bes û bi tenha ve Ibin El-Esir dibêje: ku di sala 564 k. de Mîrê Rê Înanc hate bikuštin û Qelexê Birayê Aq Songor serê xwe date bihildan û Etabik Pehlewanê Kurê Îldegiz ew date bisizakirin û wî dewleta Meraxe ji bona herdu Birayên Qeltex Ela-El-Dîn û Rikin El-Dewle date bisipartin.

Ji vê weha em têtin biliberkevtin, ku Mîr Aq Songorê duwem hate bimirin û wî çar Kur li dû xwe de dane bihištin. Di navbera Aq Songerê sêyem û Birayê wî Qetilxe de zor šer hatine bikirin. Li ser vêna jî de Pehlewan ji bona nava wan hate bikevtin û dewleta wan ji bona herdu Kurên Biçûkî Aq Songerê duwem date bidan û wî herdu Birayên wîyîtir El El-Dîn û Rikin El-Dewle jê bê pišk û parkirin.

Ibin El-Esîr di sala 570 k. de li ser Felek El-Dînê Serdarê Meraxe de dide biaxivtin, ku ew Kurezayê-Nevîyê Aq Songorê duwem bû. Bavê

wîna jêre ji serdarîya xwe hatîye bidakevtin. Li zemanê vî Mîrî de Pehlewan dîsan ji bona ser Merxe û keleha Ruwîn Diz daye bihêrîškirin. Bi mercê hiština Tebrîzê ji bona Binemala Îldigiz hajbûn di nava wan de hate bikirin.

Ji vê jî de wetov tête biderkevtin, ku tanî sala 570 k. de Tebrîz jî li jêr serdarîya Meraxe de bû û hemû devera dorhêla çiyayê Sehend bi destê Binemala Ahmedelî de bû.

Li dawîya vêna de û rûdanên sî Salîyî winda de bes û bi tenha ve li ser peymanekê[37] de di navbera Mîrê Meraxe Ela-El-Dîn Beg de di sala 602 k. de ligel Mîrê Hewlêrê Muzefer El-Dîn Gogberi de peyîv hatîye bikirin. Mebest jî ji vê peymana hanê zeftkirina Azirbêcanê ji Ebu El-Bekir Kurê Îldigiz bû. Leškerên Hevalbendan ruwê xwe ber bi Tebrîzê ve dane bivedan. Mîr Ebû Bekir Kolemendê kevnî Xanedanê Îldegiz Ay Toxmiš ji bona hewara xwe date bibangkirin. Li dawî de Muzefer El-Dîn Gogberi ji bona Hewlêrê hate bivegerandin. Ay Toxmiš jî bi šûn El-Dîn Beg ve hate bikevtin û ew tanî ber devê dergehê Meraxe hate bigihandin. Li dawî de Ela El-Dîn neçar bû, ku ew keleha xwe jêre bide bihîštin, ya ku ew hoyê vî šer û pevçûnê bû. Beramber vê jî bajarên Ormiyê û Šino ji bona Ela El-Dîn hatin bidan.

Li sala 604 k. de Ela El-Dîn Beg hate bimirin, yê ku Ibin El-Esîr pê Qere Songori[38] dibêje. Kurê wîyî Biçûk li paš wî de di cihê wî de hate bimayîn, Peyakî aza û dilsozî Ela El-Dîn Beg ev Kurê wî li ser destê xwe de daye biperwerdekirin. Belam Ev Kurê hanê di sala 605 k. de hate bimirin. Ebû Bekir Îldegiz li dawîya vêna de bigir hemû Mulkê Ahmedîlî ji xwe re date bidagîrkirin. Bes û bi tenha ve keleha Ruwîn Diz hate bimayîn, ya ku ew jî bi destê Peyê aza û dilsozî Ela- El-Dîn bû.

Zor renge, ku ew Ela El-Dîn Begê Serdarê Meraxe ye, yê ku ew ji bal Šair Nîzamî de di dîwana wî de Heft Pêker li ser de pir pesnê wî hatîye bidan. Nizamî li ser du Kurên Ela El-Dîn Beg dide biaxivtin, ku navên wan yek jê bi Nesret El-Dîn Mohemed ve û yê din bi Ahmed ve

---

[37]Insiklopêdîya Musulmantîyê di benda Tebrîzê de dibêje, ku ev Peymana hanê di navbera Mîr Ela El-Dîn Qere Songorê Ahmedîlî û Mîr Muzefer El-Dîn Gogebri de hatîye bigirêdan. (M. E.)

[38]Bi serûštî ve divê evaya ligel Qere Songori Turkî de bête bicudakirin, yê ku wî li zemanê Olcaytoxan de li ser Meraxe de di mêjûwa sala 828 k. de daye biserdarîkirin.

dihatin binavkirin. Heger em bên û van daxuyanîyan ligel daxuyanîyên Ibin El-Esîr de bidin biberamberkirin, dê emê bibînin, ku ev herdu Kurên hanê li pêš Ela El-Dîn Beg de hatine bimirin.

Dewleta Xanedana Ahmedîlî di demekê jî de ew ji bal Pîrekên wan de hatîye biserdarîkirin. Di 14 Sefera sala 618 k. de leškerê Megolî bi van navan ve hatîye bigihaštin û wan Meraxe bi darê zorê ve dane bidagîrkirin. Wan bajar dane bitalan, biwêran û bisûtandin û hêjî bi serdejî ve xelkên wî dane bikuštin. Belam Meleka Meraxe, ya ku ew li keleha Ruwîn Diz de bû, ji vê belayê rizgar bû.

Serdara dawîyî vê Xanedana Rewadî ev Meleka hanê bû, ya ku ew Nevîya Ela El-Dîn Beg bû. Ew bi navê Men Huwadad dihate binavkirin. Li dawîya çend salan de wê bi Kurê Ker û Lalê Îldigiz Ozbek ve date bimêrkirin. Li dawîya vegerandina Cel El-Dîn ji Iraqê de wî ev Meleka hanê date bimarekirin û keleha Ruwîn Diz jî bi destê wî ve hate bikevtin. (Insiklopêdîya Musulmantîyê, bergê 3, r. 279, 280).

Weha bi vî rengî ve li dawîya dewleteke çarsed salî de Xanedanên Rewadîyî Kurd hatin bilinavçûn.

## *Derîyê duwem*

## 2. Dewleta Salarî[39] li Ezirbêcanê de (300-420 k. de)

Ezirbêcan, mîna ku me ew di bergê yekem de dayîte bixuyanîkirin, ew bi navê Mîdya Biçûk dihate binavkirin.

Di sala 33 p. z. de Šahê Eškanîyê Ferhadê çarem[40] ev welatê hanê date bivegirtin. Weha bi vî rengî ve dewleta Eškanî serxwebûna Mîdya Biçûk date bitalankirin û ew bi darê zorê ji xwe re date biwergirtin. Lêbelê ew beramberî xebata xelkên wê ji bona azadîya xwe bi ser nehate bikevtin. Wan serxwebûna xweyî hundurû û berjewendîyên di nava dewletên xweyî biçûk de datin biparastin.

Mexabin em kêm bi dirêjî ve li ser mêjûwa vê devera Kurd de bi çend sedsalan berî musulmantîyê û di dema musulmantîyê de têtin biagehdarîkirin. Weha bi vî rengî ve Mêjûvan û Gervanên Ereb û Musulman bi xwe jî ve beramber bi van kêm agehdarîyên wan pêlan ve hatine birûbirûbûn. Weha wan di dema pêšîya vekirinên musulmantîyê de nedikarîbûn agehdarîyên baš li ser vê devara hanê de bi me bidin bidan; jiber vê jî bi me ve girêdana rûdan û bûyînên mêjûyî vê devera hanê di

---

[39]Sedefî di mêjûwa dewletan de navê dewleta salarî yanjî Musafirî li ser vê dewleta hanê dide bidanîn. Diyare, ku Navnîšana pêšî rastire; jiber ku Danîvanê vê dewletê bi salarê Merzebanî dihate binavkirin.

Herwehajî ew dibêje, ku ev dewleta hanê Delemî bû. Biserdejî Insiklopêdîya Musulmantîyê bêgûman vê dewleta hanê bi Dewleteke Kurd dide bidanîn. Weha bi vî rengî Deylemî di herdu Heremên Gîlan û Teberistan bešek ji Netewê Kurd têtin bidîtin. Herwehajî Iskender Menšî jî di mêjûwa xwe de Cîhana Arayî Ebasî, R. 762 de vê dibêja. Herwehajî di nivîsta Hezmeyê Isfehanî de hatîye, ku Iranî peyva Deylemî li ser Kurdên Teberistanê didin bidanîn.

[40] Mêjûwa Irana Kevnar, R. 156.

dema musulmantîyê û dema berî wê de bi hev re bidin bigirêdan, yên ku ew di Ezirbêcanê de têtin bilidarkevtin.

Tevlivêjî em dikarin ji çuna rûdanan û bûyînên mêjûyî di vê devera hanê de bêtin biliberkevtin, ku vê devera hanê dewleteke xweyî serbixweyî gewre ji bona serpereštîya kar û barên xwe hebû. Herwehajî ev devera hanê her û her bi mêrga ceng û šer ve di navbera dewleta Iranî û Romanî (Rojhilat û Rojavayî) de dihate biderkevtin.

Belê du Zanistvanên Erebî dihatin bidîtin, ku wan ji yên din bêtir guh bi rewš û zîneta Ezerbêcanê dane bidan. Yê yek ji wan Kurê Xurdazebe[41] bû, yê ku wî di sala 232 k. de di pêla mîrnešînîya Mohemedê Rewadî de serdana Tebrîzê dabû bikirin. Yê duwem El-Estexrî[42] bû, yê ku wî di sedsalê sêyemî koçî de bi gerandinekê ve ji bona devera Ezirbêcanê hatibû birabûn. Wî bi herdu çavên xwe ve dabû bidîtin, ku welatê Tebrîz û Ceberdan-Dîxwarkan û Šino li jêr serdarîya Ešîrên Redînî de bûn, yên ku ew hemsayên dewleta Benî Sac bûn, ya ku navînîya wê kevin bi bajarê Meraxe ve dihate biderkevtin, ku di pišt re navînîya wê bi bajarê Erdebîl-Erdewîl ve hate bikirin.

Yaqutê Hemewî di Mucem El Bildan de dibêje: ku devera Ezirbêcanê demekê di nava lepên Turkan de hatîye bimayîn, tanî ku Kî Xisro Šahê Iranê zora Serdarê Turkan Efrasyab dayête bibirin û ew dayite bikuštin. Bi vî rengî ve dewleta Turkan ji ser vê devera hanê hate bihilanîn. Weha tête bidiyarkirin, ku ev goya Yaqutê Hemewî bi carekê ve rast niye. Ew bes û bi tenha ve xwe bi goyeke Evsanî ve tête biderkevtin. Em baš dizanin, ku Efrasyab Keyê Turkistanê ango welatê li piš çem de bû. Ew tucarî Serdarê devera Ezirbêcanê nebû, mîna ku Yaqutê Hemewî dide bigotin.

Tevlivêjî diyare, ku welatê Mîdya Biçûk hemû di nava lepên Kurdên Nevîyên Mîdya ji pêla Mîdî de dihate bidîtin, tanî ku hêrîšên Turkan ber bi Rojava ve hatin bilivandin û Xez û di piš re jî Silcoqî-Silcokî di sala 430 k. de hatin biderketin.

---

[41]Ew Ebu El-Qasim Ubeydulah Kurê Xurdazebeyê Farisî bû. nivîsta wî di sala 1309 k. de li bajarê London hate çapkirin. Wî ew di navbera Salên 232 û 272 k. de date binivîsandin. Tête bigûmankirin, mîna ku ew li Insiklopêdîya Musulmantîyê de li ser hatîye légerandin, ku ew li dora Salên 300 hatîye bimirin.

[42]Di sala 340 k. -951 Z. de hatîye bimirin. (Mohemed Ewnî -M. E.)

Ev devera hanê di sala 288 k. de ji bona nava lepên Yusiv Ibin Ebî-Kurê Bavê Sac ve hate bikevtin, mîna ev li nik Yaqutî de hatîye bigotin. Ev devera hanê di nava lepên Yusiv de hate bimayîn, tanî ku Muenis El-Xadim di pêla Xilafeta El-Muqteder Bil-Lah ji nava lepên wî date bideranîn. Lêbelê Yusiv Kurê Bavê Sac bêhnekê ji bêhnan bêhna xwe neda bivedan, tanî ku wî careke din ev devera hanê ji bona nava lepên xwe nedan bivegerandin.

Di sala 326 k. de Wešmegîr Serdarê Rê xwe ji bona vegirtina vê devera hanê date bilikarxistin. Lekên Leškerên wî di bin Rêberîya leškerî Kurê Merdî de Serdarê Çiyan hatin birêvekevtin. Wan rûwê xwe ber bi Ezerbêcanê ve dane bivedan, ya ku ew di wê pêlê de ji bal Deysem Kurê Ibrahîmê Kurdî de dihat serdarîkirin, yê ku ew li nik Yusiv Kurê Bavê Sac hatibû bidestnîšankirin. Deysem Kurê Ibrahîmê Kurdî bi leškerekî pirî mezin ve rê li pêš leškerê Leškerî de date bigirtin. Herdu Lešker ligel hevdû de berengarî šer bûn. Leškerê Leškerî dî vî šerî de hate biserkevtin û Leškerê Deysem hate bibezandin. Belam Deysem xwe careke din bi serhev de date bicivandin û ji serî nû šer date bilidarxistin. Vê carê jî ew hate bišikenandin. Ew bi revê ve hate bineçarkirin. Wî hemû welatên deverê ji bil bajarê Ardewîl-Erdebîl ji bona Dujmin date biberdan.

Erdebîl bi tenê ve ji bona Deysem hate bimayîn; jiber ku xelkên wê bi mêrxasî û gernasi ve li ber bajarê xwe de datin bidan. Ew bi soz û bextê Leškerî ve nehatin bixapandin. Wan hewar ji Deysem datin bixwestin. Ew ligel Deysem de hatin bilihevhatin, ku ew bi hev re di yek rojê de bi du hêrîšan ve li ser leškerê Leškerî de bidin bikirin.

Di roja nîšankirî de Erdebîlî ji keleha xwe hatin biderkevtin û ew nala birûskê ber bi leškerê Leškerî ve hatin bikišandin. Herwehajî di wê bêhnê de leškerê Deysem jî bi hêrîša xwe ve li ser leškerê Leškerî de hate birabûn. Šerekî pir giran û germ di nava wan leškeran de hate bivêxistin. Pir kuštin û xwînrijandin hate bikirin. Pir bi zor û dujwarî ve Leškerî xwe ji kuština vî šerî date birizgarkirin. Ew ji bona Moqan-Mokan pena bû. Li wêderê de ew ji bal Esfehebdeha Kurê Delule de bi hêzeke leškerî ve hate biyarmetîkirin.

Ji nû ve careke din wî xwest, ku ew šerê dujminê xwe bide bikirin. Belam Deysem nexwest, ku ew ligel wî de bide bišerkirin. Wî xwe ji bona nik çemê Arasê date bikišandin. Ew û leškerê xwe li ser kelek û meškên kenarê çem de hatin biderbasbûn. Pištî derbasbûna xwe wan ew kelek û mešk ji bona kenarê cihên wan nedan bizîvirandin. Weha gava ku Leškerî bi kenarê çem ve hate bigihaštin, nema dikarîbû xwe û leškerê

xwe derbasî alî dinî çem bide bikirin. Lêbelê bêhêvîbûnê binê dilê wan neda bigirtin. Hinekan ji wan ji alîyê Jorî çem de dikarîbûn bêtin biderbaskirin. Bi vê derbasbûna hanê ve hêvîyeke biçûk ber bi çavên wan ve hate bikevtin. Ševekê ji ševan ew tevde derbasî alîyê dinî çem bûn. Wan bi hev re mîna birûskê xwe bi ser leškerê Deysem de datin biavêtin. Leškerê Deysem hate bišikenandin û bibezandin.

Pištî van kišandin, šikandin û bezandinan Deysem berê xwe ber bi bajarê Rê date bivedan. Wî Serdarê wê Wešmegîr date bidîtin. Wî jê re serê xwe date bitewandin û hemû mercên wîyî daxwazkirî date bicihanîn. Ji wan mercên giring ku ew her sal sed hezar dînar ji bona Wešmegîr xûkitîyê bide birêkirin û navê wî di gotina înê de di mizgeftan de bide bixwendin. Beramberî van mercan divabû Wešmegîr Deysem bi hêzeke sipahî bide biyarmetîkirin, da ku ew devera Ezerbêcanê ji nava pencên Leškerî bide biderxistin.

Gava Lekešrî bi vê hêza hanê ve hate biberamberkirin, ew li ber rabû. Wî dest lê date bidawešandin. Belam wî nedikarîbû xwe li ber lê danên wê de bide bigirtin. Wî xwe ji welêt ji bona beskirina xwînrijandinê date bikišandin. Wî berê xwe ber bi Zozan[43] ve date bivekirin, da ku xwe di nava çiyan de bide bigirtin, pištî ku wî bajar û gundên ser rêya xwe tevde datin bikavil û biwêrankirin. Belam Ermen rêya wî datin bigirtin û di danîna bosê de jê re ew datin bikuštin. Lêbelê Kurê wî li ser serê hêzeke biçûk de xwe dikarîbû bi Musilê ve bide bigihaštin û wî xwe bi hêza xwe ve bi Ebû Ebdulah El-Hisên Ibin Seîd El-Hemdanî Serdarê Musilê ve date bisipartin. Herdu ligelhevdû de li ser rêkxistina sipahekî hevbešî ji bona vegerandina Ezerbêcanê hatin bilihevhatin. Gava wan ev sipahê hanê dane bilidarxistin, wan bi hev re berê xwe ji bona Ezerbêcanê û šerkirina Deysem datin bivedan. Belam Deysem dikarîbû sipahên wan ji hevdû bide bitarûmarkirin. Weha bi vî rengî ve careke din Ezerbêcan ji bona bin destê Deysem hate bivegerandin.

Hîç gûman têde niye, ku piranîya pir ji hêzên Deysem Kurd bûn. Herwehajî hin ji wan hêzan jî ji leškerê Wešmegîrê Deylemî bûn. Deysem bi hebûna van hêzên hanê ve guh pê belbû. Wî dît, ku hêza Kurd

[43]Zozan navê Heremeke Çiyayî ji welatê Kurda ye. Ew li Rojhilatî Jorî Musilê ve dikeve û Yaquti ew di Mucem El-Bildan de anîye. Bi Kurdî Zozan engo Havîngehe. (M. E.)

piranîya cihên bilind di sipah de ji xwe re dane bigirtin û ew wî didin biserpereštîkirin û bi serdejî ve ew piranîya keleh û bajarên giring didin biserdarîkirin û nema ew bi wî ve tu pêtî didin bikirin. Wî pir dida biremankirin, bê ka çawan dîsan serdarî û desthilatîya xweyî talankirî ji nû ve ji xwe re bide bivegerandin? Wî dît, ku baštirîn kar di vî warê han de di xurtkirina hêza Deylemî de beramber Kurd de tête bidîtin, da ku tirazû di navbera herdu hêzan de bête bidîtin.

Weha bi vî rengî ve ji bona bi cihanîna remana xwe wî date bidestpêkirin, ku ew hinekan ji Serekên Deylemî mîna Saluk û Elî Kurê Fedil ji bona xwe bide binêzîkkirin. Wî pir diyarî bi ser wan ve date birijandin û ew ji bona xwe dane bihogirkirin. Ew bi vê tenê jî ve ne hate birawestandin, lêbelêjî hêdî hêdî wî cihên bilind ji Kurdan dane bisitendin û bajar û gund ji wan datin birizgarkirin. Wî ew cihên bilind û bajar û gundên hanê bi Peyên Deylemîyan ve datin bisipartin. Ew bi van tištan jî ve nehate birawestandin. Wî xwest, ku ew bi carekê ve xwe ji Serokên Kurdan bide birizgarkirin. Wî dek û dolabek li ser serên wan de date bigerandin. Wî ew datin bigirtin û ew ji bona binê zindanên kûr datin biavêtin. Weha bi vî rengî ve ew ji tirsa wan hate biparastin.

Deysem bi xwe ve Xaricî bû, lêbelê Wezîrê wî Ebu El-Qasim Elî Kurê Cafer Batinî bû û ew ji xelkê Ezerbêcanê bû. Dujminên Wezîr û Zikrešên wî gelacîya wî li nik Deysem dane bikirin. Deysem li ser wî de dilreš bû. Wezîr bi vê serkevtina vîlikan ji bal Dujminên xwe de li nik Deysem de pê hate bihestkirin. Saw û tirsê lašê wî date bilerizandin. Wî bi dizî ve berê xwe ji bona Term date bivekirin, da ku ew li wir de li nik Mohemed Kurê Musafir[44] de bête bipenakirin.

Bextê wî di çûn û rêya wî de reš bû. Pîyên wî hêjî bi devê derîyê Musafer negirtibûn, wî dît, ku Musafer ligel piranîya Gewreyên Miletê xwe de di berberî û pevçûnê de dihate bidîtin. Vê li ser Merzeban û Wahsozan herdu Kurên Mohemed Kurê Musafer de date bineçarkirin, ku ew Bavê xwe ji serdarî û desthliatîyê bidin bixistin û ew ji bona nava kelehê dane bizindankirin.

Beramberî van rûdanan Elî Kurê Cafer neçar bû, ku ew xwe ji bona Merzeban bide binêzikkirin, da ku ew xewin û hêvîyên xwe bide

[44]Di Insiklopêdîya Musulmantîye de hatîye, ku ev Mohemedê hanê bi navê Memelan dihate binavkirin. Di hin Çavîyên din de hatîye, ku ew bi navê Saluk bi nav û bang bû.

bicihanîn. Weha wî vegirtina Ezerbêcanê ji bona Merzeban dida bixweškirin. Van gotinên hanê dilê Merzeban tenik dikirin û guhê wî bi wan dihate bibelkirin. Pir pê neçû Merzeban ew ji bona xwe bi Wezîr ve date bidanîn. Hîç ew bi kar û barekî ve bêyî Cafer ranedbû. Bi vî rengî ve Cafer bi lez û bez ve desthilatîyeke mezin û hefsarê kar û bar bi destên xwe ve datin bixistin. Cafer Batinî bû, lêbelê Merzeban Šiî bû. Merzeban rê bi Cafer date bidan, ku ew bi eškerebûn ve ji bona rêça ola xwe bide biragiyandin. Pištî bi serkevtina Cafer bi razîbûna Merzeba ve bi vegirtina Ezerbêcanê ve wî date bidestpêkirin, ku ew dilên Dêlemîyan bi ser xwe ve bide birakišandin, yên ku wan di nava hêzên Deysem de didan bišerkirin. Gewreyên Deylemîyan mêldarî û Hevalbendîya xwe ji Cafer re datin bidazanîn û wan xwe ji bona bin Rêberîya wî datin bixistin. Ev gavên hanê pir xurtbûn û ew ji bona navtêdanê ji bona Cafer û Merzeban bi vegirtina Ezerbêcanê ve pir kêrdarbûn.

Weha bi vî rengî ve Elî Kurê Cafer û Merzeban li ser serê leškerekî pirî xurt de ji bona ser Ezerbêcanê xwe datin biraserkirin. Ew berengarî leškerê Deysem bûn û ew ligel wî de bi ceng û šer hatin bikevtin. Di vir de bêbextiyê roleke pir giran û mezin di nîšankirina çarenûsa šer de di nava herdu hêzan de date bilîstin. Bi dizî ve Deylemî û Qeflekê ji Kurdan ve xwe ji leškerê Deysem datin bivedizandin û wan ligel Merzeban de datin bialîkirin. Weha bi vî rengî ve wan ligel Dost û Hevalbendê xweyî donê de li kêleka Merzeban de datin bišerkirin. Deysem ji desthilanînê hate bikevtin û ew bi ser êš û ser gêj bû. Wî nema dizanî, bê ka çi êtir divê ew bide bikirin. Wî dev ji qada šer date biberda, da ku bêtir xwîn nema bête birijandin. Ew ligel hinekan de ji Peyên xwe ve ji bona nava çiyayên Kurdistan -Ermînya hate bikišandin. Ew li wêderê de ji bona nik dostê xwe Xaçîk Kurê Dêranî Serdarê wî welatê bi mêvadar bû û pir rêz lê hate bigirtin. Lêbelê Deysem bê hêvî nebû û wî rev û bez ji xwe re bi mal nekir. Wî ji dil û can date bikarkirin, da ku ew Kurdên wan deveran bide biserbazkirin û ew xwe careke din ji bona vergerandina Ezerbêcanê bide bilikarxsitin. Gava ji Merzeban re hate bigirawkirin, ku bi wî û Peyên wî ve tevaya welatê Ezerbêcanê ji bil bajarê Tebrîzê dê bête birizgarkirin. Careke din jî ji nû ve bêbextî serê xwe ji me re dide bihilandan. Vê carê jî ew bi xwe ve di Elî Kurê Cafer Wezîrê Merzeban de mîna cara din tête biderkevtin, yê ku ew niha Wezîrê Merzeban bû û cihê bawerya wî bû.

Merzeban Wezîrê xwe Elî Kurê Cafer ji bona vegerandina Ezerbêcanê û ji bona vegertina bajarê Tebrîzê date binardin. Hêjî ew li rê

de bû, wî ji bona xelkên Tebrîzê date binivîsandin, ku Merzeban dilbajandê ew dayite bigirtin û av bi ser devê wî ve li ser talanîya mal û dewlemendîya wan de hatîye bikevtin û ew ji bal Merzeban de ji bona raw û rûtkirina mal û dewlemendîya wan hatîye birêkirin. Wî ji wan re date bixuyanîkirin, ku ji wan re bi başî ve tête bidîtin, ku ew hewara xwe ji Deysem bidin bixwestin û ew mîna yek Mirovî bi ser çavên Deylemên Tebrîzê ve bêtin bipijiqandin.

Ev remana hanê pir bi Gewreyên Tebrîzê ve xweşhat. wan bi rast û dirustî ve ew remana hanê dane bicihanîn. Deysem jî bi vî rengî ve di hewara wan de hat bigihandin û ew bi hêzên xwe ve ji bona nava bajarê Tebrîzê hate bikevtin. Gava ev xebera hanê ber bi guhên hêzên Merzeban ve hate bikevtin, Komeke pir ji Kurdên diljikestî ji Merzeban bi dizî ve xwe bi Deysem ve dane bigihaştin. Ev rûdanên hanê hemû bi dizî ve di pişt perdê de bê agehdarîya Merzeban dihatin bikirin.

Lêbelê gava ku xeberên van dek û dolaban di guhên Merzeban de hatin bipistkirin, bi lez û pele ve wî leşkerekî mezin date bilikarxistin û wî berê xwe ber bi bajarê Tebrîzê ve date bivedan. Ew di şerekî germ û giran de li nêzîka bajarê Tebrîzê de berengarî sipahê Deysem bû. Sipahê Merzeban di vî şerê hanê de mêrxasî, gernasî û hozaneke pir berz û bala date biderxistin. Vê hişt, ku Merzeban di vî şerî germ û giran de bête biserbikevtin.

Deysem pir bi pîsî ve hate bişikenandin û wî bi revê ve xwe ji bona keleha Bajêr date biavêtin, da ku ew li wêderê de bête bipenakirin. lêbelê Merzeban bi dû wî ve hate bikevtin. Wî çardorê kelehê bi xurtî ve lê date bizeftkirin û wî gerden li Deysem de date bitengkirin. Belam Deysem ligel hêzên xweyî mayî ve di bin pošandina perên tarîya şevê de xwe ji çardorlêgirtina xwe date birizgarkirin û wî berê xwe ji bona bajarê Erdebîlê date bivekirin.

Merzeban bi dû Deysem ve hate bikevtin, piştî ku wî hêzeke baş ji bona çardorlêgirtina Tebrîzê li dû xwe de date bihiştin. Merzeban li wan de li bajarê Erdebîlê de çardorî date bikirin.

Lêbelê gava ku çardorlêgirtinê date bidirêjkirin û bajar xwe neda biberdestkirin, Merzeban ji xwe re date biremankirin, bê ka ew çawan dujwarîyên xwe dikare bide bikêmkirin û ji xwe re Xuwarin û vexwarina şer bide bipeydakirin?

Di dawîya dawî de ew bi armanca xweyî windayî ve hate bigihaştin. Wî Mirovekî pir kose û kone datin bidîtin, ku ew bi baştirîn rola dek û dolabên wî ve bête birabûn. Ev jî bi kurtî ve bi vî rengî ve

hatîye bidîtin: Bi Bavê Ebdulah Mohemed Kurê Ehmedê Neîmî, yê ku ew ji bal Deysem de piştî Elî Kurê Cafer bi Wezîrî ve ji xwe re date bidanîn, Merzeban pêre bi dizî ve dan û sitendin date bikirin. Kurê Neîmî ji bona Merzeban date binivîsandin û ew dibêje:
Ezê dê tevaya kar bidim bikirin, ku ez di serê Deysem de pêwistîya daxwaza lihevhatinê bidim bixistin. Gava ku hinek ji Gewre û bi nav û bangên bajêr ji bona vê mebestê ji bona layê te bêtin bihatin, divê tu wan bide bigirtin û wan ji bona binê zindanê bide biavêtin û nehilê ew ji bona bajêr careke din bêtin bivegerandin, tanî ku ew Deysem ji bona te nedin biberdestkirin. Evaya navroka nameya Wezîrê Deysem ji bona Merzeban bû. Ji her tîpek wê, ji her peyv û gotek wê bêhna bêbextîyê jê tête biderketin. Merzeban bi carekê ve hatinên di namê de date bichanîn.

Weha bi vî rengî ve ev dek û dolabên hanê hatin biserbikevtin. xelkên bajêr Deysem bi zorê ve dane bineçarkirin, ku ew berdestbûna xwe ji bona Merzeban bide bikirin, da ku jîna Zindevanan bête biparastin û berdana wan bête bigirawkirin. Merzeban pir bi rêz berdestkirina Deysem date bikirin. Gava Deysem ji wî date bixwestin, ku ew jê re û ji bona rûniştina mala wî re keleha Term bide bidan, Merzeban ev daxwaza wîna date bicihanîn.

Weha bi vî corî ve tevaya welatê Ezerbêcanê bi pir mal û xiznên xwe ve û bi xêr û bêrên xwe ve bi bê Hember û Berber ji bona nava destên Merzeban hate bikevtin. Deysem demekê li keleha Term de bê deng û livandin hate bimayîn. Her û her di nava serê wî de gûmana ceng û şer dihate bikirin. Di vê pêlê de leşkerê Bohîmî hêrîşî ser Ezerbêcanê date bikirin û Merzeban bi dîlî ve hate bigirtin. Birayê wî Wahsozan Deysem ji bona nik xwe date bibangkirin, da ku ew rawestandina Kurdan li kêleka xwe de bide bigirawkirin. Wî pir rêz li hatina Deysem de ji bona nik xwe date bigirtin. Wî kar û barên liberxwedana Ezerbêcanê dijî vegirtina Al Boye bi wî ve date bisipartin.

Deysem zend û bendên xwe bi pêgirî ve datin bipêçandin. Wî dikarîbû hêzeke mezin ji Kurdan bide bilikarxsitin û wî hevsarê kar û bar li Ezerbêcanê de bi destên xwe ve date bixistin. Wi xwe bi carekê ve date bilidarxistin, da ku ew rû li rû de beramberî sipahê Bohîmî de di bin Serokitîya Mohemed Kurê Ebdul-Rezaq de bide biceng û bişerkirin.

Bûyîn û rûdanên van ceng û şeran Kurê Meskewîyê di bergê duwem de di nivîsta xweyî Serpêhatîyên Netewan de dayite binivîsandin, mîna ku ew jê re ji bal Deysem de bi xwe hatine bigotin. Meskewî dibêje: ku ji bona Mohemed Kurê Ebdul-Rezaq Serdarê sipahê Bohîmî Ni-

vîsvanekî Xuresanî bi navê Kurê Mehmud hebû û ew pir cihê bawerî û rêzlêgirtina wî bû. Wî ew ji xwe re bi Wezîr ve date bidanîn. Lihevdû hate birasthatin, ku wî ew ji bona Ezerbêcanê date birêkirin, da ku ew tapo û bêšên Emîrî bide bicivandin. Li wir de šeytan di nava serê wî de date bilîstin. Šeytan hišt, ku ew ligel Mîrzayê xwe de bêbextîyê bide bikirin. Bi lez û bez ve wî xwe ligel hêz û hemû perên pê re bi Deysem ve date bigihaštin.

Gava Ebdul-Rezaq ev xebera šûm date bibihîstin, rewa di kabokên wî de neman. Cihê wî hate bilerizandin. Rûniština wî li Ezerbêcanê de nema hate bidirêjkirin. Wî pišta hustê xwe date bixurandin û ew di sala 342 k. de ji bona bajarê Rê bi šikestî ve hate bivegerandin. Deysem gerandina kar û barên Wizaretê Serdarîyê ji bona ser milên Bavê Ebdulahê Neîmî û Kurê Seqrê[45] Fileh date biavêtin û wî xwe ji bona likarxsitina serbazkirina jimarek pir ji Kurd û Deyleman date bivalakirin. Wî bi alîkarîya wan dikaribû desthilatî û serdarîya xwe ji bona tevaya Ezerbêcanê bide bivegerandin. Lêbelê wî nizanîbû, ku vê carê jî desthilatîya wîna tanî demeke kurt bû.

Pištî demeke kurt Merzeban ji jêrdestîya dîlbûnê hate birizgarkirin. Herwehajî Elî Kurê Mîškî ji binê zindana Rikin El-Dewle hate biberdan. Herdu ligel Wahsozan de li ser derkirina Deysem de ji Welêt hatin bilihevhatin.

---

[45]Kurê Meskuwîye van peyvên hanê di bergê duwem de ji Nivista xwe Serpêhatîyên Netewan, R. 136 de bi rengekî din dibêje:
ku Kurê Seqir li ser malê alîyê Xoy û Selmas de ji bal Merzeban de berpisiyar bû. Gava ku wî bi hatina Deysem bihîst, ew bi lez û bez ji bona nik Deysem çû û wî hemû malê li nik xwe ji bona wî dan û wî dilsozîya xwe jêre date biderxistin û wî serê xwe jêre date bitewandin. Deysem pir dilê wî pê hatebi šakirin û wî ew ji bona xwe yawer date bidanîn.

Gava Deysem berê xwe ji bona šerê Mohemed Kurê Ebdul-Rezaq date vivekirin, wî hemû malê û perên xwe ligel Kurê Mehmud ji bona nava Çiyayên Moqan-Mokan date binardin. Kurê Mehmud ligel Deysem bêbextî date bikirin. Wî xeber ji bona Mohemed Kurê Ebdul-Rezaq date binardin. Gava ev xebera bêbextîya Kurê Mehmud bi bin guhên Deysem ve hate bikevtin, wî wê çaxê xwe di gurbûna ceng û šer de ligel Mohemedê Kurê Ebdul-Rezaq didît. Vê xeberê pir pê kêrkir û ew pê pir dilšekestî bû. Vê hišt, ku ew di ceng û šer de bête bišikenandin.

Deysem tu tišt li ser rizgarkirina Merzeban de ji dîlbûnê nizanîbû. Wezîrê wî Bavê Eb-Dulahê Neîmî ji xwe re li kêsekê de digerîya, da ku ew bêbextîyê li Mîrzayê xwe de bide bikirin, da ku ew ji çavnešînîya wîna bête birizgarkirin. Wî dest bi zikrešîya Xuwarzayê wî Ganim ve beramberî wî date bikirin. Wî ew li ser de dihate bitûjkirin. Xuwarzayê wî li berde hate birabûn û jêre bi tirsa hêza xwe ve û ya Deylemîyan date binivîsandin.

Bavê Eb-Dulahê Neîmî ev kêsa hanê ji xwe re bi bašî ve date bidîtin, ya ku wî ew dabû bilikarxsitin, gava Ganim ji Erdebîl ji bona nik Xalê xwe Deysem diçû. Ganim ji Deysem Malê Bavê Eb-Dulah û Nivîsvanê wî date bixwestin. Wî ew bi hêza xwe û hêza Deylemîyan dida bitirsandin. Wî Nivîsvan Elî Kurê Isa date bikuštin û tevaya malê Deysem date bigirtin û ew pê ji bona nik Kurê Miškî revya.

Deysem di vê demê de ew li derveyî Erdebîlê de bû. Gava ev xebera hanê pê hate bigihaštin, ew bi lez û bez ve ji bona Erdebîlê hate bivegerandin. Wî leškerekî gewre date bilikarxistin û ew li ser serê wî leškerî de ji bona šerê Elî Kurê Mîkšî çû.

Gava destarê šer hate bigerandin, Koma Deylemîyan xwe ji nava leškerê Deysem date bikišandin û bi dizî ve wan xwe bi hêzên dujminên wî ve dane bigihandin. Weha bi vî rengî ve vê bêbextîya hanê çarenûsa vî šerê hanê date binîšankirin. Leškerê Deysem hate bibezabdin. Deysem û hêza wîyî Kurd xwestin, ku ew bi hev re ji bona Erministanê bêtin bikišandin û bipenakirin. Deysem li Ermenistanê de cara pêšîn pê hate biagehdarkirin, ku Merzeban ji dîlbûnê hatîye birizgarkirin, Bi Ezerbêcanê ve hatîye bigihaštin û wî Elî Kurê Mîškî dayite binardin, da ku ew šûna wî bide bigirtin.

Beramberî van rûdanên hanê Deysem bi çûna Musilê ve û ji wêderê de ji bona çûna Bexdê neçar bû. Ew ji bona nik Meez El-Dewle penabû, yê ku jêre pir rêz û rûmet date bigirtin. Wî jêre salanîyek bi pêncî hezar dînar date bidanîn. Deysem pir di xwešyê de dihate bijîyandin. Herwehajî Meez El-Dewle pir pir jê hezdikir, ku wî ew bi navê Birayê xweyî Bavê Salimê Deysem ve dida binavkirin.

Pir pê neçû, Deysem dev ji vê xwešiya hanê date biberdan; jiber Dost, Heval û Merovên wî li Ezerbêcanê de jêre dilsozîya xwe û rastîya navtêdana xwe ji bona vegerê datin binivîsandin. Wan jê datin bixwestin, ku ew ji bona vegera xebatê û vegerandina Ezerbêcanê bête bivegerandin. Wî ev banga hanê ji bona xwe date bicihanîn. Wî xweser dev ji Begdadê date biberdan, gava ku wî date bibawerkirin, ku Meez El-Dewlele tu

yarmetîyan jêre nade bipêškeškirin; jiber ku ew dilê Birayê xwe Rikin El-Dewle nade bišikenandin, yê ku di nava wî û Merzeban de Dostanî û Jinanîn hebû. Wî di sala 343 k. de dev ji Begdadê date biberdan û berê xwe ber bi Musilê ve date bivekirin. Wî nêtdikir, ku dê ew ji nik Nasir El-Dewle El-Hemdanî yarmetîyê ji xwe re bide biwergirtin. Wî pir ji bona wergirtina vê yarmetîya hanê date bikarkirin, belam hemû ev kar û barên ber bi ba ve cûn û ew biserneketin. Lêbelê vê biserneketina hanê dilê wî neda bišikenandin û bibêhêvîkirin. Wî berê xwe ji bona Helebê date bivekirin, da ku ew ji xwe re yarmetîyê ji Serdarê wê Seyf El-Dewle bide bigirtin. Werjî ev çûna hanê jî bê sûd hate bimayîn.

Di dawîya dawî de Deysem li Ermenistanê de hate bidîtin. Wî Xaçik Dêranî jî ji bona wê mebesta xwe date bidîtin. Lebelê gava xebera hebûna Deysem li nik Xaçîk de bi ber guhên Merzeban ve hate bikevtin, wî bi lez û bez ve ji bona Xaçîk date binivîsandin, ku ew Deysem[46] bide bigirtin. Di pêšî de Xaçîk bi girtina Deysem ve date bidudilîkirin, lêbelê di pašî de ew bi girtin û berdestkirina Deysem ve ji bona Merzeban hate bineçarkirin. Merzeban çavên Deysem date bipeqandin û ew ji bona binê zindanê date biavêtin. Pištî mirina Merzeban Deysem di zindana wî de di sala 345 k. de dane bikuštin.

[46]Deysem: ew Bavê Salimê Deysemê Kurê Ibrahîmê Kurdîye.
Kurê Meskewîyê dibêje: ku Deysem mîna Bavê di bîr û bawerîya Šurat de bûn. Ew ji Hevalbendên Heronê Šarî de bûn, yê ku ew li Musilê de di sala 283 k. de rabû û ew li wir de hate bikuštin. Ibrahîmê Bavê Deysem ji bona nava Ezerbêcanê revaya û wî Jineke ji Serokên Kurdan ji xwe re anî. Ji vê Jina hanê Deysem jê re bû. Kurê Bavê Sac Deysem li nik xwe de date bixwedîkirin û ew ligel wî de mezin bû û wî jê re cihên mezin date bigirtin. Deysem pištî Yusifê Bavê Sac di sala 314 k. de Ezerbêcan bi bin destên xwe ve date bixistin. serdarîya Deysem li Zerbêcanê de tanî sala 330 k. de date bidirêjkirin. (Mohemed Ewnî- M. E.)

## *Derîyê Sêyem*

## 3. Dewleta Hesnewî[47] li Hemedanê de (330-405 k. de).

Binê vê dewleta hanê ji bal Mîr Hisênê Gewreyê Ešîra Berzîkanî de di sala 330 de li bajarên Dînor û Šahrezor de hatîye bidanîn. Wendad û Ganim herdu Birayên[48] Mîr Hisên bûn, û ew Serokên Ešîrên Eyšanî bûn. Hemû dor û berên Dînewer, Hemedan, Nehawend, Samgan û hin ji welatên Ezerbêcanê jî di bin destên wan de bûn.

Wendad di sala 349 k. de û Ganim di sala 350 k. de ber bi dilovanîya Xwedanê xwe dv çûn û hemû Mulkên wan bi destên Hesnewî Kurê Mîr Hisên ve hate bikevtin.

### Hesnewî

Li paš mirina Bavê xwe de ew ji bona ser textê serdariyê hate bihilkišandin. Bi rastî ve ew jî Danerê vê dewleta hanê tête bidanîn; jiber vê dewleta hanê di dema Bavê wî de zîneta xweyî mîrî ji xwe re nedabû bipeydakirin. Derbarê pêla Hesnewî de agehdarîyên me kêmin. Nasyare, ku wî di çuna Rikin El-Dewleyê Bohîmî de ji bona cenga Xuresanê dayite biyarmetîkirin. Mîrza Husênê Mukriyanî derbarê Hesnewî de hinekî ji me re daye bialîkirin û ew dibêje:

---

[47]Sedefî xwedîyê nivîsta Dewletên Islamê, di bergê 1., Rûpelê 429 de vê dewleta hanê bi dewleta Hesnewî dide binavkirin.

[48]Li bal Kurê Esîr de ji Rûpelê 8-155 tête bigotin, ku Wendad û Ganim herdu Kurê Ehmed bûn û ew Xalên Hesnewî bûn. Ew Du Mîrên Kurd bi corekî din bûn û ew bi navên Eyšanî dihatin binavkirin. (Mohemed Ewnî-M. E.).

"Meez El-Dewle leškerek di bin serpereštîya Yenal Koš de ji Musilê ji bona ser Šahrezorê dayite birêkirin û Hesnewî li Rojavayî Hewlêrê de rê li ber vî leškerî de dayite bigirtin û ew bi pîsî ve dayite bišikenandin. Li dawîya vê de Meez El Dewle careke tir leškerekî din ji bona ser Dînewer dayite binardin û ew navaya dayite bitalan û biwêrankirin.

Di vê demê de Rikin Eldîn Birayê Meez El-Dewle li melbenda Cehne-Curcan- de ji bal dujminên xwe de tûšî hêrîšê bû. Wî ji Birayê xwe Meez El-Dewle yarmetî date bixwestin. Meez El-Dewle li ser vê de hate bineçarkirin, ku ew ligel Hesnewî de bête bilihevhatin, bi mercekî ve ku navê Meez El-Dewle di gotina xwendina roja înê de bête bixwendin. Bi vî rengî ve pêwendîyên dostanîya dewleta Berzekanîya Kurd ligel dewleta Bohîmî de pir hatin bixurtkirin.

Di sala 356 k. de di navbera Iz El-Dewle Bextiyar Kurê Meez El-Dewle û Hesnewî de têkçû. Šerekî germ û giran di nava wan de hate bilidarxistin û Bextiyar têde hate bišikestin. Hêz û hinera Hesnewî bi vê serketinê ve hate bibêtirkirin. Di sala 357 k. de Bextiyar dîsan ligel Hesnewî de haj bû û wî beramberî bi Texelubê Hemdanî ve daxwaza yarmetîyê ji Hesnewî date bikirin. Ew pê hate birûništin, ku sînorê Hesnewî tanî Zeyê Bahdînan bête bifirehkirin. Bî vî mercê hanê ve Hesnewî ligel Bextiyar hate bilihevhatin û wî yarmetîya wî beramber bi Texelub ve date bidan. Bi vê yarmetîya hanê ve Bextiyar Texelub date bišikenandin. Li paš de Hesnewî bi ser Hewlêrê û Šahrezor ve ji bona Dînewer hate bivegerandin.

Rikin El-Dewle ji lehevatina Hesnewî û Bextiyarê Birazayê xwe bênteng bû. Wî bi vê mehnê ve leškerek di bin Serokitîya Wezîrê xwe Bavê Fedil Kurê Emîd de di sala 359 k. de ji bona ser Hesnewî date binardin. Kamil di bergê 8, r. 217 de dibêje, ku hoyê hatina leškerê Rikin El-Dewle ji bona ser Hesnewî reftarkirina Hesnewîyî nebaš di derbarê Sehlan Kurê Musafir de bû.

Bi rastî jî ve Kurê Meskewîye di bergê 2, r. 270 dibêje, ku Hesnewî pištî bi hin serketinên xwe ve sînorên welatê xwe date bifirehkirin û wî desthilatîyeke pir zor ji xwe re date bipeydakirin. Di šerê Xuresan de wî komeka Rikin El-Dewle dabû bikirin; jiber vê jî Rikin El-Dewle pir ji Hesnewî memnûn bû. Ligel vê jî de çavên Hesnewî bi welatên wî ve nehatin bitêrkirin. Wî hêrîšî çîyan û welatên tir date bikirin. Bac ji Kerwanan dida bisitendin û gerden li Dewlemendan de dida bigivaštin. Dîsan Rikin El-Dewle çavên xwe li van kar û baran de dida bigirtin.

Belam ji niškêve navbera Hesnewî û Sehlanê Kurê Musafirê Dêlemî[49] têkçû. Kurê Sehlan leškerek date bilidarxistin û ew bi xwe ve li ser leškerê xwe de ji bona ser Hesnewî hate bikišandin. Belam Hesnewî ew date bišikenandin û wî li ordugahekî de lê çardorî date bigirtin. Wî ne-hitš, ku ne nan û nejî av bi wan ve bête bigihandin. Li paš de wî date bifermankirin, ku her Suwarek gulyekî pûš yanjî barekî êzing bide bianîn. Ew pûš û êzing li dor û berên ordugah de date bikomkirin û agir pêve date bixistin. Li layekî de germa havînê û li layekî tir de virîna agirê pûš û êzingan Dêlemî pir pê hatin bišerpezekirin. Wan daxwaza xwe ber avêtinê datin bikirin û ew hatin biberdestbûn.

Gava Rikin El-Dewle evaya date bibihîstin, wî xweser Wezîrê xwe Bavê Fedil ligel leškerekî de ji bona naskirina rastîya vê bihîstinê date binardin. Bi gihiština Bavê Fedil ve ji bona Hemedanê ew hate bimirin. Kurê wî Bavê El-Fethî cihê wî date bigirtin û bi Serdarê lešker bû. Da ku ew cihê xwe bide biparastin, wî xwest, ku ew zû ji bona bajarê Rê bête bivegerandin. Jiber vê jî ew ligel Hesnewî de hate bilihevhatin. Beramberî bi xerckirina kišandina vî leškerê hanê de Hesnewi pêncî hezar dîna pere û nêzîka van peran jî diyarî û wilax ji Bavê El-Fethî re date binardin. Bi vî rengî ev hera hanê hate bidawîkirin. (bergê 2, r. 270). Ibin-Kurê Esir zor pesnê bašbûna serpereštî, malxobûn û sincîyê Hesnewîyî pak û bilind dide bikirin. Di Insiklopêdîya Musulmantîyê de hatîye binivîsandin: "Li dawîya mirina herdu Birayên wî Wendad û Bavê Ganim de[50] bi carekê ve Hesnewî îš û karên welêt bi destên xwe ve date bixistin.

---

[49]Çavîyên kevnar mîna Kurê Esir û Kurê Meskewîye di nivîsandina rastîya navê Kurê Musafir de hatinebi cudakirin? Gelo ew Mohemed yanjî Ehmed bû. Gelo Navnîšana wîyî Kurdî Memelan yanjî, Mehlam, yanjî Sehlan bû?

Bi her awayekî ew navê Yek Mirovî bûn, Mirovekî bi nav û bang geh bi navê Mohemedê Rewadê Kurdî, gehjî bi navê Mohemedê Kurê Musafirê Dêlemî, gehjî ew bi navê Xwedanê Term, Wešmîran û Ezerbêcan dihate binavkirin. Ew Bavpîrê Kurê Musafirê Bidanînvanê dewleta Kurdîyî salarî û Rewadî ye, yê ku ew li Zerbêcanê de hatine bidamezirandin. (M. E.).

[50]Di vê pevika hanê de pir telihevî tête bidîtin. Li Jor de di pêšî de hatîye bigotin, ku Mîr Hisênê Kurdî Du Birayên wî bi navê Wendan û Ganim hebûn. Jiber vê divê li vê derê de bête gotin, ku pištî mirina Herdu Apên wî Wendad û Ganim de Hesnewî.... Tevlivêjî wergirtina pêšî ji bivîsta Dewletên Musulmantîyê û ji vê Isiklopêdîya Musulmantîyê ligel nivîsandin Ibin-Kurê Esir de lihevnakin jiber Ibin-Kurê Esir dibêje, ku Wendad û Ganîm Xalê Hesnewî bûn û ew ne Apên wî

Serdarî û desthilatîya wîna li beşê zorî Kurdistan de dihate bikirin. Dînewer, Hemedan û Nehawend ji bajarên bi nav û bangên welatê wî bûn. Bajarê Sermac jî paytextê wî bû."

Hesnewî li heraya di navbera Eded El-Dewle û Bextiyar de alîyê Bextiyar ji xwe re date bigirtin. diyare, ku hoy jî bîntegbûna wîyî vê dawîya bû, ya ku ew di navbera Rikin El-Dewlê Bavê Eded El-Dewle de û Hesnewî de hate birûdan. Li layekî tirjî de Hesnewî ew alîyê hanê ji xwe re ji tirsa dilbijandin û çavberdana Eded Eldewle ji bona vegirtina welatê wî date biwergirtin. Bi van remanên hanê ve wî alîyê Bextiyarê Birayê Eded El-Dewle ji xwe re date bigirtin û di dawî de peymanek di nava wan de hate bigirêdan.

Xwedîyê Serpêhatîyên Netewan weha ji me re li ser veguhertina vê bernameya Hesnewî de dide biaxivitin: "Di sala 366 k. de Hesnewî ligel Bextiyar de da û sitend û wî xwe ji bona yarmetîya wî date bilikarxsitin. Herçend bû, ku wî di şerê Ramhurmuz de nikarî bû ji Bextiyar re alîkarîyê bide binardin. Belam di wê dema ku Bextiyar ji bona Wasit vegeryabû, Hesnewî herdu Kurên xwe Eb-Dul-Rezaq û Bedir ligel hezar Suwarî de ji bona nik wî date binardin. Herwehajî divabû, ku ew bi xwe jî ve ji bona nik Bextiyar bihata biçûn. Kurên Hesnewî şîret li Bextiyar de dane bikirin, ku ew ji bona ser Begdadê bête biçûyîn û li wê derê de şerê Eded El-Dewle bide bikirin, da ku ew bikaribe li orduwê Musilê Hemdanî de bide bikarkirin. Belam Bextiyar bi hoyê hogirîya wîyî pir ji bona Peyakî xweyî Turkî guh li gotina kesekî de ne dida bigirtin. Eb-Dul-Rezaq ji kîna vê ji bona layê Bavê hate bivegerandin û jiber tirsa gazinan wî Birayê xwe Bedir li nik Bextiyar date bicîhiştin. Ewende pê neçû, Bextiyar ji tirsa Eded El-Dewle waz li hemû mafeyên xwe de date bihiştin. Bedir jî ew date bicîhiştin û ew ji bona nik Bavê xwe hate bizîvirandin." (Nivista Serpêhatîyên Netewan, bergê 2).

Hesnewî di sisê Rebîê Pêşî de di sala 369 k. de li bajarê Sermac[51] de hate bimirin.

bûn. Ew dibêje, ku navê Bavê wan Ehmed bû...hd... (bergê 8, R. 255). (M. E.).

[51]Sermac ji bal Mîr Hesnewî Kurê Hisênê Kurdî hate biavakirin. Ew Yekeke ji bi nav û bangtirîn şopên wî ne. (Yaqutî).

## Ebu Necim Nasir

Li dawîya mirina Bavê xwe de ew bi Serdarê Berzîkanî ve hate bikirin. Di vê salê de bi xwe jî ve wî hin ji kelehên Rojavayî Hewlêrê ji xwe re datin bizeftkirin.

Eded El-Dewlê Bohîmî ji xwe re mirina Hesnewî bi kês ve date bizanîn, çunke, Fexer-El-Dewle Birayê wî bi Hesnewî ve pišt sitûr bû û Bextiyarê Kurmamê wî jî gelekî sûd û komek ji Hesnewî ji xwe re dida biwergirtin. Jiber van rewš û zînetên hanê Eded El- Dewle zor kîna wî li ser Hesnewî de hatibû bihilgirtin. Li dawîya mirina Hesnewî de Eded El-Dewle date bixwestin, ku ew Sedarî û desthilatîya dewleta Hesnewîyan bide bilinavbirin. Di pêšî de wî Xiznedarê xwe Bavê Nesir Xuršîd Yezdar bi nameyekê ve ji bona nik Fexir El-Dewle, Mueîd El-Dewle, Qabusî û Wešmegîr date binardin. Mebesta wî di rêkirina vê nameya hanê de ji bona wan Mirovan lihevhatin û rêkkevtin bû. Kurên Hesnewî li dawiya mirina Bavên xwe de libinguhên hevdû hatin bikevtin. Her yekî ji wan li gora dilê xwe de ba ji ber guhên xwe ve dida biberdan. Kurên wî ev bûn: Ebu El-Ela, Eb-Dul-El-Rezaq, Ebu Necim Bedir, Asim, Ebu Ednan, Bextiyar û Eb-Dul- Melik. Hinekan ji wan dijî Eded El-Dewle ligel Fexir-El-Dewle de hatin birêkkevtin. Hineke din ji wan ji Eded El-Dewle rûwên xwe jê datin biwergîrandin. Bes û bi tenha ve Bextiyar ji Birayên xwe cihê bû u ew li keleha Sermac de hate birûništin. Wî ligel Eded El-Dewle de date bidan û bisitendin û pê soz date bidan, ku ew dê kelehê jê re bide biberdestkirin. Eded El-Dewle ji vê du bendîya di nava van Biran de date bikarkirin. Wî leškerekî qurs date bikomkirin û ew ji bona ser welatê Çiyan date binardin. Ev leškerê hanê bi asanî ve derbasî nava Hemedanê bû. Zor ji Mîr û Serdarên Fexir El-Dewle û Berzîkanî ligel leškerê Eded El-Dewle de hatin birêkkevtin. Bi vî rengî ve Nehawend û Sermac jî bi hêsanî ve bi ber destên wî ve hatin bikevtin. Mal û talenîyeke zor bi destên Eded El-Dewle ve hatin bikevtin.

Kurên Hesnewî li ser vê de di rêya Serdarê lešker Bavê Nesir Xuwašaze de sertewandina xwe ji bona Eded El-Dewle datin biderxistin. Li dawî de hemû ji bona ordugeha Eded El-Dewle hatin bigihandin. Eded El-Dele hemû Kurên Hesnewî ji bona bin çavdêrîyê datin bixistin û di

dawî de wî Eb-Dul-Rezaq, Ebi-bavê Ela, Ebi-Bavê Ednan, Bextiyar û Elî ligel hinek Peyayên Gewreyên Kurd de datin bigirtin.

Wî Bedir ji bona nik xwe date bibangkirin. Wî ew bi šûrekî ji zêr ve û bi hespekî ve bi zînekî ji zêr ve date bixelatkirin û wî ew bi Serekê Kurdên Berzîkanî ve date binîšankirin. Wetovjî wî Asim û Ab-Dul Melek jî date bixelatkirin.

Di dawî de wî hemû Kurên Hesnewîyî mayîn ligel Peyayên Gewreyên Kurdên girtî de dane bikuštin û hemû Mulk û Malên wan ji xwe re date bizeftkirin. Wî di pišt re Ebu-Bavê Wefa Tahirê Kurê Mohemed bi leškerekî ve ji bona ser keleha Sermac di Zil-Huce sala 369 k. de date binardin. Wî keleh date bizeftkirin û hemû mal û Xizmên Hesnewî date bitalankirin.

Di pišt vegerandina Eded El-Dewle ji bona Begdadê de Asim ligel Serokên Kurdan de li ber Bedir rabû. Bedir neçar bû, ku ew bi leškerekî ve ji bona ser Asim û Hevalbendên wî bête biçûyîn. Wî Asim û Birayên xweyî dinî ligel wî de tevde dane bilinavbirin. Ew bi serê xwe ve bê Berber û Hember hate bimayîn. Wî dest bi veguhertinên çak ve di nava welatê xwe de date bikirin û sînorên xwe date bifirehkirin. Tanî mirina Eded El-Dewle wî mercê sozê xwe ligel wî de bi carekê ve date bicihanîn. Wî di šerên ligel Fexir El-Dewle de bi leškerî ve bi dil û can ve yarmetîya Eded El-Dewle date bikirin.

li dawîya mirina Eded El- Dewle de di navbera Mîr Bedir û Birayê Eded El-Dewler Fexir El-Dewle de lihevhatin hate bikirin.

Li ser vê lihevhatina hanê de di navbera Mîr Bedir Kurê û Eded El-Dewle Šeref El-Dewle de têkçû û dujminayetî di nava wan de hate bigûrbûn. Pištî cigîrbûna Šeref El-Dewle li Begdadê de wî leškerekî zor date bilikarxistin û ew di bin Komdarîya Qere Tekîn Cuhšiyar de di sala 377 k. de ji bona ser Bedir date binardin.

Herdu lešker li nêzîka Qermisîn-Kermanšan de berengarî hevdûbûn. Li dawîya šerekî sivik de Mîr Bedir ji qazîve xwe date bišikenandin. Wî ordugahê xwe ligel barxana xwe de ji bona Qere Tekîn date bicîhištin. Qere Tekîn bi vê tepê ve negihišt. Wetov wî dizanî, ku Bedir bi rastî ve hatîye bišikenandin. Wî xwe bi lez û bez ve bi ordowa xwe ve ji bona talankirina ordugeha Bedir date bigihandin. Ew ligel leškerê xwe de hêjî bi talanîyê ve likarbûn. Pir pêneçû, Bedir bi xwe û lêškerê xwe ve bi ser wan ve hate birakišandin û bêhna xwe komkirinê nema bi destên wan ve hate bikevtin. Wî kuštarekî pir mezin li wan de date bikirin û hemû bargiranîya wan ji wan date bizeftkirin. Qere Tekîn bi

hezar belan ve ligel çend Peyên xwe ve hate birizgarkirin û wî xwe bi hezar dujwarî ve bi pira Nehran ve date bigihandin. Piştî çend rojan ew ligel leşkerê xweyî tar û markirî û perîşanê mayî de di sala 377 k. de ji bona Begdadê hate bivegerandin.

Ev biserketina hanê bi pêşeyî hêz û serxwebûna serdarîya Berzîkanî bû. Bi rastî jî ve Mîr Bedir bi başî ve ji vê biserketina hanê ji xwe re date bikarkirin û bere bere wî ji xwe re herema Çiyan date bidagîrkirin.

Di sala 379 k. de Mîr Bedir bi çar hezar Suwar ve ji bona Fexir El-Dewle date biyarmetîkirin, gava ku wî rûwê xwe ji bona Iraq û Ehwazê date bivedan, da ku ew şerê Esker Beha El-Dewle bide bikirin, yê ku ew ji bona ser Fexir El-Dewle hatibû birakişandin û yê ku ew hate bişikenandin[52].

Serdarê Berzîkanî li şer û herayên di navbera Mîrên Bohîmî de zor bi hiş xwe ve didate bilivandin. Li ser wan pevçûnên wan de Serdarê Berzîkanê wirde wirde welatê xwe date bigewretirkirin, tanî ku wî sînorê xwe bi çemê Kerxa ve date bigihandin û bajarê Şapor Xwast-Xurem Abad jî bi destên xwe ve date bixistin. Herwehajî herema Çiyan jî wî bi destên xwe ve date bixistin, ya ku ew ji welatê nihayî Kermanşayê û Şahrezorê tête bipêkhatin.

Mîrên Bohîmî bi hoyên şer û pevçûnên nav xwe ve zor bê hêz hatin bikevtiin. Nebes tenê wan nema dikarîbûn rê li ber firehkirina welatê serdarîya Berzîkanî bidin bigirtin, hêjî bêtir zor caran ew neçar dibûn, ku ew yarmetîyê ji Serdarê Berzîkanî bidin bixwestin. Hêz û hinera Bedir bi vî rengî ve her û her ber bi Jor ve diçû. Xelifê Ebasî di sala 388 k. de[53] nav û nîşana Nasir El-Dîn El-Dewle pê date bixelatkirin. (El-Kamil).

Bi rastî ve Mîr Bedir Serdarekî zor dadwer û xêrxwaz bû. Nav û bangê gewrebûna xwe wî nebes bi tenha ve ji meydanên şer û cengan

---

[52]Di Kokê de dijî vê ye. Rastkirina vê ji perê rûpelê Serpêhatîyên Netewan de hatîye bikirin. (M. E.).

[53]Di Kokê de di sala 338 k. de hatîye. Gûman niye, ku ev şaşbûneke çapî ye. Rastkirina vê ji bal Ibin-Kurê Esîr bergê 9, R. 54 hatîye biwergirtin. Ew dibêje: Di sala 388 k. de hêz û hinera Bedir Kurê Hesnewî gewre bû û nav û bagên wî berz û bala bûn. Ji bal Dîwana Xelife ew bi navê û nîşana Nasir El-Dîn El-Dewle hate binavkirin. Pêwendîyên wî li El-Heremeyn de zor bûn...hd. (M.E.).

dabû biwergirtin. Di warên Başkirina Serpereştîyê, Avanîyê û Parastina Çandinyê de pir bi nav û bang bû. Di warê kar û barên ayînî jî de ew li hemû Hemsayên dema xwe de pêştir bû. Nivîsta Serpêhatîyên Netewan derbarê qencî û nîşanên berz û balayên vî Serdarê hanê zor bi hêjabûn û nerxbûn ve dide biaxivtin.

Nasir El-Dîn Bedir tanî sala 400 k. de bê Hember û Berber bi xweşî ve serbixwe serdarîya xwe date bikirin. Ev dema serdarîya wîyî bê şer û pevçûn ji bona welatê wî zor bi xêr û bêr bû û ew ji bona xelkên Welêt pir bi xweşî û geşî hate biderbaskirin. Aramî û xweşîtî li hemû layekî Welêt de dihate bidîtin. Belam di destpêka vê salê de rêk û pêkîtîya serpereştîyê têk û pêkçû; jiber Hilalê Kurê Nasir El-Dîn Bedir bi gij bavê xwe ve çû. Ibin-Kurê Esir di Kamil de hoyê vî şerî di navbera Bav û Kur de weha dide biveguhestin:

Dayika Hilal xelkê Êla Şazincanî Kurdî bû. Piştî zayîna Hilal Bedir ev Jina hanê ji xwe date bidûrkirin. Wî ewende jî rûwê xwe bi Kurê xweyî Hilal ve nedida bidan. Wî Kurê xweyî bi navê Ebu-Bavê Îsa ve xweşewistî dikir.

Piştî ku Hilal gewre bû, car caran ew ligel Bavê xwe de ji bona raw diçû. Ji rabûn û rûniştina Nasir El-Dîn Bedir bû, gava ku ew tûşî şêrekî dihat bikirin, ku wî ew bi destên xwe ve dida bikuştin. Belam carekê Hilal kês bi Bavê xwe ve neda bidan û wî xwe bi ser şêr ve date birakişandin û ew date bikuştin. Bi Bavê wîna ve ev mêrxasîya hanê pê nexweş bû. Wî ji bona Layê xwe date bigotin, ku li layê te de weha ye, ku te biserkevtineke gewre ji xwe re dayite biwergirtin. Magelo di navbera şêr û seg de çi cudabûn tête bidîtin? Li dawîya vê bîntengbûna hanê de wî xwest, ku ew Layê xwe ji xwe bide bidûrxistin. Bi vê remana hanê ve wîna herema Samxan pê date bidan û wî ew ji bona wêderê date binardin. Hilal jî ev pê xweş bû. Wî jî dixwest, ku ew ji Bavê xwe bête bidûrkevtin.

Belam ewende pê neçû, Hilal ligel Serdarê Şahrezorê Dirawsê xwe Ibin-Kurê El-Madî de têkçû, yê ku ew Karmendê Bavê wî bû. Gava ku Bedir ev date bibihîstin, wî ji bona Hilal date binivîsandin, ku ew ligel Ibin-Kurê El-Madî de nede bişerkirin.

Belam Hilal guhên xwe bi fermana Bavê xwe ve neda bidan û wî hêriş bi ser Ibin-Kurê El-Madî ve date bibirin. Nasir El-Dîn dubare ji bona Hilal date binivîsandin û hêrişî wî kir û wî pê got, ku tu her xerabîyekê derbarê Ibin-Kurê El-Madi de bide bikirin, tu wê derbarê min de dide bikirin. Hilal li paş van gotinên Bavê xwe de bi servajî wan ve date bikirin. Destbicî ve wî leşker date bikomkirin û ew ji bona ser

Šahrezorê çu. Pištî çardorlêgirtineke kurt wî ew date bizeftkirin û wî Ibin El-Madî ligel Kurên wî de dane bikuštin û hemû malên wan dane bitalankirin. Gava ku Nasir El-Dîn ev xebera hanê date bibihîstin, ew pê zor tûre bû û wî derbarê Hilal de pêrabûnên xurt datin biwergirtin. Hilal jî beramber bi pêrabûnên Bavê xwe dest bi tefiredana Peye û Maqûlên wî jê date bikirin. Wî ji bona wan gelek diyarî û pare datin binardin. Bi vî rengî ve roj bi roj ve ew ji bona wan merdtir dibû. Vê jî cihê xwe date bidigirtin û kêra xwe date bibêtirkirin. Çunke, Bavê wîna ewende destên wî firh nebûn. Bere bere Hevalbendan rûwê xwe jê datin biveguhertin.

Bi kurtî ve leškerê Nasir El-Dîn û Hilal li ber dergehê Dînewer de berengarî yegbûn. Di vê demê de bešê zorî ji leškerê Nasîr El-Dîn ji bona layê Hilal çû û Nasir El-Dîn Bedir jî bi dîlîtî hate bigirtin û ew ji bona layê Kurê wîyî Hilal dane bibirin. Hinekan ji Serdarên lešker Hilal bi kuština Bavê wî datin bidilbijandin. Belam Hilal bi dilbijandina wan neda bikirin. Wî merdayetî û rûmeteke pir bilind ji bona Bavê xwe date bigirtin. Ew bi xwe jî ve bi pîyên xwe ve ji bona pêrgîbûna wî çû wî jê re got: "Tu her û her Mîrim û ez jî Serleškerê te me".

Bedir bersiva wî da û gotê: "Debera Kes guh li van peyvên te de nebin. çunke, ev bi hoyê linavbirina me herduwan dibe". Ev keleha hanê ji bona te, ev nîšana hanê jî ji bona te û ew mal û dewleta di kelehê tevde ji bona te wan bi baši bide biparastin. Çunke, xelk te divên, divê tu Mîr bî û min jî divê, ku tu keleheкê bi min bide, da ku ez têde dabinîšim û xerîkê limêj û rojîya xwe bim. Hilal ev daxwaza Bavê xwe date bicihanîn. Bešekî ji mal û dewletê ligel keleheкê de dayê[54].

Nasir El-Dîn li vê reftarkirina hanê de dilxweš nebû. Bi rasti jî ve pištî ku ew li kelehê de cigîr bû, wî kaxesek ji bona Ebu El-Fetih kurê Enaz û Eba Îsa Šazî Kurê Mohemed date binivîsandin, yên ku ew li Esed Abad bûn. Wî ew li ser Hilal de dan bihandan.

Bi rastî jî ve Ebu fetih ji bona ser Qermisîn çû û wî ew date bizeftkirin. Eba Îsa jî ji bona ser Šapor Xwast çû û wî ew date bitalankirin. Gava ku Eba Îsa xebera hatina Hilal date bibihîstin, wî rûwê xwe

[54]di zeylê Kurê Meskewîye de hatîye: ku li têkdana di navbera Bedir û Kurê wî de destê Wezîrê Melekê Rê Ebu Seed Ibin El-Fedil zor hebû. (Daner).

Em nizanin, bê ka çi zeyl Daner nêt dike? Zeylê çapkirî di sala 389 k. de tête bidawîkirin. Pevçûn di navbera Bav û Kur de di sala 400 k. de hatîya bikirin. (Mohemed Ewnî- M. E.)

ji bona Nehawend date biwergerandin, ya ku ew bi destê Ebu Bekir Kurê Rafi ve bû. li wêderê de Hilal hêrîšî ser wî date nikirin û wî ji Dêlemîyan çarsed Kes date bikuštin, ku not ji wan Serlêšker bûn. Kurê Rafi Abu Îsa date bigirtin û wî ew ji bona Hilal date biberdestkirin. Belam Hilal lê hate bibuhurandin û wî ew ligel xwe de date bibirin.

Gava ku Bedir ev date bizanîn, wî Peyak ji bona nik Beha El-Dewleyê Dêlemî date binardin û daxwaza alîkarîyê jê date bixwestin. Beha El-Dewle leškerek datel bikarxistin û wî ew di bin Komandarîya Fexir El-Melek Ebu Galib de ji bona yarmetîya Nasir El-Dîn de date binardin. Gava ku ev leškerê hanê bi Šapor Xwast ve hate bigihaštin, Mîr Hilal ji Ebu Îsa pirsî û wî jê re date bigotin, ku va leškerê Beha El-Dewle tête bihatin, ma tu çi dibêjî? Ebu Îsa jê re date bigotin, divê ku tu ji bona pêrgîbûna wî bête biçûyîn û jê re serê xwe bide bitewandin û bi peran wî bide dilbijandîkirin. Heger ku ew bi peran ve nehate birazîkirin, di wê hingavê de divê tu rê li ber wan de bide bitengkirin û ji nûve careke din divê tu ligel wan de bide bidan û bisitendin. Ev leškerê hanê weku leškerê pêš Dinewer[55] niye. Tu bi wan nikarî; jiber ku ew bi dilbijandin ve û li ser daxwaza Bavê te de ew ji bona ser te hatine binardin.

Hilal ev amojgariya hanê bi fêlbazî ve date bizanîn û wî Abu Îsa date bikuštin. li dawî de wî xwest, ku ew bi šev ve bi ser leškerê Fexir El-Melek de xwe bide biavêtin. Belam Fexir El-Melek pê date bizanîn. Wî xwe bi serhev ve date bidan û wî li ordugehê de ji bona parastina bargiranîya xwe hêzeke biçûk date bicihhištin. Ew bi xwe ve ji bona pêrgîbûna dujminê xwe çû. Gava çavên Hilal bi dujminê wî ve hate bikevtin, ew tê gihišt, ku amojgarîya Ebu Îsa rast bû. Ew pošman bû. Wî xeber ji bona Fexir El-Melek date binardin û got: ku ez ne ji bona šerê te hatime, belkî mebesta min ew bû, ku ez bi nêzîkî ve te bibim, da ku ez serê xwe ji bona te bidim bitewandin. Heger tu šer nekî, ezê dê serê xwe ji te re bidim bitewandin. Fexir El-Melek bi van peyvan razî bû. Wî ev xebera hanê ji bona Bedir date birêkirin û da ew wî di vê pirsê bide bitêgihandin. Bedir reftarekî bed beramberî vî Peyamberî date bikirin. Wî ew date biderkirin. Wî Peyakî din ji bona layê Fexir El-Melek date binardin û wî pê date bigotin, ku ev reftara Hilal ji bil xapandinê šitekî tir niye; jiber ku ew dizane, ku šer nema pê tête bikirin. Jibervêjî divê kês pê neyête bidan.

[55]Wetov diyare, lêbelê Ibin El-Esir jêre Dergehê Nehawenddibêje. (bergê 9, R. 80).

Gava ku Fexir El-Melek eve date bibihîstin, êtir wî date bibawerîkirin, ku Bedir bi carekê ve bi dujminê Kurê xwe ve tête biderkevtin. Wî fermana šer date bidan. Pir pê neçû Hilal bi dîlitî ve hate bigirtin ew ji bona layê wî hate binardin. Hilal jê date bihêvîkirin, ku ew wî ji bona destên Bavê wî nede biberdestkirin. Ew bi vê hêvîya hanê ve pê hate birûništin. Li dawî de wî ji Hilal nîšana berdestkirina kelehê date bipirskirin. Hilal nîšana kelehê pê date bigotin. Belam Dayika Hilal ligel Pasevanên kelehê de kelh ji bona Fexir El-Melek nedan biberdestkirin. Wan jê daxwaza parastina jîna xwe dane bixwestin. Fexir El-Melek ev daxwaza hanê jî date bicihanîn. Li dawî de ew ji bona nava kelehê çû û di pišt re wî ew ji bona Bedir date bidan, pištî ku wî hemû mal û dewleta xizna vê ji xwe re date bizeftkirin. Xizna vê kelehê bêqam bi zêr, bi zîv, bi xišir, bi cil û bergan, bi çekan ve ûhd... dewlemend bû. (El-Kamil, bergê 9, r. 79, 80).

Nasir El Dîn li dawîya vê de, pištî ku wî bi alîkarîya Beha El Dewle ve welatê xwe ji nava destên Kurê xwe ve date sitendin, wî welatê Šahrezorê ji bona Eb-Dul-Emîd El-Çiyuš Wezîrê Beha El-Dele date dan. Ji bidestpêkirina mêjûwa vê dana hanê de welatê Šahrezorê ji bal Wênerên Emîd El-Ciyuš dihate sermiyanîkirin û ew ji nava destê serdarîya Bezrîkanî hate derçûn.

Li dawîya girtina Hilal de ew ji bona binê zindanê hate biavtêin. Gava ku Sultan El-Dewle jî ji bona ser cihê Beha El-Dewle hat bigihandin û wî fermandarîya Îraqê date bikirin, dîsan wî Hilal di binê zindanê de date bihištin. Belam Tahir Kurê Hilal ji niškê ve ji bona meydanê hate biderkevtin û wî Šahrezor di sala 404 k. de ji Wênerê Emîd El-Ciyuš date bizeftkirin.

Di sala 403 k. de[56] Nasir El-Dîn leškerek date bilikarxist û wî ew ji bona ser Hisênê Kurê Mesûdê Kurd date birakišandin. Wî di keleha Kosecd de çardorî lê date bigirtin. Bi hoyê pir sermabûna zivistanê ve leškerê Bedir zor šerpezetî û azarî date bikišandin. Bi vê kêra hanê ve leškerê Bedir biryara kuština Nasir El-Dîn date bidan. Bedir bi alîkarîya Hevalbendên xwe ve evaya fate bibihîstin, belam wî date bigotin: "Ev Segên hanê çine û çawan ew dikarin tištekî wetov bidin bikirin"? Wî guh pê neda bidan. Dubare pê hate bigotin, ku biryara kuština te hatîye bidan. Dîsan wî guh pê neda bidan. Rojekê ji rojan gava ku ew li ber devê

[56]Di koka Soranî de sala 405 k. de hatîye. (Cuma)

ordugahê de li ser cihekî bilind de rawestya bû, çend kesek ji Ešîra Cozkan bi ser wî ve xwe datin bidadan û wan ew date bikuštin û Wan lešker datin bicîhištin.

Li dawî de Mîr Hisên Kurê Mesûd ji kelehê hate biderkevtin û gava çavên wî bi Term ve hate bikevtin, wî date bifermankirin, ku ew bête bihilgirtin û ew ji bona Mešheda Hêjayî Elî (Xwedê jê razî be) date binardin û ew li wêderê de hate bivešartin. Weha Nasir El-Dîn bi vî rengî vê pištî sî salî ji serdarîkirinê û di temenekî gewre de hate bilinavçûn.

Li dawîya mirina Eded El Dewle de di sala 372 k. de tanî têkçûna wîna di sala 400 k. de ligel Hilal de, ango bîst û hešt salan wî bisexweyî serpereštîya welatê Berzîkanî dida bikirin. Wî bi dadwerî, bi hiš û nermbûneke zor baš ve û bi canekî pirî bala û berz ve welatê xwe dide bisermiyanîkirin. Wî ew date bivejandin û wî ew di her warekî de date bipêšvexistin û bigeškirin.

Xwediyê Zîlê Serpêhatîyên Netewan, yê ku ew Wezîr Ebu El-Šuca bû, ji me re pir li ser pesin û nîšanên qencî vî Serdarî de dide biaxivtin: Hesenanî: Serdarên Berzîkanî ji bona parastina Hecîyên Mala Xwedê her sal pênc hezar dînar ji bona Serokên Kerwanên Hecîyan didan bidan û wan nedihištin, ku ew beramber karên xwe tu tištekî ji Hacîyan bidin bisitendin. Bicge lêvêjî wan bîst hezar dînarên din jî ji bona baškirina bîr û rêyên Hecê û parvekirina hinekî ji wan ji bona ser Perîšanên Ensar û Muhacirînên Hicazê jî dabûn bitirxankirin. Ev rêzana hanê jî dihate bicihatin, tanî ku Bedir sax bû. Pištî mirina wî xerckirina van perên hanê jî hate birawestandin.

## Siyaseta Bedriyî Diravî

Bedir zor bi hûrbûn guh bi îš, kar û barên diravî ve dida bidan. Pir bi dûrbîn û hišbûn ve wî sermiyandarîya diravî dida bikirin; jiber vê jî her û her xizna wî dagirtî bû.

Heger Fexir El-Melek Bavê Galib li Sapor Xwast de malê wî nebira, dê hebûnên xizna wî pir zor tir bana.

Yekek ji qencîyên wîyî herî gewre nehiština vešartin û hilanîna mal bû. Vešartin û hilanîna mal jiber xelkê ve wî ew bi beramber bêbextîyê ve dida bidanîn û wî ew bi gewretirîn siza ve dida bikirin.

heger Hatina Giştî ji bin serê belayeke serûştî bihata bikêmbikevtin û bi rastî jî ve tu gunehê Girtîvanên Erdan nebiwa, wî ziyanên wan Girtîvanên Erdan ji malên Sedeqê ji wan re dida bizîvirandin, yanjî dayînên wanî pêwistî ji bona dewletê ji bona saleke din dida bihiştin. Jibervêjî Kesekî nedikarîbû li pêwistîyên danîn dewletê de li ser xwe de bide bikêmterxemînkirin, yanjî ku ew li komkirina wan de bide bibêbextîkirin.

Wî her sal ji bona kar û barên qencîyê û xweşitîyê di nava bajêr de komek perên nîşankirî ji bona çakirina destgehan û karxanan dida bixerckirin. Wî ji bona avakirina rê û banan ji bona geşkirina bazirganîyê çavtengî ne dida bikirin. Jibervêjî bazirganîya welatê wî her û her ber bi geşîyê ve diçû. ji bona nimûne: heger ku wî rêyeke giring bida bivekirin, di pêşî de wî çi tiştê jê re pêwist biba dida bianîn û bazareke demî li wir de dida bidurustkirin. Her tiştê li bajêr de bihata bifirotin, wî ew ji bona wê bazarê dida bianîn û wî ew tiştên di wê bazarê de bi buhayekî zor kêm ve ji bona xelkê didan bifiroştin. Karger û Hostên rê ji xwe re ji wê bazarê tişt û mişt didan bikirin. Bi vî rengî wî ve qazanca bajêr û bazarê dida bigirawkirin.

## Nav û Nîşanên wî

Bedir zor şarezayê siyaseta dema xwe bû. Li ser leşkerê xwe de ew serdar û zal bû. Beramber bi xelkên jêr destên xwe ve ew dadwer, dilovan û mehreban bû. Siyaseta wîyî diravî pirî baş bû. Di civandina hatinan de û di xerckirina wan de bi rastî jî ve pir çavdûr bû. Qencî li ber dilê wî de pir şêrîn bû. Di bîr û bawerîya xwe de pêgîr bû. Di dema ceng û şer de yekdil, piştgirêdayî û vejandî bû. Eşêrên Berzîkanî wî bi şiyarbûneke zor kûr ve dida bisermiyanîkirin. Wî ew ji raw û rûtkirinê didan bidûrkirin. Ew di hemû warekî de didan bibaşkirin. Wî di nava wan de mêldarîya zanebûnê dida bipeydakirin. Bi saya vî karî ve ew fêrî xwendin û nivîsandinê bûn. Wî Cotkar û Gundî didan biparastin. Wî tucarî nema dihişt, ku zad û bênder bêtin bisûtandin. Wî ev reweşta kevin û pîs zor bi hiş ve date bilinavbirin.

Li gora goya Zîlê Serpêhatîyên Netewan de-Zîlê Tecarub El-Umem- de dibêje: ku di demekê de ji dema vî Serdarî di nava welatê wî de xerabî zor bû û Cotkar û Gundîyan dest bi berdana çandinîyê ve datin

bikirin. Wî ji bona Serokên Eŝîran mêvanîyeke gewre date bilidarxistin û têde hemû reng û nifŝên xwarin û vexwarinê li ser cil û sifran date bidanîn. Belam nan li ber xwarinê de nehate bidanîn. Kesekî dest û mestên xwe ji bona xwarinê neda bidirêjkirin. Hemûyan çavdêrîya anîna nan didatin bikirin. Di vê bêhnê de Bedir dest bi peyvê ve date bikirin û wî rûwê xwe ber bi wan ve date bivekirin û wî ji wan re date bigotin: wa diyare, ku hûn bê nan xwarinê nikarin bixun. Ke wa bû, bo çî hûn çandinîyên xelkê linavdibin? Xwedê Rûwên we bide bireŝkirin! Xwedê li ser min û we de Bînvan be, ji vêderê û pêve her kesek ji we xwe nêzîkî çandinîyê bidin bikirin û zordarîyê li Xwedîyên wan de bidin bikirin, dê ezê xwîna wan bidim birijandin. Bi rastî jî ve wî sunda xwe date bicihanîn û wî gelek kes ji bona vî karî date bikuŝtin. Ev Reftara hanê ji bona Eŝîran bi serpêhatîyeke tirŝ û tal bû. Kesekî tir nema diwêrî xerabîyê û zîyanan li Cotkar û Gundîyan de bide bikirin. Ev rûdana hanê perçeyeke ji nimûna dadwerîya vî Serdarê hanê tête biderkevtin.

Rojekê ew ligel hinekan ji leŝkerê xwe de dihatin bigerîyan. Di rê de ew pêrgiyî Gundîkî bû, yê ku wî hinek dar li ser piŝta xwe de dida bihilgirtin. Hinekan ji Suwarên Bedir du nan ji wî Perîŝanê reben dabûn bisitandin.

Gava ku Gundî bi rastî Bedir ve gihiŝt, Wî ban wî kir û wî jê re date bigotin: Ho Serdar, ez perîŝanekî dar firoŝim. Du nanim pê bûn, wan têra min dikir û perên darên xwe jî min ew ji bona Mal û Mendalên xwe didate bianîn. Di rê de ez tûŝî Suwarên te bûm. Yekekî ji wan nanên min ji min date bisitendin. Serdar lêpirsî? Ma tu wî Suwarî dinasî? Rêwî gotê: belê, ger ku çavên min pê bêtin bikevtin, dê ezê wî bidin binasîn!

Piŝtî van peyv û gotinên hanê di navbera Bedir û Êzingvan de Bedir di derbendekî de hate birawestandin û wî ferman bi ser leŝkerê xwe date bidan, ku ew di ber wî re bête biderbaskirin. Bi rastî jî ve ewende pê neçû, Êzingvan Sûwar ji bona Mîr Bedir date binîŝankirin. Nasir El-Dîn fermana dabezandina Sûwar date bikirin û wî pê date bigotin: divê tû vî barê êzingan bide bihilgirtin û wî ji bona nava bazara Bajêr bide bibirin û wî li wêderê de bide bifiroŝtin û perên wan bi vî Peyê hanê ve bide bidan.

Suwar Peyakî bi nav û bang bû. Wî xwest, ku ew bi perên xwe ve xwe ji vê belayê bide birizgarîkirin. Wî nerxê wan Êzingan ji bêrîka xwe date biderxistin û wî ew ji bona Êzingvan date bidan. Belam Nasir El-Dîn ev qebul nekir û wî Êzing bi Suwar ve date bihilgirtin û wî fermana xwe date bicihanîn.

Vê nimûna hanê kêreke xweyî zorî mezin date bikirin. Êtir kesekî din nema ev core sitemdarî dane bikirin. Vedibêjin, ku Meleka Rê zor ji

hiš û tevdîra Bedir pištrast bû. Her û her wê ji bona kar û barên serdarîya xwe pirsiyar pê didate bikir.

Carekê Mîr Nuh Kurê Mehmudê Sebektekîn[57] Serdarê Xuresanê Peyamberek ji bona nik Meleka Rê date binardin û wî tirs têde datin bifirandin.

Melekê kaxezek ji bona Nasir El-Dîn date binivîsandin û wê bîr û bawrîya wî ji xwe re date bixwetin. Bedir di bersiva xwe de jê re date bigotin: tu wî Peyamberî ji bona nik min bide birêkirin. Di dawîya vê birêkirina hanê de Bedir leškerekî gewre bi cil, berk û çekên xwe ve date bikomkirin û wî ew ji dergehê Rê tanî dergehê Sapor Xwast date birêzkirin û ew li vî berê rê de û li alîyê dinî rê de date biragirtin û wî hišt, ku Peyamberê Mehmud Sebektekîn di nava wî Leškerî re bête biderbaskirin. Serî li Peyamber de li vê hêz û hinera hanê de hate bisûrandin.

Gava ku ew ji bona layê Nasir El-Dîn hate bigihaštin, Nasir El-Dîn pir rêz û rûmet ji bona wî date bigirtin û wî šîret lê date bikirin: ku Mehmud ligel Meleka Rê de divê lihev bête bihatin. Li paš de ew ji bona nik Mehmud date binardin.

Bi rastî jî ve Mîr Nuh Kurê Mehmud bi kêra wê tevdîra Bedir ve hajbûn bi ser šer ve date bigirtin û ew li ligel Meleka Rê de hate birêkkevtin. Ew xapandina wînayî cengîn beramberî Qere Tekîn baštirîn nimûne ye, ya ku ew hozanî û karîna wînayî cengê dide biderxistin.

Li dawîya linavçûna Nasir El-Dîn Bedir de hêz û hinera Serdarîtîya Berzîkanî rûwê xwe ber bi jêrîtîyê ve date bivekirin û ew ji rengê serdarîtîyê hate biderkevtin û wê ji xwe re rengê mîrnešînîyeke zor bi xir û cir ve date biwergirtin.

Kurê Esîr-Ibin El-Esîr di Kamil de[58] dibêje:

Li dawîya kuština Bedir de Ešîra Cozekan ji bona layê Šems El-Dewle Bavê Tahir Kurê Fexir El-Dewleyê Bohîmî date birakirin. Tahir Kurê Hilal, Nevîyê Nasir El-Dîn li dawîya mirina Bavpîrê xwe de daxwaza serdarîyê ji xwe re date bikirin û ew ligel Šems El-Dewle de bi šer ve hate

[57]Di Zila Serpêhatîyan de bi Yemîn El-Dewle Ebu El-Qasim Mehmud Ibin Sebektekîn hatîye.

[58]Ji xwe re li Kurê Esir bergê 9, R. 92 de bide bitemašekirin. di wir de hatîye: ku welatê jêr destê Bedir Sapor Xwast, Dînewer,Birocerd, Nehawend, Ased Abad, Ehwaz û keleh û Wilayetên di nav wan de bûn. (M. E.).

bikevtin. Belam ew di šer de bisernekevt û ew bi dîlîtî ve hate bigirtin. Hemû mal û mulkên wî hatin bitalankirin û ew bi xwe jî ve li Hemedanê de hate bizindankirin. Li ser vê rûdana hanê de Ešîrên Lor û Šazincan xwe bi Bavê Šewk Kurê Bavê Fethê Mohemed Kurê Enaz ve datin bibestandin. Mulkên Berzîkanîyî mayî hemû bi destên Šems ve hatin bikevtin.

Di vê pêlê de Hilal Kurê Bedir li nik Sultan El-Dewle de di zindanê de bû. Sultan El-Dewle pištî girtina Welêt ji bal Šems El-Dewle ve - Hilal ji zindanê date biberdan. Hilal bi lez û bez ve leškerekî mezin ji bona sitendina mulkê Bavê xwe date bilidarxistin û ew ligel wî leškerî ve bi rê ve hate bikevtin. Ew ligel Šems El-Dewle de bi šer ve hate bikevtin. Belam leškerê wî šerekî bi dilê xwe ve jê nekirin û wan datin bibazdan. Ew bi xwe jî ve di šer de di Zil-Qudet de di sala 405 k. de hate bikuštin.

Di sala 406 k. de Šems El-Dewle Tahirê Kurê Hilal pištî qewil û sozdanan wîna ji bona sertewandînê jê re ew date biberdan û wî ew bi leškerekî ve ji bona ser welatê Berzîkanî date birêxistin. Li dawîya demekê de ew ligel Bavê Šok de bi šer ve hate bikevtin. Wî ew date bišikenandin û Birayê wî Sadî jî date bikuštin. Tevlivêjî li paš de hajbûn di nava wan de hate bikirin û wî Xweha Bavê Šok ji xwe re date bimarkirin.

Pir pê neçû Bavê Šok ew li batî Birayê xwe de bi fêl ve date bikuštin. Bi vî corî ve dawîya Xanedana Hesnewî hate bidawîkirin. Bešek ji welatê wan û perçê Šahrezoê ji bona nav destê mîrnešînîya Kurên Enazê[59] Kurd hate bikevtin.

Mîrê dawîyî Xanedana Hesnewî Bavê Selîm Deysem Kurê Bavê Xenaîmî Birayê Hesnewî bû, yê ku wî pištî mirina Tahir bi demeke kêm ve serdarîyek di keleha Kasan de li herema Zehaw de li nêzkaî Baba Yadgar de dabû bidamezirandin. Lêbelê rojên vî Mîrî jî pirî kêm bûn. Ew pir nejîya. Pištî mirina wîna bi demeke kurt ve ew serdarîtîya hanê hate biherifandin.

[59]Weha li nik Kurê Esîr de bi Enaz hatîye. Belam di Šerefname de bi Eyar hatîye. Seîd Pašayê Diyarberki-Xwedê lêdilovan be- di nivîsata xwe de Mirat El-Iber bi Turkî bi Enan dide binavkirin. Wehajî Daner jî wî bi Enan dide binavkirin, mîna ku dê di jor de li ser dewleta Enanî yanjî Enazi de bête biaxivtin. (M: E.).

## *Derîyê Çarem*

## 4. Dewleta Šedadî di 340-468 k. de di Aran de[60]

Mêjû li ser vê dewleta hanêyî Kurên Šedad de zor kêm agehdarîyan bi me ve dide bigihandin, yên ku wan dewleta xwe li Aran de di sala 240 k. de[61] datin bidamezirandin. Vê dewleta hanê tanî sala 468 k. de dayite bijîyandin. Piranîya Mulkên vê dewleta hanê ew ji bal Melekšahê Selcoqî ve hatin bivegirtin û ew bi Šahînšahîya wîyî mezin ve hatin bipêvekirin. Tevlivêjî hinekan ji Kurên vê Malbata hanê serdarî li hinekan ji heremên jêrdestên Bav û Kalên xwe mîna Kencet-Cenze û Anîdidan didatin bikirin, lêbelê yên ku ew li jêr çavdrêîya Sulcoqîyan bûn.

Bi pirbûn ve ev Malbata hanê Kurd bûn.[62] bajarên Nexcuwan, Kenhe, Tevlîs, Demîrqebo û Qerebax ji bajarên bi nav û bagên vê dewleta Aranî hanê bûn, yên ku piranîya xelkên wê ji El-Kez- Lezki bûn. Gava ku di sala 337 k.- 948 Z. de Salarê Merzeban Kurê Mohemed Serdarê Ezerbêcanê di Derbendê Rê de bi dîlîtî ve hate bigirtin, dewleta wî ji hev hate bikevtin. Her Mîrekî ji Mîrên herem û kelehan serdarî û serxwebûna

---

[60]Ev derîyê hanê di koka Soranî de niye. (Cuma).

[61]Weha ev di Kokê de hatîye. Diyare, ku ev ji Šašbûna 340 k. de hatîye biderkevtin. Ev Jimara 340 ew di hemû Kanîyên din de mîna Muncem Bašî û dewletên Musulmantîyê hatîye.

[62]Piranîya Çavîyan vê Malbata hanê bi Kurd didin bidanîn. Herwehajî di dewletên Musulmantîyê de ji bal Etinli Lin Pol û di Insiklopêdîya de ev hatîye binivîsandin. (Mohemed Ewnî-M. E.)

xwe ji xwe re datin biwergirtin. Di nava van Mîrên hanê de Mîrek bi navê Mohemed Kurê Šedad Kurê Karho ve hebû. Wî berî tevan dî Debîl de serxwebûna mîrnešînîya xwe date bidazanîn. Pir pê neçû sitêra wî di asû de hate biçurusandin. Hêz û hinera wî weha berz û bal bû, tanî ku ew bi tayî hêz û hinera Serdarê Ezerbêcanê bû. Tanî sala 344 k.- 955 z. de ew di xwešiyê de û bê Hember û Bermber di nava mîrnešînîya xwe de zal û serdar bû... Di pištî vê re hêdî hêdî hêz û hinera wî dihate bikêmkirin û sitêra wî di asû de dihate biçilmisandin û herema desthilatîya dewleta wî bi ser hev de dihate biqermiçandin. Di dema Kurê wî de bes û bi tenha ve herema Aranê bi destên wî ve hate bimayîn.

Di vê pêlê de Serdarekî bi navê Mîr Fedlon ve li Kence de serdarî dida bikirin. Wer tête biderkevetin, ku ev Birayê Mohemed Kurê Šedad de. Mohemedê Kurê Šedad Kurekî wî bi navê Bavê Hesen Elî Kurê Cafer Leškerî hebû[63], wî hešt salan li welêt de dayite biserdarîkirin. Di pišt wî re Birayê wî Merzeban ji bona serdarîyê hate bidanîn. Wî heft salan ji 368 tanî 375 k. de li welêt de date biserdarîkirin. Ew ji bal Birayê xwe Fedil Kurê Mohemed de di dema nêçîrê de hate bikuštin.

Fedil Kurê Mohemed li šûna Birayê xwe de ji bona ser textê serdariyê hate birûništin. Wî pir dil û bawerîya xelkê bi ser xwe ve date bikišandin. Wî pir xwešî û avanî di nava welêt de date bicihanîn. Wî zanistî û zanebûn date bibelavkirin û bigeškirin. Wî pira mezinîyî bi nav û bang ve li ser çemê Res-Arakis de date biavakirin. Wî pir kar û barên dinî qenc date bikirin.

Ev Mîrê hanê li ser textê serdarîyê de çil û heft salan hate birûništin. Wî bi dadwerî û mehrebanî hevsarê welêt tanî mirina xwe di - sala 442 k. de di nava destên xwe de dida biwergirtin.

Di pištî wî re Kurê wî Bavê Fetih Musa ji bona ser textê serdarîyê hate birûništin. Wî bes û bi tenha ve sê sala date biserdarîkirin. Di pišt wî re Kurê wî Bavê Hesen Elî Kurê Musayê, yê ku ew bi Leškerî ve bi nav û bang bû, ji bona textê serdarîkirinê hate birûništin. Serdarîya wî tanî sala 440 k. hate bidirêjkirin. Šairê Qetranê bi nav û bang ve pir pesnê vî Serdarê hanê daye bikirin, yê ku wî ew li bajarê Kence de dayite biparastin.

[63]Weha ev hatîye. Belam bêgûman ev bi šašî hatîye binivîandin. Ev weha di Nivista dewletên Musulmantiyê de hatîye binivîsandin: "Leškerî Bavê Hesen Elî Kurê Mohemed 24 sala serdarî dayite bikirin". (Mohemed Ewnî-M. E.)

Di piştî vî Serdarê hanê re Kurê wî Nu Şîrwan ji bona ser textê serdarîyê hate birûniştin. Ew ji sê Mehan pêve li ser serdarîyê de bêtir nema. Ew zû ji bona bal Xwedanê xweyî mehrebanê bilind çû. Di piştî vî re Bavê Eswar Şawir Kurê Fedil ji bona ser serdarîyê hate birûniştin. Li ser vî Serdarê hanê de pir çîrok û nivîstên mêjûwê bi qencî û serbilindîyên wî ve têtin bixemilandin. Pir bi başî û dirêjî ve li ser rojgarîyên serdarîya vî Serdarî de hatîye bitomarkirin, ku ew ji yên bav û Kalên wî pir bêtirin. Şair Qetran xwedîyê nivîsta Qabosname pir bi dûr û dirêjî ve ser kar û barên wîyî pirî qenc û baş dayite binivîsandin. Herwehajî Mêjûvan Kurê Esîr li ser wî de dide biaxivtin û ew dibêje: Gava ku Artoxul Beg piştî vegirtina wî ji bona Tebrîz[64] di sala 446 k. de ew ji bona Kence hate bigihandin, Mîr Bavê Eswar Xwedanê Kence ji bona pêrgîbona wî bi pêşîyê çû û wî serî jê re danî û wî dilsozîya xwe jê re date biderxistin[65].

Di sala 456 k. de Bavê Eswar jî bi Xwedanê xwe ve hate bigihaştin. Li şûna wî de Kurê wî Minuceher cih wergirt, yê ku ew bi Fedil duwem ve bi nav û bang bû. Nivîsta Qabosname, ya ku ew di sala 468 k. de hatîye binivîsandin, ew bi navê Fedlun Kurê Bavê Eswar dihate binavkirin. Wer diyar dibe, ku serxwebûna Kurên Şedadî bi mirina vî Fedlunê ve tête biposandin û welatê Aran jî bi Şahînşahîya Selcoqî ve di pêla Melekşah de tête bipêvekirin.

Pir bi dujwarî agehdarî ve li ser vê Binemala hanê de têtin bibihîstin. Bi kurtî ve em dikarin bêjin, ku Fedlun bi xwe ve ew bi navê Mîrîyî Fedlunê duwem Minuceher ve hatîye binavkirin, yê ku Şair Qetran pesin û şabaş pêdane bikirin. Herwehajî ew Pehlevanê wan hemû çîrok û çîvanokanin, yên ku ew di Kabosname-Qabosname de hatine binivîsandin. Wisa tête bidiyarkirin, ku serdarîya vî Mîrê Pehlevan di herema Kence, Anî û Tuwîn-Diwîn de zal bû.

Ji lêgerînên Xanîkov tête biderkevtin, ku du Kurên Fedil Minuceher hebûn û ew Serdarê Kence bû, gava ku Melekşah Kence di sala 481 k. de date bivegirtin. Herwehajî Bavê Eswarê duwem Şawir li ser Anî de

[64]Mîrê Tebrîzê di vê demê de Mîr Mensur Wehsozan Kurê Mohemedê Rewadî bû. (M. E).

[65]Di Muncem El-Umran bergê 9, Rûpelê 190 de xebera vê Serbidanînê hatîye binivîsandin.

Serdar bû[66], gava ku Dawidê duwem di sala 518 k.- 1124 Z. de bajarê Anî ji xwe date bivegirtin.

Kurekî Bavê Eswar bi navê Mehmud ve hebû. Kurekî Mehmud jî bi navê Qayî Sultan ve hebû. Di vê dawîyî de li bajarê Anî de feršekî kevnî nivîsandî hate bidozandin, ku li ser wî de agehdarîyên pir bi nerx ve li ser Qayî Sultan de hatine binivîsandin. Li ser wî feršî de sala 495 k. hatîye bineqiškirin û li kêkelekê jî de navê Qayi Sultan Kurê Mehmud Kurê Šawir Kurê Minuceherê Šedadî hatîye binivîsandin.

Li ser ronahîya agehdarîyên vî feršê kevnî nivîsandî de em dikarin nav û salên Serdarên Kurên Šedadî bidin bitomarkirin:

1. Muhemd Kurê Šedad Kurê Karhu-Qerteq-Qerto: Ew di sala 340 k. de bi navê Fedlunê yekem ve li Kence de ji bona ser textê serdarîyê hatîye bihilkišandin.
2. Bavê Hesen Elî Kurê Caferê Leškerî ji sala 360-368 k. de serdarî daye bikirin.
3. Merzeban serdarî di sala 368 k. de daye bikirin.
4. Fedil Kurê Mohemed ji sala 375-422 k. de serdarî daye bikirin.
5. Bavê Fetih Musa Kurê Fedil ji sala 422-425 k. de serdarî daye bikirin.
6. Bavê Hesen Elî Kurê Musê Leškerî di sala 425 k. de daye biserdarîkirin.
7. Nušêrwan Kurê Elî Kurê Musa di sala 440 k. de daye biserdarîkirin.
8. Bavê Esawir Šawir Kurê Fedil Kurê Mohemed ji sala 440-456 k. de daye biserdarîkirin.
9. Fedil Minuceher kurê Šawir- Fedlunê duwem di Kence de.
10. Bavê Muzefer Fedlunê Sêyem di kence de.
11. Bavê Eswar Šawir Kurê Minuceher di Anî de.
12. Bavê Fetih Cafer Kurê Elî Kurê Musa- Ala? di sala 470 k. de daye biserdarîkirin.

[66]Gurcan di bin Serokitîya Dawidê duwem de di sala 518 k. 1124 Z. de bajarê Anî ji xwe re datin bivekirin. Ji vê mêjûwê û pê ve ev bajarê hanê bi Bajarekî Gurcî hate biveguhertin.

13. Muhemd Kurê Šawir Kurê Minuceher Kurê Fedil di Anî de.
14. Qayî Sultan Kurê Mehmud Kurê Šawir di Anîde di sala 495 daye biserdarîkirin.

## *Derîyê Pêncem*

## 5. Dewleta Dostekî û Merwanî li Diyarbekir de di sala 350-476 k. de.

### A. Dewleta Dostekî

Di sala 345 û 346 de wî Bešek ji welatê Cezîrê û bajarên Mesûd û Teblîš ji xwe re date bizeftkirin. Šeš salan di paš vê de Melazekerd, Mako û Gundên dor û berên Gola wanê jî wî ji xwe re dane bigirtin. Wî li cihê bajarê Adilcewaz de bajarê Šabazîš date biavakirin. Ev bajarê hanê di dawîya vêna de ew bi destên Melik Adilê Eyubî ve hate bikevtin. Melek Adil navê vi Bajarî ji nû ve date biveguhertin û ew care din bi navê Adilcewaz date binavikin.Di sala 355 û 356 k. de wî bajarê Arcîš û Du salan li paš vê jî de bajarên Diyarbekir, Mîyafarqnî, Ruha-Orfa jî ji xwe re dane bivegirtin. Hesenkêf, Cezîre, Botan, Seruc û Nisêbîn jî pê hatin bibestandin.Bavê Šuca bajarê Diyarbekrê ji xwe re bi N Di Navînî date bidanîn û ji bal Xelifê Begdadê Nav û Nîšana Bavê Šuca pê hate bidan. Di sala 360 k. de wî Du reng Pûl bi navê Šuca date bilêdan. Di sala 364 k. de wî Bešek ji Hekarê, Kawaš-Ardešt û di dawî de keleha Wanê jî ji xwe re date bigirtin.Di sala 367 k. de û di šerê di navbera Eded El-Dewle û Hemdanî de wî alîkarîya Leškerê Bohîmî kir. Gava Eded El-Dewle ji bona Musilê hat ew ji bona nik wî çû. Gava çavên Eded El-Dewle bi Baz ve hate bikevtin, ew bînteng bû û wî xwest , ku ew wî bi dizî ve linav bibe birin. Belam Baz bi pîsbûna dilê Eded El-Dewle ve hestkir û ew bi dizî ve ji Bajar derçû û wî xwe bi Leškerê xwe ve date

bigihandin.Bavê Šuca li paš mirina Ede El-Dewle de di sala 372 k. de li Rojavayî Musilê de û li cihê Zenkar de Leškerê xwe komkir û wî xwest, ku ew ji bona ser Musilê biçe.Di sala 383 k. de Semsam El-Dewle bi Leškerekî ve Bavê Seed Behram ji bona ser wî date binardin û šerekî baš di nava wan de hate bilidarbikevtin. sipahê Bohîmî hate šikenandin û Bavê Šuca tanî dergehê Musilê bi dû wan ve hate bikevtin. Ew ligel Peyê û Maqulên Bajêr de bi gift û goyê ve hate bikevtin û wî Sê Meh ji bona berdestbûna wan bêhn date dan. Wî Bešek ji Leškerê xwe di bin Komandarîya Mîr Elî Serdarê Fênik de li wir de bi ci date hištin û ew bi xwe ji bona Diyarbekir hate bivegerandin. "Pêškewtin 6".

Rêkxerê vê dewleta hanê Bazê Bavê Šucaê Kurê Dostek bû. Xwedîyî nisvîta Mêjûwa Musilê dibêje: "ku Bazê Kurd Bavê Eb-Dul-Lah Hisênê Kurê Dostek Mîrê Ešîra Hemidî bû. Ew bi Bavê Šuca ve dihate binavûbangkirin. Li gora Ibin-Kurê Xeldun de Bavê Eb-Dul-Lah Husên Birayê Baz bû û ew bi xwe nebû.

Baz yaxud Bad di xortanîya xwe de Šivan bû. Ew zor bi hiš û jîr bû. Ew pir destvekirî û merd bû. Qencî û merdî wî pir ji bona Perîšan û Hejaran dida bikirin. Nav û dengê wî bi destfirebûn û merdbûnê ve di wê navê de hatibû biberz û bibelavkirin. Car caran wî raw û rûtî jî didate bikirin û hercî jê bi destên wî ve bihata bikevtin, wî ew ji bona ser Reben û Sêwîyan dida bibelavkirin. Bi vî rengî ve xelkekî zor lê kom bûn. Nav û dengê wî roj bi roj ve bêtir dibû".

Ev goya hanê -li layê min de weha ye-, ku ew hatîye bihûnandin; çunke, bi hiš ve nayête bikevtin, ku Kurê Mîrê Ešireke gewre Šivanîyê û cerdetîyê bide bikirin. Çunke, Ev kar û barên hanê ji neçarîya pêwistîyê ve têtin bihelbijartin. Kurê Mîrê Ešîrekê xwe ji van rengên pêwistîyan bi neçarî ve dide bidûrkirin.

Rastî eveye, ku Baz-Bavê Šuca- bere bere hêz û hinera xwe date bifirehkirin. Wî leškerekî baš date bipêkanîn û wî dorhêla xwe date bizeftkirin. Pir pê neçû, wî hêrîš bi ser Ermînya ve date bibirin û wî Ercîš date bizeftkirin. Ev bajarê hanêyî pêšî bû, yê ku ew bi jêr destên wî ve hate bikevtin. Di dawîya vêna de bêtir û bêtir biserbikevtin wî ji xwe re dayite bigirtin. Bajarê Diyarbekir ligel Mîyafarqîn û dorhêla wê jî de bi jêr destên Baz ve hatin bikevtin[67]. Îš û karên Baz-Bavê Šuca hatin bidanîn û ew li çakî û pêšbikevtinê de bûn.

[67]El-Kamil, bergê 9, R. 15. -Weha di koka Kurdî de li nik Mohemed Emîn Zekî

Dibe, weku Husên Mukriyanî dibêje: bi hoyên rabûn û rûniştinên wê demê ve Baz yarmetîya leškerê Bohîmî date bidan, ji bona ku ew Texlubê Hemdanî bide bišikenandin. Bi vî rengî ve wî pêwendîyên dostanîyê di nava xwe û Eded El-Dewle de date bipeydakirin.

Bi rastî jî ve, gava bajarê Musilê bi destên Bohîmîyan ve hate bikevtin, Eded El-Dewle ji bona vî Bajarî hate bigihandin, Baz jî bi lez û bez ve ji bona dîtina wî çû.

Lêbelê gava ku ew ji civata Eded El-Dewle hate biderkevtin, Eded El-Dewwle ji Rûništvanan re date bigotin: Ev Mîrê hanê pir bi saw û tirs ve tête bidîtin. Ew ji bona dewletê metirsîyeke gewre dide bipêkanîn û jîyana wî ji bona wê pir bi zîyan ve tête bidîtin. Wî fermana girtina wî date bidan. Belam Šah Baz bi awira xweyî pêšî ve ligel Eded El-Dewle de bi dilpîsîya wî ve hest pê date bikirin û ew zû ji bajêr derçû û wî xwe bi leškerê xwe ve date bigihandin. (Zeyl Tecarub El-Umem-Zeyla Serpêhatîyên Netewan, b.3, r. 84 -87).

Li dawîya mirina Eded El-Dewle de di sala 373 k. de Baz-Bavê Šuca welatê Nisêbînê jî date bivegirtin û hêz û hinera wî di nava dor berên Musilê jî de diçû. Bi vî hoyî ve tirsê cihê xwe di nava dilê Semsam El Dewle de date bigirtin. Wî leškerek di bin Komandarîya Bavê Seîdê Behramê Kurê Erdešêr de date bilikarxsitin û ew ji bona ser Baz date birêkirin. Baz ji bona pêrgîbûna vî leškerê hanê çû û šerekî qurs û giran di navbera wan de hate biqewimandin[68]. Bavê Seîd zor xerab hate bišikenandin û zorî Serleškerên Bohîmî hatin bidîlkirin.

Di vê Salê bi xwe jî ve Semsam El Dewle leškerekî bi hêz û hinertir ve di bin Komandarîya Bavê Qasimê Seed Kurê Hacib de date bilikarxsitin û ew ji bona ser Baz date binardin. Herdu lešker li dola Xaburê Hisênîyê[69] de li cihekî de bi navê Bacelaya de li nêzîka bajarê Kewašî de berengarî hevbûn. Šerekî pir germ û giran di nava wan de hate bivêketin.

---

hatîye, belam li nik Elî Ewnî de di rûnkirinê de ji dêlva R. 15, Rupelê 130 hatîye. Cuma

[68]Çavîyên Erebî li ser cihê vî šerî de nadin biaxivtin. Bes û bi tenha Seyid Husên Mukriyanî dibêje, ku ev šerê hanê li Zenkar de hatîye bikirin û ew li Rojavayî Musilê de tête bikevtin

[69]Yanî Xaburê, ku ew bi Çemê Diclê ve tête bigihaštin. (M. E.).

Dîsan leškerê Bohîmî hate hate bitarûmarkirin. Zor li wî de hatin bikuštin û pir Dîl lê hatin bigirtin. Leškerê mayî xwe bi Musil ve date bigihandin.

Pištî ku Baz Dîl ji bona paš xwe datin binardin, ew bi xwe û leškerê xwe ve bi šûn mayên Deylemî ve tanî dor û berên Musilê hate bikevtin. Jiber ku xelkên bajarê Musilê ji zor û sitema Deylemîyan bê zar bibûn, wan ev rewša hanê bi kês ji xwe re datin bidîtin. Ew di rûwê Deylemînan de hatin birabûn û wan bajar ji bona Baz datin berdestkirin.

Šah Baz li dawîya cîgirbûnê li Musil de dest bi komkirina leškerekî ve date bikirin û wî xwe ji bona šer dida bilikarxsitin. Wî dixwest, ku ew Begdanê ji xwe re bide nivegirtin û Xilafetê ji binkêra Deylemîyan bide birizgarkirin. Gava ku Semsam El-Dewle ev xebera hanê date bibihîstin, saw û tirsê ew date bigirtin. Wî zû leškerekî bi hêz ve date bikomkirin û ew ji bona Ziyarê Kurê Šehra Koye date bidan, yê ku ew ji Gewretirîn û bi nav û bangtirîn Komdarên Kurdên Deylemî bû. Ziyar bi leškerê xwe ve berê xwe ber bi Musile ve date bivedan. Baz bi leškerê xwe ve ji bona pêrgîbûna pêšîya wî çû. Di navbera wan de šerekî pir bi tîn ve hate bidadan. Di Encam de Baz hate bišikenandin, zor telefatî pê hate bikevtin û jê jî gelek hatin bidîlkirin[70].

Baz-Bavê Šuca li dawîya šikenandina xwe de ji bona Diyarbekrê - hate bivegerandin. Ziyar qolek ji leškerê xwe di bin Komandarîya Seed Hacib de ji bona ser Cezîrê date binardin û qolekî din ji bona ser Nisêbînê date birêkirin. Belam ev herdu qolên hanê ji fermana wî hatin biderkevtin û ji bona ser Baz-Bavê Šuca neçûn.

Gava ku ev xebera hanê bi guhê Semsamê El-Dewle ve hate bikevtin, wî bi lez û bez ve ligel Seed El-Dewle Kurê Seyf El-Dewle Kurê Hemdanî Serdarê Helebê de date bipêwendîkirin. Ew hatin bilihevhatin, ku Seed El-Dewle bi leškerê xwe ve ji bona ser Baz bide bihêrîškirin û wî bide binabûdkirin. Beramber bi vê ve wî dana Diyarbekîrê ji bona wî date biqewildan. Belam bi leškerê Helebê ve hîç pê nehate bikirin.

Gava ku ev Seed El-Dewle wetov date bizanîn, wî xwest, ku ew bi fêlbazî ve Baz linav bide bibirin. Wî Peyakî xwe ji bona ser wî date binardin. Ev Peyê hanê her çawa bû, wî xwe bi nava leškerê Baz ve date

[70]Husên Mukriyanî dibêje, ku ev šerê hanê li nêzîka Tekrîtî de hatiye biqewimandin û têde Leškerê Deylemi hatiye bišikenandin.

bigihandin. Wî xwe di bin pošandina tarîya ševê de bi çadira Baz ve date bigihandin û wî xwe ji bona nava wê date biavêtin û di wê šerpezyê de wî šurek li lingê wî de date bidawišandin û bi lez û bez ve wî xwe date bikišandin û wî date bibazdan.

Pištî demekê ku birîna Baz baš bû, wî ligel Ziyar û Seed date bdan û bisitendin. Di nava wan de lihevhatin bi vî mercî ve hate bikirin, ku di nava destên Baz de tevaya Diyabekrê û nîvê herema Tor-Abidîna Çiyayî bête bihištin. Li ser vê lihevhatinê de Ziyar Perçeyek ji leškerê xwe di bin Rêberîya Seedê Hacibî de li Musilê de date bihištin û ew bi xwe ve ji bona Bagdadê hate bizîvirandin[71].

Di sala 377 k. de 987 Z. de dîsan Šah Baz leškerek date bikomkirin û wî rûwê xwe ber bi Musilê ve date bivedan. Lihev hate birasthatin, ku di wê navê de Seed Hacibî hate bilinavçûn û Šeref El-Dewle Melkê Begdadê Bavê Xuwašaze ji bona serdarîkirina Musilê date bišandin. Gava ku pîyên Bavê Nesir Xuwašaze bi Musilê ve hatin bikevtin, wî bi çavên xwe ve hêz û hinera sipahê Šah Baz date bidîtin. Wî bi lez û pele ve hewar ji Šeref El-Dewle date bixwestin. Belam Šah Baz ew pir date bitengavkirin. Ew neçar bû, ku ew hewarê ji Ešîrên Erbên Ibin-Kurê Uqeyil û Beni-Kurên Nemîr bide bixwestin. Bi rastî jî ve šerekî zor germ û bi tîn ve van herdu Ešîrên Ereb ligel leškerê Deylemîyî Baz de dane bivêxistin. Baz di bin Rêberîya Birayê xwe de baštirîn qolê leškerê xwe bi ser wan ve date binardin. Belam di vî šerê germ û giran de leškerê Baz hate bišikenandin û Birayê wî jî hate bikuštin[72]. (ji xwe re li Ibin-Kurê

[71]Mêjûwa Musilê di Rûpelê 127 de li ser alîkarîya Seed El-Dewle de nade biaxivtin. Ew bes û bi tenha ve dibêje, ku Peyak ji bal Zîyar ji bona kuština Baz hatibû binardin.

[72] Husên Mukrîyanî di 6-Pêškewtin de dibêje, ku Telîe El-Dewle Birayê Baz di šer de hatebi kuštin, belam dîsan Lešerkerê Baz hate biserbikevtin.

Nivîsta Tecarub El-Umem-Serpêhatîyên Netewan bergê 3, Rûpelê 145 dibêje: "ku Baz xapandineke pir kon û hozan di vî šer hanê date bikaranîn. Wî pê Dil û ceger li Dujminan de date bilerizandin. Wî li serên qotên Çiyan de ga li kêlekên Peyên xwe ve bi šûrên çurusandî ve di nava destên wanî bilindkirî de date bidanîn. Van šûrên hanê li serên wan qotên Çiyan de bi lêdana tîrêjên Rojê ji bona wan ve weha dihatin bicurusandin, ku ew tevde bi Serbazan didan bidanîn; jibervêjî di kabokên Dujmin de ji tirsa rewa di wan de nema û ku ew xwe bi serên qotên Çiyan ve bi ser wan ve bidin birakišandin. Lêbelê Telîe El-Dewle Birayê Baz xwe bi ser wan de date berdan û ew di šer de hate bikuštin

Esîr bide bitemašekirin. M. E. ). Di sala 379 k. de du kes li Kurên Nasir El-Dewleyê Hemdanîyên Surî de yek bi navê Bavê Tahirê Ibrahîm û yê din bi navê Bavê Eb-Dulahê Husên ve ji Begdadê hatin û wan leškerek ji Erebên Kurên Uqeyil û Nemîr dane bilidarxistin û wan dixwest, ku ew pê ji bona ser Musilê herin. Belam tirs bi wan ve hate bikevtin û wan newêrî bûn, ku ew hêrîša xwe bi ser Musilê ve bibin bibirin.

Li paš de wan pena xwe ber bi layê Mohemedê Kurê Musîbê Mîrê Ešîra Uqel ve dane bibirin. xelkê Musilê jî bi dizî ve ligel Bavê Tahirê Ibrahîmê Hemdanî de birêkkevtibûn. Herwehajî rêkkevtinek di navbera Kurê Musîb û Kurên Hamdanî de hatibû bigirêdan, ku li gora wê rêkkevtinê de Musil û dor û berên wê ji bona Hemdanîyan bête bihištin û Nisêbîn û Cezîrê ji bona Misîb bêtin bihitšin.

Lešekerê Hemdanîyan ji Rojhilat ve û Ešîra Kurên Uqeyl ji Rojava ve rûwên xwe ber bi Musilê ve dane bivedan û xelkê Musile jî di rûwê Baz de hatin birabûn. Leškerê Šah Baz ji Rojhilatî Musilê ve berê xwe ber bi leškerê Hemdanîya ve date bivedan. Wî zor ji leškerê Hemdanîyan date bikuštin û ew tanî Rojavayî bajêr bi dû wan ve hate bikevtin. Di vê bêhnê de xelkê Musilê dergehên bajêr ji bona Misîb dane bivekirin û ji pišt hêrîš bi ser leškerê Kurd ve dane bidadan. Di vî šerî de Baz hate birîndarkirin û ew bi vê birîna xwe ve di 2 cemada duwem de di sala 380 k. de pê hate bimirin. Leškerê wî li paš mirina wî de bê Xwedî û Xwedan hate bimayîn. Ew hate bišikenandin û ew ji bona Diyarbekrê hate bivegerandin[73].

---

[73]Di Nivista El-Kamil de di B. 9, R. 26 de û herwajî di Zêla Serpêhatîyên Netewan de rûdanên vî šerê dawî bi rengekî din ve didin bixuyanîkirin:
Bi destên kurên Hemdanî ve Musil hatibû bikevtin. Baz jî xwest, ku ew ji vê kêsê gelk ji xwe re bide wergirtin û ew Musilê ji xwe re bide sitendin. Wî Leškerekî zor ji xwe re date komkirin û herwehajî Kurdên Bašnawî yarmetiya wi dane bikirin.

Šairê Merwanîyî Husênê Bašwanî di vî wari de bi Çend malikên Erebî ve dibêje, gava ku Bešwanîyan Xwedyî keleha Fênih yarmetiya Xalê xweyî Baz dane bikirin:
Bešnewî ji bona dewleta we vane yaridarin,
Sivik mîna wan ne ji Ereb û nejî Ecem nînin.
Havalbendên Baz ji Ercîšê û hêla wê ne,
Li Hedbayê ew likarin, li pesarê Musilê ne.

Šah Baz bi Leškerê xwe ve ji alîyê Rojhilat ve dora Mûsilê date bigirtin. Kurên

## B. Dewleta Merwanî

Bavê Eliyê Hesen Kurê Merwan Kurê Dostek bû, mîna ku ew di bergê duwem de di Wefiyat El-Eyan-Mirina Zadexanan de hatîye binivîsandin[74]. Li dawîya šerê Musilê de Elîyê Hesen ji Mamê xweyî Baz

Hemdanî û Bavê Zewadê Mohemedê Kurê Museyîb jî ji nava Bajêre ve wan rûwên xwe ber bi Baz ve dane bivedan û ew di rûbar de têperbûn. Bešekîtir jî ji 2000 Siwar ji Erebên Kurên Uqeylî jî di Jorî Musilê de di rûbar de têperbûn û wan jî berê xwe ber bi Baz ve dane bivedan.

Gava ku Baz bi van livandinên Leškerên berambri xwe ve hate biagehdarkirin, wî xwest, ku ew rewša xwe bide baškirin. Wi xwest, ku ew xwe ji bona Çiya bide bigihandin. Belam dem kurt bû, ev pê nehate kirin. Rewš û zîneta Leškerê wî hate bišerpezekirin.

Wî hevsarî Hespê xwe date biberdan û wî bi zengo lê date xistin. Hespê wî hate lukumandin û ew ji ser Hesp xwe hate bengizandin û gelek cih ji lašê wi hate šikenandin. Pîs ew hate birnîdarkirin. Di vê bikevtina hanê de Xwarzayî wî Bavê Elîyê Hesen Kurê Merwan xwe bi ser ve date gihandin û wî jê got: De were suwar be, ta ku ez te bi Lešker ve bidim gihandin. Baz jê re got: Hûn herin û waz li min bînin. Ez temam bûm. Bavê Elî neçar bû, ku ew wî bi ci bide hištin û ew xwe ligel Pêncsed Suwari ve bi çiyê ve xwe bide gihaštin û xwe li wêderê de bide penakirin.
Di dawî vêna de Mirovekî ji Kurên Uqeyl çavên wî di nava Birîndaran de bi Baz ve hate bikevtin û wî ew date naskirin. Hêjî Baz sax bû. Wî Mirovê hanê bi bê insafî serê Baz bi saxitî date jêkirin û wî Serê wî ji bona Kurên Hemdanîyan bir. Li paš jî de wî Termê Baz bi wan date nîšandan. Kurên Hemdanîyan Dest û Lingnê wî jî datin jêkirin û ew ligel serê Baz ve bi hev re ji bona Begdadê dane rêkirin û Perçê mayî ji lašê wî wan bi Dergehê Mîrnešînîya Musilê ve dane vekirin.

Vê dir û hovîtîya hanê dilê xelkê Musilê pir date šikenandin û wan date hewarkirin, ku çawan Mirovekî qencî wehayî bi nav û bang ji bona kar û barên Musulmantiyê bi vî rengî ve ligel wî de bête reftarkirin?

Wan Termê wî ji Dergeh datin daxtin û wan ew bi šêweyekî pir mehrebanî, dilovanî û hêjabûn ve dan vešartin... Vê bi xwe jî date derxistin, bê ka çend xelkê ji baz dida hezkirin.

[74]Çavî di Xwarzîtî yanjî Birazayîna Elîyê Hesen de ji bona Baz têtin cudakirin. Li nik Kurê Meskowîyê û Kurê Esir de Elîyê Hesen bi Xwarzayê Baz ve tête

hate bicihêbûn. Ew ligel mayê leşker de li paş bihîstina kuştina Mamê xwe de ji bona keleha Hesenkêfê hate bivegerandin. Keleha Hesenkêfê zor asê bû û ew li qeraxa ava Diclê de dihate bikevtin.

Jinapa wiyî Deylemî di vê keleha hanê de bû. Wî jê re xeber date binardin, ku Apê wî hin tişt ji bona wê bi wî ve dane bisipartin, da ku ew wan pê bide bidan. Ew dixwaze wê bide bidîtin. Amojîna wî pê date bibawerkirin. Wê jê re dergehê kelehê date bivekirin û ew ji bona cem Amojîna xwe çû. Wî biserhatîya Mamê xwe ji Jîna wî re date biveguhertin. Wî jê pêşûnkirina wê ji bona xwe date bixwestin. Wê xwestina wî ji bona xwe date bicihanîn. Wî bi vî rengî ve Jîna Mamê xweyî Baz date bimarkirin û keleha Hesenkêfêyî pirî asê bê xwînrijandin ji bona jêrdestîya xwe date bixistin[75].

Di Dawîya vêna de wî bere bere dest bi komkirina leşkerê Mamê xweyî belavkirî ve date bikirin. Wî ji nûve dewleta Dostekî hêdî hêdî ji xwe re date bisaxkirin. Hemû Serokên Kurdistanê bê şer û zikreşî pişta wî dane bigirtin û serên xwe jê re bi dil û can ve datin bitewandin. Hêz û desthilatîya wîna roj bi roj ve ber bi bilindbûnê ve dihate bihildan.

Kurên Hemdanîyan li paş biserbikevtina wan de di Musilê de date bixwestin, ku ew mayînên welatên Dostekî ji xwe re bidin bivegirtin. Wan bi vê remanê ve leşkerekî gewre ji xwe re dane bikomkirin. Ew ligel leşkerê xwe û Serê Baz de rûwên xwe ber bi Diyarbekrê ve dane bivedan. Weha wan didane bibawerkirin, ku welat bê Xwedî û Xwedan tête bidîtin û ew dê bi wan ve zû bête bizeftkirin. Lêbelê ev bîr û bawerîya wan bi ser û binê xwe ve hîç û pûç bû. Çunke, Bavê Elî cigehê xwe gelekî dabû biqayimkirin. Wî tevaya mayînên leşkerê Mamê xwe bi serhev ve dabûn

bidanîn.

Ji di hin Çavîyan de ew bi Birazayê Baz ve tête biderkevtin; jiber ku Bavê Baz, Bavê Merwan û Bavê Elî jî bi Dosetek têtin binavkirin. Mebest ji vê tête biderkevtin, ku Bavê Baz û Bavê Merwan Birayê hev bûn. Lêbelê Xwehek Baz ji Bavekî din hebû. Merwanê Birayê Baz ew Xweh ji xwe re anî. Bi vî rengi Baz ji bona Elîyê Hesenê Kurê Merwan re him Mam û him jî Xal bû. Bi vî corî ew cudabûna di nava Çavîyan de li ser Elîyê Hesenê Kurê Merwan de hate hilanîn. Binavkirina dewleta wan bi Dostekî ve rastir ji binavkirina wêna bi dewleta Dostekî û Merwanî ve tête biderkevtin. (M. E.).

[75]Di vê Markirina Jinapa xwe de Elîyê Hesen dixwest, ku ew Memleketê bide parstin.

bicivandin û leškerekî bi rêk û pêk ve û hêjî bi serdejî ve pir bi rêxistî ve dabû bipêkanîn.

Li layekî tirjî de zor û sitema Hemdanîyan, pîsbûn û zordarîya serpereštîya wan ji bona xelkê û li berrabûna xelkê de di rûwê Hemdanîyan de beramberî vê sitemkarîyê kar û barên Bavê Elî beramberî Hemdanîyan date bisivikkirin. Di dawî de Bavê Elî ligel leškerê xwe ve hêrîš ji bona ser leškerê Hemdanîya date bidadan. Šerekî germ û giran û pir bi tîn ve di nava wan de hate bilidarxistin. Wî kuštarekî zor li Hemdanîyan de date bikirin û wî ew pir pîs datin bišikenandin. Wî Bavê Eb-Dulahê Hemdanî jî bi dîlitî ve date bigirtin. Belam wî zor lê rûmet û rêz date bigirtin û wî ew date biberdan. Bavê Eb-Dulah ji bona layê Birayê xweyî Bavê Tahir çû, yê ku ew di wê dema hanê de bi dorlêgirtina Diyarbekirê ve mijûl bû[76]. Wî ji bona Birayê xwe date bišîretkirin, ku ew ligel Kurên Merwanîyan de bête birêkkevtin û bilihevhatin; çunke, jê re pir bi dujwarî ve tête bidîtin, ku ew di dereqeta wan de bête biderkevtin. Belam Bavê Tahir bi amojgarîyên Birayê xwe ve guh pê neda bikirin. Ew li ser šerkirinê de pêde çû. Wî ji Erebên Kurên Uqeyl û Numeyrî leškerekî zor bi hêz û hiner ve date bipêkanîn. Birayê wî Bavê Eb-Dulah jî neçar bû, ku ew yarmetîya wî bide bikirin.

Bavê Elî bi leškerekî baš ve di 11 sefer de di sala 381 k. de rûwê xwe bi ber wan ve date bigirtin û herdu lešker berengarî yek bûn[77]. Ašê šerekî gewre û pirî giran di nava herdu leškerên berengarî hev de hate bigerandin. Lešekerê Hemdanîya vê carê jî pir pîs hate bišikenandin û ew pir perîšan bû. Vê carê jî Bavê Eb-Dulah careke din jî bi dîlîtî ve ji bona nava destê Bavê Elî hate bikevtin. Vê carê wî tu rû bi Bavê Eb-Dulah pê neda bidan, mîna ku wî cara pêšî rû û rûmet pê dabû bidan. Pir bi sertî ve wî bermarî wî date bireftarîkirin û wî ew ji bona binê zindana Diyarbekrê date biavêtin. Ev reftarkirina hanê beramberî bi wî ve rast û durust bû;

---

[76]Li gora Seyid Husên Mukriyanî de divê Bavê Ebu-Dulah ji bona Musile hatibe bivegerandin û wî li wêderê de Birayê xweyi Tahir dabe bidîtin. Belema ev goya hanê li gora goyên Kamil û Nivista Serpêhatîyên Netewan de nayête biderkevtin.

[77]Seyid Husên Mukriyanî di Pêškewtin de, Belavoka 6 de dibêje: ku Bavê Elî li Diyarbekrê de bû û wî ji wir bi Leškerê xwe ve rûwê xwe ber bi Musilê de date vedan û ew li nêzîka Zenkar tûši wan bû.

jiber rûmeta Peyatiyê rê pê nedida bidan, ku ew careke din beramberî wê reftarkirina başî Bavê Elî şûrê xwe di rûwê wî de ji kalanê wî bide bihilkişandin.

Li dawî de Melekê Misrê di nava wan de hate bikevtin. Wî çend Mele bi diyarîyan ve ji bona nik Melek Bavê Elî date binardin. Wî hêvîya berdana Bavê Eb-Dulah jê date bikirin. Bavê Elî nexwest, ku ew hêvîya Patîşahê Misrê bide bişikenandin. Wî ew bi mercê nemana wî ve ne li Xakê Kurdistan û Iraqê de date biberdan. Wî ew ligel Melên Misrê de ji bona Helebê date binardin[78].

Debera, em careke din ji bona ser Bavê Tahirê Hemdanî bêtin bivegerandin. Ew li paş şikenandin û perîşanîya xwe de ji bona bajarê Nisêbînê revya. Li wêderê de dostê wîyî kevnar Mohemedê Kurê Musîbê Mîrê Kurên Uqeylî Bavê Tahir date bidîtin, yê ku ew bê desthilat û hêz bû. Wî ji xwe re ev lawazîya Bavê Tahir bi kês ve date bizanîn. Wî xwe bi ser Bavê Tahir, Kurê wîyî Elî û Muzeferê[79] Mîrê Kurên Numeyir ve ango dostên donê ve date bidadan û wî ew hemû girtin û wî ew dane bikuştin. Li dawî de ew ji bon ser Musilê çû û wî ew jî ji xwe re date bigirtin[80]. Wî ji bona Sultanê Begdadê Beha El-Dewle date binivîsandin û wî jê daxwaza nîşankirina Serdarekî ji bona Musilê date bikirin. Ji Begdadê Muzeferê Bavê Husênê Eb-Dulah hate binîşankirin. Di destê vî Serdarê hanê de ji bil komkirina bac û peran pêve bêtir nebû. Hemû kar û

[78]Weha di kokê de hatîye. Belam rastîya wêna mîna ku ew li nik KurêEsîr de hatîye, ku ew ji bona Misr hatêye binardin û li paş de ew ji bona Serdarîkina Helebê hatîye birêkirin û ew li wir de tanî mirina xwe maye.

[79]Weha di Ibin-Kurê Esîr de hatîya. Belam di Zêla Serpêhatîya Netewan de bi navê Zeferanê Mîrê Kurên Numeyrî hatiye binivîsandin. (M. E.).

[80]Her Ev Nivîsanê hanê dibêje, ku li dawîya vî şerî de Bavê Elî li Heştê Rebîê Yek de ji bona nava Musilê hate bikevtin. Wî Navnîşa Padşahîyê bi xwe date dan û wî Pûl jî date bilêdan.

Di Meha Cemada Yek de wi bihîst, ku Bavê Zewadê Mohemed Kurê Misîb ji bona ser Nisêbînê çûye. Dest bi cî ve wî Leşkerek ji bona ser wî date binardin. Wi ew zor xerab şikandin û koştareke zor li Kurên Uqeyl de date kirin.

Li paş vî şerê hanê de Padşahê Merwanî îş û karên Musilê baş rêk û pêkxist. Wî Yekek ji Serdarên xwe, ku bi navê Erde Şêrê Kurê Horez bû, li ser Musilê de bi serdarî ve date bidanîn. li Paş vê de ew ji bona Diyarbekir hate bivegerandin.

barên din bi carekê ve di destên Mohemedê Kurê Musîb de dihatin bidîtin.

Melek Bavê Elî bi rûxwešî û dadwerîyê ve deng û nav ji xwe re dabû bisitendin. xelkê ew zor xweš dixwest. Bi tenha ve xelkê Mîyafarînê di rûwê wî û Peyên wî de hatin birabûn. Ew roja cejnê bi ser wan de çû û ew ji bona nava bajêr hate bikevtin û Komandarê wî Bav Seqir jî ji nava bajêr date hêrîškirin, gava ku ew tevde li cihekî derveyî bajêr de bi navê Meslayan de hatibûn bikomkirin. (El-Kamil, b. 9, r. 27).

Insiklopêdîya Musulmantiye di b. 2 de dibêje, ku Bavê Elî Serdarî û desthilatîya xwe bi Xelatê, Melazgerd, Ercîš û tanî welatên Jorî Rojhilatî gola Wanê ve date bigihandin. Li alîyê Rojava de di demekê jî de wî serdarîya xwe tanî Orfa didate bibirin. Wî ev bajarê hanê di sala 381 k. de ji nava pencên Imperatorê Romê Basilê duwem date biderxistin, gava ku wî di welatê Surî de dida bišerkirin.

Bavê Elî di sala 387 k. de[81] Keça Seed El-Dewleyê Kurê Seyf El-Dewleyê Hemdanî Serdarê Helebê ji xwe re date bimarkirin. Navê vê Keça hanê Sit El-Nas bû. Ji Helebê Bûk ji bona Bavê Elî hate binardin. Wî xwest, ku ew šahîyê li Diyarbekirê de bide bikirin. Gewreyê xelkê Diyarbekrê Eb-Dul-Ber hate bitirsandin, ku Melekê Merwanîyan dê bi wan ve wî îšî bide bikirin, yê ku wî ew bi serê xelkê Miyafaqînê ve date bianîn. Bi vê remana hanê ve wan jê re tepek datin bidanîn. Gava ew ji bona nava bajêr hate bikevtin, ew ji bal Serserîyê Kurê Dumne de hate bikuštin[82]. Pir xelk û Kolên Bavê Elî berên xwe ber bi Mîyafarqînê ve dane bivekirin. Hinekan ji Dilbijvanan jî çavên xwe ji bona ser textê Bavê Elî dane beliqandin.

---

[81]Ibin-Kurê Esîr li ser vê rûdana hanê de di nava bûyînên sala 380 k. de dide nîšandan. Lêbelê Insiklopêdîya Musulmantîyê vê rûdanê di sala 387 k. de dide derxistin û herwehajî ew mirina Bavê Elî jî di vê Salê de dide bidanîn.

[82]Li gora El-Kamil de Eb-Dul-Ber pišti vê tawankarîya hanê de Keça xwe li Kurê Dumne date markirin. Vî zavayê Mêrkuj û Bedbunyad li dawîya çend rojan de Xezûrê xweyî nemûbarek jî, yê ku ew pir bi serdarîyê ve hatibû bimijulkirin, date bikuštin. Demekê wî bajarê Diyarbekrê bi destên xwe ve date xistin û wî ji xwe re Košek date bidurustkirin. Wî ligel Mumehed El-Dewle û dewletên Dirwasên xwe de pêwendîyên baš date bidurustkirin. Wî tanî zemanê Nesir El-Dewle de date biserdarîkirin.

Belam Parêzgêrê kelehê di nav nîvê nêta Dilbijanvanan de hate bigihaştin. Wî ji bona wan date bigotin: Heger Melek sax be, li gelî de hûn dikarin ji bona kelehê bêtin biserbikevtin. Heger ew linavçû be, ji her kesî baštir ji bona cihê wî Birayê wîyî Momehed El-Dewle Bavê Mensur bi xwe ye. Ewende pê neçû, bi lez û bez ve Bavê Mensur bi cih ve hate bigihaštin û ew ji bona ser textê Bavê Elî hate bihilkišandin û ew bi Padšah bû[83].

## Bavê Seîd Mensur Mumehed El-Dewle

Bavê Seîd Mensur Mumehed El-DewleBavê Seîd Mensur Mumehed El-DewleBavê Seîd Mensur Mumehed El-Dewle

Bavê Mensur li dawîya mirina Šah Baz de ji bona Mîyafarqîn hate bivegerandin û tanî mirina Bavê Elî ew Serdarê wê navê bû. Pištî kuština

[83]Seyid Hisênê Mukriyanî dawîya Seletena Bavê Elî bi rengekî din ve li ser dide biaxivtin û ew dibêje:
"Elî Šah ji bal Xelîfê Ebasî ve Navnîšana Fexir El-Dewle pê hatibû dan. Ew tanî sala 394 k. de ligel Kurên Bohîmî de hatibû rêbikevtin û wî gotina roja înê bi navê Xelîfê Ebasîyê El-Qadir Bil-Lah ve di Mizgeftan de dida xwendin.

Li sala 403 k. de wî ligel Šeref El-Dewleyê Bohîmî de ji bona ser Erebê Kurên Esed û Qerawîš çûn.

Di ševa Îna 11 Sefer de Fexir El-Dewle Melkê Diyarbekrê di nava çadirê de hate bikuštin. Kesekî nizanî bû, ku Kuštvanê wî ka kî ye. Li ser vê rûdana hanê de Leškerê Kurd Musil çolkir û ew ji bona Diyarbekrê hate bivegerandin.

(Seyid Husên çi li ser van mêjûwan de û çi jî li ser dawîya Bavê Elî de bi cudabûna El-Kamil û Insiklopêdîya Musulmantîyê ve daye biaxivtin).

Bavê Elî li Mîyafarqinê de ew bi lez û pele ve ji bona keleha wê hate bigihandin û ew bi Padšahê ve ji bona ser textê welatê Merwanî hate bihilkišandin. Li gora mêjûwa Bavê Fida wî tanî sala 402 k. de daye biserdarîkirin.

Em pir li ser pêla vî Padšahê hanê de nizanin. Pir kêm di El-Kamil de belam bi taybetî ve li ser sala serdarîya wîyî dawî de û nemana dewleta wî de hatîye binivîsandin:

"Bavê Mensur bi navê xwe ve pûl ji xwe re lê didate bidan û gotina roja înê bi navê xwe ve di Mizgeftan de dida bixwendin. Dostekî wîyî bi navê Šerowê Kurê Mame hebû, yê ku ew Serdarê bajêr bû. Peyakî vî dostê hanê Serokê Polîsê bajêr bû. Momehed El-Dewle ji çarê vî Peyê hanê nedida biheznkirin û wî dixwest, ku ew wî bide bikuštin. Belam ji bona xatirê Axayê wîna wî waz lêhêna. Peye li nefreta Bavê Mensur de agehdar bû. Wirde wirde wîna di nava Axê xwe û Padšah de date bitêk û bipêkdan. Šero li keleha Hetax[84] de mêvandarîyek ji bona Bavê Mensur date bilidarxistin. Ev keleha hanê Mulkê Šero bû.

Gavê pîyên Bavê Mensur bi kelehê ve hatin bikevtin, bi gora raspêrtina Šero ve Pasewanên Gurcîyî kelehê hêrîšî ser wî kirin û ew di sala 402 k. de dane bikuštin.

Pištî kuština wîna Šero ji kelehê hate biderkevtin û wî Pismamên Momehed El-Dewle dane bigirtin. Li dawî de wî rûwê xwe ber bi Mîyafarqinê ve date bivekirin. Ew bi çiran û šêweyê hatina Padšahîyê ve xwe bi dergehê bajêr ve date bigihandin. Pasevanan wer dizanîn, ku bi rastî ve Pašdah bi xwe ye. Destbicî wan dergeh date bivekirin. Šero keleh ji xwe re dat bigirtin. Wî ji bona Komandarên kelehên din date binivîsandin û bidaxwazkirin, da ku ew jê re serên xwe bidin bitewandin. Herwehajî wî Peyakî xwe ji bona keleha Erzen-Xerzan date binardin û wî ji Parêzgêrê wê Xoce Bavê Qasim hatina nik xwe jê date bixwestin û berdestkirina kelehê jî jê ji bona Peyê xwe date bidaxwazkirin.

Belam Xoce Bavê Qasim keleh ji bona wî Peyê hanê neda biberdestkirin û ew ji bona Mîyafarqinê çû. Di nîvê rê de wî xebera kuština Momehed El-Dewle date bibihîstin. Ew careke din ji bona Erzen hate bivegerandin. Bi lez û bez ve wî xeber ji bona Serdarê Sêrtê Bavê

---

[84]Niha ji bona vê kelehê navê keleha Licê tête kirin. Ew li Wilayeta Diyarbekrê tête bikevtin. Wehajî Mirîyê Dilovanê Seîd Pašayê Diyarbekrî di Nivista xweyî Mur-at El-Iber de bi Zimanê Turkî ve dayite binivîsandin. (M. E.).

Nesir Birayê Mumehed El-Dewle date binardin. Bavê Nesir[85] ji bal Momehed El-Dewle Birayê xwe de bi taybetî ve hatibû bidûrxistin; jiber ku wî hez li çarê wî de ne dida bikirin û ew ligel wî de pir xerab bû[86].

## Melek Adil Nasir El-Dewle Ehmed

Vî Mirovê hanê ji sala 402 tanî 453 k. de dayite biserdarîkirin. Ew di her warekî de pir gewre û bi nav û bangtirîn Padšahê Merwanî bû û wî bi dadwerîyê ve nav û bang ji xwe re dabû bisitendin. Kurê Esîr [87]dibêje: Gava ku Xoce Bavê Qasimê Serdarê Erzen ji bona šûna Mîr Ehmed dabû binardin, Nivîsvanê Ehmed jê date bipirsîn, magelo dê tu bikaribe bi vî kar û barê hanê ve bête birabûn? Mîr Ehmed jê re date bigotin: belê ez dê bi vî karê hanê ve bikaribim birabim!

Li layekîtir de Šero bi pele ve hêzek bi ser wî ve date binardin. Belam li pêš gihaština vê hêza hanê de ji bona dergehê Sêrtê Mîr Ehmed ji bona Erzen hatibû biderçûn. Li wêderê de ji nûve Šero zanî, ku îš xerab bû.

Di wê gavê de lihev hate birasthatin, ku Merwanê Bavê Momehed El-Dewle ligel Pîreka xwe de li Erzen bû û ew herdu li ser goristana Bavê Elî de rûništîbûn. Xoce Bavê Qasim ligel xwe de Bavê Nesir Ehmed ji bona nik Bavê wî bir. Wî ji Bavê wî date bixwestin, ku ew sund bide bixwarin, ku ew dê bi dadwerî ve bide biserdarîkirin. Qazîyê Erzen û çend Bînvanên din jî li wir de amedebûn. Li paš sundxwarinê de wî Kilîta keleha Erzen pê date bidan. kelehên dinî welatên Merwanî yek li dû yek de bi bin destên wî ve hatin bikevtin. El-Kamil, b. 9).

Pištî ku Melek Nasir El-Dewle di nava sînorên welatê xwe de kar û barên xwe bi rêk û pêk ve date bixistin û dadwerî û xwešitî di sernaserî

---

[85]Seyid Husên Mukriyanî berovajî Kurê Esir dibêje: di dema kuština Bavê Elî de Nesir El-Dewle Ehmed li Diyarbekrê bû û ew Šûngirê wî bû. (Balavokên 6, El-Kamil). Ew li ser Mumehed El-Dewle de nayête biaxivtin.

[86]Di El-Kamil de B. 9, R. 28 de hatîye: ku hoyê vê nexwešiya hanê di navbera herdu Biran de Xewneke Mumehed El-Dewle bû. Wi di Xewna xwe de dabû bidîtin, ku Roj ji bona nava baweša wî hatibû bikevtin. Belam Bavê Nesir hêrîš bi ser de date dadan û Roj jê date bisitindin.

[87]Ji xwe re li B. 9, R. 28 de bide bitemašekirin. (M. E.).

xakê Merwanî de date bicihanîn[88], wî di sala 410 k. de ji bona Istenbolê, Misirê û Begdadê Wênerên xwe date binardin.

Wî Kurê xwe Mîr Sulêman li Šûna xwe de date binavkirin û wî ew ji bona Cizîrê û Botan date biserdarkirin. Wî ji bona xwe Mîyafarqîn-Silivan bi paytext date bidanîn,. Belam gelek caran jî ew ji bona serdana bajarê Diyarbekir diçû û ew nêzîka mehekê li wir de dima birûništin. Herwehajî ew ji bona serdanana Wan, Ercîš û bajarên tir jî diçû.

Xelifê Ebasî El-Qadir Bil-Lah di sala 408 k. de nav û nîšana Nasir El-Dewle pê dane bidan. Di sala 415 k. de bi hoyê Penabûna Bavê Qasimê Megribî ve ji bona nik Melek Nasir El-Dewle de di navbera wî û Xelifê Ebasî têkçû. Belam li dawîya mirina Bavê Qesim de di sala 418 k. de li Mîyafarqînê de bi temenê 46 Salî de dîsan di navbera Xelifê û wî de lihevhatin û dostanî hate bidîtin[89].

Li sala 416 k. de wî bajarê Ruha ji xwe re date bivegirtin. Serdarê vî bajarê hanê Šêxekî Numeyrîyî bi navê Etîr bû. Wî li ser bajêr de Wênerekî xweyî bi navê Ehmedê Kurê Mohemed dabû bidanîn. Vî Wênerê hanê pir bi bašî û dadwerî ve kar û barên bajêr dida bigerandin. Belam Šêx Etîr mehne lê date bigirtin û ew date bikuštin. Li ser vê de xelkê bajêr ji Šêx Etîr bêzarbûn û wan bi dizî ve xeber ji bona Nasir El-Dewle datin binardin, ku ew ji bona ruha Serdarekî bide binîšankirin. Wî Zeng Wênerê xweyî Diyarbekrê ji bona Ruha date binardin. Zeng Ruha date bigirtin û wî kar û barên bajêr bi destên xwe ve date bixistin. Li dawî de Šêxê Numeyrî Etîr bi alîkarîya Salihê Kurê Merdas ve hêvîya lêbuhurandinê ji Nasir El-Dewle date bikirin. Ew lê hate bibuhurandin û wî jê re Nîvê herema Ruhayê jî date bivegerandin.

[88]Ibin-KurêESir dibêje: Rojên wî pir geš û xweš bûn. Zanistvanan ji hemû layekî ji Dunyayê xwe li welatê wî de didan bigirtin. Herwehajî Bavê Eb-Dulahê Karzunî jî xwe lê date girtin û wî Rêça Šafiî di nava Diyabekrê de date bibelavkirin. Pir Šairan xwe lê didan girtin û wan zor pesnê wî dane kirin. Wî jî pir bi merdî ve qencî bi ser wan de dida birijandin. Weha ji sala 402 tanî mirina xwe di sala 453 k. de bi vî rengi ve wî dida biserdarîkirin. Ew ji Heštê Salî mezintir bû. welatê wî pir aram, geš û xweš bû. Navê wîna di nava xelkê de pir bi bašî ve dihate biberz û bibalakirin. xelkê pir jê hezdikir. Gava ku ew mir, Welat bi Kurê wî ve hate bihištin. (M. E.).

[89]Ibin-Kurê Esîr, El-Kamil, B. 9, R. 13, 135. (M. E.).

Šêx Etûr pir bi vê ve dilšad û bextiyar bû û wî berê xwe ji bona Mîyafarqînê ji bona nik Melek Nasir El-Dewle date bivedan, da ku ew wê çakîya wî bide bisipaskirin. Wezîrên Melek Nasir El-Dewle bi kuština Šêx Etûr ve ew dan bišîretkirin.

Belam Melek ev šîreta hanê ji xwe re neda biwergirtin. Wî date bigotin: Ezê xwe ji šer ne bi bêbextîyê ve bidim biparastin, lêbelê ez dixwazim, ku ez xwe ji šer bi dilsozîyê ve bidim biparastin. Šêx Etûr ji bona Ruhayê hate bivegerandin û wî têde Cîgierekî xwe date bidanîn. Cîgerê Melek Nasir El-Dewle Zeng rojekê Cigerê nuhî Šêx Etûr ji bona nik xwe date bimêvankirin. Gava Çîgerê Šêx Etûr ji mêvandarîyê hate bivegerandin, ew di rê de ji bal Kurê Cîgerê pêšî Ehmedê Kurê Mohemed de hate bikuštin. Ešîra Numeyrî ji bona sitendina xwîna xwe serên xwe datin bihildan. Zeng Cîgerê Nasir El-Dewle ji bona šerkirina ser wan çû. Ew di šer de di sala 418 k. de hate bikuštin. Bi vî rengî ve keleha Ruha ji destên Merwanîyan ve derçû û li ser hêvîya Salihê Kurê Merdas de Nasir El-Dewle waz li Šarê Ruhayê de date bianîn[90].

Di sala 419 k. de Bedran Kurê Muqeledê Uqeylî bi leškerek Erebî ve rûwê xwe ber bi Nisêbînê ve date bivedan. hêza parastina Nisêbînê ji bal Nasir El-Dewle de beramber bi hêza Ereb ve nikarîbû xwe bida bigirtin û ew hate bišikenandin. Nasir El-Dewle leškerekî din ji bona yarmetîya hêza xwe date binardin. Lêbelê Bedran ev hêza hanê jî date bišikenandin. Nasir El-dewle zor pê nexweš hate biderkevtin. Wî ji bona cara sêyem sê hezar Suwarên tirî ji bona Nisêbînê date binardin. Vê hêza hanê ligel hêza parastina kelehê de hev datin bigirtin û wan bi hev re Bedran datin bišikenandin û ew bi dû wî ve hatin bikevtin. Belam di wê gava ku ev leškerê hanê de bi talanîyê ve hatibû bimijûlkirin, Bedran ji nûve bi ser wan de hate bivegerandin û wî ew pir pîs dan bišikenandin û ew tanî dergehê Nisêbînê bi dû wan ve hate bikevtin. Li dawiya bihîstina xebera hatina Qerawišê Birayê wî de ji bona ser Musilê ew zû ji tirsa hate bivegerandin; ku di navbera wî û Birayê wî de xirab bû. (El-Kamil).

Li paš demekê de Bedran ligel Birayê xwe Qerawišê Serdarê Musilê de hate bihajbûn. Bi xwe jî di wê demê jî de di navbera Nasir El-Dewle de û Qerawiš de hatibû bitêkûpêkçûn. Hoyê vê têk û pêkçûna hanê di navbera Nasir El-Dewle û Qerawiš de Keça Qerawiš bû; jiber ku ew

---

[90]Insiklopêdîya Musulmantîyê bervajî El-Kamil dibêje, ku ev bajarê Ruhayê-Orfa ji bal Nasir El-Dewle ji Bêzentîyan hatîye bizeftkirin.

Jina Nasir El-Dewle bû. Wê û Mêrê xwe lihev nedidan bikirin. Nasir El-Dewle Jina xwe ji bona Bavê wê li Musilê de date binardin. Qerawiš daxwaza paš Qelenê Keça xwe date bikirin. Wî daxwaza bîst hezar dînar, Nisêbîn ji bona Birayê xweyî Bedran û Cezîrê jî ji bona xercîya Keça xwe ji Nasir El-Dewle date bikirin. Belam Nasir El-Dewle bi van daxwazên hanê ve guh pê neda bidan.

Li ser vê guh pênedana hanê de Qerawiš leškerek ji bona Cezîrê, yekîtirjî di bin Komandarîya Birayê xweyî Bedran de ji bona ser Nisêbînê û ew bi xwe jî ve ligel hêzekê de ligel Bedran de ji bona dorlêgirtina Nisêbînê hev dane bgirtin. Belam bi bê girtina van herdu bajaran ve leškerê wî ji hevdu hate bibelawelabûn.

Gava ku Berdan ev rewš û zîneta hanê date bidîtin, ew ji bona Mîyafarqînê çû. Wî hêvî ji Nasir El-Dewle date bikirin, ku ew Nisêbînê bi wî bide bidan. Bi rastî jî ve Nasir El-Dewle ev bajarê hanê pê date bibexšandin. Herwehajî wî yanzedeh hezar dînar jî paš Qelenê Keça Qerawiš ji bona Qerawiš date binardin. Bi vî rengî ve ev pevçûna hanê hate birandin. Di sala 422 k. de bajarê Ruha bi destên Ibin-Kurê Etîr û Ibin-Kurê Šebil ve bûn. Kurê Etîr para xwe ji bona Padšahê Romê date bifirotin. Bi vî rengî ve leškerê Romê ji bona bajêr hat bigihandin û wî ew hemû date bidagîrkirin û wî zor li Musulmanan de date bikuštin. Gava ku Nasir El-Dewle evaya date bibihîstin, wî leškerek ji bon ser Ruhayê date bišandin. Li dawîya dorlêgirtineke tund û šikenandina leškerê Romê de wî bajar date bizeftkirin. Belam li paš de leškerekî tirî Romê ji bona hewara leškerê xweyî berê ji bona ser Ruhayê hat bigihadin û wî ji nûve bajar date bivegirtin.

Di sala 426 k. de Ibin-Kurê Wesabê Numeyrî hêzek zorî Ereb û Romê Ruhayê date bikomkirin û wî rûwê xwe ber bi welatê Merwanî ve date bivekirin. Nasir El-Dewle lešker date bikomkirin û ji dorhêlê ve jî jê re pir hewar hatin bigihandin. Gava ku çavên Kurê Wesab bi vê rewš û zîneta hanê ve hate bikevtin, ew ji saw û tirsê ew hate vegeradin.

Nasir El-Dewle kaxezek ji bona Qeralê Romê date binivîsandin û têde gilî û gazin ji bona hoyê neparastina soz û peymanên di nava wan de girêdayî lê date bikirin. Wî ew bi dorlêgirtina Ruhayê ve bi tundî ve tirs têde date bifirandin. Belam Qeralê Romê xwe bê deng kir û wî ji bona Nasir El-Dewle hin diyarî date binardin û wî jê daxwaza lêbuhurandinê date bikirin. Nasir El-Dewle jî waz lêhêna. Di receba salal 427 k. de Nasir El-Dewle hêzek di bin Rêberîya Komandarekî xwe de ji bona ser Suwêda

ji bona alîkarîya Kurê Wesab û Kurê Etîr date binardin. Wê hêzê Siwêda date bizeftkirin[91].

Li dawîya vêna de ev hêza hanê ji bona ser Ruhayê ve çû û wê çardorî lê date bigirtin. Hewara Qeralê Romê ji bona bajarê Ruhayê pê hate bigihaštin. Belam leškerê Romê xerab hate bišikenandin û di dawî de bajar bi destên Kurê Wesab û Komandarê Merwanî ve hate bikevtin[92]. Di sala 432 k. de Miletê Xez[93], yê ku wî çend salan Irana navînî û Ezerbêcan bi kuštin û talanîyê ve dabû biwêrankirin, rûwên xwe ber bi Kurdistanê ve date bivekirin. Ešîrên Hezbanî zor bi xurtî ve beramberî wan rabûn, belam bê sûd bû.

Bešê hêza Xezê li Ormîyê de rûwên xwe ber bi welatê Hekarê ve dane bivedan û ew ligel Kurdên wan navan de bi šerekî qurs û bi tîn ve hatin bikevtin. Dir û hovîtîya vî Miletê Xez Pîrek û Zarok jî nedan biparastin. Kurd xwe ji bona šax û çiyan dane bikišandin. Wan derbend û rê li ber Xez de dane bibestin. Di dawî de wan Xez dane bišikenandin û hezar û pêncsed kes li wan de wan dane bikuštin. Kurdan zor ji wan bi dîlî ve dane bigirtin. Di nava van dîlan de heft Mîrên Xez û sed kes ji Serokên wan bi hemû çek, hesp, wilax û talanîyên wan ve bi destên Kurdan ve hatin bikevtin. Mayînên Xezî din di nava šax û daxan de hatin bibelawelabûn û bitefirtûnabûn.

Di vê salê de bi xwe ve Ibrahîmê Yenal Birayê Sultan Tugurl ji bona Rê çû[94]. Xezên wê navê ji tirsan welatê Rê û Çiyan dane bicîhištin.

---

[91]Diyare, ku ev Sêwda hanê keleha Suwirek-Siyorek niha ye, ya ku ew di navbera Amed û Ruhayê de tête bikevtin. Ew bi vî navê hanêyî Zaravayê cih hate binavkirin; jiber ku Erdê wê bi sor rešî ve tête biderkevtin. Bi bervaj vî ve Erdê Ruhayê ber bi sipî ve tête biderkevtin. (M. E.).

[92]ji xwe re li nik Kurê Esîr B. 9, R. 167 de bi de temašekirin. Di wir de bêbextîya Sinosîyan, girtina Hacan û bivegerandina talanîyên wan hatîye binivîsandin. Ev jî tevdejî bi alîkarîya Nesir El-Dewle hate kirin, yê ku wî bi xurtî ve šerê Ermenî bi gišti ve û Sinosîyan bi taybetî ve date bikirin.

[93]Ji xwe re li Kanîya pêšî R. 144 de bide bitemašekirin. (M. E.).

[94]Seyid Husên Mukriyanî vê rûdana hanê bi rengekî din ve dide biveguhestin u ew mîna veguhestina Kurê Esir niye.

Wan di sala 433 k. de rûwên xwe ber bi Diyabekir û Musilê ve dane bivekirin. Di rêyên pir sext de û bi ser Zozanan ve ji bona ser Cezira Ibin Umer hatin bigihandin. Berê Xezê Boqa, Nasifli û çend Serokên wanî tir rûwên xwe ber bi Diyarbekir ve dane bivedan. Wan Qerda, Beyazîd, Huseynî û Pêšxabur dane bitalan û biwêrankirin.

Berê Xezê Mensur Kurê Xezxelî ew li hêla Rojhilatî Cezîrê de bû.

Mîr Sulêman Bavê Herbê Kurê Nasir El-Dewle kaxezek ji bona Mensurê Xezxelî date binivîsandin, ku ew daxwaza ašîtîyê jê dide bikirin û wî pê date bigotin, ku ew tanî buharê dikarin li wêderê de bêtin bimayîn û li paš de ew ji bona Šamê dikarin herin[95]. Mensurê Xezxelî nivîsandin bi dilê ve wî bû.

Li dawî de Mîr Sulêman Bavê Herb mêvandarîyek ji bona Mensur date bikirin. Gava ku ew ji bona mêvanîyê ji bona Cezîrê hate bigihandin, wî ew date bigirtin û ew ji bona binê zindanê date biavêtin. Wî bi vî karî ve pišta lêškerê Mensur date bišikenandin.

Qerawiš Serdarê Musilê, Nasir El-Dewle û Kurdên Bešnewî xelkên keleha Fênik bi hev re lešker ji bona ser Xez dane birasekirin û ew ligel wan de bi šer ve hatin bikevtin. Xez hemû talanîyên xwe bi cî ve dane bihištin û zor ji wan hatin bikuštin. Hinek ji van Xezan ji bona talanîyê ji bona hêla Nisêbînê û Šingarê çûbûn. Gava ku ew vegeriyan, wan dor li Cezîrê de datin bigirtin. Li paš de wan dev ji Cezîrê datin biberdan û rûwên xwe ji bona Diyarbekrê dane bivedan û wan ew datin bitalan û biwêrankirin.

Nasir El-Dewle Mensurê Gereyê Xez ji Bavê Herbê Kurê xwe date bisitendin û wî ew bi mercê çolkirina welatê Merwanî ve date biberdan û wî hin mal jî pê date bidan. Belam vî Miletê hanê dev ji xerabîya xwe bernedan. Wan dorhêla Sincarê, Nisêbînê û Xaborê ser bi ser ve dane bitalankirin.

Qolekî din ji wan ji bona ser Musile çûn û wan ew ji xwe re dane bigirtin û têda wan kuštarekî pir mezin dane bikirin. Nasir El-Dewle Melek Ehmed nameyek ji bona Sultan Tugurl date binivîsandin û wî têde pir gilî û gazin ji dir û hovîtiya Xez date bikirin[96]. Di sala 439 k. de Esferê

[95]Ji xwe li Kurê Esîr B. 9, R. 145 bide bitemašekirin. (M. E.).

[96]Li nik Kurê Esîr de B. 9, R. 146 de hatîye binivîsandin, ku Xez Turkin û ew Kole û Bendên Silcoqî ne.

Texelubî li hêla Serê Kanîyê de hate bipeydabûn. Wî leškerekî zor date bikomkirin û wî pesarên Padšahîya Roma ji xwe re dida birût û bitalankirin. Nasir El-Dewle ew date bigirtin û wî ew date bizindankirin[97].

Di sala 440 k. de di navbera Kurdên Hemodî-Hemêdî û Hezbenî de têkçû. Herwehajî di navbera Qerawiš û Birayê wî jî de pevçûnê date bidestpêkirin[98]. Li gora El-Kamil de hoyê vê têkçûnê eve bû[99]: Hoyê vê têkçûna hanê ev bû, ku li nêzîka Musilê de Kurdên Hemodî-Hemêdî çend kelehên wanî mîna Ekra hebûn û Serdarên wan jî Bavê Hesen Kurê Îskanîyê Hemodî bû. Gewreyê Ešîra Hezbenî Bavê Hesenê Kurê Mosek-Mošek Xwedîyê keleha Hewlêrê û dorhêla wê bû. Serdarê Hewlêrê Birayekî wî bi navê Bavê Elî ve hebû. Mîr Bavê Hesenê Îskanî yarmetîya Bavê Elî ji bona girtina Hewlêrê date bidan. Bi rastî jî ve wî Hewlêr date bizeftkirin û wî Bavê Hesenê Birayê xwe jî date bigirtin. Qerawišê Fermandarê Musilê daxwaza yarmetîyê ji Bavê Hesenê Îskanî û Bavê Elîyê Hezbenî date bikirin, ku ew ligel wî de ji bona ser Nasir El-Dewle Ehmed Meleke Merwanî herin. Bi rastî jî ve Bavê Hesenê Îskanî bi xwe

[97]Ji xwe re li nik Kurê Esîr B. 9, R. 201 de bide bitemašekirin.

[98]Kurê Esîr, El-Kamil B. 9, R. 204. (M.E.).

[99]Seyid Husên Mukrîyanî Xwedîyê Pêškewtin di Belavoka 6 de dibêje: "Hoyê têkçûna di navabera van herdu Ešîran de Qerawiš bû. Nasir El-Dewle ferman ji bona Bavê Hesen Îskanî Serdarê Ekrê date dan, ku ew ji bona ser Musilê biçe.

Qerawiš ku wa zanî, ku ew beramberî wî netwane bête biwestandin. Wî bi dizî ve Peyak ji bona layê Mîr Husênê Moškê Hezbenî date binadin, yê ku ew Xwedîyê keleha Hewlêrê bû.

Peyê Qerawiš bi Mîr Husênê Moškê Hezbenî ve got: heger tu ligel Mîr Îskan de bide bišerkirin, Cezîr û Zaxo jî dê ji bona te bête bidan. Bi vê fêlê wî ev hedru Mîrên Kurd bi gij hev de dane biberdan. Nasir El-Dewle yarmetî ji bona Mîr Îskanî date binardin. Qerawiš jî komekî ji bona Mîr Husên date bišandin. Di nava van šeran de Ešîrên Ereb li Qerawiš de bînteng bûn û wan li hemû layekî de jê re serkêšî û sergêjî dane bikirin û ew li ber wî rabûn.

Melekê Ezîzê Bohîmî, yê ku wî jiber destên Melek Bavê Kalîcar helatibû, pena xwe ji bona Nasir El-Dewle biribû".

ve çû. Lêbelê Mîr Elîyê Hezbenî Jinbira xwe date binardin. Belam di wê demê de navbera Nasir El-Dewle û Qerawiš çak bû. (El-Kamil, b. 9).

Di sala 441 k. de di navbera Mutemed El-Dewle Bavê Munîyê Qerawišê Kurê Muqeledê Uqeylîyê Mirî di sala 444 k. de li Musilê de û Birayê wî Zeîm El-Dewle Bavê Kamil Bereke Kurê Muqeledê Mirî di sala 443 k. de li Tekrîtê de pevçûneke pir no hate bivêketin. Birazyê-Birazayê Qerawiš Kurê Bedran kurê Muqeled li ser fermana Mamê xwe de hêrîš ji bona ser Bavê Kamil date bibirin û ew bi ser wî ve hate bikevtin. Bavê Kamil revya û ew ji bona nik Bavê Herb Mîr Sulêmanê Kurê Nasir El-Dewleyê Merwanî pena bû.

Nasir El-dewle ji bona sitendina tola Bavê Kamil ji Qerawiš ferman ji bona Kurê xwe Bavê Herb date binardin. Herwehajî wî bi vî rengî ve kaxezek ji bona Mîr Bavê Hesenê Îskanî date binivîsandin. Bi lez û bez ve leškerên herdu layan kom bûn û wan rûwên xwe ber bi Musilê ve dane bivedan. Li nêzîka Musilê de ew tûšî leškerê Qerawiš bûn. Šerekî pir bi germ û tin ve di nava wan de hate bilidarbikevtin. Leškerê Qerawiš pir pîs hate bišikenandin û Qerawiš bi xwe jî ve bi dîlî ve ji bona nava destên Bavê Herb hate bikevtin. Bavê Herb Qerawiš ji bona Birayê wî Zeîm El-Dewle Bavê Kamil date bisipartin.

Zeîm El-Dewle Bavê Kamil ji tirsa peydakirina hêza Kurd û ji destçûna Musilê wî Qerawiš date biberdan û wî ew ji bona Musilê date binardin.

Bavê Herb Mîr Sulêman ji vî karî tûre bû û ew ji bona welatê xwe hate bivegerandin[100]. Di sala 441 k. de Sultan Tugurl xeber ji bona Nasir El-

[100]El-Kamil bi bervajî Seyid Husên Mukriyanî ve li ser vê rûdana hanê de bi rengekî din dide biaxivtin û ew bi kurtî ve weha dibêje: Di navbera Qerawiš û Birayê wî Bavê Kamil de têkçû û herdu la Lešker bi ser hev de datin bikišandin. Di wê bêhnê jî de Mîr Sulêman Kurê Nasir El-Dewle, Hesenê Îskanîyê Hemêdî û hin ji Ešîrên Kurdên din jî ji bona ser Meelsaya hatin û wan ew datin biwêrankirin. Li dawî de ew ji bona ser Mexise çûn û têde ew peyabûn. Bavê Kamil jî bi Leškerê xweyî Ereb ve ligel Kurê Musîb de ji bona mêrga Bayniya- dibe ku ew Nineva be-hatin. Di navbera herdu Leškeran de Du Rojan šer date bidirêjkirin. Li dawî de Mîr Sulêman û Gewreyên Kurd bi xwe û Leškerên xwe ve û Bešêkî ji Leškerê Ereb ji bona layê Bavê Kamil çûn. Bi vî rengî ve Qerawîš lawaz bû. Belam Gewreyên Ereban hin daxwazên qurs ji bavê Kamil dane bixwestin, ku wî ew nikarîbûn bide bicianîn. Ji tirsa mehna devjêberdana Leškerê Ereb jê ew ji bona layê Birayê xweyî Qerawiš çû û wî jê daxwaza lêbuhurandê date bikirin. Bi vî rengî ve herdu Bira lihevhatin. (B.9, R. 206).

Dewle date binardin û jê date bidaxwazkirin, ku gotina roja înê bi navê wî ve di nava tevaya welatê wî de bête bixwendin. Nasir El-Dewle ev daxwaza Tugurl date bicihanîn[101].

Di vê salê bi xwe jî de Qeralê Romê ji Melek Nasir El-Dewle date bidaxwazkirin, ku ew li nik Sultan Tugurl de ji bona berdana Melek Îxaz bide bihêvîkirin. Nasir El-Dewle Šêx El-Îslam Bavê Eb-Dulahê Kurê Merwanî ji bona layê Sultan Tugurl date binardin û wî ew hêvîya hanê jê date bikirin. Sultan Tugurl ji bona xatirê Nasir El-Dewle bi bê xûkitî ve Melek Îxaz date biberdan. Vê berdana hanê cih û hêjabûna Nasir El-Dewle li nik Qeralê Romê de date biberztirkirin. Qeralê Romê jê re pir diyarî datin binardin û wî ji bona xatirê wî jî Mizgefta Istenbolê ji nûve date bivekirin û binuhkirin.

Di sala 446 k. de Sultan Tugurl ji Ezerbêcanê rûwê xwe ber bi Melazgurd ve date bivedan, ya ku ew di bin destên Romê de bû. Wî çardorî li bajêr de date bigirtin. Di vê çardorlêgirtinê de Nasir El-Dewle jê re sipahek ji bona pištgirtina wî date binardin û pêrejî wî gelek diyarîyên bi nerx ve jê re datin birêkirin[102].

Bavê Herb Mîr Sulêman ji alîyê Bavê xwe bi Serdarê welêt ve hatibû bidanîn. Wî bi azayî û desthilanîna xwe ve nav û bang ji xwe re dabû bisitendin û pê Bavê Herb dihate bigotin. Her çonî bû, di navbera wî û Mîrê Moskê Kurê Mecelî de Gewreyê Ešîra Bextî û Xwedîyê hin

[101]Ev perçe tê û daxwaza navcîtîyê li nik Kurê Esîr de nayête bidîtin. (M. E.).

[102]Li nik Kurê Esîr de di bergê 9, Rûpelê 223 de hatîye binivîsandin: Ku di vê sala hanê de Tugurl Beg ji bona Ezerbêcanê hat û ew ji bona Tebrîzê nik Xwedîyê wê Bavê Mensur Wehsozan Kurê Mohemedê Rewadi çû. Bavê Mensur Wehsozan kurê Mohemedê Rewadî jê re serê xwe date tewandin û wî jê re dilsozîya xwe date biderxistin. Wi Navê wî di Gotina Roja Înê de di Mizgeftan de date xwendin. Wî jê re pir bi Cavfirehî ve diyarî date bianîn û wi Kurê xwe bi girawî ve li nik wî de date bidanîn. Ji nik wî Tugurl Beg berê xwe ji bona Mîr Bavê Eswar Xwedîyê Cenzet date bivedan. Wî jî û Mîrên dinên mîna wî jî tevan serên xwe ji Tugurl re datin bitewandin. Wî welatên wan ji bona wan date biihištin. Ew ji bona Erministanê çu û wî berê xwe ber bi Melazgerd ve date bivekirin.

Hatîye bigotin, ku Nasir El-Dewle jê re Diyari û Supah dane rêkirin û herwehajî jiberê jî de wî bi navê wî gotina Înê dida xwendin û serê xwe jê re dabû bitewandin. (M. E.).

kelehên Rojhilatî Cezîrê têkçû. Wî kîna xwe avêtê. Belam Wî dida bixuyanîkirin, ku ew hajbûnê ligel wî de dide bixwestin. Wî ew date bihajkirin û wî xwest, ku ew Keça Bavê Tahirê Bešnewî Xwedîyê keleha Fênik lêbide bimarkirin.

Ev Bavê Tahirê hanê Xwarzayê Nasir El-Dewle bû. Wî nexwest, ku ew dilê Mîr Bavê Herbê Xalozayê xwe bide bišikenandin. Ew bi vê xwestina Keça xwe ve pê hate birûništin û wî Keça xwe bi govendeke pir mezin û giran ve bi pir dahol, zurnan û berbûk ve ji bona Mîr Mosk date binardin. Bi vî rengî ve Mîr Mosek li Mîr Bavê Herb de pišt pê rast bû û ew ji bona layê wî çû. Belam Bavê Herb ew date bigirtin û ew ji bona binê zindanê date bixistin.

Ev xebera hanê di meydana šerê Romê de bi guhên Sultan Tugurl ve hate bigihaštin. Wî nameyek ji bona Nasir El-Dewle date binivîsandin û wî têde daxwaza lêbuhurandin û berdana Mîr Mosk date bikirin. Belam di wê bêhnê de Mîr Mosk hate bimirin. Bi Bavê Tahir ve ev reftara hanê zor pê nexweš hate biderkevtin. Wî xeber ji bona Nasir El-Dewle û Mîr Bavê Herb date binardin û date bigotin: Heger we dixwest, ku hûn Mîr Mosk bidin bikuštin, ji bona çi we keça min di wê navê de date bikaranîn û we ez dame bišermezarîkirin?

Vî gilî û gazina hanê Mîr Bavê Herb pir bînteng û sergêjkir. Wî jeher ji bona Bavê Tahir date bidan û wî ew jî date bikuštin. Li dawîya Bavê Tahir de Kurê wî Eb-Dulah ji bona cihê wî hate bidanîn. Mîr Bavê Herb ji bona dilkišandina Eb-Dulah bi ser xwe ve wî pir dildarîya xwe ji bona wî dida biderxistin. Wî xwest, ku ew wî bide bihajkirin; jiber vê jî biryar hate bidan, ku ew civînekê ligel hev de di navbera Fênik û Cezîrê de bidin bikirin. Di vê civînê de Eb-Dulah Mîr Sulêman Bavê Herb date bikuštin[103].

Nasir El-Dewle li dawîya vê rûdana hanê de Mîr Nesirê Kurê xwe bi serdarî ve ji bona ser Cezîrê date bidanîn û wî ew bi leškerekî pir zor ve ji bona wêderê date binardin, da ku ew tola Birayê xwe bide bisitendin.

---

[103]Seyid Husên Mukriyanî vê bicudabûnê ligel Kurê Esîr de dide biderxistin. Ew dibêje: Mîr Sulêman šûna Melek Nasir El-Dewle date bigirtin û wî pišti Bavê xwe bi 13 salan ve daye biserdarikirin. Lêbelê li gora di El-Kamil de ew pêš Bavê xwe hatîye bikuštin
.

Di vê pêlê de Serdarê Musilê Qureyšê Kurê Bedran bi kês ve ji xwe re date bizanîn û wî xwe bi leškerekî gewre ve ji bona ser Cezîrê date biajotin. Da ku ew girtina Cezîrê ji xwe re bide bimisogerkirin, wî ligel Ešîra Bextî û Bešnewî de dan û sitendin date bikirin û wan ligel wî de peyman dijî Mîr Nasir datin bigirêdan. Hemûyan bi hev re rê li Mîr Nesir de dane bigirtin û šerekî qurs û bi tîn ve di nava wan de hate bivêketin. Kuštarekî pir giran bi herdu layan ve hate bikevtin. Belam di encam de Mîr Nesrê Merwanî ew datin bišikenadin û Qureyš bi birîndar û šikestî ve di sala 447 k. de ji bona Musilê hate bivegerandin[104].

Weha ev rûdanên bi dilšewat û pevçûnên pirî giran ve di nava wan de hatin birûdan; hemû jî jiber nezanî û kurtbînîya Bavê Herb hatin bikirin.

Di sala 452 k. de Melek Nasir El-Dewle Ehmed hate bimirin[105]. Wî ji heštê salî û ber jor de date bitemenkirin û wî pêncî û du salan date biserdarîkirin. Xlifê Ebasî El-Qadir Bil-Lah ew bi nav û nîšana Nesir El-Dewle ve date bixelatkirin.

Welatê Merwanî di vê dirêjîya dema hanê de zor bi bašî ve hate biparastin û bisermiyanîkirin û bi çavekî pir hêja û berz ve lê dihate bitemašekirin. Di vê demê de kêm Padšahên mîna wî bextiyar û dadwer dihatin bidîtin. Navmalî, Sazinde û Nuwazindeyên wî pirî pir bûn, ku jimara wan ji pêncsedî bêtir bû. Taqimê bezm û kêfê ji dused hezar dînar buhatir bû. Ji bona fêrbûna xwarin û nanlêdanê wî gelek Mirov ji bona Misrê datin binardin. Di koška wîyî Padšahîyê de gelek Keçên Šah û Padšahan dihatin bidîtin. Cewhereke zor hêja bi navê Cebel Yaqut li nik wî bû, ya ku wî ew ji Melek Ezîz Kurê Mensurê Celalê El-Dewle dabû bikirîn û wî ew li paš de ligel Sed hezar dînar de ji bona Sultan Tugurl date bidiyarîkirin[106]. Ji Wezîrên wî Bavê Qasimê Megribî û Fexir El-Dewleyê Kurê Cehîr bûn. Xwešitî û gešbûna welatê Merwanî di dema wî

---

[104]El-Kamil, B. 9, R. 226. (M. E.).

[105]Li nik Kurê Esir de, B. 10, R. 6. (M. E.).

[106]Ev Melek Ezîzê Kurê Celal El-Dewleyê Kurê Beha El-Dewleyê Bohîmî bû. Ew di sala 435 k.- 1043 Z. de li ser Begdadê de bi Melek hate bidanîn. Belam di šerê xwe de ligel Melek Bicarê Bohîmî de ew ji bona nik Nasir El-Dewle pena bû û ew tanî mirina xwe li Miyafarqînê de dihate birûništin û ew li wêderê jî de hate vešartin. (mêjûwa Musilê, R. 142).

de pir bi pêš ve hatibû bikevtin. Pir ji Šueran, Zanevan û Zanistvanan lê hatibûn bikomkirin. (El-Kamil, b. 10, r. 6, 7).

Mêjûwa Netewên Musulmantîyê dibêje: Li hemû layekî de Zanistvanên bi nav û bang ve rûwên xwe ji bona seraya Nasir El-Dewle dane bivekirin. Yekek ji van Zanistvanan jî Bavê Eb-Dulahê Kazronî bû, yê ku ji bal wî de Rêça Šafiî di Kurdistanê hate bibelavkirin. Nasir El-Dewle Ehmed zor Šuera, Zanistvan û Šehreza xwešewist divan. Sincîyekî wîyî zor pak û bilind hebû. (bergê 3, r. 450).

Ew bi navnîša Bavê Nasir Edil ve hatibû binavûbangkirin. Wî pir karên mezin ji bona welatê xwe date bikirin û hemû kesekî jî ew xwešewist divan. (Insiklopêdîya Musulmantîyê).

Vî Padšahê gewreyî hanê ji bona avedanîkirina welatê xwe zor daye bikarkirin. Wî li Mîyafarqînê de zor avanî dane bicîvehištin. Wî keleh, Xestexane, Avgerm, Mizgeft û Nivistaxane têda dane bidurustkirdin. Wî av ji dorhêla bajêr ji nava wî dayîte bikišandin. Baxekî gištî wî têde daye bidamezirandin. Herwehajî wî li bajarên din jî de gelek avanîyên baší baš dane biavakirin. Wehajî Wî bajarê Nasiriyê jî date bihebûnkirin, ya ku ew çar fersexekî ji Mîyafarqînê tête bidûrkevtin û ew yekek ji šopên wîyî mayînê tête bidîtin. (Insiklopêdîya Musulmantîyê).

## Qasim Bavê Nasir[107]

(Li nik Kurê Esîr de Nesir û ne Nasir hatîye binivîsandin.(bergê 19, r. 7, 11). Diyare, ku Nesir ji Nasir rastire). (M. E.).

Qasim Bavê Nasir[1](Li nik Kurê Esîr de Nesir û ne Nasir hatîye binivîsandin.(bergê 19, r. 7, 11). Diyare, ku Nesir ji Nasir rastire). (M. E.).Qasim Bavê Nasir[1](Li nik Kurê Esîr de Nesir û ne Nasir hatîye binivîsandin.(bergê 19, r. 7, 11). Diyare, ku Nesir ji Nasir rastire). (M. E.).Qasim Bavê Nasir[1]

(Li nik Kurê Esîr de Nesir û ne Nasir hatîye binivîsandin.(bergê 19, r. 7, 11). Diyare, ku Nesir ji Nasir rastire). (M. E.).

[107]Di Wefiyat El-Eyan de bi navê Bavê El-Qasim Nizam El-Dîn Nesir hatîye binivîsandin. (bergê 1, r. 57).

Li dawîya mirina Bavê xwe de bi yarmetîya Wezîr Fexir El-Dewle ve wî cîgehê Bavê xwe date bigirtin. Wî ji sala 543 tanî 472 k. de date biserdarîkirin. Di pêšîya pêla serdarîya wî de Birayê wî Mîr Seed li ber hate birabûn û di nava wan de šerekî navxweyî hate biberpabûn. Belam Bavê Nasir hate biserbikevtin. Ew li ser kar û bar de zal bû û hemû kelem li pêšîya wî de hatin birabûn. Wî dilê Birayê xwe Seed date biweškirin û wî keleha Diyarbekir-Amed pê date bisipartin. Seed di sala 455 k. de hate bimirin.

Di sala 457 k. de wî Heran û Siwêda-Suwêrek jî bi ser welatê xwe ve date bivekirin. Ji bal Xilafetê de navnîša Nizam El-Dewle pê hate bidan. (Insiklopêdîya Musulmantîyê).

## Mensur

Ew Kurê Mîr Seede û wî li dawîya Bav û Mamê xwe de hemû welatê Merwanî bi jêr destên xwe ve date bixistin. Li gora goyekê de gotina roja înê di mizgeftan de him bi navê xwe ve û him jî bi navê Xelifê Fatimîyê Misrê de dida bixwendin. Jiber vê Xelifê Ebasî lê hate bibîntengbûn.

Di dawî de Melekšahê Sulcoqî di sala 476 k. de welatê Diyarbekirê bi Fexir El-Dewle Kurê Cuhêr ve date bidan, yê ku ew kevne Wezîrê Melek Nasir El-Dewle Ehmed bû. Melekšah hêzek pê date bidan û ew ji bona ser Diyabekirê-Amed date binardin. Vî Fexir El-Dewleyê nan û xuwê xuwerê Melekên Merwanîyan rûwê xwe bi Amed ve date bivekirin. Mensûr daxwaza yarmetîyê ji dirawsên xwe date bikirin. Šeref El-Dewle Muslim Kurê Qureyš Serdarê Musilê bi leškerekî ve bi hewara Mensurê Merwanî ve hate bigihaštin. Gava Fexir El-Dewle hewara dirawsên wî jê re date bidîtin, wî mêldarîya ašîtîyê date bikirin. Çunke, wî nedixwest, ku ew ligel xelkên Miletê xwe de bide bišerkirin. Sipahên Turk ku ev date bizanîn, šev bi dizî ve wan hêrîš ji bona ser leškerê Musilê dane bibirin. Wan kuštarek mezin li leškerê Musilê de dane bikirin û wan hemû bar û malên wan dane bitalankirin. Šeref El-Dewle bi hezar dujwarî ve xwe bi Diyarbekir-Amed ve date bigihandin. Fexir El-Dewle bi leškerê xwe ve ji dorlêgirtina ser wî hate bigihandin. Šeref El-Dewle bi alîkarîya Komandarê Turk Erteq ve di sala 477 k. de xwe date birizgarkirin.

Fexir El-Dewle Diyarbekir di dorlêgirtinê de date bihištin û wî rûwê xwe ber bi Mîyafarqînê ve date bivekirin. Melekšah hêzên din di

hewara wî de dane binardin. Wî Mîyafrqînê date bizeftkirin. Li paš de ew bi xwe ve di sala 478 k. de ji nûve ji bona ser Diyarbekir hate bivegerandin û li dawîya serhildana xelkên Diyarbekrê de wî bajar di sala 479 k. de date bizeftkirin. Melek Mensûr xwe bi Cezîrê ve date bigihandin û ew li wêderê de cigîr bû. Çend kelehên wê navê û Botan di destên wî de bûn. Fexir El-Dewle li hêre jî de waz li Dawîvanê Serdarê Xwedîyî nan û xuya xwe ne dedate bianîn[108]. Wî leškerek ji bona ser Cezîrê date binardin û wî li bajêr de date bidorlêgirtin. Di Cezîrê de malbateke dewlemend bi navê Beno Wehban hebû. Di kelehê de deryekî wanî taybetî hebû, ku têre bes yek Nefer dikarîbû bihata biderbaskirin. Ji vî derîyê hanê re derîyê Bobîye dihate bigotin. Beno Wehban deryê xweyî kelehê dane bišikenandin. Leškerê Fexir El-Dewle di vî deryê hanê re ji bona nava kelehê hatin biderbasbûn û Dawîvanê Melekê Merwanî Mensurê bedbext li wir de dane bigirtin. Ew û dewleta wî bi carekê ve hate bilinavçûn. (Kurê Esîr bergê 10, r. 53. Ebu El-Fida).

[108]Ev Fexir El-Dewle Kurê Cuhêr li nik Qureyš Kurê Bedran de Wezîr bû. Wî ew bi Balozvan ji bona nik Qeralê Romê date birêkirin. lihevhatibû birasthatin, ku Nasir El-Dewle Ehmedê Merwanî jî di wê demê de Balozvanek ji bona nik Qeralê Roma dabû binardin.

Di Dema bidîtina Qeral de Fexir El-Dewle xwest, ku ew bi pêškeve. Balozvanê Nasir El-Dewle nehišt, ku ew bi pêšîya wî ve bête bikevtin.

Di dawî bivegerandina wîna de Qureyš xwest, ku ew wî bide zindankirin. Belam ew rizgar bû. Ew ji bona Helebê çû. Ew bi Wezîrê Meez El-Dewle Bavê Šemal Kurê Salih bû. Li paš de ew ji bona Meletiyê çû û ew ji wir ji bona layê Nasir El-Dewle Ehmed hat. Nasir El-Dewle jê pirsî. Çima te li nik Qeralê Rome de ew ref-tar ligel Balozvanê min de date kirin? Wî got: Min ew bi fermana Axê date bikirin.

Nasir El-Dewle bi vê bersivê ve dilxweš bû û wî ew bi Wezîrê xwe date bidanîn. Li dawî mirina Nasir El-Dewle wî Wezîrtîya Kurê wî jî date bikirin. Belam di dawî de ew ji bona Begdê çû û ew bi Wezîrê Xelife bû. Li paš demekê de ew ji Wezîrtîyê date bixistin. Melekšah Diyarbekir pê da û ev bi hoyê linavçûna dewleta Merwanî bû. Belam Xwedê zu tol jê date bisitendin. Erteq ew ji Diyarbekrê date biderkirin û wî ew ji bona Musilê date binardin. Ew li Musilê de di rewš û zîneteke pir nexweš û bi serê xwe ve di Muherem yaxud Receba sala 483 k. de mir. (El-Kamil bergê 10, r. 48, 52, 53 û 67).

## *Derîyê Šešem*

## 6. Dewleta Kurên Enan[109] li Helwanê de di sala 380-510 k. de

Bidanînvanê pêšîyî vê dewleta hanê Mîr Bavê Fetih Mohemed Kurê Enan Mîrê Kurdên Šazincanê bû. Wi ev dewleta hanê di sala 381 k. de date bidamezirandin. Ev Mîr li paš bi serdarîkirina bîst salan de di sala 400 k. de hate bimirin. Li paš wî de Kurê wî Bavê Šewk-Šewq di šûna wî de hate birûništin. Navê Bavê Šewk Faris bû û ew bi navnîšana Husam El-Dîn dihate binavkirin. Di navbera wî û Melekê Hesnewî Tahirê Kurê Hilal de dujminatîyeke kevin hebû.

Gava Tahir ji zindanê rizgar bû, wî leškerek ji bona ser Bavê Šewk date bikišandin. Di vî šerî de Bavê Šewk hate bibezandin, Birayê wî jî hate bilinavçûn û bešek ji welatê Kurên Enan bi destên leškerê Hesnewî ve hate bikevtin.

Her çend li dawîya vî šerê hanê de ew ligel hevdû de hatin birêkkevtin û Jin jî bi berdêlî ve bi hev re dane biveguhertin. Belam ewende pê neçû, Bavê Šewk ji nivškê ve hêrîšî ser welatê Hesewî date bikirin û wî ew date bizeftkirin.

Di sala 414 k. de Ela El-Dewle Kurê Kakewî[110] rûwê xwe ber bi Denyewer de date bivedan û wî ew date bigirtin. Belam wî ji tirsa Mušrif

---

[109]Weha Seîd Pašayê Diyarbekrî di nivîsta mêjûwa xweyî hêja de Mirat El-Iber-Wêneya Serpêhatîyan bi Zimanî Turkî vî navî dide binivîsandin. Kurê Esîr û li paš wî de Muncem Bašî vî navê bi Enaz didin binivîsandin. Di Šerefname de bi Eyar hatîye binivîsandin. Ez gûmandikim, ku binivîsandina Šerefname ji tevan rastir tête bidîtin. (M. E.).

El-Dewle li Begdadê de dest li Deynewer de date bihilgirtin û ew ji bona Hemedanê hate bivegerandin.

Di sala 420 k. de desteyê Xez rûwên xwe ber bi Deynewer ve dane bivekirin. Belam Bavê Fetih Kurê Bavê Šewk bi xurtî ve beramberî wan hate birawestandin. Zor ji wan date bikuštin û gelek jî wî ji wan date bidîlkirin. Wî di sala 430 k. de Qermisîn û tevaya welatê Çiyan date bidagîrkirin.

Bavê Fetih bi navê Bavê xwe ve welatê Deynewer dida bisermiyanîkirin. Di bêhnekê de dilê wî ji bona keleha Bekora hate bibijandin, ya ku ew bi destên Muhelhelê Mamê wî ve bû. Ew ligel Mamê xwe de ji bona girtina kelehê bi šer ve hate bikevtin. Ew hate bišikenandin û bi dîlîtî ve hate biberdestkirin.

Bavê Šewk leškerek dat bikomkirin û ew ji bona ser Muhelhel çû. Belam Muhelhel hewara xwe bi Ela El-Dewleyê Kurê Kakuye ve date bigihandin û ew di hewara wî de hate bibihatin. Kakuye bi leškerekî ve berê xwe ber bi Deynewer û Dorhêla wê ve date bivekirin û wî ew dane bigirtin. Li layekî tirî de Birayê Bavê Šewk Surxab Daquq date bidagîrkirin û wî hemû xelkên wan navan bi carekê ve ji çek datin bixistin û wî çekên wan dane bicivandin.

Li van rûdanên hanê Bavê Šewk ji bona Begdadê çû û wî yarmetî ji Celal El-Dewle date biwergirtin. Ew ligel leškerê Begdadê de ji bona Helwanê hate bizîvirandin.

Muhelhel jî ji bona nik Ela El-Dewle pena xwe date bibirin û wî li ser šîreta wîna de ji bona Begdadê nik Celal El-Dewle çû.

Bi kurtî ve li ser destên Begdadê herdu Bira hatin birêkkevtin. Belam Deynewer ji nava destên wan hate biderçûn.

Li paš vê lihevhatina hanê de Bavê Šewk rûwê xwe ber bi Šehrezorê ve date bivekirin û wî li keleha Bêzaršah de dor lê date bigirtin. Xwedîyê vê kelehê Bavê Qasim Kurê Eyad bi mercê berdana Bavê Fetih ji zindanê ve ligel Bavê Šewk hate birêkkevtin. Bavê Šewk dev ji dorlêgirtina kelehê date biberdan û ew hate bivegerandin.

Belam Muhelhel Bavê Fetih neda biberdan. Li ser vê de Bavê Šewk rûwê xwe ber bi Semxanê ve date bivekirin û wî hemû mulkên Mu-

[110]Ew Bidanînvanê dewleta Kurên Kakuya Kurd li Isfehanê de ye, ya ku ew ji 394-437 k. de hatîye bidirêjkirin. Wek ev di dewletên Musulmantîyê de ji bal Lastenli Lin Pol û herwehajî li nik Mencem Baš hatîye binivîsandin. (M. E.).

helhel dane bigirtin. Belam dîsan Navpijgîr ji bona nava wan hatin bikevtin û herdu Bira hatin bihajkirin.

Di vê bêhnê de Ibrahîm Yenalê Birayê Sultan Tugurlê Selcoqî bi leškerekî zor ve rûwê xwe ber bi Deynewer date bivekirin. Wî ew bajar ligel Qermisîn-Kermanšah de date bidagîrkirin.

Bavê Šewk xwe ji bona Helwanê date biavêtin. Belam ew li wêderê jî de nehate biparastin û ew jî ji dest çû. Ew neçar bû, ku ew bi xwe û mala xwe ve, bi dam û destgehên ve ji bona keleha Sêrwanê bête biçûyîn.

Bavê Šewk ligel Muhelhel de bi gift û go ve hate bikevtin û wî ew ji bona beramberîya Dujminê hevbeš date dilbijandîkirin. Di wê bêhne jî de Bavê Fetih di zindanê de hate bimirin. Tevlivêjî dîsan herdu Biran yekgirtin û wan ji bona šerê Ibrahîm Yenal xwe dane bilikarxsitin.

Di vê demê de Surxabê Birayê Bavê Šewk hîrîš ji bona ser Pendeçîn date birin û wî ew date talankirin.

Bavê Šewk di sala 437 k. de li keleha Sêrwan de hate bimirin. Li dawîya wî de Muhelhel bi Mîr bû. Seed Kurê Bavê Šewk xwe ji bona nik Ibrahîm Yenal date biavêtin û wî jê daxwaza vegerandina Mulkê Bavê xwe date bikirin.

Ibrahîm Yenal Qerqemîš-Kermanšah ji bona Bedrê Hesnewî dabû bidan. Muhelhel di sala 438 k. de hîrîš ji bona ser Bedir date bikirin û wî Qerqemîs-Kermanšah date bizeftkirin û Leškerê Ibrahîm Yenal jî date bišikenandin.

Li dawîya bêhnekê de Ibrahîm Yenal Seed Kurê Bavê Šewk ligel hêzekê de ji bona hîrîša ser Helwanê date binardin. Wî Helwan date bizeftkirin. Belam ewende pê neçû Muhelhel careke din ev bajarê hanê date bisitendin.

Seed bi šer û pevçûnê ve demek ligel herdu Mamên xwe de date bibuhirandin. Di encam de bi dîlîtî ve ji bona nava destên Surxab hate bikevtin. Kurê Surxab Bavê Esker li ser Bavê xwe rabû û wî bi yarmetîya Kurdên wan navan ve Bavê xwe date dîlkirin û wî ew ji bona Ibrahîm Yenal date birêkirin. Vî Ibrahîm Yenal Mîrê Silcoqî çavên Surxab dane biderkirin û wî Seed date biberdan. Seed jî Hewlwan date bizeftkirin.

Muhelhel li dawîya šerekî zor ligel Xez de ew di sala 443 k. de ji bona Begdadê nik Sultan Tugurl çû.

Sultan Tugurl Daquq, Šehrezor û Samxan bi Muhelhel ve date bidan, Kelah Mahki wî bi Surxab date bidan û wî Randbîn ji bona Seed date bidan.

Di dawîya vêna jî de šer û pevçûn di navbera Seed û Muhelhel de her diçû. Di dawîya dawî de Muhelhel bi dîlîtî ve ji bona nava destên Seed hate bikevtin. Seed ew ji bona Sultan Tugurl date binardin. Li ser vê de Bedrê Muhelhel di sala 446 de bi leškerekî ve ji bona šerê Seed hate birêkevtin. Wî ew date binabûdkirin. Bi vî rengî ve dewleta Kurên Enan-Enaz jî ji bona goristana mêjûwê hate biveguhestin. (Mir-at El-Iber, bergê 7, r. 374-380).

## Mîrnešînîya Derteng

Ew di hundurê welatê Helwanê de hatibû bidamezirandin û Navînîya wêna keleha Deteng bi xwe bû.

Mîrê nasînê pêšîyî vê Xanedanê Mîr Zorab-Suhrab bû, yê ku wî bi azaya destê xwe ve nav û bang ji xwe re dabû bisitendin û di dema wî de mîrnešînîya Derteng gewre bibû. Umerê Begê Kurê wî li dawîya Bavê de bi Mîr bû û ew bi desthilatîya Sultan Sulêmanê Qanûnî ve hate bibestandin. Li dawîya vî Mîrî de Kurê wî Qubad Beg ji bona šûna wî hate birûništin. Ev Mîrê hanê zor bi zerp û zereng bû. Wî sînorê mîrnešînîya xwe tanî Denyewer û Sînorê Begêdadê date bibirdin. Ew Hemdemê Xwedîyê Šerefname bû.

## Mîrnešinîya Mahîdešt

Ew li Tîlewer de cîgir bû. Di dema Šerefxande Mîrê wê bi navê Mensur Beg dihate binavkirin.

## *Derîyê Heftem*

## 7. Dewleta Šubankare-Šuwankare-Šîvankre li Fars di sala 412-658 k. de

Mîr Fedlewî ji berê Remanîyê Šivankarê Kurê Elî Kurê Hesen Kurê Eyûbî Gewreyê Ešîra xwe bû. Ew di dema Sahib Adilê Wezîrê Bohîmî de li Faris de bi Supahsalar hate bidanîn. Li pêš ve de Bohîmî zor ji bal Šuwankarî de dihatin bigivaštin û bitengavkirin.

Di mêjûwa Kezîde de li ser liberrabûna Serokekî Šivankare de bi navê Ismaîl ve di zemanê Serdarê Faris Îmad El-Dîn Bavê Kalîcar de (ji sala 416-440 k. de) dide biaxivtin.

Li dawîya vî Mîrî de Bavê Nasir Kurê Gewreyê wî šûna wî date bigirtin, ku ew di sala 447 de hate bimirin. Cihê wî ji bal Birayê wîyî Biçûk de Bavê Mensur Filaston hate bigirtin, yê ku Sahib Adil bi xwe ve Wezîrê vî Mîrî bû.

Ev Serdarê hanê li dawîya liberrabûna Fedlewî de beramber bi wî ve ew û herwehajî Dayîka wî Xatûna Xurasewî ji bal Fedlewî de hatin dîlkirin û welatê wî jî Fedlewî ji xwe re date bidagîrkirin. Wî Bavê Mensur di kelehekê de li nêzîka Šîrezê de date bizindankirin. Di sala 448 k. de wî Bavê Mensur date bikuštin û bi fermana Fedlewî Xatûna ve Dayika wî jî di seršokê de hate bixeniqandin.

weha bi vî rengî ve Mîrê Šivankarî bi Xwedanê welatê Farisê jî ve hate bikirin. Zor pê neçû ew ligel Silcoqîya de bi šer û pevçûnê ve hate bikevtin. Li dawîya šerekî bê sûd de ligel Qaûrt Birayê Elp Erselan de ew hate bineçarkirin, ku ew bi desthilatîya Elp Erselan ve bête bibestandin û ew ji bal wî de ji nû ve bi Serdarê Farisê ve hate bidanîn.

Belam Dîsan zor pê neçû, Fedlewî carekê din serê xwe li ber Elp Erselan de date birakirin. Wî xwe ji bona keleha Xoršah date bikišandin û li wêderê de ji bal Nizam El-Melek de Wezîrê bi nav û bang ve lê çardorî hate bigirtin. Wî keleh date bivekirin û li paš šerekî pir giran de Fedlewî hate bigirtin û ew di sala 464 k. de hate bidarvekirin[111].

Ešîra Šivankare demeke zor di welatê Kerman û Faris de bingehê šer û pevçûnan bû. Di sala 492 k.- 1099 z. de Šivankaran bi yarmetîya Iranšah Kurê Qaurt Mîrê Kerman ve Walîyê Faris Onar bidin bibezandin, yê ku ew ji Sultan Ber Keyareq hatibû bidanîn.

Demeke kêm li dawîya vê rûdanê de šer di navbera Šivankaran û Fexir El-Dewle Cawlî de, yê ku ew di sala 510 k. de hate bimirin, hate bidestpêkirin. Vî Cawlî bi navê Sultan Mohemedê Kurê Melekšah serdarîya Iraqê û welatê Farisê dida bikirin.

Mîrê Šivankare Hesen Kurê Mubarizê Xusro bi serdarîya Cawlî li ser welatê Farisê de pê nehate birûntšin. Mîr Cawlî Ket û pir hêrîš bi ser Xusro ve date birakišandin. Xusro di pêšî de bi yarmetîya Birayê xweyî Fedlewî ve dikarîbû li hêrîša wî de ber lê bide bigirtin. Belam di pištî demeke din de Cawlî li keleha Xusro de dor lê date bigirtin. Lêbelê pištî ku Xusro date bizanîn, ev dorlêgirtina hanê ji wî re him dujware û himjî dirêje, ew ligel Cawlî de lihevhat û ew ligel wî de ji bona šerê ser Kermanê çû. Hoyê vî šerê hanê jî eve bû, ku Melekê Kermanê Serokekî Šivankare Mîr Ismaîl Serdarê Darayecurd bi penahinde ve li nik xwe de dabû biwergirtin, yê ku Cawlî daxwaza berdestkirina wî ji bona xwe dida bikirin. Belam ew ji bona Cawlî nehate bidan.

Li dawiya van rûdanên hanê de weha tête biderkevtin, ku Ešîra Šivankare di pêla Sultan Mohemed kurê Melekšah de û bi aramî ve hatin birûništin. Belam di zemanê Sultan Mohemed Kurê Sultan Mohemed de bi hoyê bedbûna reftarkirina Wezîrê wî Nasir Kurê Elî Derkezîn ve Ešîra Šivankare dîsan liberrabûn date bikirin. Demekê wê ew nav û cî dane biserêš û biwêrankirin.

Di vê pêlê de di dema rûdana Kerman de pirseke din date birûdan, ku ew cihê ser peyivandinê têtê bidîtin: Kurê Mohemed Bavê Tahir, yê ku ew ligel Etabikê Sulgorê Songor de bû, li dawî de ji bona Ser Lorê

[111]Ev Goya hanêji bal Kurê Belxî Xwedîyê Farisname hatîye gotin, yê ku ew bi xwe jî ve di wî zemanî de dihate jiyandin.

Gewre bi serdar bû, piştî ku wî biserketina bi carekê ve bi ser Šivanakare ve date bianîn û w bi vî rengî ve nav û bangeke gewre ji xwe re date bisitendin. Ev jî bi hoyê penabûna Zenkîyê Kurê Tekla ve ji bona nava Ešîra Šivankare hate bikirin.

Înca em ji bona ser mêjûwa herî ronahîyî Šivankare bêtin bi-vegerandin:

Serekê Šivankare Qutub El-Dîn Mubarez û Birayê wîyî Mîrê ÎC-Îg Qutub El-Dîn Mohemed di dema linavçûna dewleta Silcoqîyî Kerman de û peydabûna šer û pevçûnên bê ser û binî û berdayî di nava wan navan de wan zor ji van rewš û zînetan sûd ji xwe re datin biwergirtin. Wezîr Nasih El-Dîn beramber bi Miletê Xez ve ji wan hewar date bixwestin. Ew jî bi hewara wî ve çûn. Belam wan bi cudabûna arezûwê vî Wezîrî ve û li ser daxwaza xelkê cî ve li pêš šerê Xez de navînîya Berdesêr datin bivegirtin. Bi vî rengî ve wan biserdarîkirina welatê Kerman ji xwe re di sala 597 k.-1200 z. de dane bimisogerkirin. Li dawîya vêna de herdu Mîr ligel Xez de bi šer ve hatin bikevtin.

Di vê pêlê pewendîyên di nava wan û Etabikê Faris de têkçû. Jiber vê jî wan yekek ji Xanedanên Kerman bi Cîgerê xwe ve li ser Kerman dane bidanîn û ew bi lez ve ji bona welatê xwe hatin bi-vegerandin.

Belam Xez dîsan welatê Kermanê dane bitalan û biwêrankirin. Yekekî ji Mîrên Kermanê bi navê Hurmuz Tac El-Dîn Šehnešah ve ligel Xez de hate birêkkevtin.

Nizam El-Dîn[112]ji Îg-Îc hat û wî rûwê xwe ber bi Hurmuz ve date bivekirin. Wî di šer de Hurmuz date bilinavbirin û Turkên Xez jî pir date biperîšankirin û wî ew ji hev dane bitarûmarkirin. Ewende pê neçû, Nizam El-Dîn dîsan ji bona nava Berdesêr hate bikevtin.

Belam ew zor ji ser xwe çû û wî pir kêmanî dane bikirin. Ševekê Neyarên wî ji niškê ve bi ser ve dane biajotin û ew û Kurên wî jî di sala 600 k. de dane bigirtin. Li dawî de wan destbigirtina Serokên leškernê Mubariz jî dane bikirin û wan li wan de çardorî jî dane bigitin.

Di vê bêhnê Peyakî din di meydana Siyasetê de hate biderkevtin, ku ev Mirovê hanê Ecem Šahê Kurê Melek dînar bû, yê ku ew ji bal Xwarzimšah de dihate bilêpištgirtin û biparastin û yê ku wî ligel Xez de peyman dabû bigirêdan û wî ligel wan de rûwê xwe ji bona welatê Ker-

[112]Dibe, ku Qutub El-Dîn Mohemed Serdarê Îg-Îc be. (M. E.).

manê date bivedan. Wî Kerman date bigirtin. Wî Nizam El-Dîn bi girtî ve ji bona layê Etabikê Farisê date binardin. Ecemšah hêvîya wî weha bû, ku êtir welatê Kerman dê bi hêsanî ve bi destên wî ve bête bikevtin.

Lêbelê Etabikê Farisê Seed Kurê Zenki xebir jê re date binardin, ku wî Îze El-Dînê Fedlewî Serdarê xwe bi leškerekî ve ji bona ser wî dayite binardin. Divê ew bi lez û bez ve Pasevanîya bajarê Kermanê bide biberdestkirin. Bi rastî jî ve Leškerê Faris bi Kerman ve hate bigihaštin û bajar ji dewleta Šivankare date bisitendin.

Mubarizê Qutub El-Dîn Birayê wî ji bona sitendina tolê bi Leškerekî ve hat, belam ji bil talankirinê û wêrankirinê pêve hîç pê nehate bikirin. Di sala 658 k. de Holako bi wan navan ve hate bigihaštin û wî Îg-Îc date bigirtin û Mîrê Šivankare jî date bikutšin.

Ji vê mêjûwê û pêve demekê Ešîra Šivankare li jêr desthilatîya Ilxanîyan de hate bimayîn û ew li paš de ji bona jêr desthilatîya Malbata Muzeferê Farisî hate bikevtin.

## *Derîyê Heštem*

## 8. Dewleta Etabekîyê Lorê Gewre yanjî Dewleta Fedleweyî ji 550-827 k. de.

Ev dewleta hanê li Jêrî Rojhilatî Loristanê de hate bipêkhatin û wê ji sala 550 tanî 827 k. de date bidirêjkirin. Wê 377 salî date bidirêjkirin. Welatê Loristan du perçe bû. Yek jê Lorê Gewre bû û yê din jî Lorê Biçûk bû. Ev perçekirina hanê ji dawîya sedsalê sêyemê koçî ve hebû. Du Bira jî Serdarê van du perçan bûn. Yek ji wan bi navê Bedir bû û yê din jî bi navê Mensur bû. Li dawîya Bedir Lorê Gewre bi destên Nesir El-Dîn Kurezayê wî ve hate bikevtin. Di wê demê de nîvekî Loristanê li jêr serpereštîya Xanedena Šolî Kurd de bû û Serdarê wê Seyf El-Dîn bû. Ev Xanedana hanê li gora go û evsanên kevin û kevnar de ji zemanê Sasanî de li vî Welatî de Serdar bûn.

Li dawîya sedsalê pêncemî koçî de sed malekî Kurd ji çiyayê Simaq di Jorî Surî de ji bona Loristanê hatin bikoçkirin û ew li çiyayê Emad li nik Mohemedê Xuršîdê Wezîrê Melek Nesir El-Dîn de cînešîn bûn[113]. Gewreyê vê Êla Kurd bi navê Bavê Hesenê Fedlewî ve dihate binavkirin.

---

[113]Insiklopêdîya Musulmantîyê bergê 3 dibêje: Ev Êla hanê di bin Rêberîya Fedlewî de ji Surî ji bona Mîyafarqînê hatin. Li paš de ew ji bona Ezerbêcanê û Gîlanê çûn. Ew ligel Mîrê Gîlanê Dîbacî de hatin birêkkevtin û ew li wêderê de hatin rûništin. Di sala 500 k. de ew ji wir ji bona Dešta Jorî Loristanêyî Šitrankoh hatin bigihandin.

## 1. Bavê Tahir Mohemed

Ew Bavê Hesenê Fedlewî bû. Di vê demê de welatê Faris bi destên Serdarên Sulgurî ve bû[114]. Kurezayê Bavê Hesenê Fedlewî bi navê Bavê Tahirê Mohemed ve bi azayî û mêrxasîya xwe ve hatibû binavûbangkirin. Wî ji Serdarên Farisan re dida bkarkirin.

Serdarên Farisan ligel Šivankare de dujminatîya wan hebû. Wan di bin Rêberîya Bavê Tahir Mohemed Kurê Elî Kurê Bavê Hesenê Fedlewî de leškerekî xurt ji bona ser dewleta Šivankare datin birêkirin. Bavê Tahir hate biserbikevtin û ew hate bivegerandin. Etabikê Songer-Solger jê zor memnûn bû û wî li ser arezoyî wî de navçeya Koh Golewî pê date bidan. Wî leškerek jî jê re ji bona zeftkirina Loristanê di sala 543 k. de date bilikarxsitin.

Bavê Tahir geh bi šer ve û geh jî bi ašitî ve hêdî hêdî Loristan ji bona Jêrdestîya xwe date bianîn. Di dawî de wî serbixweya xwe date bidazanîn. Bi vî rengî ve ji bal Bavê Tahir Mohemed de dewleta Fedlewîyî Kurd hate bidamezirandin. Bavê Tahir demekî serdarîya welatê xwe date bikirin û ew di sala 555 k. de hate bimirin. Wî li dû xwe de pênç Kur dane bihištin: Hezar Esp, Behmen, Imad El-Dîn Pehlewan, Nesret El-Dîn Eyawa Koš û Qezel Beckem?. Kurê wîyî gewre bi rezamendîya Birayên xwe ve ji bona cîgehê Bave xwe hate birûništin.

## 2. Etebik Hezar Esp

Serdarekî bi hiš û dadwer bû. Di zemanê wî de Loristan zor hate bipêškevtin û pir hate biavadanî û bidewlemendkirin. Gelek Ešîrên Kurd ji çiyayê Simaqê ji Surî ji bona Loristanê hatin bikoçkirin. Herwehajî ligel

[114]Bidanînvanê vê dewleta Solguri Yekek ji Komandarê Solcoqî bû. Wi ew di sala 542 k. de date bidanîn. Wê tanî sala 686 k. de date temenkirin. Li paš de Navnîša Etabekî ji bal Selteneta Solcoqî pê hatîye dan.

van Ešîrên Kurd jî de hin ji Eširên Ereb jî hebûn. Navên van Ešîran li gora mêjûwa Kezîdeyî Farisî de Ev bûn:

Asokî, Mema Kone, dibe, ku ew Mame Koye be, Bextarî[115], Murasilî, Sed Asan, Zahidan, Elani-Alanî, Konend, Pêwend, Bedayî, Bewazkî, Šunewîd, Rakî, Cakî[116], Harmî[117], Esîk[118], Kefî[119], Šemuš[120], Nixoyî, Kemakêšî[121], Mame Sê[122], Ewêlkî[123], Lêrawî, Delkî Tuwanî Kîya, Medîha Kurd Kolard...hd.

Hezar Esp bi alîkarîya van Ešîran ve hêz û desthilatîya xwe date bibêtirkin û wî Binemala Šolî bi carekê ve ji Loristanê date biderperandin û welatê wan ji xwe re date bivekirin. Wî sînorê welatê xwe bi çar fersexan ve dûr ji Esfehanê date bigihandin.

Etabikê Tekeleyê Sulgurî çend carekî lešker bi ser ve date binardin; belam wî biserkevtin pê neda bidîtin. Di her carekê de ew dihate bišikenandin. Roj bi roj ve hêz û hinera Hezar Esp dihate bêtirkirin. Bazirganî û çandinî her û her di pêšveketin û gešbûnê de bûn. Zor bajar û gund hatin biavanîkirin û avedanî hate bibêtirkirin. Li paš de wî Kurê xwe ji bona layê Xelîfe Nasir El-Dîn El-Lahê Ebasî date binardin û wî hêvîya navnîšana Etabikyê jê date bikirin û Xelîfe ew hêvîya wî date bicihanîn û jê re belgeyê Etabikîyê û xeftanê wê date binardin.

---

[115]Bexyarî

[116]Xakî

[117]Harunî

[118]Eškî

[119]Koyî

[120]Tehesofî

[121]Kemankeš

[122]Memastê

[123]Ewmelkî. ( ji Nivista Kurdler, r. 97 û 98).

Hezar Esp ligel Sultan Mohemedê Xwarzimî jî dostayetî date bipeydakirin. Wî Keça xwe bi Mîr Xeyas El-Dîn kurê Sultan Mohemedê Xwarzimî ve date bidan.

Piştî Serdarîyeke dûr û dirêj ew hate bimirin. Mirina wî di sala 655 k. de hatîye bitomarkirin[124]. Ger ku evaya rast bête biderkevtin, divê ku wî sed salî ji 555 tanî 655 k. de dabe biserdarîkirin[125].

## 3. Etabik Tîgele

Ew kurê Hezar Esp bû û Dayika wî ji Xanedana Sulgurlîyê Farisî bû. Gava xebera mirina Hezar Esp bi Faris ve hate bigihaştin, Etabik Seedîyê Sulgurî ji bona sitendina tola Xanedana Şol wî Pismamê Hezar Esp bi navê Cemal El-Dîn Umer ve bi leşkerekî du hezar kes ve ji bona ser Tîgele date binardin. Tîgele bi pêncsed Suwarî ve li nêzîka keleha Bîroyê de berengarî wî bû. Li dawîya şerekî germ û giran de Tîgele hate bişikenandin. Di vê dema şikenandinê de bi tîrekê ve Cemal El-Dîn Umer hate bikuştin. Leşkerê Farisî şikestin date bixwarin û biserkevtin ji bona Tîgele hate bimayaîn. Li dawî vî şerî de Sulgurîyan sê carên tir berê leşker lê dane bigirtin, belam hîçyan pê nehate bikirin.

Li paş demekê de Tîgele leşkerek ji bona ser Lorê Biçûk û hin navçîyên wêna date biseranserkirin û wî ew ji Husam El-Dîn Xelîlê Serdarê wê date bizeftkirin.

Li ser hin hoyan de Xelîfê Begdadê di bin Komandarîya Beha El-Dîn Geršasbî û Îmad El-Dîn Yunis de ji Xuzistanê leşkerek ji bona ser Loristanê date binardin. Vî leşkerê hanê hin ji welêt date bitalan û biwêrankirin, Birayê Tîgele jî date bidîlkirin û ew di keleha Lahoc de date bizindankirin. Etabik Tîgele xwe bi ser hev de date bikomkirin û wî rûwê xwe ber leşkerê Xelîfe de date bivedan. ew ligel wan de berengarî şer bû.

[124]Di Nivîsta dewletên Musulmantîyê de hatîye binivîsandin, ku ew li nêzîka 650 k. de hatîye mirin. (M. E.).

[125]Ev Mejûwa hanê ji bal Insiklopêdîya Musulmantiyê ji bona mirina hezar Esp û hatina rûniştina Etabik Tekele li ser Tex de hatîye tomarkirin. Ev mêjûwa hanê ne raste çunke, li dawîya çend salan ji Serdarîyê, şer û pevçûnê de Etebik Tekele ligel Holako bû, gava ku wî di Meha Muherama sala 666 k. de (di 16. 12. 1258 z. de) Begdad date bivegirtin.

Wî Îmad El-Dîn Yunis date bikuštin û Beha El-Dîn Geršasbî jî date bidîlkirin. Wî ew bi sozdana berdana Birayê xwe ve date biberdankirin.

Li sala 655 k. de, gava ku Holako ligel Pêlên Mogolî de rûwê xwe ji bona paytextê Xîlafeta Ebasî date bivekirin, Etabik Tîgele ji bona berjewendîya welat û dewleta xwe ligel Holako de hevrêya çûna Begdadê date bikirin. Holako ew ji bona nava hêza Serdar Kîtoqabus-Kîtmoqa date bixistin.

Etabik Tîgele li destana Begdadê de gelekî sixlet bû. Kuština Xelîfê Musulmanan zor kêr têde date bikirin û li hin cihan de wî hestîya nefreta xwe beramber wan karên kirîn nedida bivešartin. Ev gotinên wîyî hanê ber bi guhên Holako ve dihatin bikevtin û ew bi wan ve lê tûre bû. Gava ku Etabik bi vê tûrebûna Holako ve date bihestkirin, ew šarezayî dir, hov û xwedênenasîya wî bû, wî bi kês ji xwe re date bizanîn û ew bi bê azarîya Holako ve ji bona Loristanê çû. Holako Kîtoqabusê Serdarê xwe bi leškerekî ve ji bona girtina wî date binardin.

Šemis El-Dîn Ergonê Birayê Etabik bi kakê xwe ve date bigotin: Bi bašî ve qazanc tête bidîtin, ku tu min ji bona layê Holako bide binardin, tanî ku ez bikaribim xebatê ji bona birêkkevtin û lihehevhatina we bidim bikirin û leškerê Megolî jî bidim bivegerandin.

Etabik ev xwestina Birayê xweyî hanê bi bašî ve date bizanîn û wî soz pê date bidan, ku ew tanî ji bona Loristanê neghê bigihaštin, ew tu šerî ligel Megolan de nade bikirin.

Gava ku Šemis El-Dîn bi mêrga Fehrege ve li ser sînorê Loristanê de hate bigihaštin, Ew tûšî leškerê Megol bû. Wî nêta xwe bi wan ve date bigiyandin. Belam Serdarên leškerê Megolî guh pê binedan. Wan ew date bigirtin û bi zincîrê ve wan ew date bibendkirin û hemûyên ligel wî de wan ew dane bikuštin û wan berê xwe ji bona Loristanê dane bivedan.

Etabik Tîgele ji tirsa kuština Birayê xwe ve wî tu liberxwedanî neda bikirin û wî xwe ji bona keleha Cayinxešt date bikišandin. Her çend jî Serdarên leškerên Megolî jî soz û bext pê dane bidan, wî bi bextê wan ve nedida bibawerkirin, tanî ku hunguliska bextîyê ji bal Holako de bi xwe ve ji bona wî hate bidan. Wê gavê ew ji keleha xwe hate biderkevtin. Wan ew ji bona Tebrîzê datin binardin. Wan ew li wêderê de tevî li hemû dayînên soz û bextên xwe ve dane bikuštin. Peyên wî bi dizî ve meytê wî dane bihilgirtin, wan ew ji bona Loristanê dane bibirin û wan ew li wêderê de dane bišûštin û binešîvtin.

## 4. Etabik Šems El-Dîn Alp Ergon

Li dawîya kuština Birayê wî Holako ew bi Etabikê Loristanê ve date bidanîn û wî ferman jî bi vegerandina leškerê Megolî ve ji Loristanê date bidan.

Gava ku Etabikê taze ji bona Loristanê hate bivegerandin, wi welatê xwe wêran û perîšan date bidîtin. Dir û hovîtîya Megolan welatê wî dabûn binabûdkirin û xelkên welêt xwe ji bona serên çiyan û kêwîya dabûn biavêtin. Bere bere xelk ji bona çîgeh û rêgehên xwe dihatin bivegerandin û wan dest bi avanîyê û çandinîyê ve didan bikirin. Bi vî rengî ve di demeke kêm de welatê wî bi doxê car û baran ve diçû. Xwešî û bextiyarî di nava welêt û xelkê de hatin bigeškirin. Etabik di zivistanan de li bajarên Îdc-Îzac û Sos de û li dorhêla Šuštir de dida birabuhurandin. Havînan ew ji bona çiyayên kanîyên ava Šuštir û Zenderod diçû, yên ku ew bi ava xweyî pir û zor sard ve û bi daristanîya xwe ve mîna Buhuštê dihatin bidîtin.

Šems El-Dîn Alp Ergon bi vî rengî ve bi aramî, xwešî û bextiyarî ve panzdeh salan ji xwe re date biserdarîkirin û li paš de ew hate bimirin.

## 5. Etabik Yusif Šah

Di gava mirina Bavê xwe de ew li layê Ebqa Xan de bû. Pištî derbasbûna mehekê li ser vê mirinê de Ebqa Xan Fermanek bi nîšankirina wî li šûna Bavê de ji bona biserdarîkirina Loristanê date biderxistin. Ligel vê jî de ew bi xwe û dused Suwarî ve li paytextê Mogolî de hate bimayîn û wî ji bona serpereštîya Loristanê Cîgerek ji xwe re date bidanîn. Li šerê Boraq Xan de wî bi leškerekî Loristanî ve yarmetîya Ebqa Xan date bikirin û wî têde zor azayî date binuwandin. Di çûna Ebqa Xan de ji bona welatên Gîlan û Deylem ew ligel wî de bû. Peyên Deylemî di šer de xwe bi ser Ebqa Xan ve datin bidadan û wan dora wî datin bigirtin. Belam Yusif Šah bi firyada wî ve hate bigihaštin û wî ew date birizgarkirin. Beramber bi vî karê gewre ve Ebqa Xan welatê Xuzistan, Koh Gîloye, bajarê Fîrozan û Cerbazqan[126] pê date bibexšandin. Pištî vî šerî Yusif Šah

[126] Ev bajarê hanê Heft Fersexan li Jorî Îsfehan de tête bikevtin.

ji bona Koh Gîloye çû û wî hêrîšî Šolîyên hindamên Meme Sanî date bikirin. Wî Birayê Serdarê wan jî date bikuštin.

Li dawîya linavçûna Ebqa Xan de Rojhilatê welatê Îranê bi bin destên Ehmed Takodar ve hate bikevtin. Yusif Šah ligel Šûngirê Ebqa Xan de, yê ku ew Ergon bû, lihev nedan bikirin. Tevlivêjî de wî hinera liberrabûna wî di xwe de neda bidîtin. Ew neçar bû, ku di šerên Xuresan de dijî Ehmed Takodar yarmetîya Ergon ligel xwe de bi du hezar Suwar û deh hezar Peyede bide bikirin. Di šerê Xuresan de Ehmed Takar di sala 683 k. de hate bišikenandin. Leškerê Lor di ser Tebas û Notanza de di rêyên Biyanbanan re ji bona Loristanê hatin bivegerandin. Ji tîna zor ji wan hatin bimirin û wan xwe bi hezar dujwarî bi Loristanê ve dane bigihandin.

Yusif Šah li ser fermana Ergon de ji bona Loristanê çû, da ku ew šûna Xoce Šems El-Dîn Sahib bide bigirtin. Wî li wir de Keça Sahib date bimarkirin. Li paš de wî Sahib jî date bigirtin û wî ew ji bona layê Ergon Šah date binardin. Li pištî mirina Xoce Šems El-Dîn de Yusif Šah ji bona Loristanê hate bivegerandin û ew li wêderê de hate bimirin.

## 6. Etabik Efrasyab

Li dawîya Yusiv Šah de Efrasyabê Kurê wî li šûna wî de bi Etabik ve hate bidanîn. Wî jî Ehmedê Birayê xwe ji bona paytextê Megolî date binardin û ew bi xwe li Loristanê de hate bimayîn. Ew zordar bû û ew ji Xwedê nedihate bitirsandin. Wî dest bi bêbextîyê û xerabîyê ve date bikirin. Wî dest bi girtina Wezîrên kevnarî dewra hezar Esp mîna Xoce Nizam El-Dîn, Celal El-Dîn û Sedir El-Dîn ve her yek ji wan bi mehnakê ve date bikirin. Wî Mal û Mulkên wan date bidagîrkirin û wî ew dane bikuštin. Hinekan ji Meriv û Hevalbendên van Xanedanan ji bona Isfehanê datin bibazdan. Belem wî li wêderê jî de waz li wan de neda anîn. Wî Peyên xwe bi dû wan ve date binardin. Di wê gavê de Ergon Xan linavçû. Hinekan ji Gewreyên Malbatên kevnarî Isfehanê de serên xwe dane birakirin û wan Walîyê Megolî dane bikuštin.

Efrasyab ji vê kêsê xwest, ku ew ji xwe re sûd bide bigirtin. Wî ji bona Hemedanê û welatê Faris tanî gihandina Dilava Farîsî hin ji Xizmên

xwe bi Serdar ve date bidanîn, da ku ew bi carekê ve desthilatîya Megolan ji wan deveran ve bide bihilanîn. Wî Celalê Kurê Etabik Tîgele bi leškerekî ve ji bona parastina Kohrod date binardin. Liwêderê de ew tûšî leškerê Megolî bû û ew dane bišikenandin. Belam leškerê wi dest bi xerabîyê, raw û rûtkirinê ve date bikirin. Di vê raw û rûtkirina lešker de Megolî ji niškê ve li wan de hatin bivegerandin û wan ew pîs dane bišikenandin. Gava ku Šahînšah Kîxatoxan ev xebera hanê bihîst, wî di bin Komandarîya Toldayê Îdacî de leškerek ji Megol û Lorê Biçûk date bilikarxsitin û wî ew ji bona ser Efrasyab date binardin. Efrasyab xwe ranegirt û wî xwe ji bona keleha Canîxešt date birakirin. Belam di dawî de li ser šikenandina Hor Kodakê Mîrê Faris de wî ew di sala 696 k. de date bikuštin.

## 7. Etabik Nesret El-Dîn Ehmed

Li dawîya Efrasyabê Birayê xwe de bi Etabik bû. Vî Mirovê hanê ji sala 696 de tanî 730 yaxud 733 k. de dayite biserdarîkirin. Ango 35 yanjî 38 salan ew li ser Kursîya Serdarîyê de hatibû bidanîštin.

Vî Etabikê hanê piranîya jîna xwe di Seraya Îlxanîyan de date birabuhurandin. Ew zor Dadwer, bi Hišmend û xelkperwer bû. Di demekê pirî kêm de wî kavil û wêranîyên pêla Efrasyab date biavakirin û xwešî û bextiyarî li Loristanê de wî date bigeškirin û wî ew date bicîûwarkirin. Wî Dewlet û Mal date bidewlemendkirin. Wî Melek Qutub El-Dîn Kurê Imad El-Dînê Pehlewan bi Cîgirê xwe ve li Loristanê de date bidanîn. Xusro Šah Kurê Melek Husam El-Dîn wî bi Serlešker date binîšankirin. Di encam de wî Serpereštîya welatê xwe bi rengekî ve date bidamezirandin, ku tevaya xelkê di aramîyê û xwešîyê de dihatin bijîyandin.

Etabik Nesret El-Dîn zor Zanistî û Zanistvan xweš dixwest. Mele Fedil El-lahê Qezwînîyê bi nav û bang Nivista xwe Tarîx El-Muecem fi Ehwal Miluk El-Ecem-Kurtîya mêjûwa rewša Padšahên Ecem bi navê Nesret El-Dîn vedate binivîsandin û wî ew ji bona wî date bidiyarîkirin[127].

[127] Ew li Faris de di sala 1280 hate biçapkirin. Danek jê di Nivîstxana Misrî de tête bidîtin. (M. E.).

Herwehajî Nivista Mecme El-Ensab- Civandina Binemalan jî vî Mirovê hanê bi nav û nîšana Pîr dide binavkirin[128].

Gervanê Kurê Betute jî dibê: ku Etabik Nesret El-Dîn 160 Dibustan dabûn biavakirin. Li Îzac de çil û çar Dibustan dihatin bidîtin. Hinek ji wan jî wî ji bona Ešîran di nava Çiyan de dabû bidurustkirin[129].

## 8. Etabik Rikin El-Dîn Yusiv Šahê duwem

serdarîya vî Mirovî ji sala 773 tanî 740 k. de date bidirêjkirin. Ew Serdarekî Dadwer û Hišmend bû. Nivîstoka Mecme El-Ensab dibêje, ku desthilatîya vî Etabikê hanê tanî Besra, Xuzistan, Lamostan-Lazistan û Fîrozan diçû.

## 9. Muzefer El-Dîn Efrasyabê duwem

Navê Wî Ehmedê Kurê (li gora Kurê Betute de Birayê) Yusif Šahê duwem bû. Kurê Betute di pêla vî Etabikê hanê de li welatê wî de hatîye bigerandin. Li gora Šêx Mohemedê Xudrî de serdarîya vî Serdarî tanî sala 756 k. de dayite bidirêjkirin[130].

---

[128]Destnivîse. Ew ji bal Mohemed Kurê Elî Šivankere hatîye binivîsandin. (M. E.).

[129]Tanî dawîya pêla Etabik Neser El-Dîn bi dirêjî ve li ser wê de di mêjûwa Kezîde de tête bidîtin. Belam li dawîya vê mêjûwê hanê de bes û bi tenha ve min sûd ji Insiklopêdîya Musulmantîyê û Nivista Dr. Frech-Firêc dayite biwergirtin.

[130]Dr. Frech-Firêc di Nivîsta xwe de Kurdler, r. 102 dibêje: ku ev Etabikê hanê di dema Têmorleng de bû û ew Yekek ji Serdarê eškerê wî bû.

Lêbelê em Çil Salî cudabûnê di navbera zemanê vegirtina Têmorleng û vî Etabikê hanê de dibînin.

Derbarê ragiyandinên vê Xanedana hanê agehdarîyên me nînin yanjî ew zor kêmin. Mîrza Iskender li gora Goyên Mêjûvanên wê pêlê de dibêje:

## 10. Nur El-Wedud

Ew Šûngirê Efrasyabê duwem bû. Zor musrif û destbelav bû. Xina Etabikîyê wî di binê wê de tê hilda bû. Li gora Cîhan Ara de wî Mohemedê Muzefer Serdarê Farisê ji 713-760 k. de ji xwe bi Kur ve dabû bikirin.

## 11. Šems El-Dîn Pešeng

Ew bi Kurê Yusifê Šahê duwem ve [131]hatîye bidanîn. Ew Šûngerê Nor El-Wedud bû. Wî tanî sala 780 k. de dayite biserdarikirin. Di zemanî vi Etabikê hanê de Loristan ji šer û pevçûnên Malbata Muzefer zor ziyan dayite bidîtin. Šah Mensorê Muzeferî ji xwe re Šustir bi Navînîya Wargeha Cengê date bikirin. Wî ji wêderê de çend hêrîš ji bona ser Loristanê date bikirin. Jiber vê jî Bira û Hemberê Šah Mensur Bavê Šuca di hewara Pešeng de beramberî Birayê xwe vi šer ve hatîye bikevtin.

Bi rastî jî li Îzec de hinek ji Pûlên Šah Šuca hatine dozandin, ku ew ji bona Salên 762 û 74 k. de têtin bivegerandin.

## 12. Pîr Ehmed

Li dawîya mirina Bavê xw de Pešeng serdarîya Loristanê ji xwe re date bigirtin. Ew ligel Yekekî de ji Mirovên xwe bi navê Melek Hošeng bi šer ve hate bikevtin û wî ew date bikuštin. Li gora hinekan ji goyan de Pîr Ehmed û Hošeng herdu Bira bûn û ew herdu jî Kurên Nur El-Wedud bûn. Li dawî de Šah Mensurî Muzeferî Melek Pîr Ehmedî ji

[131]Šêx Mohemed Xudrî di Peyvdarîyên xwe de dibêje, ku ew bi navê Šems El-Dîn Hošeng dihate binavkirin û ew Kurê Kurê Efrasyabê duwem bû.

Loristanê date biderkirin wî Yek ji Peyên û Maqulên Lor bi Serdarî ve li šûna wî de date bidanîn.

Li sala 795 k. de, gavav ku Teymor Leng di Loristanê re hate buhurandin, Pîr Ehmed li Ram Hurmuz de ji bona nik wî çû û li paš jî de wî li Šîrazê de ji serdana wî date bikirin. Teymor Leng zor rûmeta wî date bigirtin û wî bi Fermaneke taybetî ve Mulkê Bav û Kalên wî lê date bivegerandin û ew Du hezar Malên Lorîyî, yên ku ew ji bal Šah Mensur de hatibûn biderkirin û bidûrkirin, dîsan ew ji bona Loristanê hatin bivegerandin. Teymor Leng Efrasyabê Birayê Pîr Ehmed ligel Šah Mensur de bi girawî ve li nik xwe de bi xwe re ji bona Semerqend date bibirin.

Li paš demekê de Teymor Leng Lorê Buzurg-Mezin di navbera Pîr Ehmed û Efrasyabê Birayê wî de date biparvekirin.
Li dawîya mirina Teymor Leng de Mîrza Pîr Mohemed li Kohan Diz de Pîr Ehmed date biberdestkirin û wî di sala 811 k. de Serpereštîya serdarîya Loristanê date birêkûpêkxistin. Belam pir pê neçû, ew di liberrabûneke navxweyî de hate bilinavçûn.

## 13. Bavê Seîd

Ew Kurê Pîr Ehmede. Ew Du salan bi girawî ve li Šîrazê de hatibû bidanîn. Li Dawîya mirina Bavê xwe de ew bi Serdarê Loristanê ve hate bidanîn. Ew li sala 820 k. de linavçû.

## 14. Šah Husên

Ew Kurê Bavê Seîd bû û ew Šûngirê wî. Li dawîbûna wî de bi Serdarê Loristanê ve ew ligel Xeyas El-Dîn Kawis Mîrekî ji Merovên de di sala 827 k. de bi šer ve hate bikevtin û ew di wî šerî de hate bikuštin.

## 15. Xeyas El-Dîn Kawis

Ew Kurê Hošeng bû. Wî Serdarî ji Šah Husên date bisitendin. Belam pir pê neçû, tani ku yekekî ji Nevîyên Sultan Ibrahîmê Kurê Šah

Rex Kurê Teymor Leng Lešker ji bona ser serdarîya Fedlewî date binardin û wî ew bi carekê ve date binabûdkirin. Li dawîya encamê vê de Serdarî ji bona nava destên Gewreyên Ešîrên Bextiyarî hate biveguhestin.

## Rûnkirin

Nivista Dr. Frech-Frêcê Elmanî, ya ku ew ji bal Serpereštîya Gištîyî Barkirvanan de li Turkîyê de ji bona Zimanê Turkî hatîye wergerandin, ger ew ku bi rasît ve wergerandina hanê bête biderkevtin, pir remanên dujminayetî beramber bi Kurdan ve dayite bibelavkirin. Ew li mêjûwê de naçe; çunke, Mêjû divê bi layî bête binivîsandin û ew rastîya rûdanan nede biveguhertin. Ji bona nimûne, ji wekhevbûna peyva Fedlewî wî xwestîye, ku ew jê sûd bide biwerbigirtin û bi cudabûnê ve ligel goyên Mejûwa Kezîde û mêjûwên bi nav û bangên din ve Fedlewî bi Xanedaneke Turkî ve bide bidanîn. Wer diyare, ku ew bi xwe jî bi vê dîtina sersûrayî ve nedaye bibawerkirin. Li paš de wî Xelebeyê Bavê Tahir bi Serleškerê Turkî ve bi mal ve dayite bidanîn. Li dawî de wî pir kîn beramberî bi Miletê Kurd ve dayite biderxitin û ew nebûna Miletê Kurd di mêjûwê de dide bibangkirin.

Ligel vêjî de Mêjû dibêje, ku Ev serdarîya hanê bi hêza Kurd ve hatîye bipeydakirin û ew di zemanê Bavê Tahir tanî vebigirtina Megolan de ji Sedsalî bêtir bi carekê ve bi serxweyî ve hatîye jiyandin. Li paš de ew mîna hemû Serdarîyên dinî Musulmantîyê di Rojhilat de bi neçarî ve bi serdarîya Megolan û Teymor Leng ve hatîye bibestandin

## *Derîyê Nehem*

## 9. Dewleta Lorê Biçûk ji sala 570-1250 k. de yanjî Malbata Xurşîdî

Eşîrên Lor li Rojava Jorî Loristanê de tanî sedsalê Şeşemînî Koçî de di jiyaneke Êlî de dihatin bijîyandin. Her Eşîr û Êlekî Sermîyandarîyeke xweyî taybetî bi xwe ve hebûn. Li gora mêjûwa Kezîde de Eşîrên Kurd di wê demê de evanan bûn:

Daudî, Ebasî, Mohemed Komarî, Kurohî û Cengewerî bûn. (Ev Eşîrên hanê koka Lorê Biçûk bûn û Mîr jî ji wan bûn. Ev Eşîr jiberê Silgorînin). Eşîrên tir: Karendî, Cengerî, Cengwerî, Fedlî, Sondî, Alanî, Kah kahî, Ricwarkî, Perawend, Darî, Abadekî, Ebu Ebas, Elo Memayî, Keçayî, Seleskî, Xodkî, Bendoyî...hd. Eşîrên Sahî, Ersan, Erkî û bihî herçend jî ew bi Lorî ve didin biaxivtin, belam ew bi xwe ve jî Lor nînin. xelkên gundan jî Lor nînin.

Ev Eşîrên hanê tani Nîvê sedsalê Şeşemî Koçî de Serpereştîyeke wanî taybetî bi xwe ve nedihate bidîtin. Ew bi dewleta Navînî ve li Begdadê de dihatin bibestandin.

Di sala 550 k. de Turkekî Hevşarî-Efşarî bi navê Husam El-Dîn Sohilî ji bal Sulcoqîyan ji bona Lorê Biçûk û Xozistanê bi Serdar ve hate bidanîn. Bav û Bavpîrên Malbata Xurşidî[132] vebestên vî Serdarê Sulcoqî

[132]Insiklopêdîya Musulmantîye dibêje; Berî pêkhatina dewleta Etabikê Lorê Buzurg-Gewre Serdarek li vî Welatî hebû û Wezîrekî wî bi navê Xurşîd ve dihate bidîtin. Renge, ku ev XurŠÎdê hanê ligel Gewreyên Malbata Xurşîd pêwendîyeke wî bête bidîtin.

bûn û ew ji Ešîra Cengerdî-Cengwerîyê Lorî bûn. Bavê Šuca El-Dîn Xuršîd Kurê Bavê Bekir Kurê Mohemed Kurê Xuršîd ji Malbata Xuršîdî bû. Wî ligel Birayê xwe Nur- El-Dîn Mohemed de li nik Husam El-Dîn Sohilî de cihekî berz û bilind ji xwe re didatin bidîtin. Šuca El-Dîn Xuršîd ji bal Husam El-Dîn ve ji bona Bešekî ji Lorê Biçûk bi Parêzvan ve hatibû bidanîn.

## 1. Šuca El-Dîn Xuršîd

Li dawîya mirina Husam El-Dîn de di sala 570 k. de Sûca El-Dîn Xuršîd ji bona hemû Lorê Biçûk bi Serdarekî serbixwe ve hate bikirin. Ešîra Cengerdî-Cengewerî, ya ku ew ku Bav û Bavpîrên Šuca El-Dîn jê bûn, di wê demê de li jêr Serpereštîya Surxabê Kurê Eyar.de bû. Ev Mirovê hanê Berber û Dujminê Šuca eL-Dîn bû.

Jibervêjî Šuca El-Dîn Leškerek lê date bigirtin û wî ew li keleha Dizê Siyah-keleha Reš de Çardorî lê date bigirtin. Hemû xelkên Manrod bo Koçkirinê ve hatin bineçarkirin.

Xelîfê Begdadê ji bona Navcîya wan bikevtin. Wî ferman bi Šuca El-Dîn ve date bidan, ku ew bes û bi tenha ve waz li keleha Mangara de bide bihištin. Šuca El-Dîn fermana Xelîfe date bicihanîn. Xelîfe li ser vê bicihanîna Šuca EL-Dîn de bi dayîna Melbenda Tarzak ve li Xozistanê de date bidiyarîkirin[133]. Mêjûwa Kezîde li ser mayîna rola Šuca de dide

[133]mêjûwa Kezîde vê Rûdana hanê bi corekî din ve dide biveguhestin û ew dibêje: ku Šuca El-Dîn bi dest ve date bigirtin. Di dawî de Surxab Parêzgeha Manrod ji bona Šuca El-Dîn date biberdestkirin.

Li paš de Šuca El-Dîn Kurên xwe Bedir û Heyder bi Leškerekî ve ji bona ser Ešîra Cengrewî-Cengewerî û keleha Diz Siyah datin binardin. Wan li kelehê de dorlêpêçandin dane bikirin.

Di šer de Heyder hate bikuštin. Li ser vêna de Šuca El-Dîn li ser Ešîra Cangewer de hate bikînbûn û wî her Yekekî ji wan bi destên wî ve bihata bikevtin, wî ew didan bikuštin. Li ser encamê vi karê hanê de hemû Tudeyan Manrod dane bicihištin. Li paš navekê de Navînîtîya Xilafetê Šuca El-Dîn û Birayê wî Nur El-Dîn ji bona hatina Begdadê datin bibangkirin. Ew ji bona Begdadê hatin biçûyîn.

Xelîfe ji wan daxwaza berdana keleha Mangara date bikirin. Wan bi vê daxwaza hanê ve nedane bikirin. Xelîfe ew ji bona nava binê zindanê datin biavêtin. Nur El-Dîn di zindanê de hate bimirin. Wî berî mirina xwe ji Birayê xwe re bi nedana kelehê date bitemînîkirin. Belam Šuca ku zanî, bê dana kelehê ew ji

bigotin: Ev Mîrê hanê zor pîr bibû; jibervêjî Bedrê Kurê wî û Seyf El-Dînê Restemê Birazayê wî hergav di nokerîya wî de bûn. Di vê pêlê de Ešira Beyat hinek ji Perçeyên Loristanê bi destên xwe ve dabûn bixistin. Bedir û Seyf El-Dîn Restem Leškerek bi ser wan ve datin biraserkirin. Li dawîya šerekî dirêj de wan ew ji Loristanê dane biderperandin..

Šuca El-Dîn Bedrê Kurê xwe ji bona Šûna xwe date binavkirin û Seyf El-Dîn Restem jî ji bona Šûna Bedir date binavkirin.

Belam Seyf El-Dîn boxtanek ji bona Bedir date bihelbestandin û wî ew date bikuštin. Li paš bêhnekê de Šuca El-Dîn xebera vê tawankarîya hanê pê date bizanîn û zori pê neçû, ku ew di sala 612 k. de û li temenekî ji Sed Salî bêtir hate bimirin.

Ew Serdarekî pirî hišmend, dadwer û xweševist bû. Goristana wîna li bal xelkên Lorî de pirî pîroz û bi nav û bang ve tête bidîtin û ew ji bal wan de tête biserdanîkirin.

Vî Serdarê hanê jiyaneke gerokî didate birabuhurandin. Havînan ew ji bona Kîrbet dihate çûyîn û Zivistanan ew ji bona Gundê Delorane di Pištkoh de dihate bidaništin. paytextê wîXurem Abad bû.

## 2. Etabik Seyf El-Dîn Restem

Ew Kurê Nur El-Dîn Mohemede û Navnîšana Etabikîyê pê hate bidan. Ew zor hišmend û dadwer bû. Derbarê xwešbûna zemanê vî Mirovê hanê de çîrok û çîvanokên xweš têtin bigotin. Di dema serdarîya wî de talanî, raw û rûtkirin û xerabî hatin bihilanîn. Belam vê zîneta hanê ewende dilê Miletê wî neda xweškirin. Bêdilovanên wan xwe li dor û berên Šeref El-Dîn Bavê Bekir Birayê wî de dane bikomkirin. Gava ku ew di Avgermê de bû, ew tev ji bona ser wî hatin biçûyîn. Her çend jî ew ji vê tepê hate birizgarbûn, belam ew bi šûn wî ve hatin bikevtin. Di dawî de Birayê wî ew ligel Mîr Elî Kurê Bedir de dane bikuštin.

---

Zindanê nayête biberdan. Wî ji dêlva wê ve keleha Tarzak û Dorhêla wê ji Navînîya Xilafetê date bidaxwazkirin. Navînîya Xilafetê bi vê guhertina hanê ve date bidilgirtin. Wê ew date biberdan û ew di sala 590 k. de ji bona Loristanê hate bivegerandin û wî di pištî vê re Sî Salên tir li Welêt de date biserdarîkirin.

## 3. Šeref El-Dîn Bavê Bekir

zemanê vî Mîrî bi šer, pevçûn, berberî, dujminayetî û bêbextîyê ve di navbera Endamên vê Xanedana hanê de hatîye biderbaskirin.

## 4. Ize El-Dîn Geršasb

Ev Birayê Šeref El-Dîn bavê Kir bû. Wî Melîke Xatûn Jinbira xwe date bimarkirin. ya ku ew Xweha Sulêman Šah bû, yê ku ew Serleškerê Xelîfe Mutesem bû.

Husam El-Dîn Xelîlê Kurê Bedir, yê ku ew demekê li Begdadê de daništibû, gava bihîst, ku Ize El-Dîn Geršasb ji bona Loristanê bi Serdar ve hate bidanîn, ew ji Begdadê ji bona Xozistanan hate çûyîn. Wî li wêderê de Leškerek date bilidarxistin û wî ruwê xwe ber bi Loristanê ve date bivekirin.

Ize El-Dîn Geršasb nikarîbû wî bide birawestandin. Belam li ser kêra Pîreka xwe û Xweha xwe de wî berberîya Husam El-Dîn date bikirin. Leškerê Lorê Hevalbendê Husam El-Dîn Ize El-Dîn Geršasb dane bigirtin û ew hate biberdestkirin. Serpereštîya welatê wî jî ji bona nava destên Husam El-Dîn hate biveguhestin.

## 5. Husam El-Dîn Xelîl

Ew Kurê Bedirê Kurê Šuca El-Dîn Xuršide. Ew li dawîya kuština Bavê xwe de ji bona Begdadê hate çûyîn û ew li wêderê de hate binešînkirin.

Li dawîya vêna de. gava ku Mîrnešînîya Loristana Biçûk bi destên wî ve hate bikevtin, wî Ize El-Dîn Geršasb bi Šûngirê xwe ve date bidanîn. Lêbelê wî li paš salekê de bi mehneyekê ve ew ji bona nik date bibangkirin û wî ew date bikuštin.

Gava ku Jina Ize El-Dîn Meleke Xatun evaya bihîst, Sê Kurên Ize El-Dîn, yên ku ew hêjî Mendal bûn, wê ew bi dizî ve ji bona layê Birayê

xwe Šehab El-Dîn[134] datin binardin. Evaya bi hoya Dujminatîyê ve di navbera Husam El-Dîn û Šehab de hate bikirin. Di mehekê de wan çend caran ligel Yektir de dane bišerkirin. Di dawî de Sulêman Šah hate šikenandin u keleha Buhar û hin ji Heremên dinî Kurdistanê bi destên Husam El-Dîn ve hatin bikevtin.

Li paš demekê de Sulêman Šah bi yarmetîya Xilafetê ve Leškerekî zor giran date bihilgirtin û ew ji bona ser Husam El-Dîn hate biçûyîn. Di Dešta Šaporxwast de herdu Lešker têkelî hevbûn. Di encam de Sulêman Šah hate biserkevtin û Husam El-Dîn di sala 640 k.de hate bikuštin.

## 6. Bedir El-Dîn Mesud

Li dawîya linavçûna Husam El-Dîn de Birayê wî Mesud ji bona layê Menko Xan hate çûynî û wî gilîyê xwe li layê wîde date bikirin. Ew ligel Holako[135] de ji bona Îranê hate bivegerandin.

Di dema bizeftkirina Begdadê de Sulêman Šah ji bal Holako hate bikuštin. Bedir El-Dîn Mesud Mala Sulêman Šah ligel Pîrek, Zarok û Merivên wî de ligel xwe de dane bihilbigirtin û wî ew ji bona Loristanê dane bibirin. Li Paš biserdarîkirina Šazdeh salan de ew di sala 658 k. de hate bimirin.

Ev Mirovê hanê Serdarekî Dadwer bû. Ew bi hiš û zana bû. Di Zanistiya Šafiî de ew pir šareza bû. Ew zor Dîndar û Dilovan bû.

Li dawîya mirina wî de di navbera herdu Kurên wî û Tac El-Dîn Šah Husam El-Dîn de Šer û pvçûnê date bidestpêkirin.

Li Paš de Ibqa Xan Kurên Bedir El-Dîn dane bikuštin û Serdarî bi Tac El-Dîn ve date bisipartin.

---

[134]Ew Sulêmane Kurê Bercemê Îwaî ye, yê ku ew Gewreyê Tira Iwaîyî Turkumanî bû. Evaya di pêvekirina mêjûwa Iraqê de hatîye bitomarkirin, ya ku ew ji bal Ezawî hatîye binivîsandin. Wî jî ev ji Nehic El-Belaxe dayite biwergirtin. (M. E.).

[135](Holako-Hulagu Xan: "Ew di sala 1217 z. de hat zayîn û ew di sala 1265 Z, de hate bimirin. Ew Nevîyê Cengîz Xan bû.." Insiklopêdîya Biçukî Elmanî, Mayers Taschen Lexikon A/Z, Leiptzig, sala 1963 de, r. 436. Cuma).

## 7. Tac El-Dîn Šah

Vî Mirovê hanê Hivdeh-Heftdeh salan Serdarî date bikirin. Ew di serdarîya xwe de baš bû. Xwedîyê mêjûwa Alem Aray Ebasî di bergê duwem de dibêjê:, ku ev Xanedanê Xuršîdî bi Ebasîyan jî dihate binavkirin: jiber ku Mulkê wan bi Xelîfên Ebasî ve dihate bibestandin. Di dawî de Iqba Xan ew jî di sala 677 k. de date bikuštin.

## 8. Felek El-Dîn û Ize El-Dîn

Li dawîya kuština Tac El-Dîn Šah de Ibqa Xan ev herdu Kurên Bedir El-Dînê Mesud bi Serdarî ve li Šûna wî de datin bidanîn.

Li gora fermana Îlxanî-Megolî de Karmenmendîya îš û karên Diravî bi Felek El-Dîn ve hatin bisipartin û bi Ize El-Dîn Husênê Birayê wî ve çavdêrîya Mulkên Taybetîyî bi Xaqan-Sultanê Gewre ve hatin bisipartin.

Van herdu Biran Panzdeh salan bi bašî ve di Loristanê de dane bisermiyandarîkirin. Wan Hêzeke baš bi Leškerekî Heftdeh hezar Kesî ve dane bipeydakirin. Wan Ešira Beyat bi carekê ve ji Lorsistanê dane biderkirin. Wan sînorên xwe bi Šuštir, Hemedan û Isfehanê ve dane bigihandin û ji alîyê din de wan ew bi Iraqê ve dane bigihandin.
Mîr Felek El-Dîn zor bi hiš, zanevan û liserxwe bû. Lêbelê Mîr Ize El-Dînê Birayê wî sert, Mêrxas û bidilovan bû. Vê cudabûna serûštîya wan kêr li sermiyandarîya wan de li ser Welêt de neda bikirin. Herdu Biran bi dadwerî ve Welat û Tude bi rê ve didan birin. Asayiš û ewletî li hemû layekî de li Welêt de hatin bibaškirin. Ligel Serdarên Dirawsên xwe de pêwendîyên wanî dostanîyî çak hebûn

Lihevhatineke seyr bû, ku ev herdu Biran di Yek Salekê jî de bi Xwedanê xwe ve di sala 606 k. de hatin bivegihaštin.

## 9. Cemal El-Dîn Xidir

Ev Mîrê hanê Kurê Tac El-Dîn Šah bû. Ew bi fermana Kîxato Xan ve bi Fermanrewayê Lorê Biçûk ve hate bidanîn.

Lêbelê Du Berber jê re hatin bipeydakirin û wan nehišt, ku ew sermiyandarîya serdarîya xwe bide bikirin. Ev herdu Berberên wîyî hanê xurt bûn. Yek ji wan Husam El-Dîn Umer Nevîyê Bedir Kurê Šuca El-Dîn Xuršîd bû û yê din Šems El-Dîn Ilyasê Lekî bû.

Van herdu Berberan serên xwe jê re nedidan bitewandin. Wan bi alîkarîya Megolên wê Navê de di dema raw û šikare de Cemal El-Dîn ligel çend Xizmên wî de dane bikuštin. Bi vî tonê ve Çira Malbata Husam El-Dîn Xelîl di Welêt de di sala 693 k. de hate temirandin.

## 10. Husam El-Dîn Umer

Vî Mîrê hanê bi zora xwe ve serdarîya Loristanê bi destên xwe ve date bixistin. Belam Semam El-dîn Mohemed, Nur El-Dîn Mohemed Kurên Ize El-Dîn Geršasb u Merevên wan ligel wî de bi dujminatî ve hatin bikevtin.

Husam El-Dîn bi yarmetîya leškerê Mengolî ve pišta xwe dida bisitûrkirin. Begzadeyên Xuršîdîyî din hevalbendîtîya Semam El-Dîn Mohemed ji xwe re didan bigirtin; jiber ku ev Mîrê hanê zor aza û bi hiš bû.

Semam El-Dîn Leškerekî zori zor ji xwe re date bikomkirin û wî ji sînorê Xozistanê berê xwe ber bi Xurem Abad ve date bivedan. Li dawî de Husam El-Dîn waz li Biserdarîkirinê date hênanîn û wî ew ji bona Semam El-Dîn date bicihištin.

## 11. Semam El-Dîn Mohemed

Rojgarîya vî Mîrê hanê di šer û pevçûnan de di navbera wî û Mirovên wî de hate birabuhurandin. Di dawî de ew bi fermana Gazan Xan ve di sala 695 k. de hate bikuštin.

## 12. Ize El-Dîn Ehmed

Ew Kurê Mîr Mohemedê Kurê Ize El-Dîn Husên Kurê Bedir El-Dîn Mesud bû. Li dawîya Semam El-Dîn de ew bi Serdarê Loristanê ve hate bidanîn. Ew hêštajî Mendal bû. Kurmamê wî Bedir El-Dîn Mesud Kurê Felek El-Dîn Hesen ji Ize ElDîn gewretir bû; jibervêjî wî serê xwe jê re neda bidaxistin.

Di dawî de Olcayto Xan[136] ev Kurmamê bi Etebik û Serdarê Delar[137] ve date danîn. Bešê Enco jî ji Welêt bi destên Ize El-Dîn ve hate bihištin.

Li Paš demekê de Bedir El-Dîn mir û hemû Lorê Biçûk bi Mîr Ize El-Dîn Ehmed ve hate bihištin

## 13. Dewlet Xatûn

Li dawîya mirina Ize El-Dîn Ehmed de gerandina serdarîya vê dewletê bi destên Jina wî Dewlet Xatûn ve hate bikevtin. Lêbelê pê gerandina serdarîyê nehate bikirin; jiber ku Mengolan destdirêjîya nava serdarîya wêna didan bikirin[138].

Goyek vedibêje: ku vê Padišaha hanê šû bi Etabikê Lorê Buzurg Yusif Šah ve date bikirin û Textê serdarîya xwe ji bona Ize El-Dîn Husên date bihištin, (yê ku ew li gora Šerefname de Birayê wê bû. M. E.).

---

[136]Di Šerefname de ew ne bi navê Olcay Xan hatîye binivîsandin, lêbelê ew bi navê Sultan Mohemed Xweda Bende hatîye bitomarkirin. (M. E.).

[137]Di Šerefname de ji dêlva Delar Welay hatîye binivîsandin. (M. E.).

[138]mêjûwa Kezîde li ser rûdanên vê dewletê de tanî zemanê Dewlet Xatûn dide peyivandin.. Li ser rûdanên dinî mayîn de ew ji Insiklopêdîya Musulmantîyê û ji Nivista Dr. Frech-Firêc wergerandina wêyî Turkî hatine biwergirtin.

## 14. Ize El-Dîn Husên

serdarîya Etabikê hanê ji bal Sultan Bavê Seîd ve pê hate birûništin û wî Çardeh salan date biserdarîkirin.

## 15. Šuca El-Dîn Mehmud

Li gora Dr. Ferech-Firêc de bayê Serxwebûnê bi serê wî ve hatibû bikevtin û ew nema Mengolan bide binaskirin. Lêbelê xelkê bi vî bayê ber serê wî ve nedan bikirin. Ew li ber wî de hatin birabûn û wan ew dane bilinavbirin.

Šerefname dibêje: ku ew Kurê Mîrê berê bû. Kuština wî ew bi ser hoyekî tir ve dide bivegerandin, ku pevçûnê di navbera wî û xelkê de hate bivêkevtin û ew pê hate bilinavçûn. Bi kurtî ve çilo be, ev Serdarê hanê di sala 750 k. de hatîye binabûdkirin.

## 16. Mele Ize El-Dîn Kurê Šuca El-Dîn

Di dema mirina Bavê xwe de ew hêštajî Mendalekî Duwanzdeh Salî bû. Di sala 785 k. de Muzeferê Šah Šuca bi Leškerekî ve ji bona ser Xurem Abad hate bigihaštin. Wî Keça Melek Îze El-Dîn ji xwe re date bimarkirin. Keça wîyî din jî Sultan Ehmed Çelayerî Serdarê Begdadê ji xwe re date anîn. Di sala 788 k. de, gava ku Teymorleng[139] bi Îranê ve hate bigihandin, Lorê Biçûk di zîneta têkçûnê de bû.

Teymorleng li Fîrozkoh de xwe bi lez û bez ve ji bona ser Loristanê date bigihandin. Wî li Xurem Abad de dor lê date bigirtin. Pištî

[139] "Teymorleng di sala 1336 z. de hate zayîn û ew di sala 1405 z. de hate bimirin. Ew Yekek ji Gewretirîn Xanên Mengolî bû. Li sala 1370 z. de ew li Semerkend de Serdar bû. Wî Asya Navînî û Îran datin bikavil û biwêrandkirin. Wî ji sala 1398-1399 z. de šer li Hindistanê de date bilidarxistin. Di nava dewleta Osmanî de wî šer di Salên 1400-1402 z. de bi serkevtîve date bikirin" Insiklopêdîya Elmanîyi Biçûk -Mayers Taschenlexikon A-Z, r. 1013, Leipzig 1963 de. (Cuma).

demeke kurt wî ew date bizeftkirin û wî ew date bitextkirin. Wî tevaya Welêt bi ber talanîyê û kuştinê ve date bivekirin. Mîr û Begzadeyên Lorî hemî wî datin bikuştin.

Goyek vedibêje, ku Melek Ize El-Dîn ligel Kurê xwe Seyid Ehmed di Dija Remyan de li nêzîka Birocord de hatin bidîlkirin. Ew û Kurê xwe di Semerqend de di Dija Endekan de li nêzîka Hemedanê de hatin bizindankirin. Li dawîya Sê salan de ew ligel Kurê wî de ji bona Loristanê hatin binardin. Li zemanê Muzeferê Zayin El-Abidîn de Melek Ize El-Dîn jêhatbûneke zor diyar date nuwandin.

Di sala 795 k. de Teymorleng careke din ji bona Îranê hate bivegerandin. Melek Ize El-Dîn li Birocord bû û ew ji wir ji bona Šustir çû. Teymorleng vê carê bi rastî xakê Loristanê date bitextkirin û golên ji xwînê jî wî di nava wê de datin bipirkirin. Ligelvêjî de Melek Ize El-Dîn bi ber destên Teymorleng ve nehate bikevtin. Kurê wî jî revya û ew jî ber bi destên Teymorleng ve nehate bikevtin.

Serdarê welatê Faris Mohemed Sultan ji vê tevlihevbûnê kês ji xwe re date bidîtin û wî di sala 798 k. de Loristan û Xozistan bi bin destên xwe ve datin bixistin.

Goyek vedibêje, ku Melek Ize El-Dîn li paš de ji bal Teymorleng hate bigirtin û wî ew di sala 804 k. de date bikuštin.

## 17. Melek Seyid Ehmed

Di rûdana kuština Bavê xwe de wî xwe dabû bivešartin. Li dawîya linavçûna Teymorleng de (di sala 1405 z. de. Cuma) wî xwe date biderxistin.

Di sala 810 k. de wî li Loristanê de Serdariya ji nûve date bilidarxistin. wî tanî sala 815 k. de date biserdarîkirin.

## 18. Šah Husên

Li dawîya mirina Birayê xwe Seyid Ehmed de wî Serdarî bi destên xwe ve date bixistin. Wî kês ji xwe re ji pevçûnên di navbera Nevîyên Teymorleng de date bigirtin û wî sînorên welatê xwe datin

bifirehkirin. Wî sînorên xwe tanî nêzîka Hemedan, Cerbazkan û Isfehanê dane bibirin.

Wî hêrîša ser Šehrezorê date bikirin. belam ew ji bal Ešîra Beharlo ve di vê hêrîša hanê de hate bidîlkirin û pê ew di sala 871 k. de hate bilinavçûn.

## 19. Šah Restem

Ew Kurê Šah Husêne. Li dawîya Bavê xwe de ew bi Serdar ve hate bikirin. Šah Ismaîlê Sefewî li paš vekirina Begdadê de ruwê xwe ber bi Huwêze ve date bivedan. Li wêderê de wî Leškerekî Deh hezar Kesî di bin Komandarîya Hesen Beg Lele û Beyram Beg Qermanlo de ji bona ser Šah Restem date bilikarxsitin û binardin.

Vî Mîrê hanê xwe ji bona serên Çiyan date biavêtin. Belam ew ji bal leškerê Šah Ismaîl hate bitengavkirin û ew bi ber destbûnê ve hate bineçarkirin. Ew ji bona nik Šah Ismaîl hate çûyîn. Šah Ismaîl lê hate buhurandin û wî ew dîsan bi Mîrîtî ve ji bona Loristanê date binardin[140].

## 20. Ogoz Xan

Ew Kurê Šah Restem bû. Ew ji bal Šah Tehmaseb bi Serdarê leškerê Îranê ve hate binîšankirin. Bi rastî jî ew Serleškerekî pirî baš bû. Ogoz Xan di sala 940 k. de bi leškerekî giran ve ji bona ser Serdarê pišt çem ve Eb-Dulah Xan Oz Beg hate biçûyîn, yê ku ew di wê gavê de bi Xuresanê ve hatibû bigihaštin û wî Îran ber bi metirsîye ve dabû bilerizandin û bixistin.

Ogoz Xan gava ku ew ji bona vê çûyînê hatibû çûyîn, wî Cîhangîrê Birayê xwe di šûna xwe de li ser serdarîya Loristanê de dabû bidanîn. Lêbelê di dawîya demekê de Cîhangîr serxwebûn date dazanîn û Tujî de Hevalbendîtiya wîna datin bikirin.

---

[140]Xwedîyê mêjûwa Cîhan Arayê Ebasî dibêje, ku Šah Restem rî dirêj bû. Šah Ismaîl ferman date bikirin, ku rîya wî bi Dur û Cewheran ve bête xemilandin. Ew bi wî qilafetê xwe ve ji bona nik Šah Ismaîl hate çûyîn û jê re kêfa Šah Ismaîl pir hate bidîtin. (bergê 1).

Gava ku Ogoz Xan ji çûna šerê xwe hate bivegerandin, ew ligel Birayê xwe Cîhangîr de bi šer ve hate bikevtin. Ew di wî šerî de hate bikuštin.

## 21. Cîhangîr

Li dawîya kuština Ogoz Xan de wî bê Berber u Hember serbixwe ve çend Salekî sermiyandarîya serdarîya xwe date gerandin. Ligelvêjî de pêwendîyên wî ligel Serdarê Sefewî de bi carekê ve nehatibûn têkveçûn. Di sala 848 k. de Šah Tehmaseb ji bona serdana El-Dewle Rehnaše Ostandarê Deyzfulê ji bona wan navan hate çûyîn. Cîhangîr ji bona layê wî hate çûyîn û wî jê re pišt date bigirtin û wî ji bona mezinbûn û hêjabûna wîna serê xwe date tewandin.

Iskenderê Menšî di bergê duwem de di Nivista xwe de dibêje, ku Cîhangîr li dawî de ruwê xwe li Îranê de date badan. Šah Tehmasebê yekem di bin Komandarîya Eb-Dulah Xanê Osta Celo de Leškerek ji bona ser Cîhangîr date biraserkirin. Di šer de Cîhangîr hate bikuštin. Leškerê Îranî kuštareke zor date bikirin.

kurên Cîhangîr Šah Restem û Mohemed ji bona Begdadê hatin birevandin. Li dawî de li ser hêvîya Seyid Mîr ji Šah Tehmaseb de ew li restem Šah de hate buhurandin[141]. Lêbelê bi hoyên livandinên wî ve ji bona serxwebûnê wî ew date bigirtin û wî ew date bikuštin.

## 22. Šah Restemê duwem

Ew Kurê Cîhangîre. Šah Tehmaseb bi bêdilya xwe bi serdarîya wî ve hate birûništin.; jiber ku Serdarên Loristanê li xwe de nedihatin birûništin. Wan hergav ber û pištên xwe didan bibêzarbikirin. Hoyê vêjî ev bû, ku Šah Tehmaseb dixwest, ku ew Ocaxê vê Xanedana hanê bide temirandin. Bi xwe jî ve Šah Restem Birayekî wîyî Biçûk ve Kesekî wîyî din nebû.

[141]Isker Menšî bi xwe ve dibêje, ku li dawîya lêbexšandina Šah Tehmaseb ji bona Restem û Mohemed de wî Mulkê Lorê Biçûk di nava wan de date biparvekirin. Lêbelê Insiklopêdîya Musulmantîyê bi corekî din dide biaxivtin.

Bi kurtî ve Šah Tehmaseb Yekek ji Mîrên Šah Restem bi navê Mîr Mohemed ve jê date tefirandin. Wî bi alîkarîya vî Mîrê hanê ve Šah Restem ji bona Tehranê date anîn û dest bi cî ve wî ew date bizindankirin.

Gava ku Ešîrên Lor di mebesta Šah Tehmaseb de hatin bilib-erkevtin, wan Mohemedê Birayê Šah Restem di keleha Çengolê-Šengolê de datin bivešartin û wan Hêzeke xurt bi Pasevanî ve jê re datin bidanîn. Bi vî rengî ve Loristan bê Serdar hate bimayîn û wê çend salan jî bi vî rengî ve date birabuhurandin.

Ji ket û pirt ve Mirovek hate peydabûn û wî got: Šah Restem ezim u min ji zindanê daye bibazdan. Ev Mirovê hanê zor šarezayê Loristanê bû û herwehajî ew zor li Šah Restem de dihate çûyîn, bi rengekî weha bû, ku Jinên Restem cudabûn pê nedidan bikirin. Bi vî rengî ve Mîrnešînîa Loristanê ji nû ve belam bi rengeî din ve hate bivejandin.

Gava ku Šah Tehmaseb evaya date bihîstin, bîn lê hate bitengkirin û wî Šah Restemê rasteqîne date biberdan. Wî fermana serdarîya Mîrnešînyîa Loristanê ji bona Šah Restem date bidan û wî ew ji bona Loristanê date binardin.

Šah Restemê derewînê pêši hate bieškerekirin. Ew hate bigirtin û ew hate bikuštin. Šah Restemê rast serdarîya xwe date bidamezirandin.

Di vê pêlê de Mohemedê Birayê Šah Restem jî gewre bibû û Hevalbendên pir ji xwe re dabûn bipeydakirin. Wî jî ji xwe re doza Serdarîyê dida bikirin. Hindik mabû, ku ew û Birayê xwe ligel hevdû de bišerkevin. Hin ji Mîrên Loristanê ji bona nava wan hatin bikevtin û wan ew lihevdû datin anîn. Çaršešê Mulkê Loristanê ji bona Šah restem hate bidan û Dušešê mayî ji bona Birayê wî Mohemed hate bihištin.

Bi vî šêwî ve wan demek datin birabuhurandin. Lêbelê Mohemed li xwe de nehate rûnitšin. wî pir šer bi Šah Restem ve didan bifiroštin. Di dawî de bi mehna mêvandarîyê Šah Restem ew date bimêvandarîkirin. Wî ew û Peyên wî di vê mêvandarîya hanê de tevde dane bigirtin û bizindankirin.

Ev Mohemedê hanê Sê Kurên wi hebûn. Li ser vê reftara derbarê Bavê xwe de wan serên xwe dane bihiladn. Wan Šah Restem û Šah Tehmaseb pir dane bibêzarkirin û xelkên Loristanê jî tûšî ziyaneke gewre bûn.

Gewre û Maqûlên Lor kombûn, da ku ew vê serhildana hanê bînin bidawîkirin. Wan bi pêwist datin bidîtin, ku Mohemed ji bona Serdariya xwe careke din bête bivegerandin; çunke, ji bona hilanîna vê serhildanê û vê malwêranîyê ji bil berdana Bavê wan pê ve çareyeke din

nayête bidîtin. Wan tomara pevdarîyên civîna xwe ji bona Dîwanxana Šah Tehmaseb datin binardin. Šah Tehmaseb bi mercê rêkirina Kurên wî ve ji bona Tehrane bi girawî ve li nik wî de bi hêvîya wan ji bona berdana Mohemed hate birûništin.

Bi vî tonî ve Mohemed hate biberdan û zorî pê nehate çûn, Kurên wî jî kês ji xwe re datin bidîtin û wan ji Tehranê dane bibazdan.

Mohemed li ser li nû ve gerden li Šah Restem de pir date bitengkirin û wî tevaya Loristanê ji bona jêrdestîya xwe date anîn.

Mohemed li paš de ligel Šahê Iranê de xerîk kevt û li dawî de wî ligel wî de pêwendîyên baš dane bipeydakirin. Herwehajî wî ligel Šehrîyarê Osmanî Muradê Seyem de pêwendîyên zor çak dane bigirêdan. Wî Loristana Biçûk bi jêr parêzvanîya Osmanî de di sala 922 k. de date bixistin. Bi vî corî ve wî Navçeyên Mendelî, Bedre, Cesan û Torsaq jî bi ser Loristana Biçuk ve datin bivekirin.

Lêbelê zû pê neçû, pêwendîyên wî ligel dewleta Osmanî de hatin têkçûn û wî li ser nuh ve pêwendîyên xwe ligel Šahê Sefewî de dane bibaškirin. dewleta Osmanî Beglerbegê Begdadê bi Leškerekî ve ji bona ser wî date binardin. Belam hîç pê nehate bikirin.

## 23. Šah Wirdî

Di gava mirina Bavê Mohemed de Šah Wirdî bi girawî ve li Begdadê de bû. Her çilo bû, wî xwe rizgarkir û ew ji bona Loristanê hate bivegerandin û ew li cihê Bavê xwe de hate bidaništin. Šah Sefewî Xweda Benjî de bi serdarîya wî ve hate birûništin.

Di dema ku leskerê Osmanî Nehawend date girin, Šah Wirdî jî ji bona layê Qorqurmiz Xanê Serdarê Hemedanê hate biçûyîn.

Gava Senan Paša rûwê xwe ber bi Hemedanê ve date bivekirin, Šah Wirdî ji bona Serdarê Hemedanê date bišîretkirin, ku bi Leškerekî kêm ve rawestnadin bermbarî Senan Paša baš niye. Vî Serdarî bi gotinên wîna ve guh pê nedan bikirin. Di encamê šer de ew hate bidîlkirin. Šah Wirdî-Derdî jî ji bona Loristanê hate bivegerandin. (Mêjûwa Cîhan Araya Ebasi, bergê 2).

Di vê demê de Ešîra Qere Ulos, ya ku ew li dorhêla Nehawendê de bû,wê ji bona Loristanê date bibarkirin. Šah Wirdî ew dane biwergirtin

û ew ji bona parastina cihê xwe li nik dewleta Osmanî de rêz li wan de date bigirtin. Ew serbixwe di nava welatê xwe de hate bijîyandin.

Di sala 1000 k. de, jiber ku dewleta Osmanî yarmetî pê neda bidan, ew dîsan ligel Îranîyan de bi rêk ve hate bikevtin. Wî Xweškeke xwe bi Šahê Îranê ve date bidan û wî bi xwe jî ve Keça Mîrekî Sefewî date bimarkirin. Vê têkelîyê zorî neda bidirêjkirin.

Di vê demê de Ogorlê Sultanê Beyatî Serdarê Isfehanê bû. Ew ji bona komkirina Bêš û bacên Mîrî ji bona Birocordê hat. Ew ligel Šah Wirdî de bi pevçûn ve hate bikevtin. Li paš šerekî xurt de Šah Wirdî ew date bikuštin.

Di vê pêlê de Šah Ebas ji bona Xuresanê hatibû çûyîn. Gava wî eve date bibihîstin, wî berê xwe ber bi Loristanê ve date bivedan. Šah Wirdî xwe li ber Šah Ebas de neda biragirtin. wî xwe ji bona nava xakê Osmanî date biavêtin.

Šah Ebas Bešekî Loristanê ( herema Xurem Abad) ji bona Mehdî Qelî Xan Šamlo date bidan û Bešê din ji Lorê Biçûk wî ji bona Sultan Husên Kurê Šah Restem date bidan û wî Ešîra Qere Ulos jî ji bona herema Elisker di sala 1002 k. de date biveguhestin.

Šah Ebas li dawîya vêna de rûwê xwe ber bi Ešîra Beyat ve date bivekirin û wî ew zor dane bipîskirin. (mêjûwa Cîhana Arayê Ebasî, bergê 2).

Di sala dawî de Šah Wirdî-Werdî bi alîkarîya Itimad El-Dewle û Ferhad Xan ve ji bal dewleta Îranê hate lêbuhurandin. Ew ji bona Loristanê hate bivegerandin. Šah ew date bixelatkirin Xurem Abad jî jê re date bidan.

Di sala 1006 k. de Šah Ebas ji bona Xurem Abad leškerek ji bona ser wî date binardin. Šah Wirdî jiber wî xwe ji bona nava keleha Çengole date biavêtin.

Belam Bešê ji leškerê Šah Ebas de di bin Rêberîya El-Lah Werdî Xan de bi dû wî ve tanî keleha Çengole hate. Li paš šerekî kurt de Šah Wirdî hate bigirtin û ew ji bona Sedmere ji bona layê Šah Ebas hate birin. Li wêderê de Šah Ebas ew date bikuštin.

Her çende, ku li dawîya Šah Werdî de Husên Xanê Kurê Mensur Beg bi ser Bešekî Loristanê ve bi Serdar ve hate binîšankirin, Tehmaseb Qelî ango Nadir Šah herema Saymara, Hêzman û pištkoh ji bona Ešîra

Iyano date bidan. Bi vî rengî ve di sala 990 K:- 1585 z. de serdarîya Lorê Biçûk bi dawî ve hate bikirin[142].

Belam Nevîyên Šah Werdî li Pištkoh de Serdarîyeke Biçûk bi destên xwe ve dane bigirtin û ew ji pêla Husên Xan ve hate bihištin û vê Mîrnešînîya biçûkî hanê date bidirêjkirin.

Wanên ku wan bi navê Walîtîyê ve dane biserdarîkirin, ev bûn: Jusên Xan, Ismaîl Xan, Esed Xan, Keleb Elî Xan, Elî Xan, Heyder Elî Xan (ev herdu Walîyên dawî Kurên Hesen Xan bûn, yê ku ew di sala 1256 k.- 1840 z. de hatiye bimirin), Husên Qelî Xan û Xulam Rida Xan.

Di pêla Walî Rida Xan de Rida Šah Pehlevî Loristan mîna welatên din bi Navînyîê ve date bigirêdan û wî Wilayeta Serbixweyî vê Xanedana hanê date bihilanîn.

## Rûnkirin

Ji rûdanên vê Serdarîyê ve weha em têtin biliberkevtin, ku dema Serxwebûna wê ewende nedaye bidirêjkirin. Bes û bi tenha ve wê di pêla Šuca El-Dîn Xuršîdê duwem de Sî Salî Serxwebûna xwe daye bikirin. Lêbelê šer û pevçûnên di navbera Endamên vê Xanedana hanê de bi hoyê bê hêzbûna wan hate bikirin.. Ev zîneta hanê jî di nava piranîya Serdarîyên wî zemanî de dihate bidîtin. Li paš de Bela Mengolan û Teymorleng jî ji bona ser vî welatî hate bidîtin û ew jî mîna welatên din hate bidagîrkirin û ew bi wan ve hate bivegirêdan. Ligelvêjî de ew di Hundur û Derve de bifirehkirin û zor bi bašî ve wî serdarîya xwe dida bikirin. serdarîya wan nekemî serdarîya Menazire, Xesasine, Hemedanî, Etabika Diyarbekir û Mêrdînê bû. Sînorên Mulkên serdarîya wan ji çemê Qarûn tanî Šehrezor, ji sînorên Iraqê tanî Hemedan û Isfehanê dihatin biçûyîn. Bi bidîtina dema wê ve û nimûneyên wê ve wê Yekitîyeke siyasîyî giring ji xwe re dida bipeydakirin.

[142]Weha hatîye binivîsandin, dibe ku ew di sala 1004 k.- 1595 z. de be. (M. E.).

## *Derîyê Dehem*

## 10. dewleta Eyubî (567-685-950 k.)[143]

### 1. Kî Bav û Bavpîrê Sazmendê vê Serdarîyê ne û ew ji ku hatine?

Ev Dewlet yanjî ev serdarîya here gewre, ya ku Kurd ew dayite bisazkirin, zor bi pêwistî tête bidîtin, ku em bi bašî li kok û bunyada wê de bêtin biliberkevtin. Insiklopêdîya Musulmanitîyê dibêje, ku Bavpîrê Selah El-Dîn Damezirvanê vê dewletê Šadî-Šazîyê Kurê Merwane, yê ku ew ji Êla Rewadî-Rewandîyê Dewîn bû. Ev Êla hanê bešekî herî gewreyî Ešîra Ezbenî-Hazbenî bû[144]. Girêdana navê Šadî bi bajarê Dewîn ve

---

[143](Ji xwe re di vî babetî de li nivîsta Selah El-Dênî Ingilîzî de Wergerandina Ereb de ji bal Dr. Elî Madî, Bêrud, sala 1988 de bide bitemašekirin. Ev nivîsta hanê pir nerxî di 489 rûpelan de hatîye niv***sandin***. Ew ji bal herdu Mêjûvanên Ingilîzî Melkom Kamiron Liyoniz û D. E. P. Cakson hatîye binivîsandin. Wan pir ji serçavîyên Rojhilatî û Rojavayî ji bona binivîsandina vê Nivistê kelk ji xwe re dane biwergirtin. Cuma).

[144]Ev Ešîra bi nav û bang bi navê Hazbanî di piranîya serçavîyên Erb û Musulmantîyê de hatîye bitomarkirin. Lêbelê Kurê Xelîlkan wê bi Hezanîye dide bitomarkirin. Ev jî pir jî nêzîka koka wêyî Kurdî ye, ya ku ew bi navê Hezan-Xêzan tête binavkirin. Ev navê han jî hêjî ji bona Desteyekî Kurd li Jêrî Gola Wanê û Bajarekî Rojhilatî Jêrî Bedlîsê de têtê bigotin. (M. E.).

giringbûneke wêyî pirî giran têtе bidîtin[145]; çunke, em dizanin, ku serdarîya Šedadîyî Kurdî li Dewînê de hatîye bisazkirin. Helbet li zemanê Šadî de hêšta jî nav û banga vê Serdarîyê ji bîra xelkê neçûbû.(Ev serdarîya hanê Yekek ji gewretirîn Serdarîyên Welatî bûn, ya ku ew di dûrtirîn sînorên Kurdistanêyî Jorîn de hate bidamezirandin. M. E.). Hin ji Mêjûvanên Ereb Kok û Malbateke dûr û dirêj ji bona Šadî dane bihelbestin. Ji bona nimûne Kurê Xeldon Binemala Šadî bi ser Ewf El-Hemîr El-Dosî dide bigihandin. Belam ew hîç cihên bawerîyê nînin. Rastî eve ye, ku mêjûwa Bav û Bavpîrê Šadî nayête binasîn[146].

Kurên Šadî Eyub û Šêrkoh li Gundê Ecdanekan-Ecdenkan de hatine Dunyayê[147]. Qadîyê Kurê Šedad Xwedîyê Nivista Newadirên Sultanî û Hevrêyî Selah El-Dîn dibêje, ku Necim El-Dînê Eyubî ji xelkê Dewîn bû û ew Walîyê Tekrîtê bû.(Rûpel 4).
Xwedîyê Nivista Mêjû Tac El-Dîn Šehenšahê Eyubî dibêje, ku Šadî xelkê Dewîn bû.

Li gora Goyeke din de Necim El-Dînê Eyubî li Bajarokê Šîxtan, renge, Šêxan[148] de hatîye Dunyayê û ew li Musil de gewre bûye û wî ji

[145]Bi rastî ev pirsiyarîya Dewîn pir bi giringî ve têtе bidîtin; jiber ku di nava Gevera Hewlêrê jî de Bajarekî bi vî navî ve hebû û ew di demekê de Sernavînîya serdarîya Soranî bû. Qolekî gewreyî ji Ešîra Hazbenî jî di hendama Etabegan de di nava wan navan de bû.

Renge, ku di navbera vê Dewînê, Qolê Hazbenî û Malbata Šadî de pêwendîyek hebe. Pir bi pêwistî ve ev yekanê hanê divê pir bi hûr û kûrî ve lêbête bigerandin. Renge, Peyva Dewîn Kurdî be û ew bi sûda peyvê yaxud pirsê be.

[146]Li gora Goya Kurê Xelîlkan de navê Bavê wî Merwan bû. Berê 2, r. 84.

[147]Ev Ecdankan Gundekî li nêzîka Dewîn de dihate bikevtin. Jîna Selah El-Dînê Eyubî, r. 57).

[148]Li nik Kurê Xelîkan de Secistan hatîye binivîsandin. Ew bi xwe ve vê Goya xwe dide bilawazkirin û ew bi ser ve dide kirin û ew dibêje, ku hatîye bigotin, ku ew li Çîyayê Cor hatîye zayîn û ew li Musilî de mezin bûye. (M. E.).

bona Sultan Mohemedê Melekšah dida bikarkirin. Ew ji bal wî ve ji bona Tekrîtê bi Parêzvanê wê ve hate binavkirin. (Cengên Xaçperestan, r. 112).

Bi kurtbirî ve Insiklopêdîya Musulmantîyê dibêje, ku Šadî ligel Behrozê Romî de Dostanîya wî hebû. Ev Behrozê hanê Mamostayê Kurên Keyên Sulcoqîyan bû. Ji niškê ve Behroz Dewîn bicîhišt û ew ji bona Begdadê çû. Bi hinera zanebûna xwe ve zû ew bi pêš ve hate bikevtin. Ew ji bal Sultan Mesudê Kurê Melekšah de li ser Begdadê de bi Parêzvan hate bidanîn[149]. Li dawîya vêna de wî xeber ji bona Šadî date binardin û wî ew ji bona layê xwe date bibangkirin

## 2. Çilo ew bipêškevtin?

Bavpîrê Šehrîyarîyê Selah El-Dîn Šadî bi hêvîya Têkošvanê Oldarîyê Behroz ve welatê xwe bicîhišt û bi Malê ve ew ji bo Begdadê çû. Li dawîya demekê de Šehrîyarîyê Mesud Tekrît bi Maldarî ve ji bona Behroz date bipêškeškirin. Wî jî Šadîyê Dostê xwe bi Cîgirê xwe ve ji bona ser wê Maldarîyê date binardin. Li paš çend Salekî de Šadî ferma Xwedê kir û ew li Tekrîtê de hate binîjandin. Necim El-Dînê Kurê wîyî gewre di cîgehê wî de hate bidanîn.

Li sala 526 k. de[150] Etabegê Musilê Îmad El-Dîn Zengî li Jorî Tekrîtê de ligel Ordîya Sulcoqîyê Begdadê de šerekî giran date bikirin û ew hate šikenandin. Wî di zîneteke pirî xerab de xwe bi Tekrîtê ve date bigihandin. Necim El-Dînê Eyubî Mêvandarîya wî û Merevên ligel wî de pir bi bašî ve date bikirin. Wê ji wan re Kelek û Beleme datin bipeydakirin û wî ew di ser Rubarê Dicle re datin biderbaskirin. serdarîya Begdadê li ser vê yarmetîya hanê de ji Necim El-Dîn tûre bû. Li dawîya demekê de rûdaneke tirjî hate qewimandin. Esed El-Dîn Šêrkohê Birayê Necim El-Dîn Eyub Yek ji Efserên Pasevanên keleha Tekrîtê date bikuštin. Bi

[149]Xwedîyê Murat El zeman, B. 3, r. 58 dibêje, Nehroz-Behroz ji bal Mohemed Šahê Sulcoqîve di sala 507 k. de ji bona se Begdadê bi Parêzvan hatîye bidanîn.

[150]Xwedîyê Nivista Jîna Selah El-Dînê Eyubî, di r. 61 dibêje, ku ev di sala 520 k. de hatîye birûdan.

vîrengî ve cihên wan hate bileqandin. Têkošvanê Oldarîyê Behroz bi endîša cihê xwe ve Necim El-Dînê Eyubî ji Cigirîya xwe date bixistin û wî lê date bizorkirin, ku ew di Tekrîtê de nemînin. Necim El-Dîn Eyubî bi neçarî ve ligel Birayên xwe û Malên wan ve bi šev ve Tekrîtê bi cî bidin bihištin. Bi hêvîya çakîya Îmad El-Dîn Zengî ve wan ruwê xwe ber bi Musil ve dane bivedan.

Hinek dibêjin, ku Šehrîyarîyê Seleha El-Dîn li keleha Tekrîtê de di sala 532 k. de (li gora Îstanlî Lin Pol de di sala 1137 z. de) ji bona Dunyayê hatîye bizayîn. Hêjî bêtir Hinek Kes dûrtir dirin û ew dibêjin, ku roja bûyîna wîna ligel wê rojê de tête bilihevrasthatin, di wê roja ku Têkošerê Oldarîyê Behroz fermana biderkirina wan ji Tekrîtê dabû biderkirin. Li gora gotina Nivîsvanekî File de, yê ku ew di karmendîya Necim El-Dînê Eyubî de bû, di wê ševa derketinê ji Tekrîtê de Selah El-Dîn bi Dunyayê ve hate bizayîn. Jiber vê jî Bavê wî pir bînteng bû û ew ji bedbextîa xwe bêzar bû. Jiber zayîna vî Kurî ew û Kurê xweyî din pir sexlet bûn. Bi vî rengî ve wan Tekrît bicîhištin.

Gava Necim El-Dîn û Birayên xwe bi musilê ve hatin bigihaštin, Îmad El-Dîn Zengî çakîya Eyubîyan bi ber çavên xwe ve date hinanîn û wî ew bi rûxwešî û sipasî ve dane biwergirtin û hatineke baš wî ji bona wan date bitirxankirin. Herdu Bira bi rûmet û hêjabûn di Seraya Zengî de hatin bicîkirin. Ew ligel wî de ji bona hin šeran jî çûn. Di hengava ku Îad El-dîn di sala 534 k. de ji bona ser Surî çû û wî Balebek date bidagîrkirin, wî Necim El-Dîn Eyubî bi Parêzvanê wê date bidanîn.

Li dawêya mirina Îmad El-Dîn Mulkên wî di nava Kurên wî de hate biparvekirin û leškerê Šamê ji bona ser bigirtina Balebek hat[151]. Gava ku Necim El-Dîn evaya zanî, wî date bitêderxistin, ku ew xwe li ber leškerê Šamê nade bigirtin û ew dê bi her awayekî ve Balebek bide bigirtin. ew bi remaneke dûrbîn ve ligel wan de hate birêkkevtin û ji bona Šamê çû. Ew li wêderê de hate birûništin. Bere bere ew hate bipêšvekevtin, Tanî ku ew bi Serdarê leškerê Šamê bû. Šêrkohê Birayê wî jî li nik Nur El-Dîn Mehmudê Kurê Îmad El-Dîn mabû, ew jî bi karê xwe, bi azaya xwe, bi hîšîtîya xwe û bi bašîya xwe ve hate bipêškevtin, ew jî ji bona leškerê Nur El-Dîn bi Serlešker bû. Gava Xaçperestan bajarê Šam di hêrîša xweyî duwem de dane birapêçandin, Necim El-Dîn

[151](Zengî di sala 541 k. - 1146 z. de hate bimirin. Nivîsta Selah El-Dîn, Wergerandina Erebî, Çapa Bêrûdê, sala 1988, r. 13. Cuma).

liberxwedaneke merdane û berz date bikirin û wî lafawên Xaçperestan dane bišikandin û wî ew ji Šamê dane bidûrkirin.

Mîrê Šamê her çend jî bi girêdana xwe ve ligel Nur El-Dîn Mehmud de dihate birûništin, belam Šehrîyar Nur El-Dîn dîsan mîna Bavê xwe çavê wî her û her li Šamê de bû. Bi remana bidagîrkirina wê wî di bin Rêberîya Šêrkoh de Leškerek ji bona ser Šamê di sala 547 k. de date binardin. Vê zêneta hanê Necim El-Dîn ber bi dujwarîyan ve date bixistin; çunke wî hejnedikir, ku ew beramberî Birayê xwe bête westandin.Wî hejnedikir, ku ew ligel Xwedîyê Qencîya xwe de bi šer ve bête bikevtin. Bi vêrema baš ve wî wist, ku ew vî îšê hanê bi ašîtî bide bibirîn. Ew bi Ferîmwer ve ligel Šêrkoh de date bigift û bigokirin. Li dawîya Šeš rojan de Leškerê Šêrkoh ji bona nava Šamê hate bikevtin.

Li paš demekê de Šehrîyar Nur El-Dîn Necim El-Dînê Eyubî bi Serdarî ve li ser Šamê de date binavkirin û wî ew ligel xwe de date bidanîn. Bi vî rengî ve hate demandin, tanî ku Šehrîyar Nur El-Dîn Selah El-Dînê Kurê Eyubî ji bona Misrê date binardin.

## 3. Çawan Mîr Selah El-Dîn pê hate bigihaštin?

Wî hin Salên Mendalîya xwe li Balebek de date birabuhurandin. Belam derbarê zemanê Zarotîya mêjûwa wîde hîç em nizanin. Sitanli dibêje, divê ku Selah El-Dîn jî mîna Mîrzadeyên tir di Hucran de Quran dabe xwendin û ew di wir de fêrî xwendin û binivîsandinê hatîye bikirin. Dîsan her li Balebek de ew fêrî Rêzanên Ziman bûye û ew fêrî bingehên Xwešxuwanîyê, Binivîsandinê, Zanistîya Peyvên Pêxember û hin tištên tir jî bûye; jiber Bavê wîna Peyakî zor gewre û bilind bû. Seruštî bû, ku ew jê re Mamostên herî bi nav û bang ve bide bipeydakirin.

Nivîsta Tebat El-Šfiîye derbarê Zarotîya Selah El Dîn de dibêje: ku Selah El-Dîn Zanistîya Peyvên Pêxember li layên Hafiz Bavê Tahirê Silêfî, Bavê Tahir Kurê Of, Šêx Qutub El-Dînî Nîšpurî, Eb-Dela Kurê Berîyê El-Nehewî û hinên Mamostên dinîbi nav û bang de daye bixwendin. Quran, Nivîsta Tenbîh di Fiqih de û hin Binivîsandinên din jiber bû.

Derbarê rabuhurandina dema wî li Šamê de li pêš çûna wîyî Misrê de Mêjûvanên Ereb hîç li ser nizanin. Lêbelê Hin ji Mêjûvanên Rojavan dibêjin, ku Selah El-Dîn her û her ew di civatên Šehrîyar Nur El-Dîn de dihate bidîtin. Jiber ku Kurê Serdarê Šamê bû, lê rûmet û rêz dihate

bigirtin. Ew Xortekî Hišmend û Šehreza bû. Ew Pir bi perwer bû. Wî zor rûmeta Oldarîyê dida bigirtin. Renge, wî jî mîna Mîrzadeyên zemanê xwe mêldarîya raw û šikariš dida bikirin. Bêgûman jî wî yarîya gog û kašo dida bikirin û carnan jî wî ligel Šehrîyar Nur El-Dîn de ev yarîya hanê dida bilîstin. Li gora kaxezekê de, ya ku wî li dawîya girtina Šamê de ji bona Xelîfê Ebasî El-Mustedî Bil-Lah li pêš çûna Misrê de dayite binivîsandin, ew di hemû šeran de ligel Bav û Mamê xwe bû. Mîna ku Xwedîyê Nivîsta Jîna Selah El-Dîn dibêje, li gora Milîbûna wîyî Kurdî de ew Suwarekîak bû û ew di mêrxasî û merdayetîya xwe de serefraz bû.

Qazîyê Kurê Šedad di Nivîsta xweyî El-Newadir El-Sultanîye de dibêje, ku ew ligel Bavê xwe de ji Balebek ji bona Šamê hat. Ew her dem û çax di nokerîya Bavê xwe de bû û wî ji qencî û bašbûna Bavê xwe zor sûdmendî ji xwe re dida biwergirtin, tanî ku wî ji xwe re nav û nîšan datin bisitendin. Li dawî de Šehrîyar Nur El-Dîn pir dildarî jîrbûn û jêhatîyên wî bû. Roj bi roj wî cîgehê wî gewretir dikir.

Xwedîyê Murat El-zeman di bergê 3, Rûpelê 156 de dibêje, ku Šehrîyar Nur El-Dîn ew di sala 560 k. de li ser bajarê Šamê de bi Parêzvanî date bidanîn.

## 4. Çûna wîyî pêšî ji bona Misrê

Gava ku Šawirê Wezîrê Xelîfê Misrê daxwaza komekê li Šehrîyar Nur El-Dîn de date bikirin, wî Šêrkoh bi Leškerkî ve di sala 562 k. de[152] ji bona ser Misrê date binardin. Mîr Selah El-Dîn jî bi fermana Mamê wî ve ligel vî Leškerê hanê de çû[153]. Wî Komandarî Qolê pêšekî dikir. Kurê

[152]Insiklopêdîya Musulmantîyê sala 560 hatîye binivîsandin.

(li nik Kurê Xelîlkan de Du Goyîn hatine binivîsandin. Yek di sala 559 k. de ye, ku ev jî rast tête bidîtin. Ya din ew di sala 558 k. de hatîye bitomarkirin. M. E.).

[153](Li gora Nivîsta Selah El-Dîn, Wergerandina Erebî, Çapa Bêrudê sala 1988, r. 18 de Šêrkoh di 20 Cemada yekem de sala 559 k.- 15 Nîsana sala 1164 z. de dest bi çûnê ve ji bona Misrê date bikirin. Wê çaxê Temenê Selah El-Dîn bi bîst û šeš salan ve hatibû bigihaštin. Cuma).

Šedad dibêje, ku Êsd El-Dîn Šêrkoh herçî dikir, wî pirs û bawerîya Selah El-Dîn ji xwe re dida bigirtin; çuke ew zor Hišmend û konevanekî pištrast bû.

Gava ku Šêrkoh bi Misrê ve hate bigihaštin, wî leškerê Derxam li Belbîsê de date šikenandin. Wî ev Wezîrê hanê li Qahire jî de date rapêçandin. Li dawîya Festas de Qahire jî bi destên Šawir ve hate bikevtin û Derxam jî hatin bikuštin[154].

Šawir rûwê xwe li Šêrkoh de date wergîrandin û wî nehišt, ku ew ji bona Qahirê bêt. Li ser vê de Šêrkoh Selah El-Dîn bi Lešerekî ve ji bona ser Belbîsê date binardin.Selah El-Dîn Šerqîyê date bizeftkirin. Šawir ku waha zanî, wî xeberê hewarê ji bona Emarîkê Qeralê Xaçperestên Qudsê date binardin û wî jê daxwaza yarmetîyê date bikirin.Qeralê Qudsê li ser vê hewarê de Lešerekî bi hêz ve ji bona ser Misrê date binardin. Šêrkoh û Selah El-Dîn Belbîs beramber bi Leškerê Qudis û Misrê ve Sê Mehan bi šêrîtî li ber hêrîšên wan de datin bidan[155]. Li layekîtir de Šehrîyar Nur El-Dîn ji bona komekeke dûra dûr bi Leškerekî ve ji bona Keyetîya Qudsê çû û wê li keleha Benyasê de date bidorpêçkirin. Gava Qeralê Qudsê evaya bihîst, tirsê ew girt. Ew ligel Šêrkoh de rêkevft û wan biryar dan, ku Lešerê Šam û Qudsê li xakê Misrê de bêtin biderkevtin. Li ser vê peyv û birê de Šêrkoh bi Leškerê xwe ji bona bajarê Šamê hate bivegerandin.

Li dawîya vegerandina Šêrkoh de Šawirê fêlbaz ligel Qeralê Qudsê de hate rêkevtin û Leškerekî Biçûkî Qudsê li Misrê de date bidanîn. Serušt bû, ku ev bi servajî rêkevtinê bû. Šehrîyar Nur El-Dîn ligel Šêrkoh de biryara girtina Misrê date bidan. XelîfêEbasîyî Begdadê jî bi vê biryara hanê ve hate birûništin.

---

[154](Di 28 Cemada duwem de sala 559 k.- 24 Gulana sala 1164 z. de Derxam ligel Birayê xwe de hate kuštin. Kanîya pêšîn, r. 19. Cuma).

[155](Dorpêçana Belbîsê di 11 Remazana sala 559 k. di Îna Sêyemî Tîrmehê de-Temuza sala 1164 z. d ji bal Qeralê Qusê û Lešerê Misrê de hate bidestpêkirin. Kanîya pêšîn, r. 20. Cuma).

## 5. Çûna Selah El-Dînî duwemî Misrê

Piştî derbasbûna Sê salan li ser çûna Misrêyî yekem de Şêrkoh[156] ligel Mîr Selah El-Dîn de bi Leşkerekî Du hezar Kesên Helbijartî ve berên xwe ber bi Misrê ve dane bivedan ûli dawîya dujwarîeke pir ew bi Etfî ve hatin bigihaştin, ya ku ew 42 Mîlan ji Qahire dûr bû[157]. Ji wêderê de wî xwe bi Cîze ve date bigihandin. Leşkerê Qudsê jî li beramberê wî de li qeraxê Çepêyî Nîl de bû..

Qeralê Qudsê Keyê Amorî peymanek ligel Xelîfê Fatimî de date bimorkirin. Li gora vê peymana hanê de Misir bi jêr parêzîya Keyê Qudsê ve hate bikevtin. Li dawîya morkirina vî peymana hanê de Keyê Qudsê ji niškê ve li Nîl de têper bû. Gava Çavên Šêrkoh bi vê ve hate bikevtin, ew ber bi Seîd ve hate çûyîn. Leškerê Qudsê jî bi dû wî ve hate bikevtin. Šêrkoh li Babeyn hate birawestandin[158]. Leškerê Qudsê xwe lê date binêzîkkirin. Herdu Lešker berengarî hevbûn. Bi mêrxasî û sepereštîya bašî Mîr Selah El-Dîn ve Leškerê Qudsê zor xerab hate šikenandin[159]. Li dawîya vê bi serketina hanê ve Leškerê Šamê keleha Iskenderîyê jî date bivegirtin. Šêrkoh ev keleha wer bargiran bi destên Selah El-Dîn ve date bixistin. Evaya yekem serdarîya Mîr Selah El-Dîn bû.li dawîya vêna de Šêrkoh Bešek ji Leškerê xwe ji bona Selah El-Dîn bicîhišt û wî ligel Bešê din berêxwe ber bi Seîd ve date bivedan.

Qeralê Qudsê ji bona dor û berên Qihire hate verandin. li wêderê de wî ligel serdarîya misrê de datin bibiryardan, ku ew dorpêçîya Iskenderîyê bidin bikirin. Li layê Derya ve jî Kestîyên Qeralê Qudsê li

[156]Ango di sala 562 k. de li gora rastirîn Goye de tête biderkevtin.

[157](Ew di 6 Rebîê Dawî de sala 562 k.- 30 Dêsembera 1167 z. de bi Etfîh ve li ser Nîl de hate bigihaštin. Selah El-Dîn, r. 23 de. Cuma).

[158]Li nik Xelîlkan de di Etfîh de bû. Li nik Kurê Esîr de di Babeyn de bû.(M. E.).

[159](Ev šeraya di 25 Cemada Dawîde sala 562 k.- 19 Avdara sala 1168 hate bilidarxistin. Selah El-Dîn, r. 27. Cuma).

Iskenderîyê dorpêçîn dane bikirin. Mîr Selah El-Dîn beramber bi Keštîyên Cengê û Leškerên Bejayîyî Misir û Qudsê ve bi qehremanî liberxwedanî date bikirin. Gernasî û mêranîyek bêhempa date binuwandin. Heftê rojî bi vîrengî ve beramberî Dujminan di bejayê û avê de mîna Šêran hate bipêgîrkirin.

Šêrkoh jî ruwê xwe ber bi paytextê Misrê û li Bereke El-Hebeše de dorpêçî lê date bigirtin. Vê destbirina Šêrkoh tirs û lerz ji bona nava cerg û hinavên Dujminan date bixistin; jiber vê jî wan daxwaza lihevhatinê dane bikirin. Bi mercekî ku Leškerê Quds û Šamê Misrê bi cî bihêlin û êtir destdirêjîyê ji bona kar û barên hundirê Misrê nekin. Di bicîanîna vê lihevhatinê de çend roj Mîr Selah El-Dîn li Ordogahê Qeralê Qudsê de date biderbaskirin. Serûštî bû, ku ew bi hûr û kûrî ruwê rêzanên Supahîyî Firengan bide bihînîkirin.

Li gora vê lihevhatina hanê de herdu Lešker ji Misir derçûn. Pir bi ser vê lihevhatinê ve neçû, dilê Qeralê Qudsê Amarîk ji bona bizeftkirina Misrê careke din hate bijandin û bi Leškerekî ve ruwê xwe ji nû ve ber bi Misrê ve date bivedan. Wî Belbîs date bigirtin û kuštarekî zorî li Tudeyê Misrê de date bikirin. Mendal û Jin jî ji serbirîna gištî rizgar nebûn.

Vê carê Xelîfê Fatimî bi xwe ve kevte hewarê û kaxezek ji bona Šehrîyar Nur El-Dîn date binivîsandin û wî têde jê hêvîya parastinê date bikirin. Wê biskên Afretên Musulman jê re datin binardin. Ev jî nîšana karekî pir giran bû. Šawirê Wezîrê Xelîfe yekek bû, ku mîna wî telaqreš, bêbext û derwûn kêm bûn. Wî bi hêvîya dilbijandina Malê Misrê Keyê Qudsê date bikarwerîkirin. Wî ligel wî de date bigift û bigokirin. Mebesta wîjî ev bû, ku ew demê bide birabuhurandin, tanî ku hewara Šehrîyar Nur El-Dîn tê. Bi rastî bi wê hêvîya dilbijandina Malê Misrê jî Keyê Qudsê li Pênç Mîlekî de li dûrî Qahire de hate rawestan.

## 6. Çûna Sêyemî Misrê

Šehrîyar Nur El-Dîn li ser hewara XelîfêFatimî de biryara xwe date bidan. Bi xuyayî ew ji bona yarmetîya Xelîfe diçû. Di rastî de ew ji bona bizeftkirina Misrê diçû. Ji bona bizeftkirina Misrê wî Leškerekî zor bi hêz û hiner ve date bikomkirin û wî ew di bin Komandarîya Šêrkoh de ji bona ser Misrê date binardin. Ev Leškerê hanê Hešt hezar Kes bû. Têde gelek Girgirên bi nav û bang ve dihatin bidîtin. Mîr Selah El-Dîn Arzuwê

çûyînê nebû, belam bi beramber fermana Šehrîyar û mamê xwe ve netuwanî bihata birawestandin. Ew jî ligel Apê xwe de çû.

Gava Amarik Qeralê Qudsê xebera hatina Šêrkoh bihîst, ew hate šelišandin. Di pêšî de wî xwest, ku ew nehêle, Šêrkoh ligel Leškerê Misrê de yekdigîr bibin. Lêbelê evaya pê nehate bikirin. Di dawî de ew di Rebîê duwem sala 564 k.- Dêsembera sala 1169 z. de bi hêvîtî ve ji bona Qudsê hate bivegerandin[160]. Li layekîtir de Šêrkoh bi ber devê Qahire ve hate bigihaštin. Xelîfe û Tudeyê Misrê ji bona pêrgîbûna wîna çûn.Wan bi xêrhatin lê dane bikirin û pir sipasîyên xwe jê re dane bipêškeškirin.

Di dawî de Šêrkoh çadrên xwe li ber devê Qahire de datin bih-iladn. Li paš de Xelîfe jî ji bona serdana Ordogahê Šêrkoh hat û wî jê re sipasî û memnuntîya xwe date biderxistin. Šawir jî ji bona layê Šêrkoh hat û wî jî jê re zor cihê sipasîyê û dildarîyek dûr date nuwandin. Jiber xwe wî bi suwarî ve her roj ji bona layê Šêrkoh dihat û wî mîna Dostekî çend Sal û jê re pir dilsoz bê bergîrî ligel wî de dida bireftarkirin. Remana wî weha bû, ku ew Šêrkoh û Serleškerên Šamê bide mêvan bikirin û ew wan di wê kêsê de tevan bide binabûdkirin. Belam Kamilê Kurê wî pê zanî û wî ligel Bavê de date biherešekirin û wî jê re got: " Bi Xwedê ger ku tu tištekî weha bide bikirin, dê ezê xeberê bi Šêrkoh ve bidim bigihandin". Tevlivêjî ew ji bona bêbextîya xwe her û her li kêsê de dihate gerandin. Serleškerên Šêrkoh hemûyan bi vê bêbextî û derewbûna Šawir ve dabûn bihestkirin.

Rojeke Înê mîna hercar Šawir ji bona serdana Ordogeha Šêrkoh hat. Šêrkoh li wê derê de nebû. Mîr SElah El-Dîn ligel Hinek ji Serleškerên tir de ligel Šawir de ji bona nêçîrê suwarbûn. Wan li wî û Suwarên ligel wî de dor dane bigirtin. Li paš de wan ew ji Hesp dane bitêwerkirin. Wan milên wî dane bibestbikirin û wan ew ji bona Xelîfe dane binardin. Xelîfe jî careke din ew ji bona wan date bivegerandin û wî ji wan serbirîna wî date bidaxwazkirin. Wan jî fermana Xelîfe bi cî anîn û serê wî ji Xelîfe datin binardin[161]. Bi vîrengî ve hebûna vî Wezîrê bêbext

[160]("Welîm El Suwerî xwe kišandina Emlerik ji Belbîsê di Roja Selexa Rebîê yekem de sala 565 k.- 2 Dêsembera sala 1169 z. de dide binîšnkirin" Selah El-Dîn, r. 39. Cuma).

[161](Serbirîna Šawir Di 15 Rebîê duwem sala 565 k.- 18 Dêsembera sala 1169 z. de hate bikirin. Selah El-Dîn, r. 40. Cuma).

hate bidawîkirin; jiber ku ewende nema bû, ku wî Misir ji bona jêrdestîya Firengan bide bixistin.

Li dawîya vêna de Xelîfe EL-ad ji bona dû Šêrkoh date binardin û wî ew ji bona nik xwe date bibangkirin. Wî ji bona Šêrkoh xelata Wezîrîyê û Navnîšna Melek El-Mensur Emir El-Ciyuš pê date bidan. Esed El-Dîn Šêrkoh nala Wezîrê Xelîfe dest bi rêkxistina îš û karên Misrê ve date bikirin. Belam Wezareta wî ewende pî neçû û wî di roja Šemê de di 22 Cemada Dawî sala 564 k. de fermana Xwedê date bicîanîn[162]. Di dema Wizareta Šêrkoh de piranîya îšên bergiran ji bona Mîr Selah El-Dîn hatibûn birêkirin.

## 7. Wizareta Mîr Selah El-Dîn

Ji Mîr Selah El-Dîn re li dawîya Sê rojên šîna Mamê wî de bi fermana Xelîfe Wezaret hate derketin[163].Hinek ji Serleškerên Šamê ev karê hanê bê dilî wan bû; jiber vê jî ew ji bona Šamê hatin vegerîyan. Êtir wan zikreša wî her û her didan bikirin. Serûštî bû, ku hîç Yekî ji wan çendî Selah El-Dîn li gora vî karî de nebûn. Xelîfe navnîšana Melek El-Nasir Ebu El-Muzefer Selah El-Dunya Wel-Dîn Yusif Ibin Eyub pêdate bidan. Melek Nasir bi temenê bîst û du salî ve û li dawîya konbûna wîyî siyasî û sipahî de bi vî cihê bilind ve hate bigihaštin. Belam gava wî temašeyî dor û berên xwe kir, Kesek ji Serdarên Leškerên xwe ve bi dil nebû. Di dawîde wî bi baší dît, ku ew Bav, Bira û Merivên xwe ji bona nik xwe bide bibankirin û wan li dora xwe de bide bikomkirin. Wî name ji wan re date binivîsandin û ew hatin. Gava Bavê wî hat, wî xelata Wizaretê ji ser šanê xwe date bihelgirtin û wî ew li ser milên Bavê xwe de date bidanîn, Bavê wî xelat wernegirt û jî re got: "Heger ev bi te neketa, Xwedê ev nedida te".

Melek nasir wist, ku ew dilên Tudeyê Misrê ber bi xwe ve bide rakišandin, Wî ji bona wan zor qençî datin bipêškeškirin û wî gelek çakî

[162](Ew di 22 Cemada dawî sala 565 k.- 23 Avdara sala 1169 z. de hate bimirin. Sela El-Dîn, r. 43. Cuma).

[163](Selah El-Dîn bi Wezîrtî ve di 25 Cemada Dawî sala 565 k.- 26 Avdara sala 1169 z. de hate binavkirin. Selah El-Dîn, r. 47. Cuma).

ligel wan date bikirin. Her çend jî ku ew Sinî bû û Tudeyê Misrê jî Šiî bûn, hîç wî destdirêjîya îš û karên Rêçolîyê nedida
bikirin. Bes û bi tenha di peyvdarîya roja Înê de li dawîya navê Xelîfe de navê Nur El-Dîn jî dihate birin.

Di dema Wizareta wî de Xaçperestan Dumyat bidagîrkirin. Melek Nasir Lešker bi ser wan ve date bidan. Wî Šahr ji wan date bisitendin û wî ew ji Misrê dane biderkirin. Bicgeh li vê jî de wî Bajarokê Eqebe jî date bizeftkirin, ya ku ew li ser rêya Hecacê Misrîde dihate bikevtin. Van herdu biserkevtinên hanê kêreke gewre li ser dilê Tudeyê Misrê de date bikirin. Evîn û dildarîya beramberî Wî hate bipeydakirin. Roj bi roj ve cihê Melek di nava cerg û hinavên xelkê Misrê û Gewremerdên wê de dihate biberz û bibalakirin.

Di navekê de Mutemen El-Xilafe binavkiriyê Cewher bi bêbextîyê ve hate bikevtin û wî ligel Firengan de date bidan û bisitendin û wî ew datin bihalandin, ku ew ji bona ser Misrê bên, da ku Melek Nasir di nava agirê Dujminê Hundur û Derve de bête bidîtin. Mutemen El-Xilafe bi Lešerê Pêncî hezar Kesekî Sudanî ve pišt situr bû. Melek Nasir kêsa vî Bêbextê hanê date bilinavbirin. Li ser vê de Leškerê Sudanî serê li ber Selah El-Dîn de date bibirakirin.

Melek Nasir Birayê xwe Šems El-Dewle Toranšah ji bona kujrandina agirê vê serhildanê date bikarmendkirin. Bi rastî jî ev Birayê aza û dilsoz baš têra wan hat û wî di nava Du Sê salan de lingên wan datin birîn. Wî ew li ser zemîna Misrê de Sudanî nehištin. Wî zorî li wan de dane bikuštin û mayînê wanî din ji bona Sudanê dane birakirin. Li wêderê jî de ew ji bal Birayê wîyî Edil ve hatin bitefer û bitunakirin. Li dawîya kuština Mutemen El-Xilave binavkiriyê Cewher de Melek Nasir Beha El-Dîn Qereqošê bi nav û bang biMutemen El-Xilate date bidanîn.

Melek Nasir hêšta taze Heraya Sudanî dabû birîn, Xaçperestan ji bona ser Dumyatê xwe dane birakišandin. Qeralê Qudsê ligel dewleta Romê de li hêrîša Misrê dabû biqisekirin. Belam wî xwest, ku ew Misir bide bidagîrkirin, berî ku Lešker û Keštîyên Cengîyî Romê bi Misrê ve bêtin bigihaštin; jiber vê Qeralê Qudsê bi xwe û Lešerê xwe ji bona ser Domytêyqwe dabû rakišandin.Kelaha Dumyatê ji bal Melek Nasir zor baš ji bona liberxwedanê hatibû biamadekirin.Jiber vê jî li dawîya Pênçî rojî de ji dorpêçana Lešker û Keštîyên Cengîyên Qeralê Qudsê de di šerên giran û sext de Hêrîšvanan pišta hustêxwe dane bixurandin û ew bi zîneteke zor xerab hate bivegerandin û hîç bi wan ve tištek nehate bikirin. Bicge li vê jî de bi fermana Xwedê ve ferteneyeke gewre jî li derya de

hate bipeydakirin û mayînên Keštîyê Cengîyên Romê jî hatin binikunkirin.

Li dawîya vê biserketina hanê de Melek Nasir dev ji zîneta liberxwedanê date biberdan. Wî bi Leškerekî gewre ve ruwê xwe ber bi Felestînê ve date bivedan û dest bi tengavîkirina Dujminê xwe û talanîya wan ve date bikirin. Van guhertên rewšên Supahî û šiyasîyî Misrî bi vî rengî ve û hêrîškirina Ordowa Misrî ji bona ser Felestîn ji bona Tudeyên Misrî rûdaneke pir mezin bû; jiber ku ew demekê li jêr desthilatî û dirbûna Firengan de bûn, yên ku ew her û her didan bitalankirin. Belam bi saya bašbûna serpereštî û hozanîya Melek Nasir ve Misir bi rewšeke tir ve hate bikevtin. Vê carê Fireng li hêrîša wan de tirsê datin bigirtin. Guhertina zînetê bi vî curî ve hejkirina Melek Nasir di dilê Misriyan bêtir date bicigîrkirin û Nav û nîašnên wî û cihê roj bi roj ve berz û bala dibû. Melek Nasir ligel ku ew Wezîrê Xelîfe Adid Bil-Lah bû, herwehajî ew Supahsalarê pir dilsozê Šehrîyarê Nur El-Dîn bû.

Bi nav û bangên Qadî Fedil û Imad El-Dînê Esfehanî herdu li nik Melek Nasir Karmendên Nivîsvanîya wîyî Fermewrî û Šêwirdarên wîyî taybetî bûn. Qazî Kurê Šedad jî li dawîya 584 K- de bi Nivîsvanê Taybetîyî Šerîyar Selah El-Dîn hate bidanîn.

Melek Nasir li dawîya kujandina tevlihevbûna Navxweyî de û biserkevtina li se Firengan de xwest, ku ew ji bona Serbixwebûnê wirde wirde Rêçola Sunî di nava Misrîyan de bide bibelavkirin. Bi vê rema çak ve wî Du Dibustanên Ayînîyî gewre date bivekirin. Yek bi navê Nasirîye û ya din bi navê Kamilîye ve wî datin binavkirin. Kur Esîr dibêje, ku wî zindanxana Dar El-Meune date herifandin û wî li šuna wê de Dibustanek ji bona Rêçola Šafiî date bidurustkirin. Her wehajî wî Dar El-Edil jî bi dibustan Šaiî kir. Wî Dadwerên Šiî Misrî hemû datin derkir û wî li çîgehên wan de Dadwerên Šafiî datin damîn.

Šehrîyar Nur El-Dîn ji bona xwendina peyvdarîya Roja Înê bi navê Xelîfê Ebasî ve zor jê dida bixwestin. Lêbelê Melek Nasir heleše pê nekir. Wî xwest, ku ew di pêšî de Cîgehê xwe bide bixurtkirin û di dawî de ew destê xwe ji bona vî îšî bide biavêtin. Li dawîya demekê de mîna hercarên xwe wî Civîneke šêwirdarîyê date bigirêdan. Wî ligel wan de li ser daxwaza Šehrîyar Nur El-Dîn de date bigift û bigokirin. Li paš de li ser biryara Civatê de Peyvdarîya Roja Înê bi navê Xelîfê Ebasî ve hate xwendinandin[164]. Xelîfê Fatimî Adid jî di wê gavê de nexweš bû. Bi

[164](Di Roja Îna Pêšî de 7 Muherema sala 567 k. 11 Sebtembera sala 1171 z. de

fermana Melek Nasir ve ev xebera hanê lê datin bivešartin. Bi rastî jî li dawîya çend rojan de Adid di sala 567 k. de hate bimirin. Melek Nasir ji bona mirina wîna zor bînteng bû; çunke, ew ji bona Siyaseta wî beramber bi Šehrîyar Nur El-Dîn pir bi sûd bû.

Melek Nasir li dawîya vešartin û šîngirtina Xelîfe Adidê Fatimî de Nevî û Xanedanên Fatimî ji Koška Xilafetê dane biderkirin. Li Xanîyekî din de wî Efretên wan dane bidanîn û wî zor temašeyî wan dida bikirin. Nêta wî di vê cihêbûnê jî de di nehiština çêbûna tevlihevbûnan de bû. Wî Xiznên Koška Xilafetê bi ser Serdaran, Peyan, Maqulan û Pêwistvanan ve date biparvekirin.

Li dawîya mirina Adidê Xelîfê Fatimî de Melek Nasir bi Serdarê Misrêyî Serbixwe ve bû. Pêšîn îšê wî durustkirina keleha Qahire bû. Di wê demê de paytext ji çend parçeyekî dihate bipêkhatin. Ji Fustat, yê ku gewretirîn perçe bû, ji Taxên Tolon û ji Qahira Elmaziye dihate bipêkhatin[165]. Melek Nasir li dora vanan de Bedeneke zor xurt date bidurustkirin. Wî di nava bedenê jî de kelehek bi navê xwe ji bona parastina bajêr date biavakirin. Wî di nava kelehê jî de Sera, Dam û destgehên Karmendîyê û hin xanîyên baš ji bona xwe û herwehajî ji bona Hevbesteyên xwe ve date bidurustkirin.

Melek Nasir nexwest, ku Šehrîyar Nur El-Dîn lê bigûman bête bikevtin; jiber vê jî wî di Peyvdarîya Roja Înê de li dawîya navê Xelîfe de navê Šehrîyar Nur El-Dîn jî dide anîn. Wî bi navê wî jî Pûl datin bilêdan. Wî ji Xizneyên Koška Xelîfên Fatimî de diyarîyên zor hêja û bi nerx ve datin bihelbijartin û wî ew ji bona Šehrîyar Nur E-Dîn datin binardin.

Di dema ku Melek Nasir ji bona vekirina keleha Šobek li Felestîn de li ser rêya Bazirganîya Misr û Šam de çûbû, wî bihîst, ku Šehrîyar Nur El-Dîn jî ruwê xwe ji bona wan navan date bivekirin. Wî ne xwest, ku ew tûšî wî bête bikirin. Wî waz li vegirtina kelehê date anîn û ew ji bona Misrê hate bivegerandin.

Bi navê Xelîfê Ebasî de Peyvdra Roja Înê li Fustatê hate xwendsin. Selah El-Dîn, r. 63. Coma).

[165](Qhire ji bal Fatimiyan de di sala 969 z. de ji nuh ve hate biavakirin. Mayers Taschen Lexikon A-Z -Insiklopêdîya Elmanîyî Boiçûk-, Leipzig, sala 1963 de, r.485. Cuma).

Hin ji Serleškerên Šehrîyar Nur El-Dîn, yên ku ew ligel vekirina Misrê de ligel Šêrkoh û Melek Nasir de bûn, bi bidanîna Selah El-Dîn di šûna Šerkoh de ew li nik wî de neman û ew ji bona layê Šehrîyar Nur El-Dîn çûn. Van Šerleškeran her û her xebat didan bikirin, ku ew dilê Šehrîyar Nur El-Dîn ligel Selah El-Dîn de bidin biguhertin. Hin vedibêjin, li dawîya vegerandina Melek Nasir ji keleha Šobek Šehrîyar Nur El-Dîn ruwê xwe ber bi Misrê ve date bivekirin. Wî xwest, ku ew wê bide bigirtin.

Gava ku Melek Nasir ev xeberaya date bibihîstin, wî Civata Šêwirdarîyê date bikomkirin û wî ligel wan de date bigift û bigokirin. Yekekî ji Endamên Civatê date bigotin, divê em šer ligel Šehrîyar Nur El-Dîn bidin bikirin. gava ku Necim El-Dîn Eyubî Bavê Selah El-Dîn evaya bihîst, ew tûre bû û wî got: "Ev Kišwer Kišwerê Šehrîyare. Em hemû jê re Kole û Bendên dilsozin". Li ser vê de Civat ji hev hate bibelavkirin. Li paš vê de Necim El-Dînê Eyubî gelek gazin û šîret li Melek Nasirê Kurê xwe de date bikirin. Bi rastî jî jiber hin kar û barên Cezîrê giring Šehrîyar Nur El-Dîn netuwanîbû ji bona Misrê bihata. Melek Nasir li dawîya çendeyekî Toranšahê Birayê xwe ji bona rêxistina kar û barên Sudan date binardin.

Li dawîya bicîanîna îš û karên Cezîrê de Šehrîyar Nur El-Dîn kaxezek ji Melek Nasir date biwergirtin, ku ew têde jê re sertewandin û dilsozîya xwe dide biderxistin. Šehrîyar Nur El-Dîn xeber ji bona Melek Nasir date binardin, ku ew bi Leškerekî ve ligel wî de di Felestînê de yekdigîrbin û ew bi hev re ligel Keyê Qudsê de šer bikin. Bi rastî Melek Nasir serfurûtîya Šehrîyar Nur El-Dîn date bikirin û bi Leškerê xwe ve ji bona Felestînê çû. Belam li pêš çavpêkevtina Šehrîyar de ew bi hoyê nexwešîya Bavê xwe ve ji bona Misrê hate bivegerandin. Bi rastî jî Mîr Necim El-Dînê Eyubî li nêzîka Bab El-Nesir ji Hesp hatibû wergerandin û ew li paš çend rojan de hate bimirin[166].

Tevlivêjî Šehrîyar Nur El-Dîn li vergerandina Melek Nasir ji bona Misrê hate tûrekirin. Wî biryarya xwe date bidan, ku ew bi Leškerekî xwe

[166](Ew di 18 Zilhuce de sala 569 k.- 31 Tîr-Temuzê de sala 1173 z. de ji Hesp kevtibû û ew di 27 Zilhuce de sala 569 k. 9 Augustê de sala 1173 z. de hate bimirin. Selah El-Dîn, r. 85. Coma).

ve ji bona ser Misrê biçe û ew wê bide bidagîrkirin û Melek Nasir jî ji cihê wî bide biderkirin. Belam mirina wî rê pê neda û ew di roja Caršema 21 Šewalê de sala 569 k. 25 Gulana sala 1174 de hate bimirin[167].

Li pêš mirina Šehrîyar Nur El-Dîn de Melek Nasir zor jêhatîbûn date binuwandin. Ji layekî ve li jêr çavdêrî û fermana Bavê xwe de leškerê Misrê date birêkxistin û biperwerdekirin û wî ji qeraxa Derya Sîpî ve tanî bajarê Qabis hemû Terablisa Rojava Tunis date bidagîrkirin. Li yekîtirjî de ji bona vekirina Yemenê Toranšahê Birayê xwe di Receba sala 569 k. de date binardin[168]. Wî Ew Kêšver û Eden bi jêr Destîya Serpereštîya Misrê de date bixistin.

Di wê navê de ji bal Xwešxwevan Imaret El-Yemen û Hin Kesên tir de tevlihevbûnek hatibû bidurustkirin. Vanan jî ligel Keyê Ferengî jî de dabûn biqisekirin, da ku ew ligel hevdû de biyekbin. Belam li pêš rûdana wê tevlihevbûnê de Melek pêhate bizanîn. Wî Kirdarên dane bihelwestandin.

Di wê navê jî de Keštîyên Cingîyên Siqilya ji bona ser Iskenderîyê hatibûn. Melek Nasir zor li beramberî wan de hate birawestandin. Di wê navê jî de Qeralê Keyê Qudsê jî hate bimirin, yê ku ew ji bona Melek Nasir Dujminekî bi hêz bû.

Li dawîya mirina Šehrîyar Nur El-Dîn de ji bona Serbixwebûna Melek Nasir êtir hîç bergîrek nema hate bidîtin. Serûštî bû, ku serdarîya Biserêxweyî Rojhilat û serdarîya Musulmantiyê hemû ji bona nava destên Melek Nasir Selah El-Dîn hatin bikevtin. Beramberekî weha ji bona wî nema, ku ew bituwane beramberî wî bête birawestandin. Kurên Menalên Šehrîyar Nur El-Dîn, Seyf El-Dîn Fermanrewayê Musilê, Šehrîyarê Silcoqî di welatê Romê de li wan navan de hebûn, belam evanan hîç Yekî ji wan sînorên wan nebûn, ku ew bituwanin Hemberîyê ligel wî de bidin bikirin.

çunke, Melek Nasir serê Firengan û biderkirina wan li Kêšverên Islamê de bi karmendîyeke Ayînî li ser šanên xwe de dida bidîtin, wî xwest, ku ew ligel van Serdarên musulmanan de lihev bide bikirin, ku ew

[167](Li gora Nivîsta Selah El-Dîn, r. 91 de ew di Roja Çaršemba 16 šewala sala 569 k.- 15 Gulana sala 1174 z. de hatîye bimirin. Coma).

[168](Ew di destpêka Receba sala 569 k. 5 Februwera sala 1174 z. de hate birêkkevtin. Selah El-Dîn, r. 88. Cuma).

hemû hêza Islamê beramber bi Dujminê Ola Musulmantîyê ve bidin bikomkirin. Bi rastî jî ev rema baš bingehê siyaseta Ayindeyî Selah El-Dîn bû û bi rastî ew li ser wê jî de diçû.

## 8. Li dawîya mirina Šehrîyar Nur El-Dîn

Melek Salih hêšta Mendalekî Panzdeh Salî bû, gava ku ew ji bona cîgehê Šehrîyar Nur El-Dînê Bavê xwe hate birûnuštin. Bi hoyê bê serpereštîya wî Serdarên Bavê wî li ser de hatin zalbûn. Seyf El-Dînê Amozayê wî, yê ku ew Fermanrewayê Musilê bû, welatên Cezîrêyî Šehrîyar Nur El-Dînê Bavê wî hemû dane bilayandin. Serdarên tir jî her Yekî di cîgehê xwe de bayê Serxwebûnê bi ber serên wan ve hate bikevtin.

Gava ku Melek Nasir ev zîneta hanê bihîst, wî kaxezek ji bona Wezîrê Melek Salih, yê ku ew Šems El-Dîn Mohemed Kurê Eb-Dul Melek Kurê Muqedem bû, date binivîsandin û wî têde gazin dane bikirin û wî date bigotin: "Heger hûn bi bašî ve kar ji bona Keye Salih nekin û Keyetîya wî nedin biparastin, dê ezê bi xwe ve bêm û dê ezê mafeyên wî bidim biparastin". Serdarên Melek Salih guh bi van amojgarîya nedan.

Serdarê Helebê Šems El-Dîn Kurê Daye Seed El-Dîn Kemšitekîn ji bona layê Melek Salih date binardin û wî ew ji bona hatina Helebê date bibangkirin, da ku destên Melek Nasir nema jê re bêtin bigihandin[169]. Lêbelê Tudeyên Šamê di pêšî de nehištin, ku Melek Salih ji bona Heleb biçe. Belam cara duwem Kemšitekîn hat û wî tirs têde dane firandin û ew ligel xwe de ji bona Helebê bir. Wî li wêderê de Šems El-Dîn date bigirtin û ew ligel Xizmên wî de ji bona binê zinanê datin biavêtin. Li dawîya vêna de Kemšitekîn ji bona bixurtkirina cîgehê xwe ligel dewleta Firengîyî Qudsê de date bidan û bisitendin. Wî ligel wan de derbarê Melek Nasir de lihevhatinek date bigirêdan. Li ser van zînetên hanê de

[169](Ji xwe re di vî warî de li Nivîsta bi Zimaê Erebî de, 347 Rûpel, Imaret Helem, Di pêla serdarîya Silcoqî de ji 479-522 k. de, Mohemed Damin, Šam-Bêrud, sala 1990 de bidin bitemašekirin. Ev Nistokeke bi nerxe û ew ji bona têgihîština vê Pêlê pir bi bašî têtê bidîtin. Mero jê jî hinek bêtir li ser rûdanên kurdistanê û mêjûwa Kurdistanê têtê biagehdarkirin û betir biliberkevtin. Coma).

Melek Nasir nameyek ji bona Xelîfê Ebasî El-Mustedî Bil-Lah date binivîsandin û wî têde gilê li vê šorbûnê û pašagerdanîya Keyetîya Melek Salih de date bikirin.

Bi rastî jî di vê navê de rewša siyasî ji bona Melek Nasir zor yarîdar bû. Keyetîya Felestîn û Surî di destên Du Mendalên bêkar de bûn. Ev jî Yek ji wan Beldewinê Çaremê Belek Kurê Melek Amorî bû. Yê din ew Melek Salih Ismaîlê Kurê Nur El-Dîn bû. Diva bû, ku ew sûdmendîyê ji vê kêsê ji xwe re bide bisitendin û ew wan Kêšveran ji bona jêrdestîya bide bixistin. Tevlivêjî de Melek Nasir heleše bi vî karî ve pênekir. çunke, wî nedixwest, ku ew xelkên Šamê ji xwe bide bitûrekirin; jibervê wî her û her name ji bona Melek Salih didan binivîdan. Wî zor rûmet û serfirûwa xwe jê re didan biderxistin. wî bi navê wî Pûl didan bilêdan û wî bi navê wî jî peyvdarîya Roja Înê dida bixwendin.

Gava Melek Salih ji bona Helebê çû, Kemšitkîn xwe bi Serdarekî Serbixwe ve date bizanîn. Kurê Muqedem û Serdarên terefdarên wî tirs bi wan ve hate bikevtin. Wan kaxez ji bona Yusif El-Dîn Serdarê Musilê datin binivîsandin, ku divê ew bêtin û yarîya wan ew bide bikirin. Lêbelê Seyf El-Dîn bawerî bi wan ve neda bikirin û li dawîya dudilyeke zor ew ligel Melek Salih hate birêkkevtin. Gava çavên Girgirên Šamê jî bi vê birêkkevtina hanê ve hate bikevtin, inca wan jî hêvîya xwe ji bona Melek Nasir datin binivîsandin û wan rizgarkirina xwe ji vê berbatê jê dane bixwestin.

Melek Nasir demek bû, ku wî ev hewara hanê ji Xwedê dida bixwestin. Destbicî ew helsa û wî bi Leškerekî ve dešta Niye date bibirîn. Bêtirs ew di ser zemîna Felestînê re hate têperandin û ew bi xakî Surî ve hate bigihaštin. Bi xwe jî ve wî li pêš culandina xwe de ji bona Xelîfê Ebasî dabû binivîsandin. ku zor bi pêwistî ve tête bidîtin, ku Suri jî bi destên wî ve bête bikevtin, da ku ew bituwanibe ligel dewleta Firengan bête bixerîkkirin û ew li Musulmantîyê de bide liberxwedan. Bi xwe jî ve serdarîya bêkarîya Melek Salih ev karê hane pê nayête bikirin û wê jî ev karaya bi xwe jî nedaye bikirin. Belkî wê hêjî bêtir ligel Dujmin de daye bilihevkirin.

Melek Nasir bi vî rengî ve yarmetîya Xelîfe jî ji xwe re date biwergirtin. Li layê hemû Kesekî de ew bi liberxwedanvanê Musulmantîyê ve hate binasîn. Jibervêjî ew nebes tenê tûšî ti liberxwedanê nebû. belkî ji hemû layekî ve yarmetî û alîkarî jê re dihate binardin.

Kurtbirî Melek Nasir bi Busra ve hate bigihaštin û Serdarê wê ji bona pêrgîbûna wîna pêšewazî lê date bikirin û wî serê xwe jê re date

bitewandin[170]. Ji vî bajarê hanê de raste û rast wî ruwê xwe bi Šamê ve date bivedan û ew li dawîya rebiê yekem sala 570 k. de pê hate bigihaštin û ew ji bona nava Šamê hate bikevtin[171]. Ew ji bona Mala Bavê xwe çû. Li paš bînvedanekê keleha Šamê jî hate biberdestkirin. Xizne û Malekî zor têde hebûn. Wî ew hemû bi ser xelkên Šamê de date bidabeškirin. Hemû Kesek li hatina wîna de dilšad û bextiyar bû.

Melek Nasir bi remaneke hozanî ve her û her di rabûn û rûniština xwe weha dida nuwandin, ku ew bes û bi tenha ji bona yarîkirin û karkirinê ji bona Xwedîyê Qencîvanîya xwe Melek Salih hatîye; jibervêjî hemû Kes bêtir xwešewistî lêdikirin. Serdar û Gewremerdên Šamê bi dil û can ve pêve hatin bigirêdan û bibestandin.

Melek Nasir li dawîya rêkxistina îš û karên Šamê de Seyf El-Islamê Birayê xwe Tefkîn bi ser wê ve date bidanîn û wî ruwê xwe ber bi Humsê date bivekirin. Wî Šar date bigirtin û wî çend Hêz jî ji bona dorpêçana kelehê bi cî ve dane bihištin. Wî rûwê xwe ji bona Hema date bivedan. Serdarê vî bajarê hanê Mîr Ize El-Dîn Cerdîk bû, yê ku ew di çûna Sêyemî Misrê de ligel Selah El-Dîn de bû. Belam li dawîya Wizareta wî de wî nexwest, ku ew ligel wî de bête bimayîn. Ew ji bona Šamê hate bivegerandin. Vî Mîrî di pêšî de nexwest, ku ew serê xwe jê re bide tewandin. Belam di dawî de Melek Nasir bext pê date bidan û wî Bajar date biberdestkirin. Tenha keleh di destên Birayê wi de hate bihištin. Ew ji bal Melek Nasir ji bona Helebê hate binardin, da ku li wêde de Bedestvana bidin biberdan û rêdana rijandina xwînê di nava Mu-sulmanan nedin bihištin. Belam gava ku Mîr Ize El-Dîn bi Helebê ve hate bigihaštin, Kemištekîn ew date bigirtin û wî ew ji bona binê zindanê date biavêtin. Gava ku Birayê Mîr Ize El-Dîn ev xebera hanê date bibihîstin, wî keleha Hema ji bona Melek Nasir date biberdestkirin. Li dawîya vêna de Melek Nasir rûwê xwe ber bi Helebê ve data bivedan. Wî di sêyemê cemada dawî sala 570 k. de dorpêçiya bajarê Helebê date bikirin. Wî date bizanîn, ku ew ji bona dujminatîyê nehatîye bihatin, belkî ew ji bona nava

[170](Di mêjûwa Bavê Šamê de tête bigo, ku Ew di 24 Rebie yekem de sala 570 k.- 24 Çirya Pêšî sala 1174 z. de bi Busra ve hate bigihaštin. Selah El-Dîn, r. 104. Cuma).

[171](Ew di 29 Rebiê yekem sala 570 k. 28 Çirya Pêšîn sala 1174 z. de ji bona nava Šamê hate bikevtin. Kanîya Pêšîn, r. 106. Cuma).

vî Welatî ji bona rizgarkirina Padšah ji nava destên Kemšitkîn û hin ji Serdarên Serrakirî hatîye bihatin.

Gava ku çavên Kemištekîn bi vê zîneta hanê ve hate bikevtin, wî xwest, ku ew di rêya Canbexšen Ismaîlî de Melek Nasir bide bilinavbirin. Wî Peyamberê taybetî ji bona layê Rêberê Ismaîlî Šêx El-Cebel Rašid êl-Dîn Sinan date binardin. Vî Šêxî çend Canbexšek datin binardin. Belam Melek Nasir pê zanî û wî ew hemû dane bikuštin.

Li dawîya vêna de bi bitengavkirina Kemištekîn ve Melek Salih xelk derbarê šer ligel Melek Nasir de dane bidilbijandin. Bi rastî ve Helebiyan bi xurtî ve li ber xwe de didan bidan. Kemištekîn li layekîtir de riyamondê Serdarê Terablisê, yê ku ew di dema Nur El-Dîn de hatibû bizindankirin, date biberdan, da ku ew beramber bi Melek Nasir ve yarmetîya wan bide bikirin. Ev komandarê Firengî li dawîya berdana wî de ew bi Çavdêrê ser Qeralê Baldewînê Qudsê ve bû. Wî daxwaza yarmetîya Kemištekîn bi kês ve zanî, ta ku ew tole ji Islamê bide bisitendin. Wî bi Leškerekî ve ruwê xwe ber bi Humsê date bivekirin.

Gava ku Melek Nasir eve zanî, wî waz li dorpêçana Helebê de date anîn. Wi ruwê xwe ber bi Leškerê Qudsê date bivedan. Belam Riyamond newêrî bû, ku ew bête rawestan. Ew hate bivegerandin. Melek Nasir jî Balebek date bizeftkirin û ew ji bona Šamê hate çûyîn.

Melek Salih daxwaza yarmetîyî ji Seyf El-Dînê Serdarê Musilê date bikirin. Vî Fermanrewayê hanê detsbicî bi xwe û bi Leškerekî ve di Hewara Melk Salih de hat û ligel Leškerê Helebê de yekdigîr bûn. wan herdu layan ruwên xwe ber bi Melek Nasir ve datin bivedan.

Belam çunke, Melek Nasir hejnedikir, ku gelacî di nava Islamê de bête bivêketin û jê Fireng sûdmendîyê ji xwe re bidin biwergirtin. Wî daxwaza lihevhatinê ligel wan de date kirin. Wî xeber ji bona wan date binardin, ku ew ji bil Šamê pêve wan hemû welatên zeftkirî dide biberdan. Bes û bi tenha ve Šamê bi navê Melek Salih ji bona xwe dide bihištin û ew ji bona Misrê tête bivegerandin.

Belam Seyf El-Dîn û Melek Salih ev mercên hanê nayîn bikirin. Li dawîya vêna de Melek Nasir ruwê xwe ber bi wan ve date bikirin û li nêzîka Hema di 19 Remezana sala 570 k. de šerekî qurs di nava wan de hate biqewimandin[172].

[172](Ev šeraya di Roja Yekšemê de di 19 Remezanê sala 570 k.-13 Nîsanê sala1175 Z, de hate vêketin. Selah El-Dîn, r. 118. Cuma).

Melek Nasir bi ser Dujmin ve kamwer bû. Wî ew zor xerab datin šikenadin û tanî Helebê wî ew datin bibezandin û di bajêr jî de wî ew datin bidorpêçkirin. Seyf El-Dîn xwe derbaskir û ew ji bona Musilê çû. Lêbelê Leškerê Melek nasir jî waz li wan de neda hanîn û wan jî ruwê xwe ber bi Musilê ve datin bivedan. Seyf El-Dîn neçar bû, ku ew Leškerekî Šeš hezar Kes ji bona pêrgîbuna wan bide binardin. Ew Li Tel Sultan de berengarî Leškerê Melek Nasir bû. Vê carê jî Lešker perîšan bû. Zor li wan de bi Dîlî ve hatin bigirtin. Talanekî zor bi destên Leškerê Misrî ve hate bikevtin. Mayînên Leškerê Musilê ji bona Helebê dane bibazdan. Li dawîya vê kamwerbûna hanê de Melek Nasir di rêya xwe de kelehên Bizexe, Menbic û Ezaz datin bizeftkirin. Wî dest bi tenggerdena keleha Helebê ve date bikirin. Di dema ku Melek Nasir ligel dorpêçana keleha Ezaz de di nêzîka Helebê de karwer bû, rojekê Canbêzarekî ji niškê ve xwe bi ser Melek Nasir ve date biavêtin û wî serê šurekî li serê wî de date bixistin; belam jiber Kelawê wîyî zêrîn ve lêdana šur zor kêm lê date bikêrkirin. Destê dora wî bi firyada wî ve hatin bigihaštin û wan ew Mirov dane bikuštin. Zor pê neçû, ku Yek li dû Yek de çend Canbêzar hatin bihelsandin û wan bi Ser Melek Nesir ve xwe datin biavêtin. Lêbelê hemû hatin bilinavbirin. Ev Mêrkujên hanê ji bal Kemšitikînê bêbext hatibûn binardin.

Melek Nasir li dawîya vê rûdana hanê de bêtir gerdena keleha Helebê date bitengavkirin. Di encam de xelkê Šar nema tuwana wanî beramber bi tundbûna Melek Nasir ve bêtin birawestandin. Wan bi hin Mercan ve lihevhatin dane bixwestin[173].

Di wê hingavê de Keçeke Šehrîyar Nur El-Dîn Xweha Melek Salih ji bona lêbuhurandin ji bo layê Melek Nasir Hat. Melek Nasir zor hêjabûn û rûmet lê date bigirtin û wî ji bona xatirê wê kes neda biazardan. Wî hemû Dilên Helebê dane biberdan û wî hemû Birindarên wê jî dane bidermankirin.

Di encam de Melek Salih li ser mêldarîya Tude de bi lihevhatinê ve hate birûništin. Wî waz li wan Kišveran de date hênanîn, yên ku ew bi destên Melek Nasir ve hatibûn bikevtin. Bi vî rengî ve ji bil Helebê û dorhêla wê ve hîç çîgehekî din ji bona Melek Salih nema hate bihištin. Hemû Kišverên din bi jêr destên serdarîya Melek Nasir ve hatin bikevtin.

---

[173](Ev Lihevhatina hanê di 12 Šewala sala 570 k. 6. Gulana sala 1175 Z, de hate bigirêdan. Serçavîya Pêšîn, r. 120. Cuma).

Di encamê vê lihevhatina hanê de Melek Nasir di Şewala vê Salê de ji bona Şamê hate bivegerandin. Li wêderê de Xelatên xelîfê Ebasî pê hatin bigihaştin. Bi navê Xelîfe ew bi Xwedîyê misir û Şam bû û navnîşana Sultan-Şehrîyarî jî pê hate bidan. Ji wê rojê û pêve bi navê Melek Salih ve nema pûl hatin lêdan û peyvdarîya roja înê nema hate xwendin. Pûl bi navê Melek Nasir Yusif Kurê Eyub ve hatin lêdan. Li dawîya vêna de û di tevaya geştîyê de herçi talanîyek bi destên wî ve hatibûn bikevtin, wî bi Ser Leşker de date bidabeşkirin.

## 9. pêla Šehrîyarîyê

Šehrîyar Selah El-Dîn li dawîya rêkxistina îš û karên Surî Destêyî Ismailî date biperwekirin. Berî rabûna xwe ji Šamê wî Toranšahê Birayê xwe, yê ku ew ji Yemenê ji bona bidîtina wî hatibû, bi Cîgerê xwe ve li ser Šamê de date navandin û ew ji bona Misrê hate zîvirandin. Wî dest bi avakirina Bedena dora Qahire û keleha wê ve date bikirin. Bi rastî ev Bedena hanê zor caran jî hatîye biveçak û bivenuhkirin. Belam Nîšans Ala Šehrîyar, ku ew Heloyîek sor li ser zemîneke zer de bû, hêjî ew li ser dîwarekî kelehê de tête bidîtin.

Li dawîya vegerandina Šehrîyar ji bona Misre Firegan bi kês ve ji xwe re datin bizanîn û wan bi Du Qolên cudan ve xwe ber bi Šamê û Balebeke ve dane rakišandin. Wan ew hindamên hanê dane birav û bitalankirin. Toranšah jî wan dane bišikenandin û wan gelek ji Musulman jî dane biradestkirin.

Gava ku Šehrîya Selah El-Dîn evaya date bihîstin, wî bi Leškerekî Biçûk ve ruwê xwe ber bi Felestînê ve date bivekirin û ew tanî Reme hat. Li wêderê de ew tûšî Leškerê bi hêzî Firengî ve bû. Ew ligel wan de bi šer ve hate bikevtin. Belam kamwerbûn ji bona Dujmin bû. Šehrîyar jiberbatîyeke di sala gewre hate birizgarbûn, ya ku ew di sala 573 k. de hate birûdan. Mîr Îsayê Hekarî di vî šerî de bi destên firengan ve hate bikevtin. Li dawî de Šehrîyar bi paran ve ew date kirîn. Teqî El-Dîn Omer û hinên din ji Serleškeran hatin biradestkirin. sipahê Šehrîyar Selah El-Dîn tevaya bargiranîya xwe di šûna xwe de date bihištin û ew tûšî azar û perîšanîyeke mezin bû. Li paš vê de sipahê Firengî berê xwe ji bona Hema date bivedan û wî çardorî lê date bigirtin. Ji bextîya xweš di dema dorpêçana bajêr de Mîr Seyf El-Dîn Ehmedê Meštub di keleha bajêr de bû. Wî ligel Serdarê wê de bi hev re bi pehlevanî ve liberxwedana xwe dane bikirin. Dujmin neçar bû. ku ew bi pištguhxurînî ve dev ji kelehê bide biberdan.

Šehrîyar Selah El-Dîn ji bona Misrê hate bivegerandin. Vê carê wi Leškerekî bi hêz û hiner ve date bikomkirin. Li dawîya Sê Mehan de wî ruwê xwe ber bi Surî ve date bivekirin. Wî Leškerê Šamê jî bi tek xwe ve date bixistin û wî gêre bi Firengan date bikirin. Di wê demê jî de Leškerê Filan gerden li Hema de dabûn bitengkirin û ew li dawî de ji bona ser Harim çûn, ya ku ew li jêr serdarîya Helebê de bû. Li dawîya

sitendina Pereyekî zor de ji Melek Salih ew ber bi paš ve hatin bivegerandin.

Firengan xwe beramber bi Šehrîyar ve lawaz dane bidîtin. Tirse ew datin bigirtin. Wan dest bi xurtkirina ser sînorên xwe ve dane bikirin û wan dest bi avanîya kelehekê ve li nêzkîa Beyt El-Yaqub de dane bikirin. keleha hanê ji bona Islame xerab bû; jibervêjî Šehrîyar xwest, ku ew bi dilbijandina Mal ve ji bona Firengan ve destên wan ji bidurustkirina vê kelehê bide kišandin. Belam karê wî bê sûdmendî ma. Wan keleha xwe dane biavakirin û ew bi Sernavînîyeke cengîyî pir giring bû.

Qeralê Qudsê li paš payînbûna avanîya kelehê de Leškerek ji bona ser Surî date binardin. Šehrîyar jî Mîr Ferxšahê[174] Birazayê xwe bi Leškerekî ve ji bona beramberîya wan date šandin. Ferxšah Firengî pirî pîs dane bišikenandin. Ewende nema bû, ku ew Qeralê Qudsê bide biradestkirin. Belam Yekekî ji Suwarên wîyî bi nav û bang ve bi Navê Hemferi ve ew date birizgarkirin. Li layekîtir jî de Šehrîyar Selah El-Dîn bi xwe û Leškerê xwe ve ji bona ser keleha Yaqub çu û wî dest bi dorpêcîya wê û talanîya hêlên Seyda û Berude ve date bikirin.

Qeralê Qudsê ji bona biwergirtina tolê ji Šehrîyar û nehiština talankirina Musulmana bi Leškerekî zor bi hêz û hiner ve berê xwe ber bi Leškerê Šehrîyar ve date rakišandin. Li Merc El-Iyun de šerekî zor germ û giran di nava wan de hate bidadan. Firen zor bi pîsî ve hatin bibezandin. Zor li wan de bi Dîlî ve hatin bigirtin. Serdarê Terablusê Riyamond, Serdarê Reme Boldewîn, Serdarê Teberîya Herc û hin Peyên û Maqulên Firengîyî din jî di nava Radestvanan de dihatin bidîtin. Ev di 2 Muherem sala 575 K- 10 Hezêrana sala 1179 z. de hatîye birûdan.

Šehrîyar li dawîya vê kamwerbûna bilindî hanêyî de bi Du Mehan ve bi Leškerekî zor xurt ve xwe ji bona ser keleha Yaqub date birakišandin. Di nava Pênc Rojan wî ew date bigirtin û Parêzvanê wêyî Firengî date biradestkirin. Wî keleh jî date bitêkûpêkdan[175].

---

[174]Ew Bavê Seid Iz El-Dîn Dawid Ferxšah Kurê Nur El-Din Šahînšah Kurê Necim El-Dînê Eyubî bû. (M. E.).

[175]Ji xwe re li Kurê Esîr, B. 11, r. 185 de bide bitemašekirin. Dê hûnê bi dûr û dirêjî ve li ser de bibînin. (M. E.).

Bi hoyê lidestçûna keleha Yaqub ve Firengan lerz û tirsê datin bigirtin. Wan daxwaza Du salan devjihevdûberdanê datin bikirin. Šehrîya bi vê daxwazê ve hate birûništin. Hemû Mîr û Serdarên Firengî ji bil Serdarê Entakya ji bona nava vê lihevhatinê hatin bikevtin.

Šehrîyar Selah El-Dîn xwest, ku ew di vê kêsê îš û karên welatê Cezire bide bisaxkirin. Serdarê Hesen Kêfê Nur El-Dîn, yê ku ew Zavayê Qelîc Erselanê Serdarê Selcoqîyi Romê bû, ligel Xezûrê xwe de têk çûbû. Li ser vê de Qelîç Erselan dazanîna cengê li ser Nur El-Din de dabû bikirin. Tavil jî Mîr Nur El-Dîn Têgildarê Šehrîyar bû. Herçend jî Šehrîyar li rûdana Husen Reîyan de riqê wî li Qelîç Ersilan bû, belam dîsan wî nedixwest,, ku xwîn di navbera Musulmanan de bête rijandin. Wî ew rêkxistin û ew bi xwe jî ji bona ser Serdarê Erminya Biçûk çû, yê ku ew bi xwe Robîn bû[176]. Wî ew date šikenandin û wî ew neçarî lihevhatinê date bikirin.

Li van biserkevtinên Šehrîyar de Yek li dû Yek de hemû Kes agehdar bûn. Wan dane bihištin, ku bi berzbûna hêz û karîna wî û šanê wîyî bilind ve pê bête birûnišatin. Hemû Serdarîyên Biçûk ji bona Dostanîyê ligel wî de didan bihewildan û Gewrebûna Šehrîyar Selah El-din li ser xwe de pê dihatin birûništin. Di navbera xwe û Šehrîyar de Peymanek di Cemada yekem de sala 575 k.- Çirya Pêšîn de sala 1180 z. de dane girêdan[177]. Ev Peymana hanê divabû, ku ew Du salan bide demandin. Serdarê Musilê, Cezîrê, Hewlêrê, Hesen Kêfê, Mêrdînê, Šehrîyarê Romê û Keyê Erministanê ji bona nava vê Peymanê hatin bikevtin. Wan datin bisozdan, ku ew di nana wan Du salan de šer ligel hevdû de nadin bikirin.

Bi vî rengî ve šer di nava Musulmanan de hate bidawîkirin. bi vê Peymana hanê ve nav û banga Šehrîyar di nava welatên di navbera Derya Reš, Tengava Farîsî û Derya Sipî de hate berz û bilindbûn. Bi saya vê Peymana hanê ve karina bi karanîna hemû Hêzên Islamê ve beramber bi

[176]Mîna ku li nik Kurê Esîr de di B. 11, r. 190 de hatîye binivîsandin, ew bi Kurê Liyon bi nav û bang bû. (M. E.).

[177](Li nik Kurê Šedad de hatîye, ku ev Peymana hanê di 10 Cemada yekem sala 576 k.- 2 Çirya Pêšîn de sala 1180 de hatîye bigirêdan. Selah El-Dîn, r. 182. Cuma).

Firengan ve hate biencamkirin. Li dawîya vêna de Šehrîyar bi dilekî bêvedayî ve di Receba sala 576 k. de ji bona Misrê hate bivegerandin. Wî Mîr Ferxšahê Birazayê xwe bi ser Šamê ve bicî date bihištin[178].

Gavav ku Šehrîyar bi Misrê ve hate bigihaštin, wî dest bi rêk-xistina îš û karên wê date bikirin. Wî Nivîstxane û Dibustan dane bivekirin û rê û ban jî dane biçakkirin. Wî keleha Iskenderîyê jî date bixurtkirin. Toranšahê Birayê wî, yê ku jê re li dawîya Balebek de Iskenderîyê pê hata bidan, li pêš bigihandina Šehrîyar ji bona Misrê ew hate bimirin.

Gava ku Šehrîyar ligel kar û barên Misrê de xerîk bû, xeber ji bona wî hat, ku Rînold Arnat Fermanrewayê Kerk mercên peymana girêdayê dane bitêkdan. Wî Kerwanekî Bazirganîyî Musulmanan li nêzîka Kerk de date bitalankirin. Lihev hate birastin, ku di wê gavê de Gemîyek ji Hacacê Filan li Dumytê de li layê wî bûn. Šehrîyar beramber bi reftara Fermanrewayê Kerk ve ew Rêwîyên Mala Xwedê dane bigirtin.

Her di wê navê jî de Serdarê Musilê û Cezîrê jî Mîr Seyf El-Dîn Xazî hate bimirin. Wî berî mirina xwe dabû bitemînîkirin, ku wî Cezîra Ibin Omer ji bona Kurê xwe Šinceršah dabû, Bajarokê Eqra Hemîdî jî ji bona Nasir El-Dîn Kešk dabû û mayînên welatên Musil û Cezîrê ji bona Birayê xwe Iz El-Dîn Mesud dabû.

Li dawîya çendakî din jî de Melek Salih Ismaîl jî di 25 Receba sala 577 k. de hate bimirin[179]. Wî jî berî mirina xwe Heleb ji bona Iz El-Dîn Mesud dabû bitemînikirin. Mîr Iz El-Dîn Mesud jî li dawî de Heleb ligel Birayê xwe Îmad El-Dîn de bi Sincarê ve di 13 Muherem sala 578 k. de date biveguhertin.

Šehrîyar bi mirina Melek Salih û bizeftkirina Helebê ji bal Îmad El-Dîn zor pest bû. Belam bi hoyê Peymana lihevhatina Du Salî ve nedibû, ku ew ji bona ser Helebê bête çûyîn û wê ji wî bide bisitendin. Bi

---

[178](Selah El Dîn di 8. Dêsembera sala 1181 de ji Šamê der çû û ew di 2. Yenayera sala 1181 de bi bajarê Wahire ve hate gihaštin. Šerçavîya Pêšîn, r. 184. Cuma).

[179](Ew di Roja Îna 25 Receba sala 577 k.- 4 Dêsembera sala 1181 de li bajarê Helebê de hate bimirin. Kanîya Pêšîn, r. 190. Cuma).

rastî jî Šehrîyar pir guh bi parastina mercên Peymana lihevhatina dide bikirin. Wî hîç peyman û Soz nedabûn û nedidan bišikenandin, tevî ku hêšta jî ji bona payanbûna wê jî Çar Meh mabûn. Xeber jê re hat, ku Hinek Hevalbendên ligel Šêxê El-Cebel de ligel Firengan de derbarê Šehrîyar de xerîkê rêkxistinê ne.

Li ser van rewš û zînetên hanê de Šehrîyar Selah El-Dîn bi Leškerekî ve ruwê xwe ber bi Šamê ve date bivekirin. Wî bargiranîya xwe ligel Tac El-Miluk Boriyê Birayê xwe de ji bona Šamê date šandin. Wî bi Leškerê xwe ve dest bi talankirina welatê Firengan ve date bikirin. Dujmin newêrî bû, ku ew rêya wî bide bigirtin. Ew bi bê dujwarî ve di Sefera sala 578 k. de bi Šamê ve hate bigihaštin[180].

Li dawîya bînvedana çend rojekî de dîsan ew hate bihelsandin û wî bi ser welatê Firengan de date bidadan. Wî zor li wan de datin bikuštin, wî bajarokê Bîsan jî date bigirtin û cardî ew ji bona bajarê Šame hate bizîvirandin.

Li dawîya mehekê de ew ji bona Bêrudê çû û wî di bejayê û avê de dorpêçana wê dat bigirtin. Belam li pêš bigirtina vî Šehrî de li ser daxwaza Gogborîyê Serdarê Heranê de wî ruwê xwe ber bi Cezîrê ve date bivekirin. Di vê navê jî de dema Peymana lihevhatinê hatibû bipayînkirin û piranîya Serdarên Cezîrê dixwestin, ku ew ji bona jêr serdarîya Šehrîyar bêtin bikevtin. Wan ev arezuwê xwe ji bona wî dane bidaraštin. Bi vî rengî ve ev ji boma Šehrîyar pêšekîyeke bi xêr bû. Wi xwest, ku ew ji vê dasendê sûdmendîyê ji xwe re bide bisitendin û Musilê jî bide bigirtin.

Bi rastî jî ew çû û wî dorpêçîya Musilê jî date bigirtin. Belam di dawîya Du Mehan de Musil wî date bicîhištin. Ew ji bona Sincarê çû û wî ew di 2. Remezana sala 578 k. de date bigirtin. Di wê navê de xeber bi wî ve hate bigihaštin, ku Fireng xwe ji bona bitanaîkirina Jêrî Surî didin bilikarxsitin. Šehrîyar giringî bi vê xebera hanê ve neda. Wî got: Fireng di wan navan de dibe, ku ew hin Gund û Mundan ji xwe re bidin bizeftkirin. Ême jî li hêre de Bajaran ji xwe re didin bigirtin. Di dema bivegerandinê de dê emê nebes tenê wan girtinên Firengan bidin bivegerandin, hêjî bêtir dê emê wan ji Welêt bidin biderkirin.

Bi rastî jî mebesta Šehrîyarîyî pêšî û dawî di Yekitîkirina Serdarên Musulmanan de û di jêrxistina wan de di bin desthilatîya xwe de

---

[180](Ew di 7. Sefera sala 578 k.- 22. Hizêrana sala 1182 bi Šamê ve hate gihaštin. Kanîya Pêšîn, r. 199. Cuma).

dida bidîtin, da ku ew sûdmendîyê ji nêrmendî û yekitîya wan beramberî Firengan ji bona girtina Qudsa pîroz bide bigirtin. Bi vê remana hanê ve di pêšî de wî xwest, ku ew kar û barên Cezîrê bide bidawîkirin.

Šehrîyar Selah El-Dîn li dawîya Sincarê ruwê xwe ber bi keleha Amed-Diyarbekir date bivedan. Li dawîya dorpêçaneke Hešt rojî de wî ew keleha xurt û gewre date bigirtin.

Di wê navê de xeber pê hate bigihaštin, Ku Îmad El-Dîn Serdarê Helebê di beramberî wî de ligel Firengan de lihevhatinek daye bigirêdan, da ku ew bi hev re hêrîšî welatên Šehrîyar bidin bikirin.

Li dawîya bihîstina vê xebera hanê de destbicî di Firatê de ew hate têperandin. Li ser rêya xwe de wî Entab di 16 Muherema sala 579 k. de date bigirtin. Li paš de wî Heleb jî date dorpêçandin. Îmad El-Dîn ku zanî, ew netuwane xwe bide biragirtin. Wî daxwaza lihevhatinê ji Šehrîyar date bikirin, ku ew li batê Helebê de Sincarê û pêvekirinên wê ji Nisêbînê, Xaburê, Reqa û Seruc ji bona wî bide bidan.

Šehrîyar bi vê veguhertina hanê ve hate birûništin û ew di 17. Sefera sala 579 k.- 19. Hizêrana sala 1183 z. de ji bona nava bajarê Helebê hate bikevtin[181]. Tudeyên Helebê bi aheng šadî ve pêšewazî lê dane bikirin û wan jê re pir sipasîyên xwe dane bipêškeškirin. Di gava dorpêçana Helebê de xêra mirina Mecid El-Dîn Borîyê Birayê wî jê re hate bigihandin. Li ser vê de ew zor sexlet bû.

Qaziyê Šamê Mihyedînê Kurê Zekî li paš vekirina Helebê de bi Xwešxuwanekê ve pesin ji bona Šehrîyar datin binivîsandin. Di vê Malikê ew dibêje:

Vekirina weyî Helebê bi šûr ve di sefer de
mizgîniya layandinîya Qudsê ye di recb de.

Bi rastî jî layandina Qudsê li paš Çar salan de di Meha Muherem de hate bikirin.

Li dawîya layandina Helebê de Nêr û mendbûna Šehrîyar bi se-rûštî ve bêtir hate bigewrekirin. Ew bi Gewreyê hemû Serdarên Musulmanan ji bil Musul hate binasîn. Ji Cêzîre tanî Remele li Felestînê de ji Terablusa Rojava tanî Yemenê ev welatan hemû bi jêr desthilatîya

[181](Dergehên keleha Helebê jê re 18. Sefer sala 578 k.- 12. axlêva sala 1182 z. de hate bivekirin. Kanîya Pêšîn, r. 234, 241. Coma).

wî ve hatin bikevtin. Hemû Serdarên van Welatan bi fermanên wî ve dihatin hilatin û dahatin. Bes û bi tenha ve remana vegirtina Qudsa pîroz û biderkirina Firengan ji Kêšverên Musulman li ser bala Šehrîyar de mabû û ew pê xerîk bû.

Šehrîyar Selah El-Dîn di 3 Cemada Pêšî de sala 679 ji Helebê derçû. Di wê navê de Firengan ji mirina Ferexšahê Šûngirê Šehriyar li ser Šamê de sudmendî ji xwe re datin biwergirtin û ew tanî Šamê wan Welat ji xwe re didan bitalankirin. Li layekîtir jî de Mîrê Kerk tanî Medîna Munewer ew navanan jî dane biwêrankirin. Hêjî bêtir ewende nebû, ku ew Medînê jî ji xwe re bide bigirtin. Belam Mîr Lulu bi firyada wê ve hate bigihaštin. Wî Leškerê Kerk date šikenandin û zor li wan de date bidîlkirin.

Šehrîyar li van zînetên hanê tûre bû. Wî xwest, ku ew zor baš firengan bide biperwerdekirin. Ew bi Leškerekî ve di Çemê Urdun de hate buhurandin. Ew bi Bîsan ve hate bigihaštin. Wî ew date bisutandin. Ew li Jorî Uqule tûšî Leškerê Fireng bû. Bi bervajî ve piranîya Firengan newêrîbûn, ku ew ligel wî de bišerkevin. Wan xwe ber bi Paš ve tanî Isfurîyê dane bikišandin.

Li dawêya vêna de Šehrîyar ji bona ser Kerk çû û wî dorpêçî lê date bikirin. Belam wî kelk jê nedît. sala duwayî jî ew ji bona ser wê hate. Belam dîsan jî wî ew neda biwergirtin[182].

[182]Kovara Misr Kul Šey di Jimara xwe 296 di mêjûwa 11 Sebtembeta sala 1931 de di bin nan û nîšana Seleh El-Dîn û Banûwa Firengî de çîrokek li ser dorpêçana Kerk de dayite binivîsandin. Kurtîya wê dibêje: " Di Çirya duwemê sala 579 k. de Šehrîyar Selah El-Dîn li Kekeha Kerk de gerden date bitengavkirin. Di wê navê de Hemfirîyê Çarem Kont dê Toron Keça Kont Rîno Dê Šatlon dabû bimarkirin. Di nava Burceke kelehê de xerîkî šayîbûn. Dayika Zave Banûwa Îtanat Encumenek ji Peyayên Gewre ligel Diyarîyan û nameyekî de ji bona layê Šehrîyar Selah El-Dîn date birêkirin. Wê di nameya xwe de jê date bihevîkirin, ku ew di ševa bidanîna govendê de wê Burcê nede biazakirin û Bisulman jî wan diyarîyên wêyî Šayê ji xwe re bidin bgirtin. Wê ji wî re date bigotin: "Divê tu bi bîra xwe ve bîne anîn, ga ku tu di nava Koška me de radest bû. Me her û her rûmeta te dida bigirtin, xwešiya te dida bixwestin û guh bi te dida bidan. Ji bona xatirê dostanî û bîrwerîya wan rojan em hevîdin, ku tu dê šaya Kurê min nede bišewandin". Bi rastî jî Šehrîyar ferman date biderkirin, ku divê tû tengayî di wê demê de neyên bikirin. Sehrîyar kaxezek bi navnîšana xwe ve ji bona Banû date binardin". Li gora van agehdarîya de em wer têtin biliberkevtin, ku ew demekê radts bû û ew demekê li jêr destên Hemferî de ma bû.

(Šerçavîyên Musulmanîtîyê tu goyên weha nade naskin. M. E.).

Li paš vê de Serdarên Firengan daxwaza lihevhatina Çar salan li Šehriyar dane bikirin. Wî ev daxwaza hanê jî date biwergirtin û ew ji bona bajarê Šamê hate bivegerandin.

Di we navê de Serdarê Musilê bi alîkarîya Xelîfê Ebasî ve xwest, ku ew ligel Šehrîyar de bêtin lihevhatin. Bi vê mebestê jî wî Biha El-Dîn Kurê Šedad, yê ku ew li layê Šehrîyar de zor xwešewist bû, ligel Šêxê Šêxan Sedir El-Dîn de ji bona layê Šehrîyar li Šamê de datin binardin. Belam Šehrîyar Selah El-Dîn ev bi berjewendî nezanî. Li paš demekê de wî bi Leškerekî ve ruwê xwe ji bona Musilê date bivedan û dorpêçî di sala 581 k. de lê date bigir. Serdarê Musilê ji bona hêvîya lihevhaê ligel wî de Dayika xwe, ya ku ew Keça Šehrîyar Nur El-Dîn bû, ji bona nik wî date binardin. Belam ev jî bê kar bû.

Gava ku Šehrîyar xeberên têkçûn û lihevkeên Erministanê date bihîs, wî dev ji dorpêçanê date biberdan û ew ji bona Mîyafarqîne hate çûyîn û wî ew di Rebia Dawî de sala 581 k. de date bigir. Li paš de ew ji bona ser Musilê careke din hate zîvirandin. Belam nexwešîyeke giran ew date girin. Bi neçarî ew ji bona Heranê hate bivegerandin.

Di Rêya xwe de ew tûšî Wênerekî tirî Serdarê Musilê bû. Bi hin mercên baš ve mîna xwendina peyvdarîya roja înê û lêdana pûlan bi navê Šehrîyar ve û berdana hin welatên tir hêviya ašîtîyê hate biwergirtin.

Gava Šehrîyar bi Heranê ve hate bigihaštin, nexwešiya wî lê hate bigirantirkirin. Hinek ji Hevalên wî umêdîya xwe ji jîna wî birîn û Šehriyar jî temînîyên xwe dane bikirin. Belam zor pê neçû, nexwešîya wî hate bisivikkirin û ew hate biçakbûn. Di vê gavê de Kurê Šedad ji bona Heranê di dawîya Zil-Qude de sala 581 de hate bigihaštin û wî bi navê Serdarê Musilê ve nama lihevhatinê date bimorkirin. Bi gora vê lihevhatina hanê de Šehrîyar Selah El-Dîn bi Serdarê Jorî Cezîrê û Bešekî dinî Kurdistanê bû.

Šehrîyar li dawîya vê lihevhatina hanê de ji Heranê helsa û ew çend rojekî li Humsê ma. Li wêderê de wî Nasir El-Dîn Kurê Šêrkohê Mamê xwe date bikuštin. Çunke, wî di dema nexwešîya Šehrîyar de ligel Serdaran de ji bona serdarîya xwe dabû bixebatkirin. Šehrîyar li cîgehê Nasir El-Dîn de Kurê li ser Humsê de bi Serdar date bidanîn. Ew di Muherema sala 582 k. de ji bona Šamê hate bivegerandin.

## 10. Šehrîyar Selah El-Dîn û Xaçperest

Li dawîya ku Šehrîyar îš û karên Surî û Cezîrê de bi rê ve bir, agirê zikrešîyê û gelacîya di navbera Serdarên wan navan de date kujandin, hemû bi fermanên xwe ve dane bibestandin, Hêzên belavikirîyên Serdarên Musulmanan, yên ku ew her û her di šer û pevçûnên nava xwe de dihatin xerckrin, wî ew hemû bi ser hev de dane bikomkirin, da ku ew wan ji bona mebesta pîroz di vegirina Qudsê de û derperandina Xaçperastan ji Felestîn bid bilikarxsitin. Ew li vê Yekitîyê û desthilatîya serdarîya xwe de bi carekê ve pištrast bû. Înca wî biryara dazanebûna xebata perest berambr bi Firengan ve date bidan.

Cudabûn û gelacîya Serdarên Firengan di Felestînê de ji bona bicihanîna vê biryara hanê zor yarîdar bû, bi taybetî li dawîya mirina Baldewînê Çarem de îš û karên dewletê bi Cîgirîyê di destên Riyamondê Serdarê Terablus de bû. Li dawî de Sîbîla Mîra Xweha Padîšah bi Mîrekî Firengî bi navê Co ve date bišukirin û wê Tac jî li ser serê wî de date bidanîn. Vî Coyê hanê bi Leškerekî ve xwe ji bona ser Riyamond li Teberîya de date bidadan. Vî Riyamondî jî daxwaza hewarê ji Šehrîyar date bikirin. Belam Šehrîyar arezuyî nikir, ku ew li pêš dawîbûna dema Peymana lihevhatinê de hêrîšî ser Firengan bide bikirin.

Ev wergerandina soz jî di vê carê jî de ji bal Firengan de di rêya Rînoldê Mîrê Kerk de hate bikirin. Bi rastî jî di sala 582 k. de kerwanekî gewreyî Musulmanan di wê gavê de li nêzîka Kerk de dihate têperîn, ew tûšî hêrîša Ferngan bû. Hemû Malên wan ji destên wan çûn. Peya û Jinên vî kerwanî jî hatin biradestkirin. Li gora goyekê de tête bigotin, ku Šehrîyar bi xwe ve jî di nava Dîlên vî kerwanî de bû. Rînold bi vê jî haj nebû. Wî hin devavêtin û šorên bêvac jî ji bona Musulmantîyê dane bikirin.

Ev xeberanan ji bona Šehrîyar hatin bigihaštin. ew zor sexlet bû. Wî sundxwar, Heger ez Rînold bidim bigirtin, dê ezê wî bi destên xwe ve bidim bikuštin.

Li dawîya vê rûdana hanê de Šehrîyar dazanîna hêrîša gištî date bikirin. Wî ji bona parastina Rêwîyên Mala Xwedê herçî ewê pêwist bû, wî date bilidarxistin û bilikarxsitin. Wî li Qesir El-Selame de li nêzîka Busra de Ordugehek date bisazkirin. Zorî pê neçû Leškerê Misrê jî pê

hate bigihandin. Melek Fedilê Kurê wî jî li hêla Eka de šikestineke baš bi Bešekî ve ji Orduwa Firengan date bigihandin. Di encam de Riyamond jî ligel Firengan de haj bû. Bi vî rengî ve hêz û hinera wî zor bû.

Šehrîyar Selah El-Dîn Encumena Šura xweyî Cengîn date bikomkirin. Vê Encumena hanê biryara šer ligel Firengan de date bidan. Roja pênc šemê 16 Rebiê yekem sala 583 k. de Leškerê Lek bi Lek hate livandin û ew di roja înê de di ser Çemê Urdun de di Jêrî Teberîya de date biderbaskirin[183]. Hêzek ji bona çavnêrîna Dûjmin wî date binardin, yê ku ew li Sefurîye bû. Li dawî de wi hêzek beramber bi Dujmin ve date bidanîn û ew bi xwe ve ji bona ser Teberîya çû û w î ew date bizeftkirin. Belam Mal û Mendalên Riyamond xwe ji bona nava kelehê datin biavêtin û wan hewar ji Melek Co re datin bixwestin.

Li paš dawîya gift û goyeke dûr û dirêj de Firengan biryara šer ligel Šehrîyar datin bidan. Wan di pêšî de xwestin, ku ew rêya avê li se Šehrîyar de bidin bigirtin. Belam ew bi šašî çûn. Çunke, Šehrîyar ji xwe ev alîyê hanê dabû bigirawkirin. Wî av ji ser leškerê Firegan date birîn. Roja pêšî Leškerê Firengan ji bona birîna avê dane bihewildan. Belem ew biser nehatin bikevtin. Di rojên germ de ew bi xwe ve ji pê avê šerpeze bûn û ew ji bona Ordugahên xwe bi ser šorî ve hatin bivegerandin. Di nava rojên din de leškerê Musulmanan bi mêrxasîyeke šêrîtî ve ruwên xwe ber bi leškerên Firengan ve dane bivekirin û hêrîšî wan dane bikirin. Wan ew bitefir û bitunakirin. Li yekî ve Hêrîša Musulmana li yekîtir ve kêra tîbûnê Fireng bi carekê ve ji karxistin. Roja 26 Rebîê Dawî sala 583 k. de bi roja ruxandina bingehên Mîrnešînîyên Firengî ve li Felestînê de tête bidîtin[184] Melek Co, Mîrê Kerk Birayê Melek.hin ji Serdarên Leškerên din jî ligel Firengên zor bi dîlîtî ve hatin bigirtin. Darê Xaçê perest jî di nava talanan de bû. Ji wê roja ku Fireng ji bona van navan hatibûn, ew weha zor tûšî šikestineke wer gewre û bi kêr ve nehatibûn bikirin[185].

---

[183](Leškerê ji Ordugeha xwe di Roja Înê 17 Rebîê sala 583 k.- 27 Hizêrana sala 1187 de hate birêkkevtin. Selah El-Dîn, r. 290, 298. Cuma).

[184](Di Ševa Šemê li ser Yekšemê de di 25/26 Rebîê Dawem de sala 583 k.- 4/5 Temuza sala 1187 z.de livandina Lešker hate bidestpêkirin. Di roja Sêšemê de 28 Cemada duwem sala 583 k.- 7 Temuzê sala 1187 z. de ev malwêranîya hanê bi serên Xaçperestan ve hate bîcîhatin. Kaniya Pêšîn, r. 308, 310. Cuma).

[185](Di vî šerî de bêtir ji Çil hezar Nefer Leškerê Xaçperestan dihate

Li dawîya šer de konek ji bona Šehrîyar dane bihiladn û têde Serdarên Lešker, Pêyên gewre û Maqul hatin birûništin. Melek Co û Mîrê Kerk jî ji bona nik Šehrîyar dane bianîn û ew li wir de hatin bidanîštin. Melek Co daxwaza avê date bikirin. Destbicî zerikek avasar ji bona wî dane bianîn. Wî tozek jê date bivexwarin û wî zerika avê ji bona Mîrê Kerk date bidan, Belam Šehrîyar destbicî nehišt, ku Mîrê Kerk avê ji zerikê ji xwe re bide vexwarin û wî got:"Ême ava xwe bi wan Kesan ve nadin bidan, tanî ku ew ji sitendin tola me ji wan neyêtin bipištrastkirin", Li dawîya vêna de ew li ser hovitî û dirbûna Mîrê Kerk beramber bi Karwan û Rwêîyên Mala Xewdê ji Musulmanan date biaxivtin. Li pas de wî bi destên xwe ve serê wî date birîn û wî sunda xwe date bicînanîn. Qeral Co li vê reftarê de pir hate bitirsandin, lêbelê Šehrîyar ew date bidilxweškirin û wî ew ligel dîlên mayîn de bi rûmet û hêjabûn ve ji bona Šamê date binardin. Bes û bitenha ve wî Dused Kes ji nava Radestvanan date bihelbijartin, yê ku ew bi xerabî û sitemkarîya xwe ve beramber bi Musulmanan gelekî bi nav û bang bûn. Wî ev Dused Kesên hanê hemû dane bikuštin.

Li dawîya çend rojan de Šehrîyar ji bona ser Teberîya çû û Jina Riyamond bê hêvî bû û wê keleh date biberdestkirin. Li paš vê de Šehrîyar ruwê xwe ji bona welatên mayînên Felestînê date bivedan. Bi xwe jî ve hêzeke wan welatan wisa nema bû, ku ew li beramber wî de bê birawestandin.. Gava ku ew ji bona her keleh û Bajaerekî dihate bigihaš, destbicî wan dergehên xwe jê re didan bivekirin. Wî jî derbarê Tudeyên wan de her û her rûxwešî û dadwerîyeke zor dida niwandin.

Li dawîya Teberîya de wî rûwê xwe ber bi Eka ve date bivedan, lêbelê ev keleha hanê nehate biradestkirin û wê liberxwenadeneke kurt date bikirin. Li paš de wê xwe bi hêvîya dilnermîya Šehrîyar ve date biberdestkirin û Tudeyên jê ha biderçûn. Li " Cemada Pêšîn de sala 583 k. de sipahê Islamê ji bona nava kelehê hate bikevtin. Wan di roja Înê de diMizgefta wê de, ya ku Filan ew ji bonaKenîštê dabûn veguherandun, dane bilimêjkirin[186].

---

bitexmînkirin. Ji wan Sî hezar hatin kuštîn, Deh hezar hatîn biradestkirin û Sê hezar ji wan hatin birizgarkirin. Kanîya Pêšîn, r. 310. Cuma).

[186](Di Roja Pêncšema 9 Cemada Pêšîn de sala 583 k.- 9 Temûza sala 1187 z. de Lešker ji bona Hêrîšê hate amadekirin. Belam kelehê xwe date berdestkirin. Kanîya Pêšîn, r. 290 û 312. Cuma).

Li dawî vêna de Šehrîyar Melek Adil Birayê xweyî li Misrê de ji bona ser tuxubên Felestînê date binardin, da ku ew dest bi pakbûna wan ji Xacperestan ve bide bikirin. Melek Adil Husin Mecdel Yana u bajarê Yafa dane bigirtin û pir dîlên zor bi destên wî ve hatin bikevtin.

Šehrîyar jîji Eka hin ji Qolên xwe jî ji bona vekirina keleh û bajarên Felestînêyi mayîn datin binardin. Wan Nasire, Qîsarîye, Heyfa, Sefurîye, Šeqîf, Filule û Maleya dane bivegirtin. Li yekîtir de Nablos, Sebsete, Beha Qebir Zekerîya û hin Bajarokên tir jî Leškerên Musulmanan dane bivekirin.

Šehrîya bi xwe ve jî ji bona ser keleha Tenîn çû, ya ku wî vegirtina wê ji bona Teqî El-Dîn Omerê Kurê Birayê xwe dabû bisipartin, wî ew date bigirtin. Ji wir wî ruwê xwe ber bi Seyda date bivekirin. Wî ev bajarê hanê jî be šer date bigirtin. Wî Bêrud li dawîya Hešt rojên dorpêçînê de date bizeftkirin.

Li dawî de Šehrîyar xwest, ku ew Esqelan bide bigirtin, çunke, ew li ser rêya Misrê û welatê Šamê de bû. Ew nala dergehê Qudsê dihate bidîtin. Mexabin, ku di wê demê de Šehrîyar tu giringbûn û guhpêdan ji bona bajarê Sur nedabû, yê ku wirde wirde Gawir têde dihatin bikomkirin, belam ew bê Serek bûn. Ew dê bi Hêzeke sivik ve di wê demê de bihata bigirtin. Tevlivêjî guhpêdan bi bigirtina vî Bajarî ve nehate bidan. Li paš de keleha vî Bajarî bi Mîla bizava Gawiran ve hate bikirin. Zor pê neçû, ku Markîz Konard ji Qestentînîyê ve bi Mal û Çekekî zor ve ji bona vê keleha vî bajarê hanê hat û wî liberxwedana keleha Bajer date birêk û bipêkxistin. Ew bi mîla bizava Hêrîša Xaçperestên Sêyem ve hate bikirin. Ew bi berbateke mezin ve ji bona Musulmanan hate bikirin. Guhpêneda Sur ji bona Musulmana šašbûnekeke gewreyî siyasî û sipahî bû; jiber li pêš hatina Markîz konard de Tudeyê Sur xerîkî berdestbûna xwe bûn. Belam gava ku Konard hat, wan remana xwe dane biveguhertin.

Šehrîyar Selah El-Dîn xwest, ku ew di rêya Bavê Konard de, yê ku ew li bajarê Šamê de Dîl bû, nehêle, ku Konard liber Sur bide bidan. Belam ev tedbîra hanê bi ser ve nehate bikevtin. Šehrîyar li dawîya vêna de ruwê xwe ber bi Esqelan ve date bikirin û wî ew date bidorpêçkirin. Çardeh roja ew ligel vekirina vî bajarî xerîk bû. Wî xwest, ku ew keleha bajêr di rêya Qeral Co de bide bigirtin. Belam ev bê kelk bû. Di dawîya Cemada Pašîn de bi xurtî ve wî hêrîš bi ser keleha bajêr de date bidadan û wî ew date bizeftkirin. Di dawîya vêna de wî Xeze, Remle, Xelîl El-Rehman, Beyt El-Lehem û çend cigehên din jî datin bigirtin.

Ev hemû vekirinên hanê di nava Du Mehan de Šehrîyar dane bikirin. Bi rastî jî ev bi piškdarîya hîç Padšahekî ve nehatibû bikirin. Li dawîya vêna de rêya Qudsa pîroz ji bona Musulmanan hate bivekirin. Šehrîyar Selah El-Dîn dizanî, ku giringbûna vî Šarê piroz li layê Musulman û Filan de zor bi mezinbûn tête bidîtin; jibervêjî wî nedixwest, ku ew wê bi zor û šer ve bide bigirtin û ew wê tûšî dorpêçanê û wêrankirinê bide bikirin. Bi vê remanê ve wî Encumenek ji bona Tudeyên Qudsê date binardin, da ku ew ji bona radestkirina wan ligel wan de bidin bipeyvînkirin. Firengan ev daxwaza radestbûnê nayîn bikirin. Di wê hingavê de Serdarê Remle Belyan bû, yê ku ew di šerê Hetîne de hatibû bidîlkirin û wî destûr ji Šehrîyar xwestibû, ku ew ji bona Qudsê biçe, da ku ew Mala xwe bide anîn û ew bêtir ji Ševekê li Qudsê de nemîne.Belam ev Serdarê bêrûmet bi servajî vê ve li Qudsê ma ew bi Serdarê Liberxwedanvanên bajêr ve bû. Hešt hezar Kes lê hatin bikomkirin. Gewreyê Kešên Qudsê Xiznên Kenîštan ji bona wî dane bivekirin, tanî ku ew ji bona liberxwedanê bide bixerckirin.

Šehriyar Selah El-Dîn ke wa zanî, ew bi Leškerekî ve ruwê xwe ber bi Qudsê ve date bivedan û ew di 15 Receba sala 583 k.- (20 Êlona sala 1187 z. de, Cuma) bi Qudsê ve hate bigihaštin û wî dorpêçanî lê date bigirtin. Li dawîya lêverandin û serencekî Pênc rojî de wî li layê Jorî de hêrîš bi bašî ve date bizanîn. Wî Wargehê cenga xwe ji bona wêde date bivegubihestin û wî Çiyayê Zeytunê ji xwe re bi sernavîna Orduwa xwe ve date bidanîn. Li wêderê de wî gerden li bajêr de date bitengkirin. Leškerê Musulmanan hêdî hêdî dihatin bipêšvekevtin û ew di ser Çala dora bajêr de hatin bitêperbûn û wan bedena bajêr jî dane bikonkirin. Ev rewša hanê bi hoyê bêhêvîbûna Liberxwedanvanên Firengan hate bikirin.Wan daxwaza ewletîyê û berdestbûnê dane bikirin. Li dawîya gift û goyeke dûr û dirêj de bi mercê ku Firengî di nava Çil Rojî de bi serbestî ji bajêr bêtin biderkevtin û her Peyak bi Deh dînaran , Jin bi Pênc dînaran û Mendal bi du dînaran xûkitîya rizgarkirina xwe divê bidin bidan. Ji destpêkirina roja îna 27 Receba sala 583 k.- (2 çirya pêšîn sala 1187 z. de, Cuma) xelkê dest bi derçûnê ji bajêr ve dane bidestpêkirin.

Bi vî rengî ve vekirina Qudsê hate bipîrozkirin, mîna ku Qazîyê Šam Muhyedîn li dawîya vegirtina Helebê dabû bitexmînkirin. Ev Pîrozîya hanê di Meha Recebê de hate bicîhatin.

Šehrîyar ev Qazîyê birêz ji bona Qudsê date bibangkirin, da ku ew di roja vekirina wê de têde Peyvdarîya Roja Înê bide xwendin[187]. Di wê roja Înê de Limêjvan weha zor bûn, ku Mizgefta Eqsa ew nedigirtin[188].

Ev Xûkitîya Šehrîyar Selah El-dîn bes û bi tenha ve li ser Leškerê Firengî û Hevalbendên wa de hatibû bidanîn. Fileyên xelkên bajarê Qudsê mîna hemû Filên din li bajarên din de li cîgehên xwe de man û ew mîna xelkên vebestîyên Xwedan Nivist dihatin bidîtin.

Šehrîyar li dawî derçuna Serdar û Leškerên firengî de ji bona nava Qudsê çû. Bîcgeh li vê jî de Šehrîyar heft hezar Perîšan û li ser Hêvyaî Birayê xwe Melek Adil De hezarên din jî wî ew ji dana xûktîyê dane birizgarkirin. Hêjî bi ser jî de wî rojek jî ji sibehê tanî êvarê de bi bê xûkîtî ji bona derçûna hejaran date bidanîn. Wî destûr ji bona Kešan û Karmendên Oldarîyê date bidan , ku ew tanî tuwanin, ligel xwe de ew šit mištan bidin bibirin.

---

[187](Wî di Roja Îna 4 Šubana sala 583 k.- 9 Çirya Pêšîn sala 1187 z. de Pevdarîya Roja Înê date Xwendin. Selah El-Dîn, r. 322, 323. Cuma).

[188]Dilovan Ibrahîm Efendî Heyderî dibêje, ku Qazî Muhyedîn ev Malika hanê bi destpêkrina Peyvdarîya Roja Îna vekirina Qudsê ve di Mizgefta Eqsa de dayite bidestpêkirin:

Supas ji bo Yezdan bi jêrkirina dewleta Xaçperestan ve
serfiraz, serbilind bû, Ola Musetefayê Ereb bi Kurd ve

(Weha Kurdan Qencîyên mezin her û her ji bona Zarokên Mustefayê Ereb dane bipêškeškirin. Divabû ku ev tev de li bal Ereb de cihê sipasê bihatana bidîtin û wan jî qencîyên Kurdan li wan de bidana bivegerandin.

Belam mexabin Dêya min di zarotîya me de her û her ji me re dida gotin, Ku Ereb bê nan û Xuwê ne û Nan û xuya wan her û her li ser kabogên wan de têtin bidîtin.

Sedam Kurê Husên di 15 Nisa sala 1987 de tanî Awgosta sala 1990 her her wî dixwest, ku ew Kurdan bi Bumbên Kimyayî û biyolocî ve ji ser Zemîna Kurdistanê bide biqirkirin, da ku ew Kurdistanê ji xwe re bide bierebkirin,

Di vî warî de ji xwe re li Nivîsta Ekremê Cemîl Paša de bi Zimanê Kurdî ve, Diroka Kurdistanê 372 Rûpel, (Bêrudê sala 1972 de), ji r. 122-164 de bidin bitemašekirin. Pir bi nerxî û ciwanî ve li ser belgeyên Mêjûyî de wî ev danava hanê dayite binivîsandin. ku wî têde tevaya poxtîya serdarîya Ereb di Kurdistanê de dayite tazîkirin û tevaya dirêjîya tarîya Bihušta Evsana Ereb di nava Kurdistana me de li ber çavan de dayite derxistin. Cuma).

Bi kurtî Gewrebûn, mehrebanî û dawerîya Šehrîyar di layandina Qudsê de ji sînor der bû, ku tevaya Nivîsvan û Mêjûvanên Filan pê hatin birûništin û bimukurhatin.. Wî zor rûmeta Hejaran û bi taybetî ve rûmeta Jinan didate bigirtin û wî zor yarmetîya wan dida bikirin. Wî zor bi rûmet ve Šehbanû Sîbîl li ser daxwaza wê de ji bona layê Qeralê Coyê Merê wê date binardin, yê ku ew li Nablisê de Radest bû.

Hin ji Afretan di gava derçuna xwe de bi bigihîština layê Šehrîyar ve wan hêvîya berdana Mêr, Bira û Bavên xwe ji Dîlbûnê jê dane bikirin. Šehrîyar zor bi van hêvîyên hanê ve hate bikêrkirin û biliberkevtin. Wî hêvîya wan date bicîhênanîn.

Ev reftara mirovanîya Šehrîyar derbarê Firengê Qudsê û Felestînê bi carekê ve servajî reftara wan beramberî bi Musulmanan ve bû. Bi rastî jî gava ku di sala 492 k.- 1099 z. de Godferi Qudus date bizeftkirin, wî pir rengên pîsîtîyê beramber bi Musulmanan date bikirin. Bi pêrûniština Mêjûvanên Filan ve nêzîka Heftê hezar Musulman dane bikuštin.

Šehrîyar Selah El-Dîn nêzkîa mehekê li Qudsa humanwer de ma. Wî îš karên wê date birêk û bipêkxistin. Mizgeftên wê wî dane binuhkirin û bivejandin. Dibustan têde wî dane biavakirin. Kêmanîyên wê wî datin bihilanîn. Di dawîya van de wî bi Leškerê xwe ve ruwê xwe ber bi Sur ve date bivedan. Keštîcengên Misrî jî bi fermana Šehrîyar ve ruwê xwe wan jî ji bona wê kelehê dane bivekirin.

Markîz Konard ji vê kêsê ji xwe re kar date biwergirtin. Wî ev keleha hanê zor pêk û xurtkir. Herçend jî di avê û bejayê de ew hate bitengavkirin, bê sûd bû. Bi xwe jî Zivistan jî bi ser ve hat. Li ser daxwaza Hinan de ji Serdarên Lešker ve dorpêçîn ji ser kelehê ve datin bihilanîn. Belam Šehrîyar ji vî karî zor pest bû. çunke, Serdarên Lešker giringbûna vê Dejê mîna Šehrîyar nedidan bihêjakirin. Tevlivêjî divabû bi her awayekî ve ew vê Deja hanê ji destên Firengan bidin bisitendin û Felestînê bi carekê ve ji wan bidin bipakkirin. Heyf ku bi dijî arezûyê Šhrîyar ve Serdarên Lešker li ser bivegerandinê de sorbûn.

Diyare, ku di vî alî de Sê šašbûn hatin bikirin.

1. Di hingava xwe de û di pêš vekirina Qudsê de divabû ev Deja hanê ji destên Firangan de bihata biderxistin.
2. Divabû Ku Šehrîyar Selah El-Dîn nedaba bihištin, ku ewên di šeran de dihatin bigirtin û ew ji dîlbûnê dihatin biberdan, yanjî ewên ku di bajarên zeftkirî de dihatin

bidercûn û ew tevde li Sur de dihatin bikomkirin û wan bergirtineke taze ji bona Musulmana didan bipêkanîn.

3. Divabû li dawîya vekirina Qudsê de Leşkerê Musulmanan bi ser vê Deja hanê ve bihata binardin û waz lê nedana bianîn û ew bi her rengekî ve divabû wan ew bidana bizeftkirin.

Bi kurtî vekirina Qudsê ji bal Musulmanan ve Eropayî hatin biçavsor û bixwîngermkirin. Keşên tundrê di nava Tudan de ji bona helsandina wan û dagirtina wan bi qîj û hewar dihatin bihilatin û bidahatin û kef bi ser devên wan de dihate bikevtin, ku ew xelkê ji bona şerê Musulmana bidin bilivandin. Pir pê neçû Hêzeke pir gewre hate bikomkirin. Li hemû layî de xelkê ruwê xwe ber bi Felestînê ve dane bivedan. Şahînşahê Elmanî, Padîşahê Ingilîzî Rişard, yê ku ew bi navê Rişardê Şêrdil[189] ve bi nav û bang bû, û hin ji Keye û Serokên Gubgubên tir Ji Xacperestan di nava wan de diha bidî[190].

Şehrîyar Selah El-Dîn di wê navê de Deja hunîn date bigir û wî dejên Kewkeb, Sefed û Kerk jî dane bidorpêçkirin. Ew di 6 Rebiê yekem de sala 584 k. de ji bona Şamê hate bivegerandin. Li wê de wî Leşkerekî zor helgirt û wî ruwê xwe ber Terablos û Entakaya date bivekirin. Li dawîya vegirtina Entertos wî Qeral Co date biberdan, bi mercekî ve ku

[189]"Richard Padîşahê Ingilîzî ji sala (1157 - 1199) hate bijîyandin. Ew ji sala 1189 de Padîşah bû. Ew di sala 1193/94 beşdarî Geştecengîya Xaçperestên sêyem bû". Insiklopêdîya Elmanîyî Biçûk, r. 839.
(Ev Pepûkê hanê bedbext bû. Ew li nik Şehrîyar Selah -El-Dîn de hate bidîlkirin. Piştî berdana wîna careke din ew li Elmanya de ji bal Heinrih -Hayinrişê- Çarem de hate biberdestkirin. Cuma).

[190](Ji xwe re di vî wari de li Nivîsta Elemani Weltgeschichte-mêjûwa Cîhanê-, Berlin 1963, B. 3 r. ji 374-387 de bidin bitemaşekirin. Deryê Duwanzdehî vê Nivîstokê di bin nav û nîşana: Pêlên Xaçperestan ji bona ser welatên Rojhilatî dorhêla Deryasî hatîye binivîsandin. Pir bi başi ve û givasti ve mero dikare ji xwe re liber şerên Xaçperestan û kêrên wan di Rojhilata Navîn de bête biliberkev. Cuma).

ew beramber bi wî ve nede bišerkirin, li Surî de nemîne û ew ji bona Ewropa bête çûyîn. Lêbelê ev Qeralê virker ji bona Sur çû. Belam Konard ew wernegirt. Li paš de ew ji bona Terablos çû û wî hinên ji Mayînên Xaçperestan dane bikomkirin û ew ligel leškerê Sur ji bona ser Eka çû.

Šehrîyar Selah El-Dîn di vê geštcengîya xwe de Merqeb, Cible, Laziqîyê, Sehyûn û hinên din ji bajar Dejên din jî dane bizeftkirin. Li paš de ew bi ser Helebê ve ew ji bona Šamê hate bivegerandin. Wî destûra sipahêyê xweyî gištî ji bona bînvedanê date bidan. Wî bi sipahê xweyî taybetî ve di zivistanê de ji bona Sefed û Kewkeb ruwê xwe date bivekirin. Wî ew dane bizeftkirin. Di wê navê jî de xebera girtina Kerk ji bal Melek Adil ve pê hate bigihaštin.

Šehrîyar ji bil Sur hemû Šar û Dejên Felestînê dane bigirtin. Belam manebûna Sur di nava destên Firengan de berbatîyeke zor gewre bû. Bi xwe jî halandina xwîngermbûn û sergermbûna Ewropa Geštcengiya Sêyemî Xaçperestan wirde wirde bi Sur ve dida bigihandin. Di encam de di bidestpêkirina sala 585 k. de rewš û zîneta Supahîyî Šehrîyar hate biveguhertin. Ew ji hêrîšê neçarî liberxwedanê bû.

Konardê Komandarê Sur Leškerekî zor bi hêz ve date pekanîn. Ev bizava hanê pêšekîya ferteneyeke mezin bû, ya ku wê ji bona Kišverên Musulmanan dida bikirin. Qeral Co bi dijî sozê xwe ve Leškerekî zor li Terablosê de date bikomkirin. Keštîyên Firengî jê re her û her xwarin û vexwarin, çek û teqemenî diatin anîn.

Šehrîyar Selah El-Dîn beramber bi van rewš û zînetên hanê ve xwe date bilikarxsitin û ew bi Leškerekî ve li Merc El-Îyun de çavdêrîya pêrgîbnûa Dujminên xwe dikir[191]. Li layekîtir jî de wî li Deja Šeqîf Ernon de dorpêçî date bikirin. Belam gava ku wî dît, ku Firengan gerden li Eka de dane bitengkirin, wî perçeyek ji Leškerê dora Šeqif bicî hišt û ew bi xwe ve ji bona Eka çû.

Dorpêçvanê Eka Qeral Co bû. Vê dorpêçana hanê Du salan date demandin. Hoyê dirêjbûna vê dorpêçanê bi bigihandina hewarekê li dû hewarekê de ji bona Firengan bû. Herwehajî Konard jî bešdarî vê dorpêçanê bû.

[191](Ew di 17 Rebiê yekem sala 585 k.- 5 Gulana sala 1190 z. de bi Merc Îyun ve hate bigihaštin. Selah El-Dîn, r. 344. Cuma).

Heger Šehrîyar Selah El-Dîn guhpêdaneke bi carekê ve ji bona dorpêaçna Eka bida bidan û li pêš zorbûna wan û hatina Konard de lêdaneke baš li wan de bida bidan, ne weha Dorpêçîyê dirêjî pê dida kišandin û nejî dilbijandina Firenagan ji bona Qudsê û Felestînê dihate bikirin.

Bi servajî vê jî Šehrîyar zor giringbûn bi Burca Šeqîf ve date bidan. Wî Qeral Co serbest hišt, ku ew roj bi roj ve hêza xwe bide bibêtirkirin.

Šehrîyar Selah El-Dîn bi Eka ve hate bigihaštin. Wî dît, ku Fireng ligel dorpêaça wê de xerikin. Li dawîya çend rojan de wî hêrîš ji bona ser Dorpêçvanan de date bidadan. Bi taybetî Mîr Teqi El-Dîn Omer Kurê Šahînšah Birazayê wî bi hêrîšeke šêrîtî ve layei Eka ji Dujmin date biçolkirin û wî rê ji bona bajêr date bivekirin, da ku jê re hewar û yarmetî bêtin binardin.

Sitanlî Dibêje, ku Šehrîyar bi xwe ve di pašnîvroja 2 Šubana sala 585 k. de ji bona nava Eka hate bikevtin. Wî Mîr husam El-Dîn Semîn bi Serdarê Burca wê ve date bidanîn. Gava tarîya ševê konê xwe date bivedan, Leškerê Musulmanan cardî ji bona Ordugeha xwe zîvirandin. Di vê kêsê de Firengan xwe zor dane bixurtkirin û wan ew rêya, ku Orduwê Musulmanan bi roj ve hatibûn têperandin, dane biberbestkirin. Bi vî corî ve rencê Šehrîyar bi valayî ve hate biçûyîn.

Mêrxasî bi Dujmin ve hate bikevtin, ku wî di Pêncê Remezana sala 585 k. de bicgeh li Dorpêçana Burcê de hêrîšeke gištiyî xurt ji bona ser leškerê Musulmanan date bidadan. Wî ew jiberhevdû dane bixistin û wî ew dane bibelawelakirin û wî ew ji dorhêla Eka dane bidûrkirin. Di vê navê de Leškerê Musulmana zor bela wela bûn. Bešek jê beramber bi Mîrê Entakya Boemend ve hatibû birawestandin, Bešekî tir bajarê Šamê beramber bi Terablos ve dida biparastin û Bešekî tirjî Beramber bi Xaçperestan ve Dumyat û Iskenderiye didan biparastin.

Li layekî de vê nîvšikenandinê û li layekî tir de bi ser ve hatina zivistanê û Remezanê û sorbûn û daxwaza Serdarên Lešker ji bona šernekirinê[192] û bivegerandinê Šehrîyar Selah El-Dîn neçar bû, ku ew xwe

[192]Kamwerbûn û biserkevtin di dawî de li layê Šehriyar Selah El-Dîn bû; jiber di vî šerî de nêzîka Deh hezar Serbaz û Efser ji Firengan hatin bikuštin. Mêjûwa Musulmantîyê, r. 381.

ber bi paš ve tanî Xerube bide vekišandin û ew Eka ber bi fermana Xwedê ve bide bisipartin.

Šehriyar Selah El-Dîn li mêranî û jêhatbûna Firengan de û sistî û xwe vegirtina ji šer ji bal Musulmana ve zor pest û cergkiziri bû. Wî hest bi pêšbîniya malwêranîya hatî ve date bikirin. Wî kaxez ji bona hemû layekî ve datin binivîsandin û wî daxwaza komekê date bikirin. Wî tevaya Zivistanê bi bê livandin ve li Xerube de date birabuhurandin. Ew ji wê nexwešiya xwe, ya ku ew tûšî wê bibû, wirde wirde jê hate çakbûn. Lešker jî le hatibûn bikomkirin. Li dawî de ew helsa û wî di 17 Rebiê yekem de sala 586 k. de ruwê xwe ber bi Eka ve date bivedan[193]. Tanî wê demê Dujmin kar û barên dorpêçkirinê dabûn bipayînkirin u wan rê liberxwedanvanan dabûn bitengkirin. Li dawîya vê heft rojan de Šehrîyar bi Eka ve hate bigihaštin.

Di navê de Keštîyên cengîyî Misrê ber bi Eka ve hatin û wan Keštiyên cengîyê Firengî datin bisikenandin û ew ji bona Benderê Burcê hatin biderbasbûb. wan pêwistîyên Liberxwedanvanan dane bipirkirin

Di vê gavê jî de xebera ketina Šahînšahê Elemanî Friedrich Barbarossa-Firidriš Barbarosa ji nava Xaçperestan û bi birêkkevtina wîna ji bona Felestînê bi Šehrîyar Selah El-dîn ve hate bigihaštin. Šehrîyar Seleha El-Dîn beramber bi šepolên Xaçperestan ve dawxwaza yarmetîyê ji Serdar Girgirên Musulmanan date bikirin. Wî ji bona yarmetiyê Encumenek ji bona Šehrîyarê Merakiš Yaqub El-Mensur jî date binardin. Mexabin, li hîç layekî de guh bi peyvên Šehrîyar nehatin bidan û Kesekî jî yarmetî ji bona wî neda binardin. Weha bi vî rengî ve Qehremanê gewreyê Musulmanan beramber bi Xaçperestan ve bi tenha xwe ma. Jê re bes û bi tenha ve yarmetîya Xwedê ma.

Šahînšahê Elemanî di 11 Hizêrana sala 1190 z.- 586 k. de di derbasbuna Çemekî de hate xenikandin[194]. Li dawîya vêna de Bešekî ji Orduwa Elemanî ji bona welatê xwe hate bivegerandin û Besê din di bin

[193](Di 18 Rebiê sala 586 k.- 25 Nisana sala 1190 z. de dest bi livandina xwe ve date bikirin. Kanîya pêšin, r. 361. Cuma).

[194]Ev çemê hanê Çemê Cihan bû. yê ku ew di nava Kilikya de tête derbaskin. Ew di Nivistên Ciyografîyî kevnî Musulmanan de bi navê Çemê Mesîse dihate bibinackirin. (M. E.).
(Bi latinî ew bi navê Çynidos-Sindos ve tête binavkirin. Selah El-Dîn. r. 365. Cuma).

Rêberîya Kurê wî Dog Doswabyada de di rêya Entakya ve ruwê xwe ber bi Felestînê ve date bivekirin.

Bešekî ji Orduwa Xaçperestan ji bona dorpêçanê xerîk bû û bešên din jî ji bona šerê Šehrîyar hatibû bitirxankirin. Vî bešê duwem di 20 cemada duwem de sala 586 k.- 25 tîrmeha sala 1190 z. de bi ser leškerê Šhrîyar ve date bihêrîškirin[195]. Di pêsî de wan Bešek ji Leškerê Musulmanan pîs dane bišikenandin û ew hatin bibelavkirin. Hinekan ji wan tanî Teberîya û Šamê jî xwe nedan bigirtin. Leškerê Firengî tanî Ordugahên Musulmana hatin bipêšvekevtin. Li paš de Hêzên Musulmanên mayî bi ser Firengan ve date bidadan û wan ew zor xerab dane bišikenandin û qada cengê bi termên wan ve dane bitijekirin[196]. Xaçperest bi carekê ve hatin bišikenandin.

Li layekî tirjî de Liberxwedanvanên keleha Eka bi hin destikên sade ve Burcên Dorpêçvanan ligel šervanên têde dane bisûtandin.

[195](Di Wergerandina Erebî de 26 Tîrmeha sala 1190 z. de hatîye binivîsandin. Di koka xweyî Kurdî de 25 Tîrmeha sala 1190 z. de hatîye tomarkirin. Herwehajî di Nivîsta Selah El-Dîn jî de Rûpelê 366 de roja 25 Tîrmehê hatîye binivîsandin. Rastîya wê jî 25 Tîrmehê ye. Cuma).

[196](Di vî šerî de vedibêjin, ku hemû hêza Firengî hate bikuštin, ku ew bi bêtir ji duwanzdeh hezar Kes ve dihate bitexmînkirin. Kanîya Pêšîn, r. 366. Cuma).

## 11. Miziša Šehrîyar Ligel Leškerê Ingilîzî de

Di 22 Cemada Dawî de sala 586 k. de Leškerekî gewre ji Xaçperestan di bin Rêberîya Kont Hinri Birayê Xweha Padšahê Ingilîz de bi dergehê Eka ve hate bigihaštin[197]. Wî di dora wê de Ordugehê xwe date bisazkirin û wî xwe ji bona hêrîšê date bilikarxsitin. Gava ku Šehrîyar ev xebera hanê date bibihîstin, wî cîgehê xwe ji bona šer yarîder nedît. Ew ji bona Xerube hate bivegerandin. Bi vî rengê dûrkevtina Šehrîyar ve sorbûn û xurtkirina Firengan ji bona dorpêcanê hatin bibêtirkirin. Ser li nû ve wan zor û tengavî li Dorpêçvanan de datin bikirin. Belam Parêzvanê kelehê Mîr Husam El-Dîn ji alîyekî de û Parêzvanê Senger û Teqemenîyan Beha El-Dîn Qere Qoš ji alîyekîtir de bi mêrxasî û gernasîyeke pir merdane beramber bi hêrîšên Firengan ve hatin birawestandin. Mêjûvan Mîšo zor pesin û šabašiya jêhatîbûn û tebûtbûna van herdu Rêberan dide bikirin. Zor caran wan Burca Çepî Dujminanan datin bisûtandin, ya ku wê agirên xwe ji bona ser kelehê û Burcên wê didan bipešiqandin. Gelek carî jî ew ji kelehê dihatin biderkevtin û wan dujmin neçardikirin, ku ew cîgehên xwe bidin biveguhertin û ber bi paš ve bêtin bivekišandin.

Kont Hinri beramber bi van liberxwedanên merdane ve bê hêvî û pest bû. Wî hemû hêz û hinera xwe bi ser dorpêçan û bitengavkirina kelehê ve date bigivaštin. Di vê navê de xwardemenî û teqemenî li herdû layan de hatin bikêmbûn. Belam Šehrîyar ji Bêrudê çendî pêwist ji xwarin û Teqemenîyê ji bona Eka date binardin û wî ew bi Liberxwedanvanan ve date bigihandin.

Gava ku Xaçperestan zanîn, ku Dorpêçana bejayî ewende kêrê li ser Liberxwedanvan nade bikirin, wan hewara xwe ji bona Papa datin binardin. Ser li nû de ragiyandinê li seranserî ewropa date bidestpêkirin û hêzeke zorî Xaçperestan di rêya deryê re bi ber devê Eka ve hate bigihaštin.

hêza Hanri rewša Cengê ji bona Xaçperestan bi bašî ve datin bidîtin. Wan hêrîša xwe ji bona ser leškerên Musulmanan birin. Lihev

[197](Di 23 Cemada Dawî de sala 586 k.- 28 tîrmeha sala 1190 Hinri bi hewara Xaçperestan ve li Eka de hate bigihaštin. Selah El-Dîn, r. 367. Cuma),

hate birasthatin, ku Šehriyar Selah El-Dîn nesax bû û ew li jêr çadira xwe de tik daništibû û wî ji xwe re seyrî qada cengê dida bikirin. Šereke dirêjî kišand. Belam di encam de Firenagan ziyanên zor datin bixwarin û ew bi pešokî ve ji bona cîgehên xwe hatin bivekišandin.

Danerê Musewer El-Islam Mîrza Mîr Elî dibêje, heger Šehrîyar bi xwe ve serpereštîya vî šerê hanê bida bikirin, dê wî rast û durst kamwerîyeke gewre bi destên xwe ve bida bixistin.

Di vê navê de bi hoyê fertena Derya ve Keštîcengîyên Firengan ji Eka hatibûn bidurkevtin. Leškerê Musulmana ji vê Kamwerîya hanê ji xwe re sûdmendî datin biwergirtin û wan Liberxwedanvanên Eka dane biveguhertin. Dijî arezuyî Šehrîyar wan Leškerekî kêmtir têde dane bidanîn. Li layekîtir jî wan Çek û Teqemenîyeke baš bi wan ve nedan. Wan Mîr Seyf El-Dîn Elî El-Meštub bi Komandarê ser Eka ve datin bidanîn.

Hin ji Mêjûvanan dibêjin, ku hoyê lidestçûna Eka di kêmbûna Liberxwedanvanan de, di šerkirina bêdilî de û di hatina yarmetî û hewareke gewre de ji bona Xaçperestan tête bidîtin.

Qeralê Firensî Filip Ogost di duwazdeh rebiê yekem sala 587 k. de bi leškerekî zor ve bi ber dergehê Eka ve hate gihaštin[198] û ew ligel Xaçperestan de yekdigîr bûn.

Vê hêza taze jimareke pir gewre bi ser hêzên Xaçperestan ve date bixistin. Šehriyar li ser vê de ji Serdarên Musulmanên pêve girêdayî daxwaza komekê date bikirin.

Zor pê neçû, Qeralê Ingilizî Rišarde Dilšêr jî ji bona Eka hate bigihaštin[199], yê ku ew bi azayya xwe ve li Ewropa de bi nav û bang bû[200].

---

[198](Li gora Nivîsta Selah El-Dîn, r. 380 de Qeralê Firensî Filip Ogust di 23 Rebiê yekem sala 587 k.- 20 Nisana sala 1191 z. de bi ber devê Eka ve hate bigihaštin. Cuma.).

[199](Ew di 11 cemada yekem sala 587 k.- 8 axlêva sala 1191 bi Bîst û Pênç Keštîyên Cengînî ve bi Eka ve hate bigihaštin. Selah El-Dîn, r. 380. Coma).

[200]gava Qeralê Ingilîzî û Firensî bi Eka ve hatin bigihaštin, ew tûši nexwešîyê bûn. Šehrîyar ku ev bihîst, wî ji bona van herdu Dujminên xwe ji Çiyayê Lubnanê Berf û Mêwên taze dane binirêkirin. Musewerê Mêjûwa Îslame.

Dorpêçana Eka ji alîyê bejatîyê û avê de bi tundî ve hate bidirêjkirin. Liberxwedanvanan bi rastî jî bi pelevanî ve dane biliberxwedan. Šehrîyar Selah El-Dîn hišta jê re yarmetî nehatibûn û hêza wî jî ji bona hêrîšê ne amadebû. Zor pê neçû, ku Liberxwedanvan tûšî birçîbûn û mirina reš bûn. Li jêr van derdan de ew zor bêhêz hatin bikevtin. Bi fermana Šehrîyar ve Gemîyek ji Bêrudê pir li xwarin, vexwarin û teqemenî de ji bona Eka hate birêkirin. Belam ew di rê de tûšî hêrîša Qeralê Ingilîzî bû. Komadarê Gemîyê bi neçarî ew date binikonkirin, da ku ew bi destên Dujmin ve neyête bikevtin. Ev bi xwe ve ji bona Liberxwedanvanên Eka lêdaneke xurt bû. Xaçperestan ji alîyê rešayê û avê de bi xurtî ve rê li kelehê ve dane bitengkirin. Liberxwedanvan li layekî de beramber bi tengavî û bumbebarandinên Dujmin bûn û li layekîtir jî ew beramber bi birçîbûn û pir rengên nexwešîyê bûn. Karina liberxwedana wan bi carekê ve hate sikenandin. keleha Eka Du salan bi mêrxasî û qehremanî ve beramber bi šepol û lafawên Xaçperestên Firengan ve hate bitudkirin û wê xwe date biragirtin. Belam êtir havil têde nema bû. Wê daxwaza yarmetîyê ji Šehrîyar date bikirin, belam çunke, hêza Leškerê Musulmanan ewende nemabû, ku ew yarmetîya wan bidin bikirin.

Komnadarê kelehê Mîr Seyv El-Dîn Elî Meštub beramber bi vê zînetê ve ew ji bona layê Qeralê Firensî ji bons gift û gokirinê çû û wî pê got: "Gava em ji we re bajêr bidin biberdestkirin, bi mercekî ve divê hûn wê reftarê ligel me de bidin bikirin, ya ku me ligel xelkê we de date bikirin, gava wan jî bajar ji me re datin biberdestkirin". Filip Ogust beramber bi vê daxwaza maqulî hanê ve got: "Ez hîç razî nabim, ku ji xelkê Eka û Liberxwedanvanên wê Yek Mirov bête bisaxhištin". Li ser vê bersiva hanê de Mîr Seyf El-Dîn ji bona eka hate bivegerandin.

Eka demeke tir jî xwe date biragirtin, belam birçîbûn û nexwešîyê bêhn lê nedan bivedan. Di encamê dawî de bi mercê parastina canê Musulmanan ve ew di 17 receba sala 587 k.- 12 tîrmeha sala 1191 z. de hate biberdestkirin[201]. Li gora mercnameya berdestbnûnê de divabû ku 1600 dîlên Xaçperestên li nik Musulmaman de bêtin biberdan û dused hezar dînar ji boma Gewreyên Xaçperestan bêtin bidan.

[201](Li gora Nivîsta Selah El-Dîn, r. 380, 384 de ku Eka di 7 cemada Dawî sala 587 k.- 12 temuza sala 1191 z. de hatiye berdestkirin. Cuma).

Belam Xaçperest bi serkevtinê ve mest û sergerm bûn. Wan guh bi merc û sozan ve pê nedan û wan kuštineke gištîyî zor li Eka de dane bikirin. Qeralê Ingilîzî Mayînên liberxwevedanan li dora bajêr de di 23 Receb de dane bikomkirin wî ew hemû dane bikuštin. Bi vî rengî ve liberxwedana Eka bi hoyê linavçûna Šêst hezar Musulman ve bû.

Li pêš girtina Eka de di navbera Serokên Xaçperestan de gelacîyê, berberîyê û duberyê datin bidestpêkirin. Di navbera Qeralê Firensî û Ingilîzî de hate lehevketin. Di navbera Qeral Co û Markîz Konard de li ser dilbijandina Taca Textê Felestînê de hate têkçûn. Qeral Filip hevalbendîtiya Konard dida bikirin. Qeral Rišard jî hevalbendîtî û pišta Co dida bigirtin. Qeralê Firensî li ser hin reftarên rûšikenadinên Qeral Rišard de tûre bû û wî di 7 Receba sala 587 k. de Felestîn bîcîhišt û ruwê xwe ber bi Ewropa ve date bivedan. Konard di bin re ligel Šehrîyar de dida û distend û ew ligel wî de xerîkî lihevhatinê bû.

Bi kurtî ve ev berberî û duberîya hanê di navbera Serokên Xaçperestan de zorwerî û tundbûna Firengan datin bisistkirin û ew bi kelkê Musulmana ve hatin. Qeralê Ingilîzî li paš nêzîka bînvedana mehekê li Eka de ruwê xwe ber bi Yafa ve date bivedan. Di rê de ew her û her li jêr hêrîšên Lêškerê Musulaman de bû. Bi wî ve pir ziyan hatin bikevtin. Qeral Rišard Yafa date bisengînkirin û wî hin keleh û burcên din jî di deštê de dane bidurustkirin. Belam Leškerê Musulmana kêš pê nedidan û wan her û her bi hêrîš û šerên xwe ve ew bitengavdikirin. Carekê ewende nema bû, ku ew Rišard radest bikin. Bi kurtî ve Qerale Ingilîzî li paš têgihaština xwe de ku sorbûn û xwe ragirtina Šehriyar û hunera wîyî cengînîyê ligel hîç Dujminekî din de pîvandin nayête bikirin û beramber bi vî Dujminê gewre ve šerkirin bê havîl tête bidîtin. Çi ev bawerîya hanê û çi jî mêldarîya vegrandina wîna ji bona Ingilistanê ew bi ser daxwaza lihevhatinê ve hate bikišandin.

Šehrîyar Selah El-Din, yê ku ew bi sincîyên pir bilind ve û bi mêrxasîya xwe ve pir bi nav û bang bû û her wehajî ew zor bi ziyanên gewreyî Leškerê Musulmanan ve hatibû bikêrkirin, lihevhatin bi bašî ve date bidîtin. Jibervêjî wî dan û bisitendin ligel Rišard ji bona Birayê xwe Melek Adil date bisipartin. Melek Adil û Rišard hevdû bidîtin û Hemferî Dotorn di nava wan de wergerandin dida bikirin. Jiber ku Mercên Qeralê Ingilîzî ji bona lihevhatinê yarîker nebûn, Gift û gokirinê û hat û çûyinê ser nedan bigirtin. Tevlivêjî de li ser daxwaza Ašîtîyê de ji bal Marki Dofurwa de Qeralê Ingilîzî dîsan jî daxwaza Ašîtîyê date bikirin. Di

encamê gift û goyînê de Melek Adil û Qeralê Iingilîzî Richard -Rišard li ser van mercên jêrîn de lihevhatin:

1. Ku Qeralê Ingilîzî Xweha xwe ji bona Melek Adil bi Jinitî ve bide bidan û ew tevaya Mulkên xweyî bi destkevtî ve di qeraxa derya de bi rengê xelata jinanînê ve ji bona Melek Adil bide bihištin.
2. Divê Šehrîyar Selah El-Dîn welatên Firengîyên girtî û vekerî ji bona Melek Adil bide bihištin û bajêrê Qudsê di navbera Musulmanan u Filan de bi Bajerekî hevpar ve bête bidanîn û ew di bin Serpereštîya Xweha Melekê Ingilîzî û Pîreka Melek Adil de bête bixistin.

Šehrîya Selah El-Dîn bi bê dilê xwe ve ev mercên hane dane biwergirtin. Belam Keše bi vê Jinanînê ve nehatin birûništin û wan hereše ji bona ser Qeral û Xweha wî datin biavêtin, ku ew ji Filetîyê hatine biderkevtin. Jibervêjî ev lihevhatina hanê nehate biserkevtin.

Bi tenha qazanc ji vê gift û goyê, hatin û çûyînê ve eve bû, Ku Šehrîyar Selah El-Dîn ji vê kêsê ji xwe re sûd date biwergirtin û wî keleha Esqelan di 29 Šubata sala 587 k. de date wêrankirin. Hoyê wêrankirina vê kelehê jî ev bû, ku Serleškerên Musulmanan nedixwestin, ku ew mîna Eka li ber wê de bidana bidan yanjî ku ew careke din bi destên Firengan ve bête bikevtin. Di dawîya vêna jî de Šewhrîyar fermana wêrankirina Remle jî date bidan. Ew bi xwe Leškerê xwe ve ji bona ser Eyin El-Netrun çû. wî di wan navan de cîgehek nehišt, ku Xaçperest jê bikaribin jê sûdmendîy ji xwe re bidin biwergirtin. Gava zivistan hat, Šehrîyar ji bona Qudsa human çû. Wî destûra Šervanên xwe ji bona malên wan date bidan û wî Hêzek kêm li dewir û berên xwe de date bihištin. Di rêya vê hêza xwe de wî sengerên Qudsê didan bixurtkirin û li layekîtir jî de wî çavdêrî li ser livandin û tevgerên Dujmin de dabû bidanîn.

Rîšard di pêšîya Zil-Huce sala 587 k. de di nava çilê Zivistanê de ruwê xwe ber bi Remle ve date bivedan û wî bi ezyeteke zor ve ev Bajarokê hanê date bigirtin û li paš de ew tanî Beyt Nobe jî hate bihatin. Belam wî xwe ranegirt û ew hate bivegerandin. Wî hinek Xaçperest ji bona talanîya wan Hêlan de date bihištin. Ew ji bona Yafa û Eka çûn. Weha bi vî rengî ve hêza Rîšard kêm bû. Wî xwest Esqelan bide biavakirin û wê ji bona xwe bi Sernavîna bingehê tevgerên xweyî cenginî

ve bide bikirin. Belam berberîya di navbera Xaçperestan de, duberîya Konard ligel Rîšard de û hatina nûçeyên nexweš ji Ingilistanê de Rîšard bêhêvî kirin. Dîsan wî daxwaza lihevhatinê date bikirin.

Di dema buharê de hin serhildan li welatên Cezîrê de hatin birûdan. Šehrîyar Selah El-Dîn neçar bû, ku ew hin ji leškerê xwe ji bona nava Cezîrê bide binardin. Rîšard xwest, ku ew ji vê zînetê ji xwe re kar bide biwergirtin û ew ji bona ser Šehrîyar bide bidadan. Bi vê remanê ve wî Lešker bi ser hev ve date bikomkirin. Wî di Nîvê Cemada yekem de sala 588 k. de tanî Husun El-Dawrun çû.

Li dawîya wêrankirinê û kuštarekî zor ji Musulmanên wan navan de Rîšard ji tirsa bišikandin û negirtina Qudsê xwest, ku ew bête bivegerandin. Belam Xaçperestan bi gotinên wî nekirin. Ew neçar bû, ku ew tanî Beyt Nobe bête çûyîn. Beramber bi vê tevgera Xaçperestan ve Šehrîyar Selah El-Dîn xwe ji bona liberxwedanê û liberwestandinê dabû bilikarxsitin. Wî her kanî avanîyek li ser rêya dujmin de dabû biwêrankirin. Di encam de vê zîneta hanê Šerleškerên Xaçperestan date bibêzarkirin û wan di civîneke cengê de biryara xwe datin bidan, ku ew waz li Qudsê de bidin bianîn û ew ji bona ser Misrê biçin.

Qeral ji bona Eka hate bivegerandin û ser li nû de kaxezek ji bona Šehrîyar date binivîsandin û wî têde daxwaza lihevhatinê date bikirin. Di nava wan de gift û goyê ji bona lihevhatinê date bidestpêkirin. Di encamê dawî de di Bîst û duwemê Šibana sala 588 k.- duwemê Dêsembera sala 1192 z. de bi mercê mana Yafa jî di destên Xaçperestan de lihevhatin hate bigirêdan.

Evaya encambûna geštcengiya Sêyemî Xaçperestan bû. Ev çend ded hezar Canbêzar û Cengawerên lafawên xwîngermên Ewropî, yên ku wan ruwên xwe ber bi Qudsa human ve dabûn bivedan, pênc salan beramberî bi pêgîrî, gernasî û qehremanîya Šehrîyar ve di šer û ceng de bûn. Mûyekî wan bi serpereštiya bašî Šehrîyar ve binedan bikêrkirin. Di dawî de Du Bajarokên kenarê Derya bi destên wan ve hatin bikevtin. Piranîya Leškerên wan linavçûn û Bešekî kêm jî jê derbas bû û ew ji bona welatê xwe çû.

Debera em ji bona kara Šehrîyar ji van šer û cengan bêtin bivegerandin. Nivîsvanê Jîna Selah El-Dînê Eyubî dibêje: "Šerên Felestinê ji bidestpêkirina šerê gewreyî Hetîne hatîye bidestpêkirin. Di berî wê gavê de bihustek ji xakê Felestînê di destên Musulmana de nedihate bidîtin. Belam li dawîya lihevhatina Remele de di 22 Šubana sala 588 k. de hemû Felestîn ji bil perçeyekî biçûk ve ji Sur tanî Eka tevde

bi Mulkê Šehrîyar ve bibû. Fireng ji hemû Kêšveran hatibûn biderkirin. Beyt El-Muqedes- Mala Xwedêyî human hatibû bivegerandin. Šan û rûmeta Musulmantîyê ser li nû ve de hatibû biberz û bibalakirin".

Qehremanê Kurd û Musulmantiyê li dawîya lihevhatinê de ji bona Qudsê çû. Wî kar û barên serpereštîya hundur dane birêkûpêkxistin. Wî têde hin Nivistokxane û Xestexane dane bidurustkirin. Li paš de wî xwest, ku ew ji bona Mala Xwedê biçe. Belam Serlešker û Pîremerdên Musulmanan ji tirsa bêbextiya Firengan lê di rê de wan jê datin bihêvîkirin, ku ew neçe. Di dawî de li ser sorbûna daxwaza wan de jê wî waz li vê remana human de date anîn. Li paš navekê de ew ligel hêzeke xweyî taybetîyî biçûk ji bona welatê ser kenar çû. Wî li keleh û Bircên wê de datin bilênerîn û venerandin. Wî ji bona xwešbûna jîna Tudeyên wê karên pêwist dane bikirin. Li paš de bi ser Nablos, Bîsan û Kewkeb ve ji bona Berudê çû. Li wêderê de wî ligel Mîrê Entakya de bidîtinek kir. Li dawî de di 26 Šewala sala 588 k. de ji bona bajarê Šamê çû[202].

[202](Ew di 26. Šewalê - 4 çirya pašîn de sala 1192 z. de bi Šamê ve hate bigihaštin. Selah El-Dîn, r. 423. Cuma).

## 12. Mirina Šehrîyar Selah El-Dîn

Šehrîyar Selah El-Dîn li Šamê de ji bona rêkxistina îš û karên welêt û dabeškirina qencîyê bi ser Parsekan, Perîšan û Sêwîyan ve û ji bona binardina Šervanan ji bona cihên wan xerîk bû. Hemû rojekê jî çend Demik jî wî bi rav û nêçîrê ve didan birabuhurandin.
Di roja 14 Sefer de sala 589 k. de ji bona pêrgîbûna pêšwazîya Hecacan derçû[203]. Ev pêšwazîya hanê pir bi qerebalix bû. Van temašeyên rewanîyên xweš u bilind ji vegera Rêwîyên Mala Xwedê zor kêr têde dane bikirin. Ew li neçûna xwe de ji bona Mala Xwedê pir li xwe de tûre bû û wî dest bi girî ve date bikirin. Her di wê ševê jî de lerzê ew date bigirtin. Roj bi roj ve nexwešîya wî lê hate girantirbûn. Di dawî de di roja Çaršema 27 Sefera sala 589 k.- 4 Avdara sala 1193 z. de wî fermana Xwedê date bicîanîn. Temenê wî 57 Sal bû. xelk hemû ji bona wî giryan. Roja mirina wî Kes ji Mala xwe ji bona derve neçû. Bazar û Dukan ne bûn. Rêgeh û kolan vala man. Termê human bê xeml û dengîn hate bihêzarkirin û bivešartin.

Li dawîya Sê salan de Melek Efdelîyê Kurê wî li nêzîka Mizgefta Emewî de Mala Peyakî Qenc date bikirin û wî mayînên lašê wîyî perest di roja Ašura de bi rûmet û hêjabûneke mezin û giran ve date biveguhestin û ser li nû ve ew careke din hate bivešartin. Melek Efdel Sê roj Šîn ji bona wî date bidanîn.

Di roja duwemî mirina wî de Tude kombûn û dengê girî û šîna wan bi Asman ve dihate bigihaštin. Zû ev šîn, šûn û girî hate hilanîn. Bes û bi tenha ve Xwešxwevan Imadê Isfehanî bi xwešxwewaneke dirêj ve Šûn û šîna wî date bigirtin.

Dr. Ehmed El-Beylî dibêje: "Šehrîyar mird û bi mirina wî re Netewê Musulman Padšahekî zor bi hêz û hiner ve li kîs de çû, yê ku wî ew ji layekî weha rizgar kir, ku ewende nema bû, ku ew tûšî nemanê biba. Šehrîyar Selah El-Dîn mird û Dujminên wî jî pê hatin birûništin, ku ew Mamostakî gewre û Karkerekî gewre bû, ku wan jê hînbûnên Azayê û Šehsuwarîyê datin bigirtin. Ew nimûneya merdîtîyê, nîmûna Sincîya bilind û Serçavê dilovanîyê u dilnerbûnê bû".

[203](Di 15 Sefera sala 589 k.- 20 rešmeha sala 1193 z. de ew ji bona pêšewazîya Rêwîyên Mala Xwedê hate biderkevtin. Serçavîya Pêšîn. r. 432. Cuma).

Di dema jîna wî de Deh Kurê wî û Heft Keçên wî hebûn, mîna ku ev di Nivîsta El-Fetih El-Qesî fi El-Fetih El-Qudis de hatîya binivîsandin.

## 13. Nîšanên wiyî bilind, Sincî û Perwerdebûna wîyî baš

Em di kurtîya mêjûwa vî Qehremanê Musulmantîyê de baš hatin bitêgihištin. Ji wê roja ku ew bi Wezîrê Xelîfe Adid tanî roja mirina xwe ve bê ka wî çend gorî û çend kar û barên mezin ji bona Cîhana Rojhilat dane bipêškeškirin. Bê ka wî çend kamwerîyên Musulman bi ser Firengan ve datin bikirin. Bê ka çawan wî dikarîbû Du welatên mîna Surî û Misirê bi cudabûnên Rêçolî ve û dilbijandin û berberîyên Kesitîyê ve zor ji hevdû cuda li jêr serdarîya xwe de bide bixistin. Bê ka çawan wî ji Kurdistanê tanî Tunis, Yemen û Eden zor Miletên cuda cuda li jêr desthilatîya xwe de bide bikomkirin û ew Biratîyê di nava wan de bide bicîanîn.

Em dibînin, ku di nava wan Miletan de Kes nebû, ku ji dil Šehrîyar xweš nebû û ew ji fermana wî nedihate biderkevtin. Di dema tengavîyê de Tude can û malên ji bona wîna didan gorîkin. Ev hemû jî nîšana evîn û rûmeta gištî ji bona wî bû. Wan ew xweš dixwest; jiber ku ew ji bona wan Alîkar û Pištvan bû. Ew Ji bona Dujminan Leheng û Qehreman bû. Ji bona rewana xwe û malê dunyayê wî nedaye bikarkirin. Hemû kar û xebata wî ji bona berjewendîya Musulmantîyê bû.

Šehrîyar Selah El-Dîn bi tenha bes bi hišê xwe ve nedida biîškirin. Her û her wî ji reman û bawerîya Gewremendan û Hišmendan šudmendî dida bigirtin. Ev rewša hanê jî li gora yasayê Ola Musulmantîyê û Rewešta Pêxember bû. Hîç wî hej ji zordarîyê û zordestîyê nedida bikirin. Zor caran li ser reman û biryarên Encumena Šêwirdaran wî dev ji bîr û bawerîya xwe dida biberdan, mîna ku me li beramberî Sur û Eka de date bidîtin.

Li rakišandina dilan de bi ser xwe ve ew zor šareza bû. Hemû Kesekî ew xweš dixwest; jibervêjî mirina wî bi hoyê šîn, šûn û girî ve ji bona hemû Xizim, Serdar, Bestvan û Jêrdestvanên wî bû. Hemû Kesekî Šehrîyar bi xwe bi Bavekî dilsoz û dilovanan ve, bi Padšahekî Dadwer ve, bi Serdarekî tund û sert ve ji Dujminan, bi Pištvanekî rast ve, bi Sitemkar ve ji bona Dujminan, bi Penayê Peyayê Çak ve, bi Hêrîšvanekî xurt ve, bi Karkerekî Ol û Yekkirina Musulmantîyê ve dida bidanîn. Ji bona karkirinê ji bona Musulmantîyê nenexwešîyê, nemal û Mendalan jî dikarîbûn rê liber bidin bigirtin.

Gava ku wî Kurê xwe Melek Zahir bi karmend kir, wî ev amojgarîya başî hanê pê date bigihaştin:" Ez te bi bisertewandî ji bona Xwedê amojgarî dikim; jiber ev bingehê hemû başîyekê ye. Ewê ku Xwedê bi te pê dide bifermankirin, ez jî bi te pê didim bifermankirin, çunke, ew bi hoyê rizgarkirina te ve têtê bidîtin. Xwe ji xwînrêtîne bide biparastin; çunke, xwînrijandin nikare Dilê Tude bide biragirtin. Divê tu li rewş û zîneta jiyana xelkê de bide bitemaşekirin û biguhpêdan; çunke, tu li ser wan de dilsozê min û dilsozê Xwedê ye. Divê tu Dilê Serdar û Karmendên bingehên Serdarîyê bide biragirtin; çunke, kamwerîyên min bi saya reftara pak ve ligel wan de têtin bidîtin. Çavreşîyê bi Kesekî ve nede biavêtin, çunke, ku mirin bêhnê bi Kesekî ve nade bidan. Di reftara xwe de ligel Tude de zor wir be; çunke, heger ku ew li te dilxweš nebin, Xwedê li te nayete bexšandin. Ewê di navbera te û Xwedê de ye, ew li te bi tobekirinê ve têtê bilêbuhurandin, çunke, ew gewreye û lê buhure".

Šehrîyar Selah El-Dîn beramber bi xwebestvanên xwe ve hîç nemeznayî û nejî Šehrîyarî daxwaz bû. Hemû Kes bi bê dujwarî dituwanî ji bona layê wî bête çûyîn. Ne Dervan û nejî Wezper dikarîbû ber li ber wan bide bigirtin. Xwedîyê gilî bi bê tirs û saw ji bona layî wî diçû û gilîyê xwe dida bikirin. Ji hemû layekî Gilîvan ji bona layê wî dihatin û hîç carekê ew sexlet nedibû. Tude ji bona layê wî diçûn, çunke, šareza bû, mehreban bû û mafe sitend bû. Li layê Šehrîyar de Gewre û Biçûk di meqamê mafe de yekbûn. Dilê wî nazik bû. Ew zor liberdihate bikevtin, gava ku wî dengê Reben û Hejaran dida bibihîstin. Mehrebanîya wî dilê wî nermdikir û çavên wî bi hêstiran ve pir dikir. Wî ji bona wan xelat u yarî didan bipêškeškirin. Mirovanî û qecnî li layê wî de pir xweš bû. Hîç wî nedihîšt, ku li Navmalî û Kolan de bête bilêxistin; çunke, di wê hingavê de rewš û zîneta van reng Mirovan zor xerab bû. Heger çavên wî bi šêwîyekî ve bihata bikevtin, mehrebanîya wî dihate cošbûn. Heger Kesekî wî nebaya, Wî cîgehek ji bona wî dida dozandin. Heger Kesek wî bibuya, wî pare û mangane dida pêdan, tanî ku ew bête biperwedekirin.

Dilovanîya Xwedê lêbit. Li cil û bergên xwe de, di xwarin û vexwarina xwe de û di nava mala xwe de nimûneyeke sadebûn û merdayetîyê bû. Carekê xanîyek baš jê re di bajarê Šamê de hate bidurustkirin. Gava ku ew ji bona wêderê hat û çendekî temašeyi xanî kir, wî got: "Di vî xanîyê hanê de tanî dawî em namînin. Ev xanîyê hanê bi kêrî wî Kesî ve nayê bidîtin, yê ku mirin li šûna wî de têtê gerandin. Karê me di vê dunyayê de bes û bitenha ve ji bona Xwedê karkirine". Mal û mulkên pir ew hîç bi payebûn nedan bikirin. Wî digot: "Mal û xolî li layê

min de yekin". Jibervêjî ku her Kesekî daxwaza danê lêbida bikirin, wî ew bê hêvî nedkir. Her û her wî ji dwaxwaza dayînê bêtir ji bona daxwazvan dida bidan. Jiber zorbûna merdîtî û destvekirina wîna Xiznedarên wîna pir caran perên Xiznan li ber wî de didan bivešartin, da ku ew di dema tengavîyê de bê pere neyête bihištin. Nimûneyek ji bona zor gewrebûna merdîtî û destvekirina wîna têté bidîtin, gava ku ew mir, ne pere, ne mulk û ne xanî wî li dû xwe de datin bicîhištin. Mîr Mohemed di Gešta Šamê de dibêjê: "Xwedêlêdilovan ji sînor der merd û çavfireh bû û dibêjin, ku li dawîya mirina wî de bes û bi tenha ve 47 Direhem li paš wî de hatin bicîhištin. Dibe, ku lipašhiština Parsekekî jî jê vê lipašhiština wîna de bi gelekî ve zortir bête bidîtin".

Di sala 1316 k.- 1898 Šahînšah û Šahbanûwa Elmanya serdana Šamê datin bikirin[204]. Wî di peyvdarîya xwe de got "Zor pê min xweše, ku ez li Šarekî de dibim, ku di dema xwe de Mirovekî Gewreyî weha têde jiya ye. Ew herî gewretirîn Peyê Heyamê xwe bû. Di azayê û gernasîya xwe de pê hempa bû. šan rûmeta wî di tevaya dunyayê de bi nav û bang bû. Ev Qehremanê Gewreyê hanê Selah El-Dînê Eyubî bû". Li dawîya vêna de wî destek gul ji bona yadgarîya mezinbûna wîna li ser Goristana wî de date bidanîn[205]. Li ser wî destgulî bi zimanê Erebî hatibû

[204](Weke ku bi bîra min ve têté bikevtin, ku ev serdana hanê di sala 1913 z. de bi vekirina Šivia Tirina Hicazî ji Šamê tanî Medînê hate bikirin. Di Navîna Šamê de li Merçe de Šahînšahê Elmanî pevdarîyeke pir mêjûyî bi perdehilanîna yadgariya vekirina wê Šivê ve date bigotin. Wî serdana Aramgeha Šehrîyar Selah El-Dîn date bikirin û tevaya hundurê Aramgehê bi girantirîn û buhatirîn Kašîyên Mayisner date bixemilandin. Cuma).

[205](Di sala 1919 gava General Goro bi Leškerê xwe ve bajarê Šamê date bileyandin, ew xweser ji bona ser goristana Šelah El-Dîn çû û wî Tapanê Potina xwe li ser Kêla serê wî de date bidanîn û wî date bigotin: "Tev li te jî de vaye em careke din jî hatin".

Min mêjuwa gelek Vekirvanan di pêlên mêjûyî cudan de dayite bixwedin. Bi rastî jî ve reftar û gotinên weha ters û çors min nedane bixwedin û bibihîstin. Heger wî dixwest, ku ew tola Qeralê Filpê duwem bide biwergirtin, divabû ew serê xwe bide bitewandin, jiber ku bi saya serê Seleh Al-Dîn ve Filip bi saxê careke din ji bona Firensa hate bizivirandin. Eve ji alîyeki de ji alîyekî din hemû Rewešt, Rewend. Destur, Qanun, Yasa û Rêzanên Supahî di seransî mêjûwa Mirovanyê de li ser Serleškeran dide bineçarkirin, ku ew bi rûmet û hêjabûn ve ligel bidestkevtinên Dîlên xweyî Serleškeran ve bidin bireftarkirin. Hêjîbêtir divê beramberî hemû Mirîyan rêz û rûmet bête girtin. Belam General goro ev rûmeta

binivîsandin: "Wilhilmê duwem Šahînšahê Elemanya û Padšahê Pirusya vê destgula hanê ji bona yadgarîya Qehreman Selah El-Dînê Eyubî dide bidanîn".

Nivîsvanê Jiyana Selah El-Dînê Eyubî dibêje: ku wî di šerekî Xaçperstan de bi bê guhdan u vegirtina xwe ve bi tîrbarîna Leškerê Xaçperestan ve bide bidan, wî xwe ber bi pêš ve date helkutandin û wî ji bona Dujmin date bang û biqîrkirin: "Li cîgehên xwe de biwestin, dilê vî Šêrî ji dilê Šêrê we mezintire".

Di demekê de ku hêrišên li dûhev de ew dabûn westandin û jiber xurtbûna nexwešîya wî ew li ser hespê de zor dihat biêšandin. Hevalên wî jê re dane bigotin: "Dabeze û tozekî bêhna xwe bide bivedan". Belam wî bi gotinên wan ve neda bikirin û wî ji wan re date bigotin: "Heger ku ez ji hesp dabezim, wê sayê ez bi nexwešîya xwe ve dizanim".

Bi kurtî ve ev Šehrîyar bi saya Sincî, nav û nîšanên xweyî berzî bilind ve bê hempa bû. Ew nimûneya Musulmantîyê û Pûtê gewreyî Rojhilat bû. Civatên wî bi Zanistîvanan û Hišmendan dihatin bidagirtin. Ber dergehê wî ji Perîšan, Reben û Pêwistvanan tije bû. Ligel vê hemû gewrebûna xwe jî de ew bi endazekî weha bêpayebû, ku pê hatiye bigotin: "Bi rastî bêpayebûn û Oldarîya wîna serên Mirovan dida surandin".

Zor caran di šer de ji bona kamwerî, sitendin û rizgarkirina Kêšverkî wî xwe tûšî berbatîyê dida bikirin. Di vî warî de pir nimûneyên yektayî bilind di canpêzaryê û šanbilindyê de têtin bidîtin. Bickeh li vê jî de ew ji bona rêk û pêkxistina kar u barên Welêt zor likar bû. Bi saya vê gerandina konevanî ve Kêšverê Eyubî di wî zemanî de di hemû warekî de pêšveketirîn welatê Cîhanê bû. Ew ji bona Tudeyê xwe ve mîna Bavekî dilsoz bû. Her û her wî ew ji bona qencî û bextiyarîya wan didane biamojgarîkirin.

---

hanê ne ji bona xwe date bigirtin û nejî wî ew ji bona Miletê xwe date bigirtin. Šehrîyar Selah El-Dîn bi vê lêdana potina hanê ve biçuk nebû, lebêlê hîç gûman têde niye, ku General Goro pê pir hate binizmkirin.

Hin ji nevîyên Ereb jî mîna Efleq, Sedam û hinên din jî li ser Kurtêlxwer û Cašên Kurdan de navê Šehsuwarên Selah El-Dîn datin bidanîn. Çend bê šermezarî ye, çend çepelî ye, na hêjîbêtir çend bedbextiya Ereb têde tête bidîtin, ku ew navekî weha çurusandî di asuwê mêjûwa Cîhanê de bidin gemarkirin. Cuma).

Di vî babetî de Bînvanên herî bi hêz ve Dujminên wî bi xwe ve têtin ditin. Istanlî dibêje: "Dunya weha di Nîšan û Sincîyên vî Šehrîyarî de hatibûn bitêgihištin, ku hîç gûman li rewanîya wîyî pakî bilind de, li qehremanî û azabûna wîna de, li pir hestbûna dilovanîya wî de, li pakbûna dilê wîyî sade ji bona jînê de û xwe vegirtina wî ji dilbijandinên Dinê ve ji bona Ola xwe dihatin bidîtin û ew hêjî bi serdejî ve pir bi rumet bû. Ev nav û nîšanên berz û bala bi rastî ve lêdihatin, ku ew bi nimûneya Qehremanê Musulmantîyê ve bête bidanîn".

Nivîsta mêjûwa Mêjûvanan dibêje: "Derbarê Selah El-Dîn de, tištên ku Fileh pê hatibûn sersurandin, ev bûn: Bext û bilindbûna rewanîya wî, merdbûn û çavfirehbûna wî, dilovanî û mehrevanîya wî, lêbuhurandin û pêgirtina soz û peymanên wî bûn. Bi rastî jî ve ev cihê sersurandinê niye, ku van hemû nav û nîšanên bilind dilên Tudeyên Ewropayî beramberî bi Šehrîyar Selah El-Dîn ve pir bi rêz û hêjabûnê ve dane bidagirtin. Ev hemû nav û nîšanên Mirovekî gewre bû, yê ku bi ser wan ve kamwerî datin bigirtin û wî ew ji Asya dane biperandin."

Wî pir rûmeta Mirovên dorhêla xwe dida bigirtin. Ew ligel wan de gelek baš bû. Heger wî poxîyek li nik Yekekî ji wan de bidata bidîtin, Hîç wî ew bi rûwê wan ve ne dida bixistin. Peyvên zor kêm wî dikirin. Wî Hevalên dora xwe jî bi vî rengî ve dabûn bifêrkirin. Civata wî zor pak bû. Kesekî nediwêra, ku ew li dijî Hevalê xwe yanjî Kesekî din de li layê wî de bide bidujûnkirin. Wî Mal û Mendalên xwe xwešdixwest. Zor caran jî wî ligel Zarokên xwe de dida biyarîkirin. Ew zor dîndar bû û wî wer jî Zarokên xwe pê dabûn bigihandin. Dadwerî li nik wî de zor xweševist bû. Her kesekî bi dijî dadweriyê ve bida bireftarkirin, wî bi tundî ew didan bisizakirin. Hefteyî du caran ew bi xwe ve ji bona bihîstina gilîyên Sitemxweran dihate bidanîštin. Dergehê wî ji bona Biçûk û Mezinan, ji bona Hejar û Dewlemendan vekirîbû. Ev rewešta hanê wî di dema geštîyên xwe jî de neda biveguhertin.

Estivinsin dibêje: "Šehrîyar Selah El-Dîn di kar û barên xwe de biserkevtî bû, di îšê xwe de šareza bû û di bitexmînkirin û liyekdana hêza dujmin de wirya bû. Heger wî biryara kirina îšekî bida bikirin, wî di kirina wî de hîç dudilî nedida bikirinn. Di îš de wî qet westandin û bêzarî nedida bizanîn. Beramber bi dujwarîyê û westandinê ve gelekî ew bînfireh bû. Bawerîyeke wîyî pirî berz bi xwe ve hebû. Ev hemû nav û nîšanên berz têde dihatin biberzkirin. Bidîtina wî di îš de zor rastgo bû û dadwerkirina wîna di derbarê mafe de zor dadwer bû".

Šehrîyar Selah El-Dîn di bergê duwemî Wergerandina Musewer Tarîx El-Islam- Wêneyê mêjûwa Musulmantîyê de ji bal Mîrza Mîr Elî bi vî rengî ve pesnê wî hatîye bidan: "Selah El-Dîn Yekek ji gewretirîn û Qehremantirîn Vekirvanên Padšahên Cîhanê dihate bidîtin."

Ehmed Zekî Paša di pevdarîya xwe de di Keništê de derbarê Selah El-Dîn de dibêje, ya ku ew jî di Kovara Ramesis de hate bibelavkirin: "Miletê Qubtî ev Padšahê gewre zor xwešewist bûn; çunke, ew didan biparastin û guh bi wan ve dida bidan. Di pêla Šehrîyarîya wî de çavên wan bi xwešîtîyê û gešbûnê ve hatin bikevtin. Nîšana herî gewrebûna vê evîndarîya wan eveye, ku wêneyê Šehrîyar Selah El-Dîn li teništa Wêneyê Isayê perest dihate bidanîn". Kovar pêde dire û ew dibêje, ku Yekekî ji Xwešxuvanên Endelosî bi navê Eb-Dûl Munim El-Endelosî ve di serdana xwe de di wê pêlê de ji bona Misrê bi çavên xwe ve wî evîndarîya Miletê Qubtî ji bona Selah El-Dîn dayite bidîtin. Di vî warî de wî xwešxuwanîyek-bi Zimanê Erbeb, Cuma- dayite birêkxistin: Em van herdu Malikan jê tînin:

Wan ji bo te di nava Mala Xwedê de wênê te datin bihiladn
wan mîna bawrîya wan ji bo wênê Perest bi te bibawerîkirin
Jê re Keše serî dida tewandin, pesnên wî wî didan biberzkirin
wî pê ji bona nexweš û Bîmarvanan nivšt didane binivîsandin

Wî di wesyetnama xwe de gotîye: "Šûrê min jî ligel min de bidin bivešartin, da ku ew di roja Heleste de ji bona min baštirîn Bînvanîyê bide bidan". (Hammer, B. 4, r. 207, 209).

## 14. Šopên wîyî Avanîyê û Bajartîyê

Šopên gewreyê Šehrîyar Selah el-Dîn ne bes tenê di kamwerî, Yekkirina Musulmanan, bašbûna Serpereštîyê, hozanî û konevanîyi wîyî Supahî û siyasî de dihatin bidîtin. Ligel van tevan jî de zor zor bi avanîyên baš baš ve welatê xwe wî daye xemilandin.

Wî dît, ku hînkirin di mizgefta Omer de li Festatê de mîna hînkirina nihayî Ezher bû. Di sala 566 k.- (di Nîvê Šuban/Nîsana, Cuma) sala 1170 z. de li nêzîka Mizgefta kevin de Dibusta Nasiriyê ji bona hînbûnên Rêçola Šafiî date bidurustkirin. Ev Dibustana hanê jî Pêšîn dibustan bû, ya ku ew li Misrê de hatibû bidurustkirin. Li dawîya vêna de wî Dibustana El-Qemhîye li nêzîka wê de ji bona Rêçola Malikî date biavakirin. Wî di sala 572 k.- 1176 z. de Dibusta Rêçola Henefî de date biavakirin, ya ku jê re Xanîyê Wezîr El-Betaihî hate bitirxankirin û ya ku jê re niha Dibusta El-Siyufiye tête bigotin. Ligel avakirina van Dibustan jî de wî kar û barên Mamostan û Xwendevanan jî date binîšankirin. Bi vî rengî ve wî dikarîbû li šûna Rêçola Šîi de Rêçola Sunî bide bibelavkirin.

Xwedîyê Nivîsta Subuh El-eša dibêje: "ku Xaneqa û Tekye li pêš serdarîya Eyubî de li Misrê de nebûn. Sazvanê pêsîyî vanan Šehrîyar Selah El-Dîn bû. Wi li durustkirina Xaneqyê Selahîye de, ya ku ew bi navê Seîd El-Sueda ve bi nav û bange, date bidestpêkirin û wî hin Ewqaf jê re Qîsariyet El-Šurb di nav Qahire de û Baxê El-Hebanîye di Kolana Bereke de date bidanîn.

Bingehê hêza Deryayî li Misrê de ew ji bal Šehrîyar Selah El-Dîn hate bidanîn. Di bina Navnîšana Dîwan El-Ustol dam û destgehekî taybetî li jêr çavdêrîya Melek Adilê Birayê xwe de date bisazkirin. Iskenderîye û Dumyat li ser kenarê Derya Sipî de, Festas û Qos li ser Nîl de Benderên giringî deryayî bûn.

Çunke, Iskenderîye her û her tûšî bidadana Firengan dibû, wî Beden û keleha wê zor baš datin biavakirin. Li wêde û li Misrê de wî Du Xestexane jî dane bidurustkirin. Wî Koška Ezîz Ibin El meezê Fatimî, yê ku wî ew di sala 384 k. de dabû biavakirin, bi Nexwešxanê ve date biveguhertin. Wî herwehajî di nava wê Koška hanê jî de Mêvanserayek date biavakirin.

Wî ji bona baškirin çandinyê û hêsankirina karê Werzešvanan hin pir û cohok jî dane bidurustkirin. Ji bil van karan jî wî bedeneke xurt û sengîn li dora paytextê Misrêyê ji Festat, Esker, Qehire û Mederîyê de date biavakirin. Keleheke xurt jî li cîgehekî berz date biavakirin, ku ew bi ser her çar perçên paytext ve bête biserjorkirin. Di nava wê kelehê jî de wî xanîyek ji bona xwe û seraya Serdarîyê date bidurustkirin. Hêstajî bi ser dîwarê vê kelehê ve Wênê Heloyekî Nîša Ala Selah El-Dîn Eyubî bi xwe ve tête bidîtin. Ew Helo sorekî li ser xamekî zer de hatîye bineqškirin.

Bacê Gomrikê jî bi carekê ve wî date hilanîn[206]. Bi vî rengî ve wî kar û barên Werzešvanan û Bazirganan zor hêsan û xweškir. Bi rastî jî di hingava serdarîya Fatimî de Tudeyê Misrê li jêr bargiranîya van bacan de bi carekê ve hatibû bipištxûzkirin. Di ruwên van Bacan de zor sitemkarî li Tudeyê Misrê dihate bikirin.

Bicgeh li van Bacan jî Salê Du hezar dînar ligel hezar Erdem Genim bi Mîrê Mekê ve nala Baca Hecacan dihate bidan.

Doktor Ehmed Bilî di dawîya dana vî Šehrîyarê gewre de dibêje: "Evê ku me li ser de date biaxivtin, ew letek ji nîsanên vî Šehrîyarî tête bidîtin. Ev Serdarê bi hêz û hiner ve, ev Vekirvanê Biserkevtî, ez di wê bîr û bawerîyê de me, heger kû mîna Selah El-Dîn di nava Padšahê Musulmanan de zor bihatina bidîtin, dê rewša Musulmantîyê bi vî tonî ve di derve û hundur de weha lawaz û bêkelk nehata bidîtin".

Mîrza Mîr Elî dibêje: " ku gava Fedil El-Qadî Wezîrê Selah El-Dîn bû, ew destê rastêyî Šehrîyar ji bona bicîanîna kar û barên Qencîyê bû. Nebes tenê serdarîya Selah El-Dînî Šêwiradî ji Qereqoš, Husam El-Dîn, Meštût û hinên dinî mîna wan dihate pêkhatin, belkî jî Mirovên mîna Qadî El-Fadil, Katib Imad El-Dîn, Îsayê Hekarî û hin ji Zanistvanên bi nav û bang ve di nava wê de dihatin bidîtin"[207].

---

[206](Fermana Selah El-Dîn ji bona hilanîna Bacên Gomrikê ji Qehirê Festat di Roja Îna 3 Sefera sala 567 k.- 6 Çirya Pêšîn sala 1171 z. de hate bixwendin. Šelah El-Dîn, r. 65, 68. Cuma).

[207]Geštvanê bi nav û bang Eb-Dul-El-Letif li dawîya lihevhatîna Qudsê de ligel Selah El-Dîn de hate rûništin. Ew dibêje: " Di ševa pêšî de di çûna min de li nik wî de min dît, ku ew di nava civatekê ji Zanistvan de hatîye bidaništin. Ew guh li peyv û biaxivtinên wan dide bigirtin. Car caran jî wî hevparîya gift û goyê dida bikirin.

Ji bona xurtkirin û sengînkirina Bedena Qudsê zor caran wî bi milên xwe ve kevir didan bikišandin. Her Roj li Rojhilat de ew ji bona ser Bedenê dihat û wî bi çavên xwe li ser Karker û Hostan de çavdêri dida bikirin. Wî ševa xwe jî bi îš û karên dewletê ve dida birabuhurandin. Tarîx El-Islam El-Musewer).

## 15. Kurên Šehrîyar Selah El-Dîn

Šehrîyar Selah El-Dîn di dema jîna xwe de serdarîya Felestîn û Surî bi Melek Efdel Elî Bavê Hesen Nuredîn Elî date bidan. serdarîya Misirê jî wî bi Melek Ezîz Osman Bavê Fetih Îmad El-Dîn date bisipartin. serdarîya Helebê jî wî bi Melek Zahir Xazî Xeyas El-Dîn dabû.

Melek Adilê Birayê wî jî Bešekî ji Cezîrê bi destên wî ve bû. Kurên Šêrkohê Mamê xwe jî li Humsê de dabûn bicîgirkirin. Yemen jî bi destên Kurên Birayê wî Seyf El-Islam Textekîn ve bû. Di berî mirina xwe de Šehrîyar Kes bi Pêhatî û Šûnwarê xwe ve nedabû bidanîn. Jibervêjî Kurên wîna her Kesekî li cîgehê xwe de gerandina Serdariya ji xwe re dane biwergirtin. Bigir nêzîka Salekî hemûyan pêvgirêdana xwe bi Melek Efdel ve dane biparastin.

-----------------------------

## Melek Efdel, Melek Ezîz û Melek Adil

Melek Efdel Kurê pêšîyê Šehrîyar Selah El-Dîn bû. Li dawîya Bavê wî de Serdarên mayînên Eyubî pêve dihatin bigirêdan.
Diya El-Dîn Kurê Esîr -Birayê Mêjûvanê bi nav û bangê Kurê Esîr- Wezîr û Serkarê kar û barên Melek Efdel bû. Ev Wezîrê hanê di serkarî û Siyaseta xwe de zor lawaz bû. Jibervêjî ew girêdana gerandinê zû têk çû. Li ser ruwê vî Wezîrê bêgerandin û tedbîr de Serdarên bi nav û bang ve û îšguzarvanên zemanê Šehrîyar Selah El-Dîn zû jiber çavên Melek Efdel hatin bikevtin û wî ew ji cihên wan dane bidaxistin. Jibervêjî hemû jê tûrebûn. Yek li duwayî Yekî de Surî wan datin bicîhištin û ew ji bona Misrê ji bona layê Melek Ezîz çûn. Bi xwe jî ve zor pê neçû, ku Melek Ezîz Serbixwebûna li Misrê de date bieškerekirin. Wî di sala 590 k. de ji bona bizeftkirina Mulkê Birayê xwe li Suri de bi leškerekî ve berê xwe ber bi Surî de date bivedan. Pevçûna di navbera van herdu Biran de bi navcîtîya Melek Adil û hin ji Gewreyên Eyubî de, her ku ew çilo bû, vê carê hate bibêdengkirin. Belam di sala diwayî de Melek Ezîz dîsan xwe ji bona ser Suri date rakišandin. Vê carê Melek Adil yarmetîya Melek Efdel date bikirin. Wî bi konetî û navtêdana xwe ve Leškerê Misrî li Melek

Ezîz de date wergîrandin. Ev Šahzajî de di encam de bi vegerînê ji bona Misrê neçar bû.

Melek Adil di pêšî de bi diyarî ve Hevalbendê birêkkevtina Birazayên xwe bû. Belam ku di dawî de wî temašeyî bê serkarî û bê serpêhatîyên wan date bidîtin, wî zanî, ku rencên Šehrîyar Selah El-Dîn li ruwê Kurên wîna de dê bêtin biberbakirin û dê welatê Eyubî tûšî bê hêzîyê bêtin bikirin. Wî xwest, ku ew xwest, ku ew gerandina Welêt bi jêr destên xwe ve bide bixistin. Bi xwe jî ve nerêkîya Birazayên wî jî ji bona vê mebestê dida bikarkirin. Bi vê remanê ve wî layê Melek Efdel ji xwe re date bigirtin û Melek Ezîz bi bêhêvîtî ve ji bona Misrê hate bivegerandin. Li paš de dîsan wan agir nuhkirin û Melek Efdel ji bona Šamê hate bivegerandin û Melek Adil bi xwe jî ve ji bona Misrê çû, da ku ew bi rêk û pêkxistina îš û karên Misrê bi navê Melek Ezîz ve bide bikirin û ew li wêderê ma. Bi rastî jî ve wî dixwest, ku ew bingehê serdarîya xwe li welatê Ferunan bide bidanîn. Li dawîya navekê de bi hin mehnan ve wî legel Melek Ezîz de Leškerek bi ser Melek Efdel de date bidadan. Li dawîya šer û pevçûnan de di sala 592 k. de wan Šam datin bizeftkirin. Melek Efdelê bedbext ji dêlva bajarê Šamê bi neçarî ve bi keleha Sarxed ve hate birûništin. Weha welatê Šamê bi diyar ve bi Melekê Misrê ve dihate bibestandin, belam di rastî de ew li jêr destên Melek Adil de dihate bidîtin.

Bi rastî ve ev reftara hanê di warê Sincî û Xizmayetîyê de zor bi naširînî ve tête bidîtin. Belam ew ji bona parastina welatê Eyubî weha dida bipêwistkirin, da ku ew beramberî hêrîšên li dûhevdûyî Xaçperestan de û rêk û pêkxistina îš û karên Welêt bikarîba bihate birabûn. Ji Welêt re Serdarekî bi šan, bi desthilatî û xurt ve dihate bidivakirin. Jibervêjî heger em temašeyî berjewendîya gištî bidin bikirin, Hîç gazineke mêjûyî ruwê xwe ji bona Vekirvanê Kerk nade bivekirin.

Melek Adil li dawîya saxkirina Suryê de ji bona xwe û bi rêk û pêkxistina kar û barên wêna ve ew ji bona geštiyeke li sergerandinê de ji bona ser Cezîrê de date bidestpêkirin. Wî serpereštiya wê jî date bisazkirin. Li dawîya mirineke ket û pirî Melek Ezîz de di 27 Muherema sala 595 de bi neçarî ve ew ji bona Surî hate bivegerandin. Çunke, Melek El-Mensur Mehmudê Kurê Melek Ezîz hêšta jî mendal bû, Melek Efdelê Mamê wî ji bona Misrê hatibû bibangkirin û ew bi Cîgirê Melek Mensur ve hatibû bidanîn.

Melek Efdel xwest, ku ew ji vê karmendîyê ji xwe re sûd bide biwergirtin û ew tola xwe ji Melek Adilê Mamê xwe bide bisitendin. Wî

ligel Melek Zahirê Birayê xwe Serdarê Helebê de date bidan û sitendin. Wî sozê yarmetîyê li wî jî de date biwergirtin. Wî dest bi karxistina ser Suri ve date bipêkirin.

Melek Adil li ser vê dan û sitendina hanê de beberdar bû. Wî bi konetî û siyaset ve zû di navbera Melek Efdel û Serdarên Hevalên wî de date bitêkûpêkdan. Wî bi Leškerekî gewre ve ruwê xwe ber wî ve date bivekirin û wî pê gêre date bikirin. Di encam de wî di Rebiê duwem de sala 596 k. de ew neçarî berdestbûnê kir û herwehajî wî Melek Mensur jî Misrê date biderkirin. Wî welatê Misrê jî date bidagîrkirin û pêvekirina wêna bi welatên xwe ve date dazîn.

Melek Efdelê telaqreš bi bêhêvîbûn ve ji bona Burca Sarxed hate bivegerandin. Di dawîya navekê de Melek Zahirê Birayê wî xwest, ku ew Šamê jê re bide bisitendin. Ew bi Leškerê Helebê ve ji bona ser bajarê Šamê hat. Wî dor lê date pêçandin. Belam vê carê jî bi konatî û siyaseta Melek Adil ve di nava Herdu Biran de hate têkçûn. Melek Zahir waz li dorpêçanê date anîn û ew ji bona Helebê hate bivegerandin. Melek Efdel jî ji bona Serxed hate bivegerandin. Di dawîya navekê de Melek Adil keleha Necem, keleha Suruc û keleha Semsad ji bona Melek Efdel dan. Belam van qencîyên hanê jî ewende nedane bidirêjkirin. Di sala 599 k. de ew careke din ji nava destên wî hatin biderxistin. Dayika Melek Efdel gelekî tika li Melek Adil date bikirin, da ku ew wan kelehan ji bona Melek Efdel bide bivegerandin. Belam sûda wê nebû. Gava ku Melek Efdel evaya zanî, wî dest bi avanîkirina keleha Semsad ve date bikirin û wî girêdana xwe bi Silcoqîyên Romê ve date dazîn. Demekê jî wî bi vî rengê hanê ve ji xwe re date birabuhurandin. Gava Melek Zahirê Birayê wî hate bimirin, wî xwest, ku ew bi yarmetîya Kîkawisê Serdarê Silcoqî ve Helebê ji xwe re bide bigirtin û ew ji xwe re li wêderê de Serdarîyekê bide pêkanîn. Belam vê carê jî ew bi mebesta xwe ve bi hoyê nerêkevtina Hevalbendên xwe ve û destdirêjîya Melek Ešrefê Kurê Melek Adil nehate bigihaštin. Ev Šahzadeyê bedbext di sala 610 k. de bi bêhêvîbûn ve ji bona keleha Semsad hate bivegerandin. Ew tanî payîna jiyana xwe bê Kes û Kus li wêderê de ma. Ew di sala 622 k. de kewt û pir hate bimirin.

## Šehrîyarîya Melek Adil

Seyf El-Dîn Melek Adil di 16 rebiê duwem de sala 596 k.- 2. rešmeha sala 1200 z. de li Qahire de serdarîya xwe date bidazanîn. Mîna ku me dabû biaxivitin, wîna bi hozanî ve bigir tevaya Kêšverên jêr destên Šehrîyar Selah El-Dîn ji bil Heleb pêve ji bona jêr desthilatîya xwe dabûn anîn. Derbarê Serpereštiya xwe ve ew li ser šûna Birayê xwe de revišt. Serpereštîya welatên xwe bi navê xwe ve ji bona Kurên xwe datin bisipartin. Melek Kamilê Kurê xwe li ser Misrê de date bidanîn. Melek El-Miezem Îsayê Kurê xwe li Surî de date binîšankirin. Melek Ešrefê Musewîyê Kurê xwe li Cezîrê date binavkirin. Kurên xweyi din wî ew li ser cîgehên din datin bidanîn û ew ligel Birayên wanî din de.datin bibestandin.

Di hingama serdarîya Melek Adil de bigivaština tundbûna Xaçperestan li ser welatên Musulmanan de ne ewende xurt bû. Tevlivêjî de Serdarên Firengan bi ayîna xweyî taybetî ve soz û pemanên girêdayî ligel Šehrîyar Selah El-Dîn de dane bišikendanin. Wan Orduwekî gewreyî Xaçperestan di rêya derya re ji bona ser Bêrudê datin bikišandin û ew date bigirtin. Ev rakišandina hanê li ser Bêrude de di dema šer û herayên di navbera Kurên Selah El-Dîn hate bikirin.

Li dawîya ku Melek Adil ji bona ser Text hate hilkišandin, ew bi Leškerekî ve ji bona ser Yafa çû û wî ew datze bigirtin. Xaçperestan jî di wê navê de li Tibnîn de dor dabûn pêçandin. Belam ew bi wan ve nehate bigirtin. Di dawî de lihevhatin di nava wan de hate bilidarxistin û wan ji bona Sê salan Ašîtî di nava xwe de dane bibestandin. Bi vî rengî ve fertena hatina Çaremî Xaçperestan hate bibirandin.

Di sala 613 k. de Melek Zahir Xazîyê Serdarê Helebê hate bimirin. Melek Efdelê xwest, ku ew bi alîkarîya Kîkawisê Selcoqîyê Romê de vî Bajarî ji xwe re bide bigirtin. Belam vêjî sernegirt. Heleb jî bi destên Melek Ešrefê Kurê Melek Adil hate bikevtin. Bi vî rengî ve serdarîya Kurên Seleha El-Dînê herî gewreyî Qehremanê Musulmanan hate bidawîkirin.

Ji xwešbextîya Melek Adil bû, ku agirê hatina Çaremî Xaçperestan vê carê bi Kêšverên Îsalamê ve nehat bigihaštin. Bes û bi tenha ve wan vê carê Istenbol dane bisûtandin û biwêrankirin.

Papayê Înosanê Sêyem di sala 613-614 k.- 1216-1217 z. de fertena hatina Xaçperestên pêncem date bidurustkirin. Qeralê Meciristan, Doqên Otrîš û Bavarya ligel Serdarên Elmanîya Jêrîn de tev de ligel vê

hatina Xacperestên Pêncen de têklel bû. Wan Orduwekî ji dused û pêncî hezar Kes ve bi pirî ji Elaman ve datin bilikarxsitin u wan ruwê xwe ber bi kenarê Surî ve datin bivedan. Di rêya derya re ew ji bona dewr û berên Eka hatin û wa ew nav dane bitalan û biwêrankirin. Herwehajî ew ligel filên Surî jî de bi šer ve hatin bikevtin. Li dawi de wan datin bibiryardan, ku ew ji bona ser Misrê jî herin Bi rastî jî ew ji bona qeraxa derya hatin bivegerandin û ew li Gemîyan de suwar bûn. Wan ruwê xwe ji bona devbigihandina çemê Nil ji bona derya Sîpî dane bivedan û ji wêderê de ew ji bona dewr û berên Dumyatê hatin û dor lêdane bipêçan.

Melek Adil di wê navê de li Jorî Surî de bû, gava ku pê xebera dorlêpêcana Dumyatê hate bigihaštin. Da ku ew bi lez û bez ve leškerekî ji bona beramberkirina Xaçperestan bide bikomkirin, wî ruwê xwe bi ber bajarê Šamê ve date bivekirin. Belam hatina mirinê bêhn pê nedayê û ew li nêzîka bajarê Šamê de li Elakîn de di Camada duwem de 31 Awgosta sala 1218 z. de hate bimirin.

## Rewš û Rûçikên wî

Danerê Musewer Tarix El-Islam Mîrza Mîr Mohemed Elî dibêje: Seyf El-Dîn Melek Adil Mirovekî zana û bi tedbîr bû. Ew zor dûrbîn bû. Di rabûn û rûniştên xwe de qencperwer bû. Ew di biryarên xwe de pêgîr bû û di kar û barên xwe de ew mêldariyê çakîyê bû. Wî jî mina Birayê xwe zor zanistî û zanebûn xwešdivst.

Ew di šer de aza û bi cerg bû. Di siyaset û serpereštyê de bi hiš û kone bû. Ew di zemanê Birayê xwe de destê wîyî rastê bû. Çi di hikama Birayê xwe de û çi di hingama xwe de wî šerên zor ligel Xaçperesta de datin bilidarxistin

Ligel Qeralê Ingilizîyî Rišardê Šêrdil de zor dostanîya wî dihate bidîtin. Vî qeralî di peyv û nameyên xwe de ligel wî de bi Xweševist û Bira ve jê re digot. Li ser vê dostanîya hanê de wî Melek Kamilê Kurê xwe ji bona nava Cengawerên-Šewalîyê date bixistin.

Navnîšana wîyî Padšahîyê li ser Pulan de bi navê Ebû El-Fida dihate bilêxistin. Di zemanê xwe de wî xurtbûn û šanbûna serdariyê bi carekê ve dabû biragirtin.

## Šehrîyarîya Melek Kamil

Nav û nîšana wî Nasir El-Dîn bû. Ew bi navê Ebû El-Mealî Mohemed dihate bibangkirin û ew Kurê Melek Adil bû. Ew di Rebiê yekem sala 576 k. de hate bizayîn. Li dawîya mirina Bavê xwe de wî serdarîya Misrê ji xwe re date biwergirtin. Wî Xaçperest ji dewr û berên Domyatê û tevaya xakê Misrê dane biderkirin.

Di wê navê de Melek El-Muezem Îsa šerf El-Dîn Serdarê Surî bû û Melek El-Ešref Musa Muzefer El-Dîn jî Serpereštîya Helebê bi destên xwe ve dabû bigirtin.

Orduwa Xaçperestan demeke zor li Domyatê de dane bidorpêçandin û wan ew gelekî dane bitengavkirin. Çi Dorpêçvanan û çi jî Dorlêpêçvanan jiber nexwešiyê û birçîbûnê zor ziyanên mezin bi wan ve hatin bikevtin. Li dawîya Sal û nîvekê ji dorlêpêçandin û tengavîyê de înca Domyate bi destên Xaçperestan ve hate bikevtin. Di dema

liberxwedanê de serjimara Tudeyên vî bajarê Heftê hezar Kes bû. Di dema berdestbûnê de serjimara wîna bes û bi tenha Sê hezar Mirov mabûn. Ev jî ji bal Xaçperestên tundrê û xwînxwar tevde bi hev re berbikuština gištî ve hatin bixistin.

Orduwa Xaçperestan li paš girtina Domyat de ruwê xwe ber bi Qahire ve dane bivedan. Orduwa Melek Kamil her çenjî de ew ji bal Leškerên Birayên wî ve hatibû bixurtkirin, Belam dîsan jî beramberî bi Leškerê Dujiminên xwe ve zor kêm bû û pê hêrîš ji bona ser Leškerê Dujimin nedihate bikirin. Jibervêjî Melek Kamil ligel Serdarên Xaçperestan de bi gift û go ve hate bikevtin. Bi mercê wazanîna wanan ji bona Domyatê dê ew ji wanan re Felestîn bide bivegerandin. Belam ev daxwaza lihevhatinê ji bal Xaçperestan bi nayînê ve hate bivegerandin.

Biwergirtina Domyatê û hêrîša Qahire ji bal Xaçperestan kêreke pirî gewre li Orduwa Xaçperestan hate bikirin. Xaçperestan çavên xwe ji bona girtina tevaya Misrê dane biberdan. Melek Kamil jî ji bona rizgarbikirina Misrê li wazanîna Qudsê û Felestînê de ji bona Xaçperestan amede bû. Di vê zîneta hanê de bêkarîya Orduwa Xaçperestan û avrabûna Çemê Nîlê kêseke zor baš bi Melek Kamil ve hate bidan. Wî fermana šikenandina hemû derbendan date bikirin û Dešta Delta Nîlê tevde date binavkirin. Rêya vegerê li Xaçperestan hate birîn û yarmetiya xwarin û vexwarinê di rêya Derya re nema bi wan ve hate bigihaštin. Ew tûšî bicîbûneke xerab bûn. Li layekîtir jî de Leškerê Musulmanan bi komikên biçûk biçûk ve hêrîš bi ser Leškerê Xaçperestan didan bidadan û wan ew ji hev didan bijenandin. Li ser van rewš û zînetên hanê de Xaçperestan daxwaza lihevhatinê dane bikirin, ku bi mercê rêya vegerê ji bona wan ve bête bidan û Serdana Hecanên wan ji Qudsê bête bihištin. Lihevhatin hate bigêrdan û Xaçperst hatin bivegerandin.

Li dawîya vêna de, ku heraya hatina Xaçperestên Šešem hate birîn, ewende pê neçû, ku di nava Kurên Melek Adil de šerê navmalîyê date bidestpêkirin. Melek El-Muezem Îsa Serdarê Surî li ser Birayê xwe de hate wergerandin. Wî çavên xwe ji bona ser Textê Misrê datin biavêtin. Ew ligel Cela El-Dîn Xwarzim šah de xerîk bû, ku ew ligel wî de bête bilihevhatin.

Gava ku Melek Kamil evaya bihîst, ew zor sexlet bû. Di vê navê jî de Fridrîke duwemî Šahînšahê Elmanî bi Leškerekî gewre ve rûwê xwe ber bi Misrê ve dabû bivedan. Melek Kamil neçar bû, ku ew maweyekî ligel Šahînšahê Elmanî de gitf û goyê bide bikirin. Wî dixwest, ku ew lihevhatinekê ligel wî de bide bikirin.

Bi fermana Xwedê ve di wê navê de Melek El-Muezem Serdarê Surî di Zil-Qude sala 624 k. de hate bimirin. welatê wî ji bona Melek Nasir Dawidê Kurê wî hatibû bicîhiştin. Melek Kamil ji vê zîneta hanê ji xwe re sûd date biwergirtin u ew bi Leškerekî ve ji bona ser Šamê çû. Melek Ešrefê Birayê wî ji wî layî de xwest, ku ew yarmetîya Melek Nasir bide bikirin. Belam di dawî de ew jî ligel Melek Kamil de hate birêkkevtin û wan bi hev re Šam dane bigirtin. Melek Kamil biramber bi Hinekan ji welatên Cezîrê ve welatê Šamê bi Melek Ešref di sala 626 date bidan. Melek Kamil Kerk, Šobek û Hin ji kelehên dinî ji mayînên welatê Šamê ji bona Melek Nasir Dawid dan[208].

Melek Kamil li dawîya cî bi cîkirina îš û karên Surî de wî ruwê xwe ber bi Cêzirê-Mêzoptamya ve date bivekirin. Ji bona berbestkirina lafawên Xwarzemî û Mengolan wî ev welatê hanê date birêkûpêkxistin. Wî hin cîgeh jî dane bigirtin, yên ku ew bi destên vî u wî de bûn. Wî Husin Kurd bi maldarî ve ji bona Kurê xweyî mezin Necim El-Dîn date bidiyarîkirin û wî ew bi Serdarî ve ji bona ser Cezîrê ve date bidanîn. Di wê navê de wî alîkarîya Necim El-Dîn Eyubîyê Kurê xwe bi Leškerekî ve ji bona girtinên sipahên Xwarzimiyî ji hev bela wela date bikirin, da ku ew bituwanin li beramberî lehîyên Mengolan de berbestîyê bidin bikirin.

Di sala 629 k.- 1229 z. de Šahînšahê Elemanî Firidrik bi Surî ve hate bigihaštin. Di navbera Šahînšah û Melek Kamil de gift û goyê ji bona lihevhatinê di nava van rojan de bi payînê ve hat. Li gora vê lihevhatina hanê de Qudsa human ligel Nasire bi dorhêla wê ve û ji Aka tanî Yafa jî bi perçakî ji Kenar jî bi rengekî demî ve ji bona nava destên Šahînšahê Elmanî Firidrik ve hate bikevtin û bi beramberî vê jî ve tanî derbasbûna Deh salan, Šeš Mehan û Deh Rojan waz li šer û cengê de tête anîn. Li layekîtir jî de Šahînšahê Elemanî divabû, ku ew berbamber bi hemû Dujminên Melek Kamil ve yarmetîya wî bide bikirin. Bi kurti ve vê Peymana hanê ne Musulman û ne jî File dane bidilkirin. Šahînšahê Elemanî jî zor pê neçû, wî Felestîn date bicîhištin û ew ji bona Elemanya hate bivegerandin.

Li dawîya vê lihevhatinê de zor pê neçû, ku di navbera

[208]Tarix El-Islam El-Musewer dibêje, ku Melel Kamil kelehên Heran, Ruha û Reqayê bi Melek Nasir Dawid ve dan. Belam li gora rûdanên tên, evaya rast nayête biderkevtin.

Melek Kamil û Melek Ešrefê Birayê wî de ligel Šehrîyarê Romêyî Selcoqî de têkçû. Šehrîyar Kîqibadê Selcoqî bi leškerekî ve xwe ji bona ser Jorî Cezîrê di sala 631 k. de date rakišandin û ew ligel leškerê Eyubî de bi šer ve hate bikevtin. Di pêšî de biserkevtin ji bona Leškerê Silcoqî bû û wan hin cîgeh ji Mulkên Eyubî dane bidagîrkirin. Belam ew bi wan ve nehate biparastin. Dawîya van šer û cengan bi mirina Šehrîyar Kîqubad ve hate birîn. Leškerê Silcoqî ji xakê Eyubî di sala 633 k. de hate biderkirin.

Xwešbûna di navbera Melek Kamil û Melek Ešrefê Birayê wî de ewende neda bidirêjkirin. Melek Ešref dijî Birayê xwe ligel Gewreyên Eyubîyî din de vîlikek date gerandin. Gava ku Melek Kamil evaya bihîst, wî bi leškerekî Misrî ve dest bi pêškerîyê ve date bikirin û wî ruwê xwe ji bona welatê Šamê date bivedan. Belam li pêš bidestpêkirina šer ligel Melek Ešref û Hevalbendên wî de Melek Ešref li bajarê Šamê de di 4 Muherema sala 635 k. de hate bimirin. Bi vî rengî ve bajarê Šamê bi bê šer ve bi destên Melek Kamil ve hate bikevtin. Belam beramberî berdestbûna bajarê Šamê wî Balebek û Bûsra ji bona Melek Salih Ismaîlê Birayê xwe pê dane bisipartin.

Melek Kamil di dawîya vê kamwerîya xwe de bi çend Mehan ve li Šarê Šamê de di 21 Receba sala 635 k.- 8 Avdara sala 1238 z. de hate bimirin.

## Nîšan û Rûçikên wî

Melek Kamil bêguman Serdarekî zor baš û hinermend bû. Ew xwedan nîšanên berz u bilind bû. Çi di meydanên ceng û šer de û çi di warên kar û barên siyasî de ew zor wirya û šehreza bû. Bi mirina wî ve sernešîvbûna serdarîya Eyubî date bidestpêkirin. Ew li bal Rišardê Šêrdil bi Cengawer-Šuwalê hatibû biwergirtin. Di warên zanistîyê, zanebûn û avanîyê de ew li ser šûna Bav û Mamê xwe de diçû. Hin ji Šopên wîyî baš di rêkxistina kar û barên avdana Misrê de têtin bidîtin. Ew di wî karî de gelekî xerîk bû. Di zemanê wî jî de bixurtkirin û sengînkirina keleha Qahire hate bidawîkirin.

Bi rasti jî berdestkirina Qudsa human û hin Cîgehên din ji bona Šahînšahê Elemanî bi diyarî ve cihê gilî tête bidîtin. Belam li pêš vê de divê berî ku Mirov bîr û bawerîyeke bi carekê ve di vî warî de bide

biderxistin, divê Merov bi çavekî hûr û kûr ve zînet û rewša siyasîyî taybetîyî wî zemanî bi ber çavên xwe bide bixistin. Herwehajî divê ku mero Zînet û zikrešiya Birayên wî jî li ber çavên xwe de bide bidanîn.

## Melek Adilê duwem

Li dawîya mirina Melek Kamil de Gewreyên Eyubî Melek Adilê duwem, yê ku ew Kurê biçûkî Melek Kamil bû, bi Šehrîyar ve dane bidazanîn. Weha ev Šahzadeyê hanê çi jiber biçûkî ve û çi jî jiber bê karyê ve karîbûna wîyî serdarîyê nebû. Di vî barî de mafe li layê Melek Necm El-Dînê Birayê wîyî gewre bû, yê ku ew di wê navê de Serdarê Cezîrê bû. Di gava ku ew di dorlêpêçana Ruhayê de xerîk bû, xebera mirina Bavê xwe zanî. Wî waz li dorlêpêçanê de date anîn. Wî xwest, ku ew ji wêderê de ji bona Surî bête bivegerandin. Belam ji niškêve ew tûšî serhildana hinên Ji sipahên Xwarzimî di nava Leškerê xwe de bû. Wan xwestin, ku ew wî bidin bigirtin. Her çilo bû, wî xwe date birizgarkirin û wî xwe ji bona Sincarê date bigihandin.

Gava ku Bedir El-Dîn Lulu Xwedîyê Musilê eve zanî, wî xwest, ku ew vê kêsa xwešî hanê ji nava destên xwe ji xwe re ji bona binabûdkirina Mîr Necim El-Dîn nede biberdan; jiber ku ew Yekek ji Dujminên wî bû. Wî bi Leškerekî xurt ve xwe ji bona dorlêpêçana ser Šingalê date rakišandin.

Belam bi saya serê Wezîr û Qazîyê wîyî Šehreza, Hišmend û bi rabûn û rûniština xweyî nerm ve di navbera wî û Xwarzimîyan de hajbûn hate bilidarxistin. Bi yarmetîya sipahê Xwarzimîyan Leškerê Bedir El-Dîn Lulu zor xerab hate šikenandin. Ji wêderê de wî ruwê xwe ber bi Diyarbekrê ve date bivedan. Wî Šehrîyarê Romê jî li dorhêla keleha Diyarbekrê de date bišikenandin. Wî welatên Cezîrê dîsan ji bona jêrdestî û serdarîya xwe datin anîn.

Di sala 636 k. de Serdarê Šamê Melek Cewad Yunis ji bona Mîr Necim El-Dîn veguhertina welatê Šamê bi Sincarê, Reqa û Ane ve ji welatên Cezîrê jê re date bipêškeškirin. Mîr Necim El-Dîn nexwest, ku ew vê kêsa vê veguhertinê ji nava destên xwe bide biberdan û wî ev veguhertina hanê date biwergirtin.

Wî Toranšahê Kurê xwe bi ser Cezîrê ve date bicîhištin. Heran, Ruha û hin çigehên din jî wî ji bona Fermandarên Xwarzimî datin bidan.

Wî bi leškerekî ve ruwê xwe ber bi Sûrî ve date bivedan û wî Šam jî date bigirtin
Melek Adilê duwem û Mîr Dawidê Amozayê wî Serdarê Kerk bihev re dabûn bibiryardan, ku ew bi hev re ji bona ser Melek Necem- El-Dîn biçin. Di wê navê de hin ji Gewreyên bi nav û bangên Fermandarên Lešker ji reftara Melek ligel wan de jê hatibûn bitûrekirin û ew ji bona nik Melek Necim El-Dîn hatibûn. Herwehajî Mîr Dawidê Kurmamê wî jî dixwest, ku ew ji bona nik wî bi mercekî ve bê, ger ku ew Šamê pê bide bidan. Belam Melek Necim El-Dîn ev daxwaza Kurmamê xwe date binayînkirin. Amozayê wî Mîr dawid dîsan xwe bi ser Melek Adilê duwem ve date badan.

Di sala 637 k. de Melek Necim El-Dîn ji bona bizeftkirina Misrê xwe date bilikarxsitin. Ew bi Pênc hezar Kes ve ji Šamê hate helsandin û ew ji bona Nablisê çû. Melek Necim El-Dîn xwest, ku ew bizanibe. Magelo bi rastî ve Melek Ismailê Apê wî dixwaze yarmetîya wî bide bidan yanjî na? Çunke, Vî Apê wîna pir jê re Šelafî didan bikirin. Bi peyvê ve wî hîç kêmasîyek nedida bihištin. Belam di bin re vî Mamê hanê ligel wî de bêbextî dida bikirin. Li jêr de wî legel Mîrê Humsê de dida bipeyvînkirin, ku ew bi hev re Serleškerên Melek Necim El-Dîn bi pir sozên cudan ve dijê wî bidin birakirin. Ew bi hev re bi vê mesta xwe ve hatin bigihaštin. Ji niškêve Leškerê Necim El-Dîn di Nablusê de xwe ji dorhêla wî date bidûrkirin. Melek Necim El-Dîn li wêdrê de bi tenha xwe ve hate bicîhištin.

Gava ku Mîr Dawidê Serdarê Kerk evaya bihîst, ew bi leškerekî ve ji bona ser nablusê hat û wî Melek Necim El-Dîn date biradestkirin. Wî ew ji bona Kerd date binardin. Herçenjî de Melek Adilê duwem jê date bidaxwazkirin, ku ew wî jê re ji bona Misrê bide binardin. Lêbelê wî ev daxwaza wî date binayînkirin.

Di navê de dema Peymana di nava Melek Kamil û Šahînšahê Firidrikê Elemanî de hate bidawîkirin. Belam Firengan nedixwestin, ku ew Qudsê li gora Mercên wê Peymanê de dîsan ji bona Musulmanan bidin bivegerandin. Mîr Dawid bi serê xwe ve rabû û ew bi Leškerekî ve ji bona ser Qudsê çû. Li paš dorlêpêçaneke bîst û yek rojî de di Cemada yekem de di sala 637 k. de wî Quds date bizeftkirin. Wî hemû xurtkirin û sengînkirinên bajêr ji bal Ferengan ve datin bitêkûpêkdan.
Carekedin ji nû ve Felekê ruwê xwe bi gešbûn ve ji bona Melek Necim El-Dîn date bivekirin. Gift û goyên di navbera Mîr Dawid, Melek Ismail û Melek Adilê duwem de ser negirtin. Li ser navcîtîya Mîrê Hema de

Melek Necim El-Dînê Eyubî û Mîr Dawid hatin birêkkevtin. Herduyan li Qudsê de di navbera xwe de peymanek dane bigirêdan. Li gora vê Peymana hanê de divabû, ku Misir ji bona Melek Necim El-Dîn bête bidan û Surî û welatên Rojhilat jî ji bona Mîr Dawid bêtin bihištin.

Vê lihevhatina hanê di navbera Mîr Dawid û Melek Necim El-Dîn de Melek Adilê duwem date bitirsandin. Destbicî wî ferman bi Melek Ismailê Mamê xwe ve date bidan, ku ew ji bona ser Morkirvanên wê peymanê bête çbiûyîn. Melek Adilê duwem jî bi xwe ve ligel Leškerê xweyî Misrî ve berê xwe ber bi Felestînê ve date bivedan. Li Banyasê de wî Ordugahê xwe date bidamezirandin. Bešekî gewre ji Leškerê wî Memluk bûn, ku ji wan re Ešrefiyê pê dihate bigotin, jiber ku ew bi navê Ešrefê Birayê Melek Kamil ve dihatin bigirêdan. Ew ji Melek Adilê duwem dilšikestî bûn. Ew li Ordugah de ji bona ser wî çûn û wan ew date bigirtin. Wan ew ji Šehrîyarîyê datin bixistin. wan ew ji bona Qahire datin binardin û wan ew li wêderê de datin bizindankirin[209]. Li paš çend rojan de Padšahîya Misrê ji bona Melek Necim El-Dîn hate biveguhestin.

[209]Melek Adilê duwem Bavê Bekir tanî sala 645 k. de di wê zindanê kelehê de hate bihištin û ew di vê mêjûwê de di wê zindanê de hate bidarvekirin.

## Melek El-Salih Necim El-Dînê Eyubî

Ew Kurê Gewreyî Melek Kamil bû. Ew di sala 603 k. de hate bizayîn. Ew di sala 625 k. de ji bal Bavê Xwe de bi Šungîr ve hate bidanîn. Belam bi kêr û buxtanên Dayika Melek Adilê duwem ve ew jiber çavên Bavê xwe ve hate bikevtin û ew ji Misrê hate bidûrkirin. Mîna ku me li Jor de date bixuyanîkirin, ew zor tûšî ezyet û janê bû. Belam di dawî de ji bêkêrî û bêkarîya Melek Adil Bavê Bekir ve bext bi firyada wî ve hate bigihaštin. Li dawîya daxistin û bizindakirina Melek Adilê duwemê Melek El-Salih Necim El-Dînê Eyubî ji bona Misrê hate bibangkirin û li wêderê de di sala 637 k.- 1240 z. de Sehrîyariya wî hate dazanîn. Zor pê neçû, Šehrîyarîya Melek Salih Necim El-Dîn ji bal Xelîfê Begdadê pê hate birûništin.

Weha bi vî corî ve bê šer û hera Misir ji bona Melek Salih hate bisaxkirin. Herwehajî welatên Rojhilatî Kurdistanê jî bi alîkarîya Toranšahê Kurê wî ve li jêr gerandineke pirî baš û bi rêk û pêk ve dihatin bidîtin. Bi tenha ve Surî di navbera šer, šor û pevçûnên Gewreyên Eyubiyan de sergêj û serêš mabû. Heger ku ev welatê hanê jî ji bona wî bihata bisaxkirin, dê bi carekê ve šan û xurtbûna zemanê Šehrîyar Selah El-Dîn bi endazekî nuh ve bihata bivegerandin.

Tištî ku Melek Necim El-Dînê Eyubî dida bisexletkirin, Peymana Qudsê bû, ya ku ew di navbera wî Mîr Dawid de hatibû bigirêdan. Bi rastî jî bi destê wî ve nediçû, ku ew Surî bi destên Mîr Dawid de bide bihištin. Bi xwe jî Peymana Qudsê di navbera wan de li jêr tengavî û givaštinê de hatibû bimorkirin. Jibervejî ewende hêjabûna wêyî Mafeyî û Sîncî ne bû. Melek Salih Necim El-Dînê Eyubî bi vê reman û bawerîya hanê ve hilanîna vê Peymanê date bidazanîn. Bi xuyanî ve wî Mîr Dawid jî bi sozê bidanîn Serdarê Šamê ve pê date bigihandin.

Melek Salih sala xweyî duwayî jî ligel rêkxistina îš û karên Misrê de date birabuhurandin. Wî Bedewîyên Joriyî Misrê bi xurtî ve dane biserjêrkirin. Serok û Šêxên wanî serhildayî dane bigirtin û Mulk û Malên wan bi ser Hevalbendên xwe ve date biparvekirin. Di wê Salê jî de wî di nava Girava Rewde de di nava Çemê Nîl de Serayek ji bona xwe û Qišleyek ji bona Hevalbendên xwe date bidurustkirin.

Di wê Salê bi xwe de Melek Necim El-Dî ligel Dujminên xweyî xwemalî de têkçû. Mîr Dawid li dawîya hilanîna Peymana Qudsê de baš

hate bitêgihiŝtin, ku Ŝehrîyar Necim El-Dîn meydanê pê nade bidan, tanî ku ew desthilatîya xwe bide bizorkirin. Herwehajî Mîr Necim El-Dîn Ismailê Mamê Ŝehrîyar Necim El-Dînê Eyubî jî jiber bêbextîya wîyî pêŝî ve ligel Pismamê wî de tirs û lerzê date bigirtin. Wî wer dizanî, ku Ŝehrîyar dê Ŝamê jî ji nava destên wî bide bihilanîn. Li Rojhilat-Cezîrê- jî de Bedir El-Dîn Lulu Serdarê Musilê desthilatîyeke zor ji xwe re dabû bipeydakirin. Wî Ŝarê Amed ji Toranŝahê Kurê Ŝehrîyar Necim El-Dî dabû bizeftkirin. Ji bil Hesen Kêf û keleha El-Haêm pêve cîgehekî din wî di destên wî de nehiŝtibûn.

Di dawî de Mîr Dawid û Mîr Ismailê Xwedanê Ŝamê dijî Ŝehrîyar Necim El-Dîn ligel Firengên Felestînê de hatin birêkikevtin, ku ew welatên Teberîya, Seqîf Arnon û Sefed, yên ku ew ji bal Ŝehrîyar Selah El-Dîn hatibûn bivekirin, ji bona Ferengan bidin zîvirandin. Herwehajî destûr ji bona wan hate bidan, ku ew ji xwe re Çekan ji Ŝamê bidin kirîn.

Bi kurtî ve di navbera Mîrên zikreŝ û dilbijokên Eyubî û Firengan de ji bona nabûdkirina Ŝehrîyar Necem El-Dîn de peymanek hate bigirêdan. Destbicî ji bona bicîanîna bernameya xwe wan xwe dane bilikarxsitin. Ser û binê vê gelacîya hanê Mîr Necim El-Dîn Ismailê Mamê Ŝehrîyar Necim El-Dînê Eyubî bû. Di dema xwe de dîsan vî Mîrê hanê her bi fen û xapandinê ve Ŝam ji Melek Cuwad Yunis date bisitendin, yê ku ew ji tirsa wî ve ji bona nik Firengan date bibazdan. Mîr Ismail ji vê Peymanê û têkelîya wî ligel Firengan de sûd date bigirtin. Wî çend Pere ji bona Firengan date binardin û beramber wî ji wan Melek Cewad Yunis date biwergirtin. Wî ew bi hovîtî ve date bikuŝtin.

Bi kurtî ve ji bona ruxandina binaxeyê Ŝehrîyarîya Eyubî Dawid û Ismail pîsîtîyeke mezin dane bikirin. Tanî radeyekî li jêr de wan xeber ji bona Firengan datin binardin, ku Dîlên Musulmanan li Ŝeqîf û Aron de dê serên xwe bidin bihildan. Gava ku Xwîngermên Firengan ev xebera hanê datin bizanîn, wan hemû Berdestvanên Musulmanan dane bihelgirtin û ew ji bona Eka dane biveguhestin. Li wêderê de wan ew hemû dane bikuŝtin.

Li dawîya navekê de leŝkerê Firengan ligel Dawid û Ismail de bi hev re ruwên xwe ber bi Leŝkerê Ŝehrîyar Necim El-Dîn ve dane bivekirin. Di navbera Xeze û Esqelan de herdu Leŝker berngarî hevdû hatin bikirin. Ŝerekî qurs u bi tîn ve di nava wan de hate bidadan. Di wê gavê de leŝkerê Musulmanên li jêr Rêberîya Mîr Ismail de xwe jê dane bicihêkirin û ew tevde ji bona layê Ŝehrîyar Necim El-Dînê Eyubî de çûn. Di Encam de Hevalbend zor xerab hatin biŝikenandin. Gelek ji Firengan bi dîlî ve

hatin bigirtin û ew neçar bûn, ku ew ligel Šehrîyarê Misrê de hajbûnê bidin bikirin. Leškerê jî ji bona welatê xwe hate zîvirandin. Bi hoyê dûr-kevtina Šehrîyar Necim El-Dîn ji Surî ve di sala duwayî de Firengan ligel Mîr Dawid de bi hin šerên biçûk biçûkî xwînavî ve hatin bipêrabûn.

Di sala 641 k. de di navbera Šehrîya Necim El-Dîn û Mîr Ismail de gift û goyên lihevhatinê hatin bidestpêkirin. Bingehên van gift û goyên lihevhatinê evanan bûn: Ku Mîr Ismail Melek Xeyas El-Dînê Kurê Šehrîyar Necim El-Dîn[210], yê ku ew li bal wî de radest bû,bide biberdan û ew xwe bi Bestvanê Necim El-Dîn bide binasîn û Pevdarîya Roja Înê bi navê wî ve bide xwendin. Belam Mîr Ismail xeber bi ber guhên wî ve hate bikevtin, ku Šehrîyar Necim El-Dîn bi dizî ve Xwarizimîyan li ser wî de dide bihandan. Bi hoyê vê ve wî gift û go ligel Šehrîyar Necim El-Dîn de date birîn.

Di dawîya vê Salê de Ismail û Dawid ligel Firengan de Peymaneke dawî dane bigirêdan. Li ser bingehê vê Peymanê de wan destbikišandê ji Bešê zorî Felestîn ligel Qudsa human û hin Cîgehên dinî perestî Musulmanan de dane bidestpêkirin. Di sala 641 k. de Mîr Dawid, yê ku ew Dujminekî zorî noyî Firengan bû, neçar bû, ku ew Zinar û Zengoyê Buraqê Pêxember di Mizgefta El-Eqsa de ji bona Firengan jî bide biberdestkirin.

Šehrîyar Necim El-Dîn berامber bi van Dujminên Hevalbendan ve Xwarzimîyan bi heware xwe ve dane bianîn. Bi rastî jî Leškerê Xwarzimîyan di duwayî sala 642 k. de li ser rêya xwe de Qudsa Human dane bizeftkirin. Wan di wan navan de wêrankirinên pir mezin dane bikirin. Šehrîyar Necim El-Dîn jî ji Misrê ve Leškerek ji bona yarmetîya Xwarzimîyan date binardin. Îsmail jî Leškerek ji bona hewara Firengan date binardin. Herdu Leškeran jî li Xezê de šerekî zor germ û giran bi hev re datin bidadan. Kamwerîya bi carekê ve bi destên Leškerê Xwarzimîyan û Misrî ve hate bikevtin. Leškerê Xwarzimîyan talankirineke bêjimar û sînor dane bikirin. Li dawîya vê kamwerîyê de Leškerê Misrî Qudsa Human[211] û Felestîn di sala 642 de datin bileyandin. Ev welatê hanê ji

[210]Ev Šahzadeyê hanê di dema çûna Šehrîya Necim El-Dîn ji bona Nablusê bi Dîlîtî ve ji bona nava destên Ismail hate bikevtin.

[211]Qudsa Human di pêla bêhêzbûna Xelîfê Ebasî de di nava destên Silcoqîyan de hatibû bikevtin. Xelîfê Mustensirê Bil-Lahê Fatimî di sala 439 k. de Qudis ji Silcoqîyan date bisitendin. Li dawî de di sala 492 k. de Firengan ew date leyandin.

destpêka vê mêjûwê de tanî sala 1336 k.- sala 1918 z. de di destên Musulmanan de hate bihiştin. Mîr Dawid bi tenya ve Kerk, Selt û Eclun pê hate biparastin.

Leşkerê Misrî li bajarê Şam jî de date bidorlêpêçanîkirin. Vê dorlêpêçanîya hanê zor dirêjî date bikişandin. Inca di sala 643 k. de Ismail hate biberdestbûn. Beramber bi Şamê ve Balebelk, Busra û hin pêvekirinên wê ji bona Ismail hatin bidan.
Li dawîya vê kamwerîya hanê de Xwarzimiyan temayeke gewre dilê wan date bigirtin. Belam çunke, ku ew bi destkevtinên destên xwe ve nehatin bitêrkirin, ew ji bona nava Leşkerê Ismail û Dawid hatin bikevtin. Bi fermana wan ve wan li bajarê Şamê de dor lêdatin pêçandin. Ji bal Komandarekî Eyubî de tanî pêşîya sala 644 k. de bi bênimûne ve li ber Şamê de bi qehremanî ve hate bidan. Mîrê Heleb û Hemayê tanî wê demê jî Hevalbendîtiya Şehrîyar Necim El-Dîn nedane bikirin. Belam wan ji bona xatirê birîna şer û wêrankirinên Xwarzimiyan Leşkerên xwe ji bona ser wan dane binardin. Xwarzimîyan neçar bûn, ku ew waz li dorlêpêçana Şarê Şamê de bidin anîn. Ew ji bona pêrgîbûna Leşkerê Helebê çûn û ew li Qeseb de (dibe ku ew Qesîr be, M. E.) tûşî wan bûn. Şerekî giran û bi tîn ve di nava wan de hate bigerandin. Xwarzimî zor xerab hatin bişikenandin. Yekek ji Serleşkerê wanî gewre hate bikuştin û yên din neçarî duçarî bazdanê hatin bikirin. Mîr Ismail jî xwe ji bona Helebê date biavêtin û Mîrê Helebê Yusifê duwem ew date biparastin. Belam Balebek ji destên wî çû û ew bi destên Şehrîyar Necim El-Dînê Eyubî ve hate bikevtin. Zarok û Pîrekên wî jî hatin biberdestkirin û ew ji bona Qahire hatin binardin. Mîr Dawid jî ji bil Kerk ve hemû Mulkên wî ji destên wî çûn. Wî jî ji bona Helebê date birakirin. Wî Kurekî xweyî gelekî biçûk bi ser Kerk ve date bicîhiştin.

Mîrê Helebê zor riqê wî Li Şehrîyar Necim El-Dînê Eyubî de dihate helsandin. Ji bona liberxwedana Mulkên xwe ve beramber bi Şehrîyar Necim El-Dînê Eyubî ve wî xwest, ku ew Humsê jê bide bizeftkirin. Wî Leşkerê xwe ji bona ser wî Bajarî date binardin. Li dawîya Du Mehan de ji dorlêpêçanê de wî ew ji Mîr Eşref di sala 646 k. de date bidagîrkirin. Şehrîyar li ser van destdirêjîyên Nasir Yusifê duwem de zor

Heft rojan wan têde bikuştina gistî datinbi lidarxistin. Di Mizgefta El-Eqsa de wan Not hezar Kes dane bikuştin. Di sala 538 k. de Şehrîyar Selah El-Dîn ew date birizgarkirin û ew bi destên wî ve hate bikevtin.

hate bitûrekirin û ji bona šerê wî ew ji bona bajarê Šamê hat. Wî Yekek ji Serleškerê xwe ve bi Leškerekî ve ji bona ser Humsê date binardin. Pištî bigihandina wîna ji bona Šamê bi ber guhên wî ve hate bikevtin, ku hatina Xaçperestên Heftem di bin Rêberîya Liwîsê heftemî Padšahê Firensa de berên xwe ber bi Domyatê ve dane bivedan. Vê rûdana hanê pê date bineçararkirin, ku ew binavcîtîya Xelîfê Begdadê ligel Nasir Yûsifê duwem de bi lez û bez ve bête lihevhatin. Li dawya vê lihevhatinê de tevî li nexwšîya wîyî giran de ew li ser darbestê de ji bona Ašmunen hate biveguhestin. Belam tevlivêjî de wî tuwanîbû, ku ew Xaçperestan bide biderkirin û Domyatê jî bide bivegerandin. Çunke, li dawîya nexweškevtina wîna de best û girêdana di navbera Leškerê wî de hatin bisistkirin. Herwehajî Bediwên ji Ešira Kenane de, yên ku wan hin ji cihên nêzîkî meydana šer de parastina wan bi ser hustuwên xwe ve dabûn hiladn, gava ku wan zanîn, ku ew cîhanan ji bal leškerên Šehrîyar de hatine bicîhištin, destbicî bi nemerdayetî ve ew deverên hanê dane bitalankirin û jê wan dane bibazdan.

Šehrîyar Necim El-Dîn demeke kêm li pêš mirina xwe de li zîneta Kurên Mîr Dawid de bi çavekî dildarî date bitemašekirin. Bi rastî jî gava Kurê Mîr Dawidî Gewre dît, ku Bavê wî Birayê wîyî Biçûk li cîgehê xwe de bi Serdarê keleha Kerk ve dayite bidanîn. Ew bi Leškerekî ve ji bona ser Birayê xwe çû û wî ew date biberdestkirin. Ew bi lez û bez ve ji bona layê Šehrîyar Necim El-Dîn hate bivegerandin û wî keleha Kerk jê re date bipêškeškirin, bi hêvyîa ku ew cîgehekî tir ji bona wî biramberî Kerk jê re bide bidan. Šehrîyar Yekek ji Serleškerên xwe bi Leškerekî ve ji bona leyandina kelehê date binardin.

Šehrîya Necîm El-Dînê Eyubî di 15 Šubana sala 647 k.- 23 Çirya duwem de sala 1249 z. de hate bimirin.

## Armanc û Šopên wîna

Armanca berzî pîrozî vî Serdarê hanê di pêkanîna Dewleteke xurtî bihêz mîna dewleta Šehrîyar Selah El-Dîn û Bavê wî Melek Kamil de li Misir, Felestîn, Surî Cezîrê de dihate bidîtin. Bi cudabûneke zor kêm ve ev armanca wî di dawîya Šehrîyarîya wî de hate bicîhatin. Bes û bi tenha ve Mîrnešînîyên Heleb û Musil li jêrdesthilatîya wîna de biderbûn.

Melek Necim El-Dîn ji bona yadkirina xurtbûn û Kêra xwe Leškerekî Memlukî date bipeydakirin[212]. Ev hêza Çekdar di zemanê xwe de bi rastî jî zor kar û bikêr bû. Belam ev hêza Çekdarîyî Bêgane mîna hemû Hêzên Çekdarîyên hempayên xwe di mêjûwê de li dawî de bi hoyê linavçûna dewleta Eyubî ve li Misir û Šamê de hate bikirin.

Melek Necim El-Dîn bi ser Karmend û Serleškerên xwe ve saweke zor hebû. Hîç Yekekî ji wanan di civata wîna de nikarîbûn bidana bipištkirin, yanjî jê bidana bipirskirin.

Vî Melekê Gewre ji bona avanî û avedanîyê zor karên giring û giran dane bikirin. Koškên Rewde, Koškên Kebišê û Dibustanên avakirî hemû nimûneyên karên wîyî zorî bilindin. Bicke li vanan jî bajarê Salihîyê jî wî date bidurustkirin. Mebesta wî ji avanîya vî Bajarî bû, ku ew wî nala kelehekê li ser sînorê Rojhilat de bide bilidarxistin.

---

[212]Ev Memlukên-Kolemendên hanê sipahê taybetîyî Šehrîyar Necim El-Dîn bûn. Ji wan re Kolemendên Derya dihate bigotin. Hemûyan Koleyê Çerkesî û Gorcî bûn, yên ku ew bi peran ve hatibûn kirîn. Ew li nav Çemê Nîl de di Girava Rewde de di Qišleyeke taybetîyî xwe de dihatin bijîyandin.

Li zemanê Šehrîyarê Kolemendan Qelawin de Desteyekî din ji van Kolemendan hate bipeydakirin û bi Burcî ve hatin binavkirin; jiber ku ew di hundurê Burcên keleha Qehire de dihatin bijîyandin.

Bešê yekem dewleta Eyubî li Misir û Surî de ji sala 648 tanî 792 k. de date dagîrkirin. Bešê duwem Šehrîyarîya Kolemendên Derya date bilinavbirin û wan tanî pêla bikevtina Šehrîyar Selîmê yekemî Osmanî ji bona Misrê di sala 922 k. de date biserdarîkirin. Ew ji bal Selîmê yekemî Osmanî de hatin binabûdkirin.

## pêla Šehrîyarîya Toranšah

Ew Kurê Melek Salih Necim El-Dînê Eyubî ye. Di gava Mirina Bavê xwe de ew Serdarê Cezîrê û Kurdistanê bû. Hêšta li zemanê Bavê xwe de û di šer û merên Bedir El-Dîn Luluyê Xwedanê Musilê û Šehrîyarê Silcoqîyî Romê de li îš û karên Serdarîyê û Serpereštiyê de pê hatibû bigihaštin. Di hunera cengînîyê de wî nav û bangekî gewre ji xwe re dabû biwergrtin.

Gava ku wî xebera mirina Bavê xwe date bibihîstin, destbicî ve ew hate helsadin û wî ruwê xwe ber bi Misrê ve date bivedan.

Šeceret El-Dure Jinbava wî Jineke zor têgihištî û hišmend bû. Tanî gihiština Toranšah ji bona Misrê wê mirina Melek Necim El-Dîn dabû bivešartin. Gava Toranšah bi Misrê ve hate bigihaštin, destlicî de ew ji bal Gewre û Serleškerên Eyubî de hate helbijartin û ew bi Šehrîyarî ve hata bidazanîn.

Tanî wê demê jî Leškerê Xacperestan di bin Rêberîya Sin Liwis de Domyat dabûn bidagîrkirin û wî ew ji xwe re bi Sernavînîya Wargeha Cengê ve dabû bidanîn. Li dawîya hatina yarmetiyê jê re ji bal Ingilîz û Firensan ve wî ruwê xwe ber bi paytextê Misrê ve date bivedan. Armanca pêšîyî Xaçperestan bajarê Mensure bû.

Li dawîya gihiština Toranšah de ji bona Misrê destlicî de ew ligel komkirina Leškerekî û girawkirina liberxwedanê de xerîk bû. Xaçperestan bi sistîyeke sersûrandî ve inca di nava mehekê de ji Domyatê bi bajarê Mensure ve hatin bivegihaštin. Toranšah ji sistî û teralbûna Xaçperestan kar ji xwe re date biwergirtin. Wî Leškerekî baš date bikomkirin û li layekîtir jî de wî Bajarokê Mensure pir bi bašî ve date bixurt û bisengînkirin.

Di vê navê jî de Leškerê Elemanî jî ji bona yarmetîya Xaçperestan hatibû bigihaštin. Ev Leškerê gewreyî Xaçperestan bi Mensure ve hatin bivegihaštin û bi bêguhpêdan bi xurtkirin û sengînkirina wêna ve wan lê datin bidorlêpêçandin. Avhilatina Rubarê Nîlê bernameya Sîn Liwis date bitêkûpêkdan. Bi fermana Toranšah ve pir û avbendên di navbera Mensure û Qahire de hatin bišikenandin. Lafawên avê li hemû layekî de Ordugeha Xaçperestan li ber xwe date bidan. Rêya vegerî li wan de hate birîn. Li layekîtir jî de Leškerê Toranšah li hemû alîyekî de gêre li ser serên Leškerên Xaçperestan date bilidarxistin û çûn û hatina wan jî ligel

Domyatê de datin bibirîn. Wan ew tûšî birçîbûnê û nexwešîyeke zor xerab dane bikirin.

Li yekîtir jî de Toranšah bi karekî berz ve ji bona bizeftkirina Domyatê û birîna rêya derçûna Xaçperesta pê hate birabûn. Wî hin ji Gemîyan dane bijihevxistin û perçe bi perçe ve bi pišta Devan ve ji bona kenarê Derya Sipî ve dane bigihandin. Li wêderê de ji nû ve wî ew datin bilihevxistin. Bi vî rengî ve wî Desteyekî Keštîyên Cengînî baš li wêderê de date pêkanîn. Wî ew kert û pirt ji bona ser Domyatê datin binardin û pêwendîyên Xaçperestan ligel Evropa de datin bibirîn.

Bi kurtî ve li layekî de tengavîya leškerê Misrî û lafawên Šepolên pêlên avhilatina Rubarê Nîlê bi ser Firengan de û li layekîtir jî de birçîbûn û nexwešîyê Serdarê Leškerê Xaçperestan bi bivegerandinê ve date bineçarkirin. Di vê xwe vekišandina hanê de Leškerê Misrî zor ji Leškerê Xacperestan dane bikuštin û wî bi wan ve dane bigêrekirin û di dawî de wan ew di sala 647 k. de dane bidîlkirin. Sin Liwis jî bi xwe û Ala Perest ve, ya ku wî ew ji Dêra San Denîs de ligel xwe de dabû bihilgir, bi destên Toranšah ve hate bigir. Li dawîya dana seraneyekî heštsed hezar dînarên Zêr û berdestkirina Domyat de inca Sin Liwis xwe û Serleškerên xwe dane birizgarkirin. Wî Peymanek jî ligel Toranšah de date bimorkirin. Li gora vê Peymanê de divabû, ku ew destbicî ve xwe ji ser xakê Misrê bide kišandin. Wî ev mercê hanê date bicîanîn û ew ji bona Surî çû. Sê Salekî ew li wêderê de ma. Zîyanên Xacperestan di van šeran de bi bêtir ji Sî hezar Kes ji Šervanan ve hate bitexmînikirin. (Mealim Tarix El-Qurun El-Wista-Agehdarîyên mêjûwa sedsalên Navînî).

Li dawî birîna šer û merên Xaçperestan de Toranšah ji bona sazkirina best û bendeke Supahî di nava Leškerê Kolemendan de xerîkdar bû. Beše Deryayî ji hêza Kolendan, yên ku ew ji Kolemendên Bavê wî bûn, zor ew xwedser bûn û ew bi serên xwe ve bûn. Toranšah bi Leškerê Cezîrê ve pišt sitûr bû. Wî xwest, ku ew Kolemnendên Deryayî ji bona jêrbûna best û bendê bide bianîn. Vê remana Šehrîyar ji bona leškerê Kolemendan hišt, ku ew ji fermana wî bê biderkev û ew lê bêtin biwergerandin. Wan jê re tepek dane bidurustkirin û wan ew di sala 648 k. de dane bikuštin.

Hinek ji Mêjûvanan dibêjin, ku di vê tawankarîya hanê de destê Šeceret El-Dureyî Jinbava wî têde dihate bidîtin. Renge, ku ev peyva hanê rast bête bidîtin; jiber vê Afreta hanê jî çavên xwe ji bona Šehrîyarîyê dabûn biavêtin. Bi hesta Jinbavê ve û bi serûštî ve wê ji Toranšah nedida bihejkirin. Li layekîtir jî de pêwendîyên wê ligel van

Tawankarên Kolemendên Deryayî zor bi rêk û pêk bû. Hêjî bêtir wê li paš demekê de pištî biwergirtina Šehrîyarîyê bi Komandarê Kolenmendên Deryayî ve date bišûkirin, yê ku ew bi Eybik dihate binavkirin. Ca bi gora vêna ve hîç derew niye, ku bi rêk û pêkxistina vê tawankarîya hanê bi agehdarîya Šeceret El-Dur ve hatibe bilidarxistin.

Bi kurtî ve herçilo be, ji bedbextîya welatê Eyubî bû, ku ew ji Padîšahekî sert û qehreman û ji Serdarekî bi nav û bang ve bête bibêparkirin. Toranšah Šehriyarê dawîyî Eyubî bû, yê ku ew pir bi pêgîr, çîgir û cerg û hinav bû. Zore renge, ku dê wîna xemleke baš bi Šehrîyarîya Eyubî ve bida bidan. Belam Feleka bêbext û bêbextîya navxweyî qad pê neda dan. mêjûwê ji me re date biveguhestin, ku bes û bi tenha ve veguhestina Keštiyên Cengînîyê li ser pišta Hušturan de wê her ev li nik vî Serdarê hanê dayite bidîtin. Inca li dawîya Du Sed û Çar salan de Šehrîyarê Mohemedê Vekirvanê Turkî beramber bi Bedena Istenbolê ve ev karê hanê date bikirin[213]. Hîç gûman têde niye, ku Šehrîyarê Mohemedê Vekirvanê Gewre ji Toranšah hatibû bihînkirin.

Bicke livêjî de nabûdkirina Orduwê Xaçperestan û dîlkirina Qeralê Firensî jî bi saya šan, rûmet û gernasîya vî Serdarî ve hatîye bikirin.

## Payînbûna serdarîya Eyubî li Misrê de

Kolemendên Deryayî Serhildayî li dawîya kuština Toranšah de Šeceret El-Dure Jinbava wîna bi Padîšahî ve li ser Textê Misrê de dane bidanîn. Peyvdarîya Roja Înê bi navê wê ve dihate xwendin û Pûl jî bi navê wê ve hatin bilêdan. Li ser Pulên wêna de "El-Mustesimiye El-Salihe El-Meleket El-Muslimîn, Um Melek El-Mensur Xelîl- Rumetvana Qenca Padîšaha Musulmanan û Dêya Padîšahê Mensurê Xelîl" dihate bineqiškirin. Li dawîya dazanîna Padîšahîyê de wê Meez El-Dîn Eybek Serokê Kolemendên Deryayî bi Serleškerê Misrê ve date bidanîn

Šehrîyarîya Šeceret El-Dure zor neda bidirêjkirin; çunke, ku Gewreyên Misrê li ser nîšankirina Serdarekî ji nava Xanedana Eyubî de

[213](Evaya di sala 1453 z. de beramber bi vekrina Istenbolê de ji bal Šehrîyarê Muhememedê Verkirvane Gewreyî Turkî hate bikirin. Cuma).

sorbûn. Di dawî de Melek El-Ešref Musayê Xwarzayê Melek Kamil û Kurê Mîrê dawîyî Eyubî li Yemenê de li cîgehê Šeceret El Dure di sala 648 k. 5 Awgosta sala 1250 z. de bi Padîšahê Misrê hate daîn. Belam Serdarî û desthilatî di nava destên Mîr Meez El-Dîn Eybek[214] de bûn.

Li dawîya Salekê de Misir ligel Melek Nasir Yusifê Serdarê Helebê de têk çû. Vî šer û pevçunê Salekê di nava wan de date bidirêjkirin. Di dawî de Xelîfê Begdê Melek Nasir Yusif û Aybek di sala 652 k. de dane bilihevanîn.

Mîrê Kolemendên Deryayî û Serleškerê Misrî Meez El-Dîn Eybek di sala 653 k. de Serdariya xwe serbixwe li ser Misrê date dazanîn û wî Melek Ešref ji ser Textê Patîšahîyê date bidaxistin û wî ew ji bona nik Merevên wîna li Yemenê de date binardin. Bi vî rengî ve Šehrîyarîya Eyubîyî xurtî û binav û bang li Misrê de hate bipayînkirin û ew di dawî de ji bona nava destên Kole û Bendên wan hate biveguhestin. Vî karê siyasî û Supahîyî hanê bi hoyê linavçûna serdarîya Ebasî hate bikirin. Herwehajî wî karî jî serdarîya Eyubî li Misrê de date binabûdkirin. Bi her awayekî ve divabû, ku Melek Adil li pêš danîna bingehê Leškerê Kolemendan de bi hûr û kûrî ve temašeyî mêjûwa Xilafeta Ebasîyan ji xwe re bida bikirin û wî jê ji xwe re hînbûnên bi nerx ve bidana bigirtin.

---

[214]Xwedîyê Tarîx El-Islam El-Musewer Mîrza Mohemed Elî dibêje: "Aybek ji Axa Bek hatîye".

Belam ji hiš nedûre, ku ev Ay Bek bi têgihiština Mîrê Heyvê bête bidîtin.

## 2 . Serdarîya Eyubî li Helebê de (579-685 k. de).

Šehrîyar Selah El-Dîn cara yekem ev welatê Helebêyî hanê ji bona Zahir Xazîyê Kurê xwe date bidan, yê ku ew hêštajî Yanzdeh Salî bû. Li dawîya çend Mehan de wî serpereštîya vî Welatî ji bona ser milên Melek Adilê Birayê xwe date biavêtin. Di sala 582 k. de Šehrîyar ji nûve welatê xwe date biparvekirin. Wî Melek Adil bi Etabikê Melek Ezîzê Kurê xwe ve li Misrê de date bidanîn. Wî dîsan welatê Helebê bi Melek Zahir Xazîyê Kurê xwe date bidan û wî Deife Xatun[215] Keça Melek Adilê Birayê xwe lê date bimarkirin. Melek Zahir di jîyana Bavê xwe de her û her dilsozekî rast û durustê wî bû. Di hemû šerên Xaçperestan de wî ligel Bavê xwe de komek didan bikirin. Li dawîya mirina Bavê xwe de ew bi Melek Adilê Mamê xwe hate bigirêdan. Armanca berzî vî Mîrî bû, ku ew bilihevhatin tirazûwê hêza Serdarîyên Eyubî bide biparastin. da ku ew bikaribe liberxwedana xwe li ber hemû hêrîšan de bide bikirin, wî keleha Helebê zor bi sengînî ve date biavakirin û bixurtkirin. Melek Zahir di sala 613 k. de hate bimirin. Mehrevanê Xwedê li pêš mirina xwe de Melek Ezîz Mehmudê Kurê xweyî biçûkê Kurê Keça Melek Adil bi Pêhatîyê xwe ve date bidanîn. Mebesta wî jî ji vê jî bû, ku ew ji yarmetî û desthilatîya Melek Adil sûd ji bona mala xwe bide biwergirtin. Melek Ešref Musayê Kurê Melek Adil Fermanrîya Leškerê Helebê bi ser milên xwe ve date bihildan û ew bi xwe beramberî hêrîša Šehrîyar Kîkawisê Selcoqî ve bi bašî ve hate birawestandin. Gerandina Kar û barên welatê wî di nava destên Etabik Tuxurlî Cîgirê Melek Zahir û Qadî Beha El-Dînê Kurê Šedadê bi nav û bang de dihhate bidîtin.

Melek Adil û Melek Kamilê Pêhatiyê Kurê wî bi serdarîya Melek Ezîz ve hatin birûništin. Melek Ezîz di sala 628 k. de gerandina kar û barên welatê xwe bi ser milên xwe ve date bixistin. Ji bona girawkirina serpereštîya xwe wî ji Gewreyên Hevalbendên xwe Karmendên taze dane binîšankirin. Herwehajî wî fermandarîya keleha Helebê jî ji bona nava destên Mîrekî ji Hevalbendên xwe date bisipartin. Bi yarmetîya Kamilê

[215]Bi navê û bang bû, ku navê wê Sefiyet Xatun bû. (M. E.).

Xalê xwe ve wî keleha Šêzer date bigirtin. keleha Bîre jî, ya ku ew Bajarokekî li ser Furatê de bû û ya ku ew di nava lidûmayinên Melek Zahir Dawidê Mamê wî de dihate bidîtin, bi destên wî ve hate bikevtin. Çi Bav û çi jî wî jî wan zor bajarê Helebê dane biavedanîkirin. Wan Bazirganîya wêna pir bi pêš ve dane bixistin. Wan sînorên wê ji alîyê Cezîrê û Surî de dane bifirehkirin.

Melek Ezîz di sala 634 k. de di nava xortanîya xwe de hate bimirin. Cihê serdarîya xwe wî ji bona Melek Nasir Yusifê duwemê Kurê xwe date bicîhištin[216], yê ku ew hêšta Heft Salî bû.

Nenka Yusif Deyfe Xatun di pêla tengavîyeke siyasî de gerandina kar û barên welêt bi destên xwe ve date bixistin. Ew bi Cîgirê Melek bû. Li dawîya tûrebûnekê de di navbera wê û Melek Kamil de wê Hevalbendiyek ligel Melek Ešrefê Serdarê Šamê de date bigirêdan. Di dema ku Leškerê Misrê ji bona vegirtina welatê wê xwe bi ser ve date rakišandin, wê dikaribû zor bi bašî ve liberxwedana xwe bide bikirin. Orduwa wê di bin Fermandarîya El-Muezem Kurê Selah El-Dîn de Leškerê Dujmin tûšî ziyanên pir gewrekirin û wî ew dane bivegerandin.

Deyfe Xatun ji bona bêtirkirina desthilatî û xurtbûna xwe bi eškere ve ligel Šehrîyar Kîxisroyê Silcoqîyê Romê de peyman date bigirêdan. Wê xwe bi Bestîvanên wî ve date biwergirtin. Wê bi navê wî Pul dane bilêdan û peyvdarîya roja înê bi navê wî di nava Mizgeftan de date xwendin. Wê Xweha Kîxisro ji bona Melek Nasirê Nevîyê xwe date bixwestin.

Di vê navê de berbatîyeke zor gewre ruwê xwe ber bi Surî ve date bivedan. Hemû xelkên Šervanên Xwarzimî li Jêrî Derya Xezer de, yên ku ew ji bal Cengîz Xan de ji Xaka xwe hatibûn biderkirin, ruwên xwe ber bi Cezîrê ve dane bivekirin. Wan welatê Melek Salihê Eyubîyê Kurê Kamil dane bileyandin.

Mexabin, ku ew kîn û berberiya di navbera Mîr û Gewreyên Eyubî de nehišt, ku ew beramberî vê berbatîya hanê de biyekbin, yaxudjî ku ew li gora berjewendiya xwe de xwe li ber Xwarzimîyan de bidin biyekgirtin. Di dawî de di sala 638 k. de Leškerê Helebê beramber bi hêza zorî lafawîyî Xwarzimî ve hate bišikenandin û Melek Muezemê Kurê Selah El-Dîn Fermandarê leškerê Helebê jî hate biberdestkirin. Hemû bargiranîyên leškerê Helebê bi destên Dujmin ve hatin bikevtin. Hemû

[216]Ev Melek Nasir ji Fatime Xatun Keça Melek Kamil bû.

welatê Surî tanî Hemayê bi jêr destên Xwarzimîyan ve di sala 638 k. de hate bikevtin. Li Paš de Leškerê Helebê ji bal Melekê Humsê û Ešîrên Gerokên Ereb ve, yên ku wan jiber Xwarzimîyan dabûn bibazdan, hate bixurtkirin. Wî hêzeke wetov date bipeydakirin, ku ew ser li nû de ligel leškerê Xwarzimî de bikaribe bide bišerkirin. Di vêketina šer de di navbera herdu leškeran de Leškerê Xwarzimî xerab hate šikenandin û wî date bibazdan. Leškerê Helebê tanî Rehbe bi dû wî ve hate bikevtin û ji wir û pêve ew nema bi dû wî ve çû. Xwarzimîyên šikestî xwe ne li Heran û ne jî li Ane de dane bigirtin. Ew ji wir ji bona nava xakê Xelifê Ebasî hatin bikevtin. welatê Cezîrê, yê ku ew ji bal Xwarzimîyan hatibû bileyandin, hate birizgarkirin û hemû Dîlên Musulman hatin biberdan, yên ku ew tevde li Heranê de hatibûn bizindankirin. Di sala 640 k. de leškerê Helebê careke din jî pîs Lešker Xwarzimîyan date bišikenandin. Li dawîya vê kamwerîya hanê de bi çend Mehan ve Sefiya Xatun hatebi bimirin. Melek Nasir Yusif vê carê kar û barên gerandina serdarîya xwe bi destên xwe ve date bixistin. Wî li ser bešê zorî Surî de ji Erîš tanî Furatê dida biserdarîkirin. Ji bal Xelîfê Begdê de Navnîšana Šehrîyarî pê hate bidan.

Zor mexabin, ku bedbextîya wêrankirina Tataran hate bidîtin. Bi rastî jî Holako di sala 658 bi Šepolên pêlên Mengolî de ruwê xwe ber bi Helebê ve date bivekirin. Šehrîyar Nasir bi bê sûd ve çavnêrîna alîkarîya Misrê date bikirin. Di dawî de ew neçar bû, ku ew Helebê bide bicîhištin û ew ji bona bajarê Šamê çû. Belam dîsan ew rizgar nebû û ew bi nava destên Holako ve hate bikevtin û wî ew date bilinavbirin. Bi vî rengî ve serdarîya Helebêyî Eyubî jî li ser destên Holako de hate bidawîkirin.

## 3. Serdarîya Eyubîyî Šamê

Šehrîyar Selah El-Dîn di jîna xwe de welatê Šamê bi Melek Efdelê Kurê xweyî gewre ve dabû. Li dawîya mirina wîna de zor pê neçû, tanî ku di navebera Melek Efdel û Birayê wî Melek Ezîzê Serdarê Misrê de têk çû. Li dawî jî de Melek Adil jî xwe têkelî vê herayê kir. Demeke dirêj vê hera û pevçûna hanê date kišandin. Di wê navê de bajarê Šamê Sernavînîya serdarîya Melek Efdel çend carekî bi jêr dorlêpêçanê ve hate bikevtin. Inca li dawîya mirina Melek Ezîz û šikestina Melek Efdel de Šam û Surî bi jêr desthilatîya Melek Adil ve hate bikevtin. Li dawîya mirina Melek Adil de serdarîya Surî bi destên El-Muezem Îsayê Kurê wî ve hate bikevtin. Di zemanê vî de berbatîya Firengan bînvedana vî Welatî dane bitengkirin. Li dawîya El-Muezem de Melek Nasirê Kurê wî bi Serdarê welatê Šamê ve hate bidanîn. Belam Melek Kamil wazî lê nehêna û ew bi Leškerekî ve ji bona ser wî çû. Di pêšî de Melek Ešref Musayê Birayê Melek Kamil layê Melek Nasir date bigirtin, belam di dawî de ew ligel Melek Kamil de hate birêkkevtin û wan bi hev re bajarê Šamê dane bigirtin û serpereštîya vî bajarê hanê di sala 626 k. de bi destên Melek Ešref ve hate bikevtin.

Ewende pê neçû, Melek Ešref ji bona liberxwedana berbatîya Celal El-Dînê Xwrzimšah ligel Šehrîyarê Romê Kîqubad de lihevhatinek date bigirêdan. Wî Leškerek di bin Fermandarîya Mîr Ize-El-Dîn Umerê Hekarî de ji bona hewara Hevalbendê xwe date binardin. Van herdu Hevalbendan Celal El-Dîn li nêzîka Erzencan de di 28 Remezana sala 627 k. de dane bišikenandin. Li dawîya navekê de di navbera Melek Ešref û Melek Kamilê Birayê wî de têk çû. Herwehajî di nava wan û Hevalbendê wanî Ela El-Dîn Kîqubad jî de têk çû, yê ku wî hêrîšî ser welatê Cezîre date bikirin û Perçeyek jê date leyandin. Inca li dawî Du salan de ango di sala 633 k. de ew Perçe hate bivegerandin.

Melek Ešref di dawîya jîna xwe de ligel Melek Kamil jî de têk çû û Leškerê Misrê jî ji bona ser bajarê Šamê hat. di wê navê de Melek Ešref hate bimirin.

Di zemanê Melek Adilê duwem de šer û heran di navbera Mîrên Eyubî datin bidestpêkirin. Melek Salih Ismailê Serdarê Šamê ligel Firengan de beramberî bi Melek Salihê Eyubîyê Serdarê Misrê ve Hevalbendîtiyek date bigirêdan. Melek Salihê Eyubi bi yarmetîya Leškerê

Xwarzimîyan ve sipahên Hevalbendan li Xeze de di sala 634 k.- sala 1244 z. de date šikenandin û wî ser li nû ve Surî û Misir biyekkirin.

Li dawîya Mirina Melek El-Muezem Toranšahê Kurê Salihê Eyubi de Serdarê Helebê Melek Nasir Yusif bajarê Šamê date bizeftkirin. Ev Šahzadeyê hanê bi xwe jî ve dawîvanê Mîrê Eyubi li ser Šamê bû.

bajarên welatên Šamê di zemanê Eyubiyan de zor avedanî, avanîkirin, pêškevtin û gešitî datin bidîtin. Mîr û Jinmîrên Xaneda Eyubi û Gewremerdên vê pêlê de di avanîkirina Seran, Košk û Kaxên ciwan ciwan de bi hev re didan bipêšbazîkirin. Bi taybetî ve bajarê Šamê di vê pêlê de pir hate bipêšvekevtin. Ew bi navînîya zanistîyê û komek ji dibustanan ve hate bikirin. Geštvanê bi nav û bang ve Kurê Cebir, yê ku wî li zemanê Šehrîyar Selah El-Dîn de bajarê Šamê dayite bidîtin, dibêje: ku di bajarê Šamê de Bîst Dibustanek hebûn, belam ewende pê neçû, tanî ku jimara wan Dibustanan hate bidubarekirin.

## 4. Serdarîya Eyubiyî Hema.

Li dawîya bikevtina Hemah de bi destên Eyubiyan ve Šehrîyar Selah El-Dîn ew ji bona Melek Muzeferê Kurê Teqi El-Dînê Birayê xwe date bidan. Nevîyên vî Mîrê hanê li hêre de her û her Serdar bûn. Wan her û her dixwestin, ku pêwendîyên wan ligel Serdar û Gewremendên Eyubi bi bašî ve bête birabuhurandin.
Gava ku Holako ji bona ser Surî hat, wan nikarîbûn xwe li ber wî de bidin biragirtin. Li dawîya bišikandin û vegarandina Holako ji Surî de ew bi serdarîya Kolemendên Misrî ve hatin bibestandin. Ev Malbata hanê di mêjûwa 698 k. de hatin bilinavbirin.

Birazayê Melekê pašîyî Hema Mêjûvan û Zanistvanê bi nav û bang ve Mîr Ebu El-Fida Ismail bû, yê ku wî ligel Šehrîyar Mohemed Nasir de bešdarî šer bû. Vî Šehrîyarî gelekî ji Ismail hejdikir û wî Hema pê date bidan û pêre jî wî Navnîšan û Mafeyê Šehrîyarîyê jî pê date bidan. Di hingama Ebû El-Fida de Šarê Hema zor hate bipêšvekevtin. Gora vî Mîrê gewreyî hanê di nava Goristana bajarê Hema de tête bikevtin.

Li dawîya Šehrîyar Ebû El-Fida de Melek El-Efdel Mohemedê Kurê wî bi hoyê bê Serpereštîya xwe ve ewletîya Šehrîyarê Misrê bi xwe ve date biwindakirin. Di encam de ew hate bigirtin û ew li keleha Šamê de hate bibendekirin. Bi vî rengî ve serdarîya Eyubî li Hema hate bidawîkirin.

## 5. Mîrnešînîya Eyubîyî Humsê

Ev welatê Humsê di sala 570 k. de bi destên Šehrîyar Selah El-Dîn hate bikevtin. Li dawîya vê mêjûwa hanê de bi çar salan ve wî bi Mohemedê Kurê Šêkohê Mamê xwe ve data bidan. Di vê navê de ev welatê hanê ji bal Melek Nasir Yusifê duwem de Serdarê Helebê di sala 646 k. de hate bizeftkirin. Belam ewende ew bi destên wî ve nama û ew careke din ji bona nava destên Nevîyên Šerkoh hate biveguhestin. serdarîya vê Xanedana hanê tanî sala 661 k. de date bidemandin. Bi hatina Holako ve bê liberxwedan wê dergehê xwe jê re date bivekirin û serdarîya Xanedana Šerkoh li nav hate biçûyîn.

## 6. Mîrnešînîya Eyubîyî Yemen.

Em dizanin, ku ew ji bal Melek El-Muezem Toranšahê Birayê Šehrîyar Selah El-Dîn di mêjûwa 569 k. de hate bivekirin[217]. Wî Du salan

[217]Di Mirat El-zeman, bergê 3 de hatîye: Ku Šems El-Dewle Toranšah, gava ku wî berê xwe ji bona vekirina Yemenê date bivedan, ew di rêya xwe de Di ser Meka pîroz re hate derbaskirin. Wî dixwest, ku ew ji bona nava bajarê Mekê here. Bela Mîrê wêna Dergehê Kebê date kilîdkirin û ew ji bona serê çiyayê Bavê çû. Toranšah berê xwe date Kabe, da ku ew xwe li dora wê bide zîvirandin. Wî dît, ku dergehê Kabê hatîye kilîdkirin. Wî destên xwe ber bi Jor ve date berzkirin u wî ji bona Xwedan date bangkirin û got: Xwedo! Heger ku ez bi mebesteke pak ve ji bona vî cihî hatime, de vî derî tu ji min re bide vekirin. Wî destên xwe ji bona kilîdê date avêtin û bi hêza Xwedê ve dergehê Kabê jê re hate vekirin û wî têde date limêjkirin.

Gava ev xebera hanê bi Bavê Qeysê serê çiyê ve hate gihaštin, wî xwe ji serê çiyê date berjêrkirin û ew ji bona nik Toranšah hat û wî jê re hêvîya lêbuhurandinê date bikirin. Toranšah lê hate buhurandin, wî ew date bixelatkirin û di cihê wî de wî ew date bihištin.

Toranšah bi sipahê xwe ve hate birêkkevtin û ew ji bona Yemenê hate bigihaštin. Li wêderê de ew ligel Hezên Eb-Dul Nebî Kurê El-Mehdî bi šer ve hate bikevtin. Wi ew date bipirtpitrkirin. Ev Serdarê pirt pirtkirî zor sitemkar û bedkar bû. Karên wîyi Zarotîyê ji Hîš derbûn. Wî Gorek û Aramgehek ji bona Bavê xwe bi avzêr ve dabûn biavakirin. Wî bi darê zorê Tude neçardikirin, ku ew ji dilva Kabê ve serdana goristana Bavê wî bidin bikirin. Toranšah ev Sitemkar û Bedkarê hanê date bigirtin û ew date kuštin. Tevaya malên wî û Aramgeha Bavê wîyî avzêrkirî û tijê bi cewher û kevirên giran ve dane bizeftkirin.

li Yemenê de bi navê Birayê xwe ve date biserdarîkirin. Li dawî de wî Cîgirvanek li šuna xwe li ser de date bidanîn û ew ji bona Misrê hate bivegerandin. Li dawîya mirina wî de Yemen bi Melek Ezîz Textekînê Birayê Šehrîyar Selah El-Dîn ve di sala 579 hate bidan. Ev Mîrê hanê tanî mirina wî di 16 Šewala sala 593 k. de li wêderê de ma. Di dawîya wîna de El-Meez Ismailê Kurê wî šûna wîna date bigirtin. Belam ew di sala 598 k. de hate bikuštin.

Nasirê Eyubiyê Birayê wî cîgehê wî date bigirtin û ew jî di 12 Muherema sala 611 hate bikuštin. Li dawîya vê de Melek Mesud Selah Eldîn Yusif Kurê Melek Kamil bi Serdarê Yemenê ve hate binîšankirin û wî bi hêzeke mezin ve ber bi Yemenê ve date bivedan. Ew di 2 Muherema sala 612 k. de bi Sernavînîya Yemenê ve hate bigihaštin, ya ku ew Zubey de bû. Li dawîya girtina Teez de Sulêman Kurê Teqi El-Dîn Umer Kurê Šehinšah ji bona Misrê hate bivegerandin. Ew ligel Imamê Yemenê de bi šer ve hate bikevtin. Di roja 8 Cemada duwem de sala 614 wî Sena date bizeftkirin. Li sala 619 k. de kar û barên Yemenê wî ji bona nava destên Kurên Resulîyî Hevalbendên Eyubî datin bisipartin û ew di sala 620 k. de ji bona Misrê hate bivegerandin. Di sala 624 k. de careke din ew ji bona Yemenê neçarî bivegerandinê bû. Wî Kurên Resulî dane bizindakirin û wî ew di wê roja girtina wan jî de ji nû ve dane biberdan. Ew di sala çûna xwe de cardî ji bona Misrê hate bivegerandin, pištî ku wî dîsan Serpereštiya Yemenê ji bona Nur El-Dîn Umerê Kurê Resulî date bisipartin. Li dawîya derbasbûna demekê de Nur El-Dîn dazanîna Serxwebûna xwe date bikirin. Bi vî rengî ve bingehê serdarîya Resulî li Yemenê de hate bisazkirin.

## 7. Serdarîya Eyubiyî Cezîrê

Vê serdarîya hanê ji roja bidanîna wêna tanî sala 643 k. de date bidirêjkirin. Navînîya wêna Mîyafarqîn[218] bû. Di zemanê El-Muzefer Xazî ew bidestên Mengolan ve hate bilinavçûn. Belam li hin bajarên Cezîrê û Kurdistanê de Mayînên Eyubi her mabûn. Ji van jî Mîrnešînîya Hesenkêfê[219] bû, ya ku wê tanî sedsalê Dehemî Koçî jî date demandin.

## Dîtineke Gištî

Sehrîyariya Eyubi li šûna dûmayîna Xilifên Fatimî di Misrê de û Etabikan li Surî de hate bidamezirandin. Tevî hêrîsên Xaçperestan Yek li dû Yek jî de di hingava Šehrîyar Selah El-Dîn, Melek Adil û Melek Kamil de šûneke wêyî pirî diyar hebû. Di pêla Melek Adilê duwem de ji bê serpereštî û sistîya wîna de ew hate bibêhêzkirin. Belam Melek Salih Necim El-Dînê Eyubi bi dujwarî û bi karekî bikêr ve di dawî de bi ser wan Serdarên bêker, Dilbijok û Genî ve hate bikevtin. Tanî radeyekî wî cardî xemla pêšî pê date bidan. Wehajî Kurê wî Toranšah jî dê bida bikirin, ger ku ew tûšî serhildana leškerê Kolemendan nehata bikirin. Dibû, ku wî jî karekî zor mezin ji bona vê Serdasrîya hanê bida bikirin. Çunke, ku ew Serdarekî pri baš bû.

Jêhatbûnên Šehrîyarên Eyubi bi tenha ve di qadên šer de nedihatin bidîtin. Belkî ew di qadên Zanistiyê, Zanebûnê, Avanîyê û Aburî de dihatin bidîtin. Wan di van waran de šopên gewre û bi nav û banh ve li dûxwe de dane bicîhištin. Di derbarê Çandinîyê û Avdanyê de zor xerîk

[218]Niha Ev bajarê hanê bi Silîvanê tête binavkirin, Ev navê hanê jiber E$îra Silîvanîyî Kurdîyî mezin lê hatiye bikirin. Kurd ji Silîmanî Silîvanî dibêjin û ew ji bona Silîman Silîvan dibêjin. Silîwan di Neqšên Turkî de hatîye binivîsandin. (M.E.)

[219]Ew niha bi navê Šernexê ve tête binavkirin. Li dorhêla wê de Ešîra Melekan tête bidîtin, ya ku ew di mêjûwê de pir kevnar û bi nav û bang tête biderkevtin. (M. E.).

bûn. Di zemanên xwe de wan ji bona pêšvexistin û geškirina Bazirganîyê gelek peyman ligel Serdarîyên welatên Ewopa de datin bigirêdan.

Orduwa Eyubî Du Beš bû. Leškerê taybetîyi Kolemendan û leškerê Mîr û Serdarên pêve girêdayî bûn. Ev rengê pêkhatinan bi gora wî zemanî ve zor baš bûn û ew li gora hatinên Serdarîyê de ji dihatin bilihevhatin. Leškerê Kolemendan, yên ku ew hemû Kole bûn û ew bi peran ve hatibûn kirîn, bi remaneke Supahî ve hatibûn bipeydakirin. Di pêšî de mîna Leškerê Turkîyî Ebasî û Inkîšarîyê Osmanî pirî baš bûn û wan gelekî karkirin. Lêbelê di pêla lawazîya Serdarîyê de ew mîna Mikrobekî berbat bi Serdariyê ve hate bikevtin û wî ew tûšî nexwešîya nemanê kir.

Di hingava Šehrîyarîya Eyubi de ji bona Cîhana Musulmantîyê bingehekî xurt û pêškevtî hate bidanîn. Li hemû layekî de Zanistvan û Karnasên bi nav û bag ruwên xwe ber bi Serayên Šehrîyarîyên Eyubi ve dane bivedan. Šehrîyarên Eyubi jî zor ji bona wan rûmet û šan dane bigirtin. Ji bona zanebûn û avanîkirina welêt wan zor karên hêja û bi nerx ve dane bikirin, Wan Bingehên rêzanên gerandina Welêt dane bidanîn. Wan Bêš û Bacên Serdarîyê ji bona rêzaneke bi rêk û pêk ve dane bixistin. Wan šeweyê rabûn û rûniština Serayên Serdarîyê û Nav û Nîšanên Mîrî dane birêkûpêkvexistin. Rêzanên Mîrnešînîyan -(Derebegîyan)- di nava welatên Eyubi de zor hatin bipêšvekevtin. Zor ji rêzanên Eyubi ji bona Siwarên Mêrxasên Ewropa hatin biveguhestin. Ji bona nimûne Durujmê Xanedananên Keyan û Padîšahan Ewropîyan ji Eyubiyan dane biwergirtin.

## *Derîyê Yanzdehemîn*

## 11. Dewleta Kurên Erdelanî ji 617-1284 k. de

Bi gora Šerefname û Çar sedsalên Dawîyî Iraqê ve ev Serdarî zor gewre û bihêz bû. Li gora goyên Tudeyên Erdelan ev serdarîya hanê pirî kevnar bû û ew tanî Hingava Ebasîyan û hêjî bêtir tanî hingava Sasanîyan jî diçe. Bi rastî jî ji bona rastîya duwem belgeyekî rast û durust bi destên me ve niye. Belam Mêcer Longirîk dibêje: ku ev Serdariya hanê ji bal Cengîzxan pê hatîye birûništin[220]. Doktor Firêc dibêje: ku Cengîzxan Sazvanê vê Serdarîyê ji bona van navan date binîšankirin[221]. Divê, ku ev serdarîya hanê li dawîya Xilafeta Ebasî de hatibe bidamezirandin; çunke, Leyandina Iranê ji bal Cengîzxan de di sala 617 k. de hatîye bikirin û ew di hingava Xilafeta Nasir El-Dîn El-Lah de hatîye birûdan.

Îca bi gora vê mêjûwê ve dibe, ku ev serdarîya Kurên Erdelan geh bi Serxwebûn û geh jî pir caran jî bi rengê bestî ve ji šeš sedsalan û nîv bêtir hatîye bidemandin. Çunke, mêjûwa linavçûna wê de di sala 1284 k. de tête bidîtin.

debera em careke din ji bona ser pirsiyarîya bidamezirandina wêna bêtin bivegerandin. Di vî warê hanê de Mêjû tištekî bi šêweyekî gištîyî bi carekê ve ji me re nade bizanîn. Šerefname dibêje: ku Baba Erdelan ji Xanedana Ehmedê Merwane, yê ku wî serdarîya Merwanî Kurd li Kurdistana Navînîde dayite bisazkirin. wî ji Diyarbekirê ji bona

---

[220]Çar sedsalên Dawîya Iraqê, Rûpel 6.

[221]Kurdler, r. 119.

nava Eşîrên goran dayite bikoçkirin[222]. Li dawîya vêna de gava ku Cengîzxan Iran date bizeftkirin, wî ji Mengolan re date bikarkirin û wan ew ji bona şarezorê datin biserdarîkirin.

Goya çar sedsalên dawîyî Iraqê di koka xwe de ew jî mîna goya Şerefname ye. Lêbelê ew bêtir bi ser ve dide bivekirin û dibêje, ku Baba Erdelan li Malbateke kevnî û Gewreyî Diyarbekir bû. Wî ji bona nava Eşîra Goran date bibarkirin. Ewende pê neçû, wî desthilatî ji xwe re date bipeydakirin û Eşîrên Şarezorê û Xêlatên Rojhilatî Hewreman jî ji bona jêrdestîya xwe dane bikişandin. Gava Cengîzxan ji bona wan navan hat, ew bi serdarîya Baba Erdelan hate birûniştin.

Geştvan û Rojihilatvanê Ingilîzîyî bi nav û bang Rêç dibêje, ku Xanedana Kurên Erdelan di koka xwe de bi xwe jî ew ji Goranin û ew jiberê Mamoyîne. Lênerînên vî Mêjûanî ji Hiş zor nêzîkin. Dibe, ku ew bi hêza Eşîra xwe ve bi ser Eşîrên wan navan ve hatibe zalbûn û wî serdarîya xwe dabe bidamezirandin[223].

Şerefname derbarê serdarîya Baba Erdelan çende agehdarîyan nade bidan. Lêbelê Mêcer Longrik dibêje, ku Kelol Begê Kurê Baba Erdelan bi xwe ve Hewlêr jî ji bona jêr serdarîya xwe date anîn û pêla serdarîya Xidir Begê Kurê Kelol Beg û Ilyas Begê Kurê Xidir Beg bi bê şer û pevçûn hatîye birabuhurandin û bêtir vê serdariyê hêz û hiner ji xwe re dayite bipeydakirin.

Biderkevtina serdarîya Celayerî di sedsalê Heştemînî Koçî de li Iraqê de di zemanê Mîrekî sistî û bêkêrî (dibe, ku ew Xidir Begê Kurê Ilyas Beg be) Erdelanî de lihev hatîye birasthatin. Beşê Jor û Rojavayî Erdelan ji dest çû. serdarîya Celayerî ji bona vegirtina mayîna welatê Erdelana zor date bikarkirin.Lêbelê beramberî azayî û konetîya Mîrê tazeyî Erdelan Hesen Beg Kurê Xidir Beg hîç bi wê ve nehate bikirin. Li dawî de di sedsalê Nehemînî Koçî de-Panzdehemînî Zayînê de- di pêla serdarîya xurtî Mamun Beg[224] de ew Beşê layê Jorî, yê ku ew ji bona nava

---

[222]Ev serdarîya Merwanî di dawîya sedsalên pêncan de hatîye bilinavçûyîn. Zor dibe, ku Baba Erdelan her di wê demê jî de jiber sor û sitema Wezîr Bavê Cuhêr ji bona nava Goran dabe bibarkirin.

[223]Doktor Firêç di Nivîsta xweyî Kurdler de, ya ku ew têde zor bi dildarî guh bi Xwîngerbûna Turkî ve dide bidan, koka Baba Erdelan bi rengegî din ve dayite binivîsandin.

[224]Ev Mamun Bege, ew kurê Munzir begê Hesen bege, yê ku ew beramberî

destên Celayerîyan hatibû bikevtin, hate bivegerandin. Dîsan Zeyê Badînan-Zeyê Mezin- bi sînorê Jorî Erdelan bû. Hêzeke Erdelanî jî li Rewanduz hate bidanîn.

Li Serdarîyên Dirawseyên Iraq de di wê pêlê de tanî wê roje de hîç Serdarîyeke weha peyda nebibû, ku bi qed serdarîya Erdelan wer bi hêz û hiner ve hatibe bipeydakirin.

Di vê pêle de xelkê welatê Šarezor bi xwe hêjî ew xelkên wêyî îro bûn. Zengene, Hemewend û Caf hêšta ew ji Iranê nehatibûnê. Malbatên Ayînî mîna Šêxan, Talebanî û Cebarî hêšta zor nebibûn û wan rengên Ešîran ji xwe re hêjî nedabûn bipeydakirin. Dolên Rojhilatî Kerkuk bi destên Gundîyên tevlihevên Kurd bûn. Jiyana Bajartîyê bi bidîtina îro ve zor kêm bû. Derne û Pencewîna îroyî li ser sînor de, Kuyê, Herîr, Rewanduz û Akrê her yekekî ji van Bajaran xwedan serdarîya xweyî biçûk û keleha xwe bûn.

Li layê Jorî Zeyê Badînan de Mîrnešînîya Imadîyê bû. Ekra, Dêr, Duhok û hin caran jî Zaxo bi Mîrnešînîya Imadyê ve girêdayî bûn. Ev Mîrnešînîya hanê ji sedsalê Duwanzdehemînî tanî Çardehemînî Zayînê de date demandin. Ango wê Dused Salî li jêr serdarîya Erdelanan de date bidirêjkirin. Di dawîya vê mêjûwa hanê de ew bi jêr serdarîya Celayerî ve hate bikevtin. Li hêre de ji bidestpêkirina sedsalê Çardehemînî Zayînê de Xanedana Badînan bi Serdar bûn. xelkê vî Welatî jî ji Ešîrên Hekarê bûn. welatê Mukrî jî li jêr serdarîya Erdelanan de bû.

Mamun Beg Sê Kurên wî hebûn: Bêkeh Beg, Surxab Beg û Mehmud Beg. Li dawî mirina wî de Bêkeh Begê Kurê wîyî gewre li šûna wî de hate birûništin. Lêbelê wî netuwanî hemû welatê Erdelanê ji bona jêr serdarîya xwe bide anîn. Birayên wî her Yekî li welatê xwe de gerandina xweyî serbixwe dane bidamezirandin. Ew Perçê ku ji bona Bêkeh Beg mabû: keleha Zelem, Texeso, Šemîran, Hewar, Sîman, Dawdan-Rawdan, Avrawdan- û Kelenber bûn. Diyare, ku di zemanê Bêkeh Beg de bûyînên giring û gewre nehatine birûdan. Heger wan jî dabin birûdan, ew ji bona me nediyarin. Belam bi gora ku ew di

---

serdarîya Celayerî bi merdayeti ve hate birawestandin. Li gora Mêjûvan Elî Ekber Hingava serdarîya vî Mamunî li sala 862 k. de tanî sala 900 k. de ango 38 salan dayite demandin. Insiklopêdîya Musulmantîyê.

bidestpêkirina sedsalên Nehemînî Koçî de bi Serdarê Erdelanê bûye, renge, ku ew ligel pêla Yawiz Šehrîyar Selim de lihev hatibe birastin. Mêcer Longrik dibêje: Li dawîya Kamwerîya Çaldêran de ew ligel Mîrnešînîyên mayînên kurdên din bi dewleta Osmanî ve hate bigirêdan. Belam li layê min de ev bawerîya hanê lê tête bigûmankirin; çunke, Mewlana Idrîs li çûna xweyî Kurdistan de hîç biaxivtineke wisa nedaye bikirin.

Li dawîya Bêkeh Beg de Mamunê Kurê wî ji bona Cîgehê wî hatîye birûništin. Ev Serdarê hanê di pêla Šehrîyarîya Sulêmanê Qanûnî de -ji 926-974 Koçîde- hatîye bipeydakirin. Ew bi dewleta Sefewî ve dihate bigirêdan. Bere bere wî Welat û Dewhilatiya xwe dida bifirehkirin. Wî sînorê xwe bi Zeyê Koye ve date bigihandin. Hewreman, Šarezor, Qeredax û Dešta Kermiyan jî di navbera Çiyayê Qeredax û Rêya Kefrî-Kerkuk jî de bi jêr serdarîya wî ve hatin bikevtin. Firehbûna desthilatîya serdarîya Erdelan bi vî rengî ve ji bona serdarîya Osmanî dest nedida. Di pêšî de dewleta Osmanî ji bona berbestiya wî Hêzek Inkîšarî li Kerkuke de date bidanîn. Li paš wê de bi mehna girawkirina rêya Begdadê û hêrîšên Ešîrên Šarezorê ji bona dor û berên we rêyê ve di bin komandarîya Hisên Paša de li sala 945 k. de Leškerek ji bona ser Mamun date binardin. Bešê zorî vî Leškerê hanê jî Gewreyên Kurd bûn. Di nava vî Leškerê hanê de Sultan Hisênê Mîrê Imadîyê jî dihate bidîtin. Armanca vi Leškerî bizeftkirina mirîwan û Sune bû û herger netuwanî ew van Bajaran bide bigirtin. Hîç nebe, divabû, ku ew kêmanî ve Šarezorê bide bigirtin. Mamun Beg beramberî vî Leškerê hanê liberxwedaneke merdayetî date bikirin û li dawî de wî xwe ji bona nava keleha Zelem date vekišandin. Leškerê Osmanî xwe ji bona ser kelehê date rakišandin û wî lê dor date pêçandin. Gava ku Mamun Beg bêhêvî bû, wî xwe bi Istenbolê ve date bigihandin[225]. Belam ew li wêderê de hate bizindankirin. Leškerê Hisên Paša jî li dawîya wêrankirin û talankirina welatê wî de hate bivegerandin.

Li dawîya Mamun Beg de Surxabê Begê Mamê wî ligel Šahê Iranê Tehmaseb de pêwendîyên xwe date bitazekirin û welatê Birazayê xwe jî date bileyandin.

---

[225]Li gora Goyekê din de Mamun Beg bi Dîlî ve hate bigirtin û ew ji bona Istebolê hate birin. Kurdler, r. 122.

Gava Šehrîyar ev xebera hanê date bibihîstin, wî Mamun ji zindanê date derhênanîn û Melbenda Hule pê date bidan û Ismailê Birayê wî jî bi serdarê Melbenda Seroçek ve date binîšankirin. Belam Surxab Beg zor baš xwe dabû bicîgîrkirin û bi van herdu Biran ve beramber bi Mamê wan ve hîç pê nehatin bikirin.

Di sala 948 k. de El-Qas Mîrzayê Birayê Šah Tehmaseb bi destên Leškerê Kurd ve hate bikevtin û wan ew ji bona layê Surxab Beg dane bibirin. Lêbelê zorî pê neçû, Ismail Mîrza bi Leškerê Qezilbaš ve xwe ji bona ser Surxab date kišandin. Wî dor li Surxab û Mîrza El-Qas di keleha Merîwan de date pêçandin. Mîr Surxab neçar bû, ku ew El-Qas Mîrza bide biberdestkirin, da ku ew welatê xwe ji šerê Qizilbašan bide biparastin[226].

Elî Paša Walîyê Begdadê ev zîneta hanê ji bona ber Istenbolê date biraxistin. Dergehê Bilind ev zîneta hanê bi kêra sistîya Elî Paša date bizanîn û wî ew ji cîgehê wî date bidaxistin û li šûna wî de wî Balteçî Mohemed Pašayê bi nav û bang bi Walitî ve ji bona ser Begdadê di sala 956 k.- 1549 z. de date binardin. Vî Walîyê nuh Osman Paša ji bona vegerandina Šarezorê date bikarmendkirin û wî ew bi leškerekî baš jî ligel hêzeke xurtî Topçî ve date bilikarxsitin û wî ew lgel hêzeke Kurdî jî ji bona ser Šehrezorê date binardin.
Vî Leškerê hanê Surxab Beg li keleha Zelem de dor lê date pêçandin. Vê dorlêpêçana hanê zor date kišandin. Di dawî de Balteçî Paša bi xwe jî ve ji bona ser kelehê hat û wî Komandarîya Lešker ji bona nava destên xwe date bihiladn. Wî bi konevanîyeke hozanî ve û bê šer ligel Surxab de hate birêkkevtin. Surxab keleh date bicîhištin û ew rošt. Bi vî rengê hanê ve keleha Zelem bi destên Balteçî Paša ve hate bikevtin. Wî Welî Beg bi hêzeke baš ve ji bona ser kelehê date bidanîn. Ji sala 961 k. de Serpereštîya vî Welatî di nava dewleta Osmanî de hate birêkûpêkxistin.

Di goyên bajarê Sune de hîç ev peyvanan têde nayên bidîtin. Surxab Beg li dawîya derçnûa wîna ji keleha Zelem de bi alîkarîya serdarîya Iranê ve disan bi ser Erdelan û Šehrezorê ve hate bicîgîrkirin û demeke zor wî serdarî date bikirin. Li Seraya Šahê Sefewî de rûmet û hêjabûneke wîyî zor dihate bidîtin. Wî Behramê Kurê xwe ji bona ser Rewanduzê bi Serdar ve date bidanîn û wî liwêderê de demeke zor date biserdarîkirin.

[226]mêjûwa Elem Arayê Ebas.

Doktor Firêc dibêje: ku Surxab Beg li paš navekê de destparastina Iranî ji ser xwe date bifirêdan û wî dest bi serpereštiya serbixwe ve date bikirin. Demeke zor wî bê šer û šor li gora dilê xwe de serpereštîya serdarîya xwe date bikirin. Ev Mirovê hanê ji giringtirîn Serdarên vê Binemalê bû. Šerefname zor pesnê hišmendî û bilindbûna serpereštîya wîyî qenc dide bikirin û ew dibêje, ku wî Yanzdeh Kur li dûxwe de dane bihištin.

Di dema ku Surxab Beg hevalbendê Iranî bû, Mohemed Begê Kurê Mamun Beg hate bipeydakirin. Bi hoyê mirina Bavê wîna Mamê wî Melbenda Hule[227] û Seroçkî pê date dan. Bere bere wî Sînorên welatê xwe datin bifirehkirin. Wî Qeredax, Šarbajêr û Demheran -Dilcoran- ji bona jêr serdarîya xwe datin bianîn. Wî ji Šehrîyar Sulêman Osmanî date bixwestin, ku ew van welatên hanê pê bide bisipartin.

Renge, bi ser vajî kêra daxwaza Mohemed Beg ve zorî pê neçû, tanî ku Restem Pašayê Serekwezîr ligel Osman Pašayê Mîrê Miranê Begdadê û Mîr û gewreyên Kurdistanê de ji bona bizeftkirina Erdelanê hate bikarmendkirin. Leškerekî gewre û giran li keleha Zelem de dorlêpêçanî date bikirin. Vê dorlêpêçana hanê Du salan date kišandin. Mohemed Beg jî di wê navê de hate bimirin. Li layekîtir jî ve Šah Tehmaseb yarmetîya kelehê dida bikirin; jibervêjî Restem Paša hate bineçarkirin, ku waz li dolêpêçana kelehê de bide hênanîn û ew berê xwe ji bona welatê Šahrezorê bide bivedan. Di wê navê de ew jî hate bimirin.

Li cîgehê Restem Paša de dîsan Balteçî Mohemed Paša bi Leškerekî zor ve ji bona ser Šehrezorê hate binardin. Wî Šahrezor date bidagîrkirin. Surxab Beg di vê navê de Serdarê Erdelan bû û ew Hevalbendê Iranîyan bû.

Di dawîya mirina Surxab de Sultan Elî Kurê wî ji bona šûna wî hate rûnitšin. Lêbelê li dawîya Salekê de ew jî hate bimirin. Di wê navê de di navbera Bisatê Birayê wî û Teymurxanê Kurê wî de šer û pevçûnê li ser serdarîyê date bidestpêkirin. Bisat cîgehê Birayê xwe date bigirtin. Belam Teymurxanê Birazayê wî waz lê neda hênanîn û wî ew bi yarmetîya dewleta Osmanî ve pir date bitengavkirin. Wî Apê xwe date šikenandin û serdarîya Erdelanê ji bona jêr serdarîya xwe date hênanîn. Šehrîyar Muradê Sêyem welatê Šahrezorê ligel Nîša Mîrê Mîran û

[227]Pêwendîya Hule ligel Seroçek de cihê gûmanê ye. Renge, ku ev Navê Hule bi šašî ve di Šerefname de hatibe bitomarkirin.

Navnîšana Pašetîyê jî pê date bidan û wî Çar Kurên wî jî bî Mîrîtî ve li Ser Melbendan de di sala 988 k.- 1580 z. de date binîšankirin.

Di Šerefname de derbarê Kurên Teymur Paša û Malbendan de hatîye binivîsandin:

1. Sultan Elî Mîrê Malbenda Sune, Hesen Abad û keleha Qezelce bû.
2. Bodaq Beg Mîrê Malbenda Qeredax bû.
3. Murad Beg Mîrê Malbenda Mehrewan-Merîwan- bû
4. Bedirxan Mîrê Malbenda Šarbajêr bû.

Doktor Firêc dibêje: ku hingama serdarîya Teymurxan Paša ji bona Kurdistanê malwêranî bû; çunke, vî Mirê hanê zor hej ji talanîyê dida bikirin. Mîrên Loristanê Omer Beg û Šahwîrdi hevdû dane bigirtin, da ku ew ji bela wî bêtin birizgarkirin û wan ew date bigirtin. Belam dîsan ew ji nava destên wan hate birizgarkirin û ji nû ve wî dest bi tengavkirina Dirawsên xwe date bikirin. Di çûna talanîyeke xwe de di sala 998 k. de hate bikuštin.

Li dawîya Teymurxan Paša de Heloxanê Birayê wî bi Mîrê Erdelanê bû. Vî Ciwanmêrê hanê mîna Teymurxan hej ji talanîyê nedida bikirin. Belam li gora rêzanên zemanî de nedihate bikirin, ku Ešîran bi carekê ve ji talanîyê bidin bidûrkirin. Derbarê Šehrîyar Murdê Seyem de bestandineke wîyî baš hebû.

Šerefname tanî Mêjwû sala 1005 k. de agehdarîyên dirêj li ser vê Mîrnešînîya hanê de dide bidan. Insiklopêdîya Musulmantîyê û Çar sedsalên Dawî li Iraqê de derbarê zemanê dawîyî vê serdarîya hanê zor kêm li ser de dide biaxivtin. Diyare, ku li dawîya Heloxan de serdarîya Erdelan di sala 1014 k.- 1605 z. de bi nava destên Xan Ehmed Xan ve hatîye bikevtin. Ev Serdarê hanê ligel Šah Ebas de zor rêk bû û wî welatê Erdelanê bi Iranê ve date bibestandin. Bi parstina Šah ve pišt estûr bû û wî xwe bi ser Ešir û Mîrnešînîyên Kurdîyî jêr serdarîya dewleta Osmanî de dide birakišandin. Išê wîyî pêšî bû, ku wî ji bona ser Ešîrên Mukrî date bihêrîškirin. Li salanên diwayî de wî Rewanduz û Imadîyê jî date bizeftkirin û wî Karmendên xwe li ser wan de datin binîšankirin. Wî Koye û Herîr jî ji bona jêr fermana xwe datin bihênanîn. Vê Serdarî û desthilatîya Xan Ehmed Xan bi ser van Welatan de ewende nedan bidirêjkirin. Ligel vê jî de Bîsta Salên pêšî di hingama serdarîya Xan Ehmed Xan ji bona Erdelana Gewre bi rastî jî ve pir bi šan, rûmet, pîrozî

û xweşî bû. Wî di wê hingava hanê de hemû welatê Erdelanêyî kevnar date biparastin. Di vê pêla hanê de wî zor dildarî û alikarî ji Şah Ebas ji xwe date biwergirtin. Bi serdejî Şah Ebas Xweha xwe jî lê date bimarkirin. (Mêjûwa Neîma).

Xan Ehmed Xan bi remaneke dûrbînî û hişmendî ve xwe bi ser wan Cîgehan ve nedida rakişandin, yên ku ew rast û rast ji bal serdarîya Osmanî ve dihatin biserpereştîkirin. Bes û bi tenha ve ew ligel Serdariyên Kurdîyî Cihî de xerîkdar bû.

Belam li gešta Şah Ebas de ji bona ser Begdadê de di sala 1034 k. de Xan Ehmed Xan bi Leşkerê Erdelan ve ligel bû. Ew ji bona ser Kerkukê çû û wî ew li dawîya şerekî kurt de date bigirtin. Wî Şahrêzor jî date bidagîrkirin, (Mêjwaû Cihana Arî Abasi). Bi vî rengî ve Serdarî û desthilatîya Xan Ehmed Xan ji Rojavayî Imadîyê tanî sînorê Kermanşan û hemedan diçû û ew ji Loristan tanî Goma Ormiyê diçû. Tevaya Mîrneşînîya Soran jî li jêr desthilatîya Erdelan de dihate bidîtin.

Hingama xurtbûna Erdelan li dawîya mirina Şah Ebas di sala 1037 k. de nema date bidirêjkirin. Di sala 1039 k. de Serek Wezîr Xusro Paşa ji bona sitendina Begdadê ji bona Musilê hat. Li wêderê de bi şîreta Gewreyên Kurdan mîna Seyid Xanê Imadîyê, Mîrbegê Soran û hinin tir ve wî ruwê xwe ber bi welatê Erdelan ve date bivekirin.

Xan Ehmed Xan ligel serdarîya Iranê de Peymana Parastina Dostanîyê dabû bigirêdan. Bi xwe jî ve wî ev dostanîya hanê li kêsa gešta dawîyî Şah Ebas de ji bona ser Begdadê de date bicîkirin. Di navbera Mîran, Maqul û Peyan de zor Kes hebûn, ku ew Hevalbendên serdarîya Sunîyî Osmanî bûn. Van hemûya li nêzîkbûna Serdar Xusro Paşan de kês ji xwe re datin bidîtin. Gava Orduwa Osmanî ji Kerkukê xwe date birêxistin, gelek ji Serdarên Xanedana Erdelan ligel Bîst Xanên dinî Kurdistanê ji bona nik Serek Wezir Xusro[228] hatin. Leşkerê Osmanî li Şahrezor de hate westandin û çil û pênc Rojan ew ligel avanîkirina keleha Kelenber xerîk bû.

[228]Mêjûwa Neima dibêje: ku Xan Ehmed Xan di wê gave de di birîna Zeyê Kuye de bû. Wî xwe ji bona bextê Serek Wezîr Xusro date biavêtin. Serek Wezir û Şehrîyar di xwe avêtina wî de lêhatin bibuhurandin û ew li Musilê de dane bicigîrkirin.

Belam ev Goya hanê ewende rast niye. Bi rasî ve di navekê de Xan Ehmed Xan li serdarîya Iranê ruwê xwe dabû wergerandin. Ev jî ji bewr wê bû, ku bi Fermana Şahê Sefewî ve çavên Kurê wî dabûn bihilkirin.

Li dawîya vêna de Serek Wezîr Hêzek ji bona ser keleha Mehreban date binardin wî ew date bigirtin. Hêjî di vê navê de Orduwa Osmanîyî kokî li Musilê de bû, gava ku Serdarê Iranî Zeynel Xan û Xan Ehmed Xan bi Leškerekî Çil hezar Kesî ve ji Hemedanê hate birêkkevtin. Bi bê rêya vegerandina Qolê Mehreban bidin bibirîn, ew ligel wan de bi šerekî sexte ve hatin bikevtin. Di germîya vî šerî de yarmetîyên Xusro Paša bi firyada Qolê Osmanî ve li Mehrebanê de hate bigihaštin û Zeynel Xan xerab hate bišikandin û çend hezar Kes jî lê hatin bikuštin. Herwehajî ew bi xwe jî ji bal Šah ve hate bidarvekirin û di šuna wî de Restem Xan bi Serdar ve hate binîšankirin. Šahê Iranê bi xwe jî ve ligel Leškerê xwe de ji Isfehanê ji bona gorepana šer hate birêkkevtin.

Xusro Paša li dawîya vê kamwerîya gewre de ruwê xwe ber bi Sernavînîya Erdelanê ve date veda, ya ku ew keleha Hesen Abad bû û Sernavînîya Xan Ehemed Xan bû. wî ew date bitalan û biwêrankirin. Di axlêva sala 1040 k.- 1630 z. de ew bi ber devê Hemedanê hate bigihštin. Li dawî wêrankirina Hemedanê û Dergezîn de û li paš talankirin û kuštarekî zor de Serek Wezîr Xusro Paša ji bona ser begdadê hate bivegerandin. Wî Çil rojî dor lê date pêçandin. Belam hîç pê nehate bikirin. Wî xwe ber bi paš ve di ser rêya Musilê de di sala 1041 k.- 1631 z. de date bivekišandin. Hêštajî Serek Wezir Xusro Paša ji Musul dernekevtibû, Xan Ehmed Xan xwe ji bona ser Šarezor date helkotandin û wî ew date bizeftkirin.

Derbarê dawîya serdarîya Xan Ehmed Xan û Pêhatîynê wîna de agehdarîyên wisa bi destên me ve nehatine bikevtin. Di demekê de Xan Ehmed Xan bi hoyê sitemkarîya Šahê Sefewî ve ruwê xwe li dewleta Iranî de date wergerandin û ew ji bal Šehrîyar Osmanî de li bajarê Musilê de hate bidanîn[229]. serdarîya Erdelanê bi destên Sulêman Xanê Erdelanî

[229]Von Hemmer Xwedîyê mêjûwa dewleta Osmanî di vî babeti de bi kurtî ve dibêje: Ku Xan Ehmed Xan ji reftara bedî Šahê Sefewî de hate bitûrekirin. Pêhatîyê Šah Ebas zor û stema wî beramber bi Xan Ehmed Xan ve wer pîs bû, ku wî çavên Kurê Xan Ehmed Xan datin biderxistin. Xan Ehmed Xan beramber bi vê zordariya hanê ve neçar bû, ku ew dev ji Iranê bide biberdan û ew ji bona nik Derwleta Osmanî li Musilê de bête bihatin.

Kuçûk Ehmed Paša ji bona Dergehê Bilind li Istenbolê de li ser hatina Xan Ehmed Xana de date binivîsandin. Dergehê Bilind jê re Xelatên Sunî û Nîšana Beglerbegîyê û Nîšanên din datin binardin û bipevekirin. Ew ligel Ehmed Paša de bi Leškerekî gewre ve ji bona ser Iranê çûn. Li dešta Mehreban de ew ligel Iranîyan de berengari šer bûn.Du rojan vî šerî date bidirêjkirin û têde sipahê Turkî U Kurdî hate bitar u bimarkirin û Ehmed Paša jî hate bikuštin. Xan Ehmed Xan pir

ve hate bikevtin, yê ku ew bi xwe jî ve ji wê Malbatê bû. Renge, ku di zemanê Sulêman Xan de di mêjûwa 1694 z. de Sulêman Begê Bebe ji bona ser Erdelanê xwe dayite rakišandin. Evejî dibe, ku ew di pêla serdarîyeke sist u bêxêrî Erdelan de hatibe bikirin. Bešekî Erdelan bi jêr leyandina Baba Sulêman ve hate bikevtin. Belam li dawîya Salekê de Srdarê Erdelanê bi yarmetîya dewleta Iranê ve Baba Sulêman date šikenandin û welatê xwe jê date bisitendin.
Li gešta cenga Walîyê Begdadê Hesen Paša de di sala 1143 k. de ji bona ser Hemedanê Serdarê Erdelanê Elî Qelî Xan bû, yê ku ew bi bê šer ve bestevanê dewleta Osmanî bû; çunke, ew ji bal dewleta Iranî ve ji cihê wî hatibû bidaxistin. Wî gelek hêvî li ser alîkarîya Hesen Paša de dabû bigirêdan. Li ser vê jî de Xane Pašayê Bebe bi fermana Hesen Paša ve Erdelan date bidagîrkirin. Elî Qelî Xan û zor Gewreyên wî jî serên xwe ji bona Xane Pašayê Bebe dane bitewandin.

li dawîya šerê Šerefxanê Efxanî û Ehmed Pašayê Serdar de di Dêsembera sala 1726 z. de Mîrnešînîya Erdelan ji bona Xane Pašayê Bebe hate bidan; jiber ku ew bi hoyê šikenandina sipahê Osmanî bû. Çar Salekî û tanî hingama Nadir Šah Erdelan di nava destên wî de hate bihištin. Belam gava ku desthilatîya Iranê bi destên Šah Tehmaseb Qelî ve hate bikevtin û wî Leškerê Osmanî ji nava xakê Iranê date biderkirin. Wî welatê Erdelanê jî ji bona Subhan Werdî Xanê Erdelanî date bidan û serdarîya Bebe-Baban- hate bidawîkirin.

Di sala 1793 z. de Sulêman Pašayê Serdarê Bebe-Baban- bešek ji welatê Erdelanê date leyandin, gava ku wî ji bona cara duwem Selîm

---

bi dilšikestî ve ji bona Musilê hate bivegerandin.

Vê bezandina hanê zor li ser vî Mîrê mêrxas û gerans û Nevîyê Šehrîyar Selah El-Dîn de date bikêrkirin. Ew di sala 1064 k. de hate bimirin.

Jiber ku malikên Farisîyên tên, mêjûwa zayina wî û mirina wî didin bitomarkirin, em wan li vêderê de didin binivîsandin. Me ew ji Rojnama Jînî Kurdî dayite biwergirtin:

Xan Ekrad Yani Xan Ehmed — Sal Bext 1002 emde zi Edem bîrun
Sal kecbext 1023 yaft Hukum û cilus — Dexelet 1039 kešt wele û mecnûn
Baz Suhbet enderxem 1040 — yaft Hukmi zibîštir Efzûn
Sal Xemha 1046 hezîmetiš dadend — Reft bîrun ez Eyn zemene don.

Pašayê Mamê xwe li Qizilçe de date šikenandin û wî cihê wî ji xwe re date biwergirtin. Belam zor pê neçû, Subhan Werdî Xan ew ji welatê Erdelanê date biderperandin. sala duwaî bi navtêdana Kerîm Xanê Zendî Sulêmaan Paša dîsan ji bona ser Erdelanê çû û wî bi yarmetîya Leškerê Kerîm Xan ve bajarê Sune date bizeftkirin. Li dawîya Salekê de Sulêman Paša hate bikuštin û Elî Begê Kurê wî bi Serdarê Mîrnešînîya Erdelanê ve hate daîn. Mohemed Paša Birayê Sulêman Paša jî li keleha Çewalan de Serdar bû.

Mîrên Zaroyên Erdelanê ligel Aga Mohemed Xanê Qaçarî de hevalbend bûn, yê ku ew Dujminê herî gewreyî Malbata Zend bû; jiber vê jî Kerim Xanê Zendî pištbanî li Mîrên Baban de dida bigirtin. vê zîneta hanê zor caran Leškerê Iranê ji bona ser Erdelanê û Šahrezorê dayite hênanîn û zor caran jî wê Leškerê Begdadê ji bona wan navan dayite anîn.

Li dawîya Subhan werdî Xan serdarîya Erdelanê ji bona nav destên Xusro Xan di sala 1168-1214 k. de hate bikevtin, yê ku wî bi navê Gewre ve deng û bang dayite bisitendin[230]. Li sala 1190 k. de Ehmed Paša Walîyê Begdadê bi Hêzeke mezin ve ji bona Kermenšanê hat û Mohemed Pašayê Bebe ji bona Sune çû. Mohemed Paša Leškerê Erdelanê date šikenandin û wî Bane jî date bigirtin. Di šerekî din de wî Xusro Xan xerab date bišikandin. Belam zorî pê neçû, Leškerê Kerim Xanê Zendî di bin Komandarîya Kelb Elî Xan de bi Erdelanê ve hate bigihaštin û wî Mohemed Paša date biderperandin û ew tani dewir û berên Kerkukê hat.

Bi kurtî ve li hingama serdarîya Bebe de Erdelan zor leyandin û wêrankirin date bidîtin. Li dawîya Xusro Xan de Eman El-Lah Xanê Kurê wî, yê ku disan nav û banga wîyî Gewre hebû, ji bona cîgehê bavê xwe hate birûništin. Wî ji sala 1214 tanî 1240 k. de dayite biserdarîkirin. Ev Serdarê hanê bi rastî jî ji bona zanebûn û avanîya welatê xwe zor xerîk bû. Wî Šarê Sune zor date bicuwankirin. Wî ew bi sernavînyîa Zanistîyê, Wêjeyê Xwešxuwanîy dêate bikirin. Sêr Con Malkom û Rêç mêvanê wî bûn. Wan zor pesnê serpereštî û karê wîna dane bikirin. Li dawîya vî Serdarî Xusro Xanê Kurê wî, yê ku ew bi navê Nakam binav û deng bû, ji bona šûna wî hate birûništin û wî Deh Salekî date biserdarîkirin. Di Xwešxuwanîyê û Wêje de behrek wîyî pirî bilind hebû. Mah Šeref Xanim Xwešxuwa bi nav û bang ve Jîna vî Serdarî bû. Li

[230]Mêcer Son dibêje: ku Xusro Xanê duwem Keça Šah Fetih Elî ji xwe re dayite bixwestin. Belam renge, ku ev Xusrowê yekem be.

dawîya mirina wî de li zemanê Rida Qeli Xanê Kurê wî[231] de šer û heran di navbera Begzadeyên Erdelanî de hatin bivêketin û Walîyê wanî Šanzdeh Salî li Tehranê hate bizindankirin. Inca li dawîya mirina Mohemed Šah de ew hate birizgarkirin Eman El-Lah xan Birayê wî, yê ku ew Serdarê dawîyî Erdelanê bû, ji sala 1265 tanî 1284 k. de date biserdarîkirin. Li sala 1268 k. de serdarîya Tehranê bi dozandina behanan ve date bidestpêkirin. Di sala 1284 k. de Nasir El-Dîn Šah Xanedana Erdelanî ji binî ve date binabûdkirin û wî Ferhad Mîrzayê Mamê xwe bi Serdar ve ji bona ser Erdelanê date bidanîn. Bi rastî jî hêšta li vê Xanedana hanê de hin Kes mane. Belam hîc di destên wan de niye.

Mîna ku me li Jor de li ser de date biaxivtin, ev serdarîya Erdelanê Yekek li Serdarîyên Gewreyên Kurdên Iranê de bû. Li gora Šerefname di navekê bi carekê ve ew biserêxwe bû. Wê Pûl bi navê xwe ve lêdidan û peyvdariya roja îne jî bi navê Serdarê xwe dida xwendin. weha diyare, ku vê hingama Serbixweyê ji dawîya serdarîya Ilxanî ve ji destpêka sedsalê Heftemê Koçî ve tanî hingama Sefewî de di destpêka sedsalê Dehemî Koçî de ango Du sed Salî dayite demandin. Li dawîya vêna de bi bendbûna xwe ve ligel Iran û hin caran jî Osmanî de dîsan Serxwebûna navxweyî tanî li navçuna Xan Ehmed Xan dida biparastin. li dawîya vêna de û gewrebûna desthilatîya siyasîyî Iranê bi ser ve hate zalbûn. Di Encam de di sala 1284 k. de bi carekê ve ew ji bona Goristana mêjûwê hate biveguhestin[232].

[231]Mêcer Son dibêje: ku navê vî Serdarî Xulam Šah Xan bû. "Raportê Sulêmanîyê", Kelkuta, sala 1918 de.

[232]Danervanê hêja di dawîya vê danavê de Dara Binemala Zaroyên Erdelanî de dayite bidanîn, yên ku ew li Iranê de bi nave Binemala Walî Zade hatine binavûbagkirin. Ew ji Nivîsteke Ingilîzî bi navê Ešîr û Peyên Rojavayî Iranê hatiye biwergirtin, ya ku ew di sala 1918 de hatîya biçapkirin. Me nikaribû ew niha bida wergerandin û li vêderê de bida bitomarkirin. Me ew date bišûnxistin, tanî ku kês ji me re bête bivedan, da ku em ji bona tevaya Darên Binemalên Serdarên Kurdistanê vî kari bidin bikirin. (M. E.).

## *Derîyê Duwanzdehemîn*

## 12. Dewleta Padîšahên Kurd yanjî Kurt ji sala 643-785 k. de

Ev serdarîya hanê li gora bîr û bawerîya Krozon li Sîstanê de ji bal Ešîra Kurd Gelî di sala 634 k.- 1245 z. de hatîye bisazkirin û wê tanî 785 k.- 1383 Z, de dayite bidirêjkirin. Pir mexabin, ku tanî hêsta jî hîç bi dirêjî ve li ser vê serdarîya hanê de agehdarî bi destên me ve nehatine bikevtin. Bes û bi tenha ve ewende em dizanin, ku ev Êla xurtî hanê di Mêjûweke ne diyar de ji Kurdistanê ji bona wêderê hatiye yanjî ew hatîye binardin.

Krozon ev agehdarîyên hanê ji Nivista hêjayî Rawilson bergê yekem, ji Perê Rûpelê wêyî 228 dayite bigirtin[233].

Nivista Qamus El-Ilama Turkî di vî babetî de li ser vê serdarîya hanê de dibêje: Ku ev serdarîya hanê di nêzîka sedsalê Heftem û Heštemî Koçî de li welatê Herat, Gor, Gurcistan û Sîstan de di hingama Ilxanî de hatîye bipeydakirin. Ev serdarîya hanê ji bal Šems El-Dîn Mohemed di sala 643 k. de hatîye bisazkirin, yê ku wî šûna Bavê Dêya xwe di serdarîya Gor de dayite biwergirtin. Di hingama Šahînšahê Menqaanê Ilxanî de fermana Šehrîyarî ji bona pêrûniština serdarîya wî û sipartina Mîrnešînîya Haratê ji bona wî hatîye biderkevtin. Mîrnešînîya wêna sî û

---

[233](ji vir û pêda ev dana çapa Kurdî de niye. Belam ew di dana çapa wergerandina Erebî de tête bidîtin. Cuma).

sê salan dayite bidirêjkirin. Ew di hingama Šahînšahê Ebqaxanê Ilxanî de di sala 676 kocî de hatîye bimirin. Ev Mîrê hanê Serperešvakî zor baš bû û ew Xwešxwevakî dildar bû. ji Malbata wîna Šeš Pêhatîyên wî ji bona serdarîyê hatine hilkišandin. Di hingama hatina Pêhatîyê wîyî Heftemîn Padîšah Meez El -Din Bavê Hesenê Mohemed de wî kêsa nema Šahînšahîya Ilxanîyan li iranê de ji xwe date biwergirtin û wî sinorê Wlatê xwe date firehkirin û Serxwebûna xwe date bidazanîn. Li paš vî Padîašhê hanê de Mîrê kurê wî Xeyas El-Dîn ji bona serdarîyê hate birûništin. Wî Serxwebûna xwe tanî pêla Teymurxan date biparastin. Teymurxan ew li Heratê de date dorlêpêçandin. Wî ew û tevaya Binemala wî di sala 783 k. de datin binabûdkirin.

Dirêjîya vê Serdarîyê weha bû: Li paš Šemis El-Dîn Sazvanê pêšyî vê Binemalê de Kurê wî Rikin El-Dîn šûna wîna date bigirtin. serdarîya wî ji sala 676 tanî 694 Koçî de date dirêjikirin. Li paš vî de Kurê wî Fexir El-Dîn šûna wî date bigirtin, yê ku ew Heft salan di pêla Bavê xwe de girtî bû. Li paš de li ser hêvîya Mîr Newroz ji Bavê wî de ew hate biberdan û ew bi Penahinde ji bona nik Xazan Xan çû. Ew bi saya Mîr Newroz ve ji bona ser Textê Serdarîyê hate hilkišandin. Belam ew beramberî Mîr Newroz bê nan û xuwê hate biderkevtin. Gava ku Mîr Newroz jiber Mîr Qeltex date bibazdan û wî xwe lê date bigirtin.Wî ew ji bona Dujminê wî date berdestkirin. Pêlekê wî serê xwe li ber Šahînšah Xazanxan de date birakirin. Herwehajî wî šerê Birayê xwe Olçaytuxan date bikirin. Weha bi vî rengî ve wî rojên jîyana Serdariya xwe bi šer û pevçûnan ve ligel Dujmin û Hemsayên xwe de Duwanzdeh salan jê Deh Sal di jîna Bavê xwe de û du sal jî li pey wî de date birabuhurandin. Wî di sala 706 Koçî de ji bona Dunya din date bibarkirin. Li paš wî de Xeyas El-Dînê Birayê wî bi fermana Ilxanî ve ji bona serdarîya Gor û Xuresan hate binîšankirin. Ew di sala 721 Koçî de ji bona serdana Mala Xwedê çû. Di vegera xwe de wî rêya xwe bi paytextê Ilxanî ve date bixistin û ew bi bidîtina Šehrîyar Bavê Seed û Mîr Çopan ve hate bihêjakirin. Gava ku di navbera Šehrîyar Bavê Seed û Mîr Çopan de pevçûnê date bidestpêkirin û Mîr Çopan ji bona nik wî hate bipenahindekirin, wî dostanîya xwe ligel Mir Çopan neda biparastin. Wî bi bêbextî ve ew û Kurê wî dane bikuštin û serên wan wî ji bona Šehrîyar Bavê Seed dane birêkirin. Weha bî vî rengî ve li paš serdarîya Bîst û Du salan de ew hate bimirin. Li paš wî de Kurê wî Šemis El-Dîn ji bona ser Serdarîyê hate hilkišandin. Wî guh bi kar û barên Mîrnešînîyê ve nedida bidan. Ew bi kêf û meybazîyê ve hatibû bikevtin. serdarîya wî pir neda bidirêjkirin. Ew li paš Deh Mehan

de di sala 730 Koçî de hate bimirin. Li paš wî de Birayê wî Hafiz Du salan serdarîya welêt date bikirin. Di nava sala 732 Koçî de Birayê wî Meez El-Dîn ji bona Serdarîyê hate birûništin, yê ku ew bi mezintirîn Padîašhê Kurt ve tête bidîtin. Gava di sala 743 Koçî de Šehrîyar Bavê Seed ji bona Dunya din date bibarkirin, wî Serxwebûna xweyî bi carekê ve date bidazanîn. Wî bi navê xweve pûl datin bilêdan û wî peyvdarîya roja înê li Xuresanê û welatê Gorê de bi navê xwe ve dida xwendin. Weha bi vî rengî ve wî bi dadwerî û zenebûn ve serpereštîya welatê xwe dida bikirin. Ew di sala 771 Koçî de bi dilovanîya Xwedê ve hate bigihaštin. Zanistvan Seed El-Dîn El-Teftezanî Nivista xweyî bi nav, bang û dirêj ve di zanistîya Ziman de bi navê vî Padîšahî dayite binivîsandin. Li paš wî de Kurê wî Xeyas El-Dîn Pîr Elî ji bona ser Textê Serdarîyê hate hilkišandin. Ew Heštemîn Padîšahê Dawîvanê vî Binemala Kurtîyî bi nav û bang ve li Xuresan û Gor de bû. Wî Duwanzdeh salan date biserdarîkirin. Li paš de Teymor bi Leškerên xwe ve li keleha Heratê de dor lê date pêçandin. Vê dorlêpêçandina hanê bi šerên pir dujwar û dirêj ve date bidirêjkirin. Wî bi qehremanî ve liberxwedana xwe date bikirin. Belam di dawî de ew ji bona nava destên Teymur hate bikevtin. Wî ew û tevaya Binemala wîna datin biqirkirin. weha bi vî rengî ve serdarîya Koma Kurd li Xuresanê jî de hate bidawîkirin[234].

---

[234]Vê serdarîya hanê hin ji Kanîyên nuh wê bi serdarîya Koma Kurd li Xuresan û Sîstanê de didin binavkirin, ya ku ew di Nivistên kevnarî mêjûwê de bi navê Padîšahê Kurt yanjî Kurên Kurt ve bi nav û bangin. Weha ew bi vî navê hanê ve hatîye binavkirin; jiber Sazvanê wê Šemis El-Dîn Mohemed Kurt bi vî navî hatibû binavkirin. Ew bi Kurt ve hate binavkirin, gava ku wî rêzên Xwarzimîyan di šer de datin birandin. Xwarzimiyan ev navê hanê dane bilêkirin; jiber di zimanê Xwarzimî de Kurt bi têgihiština Birrînê tête biliberkevtin. Hin jî di bêjin, ku Kurt bi têgihiština Gewre yanjî Ciwanmerd tête biliberkevtin. Mêjûvan di tomarkirina gotinê jî de neyekin. Hin ji wan bi Kert û hin ji wan bi Kurt ve vê gotinê didin bitomarkirin. Ew bi Kert ve bi nav û bange. Herwehajî cudabûn di koka vê Binemalê jî de di nava Mêjûvan de pir gewre tête bidîtin. Magelo ew Farisî ye, Kudî ye û Tacîkî ye, yaxud ew Turkî ye yajî Turkumanî ye?.
Xwe re li Cami El-Duwel ya Muncum Paša, Cîhan Ara ya Xefarî, Murat El-Edwar û Murqat El-Exbar ya Eri bide bitemašekirin. (M. E.).

## *Derîyê Sêzdehemîn*

## 13. Dewleta Zend ji 1202 - 1167 k. de.

mêjûwa Iranê ji destpêka kuština Nadir Šah tanî hingama sazkirina serdarîya Qacar de bigir nêzîka Nîv Sed salekî ve bicegeh li rojgarîya Kerîm Xanê Zend de zor tevlihev bû.
Li pêš peydabûna Kerîm Xan de rewša Iranêyî Hundur bi wî rengî ve bû. Di dema ku Ehmed Xan ji bona vegerandina ewletîyê ji bona Xuresanê hatibû bikarmendkirin, Gewreyê Ešîra Qacariyî Turkumanî Mohemed Hisên Xan xwe li Ister Abad de dabû bidamezirandin. Wî hemû welatê Mazenderan jî ji bona jêr serdarîya xwe dabû hênanîn. Fethî Elî Xanê Bavê wî ew ji bal Nadir Šah hatibû bikuštin; jibervêjî ew ligel Nevîyên Nadir Šah de di dujminatîyê de bûn. Ehmed Xan ji tirsa vê ve, da ku Mehemed Hisên Xan îš û kar lê nede bitêkdan, Leškerekî Efxanî ji bona ser Mazenderan date binardin. Belam ev Leškerê hanê hate šikenandin û ziyaneke zor gewre pêve hate bikevtin. Ev jî bi hoyê bêtirbûna hêz û desthilatîya Gewreyê Qacar bû.

welatê Azirbêcanê di vê pêlê de li jêr serpereštîya Esed Xanê Efxanî de bû. welatê Gêlanê li jêr serpereštiya Yekekî ji Serokên cih de bû, yê ku ew bi navê Hidayet Xan ve dihate binavkirin. Wî Serxwebûna xwe date bidazanîn. Gurcistan jî li jêr serpereštîya Heraqliyos de bû, yê ku ew Generalekî Fileyî Nadire Šah bû. wer dihate biderkevtin, ku çavên vî Generalî jî ji bona Serxwebûnê dihatin bigerandin.

Di vê navê de zîneta Jorî Iranê weha têkçûbû, ku Elî Merdan Xan jî, yê ku ew Yekek ji Serokên Ešîra Bextiyar bû, ji bona ser Esfehanê çû û

wî ev bajarê hanê ji Bavê El-Fetih Xan Welîyê Šahrux date bizeftkirin. Da ku ew dilê Tudeyê vî paytextî ber bi xwe de bide rakišandin, wî Yekek ji Zaroyên Sefewî de ji bona ser Textê vî bajarî date bidanîn Belam ligel vê jî de bi bê yarmetî netuwanî ew vî îšî bide biseranîn. Ew neçar bû, ku ew çend ji Gewre û Maqulan ji bona nik xwe bide bibangkirin. Yekek ji van jî Kerîm Xanê Zend bû, yê ku ew ji Xanedaneke gewre nebû[235]. Ew di Orduwa Nadir Šah de Komandar nebû. Belam wî bi mêrxasî û sincîya xwe ve nav û bang ji xwe re dabû bisitendin.

Mêjûvan dibêjin: ku Kerim Xan di pêšî de ligel Elî Merdan de derbarê bidanîna Šehzadeyekî Sefewî li ser Text de yek bîr û bawerî bûn. Biryara wanan weha bû, ku Yekek ji wanan li layê vî Šahzadeyê hanê de bi Wezîr be û yê din jî bi Serdarê Supah be. Hin ji Serçavîyên din dibêjin, ku Kerîm Xan nexwestîye, ku ew ligel Elî Merdan Xan de xwe bi mîna wî ve bide bidanîn. Belkî bi tenha ve li dawîya mirina wîna de wî çavên xwe ji bona cihê wî dabûn biavêtin. Çunke, ev Serokê Bextiyarî zor pîr û Ocax kor bû.

Li dawîya girtina Esfehanê de Elî Merdan derbarê Tudê wêve zor sitem date nuwandin. Belam Kerîm Xan pir li ber Gerekê Culfayê de, yê ku ew ji bal wî ve hatibû leyandin, date bidan û wî nehišt, ku xwîn û malên Gerekê wî bêtin birijandin. Vî karê hanê zor kêra xweyî bilind date bikirin; çunke, Bešê pirî vê Taxê File bû. Belam Kerîm Xan ne bi dûrbûna dilgermbûna Ayînî ve belkî bi bilindbûna sincîya xwe ve ligel wan de date bireftarkirin; jiber wîna bi mirovanî û mehrevanîya xwe ve nav û bang ji xwe re dabû bisitendin.

Bi nav û bangbûna Kerîm Xan û dildarîya Tude jê re zikrešîya Elî Merdan Xan ji bona wî date anîn. Ewende pê neçû, ku bi carekê ve navbera wan hate têk û pêkçûn. Elî Merdan Xan dida biremankirin, ku ew Kerîm Xan bide bidûrkirin, da ku ew li Tudeyê Taxa Culfa bide bitengavkirin. Ev remana hanê li nik xelkê de diyar bû. Li layekitirî jî de wî Walîyê Esfehanê date bikuštin. Diyar bû, ku Tawankariya wîyî duwem dê di bikuština Kerîm Xan de bête bidîtin.

Bi kurtî ve nigaš û rewrewka di serê Eli Merdan Xan de di encam de bi hoyê šer vêxistinê ve di nava Herdu Hevalan de hate bikirin. Kerîm

[235]Li gora Goyên Xoye bi xwe ve Kerîm Xan Kurê Imak bû, yê ku ew Kelešekî bi nav û bang bû. Navê Bavpîrê wî nayête bizanîn.

Xan bi xwe û Hevalbendên xwe ve beramber bi Elî Merdan Xan ve hate westandin û wî šer li ser wî de date bidazanîn. Li dawîya çend šerî de Elî Merdan Xan bi destê Serokî bi navê Mohemed Xan ve di sala 1160 k.-1753 z. de hate bikuštin. Bi vî rengî ve Irana Jêrî bi bê Hember ve ji Kerîm Xan re hate bimayîn. Belam li pêš vêna de, da ku ew bituwanî li vî Welatî de bi xwešîtî Šehrîyarîyê bide bikirin, divabû, ku ew çend Dujminên xurt jiber xwe bide malandin.

Bešê herî zorî Leškerê Kerîm Xan ji Ešîra Lek bû, ya ku Zend Tirek jê bû. Çi bi hêz û çi jî bi mêrxasîya xwe ve ji bona serdarîya Iranê ew lidarbûn. Herwehajî Tudeyê Bajaran jî hemû Hevalbendên Kerîm Xan bûn; çunke, ew li sincîya wîyî pak û dadwerîya wî de pištrast bûn. Eširên Ereb jî bi dil û can ve ligel Kerîm Xan de bûn. Eširên Turk ligel Dujminên Kerîm Xan de bûn, tevlivêjî de wan bi çavekî rûmet ve temašeyî Kerîm Xan didan bikirin.

## 1. pêla Kerîm Xan

Li dawîya mirina Eli Merdan Xan Du Dujminên bi hêzî Kerîm Xan mabûn: Yeke jê Esed Xanê Efxanî bû û yê din Mohemed Hisên Qacarî bû. Kerîm Xan di pêši de ruwê xwe ber bi Esed Xan ve date bibivekirin. Li nêzkîa Qezwîn de berengarî šerê wî bû. Ew bi rengekî ve hate šikenandin, ne ku ew bes tenê destên xwe ji ser Esfehanê bide bihelgirtin, belkî jî wî waz li Šêrazê jî de date hênanîn. Kerîm Xan li dawî šikenandina xwe de xwe ji bona nava Šaxên di navbera Newala Farisî û Dilava Farisî de li nêzîka Dola Kermsîr date kišandin. Beramber bi vê zîneta hanê ve rewša Kerîm Xan hate bidujwarkirin.

Restem Sultanê Xešt, -Xešt Gundekî bi çûk bû û ew li nêzîka Lûtê Šaxekî bilindî zal bi ser Kermsîr de bû.-, li hêre de yarmetîya Kerîm Xan date bikirin. Li Derbendê sextî Kumariç de wî Esed Xan date šikenandin. Kerîm Xan jî bi xwe u Leškerê xwe li Dolê de hatibûn westandin. Mayînên Leškerê Esed Xan, yên ku ew li Derbendê Komarîc de ji destên Restem Sultan hatibûn birizgarkirin, li Dole de û li nêzîka Xešt de tûšî Kerîm Xan bûn.Zor li wan hatin bikuštin. Biserkevtina Kerîm Xan bê hampa bû. Bešê Leškerê wî, yê ku ew ji Ešîrên wan navan bûn, bi šûna mayînên derçûyên Dujminin ve hatin bikevtin û ew tanî Šîrazê bi šûn wan

ve çûn û ew dane bigirtin. Li dawîya vê rûdana hanê de Esed Xan êtir nema ji bona beramberbûna Kerîm Xan hat.

Esed Xan di šerekî de ligel Mohemed husên Xan dîsan ew hate bišikenandin û wî ji bona Begdadê date bibazdan. Walîyê wê her çenjî de wî pir rêz lê date bigirtin, belam wî pišta wî nedagirtin, ku hêzekê ji bona wî bide bipêškeškirin, da ku ew welatê xwe bide bisitendin. Li Paš de wî xwe ji bona nik Ostandarê Gurcistanê Hiraqliyos date biavêtin, belam wî jî ji bona wî hîç neda bikirin. Di dawî de wî xwe ji bona layê Kerîm Xan date bihavêštin. Kerîm Xan zor rêz û rûmet lê date bigirtin û wî ji bona wî cihekî bilind pê date bidan. Cihekî bilindîyî wetov ku ew ji bona Kerîm Xan bi cihê bawerîya wî ve bû. Ewende pê neçû, ku ev Hemerê Dujminê no bi Dostekî bašî Kerîm Xan ve hate bikirin.

Dujminê herî xurtî Kerîm Xan Muhed Husên Xan Qacar bû. Ev Ešîra Turkîyî Qacarî li zemanê Teymur Leng de ji Surî ew ji bona Iranê hatibû binardin. Ew Yekek ji Heftên Ešîrên ku wan Šah Ismail ji bona ser Text dabûn bihênanîn.

Karîm Xan li paš bi destkevtina welatê Faris de û li paš, ku ew baš hate bicigîrkirin, wî zor kelk ji šer û herayên di navbera Esed Xan û Mohemed Husên Xan de ji xwe re date biwergirtin. Ne ku bes tenê wî welatê Faris ji xwe re dabû bigirtin, lêbelê jî wî welatê Esfehan û Bešekî ji Iraqa Ecem jî ji xwe re dabû bisaxkirin. Belam ewende pê neçû, ku ew Bešê zorî van Welatan bi neçarî ve bide biberdan; çunke, Mohemed Husên Xan li dawîya šikenandina Esed Xan de welatê Ezerbêcanê bi ser welatê xwe ve date bivekirin û wî bi Leškerekî gewre ve ruwê xwe ber bi Esfehanê ve date bivekirin. Leškerê wî wisa gewre bû, ku li dawîya Nadir Šah de tanî wê rojê de Leškerekî wetov hîç li dora Serdarekî de nehatibû bikomkirin. Kerîm Xan date bihewildan, ku ew berbestî vê Orduwê bide bikirin. Belam bê kar bû. Ew neçar bû, ku ew ji bona Šîrazê bête bivegerandin û ew li wêderê de liberxwedana xwe bide bikirin.

Mohemed Husên Xan li paš de ku wî xwe baš date bigirtin, wî Hešt hezar Kesek li Esfehanê de date bicihištin û ew bi Sê hezar Kesekî ve ji bona dorlêpêçana Šîrazê bi rê ve hate bikevtin. Di wê demê de li dorhêla Šîrazê de hemû merc ji bona Hêrîšvanan alîkar bûn. Hemû Berî tijê dexlê pê gihištîbû. Gava ku ew bi Šîrazê ve hate bigihaštin û hêštajî wî Topên xwe nedabûn bisazkirin, Ew di sala1170 k.- 1757 z. de tûšî hêrîša Šx êlî Xan bû, yê ku ew Serokekî bi kar û azayî Ešîra Zend bû. Ji niškêve wî ji bona ser bargiranî û dawîya Lekšerê Mohemed Husên Xan date bidadan. xelkê wan navan jî, yên ku wan Mal û Mendalên xwe ji

bona nava Çiyayên wê dorhêlê biribûn, hemûyan yarmetîya Šêx Elî Xan dane bikirin. Ev hêrîša hanê bi hoyê kêmbûna Zad û Zexiîê ve bû û Leškeerê Mohemed Husên Xan jî bêhn lê hate bitengkirin. Li layekîtirjî de di dirêjbûna kišandina dorlêpêçanê de ev leškerê bê best û bend, yê ku ew bes û bi tenha ve bi zordarîya Serokên xwe ve hatibûn bikomkirin, hate bibêzarkirin. Biçgeh li vêjî de lihevhatin û dilsozî di nava wan de nedihate bipeydakirin. Hinek ji wan hêzan taze ji bona jêr Çek dabûn anîn. Hinek ji wan jî ji Mayînên Leškerê Esed Xan dihatin bipêkhatin, yên ku wan çend Mangekî li pêš de ligel Mohemed Husên Xan de dabûn bišerkirin.

Di vê navê de leškerê Gorc û Sebkarê Kerîm Xan li Dorpêçvanan de zor tengavî dane bikirin. Ne bes tenê wan Bajar bi mêrxasî ve li ber datin bidan, belkî ji bona bibelavkirin û ziyanlêdana Dorlêpêçvanan wan hîç dirêxî nedan bikirin. Di encam de îš bi radeyekî wetov hate bivegehaštin, ku hemû rojê Bešekî ji leškerê Mohemed Husên Xan jihevdû dihate bibelawelakirin. Vî karî Serokê Qacaran date bineçarkirin, ku ew waz li Dorlêpêçanê de bide hanîn. Bi rastî jî kirt û pirt ve wî Šîaz date bicihištin û ew ji bona Isfehanê hate bivegerandin. hêza ku wî ji bona Dorlêpêçana bajarê Šîrazê li dûxwe de dabû bihištin, ew jî jihevdû hate bibelawelakirin. Mohemed Husên Xan li Isfehanê jî de xwe neda bigirtin û ew ligel Orduweke Duwanzdeh hezar Kesekî de lawaz û ziravšikestî xwe ji bona Mezenderan date bigihaštin.

Kerîm Xan li dawîya ku wî xwe baš date bikomkirin û ewletîya welatê Farisî date girawkin, wî ruwê xwe ber bi Isfehanê de date bivedan. Ew ji bal Tudeyê Šarê Isfehanê di sala 1170 k.- 1756 z. de bi aheng û semawend ve hate bipêšîwazîkirin. Piranîya bajarên Iraqa Ecem jî bi vî rengî ve bi destên wî ve hatin bikevtin. Kerîm Xan ji bona vegrandina xurtbûn û karnînbûna xwe pêwistî biserkevtinê bû. Bi rastî jî li šerên ku wî dabûn bikirin, li hinekan de ew hatibû biserkevtin. Belam di pirbûna wan de ew biserkevtinê nehatibû bibextiyarkirin. Zîneta wîna zor caran cîgehê hêvîyê nebû. Belam ew rêzlêgirtina ji bal Tudeyê Bajaran ji bona wî ji kevê date biparas u di encam de wê ew date biserxis.

Kerîm Xan ligel vêjî de, di wan welatên ku ew bi arezuwa xwe ve pêve hatibûn bibestandin, bi bašî ve îš û karên wan date birêxis. Li layekîtir jî de wî Šêx Elî Xan ligel Leškerekî helbijartî de ji bona ser Mezenderan date binardin, da ku ew bi carekê ve Mohemed Husên Xan neçarrî sertewandinê bide bikirin. Ji bona vê yekê jî divabû, ku ew di pêšî de Yekitîya Ešîrên Qacarî bide bitêkûpêkdan. Ev Ešîra mêrxas û pir Sê

Ber bû: Yekek ji wan li dorhêla Kence de bû, ya duwem li hêla Mero bû û wê sînorê Xuresanê jiber hêrîşên Ozbêkan dida biparas, Ya Sêyem jê li welatê Ester Abad de bû. Ev Berên hanê bi xwe jî ve di koka xwe de li jêr desthilatîya Du Xanan de bûn. Yekek ji wan li pêš demekê de bi ser hemû Ešîrê de Serdar bû. Yuxarî Baš Xan di vê demê de çi bi dilbijandina Kerîm Xan ve û çi jî bi dilbijandina xwe ve Serdarê vê Ešîrê bû. Lihevrats- hainek bû, ku Navê vî jî Mohemed Husên Xan bû. Herdu Xan jî bi navê Mohemed Husên Xan ve diha binavkirin. Berberî û Dujminatîya di navbera herdu Xanan de hišt, ku Yuxarî Baš Xan ji bona nava Leškerê Šêx Elî Xan bête bitevlêkirin. Vê rûdana hanê Dujminê Kerîm Xan Mohemed Husên Xan date bilawazkirin. Ligel vêjî de Mohemed Husên Xan neçar bû, ku ew ligel Hêzeke lawaz de ligel Šêx Elî Xan de bi šer ve bête bikev. Belam di dema germbûna šer de Bešekî ji Leškerê wî ew date bicîhiš û ew bi xwe jî ve rizgar nebû. Ew bi dîlî ve hate bigir[236].

di encamê vê kamwerîya mezin de Mazenderan, welatê Gîlan û Perçeyê zorî Ezerbêcanê bi destên Kerîm Xan ve ha bikev. Belam welatê Ezerbêcan ewende pê neçû, ew tûšî leyandina Fetih Elî Xanê Serokê Ešîra Hevšar bû. Vî Serokê hanê gelek carî komek ji bona Dujminên Kerîm Xan dabûn bipêškeškirin. Vê carê bi eškere ve ceng li ser wî de date bidazanîn. Li Jêrî Tevrîzê de û li Dešta Qeçêmîn de hate bišikandin û wî ruwê xwe ber bi Ormiyê[237] ve date bivedan. Li dawîya dorlêpêçana çend Mehan de ku wî zanî, liberxwedan pê nema têtê bikirin, wî xw ji bona layê Kerîm Xan date bifirêdan û Kerîm Xan di sala 1173 k.- 1760 z. de lêhate bibuhurandin.

Fetih Elî Xan li pêš berdestbûna xwe de wî ligel hinekan ji Serleškerên Ordwa Kerîm Xan de ji bona kuša wîna dabû bipêwendîkirin. Belam ev vîlika kuša Kerîm Xan hate bieškerekirin. Fetih Elî Xan siza xwe date bixwarin. Herwehajî çend ji Serleškerên bi nav û bang jî ve hatin bihilwesatandin. Mêjûvanên Iranî dibêjin, ku bi hoyê vê bêbextîya

[236]Kurên Mohemed Husên Xan ji bona Turkistanê xwe dane birakirdin. Li paš Çar salan de ew ji bona nik Kerîm Xan ha û wî zor rêz û rumet ji bona wan date bikirin. Aga Mohemed Xan Kurê gewreyî Mohemed Husên Xan li paš de bi hoyê binabûdkirina Malbata Zend bû.

[237]Mêjuvanê bi nav û bang Strabo bi vî Bajarî ve Thebarma dayite bigo. Gûman têtê bikirin, ku Zeradešt li vî Bajarî de hatîye bizayîn.

hanê jî ve Serdarê Serleškerê bi nav û bang Šêx Elî Xan jî hate bidarvekirin. Belam ev Goya hanê bi rastî jî ve pêwistî bi pištgirê ve tête bidî.

Kerîm Xan di gišt šer û pevçûnên xwe de ji bona Serdarîyê û desthilatîya xwe yarmetîyeke baš ji Ešîrên Erebî hêla Dilava Farisî ji xwe re dida biwergir. Hinek ji Hêzên Ereb tanî Isfehanê ligel wî de çûn. Jiber vê jî reftara wî ligel wan de baš bû. Bes û bi tenha ve wî Lešker bi ser wan ve dida binardin, gava ku wan serî li ber wî de didan bihiladn, yanjî gava ku wan bêš û bacên xwe ji bona wî nedidan birêkirin. Ji bona nimûne serhildana Mîr Muhana Mîrê Bender Rîg[238], yê ku wî navbera rêya Šîraz û Bender Bošeher dabû birrîn. Bi vî rengî ve Kerîm Xan bi xurtî ve ew dida bisertewandin. Gava Šêx Sulêman Serokê Ešîra Keeb jî beramber bi Kerîm Xan ve serê xwe date birakirin, Kerîm Xan neçar bû, ku ew bi Leškerekî ve ji bona ser wî bête çûyîn. Šêx Sulêman bi Keštîyekê ve ji bona Giraveke nêzîk date bibazdan. serdarîya Kerîm Xan gelek carî bi hoyê nobûn û šerdagîrsandina Zekî Xanê[239] Birayê wî dihatebi êšandin. Vî Zekî Xanî bi carekê ve serê xwe li ber Kerîm Xan date birakirin. Wî xwe ligel hin ji Gewreyên Serleškerên Kurdên layê Ešîra Feylî de beramberî Kerîm Xan date biyekkirin. Belam ev Serrakirina hanê ji bona wî bi serî ve neçû. Ew hate bivegerandin û wî xwe ji bona layê Kerîm Xan date biavêtin. Kerîm Xan lêhate buhurandin û karmenditî pê date bisipartin. Wî ew ji bona ser Damegan[240] date binardin; jiber Husên Qelî Xanê Qacarî li wê Deverê de serê xwe beramberî bi Kerîm Xan ve dabû birakirin. Zekî Xan zû ev serrakirina hanê date bitemirandin. Husên Qelî Xan ji bona nava Turkumanan date biraykirin.

Šer û nobûna Zekî Xan bêgûman ji bona paraayîša Welêt bê sûd nebû; çunke, mehrevanî û dadwerîya Kerîm Xan mêranî bi hin Serok û

---

[238]Ev Bender Rîg li dûrbûna Nîv Derece de li Jorî Rojavayê Bender Bošeher têtе bikevtin.

[239]Zekî Xan bi Birayê Kerîm Xan ve hatîye bidanîn. Lêbelê ew him Amozayê wî bû û him jî ew Zirbirayê wî bû. Bicgeh li Zekî Xan Zirbirayê wî Iskender û Zirxweha wî ji Dayîka wî bûn. Belam ew ji Bavê wî nebûn.

[240]Damegan welatê Xanedana Pars (Eškanî) bû.

Serleškeran date bidan, ku ew li ber wî de serên xwe bidin birakirin; jiber ku wan dizanî, di encam de dê ew ji bal Kerîm Xan bêtin bilêbuhurandin. Belam êtir hemû Kesek hate bitêgihištin, ku her serrakirin dê ew ji bal Birayê wîyî sert bête temirandin û hîç lêbuhurandina Kerîm Xan ji bal wî ve nayête biguhpêdan. Serrakirin her li Damegan de bi tenha xwe ve nebû. Li mazenderan û zor cîgehên din jî ew hatibûn bipeydakirin. Belam ew hemû bi xurtî û darêcû ve hatin bikujandin. Zor caran jî pêš bigihiština lešker Serrakirvan ji hevdû dihatin bibelawelakirin. Bi kurtî ve sertbûn û nobûna Zekî Xan Iran ji serhildanan date bipakkirin û salên dawîyî pêla Kerîm Xan  ji bona nava westandin û bêdengîyê wî date bixistin.

Xweha Šah Husênê Sefewî Kurê xwe Ismailê Neh Salî bi alîkarîya Elî Merdan Xan ve ji bona ser Textê.Šahîyê date bihiladn. Îsmail Šah ji bal Kerîm Xan jî hate biparastîn. Kerîm Xan bi navnîšana Cîgirê Šah ve hate bitêrkirin. Mêldarîya wîyî biwergirtina cîgehê Serdarîyê nebû. Wî Šîraz bi paytextê xwe ve date bidanîn û ew têde hate bidaništin.Etir wî bi xwe ve nema serpereštîya lešker dida bikirin. Wî ew ji bona Serleškerên xwe date bihištin. Wî Leškerekî zor ji bona dorlêpêçana bajarê Besra date bikomkirin. Wî ew lešker ji bona jêr Komandarîya Birayê xwe Sadiq Xan date bixistin. Dibe, ku wî jî mîna hemû Serdarîyên pêšî Iranê jî ji bona girawkirina asayîša hundurû xwe xerîkî cengên Derve dîjî Turkan didan bikirin û wan ew bi bašî ve dida bizanîn. Li gor vê bidîtina hanê de wan Bîr û Bawerîyên Gištî ji bona mebest û armanca xwe didan bibernamekirin. Kerîm Xan dizanî bû, ku hîç tištek bi qed bizeftkirina cihên perest, yên ku têde Perestgehên Šîe têtin bidîtin, li nik Šîiyan de wan didin dilbijandin û bisergermkirin; jiber vê jî de Kerîm Xan vekirina welatê Iraqa Erebî ji bona xwe dabû biarmanckirin.

Kerîm Xan di pêšî de li ser Omer Paša Walîyê Begdadê de li nik serdarîya Istenbolê de date bigilîkirin; çunke, Omer Paša Bêšek ji bona ser Serdanvanên Iranî ji bona cîgehên perstên wan dayite bidanîn. serdarîya Osmanî ev gilîyê Iranî date bivegerandin û wê ew di ser guhên xwe re date biavêtin. Sadiq Xan jî bi leškerekî pêncî hezar Kes ve li nêzkîa Kenarê Dilava Farisî de ruwê xwe ber bi Besra ve date bivedan û Sê Keštyînên Cengîyî sivik jî ji Derbendên Bošeher û Rîg de ligel Leškerên wî de hatin birêkkevtin.

Bi rastî serdarîya Osmanî li Bera de çend Keštyîên Cengînî hebûn, belam wan ligel Keštîyên Cengîyên Sadiq Xan de netuwanîn beramberîy bêidin bikirin. Sadiq Xan li dawîya vêna de bi ser Rubarê Erb ve hate

zalbûn. Zu bi zû ve wî Pirek ji Beleman date bidurustkirin û wî Orduwê xwe ji bona Kenarê Rastêyî Rubarê Ereb date perandin. Destlicî wî xwe ji bona dorlêpêçanê date bilikarxsitin.

Šarê Besra zor gewre bû û pir baxçe di nava wê dihatin bipeydakirin. Serjimara Tudeyê wêna texmîna Pêncî hezar Ten dihate biderkevtin. hêza parastina wêna ji Çaryek ji Sermara wê bêtir bû. Ostandarê wêna Sulêman Aga bû. Ew Serbazekî aza bû û ji bal Serbaz û Serdarên xwe dildar bû. Dîwarê keleha Besra zor berz bû, belam xurt nebû. Xêza bingehîyî liberxwedanê çend Burc bûn û di nava wan de sed topek dihatin bidîtin.

Li zivistana sala 1189 k.- 1775 z. de dor li Besra de hate pêçandin û sipahê Iranî hate bipêšveketin. serdarîya Osmanî ferman bi Ostandarên Wanê, Musilê, Diyarbekrê, Helebê û Šame ve date bidan, ku ew bi hemû Hêzên xwe ve li bajarê Begdadê de bêtin bixirkirin

Weha dihate bigûmankirin, ku evanan ji bona Begdadê tên, da ku ew ligel Ostandarê vî Welatî de bi firyada Besra ve herin. Belê ew ji bona Begdadê hatin bihatin. Wan bi remana dilxweškirina Serdarê Iranê ve Omer Pašayê Ostandar datin bikuštin û deslicî wan Encûmenek ji bona Šîrazê ji bona nik Kerîm Xan datin binardin, da ku ew ji Kerîm Xan re bidin bigotin, ku Kirdarê vêxistina vî šrê hanê Ostandar bû û ew hate bikuštin û Arezuwê wî hate bicîhatin. Belam Kerîm Xan guh bi gotinên ve neda bidan. Wî xwest, ku ew ji lawazîya serdarîya Osmanî kar ji xwe re bide bigirtin. Bi kurtî ve Ostandarê Besra li dawîya Sêzdeh Mehan ji liberxwedanê de bi hoyê nemana zad û zexîrê ve bi neçarî ve di Hezêrana sala 1190 k.- 1776 z. de hate biberdestkirin.

Ostandarê berdest û Girgirên bajêr bi rêzlêgirtin û hêjabûn ji bona Šîrazê hatin binardin. Sadiq Xan jî bi bašî ve reftar ligel xelkê Besrê de date bikirin. Wî Elî Mehmud Xan bi Komandar ve ji bona ser Besra date binîšankirin û ew ji bona Šîrazê hate bivegerandin.

Mehmud Xan bi bê agehdarî û xwe bilikarxsitin ve xwe têkelî šerê di navbera Du Ešîran de date bitûškirin.Ew tûšî šikanadinê bû û zor ziyan bi wî ve hatin bikevtin û Komandarên wî jî hatin bikuštin. Gava Sadiq Xan evaya bihîst, zû wî xwe bi Besra ve date bigihandin. Wî bi bašbûna reftar û sincîya xwe ve di wan navan de ašîtî date bidamezirandin û tanî mirina Kerîm Xan bi hêsanî ve serpereštîya wêderê date bikirin. Li paš de bi hoyên xweyî ve wî Besra date bicîhištin. Li dawîya vêna de Ostandarê Bedadê jî bi sivik û hêsanî ve bajarê Besra date bisitendin.

Li pêš zemanê Kerîm Xan de Ewropa jiber tevlihevbûnên Hundurî Îranê ve ewende guh bi bazirganîya Îranê ve nedida bidan. Lêbelê di zemanê Kerîm Xan de bazirganî jî mîna çandinyê li Îran de pir hate bipêšveketin. Vî Serdarê pir bihiš hemû Zenevanên Pêše ji Ermenîyan û Îranîyan jî pir ew datin bidilbijandin û datin biparastin. Bi rastî jî ve di pêla dawîya serdarîya wî de Îran bi xwešbûn û bextiyarîyê ve hatibû bigihaštin. Xwedî Mulkan û Zevîvanan ji hatinên xwe Bešekî zor kêm ji bona serdarîya dida bidan. Belam her gava ku Serdar ji wan daxwazî bida bikirin, wan bi dilxwešî ve daxwaza wî didan bicîanîn. Jiber vê jî piranîya van xelkan bigir bi serê xwe bûn. Ew Xwedanê dewlemendî û bextiyarîya xwe bûn û ew ji xelkên din bextiyartir bûn. Di pêla Kerîm Xan de her yarmetîyek û alîkaryek bi nigaša Mirov ve bihata bikevtin, ew ji bona vê Birê dihate bikirin.

Hemû bajarên Îranê di pêla vî Serdarî de hatin bipêšvekevtin. Belam hîç ji wan mîna Šîrazê nebûn. Kerîm Xan ev bajarê hanê ji xwe re bi paytext ve date bidanîn; jiber ku ew ji cihê Ešîra wîna nêzîk bû û biserdejî dilgirdana xelkên wê bi wî ve pir xurt bû. Pir wî xwe têde date êšandin. Wî îš û karên liberxwedanê têde date birêkxistin. Wî bajar bi gelek avanîyên ciwan ve û zor bi kelk ve date bixemilandin. Dor û berên wê wî bi bax û baxçan ve date biqešengkirin. Çend ew ligel xemilandin, ciwankirin û qešengkirina bajêr de xerîk bû, bêtir jî ew ligel girawkirina xwešî û bextiyarîya xelkê wê de li kar bû. "Çira vê roja xweš" ew ji bal Mêjûvanekî Îranî[241] bi bašî ve hatîye pesindan. Gava ku ew li ser Kerîm Xan dide biaxivtin, ew dibêje: "Vê ronahîya hanê tevaya Welêt date bitijekirin. Belam tîna wêna di Šîrazê de bêtir bû. xelkên vî bajarê nazenîn bi carekê ve li xwešbûnê û bextiyarîyê de behremend bûn. Wan di nava civatên Keç û Kurên ciwan de dema xwe didan birabuhurandin. Šahî û kêf li hemû layekî de serdar û zal bû.

Krîm Xan li temenekî Heštê Salî di 13 Sefera sala 1193 k.- 1779 z. de[242] hate bimirin. Bi serxwebûneke bi carekê ve wî Bîst û Hešt salan

[241]mêjûwa Xanedana Zend, ya ku ew ji bal Elî Riza hatîye binivîsandin.

[242]Ew li bajarê Šîrazê de hate vešartin. Belam dawîya pêkhatina serdarîya Qacari de Aga Mehmud Xanê bêbext hestîyên wî ji Šîrazê û yên Nadir Šah ji Mešhed datin biderxistin û ew herdu li ber derîyê Sera xwe de datin binajtin, da ku ew her roj bi pîyên xwe ve di ser wan re bête biderbaskirin. (Mêjûwa Sêr Con Malkolm).

date biserdarîkirin[243]. Bi taybetî ve di Bîst  Salên dawî de bi carekê ve wî bi bê Hember û bi serê xwe ve serdarîya Îranê date bikirin.

[243]Hinek dibêjin, ku ew li temenê Heftê û Pênc Salî de hatîye bimirin. hinekan jî dayite bigotin, ku ew li temenê Heštê û Šeš Salî de hatîye bimirin. Belam reman zor li ser vê ye, ku ew li nêzîka Heštî Salî de hatîye bimirin. Lêbelê jî dibe, ku Kerîm Xan bi xwe jî ve mêjûwa zayîna xwe nizanibe; çunke, tomarkirina zayînê li nik Ešîran de rewešt nebû.

## A. Sincî û Nîšanên wî

Wênekirina Sincî û Bašîyên vî Ciwanmêrî weha sivik û hêsan niye. Bi rastî jî šopên Serdarên bi serên xwe tête dihatin bipeydakirin. Ew ne zor sert bû û nejî zor ew mehrevan bû. Ew Peyakî li ser xwe bû. Di hemû pêlên jîyana xwe de bi cansivikîyê û azayê ve nav û deng ji xwe re dabû bisitendin. Jiber van hoyan jî wî xwe ji šašbûn û payebûna cîgehên bilind dida biparastin û wî parastina dilovanîyê û nerbûnê dida bikirin. Ligel vê jî de wî mîna Mirovên tir hin Kes bi xurtî ve didan bisizakirin. Her û her wî îšî dijî serûštîya xwe bi Yekek dinî ve dida bisipartin. Bi vî karî ve wî saw û tirs ji bona nava cerg hinavên Dujmin û Serrakirvanan dida bixistin. Lêbelê jî ewende ew ji bona her Kesekî mehrevan bû, yên ku wan xwe ji bona ba wîna didan bipenakirin û daxwaza lêbuhurandinê lê didan bikirin. Wî ew daxwaza wan nedida bivegerandin. Yekek ji herî nîsanên wîyî bilind dilpakî û çakîya wî bû. Wî serkuzeštî jîyana xwe dida bivegerandin, ya ku ew pir sêr û xweš bû.

Kerîm Xan di lêbuhurandin û hajbûnê de mêrxasiyeke wîyî pirî bilind hebû. Heger wî li Mirovekî de bida bilêbuhurandin, wî pê dida bibawerîkirin û wî pišta xwe pê dida bisipartin. wî ew xweser bi xwe ve dida bigirêdan. Bi dil ve wî hemû Kes xwešdixwest. Di erkên Ayînî de zor durust bû, lêbelê ew têde ne xwîngerm bû û nejî rêtund bû. Ew ruxweš û dilkêš. Li xwešîyên jînê de bi carekê ve piškdar bû. Wî dixwest, ku her Kesek jî mîna wî li xwešîyên jînê û dunyayê de behredar bin. Di vî babetî de wî mêldarîya bêtirbûnê nedikir. Wî carekê hîç ew bi pileyekî ve neda bigihandin, ku ew kêrekê li cihê wî de yanjî li karê serdarîya wî de bide bikirin.

Kerîm Xan hîç xwendewar nebû. Wî nikarîbû bida xwendin û nivsandinî. Renge, di zemanê zarotîya xwe de ew ji bona Hucrê neçûbe, yanjî wî nexwestiye, ku ew ji bona wê here. Ew Kurê Serokekî Bicûkî Ešireke Kohî bû[244]. Wî ji bil wan tištan pê ve, yên ku ew ji bona jîyana wî bikar dihatin, fêrî tištekîtir nedibû. Kerîm Xan jî li ser wê šûnê de diçû. Ew bi qed Palevanekî ve bi hêz û çalak bû. di suwarîyê de ew bê hempa

[244]Çi Zend û çi jî Qolên dinî Ešîrên Lek mîna hemû Ešîrên dinî Îranê di zîneteke pir lipašvemayî de bûn.

bû. Di hemû rengên supahbazî de pirî qenc bû. Tevî ku ew Xwendewar nebû. wî dixwest, ku hemû Kes bixwînin û wî ew ji bona xwendinê didan dilbijandin. Civata wî cihê Zanistvanan û Hozanvanan bû. Aramgehên Šêx Sadî û hafiz, yên ku li dor û berên Šîrazê de bûn, ser li nû de wî ew li ser cîgehên wanîyî kevnar datin biavakirin. Wî hatinên hin bax û erdan jî ji wan re date bitirxankirin û ji wan re wî Pasevan datin bidanîn

Ev karên hanê ji gewretirîn kar di nava karên wî de têtin jimartin; jiber Tudeyê Šîrazê van bi šopên wîyî pir hêja û bi nav û bag di pêla Šehrîyarîya wî de didin bidanîn. Çunke, ev bajarê hanê cihê van herdu Xwešxuwanê mezin bû û ew bi wan ve pir serbilind bû.

Yekek ji rewešta Kerîm Xan bû, ku wî her roj çend demek ji bona bihîstina gilî û gazinên Bestvanên xwe ve didan bitirxankirin. Di vî warî de çîrokek tête bigotin, ku bi rastî ve ew nîšaneke zor ciwan û bilind li ser xweyîbûn û dadwerîya Kerîm Xan de di serpereštîya Serdarîyê û Tude de dide biderxistin: "Rojekî li Dîwana Dawerîyê de wî îšê xwe dabû bipayînkirin û wî dixwest, ku ew biçe. Ew di wê rojê bo hoyê kawerwerîya Dadwerîyê de zor hatibû westandin. Di wê gavê û hingavê de Peyakî pêt bi zend û bend ve ji bona devê rêya wî date bibazdan û bi qerîn û hewar ve Dad! Dad! dida bibangkirin. Kerîm Xan jê date pirsîn:

- Tu kî ye?

Peya:- Ez Bazirganim. Herçî min hebû, ew hate dizîn.

Kerîm Xan:- Çawa û li kûderê de ew hate dizîn?

Peya:- Ez razayî bûm.

Kerîm Xan:- Bi zimanekî tûrebûn û xwîngermbûn gotê: - Çima te date bixewkirin?

Peya: Ez šašbûm. Wer mim zanî, ku tu šiyarî.

Vê bersiva hanê tûrebûn û xwîngermbûna Kerîm Xan date binehištin.

Mêrxasîya vî Peyayî beramber bi rexnegirtina xwe ve zor pê xweš bû. Wî ferman ji bona Wezîrê xwe date bidan, ku ew Nerxê Malê wîna ji Xizna dewletê pê bide bidan. û wî jê re got:

- Divê tu bide bixebatkirin, da ku tu vî Malî bide dozandin. Malkolm, mêjûwa Îranê r. 87).

Rêya çûna Kerîm Xan ji bona sazkirin û parastina Hiner û desthilatîya xwe li ser saya Hestîya Rewanîyê û Kesîtîyê dihatebi bixurtkirin. Hîç wî mêldarîya talanîyê nedida bikirin. Wî nedixwest, ku ew bi alîkarîya talanîyê û xerabîyê ve Orduwekî bide bixewkirin. Wî nedixwest, ku ew ji bona bêtirkirina rûmeteke Milîyî bêkelk û yanjî ji bona berzkirina cihê serdarîya xwe Siyaseteke hîç û pûç bide birêvebirin. Di serûštîya de ew

zor sade bû û di cil û berên xwe jî de ew pir sade bû. Ligel vê jî de gotin û fermanên wî yek peyvbûn û ew divabûn dest li cî de bêtin bicîanîn. Derbarê Mêletê xwe ve bi giştî ve rûxweš bû û wî dixwest, ku ew tev bi xwešî ve bijîn. Di šincî û Serûštîya xwe de hîç bi qed wî ve baš û sêr nebû. Wî dikarîbû, ku ew di dorhêleke wisa de, ya ku ew têde dihate bijîyandin, hesteyekî serûštî û mirovanî di nava hemû pêrabûnên serdarîya xwe de bide bicîanîn. Ev biserkevtina wîna ji bona hemû Serdarên bi Serên xwe ve divê bi hînbûneke baš ve bête bidîtin. Ew bi bextîyarî ve hate bijîyandin. Mirina wî mîna mirina Bavekî zor xwešewist û zor šayanê pištgirtina mala xwe bû. Her Îranîyekî wê demê navê Kerîm Xan ligel wan kar û barên wî de, yên ku wî ew ji bona sazkirina serdarîya xwe dabû bikirin, bi mezinbûn û perestî lê dida bitemašekirin. Bi hoyê berzbûna šan û rûmeta wî ve hemû Kesekî bi dil û can ve xwe pêve dida bigirêdan. Her gava ku li ser nîšan û rûçikên wî de bihata peyivandin, bêgûman zor pesin û šabaš li ser wan de dihatin bikirin û bi tenha ve dihate bigotin: " Ku ew bes Padišahekî gewre ne bû, Xwedan Seran û peyan nebû û vekirinên wî zor nebûn, Belam divê pê bête rûniština, ku ew Serdarekî bê Heval û Hempa bû"[245]

---

[245]ji biwergirtina mêjûwa Kedxweda Sêr Malkolm dibêje: Min ev ji devên gelek Gewreyên dewleta Qacerîyî diwayî pêla Kerîm Xan dayête bibihîstin.

Binning di Nista xwe de bergê 2, Rûpelê 267 de dibêje: "Di nava hemû rêzên navên Serdarên Îranê de bi tenha ve navê Kerîm Xan ji bal hemû Tudeyan ve mîna Bavekî šêrîn û Serdarekî Dadwer dihate bibîrxistin. Ew zor ji sitem û darzorîyê dûr bû".

B. Li dawîya mirina Kerîm Xan de.

Mirina Kerîm Xan bidestpêkirina têkçûna serdarîya Zend bû û herifandina bingehên dewleta Îranê bû. Kerîm Xan xwedan pênc Kur bû. Yekek ji wan li pêš wî de hatibû bimirin. Bes û bi tenha ve li paš wî de çar Kur mabûn, yên ku ew çerxa Felekê hemû tûšî bêbextî û telaqrešiya Serokên Malbata wan dane bikirin[246].

Zekî Xan her li dawîya mirina Kerîm Xan de Serdarî ji bona jêr destên xwe date anîn. Hin ji Gewreyên Ešîra Zend bi xwe ve li Zekî Xan de pištrast nebûn. Ew ji bêbextîya wîna ditirsiyan; jibervêjî wan keleha nava bajarê Šîrazê dane bigirtin û wan ji bona liberxwedana xwe ew dane bilikarxsitin û pêrejî wan xwe bi Hevalbendên Ebu El-Fetih Xanê Kurê Kerîm Xan dane bizanîn. Zekî Xan bi dazanîna Cîgerên Ebû El-Fetih û Birayê wî[247] ve ji bona ser Textê Bavê wan pištgirtina xelkê ji bona Gewreyên Ešîra Zend date binayînkirin. Lêbelê bi rastî ve Herdu bi nav ve Serdar bûn. Bi hoyê ku ew Xizmê wan bû û ev Herdu Šahzade di warên Sermiyandarîya dewletê de ne Šahreza bûn, hemû Serdarî û Desthilatî wî bi destên xwe ve dabûn bixistin. Wî li hemû îš û karekî de yaremetî ji bal Xuwarzê xweyî bi nav û bang ve Eli Murad Xan dida biwergirtin.

Zekî Xan ji bona bizeftkirina keleha nava bajarê Šîrazê gelekî hewlîda. Belam ev îše ewende sivik nebû. Zekî Xan li endîša dorlêpêçana dûr û dirêj de rêya fen û fêlbazîyê ji xwe re date bigirtin. Bi sund û Quranan Gewreyên kelehê dane bipištrastkirin. Nebes tenê wî xweset, ku ew li wan de bête buhurandin, belkî wî xwest, ku ew Karmendîyên gewre gewre jî bi wan ve bide bisipartin. Van Gewreyên hanê pê dane

---

[246]Herî Gewreyî van Kuran Selah Xan bû, yê ku ew berî bête ser serdarîyê çavên wî ji bal Pismamê wî hatin bikorkirin. duwemê wan Ebu El-Fetih Xan bû, yê ku ew li dawîya bi navbûna Šah ve di pêla serdarîya Sadiq Xanê Mamê wî de çavên wî hatin nirakirin. Sêyemê wan Mohemed Elî Xan ji bal Ekber Xan hate bikorkirin. Çaremîne wan Mohemed Rehîm Xan di pêla Bavê xwe de hate bimirin û ew ji korbûnê hate birizgarkirin. Bêcemînê wan Ibrahîm Xan bû, yê ku ji bal Ekber Xan zimanê wî hate bijêkirin.

[247]Ev Šahzade Zavayê Zekî Xan bû.

bibawerkirin u wan xwe ji bona wî dane biberdestkirin. Zekî Xan tevî bi sund û sozên xwe ve hemû bi rengekî pir dir û hov ve dane bikuštin.

Gava Sadiq Xan xebera mirina Kerîm Xan date bibihîstin, wî Besra date biçihištin û ruwê xwe ber bi Šîazê ve date bivekirin. Gava ku ew nêzîka bajêr bû, wî Çadirên xwe dane bihiladn. Wî Cafer Xanê Kurê xwe ji bona nava bajêr date binardin, da ku ew remana Zekî Xan derbarê serpereštiya Serdarîyê de bide bizanîn. Cafer Xan hate bivegerandin û wî soz û peymanên Zekî Xan ji bona Bavê xwe dane bivegerandin. Ligelvêjî de wî Bavê xwe bi nebawerkirina wan ve date bitemînîkirin, çunke dibû, ku ew jî tûšî wê bêbextiyê û telaqrešîya Zekî Xan bihata bikirin, ya ku wî ew derbarê Gewreyên Zend dane bikirin. Vê temînîya hanê kêr li Sadiq xan date bikirin. Wî umîdîya birêkkevtinê date birîn û wî biryarî date bigirtin, ku ew Šîrazê bide bidorlêpêçkirin. Bi gora mezinbûna evîndarîya Orduwa xwe ve ew li serkevtinê de pištrast bû. Bi vê bawerîyê ve wî xwe dabû bilikarxsitin.

Li vî layî de Zekî Xan date bitemašekirin, ku ew bi fen û xapandinan ve Sadiq Xan nade birakišandin. Destbicî ve wî Ebû El-Fetih date bizindankirin û Mohemed Elî Xanê Birayê wî, yê ku ew tanî wê gavê di Serdarkirînê de hevbešê Ebu El-Fetih Xan bû, bi tenha ve bi Šahê Îranê ve date bidazanîn. Wî Sê Kurê Sadiq Xan jî dane bizindankirin, yên ku ew li Šîrazê de bûn. Wî dergehê bajêr date bidaxistin. Wî date bidazanîn, ku ew dê Mal û Menalên hemû Efser û Neferên Ordowa Sadiq Xan bide bidarvekirin. Bi vê dazanîna hanê ve daxwaza wî hate bicîhatin; çunke, hemû Kesî dizanî, ku rijandina xwîna wan Belengazan li layê Zekî Xan de weku av vexwarinê ye. Ji tirsa vê hemû Efser û Neferên Orduwa Sadiq Xan, yên ku Mal û Menalên wan di bajêr de bûn, devjê biberdan û ew ji bona Šîrazê çûn. Bi vî rengî ve hemû pilan û hêvîya Sadiq Xan bi serkevtinê ve têk çû. Bes bi tenha ve Sêsed Kesek li dora wî de ma. Ew neçar bû, ku ew xwe ji bona Kerman bide kišandin. Zekî Xan Hêzeke Suwarî ji bona ser wî date binardin. Li Çil Mîlekî Rojhilatî Šîrazê de li Derbendê Orsîncan de ew tûšî wî bûn û bi šer ve hatin bikevtin. Bi kuština Komandarê vî Leškerê Suwarî ve ev hêza hane hate šikenadin û ew ji bona Šîrazê hate bivegerandin. Sadiq Xan xwe bi Kermane ve date bigihandin û wî xwe di nava keleha wêyî bicûk de date bipenakirin.

Yekek ji rûdanên giringî paš mirina Kerîm Xan rizgarbûn û derçûna Aga Mohemed Qacar ji Šêrazê bû. Ev Mirovê hanê di sala 1160 k.- 1747 z. de hatibû bidîlkirin û ew ji wê mêjûwê de tanî hêsta li keleha Šîrazê de bendbû. Di navekê de rê pê hatibû dayîn, ku ew car caran ji

bona rawê bête biçûyîn. Kerîm Xan zor qedrê wî dida bigirtin û wî di îš û karên Serdarîye de ji bîr û bawerîyên wî dida bikarkirin. Aga Mohemed Xan bextê xwe bi mirina Kerîm Xan ve dabû bigirêdan û wî çavdêrîya wê dida bikirin. Xuweha wî jî Jina Kerîm Xan bû. Di roja mirina Kerîm Xan de wî ji sergêjîya Serdarîyê û Pasevan date bikarkirin û ew ligel çend Peyên xwe de ji bajêr hatin biderkevtin û ew bi rê ve hatin bikevtin. Wî xwe bi welatê xwe ve date bigihandin. Wî di derbasbûna demê de Hêzek zor date bikomkirin û wî di sala 1193 k.- 1779 Šahîtîya xwe date bidazanîn.

Zekî Xan dizanî, ku Serokê Qacaran bi tenha ve bi Mazenderan ve nayête rûništin; jibervêjî wî Leškerekî helbijartî di bin Komandarîya Elî Murd Xanê Xuwarzîyê xwe de ji bona ser wî date binardin, da ku ew pêškevtina wî bide bigirtin. Lêbelê wî xwe bi vê cûlandinê ve bêtir tûšî berbatîyê date bikirin.Xuwarzîyê wî aza û jîr bû û ew bi serhatîya xwe ve pê hatibû gihaštin, ku merc û zînetên welêt ji bona Kesekî mîna xwe bi bê hêz û alîkarî ve nayête bidîtin. Wî bi vê bawerîya hanê ve li šûna kêsekê de dihate bigerandin, da ku ew beramber bi Serdarekî weha Sitemkar ve, yê ku hîç pišt pê ve nayête bigirêdan û hîç Mirovekî jêrdestên wî jî jê nade bihejkirin, serê xwe li ber bide birakirin. Bangkirin û hewara Sadiq Xan di dema rakirina wî de ji Šîrazê û gihiština Elî Murad Xan ji bona Tehranê bi bihaneyeke baš bû, da ku ew wê remana xwe bide bicîanîn. Wî Serok û Efserên Lešker dane bikomkirin û wî ji bona wan date bigotin: "magelo yarîpêdanî bi Serokekî mîna Zekî Xan ve, yê ku wî reftareke zor xerab beramber bi Kurên Kerîm Xan ve dayite bidan, duruste? Bi kurtî ve wî bi asanî ve dilên wan bi ser xwe ve date birakišandin. Li dawîya vêna de Elî Murad Xan ruwê xwe ber bi Îsfehanê ve date bivedan. Gava ku ew nêzîkî wê bû, Walîyê Zekî Xan têde date bibazdan. Teva xelkên bajêr bi hemû Çînîyên xwe ve hevalbendîya Elî Murad Xan dane bikirin. Biçgeh li vê jî de wî date bidazanîn, ku mebesta wî ji vê culandinê bes û bi tenha ve anîna Kurê Gewreyî Kerîm Xan ji bona ser Textê Bavê wî ye. Ji bil vê mebestê mebestek wîyî din niye. Vê dazanîna hanê bêtir evîndariya Tude jê re date birakišandin.

Gava ku Zekî Xan li serrakirina Xuwarzîyê de xeberdar bû, hiš di serê wî de nema. Zû bi zû ve wî Leškerek date bikomkirin û wî ruwê xwe ber bi Îsfehanê ve date bivekirin. Belam tolhilanîna Xwedê lê hatibû binêzîkkirin, Gava ku ew bi Yezed Xwast ve hate vegihaštin, wî ji xelkê wê bêša wê Salê date bidaxwazkirin û wî fermana komkirina wan date biderxistin. xelkê dana bêšan jiber kêmbûna zîneta xwe nedan. Ji dêlva

lêbuhurandina wanan wî Peyên Gewre û Maqulên wanan datin civandin û ew ji pencarên kelehê de date bitêwerkirin. Bi vê jî wî waz neda hênanîn. Wî Mîrzayekî pîrozî vî Bajarî jî ji bona nik xwe date rakišandin û bi wê mehnê jî ve wî xwest, ku ew wî karî û hin pîsîtîyê jî pê bide bikirin. Belam Pasevanên kelehê nehištin, ku ew wî karê dir û hov bide bikirin. Bi hoyê vê dir û hovbûna wîna ew lê sar bûn û wan xwe lê datin wergerandin û wan ew di sala 1779 z. de date bikuštin.

Li dawîya kuština Zekî Xan Ebu El-Fetrih Xan Kurê Kerîm Xan di sala 1780 z. de bi Šahê Îranê ve hate bidazanîn. Ev Mirovê hanê mêrxas û dadwer bû. Xwedan serûštîyeke dilsoz bû. Belam wa diyare, ku îšê wî pir dijwar bû. Tevlivêjî de gûman nebû, ku ji bona nehiština linavçûna Xanedana Zendî û asayîšê di nava Welêt de ji bil dazanîna Šahînšahîya wî pêve çareyeke din nebû.

Gava Sadiq Xan xebera linavçûna Zekî Xan date bibihîstin, ew helsa û wî ruwê xwe ber bi Šîrazê ve date bivekirin. Sadiq Xan bi xemilandineke Šahînšahî ve di 30 Cemada yekem de di sala 1194 k. de ji bona nava bajarê Šîrazê çû. Ev Mîrê hanê Serdarekî baš bû û bi hiš tedbîr bû. Belam ew zor dildarê Desthilatîyê bû. Li layekîtir jî de li jêr serpereštiya Serdarekî nezan û lawaz jî deyan pê nexweš bû. Bi kurtî ve dan û sitendin di vî warî de di navbera Mam Xwarzê de nedihate bikirin. Di encam de Sadiq Xan Birazayê xwe date bigirtin û çavên vî zimanbestî datin bihilkirin. Wî xwe di sala 1194 k.- 1780 z. de bi Šahînšahî date bizanîn. Belam hîç wî hêvî nedida bikirin, ku Textekî bi vê sitemkariyê bête bideskevtintin, dê ew bête bidirêjkirin. Bi rastî jî ve berbatîya herî gewreyî Elî Murad Xan roj bi roj ve her dihate bigewrekirin. Wî Caferê Kurê xwe ji bona Îsfehanê date binardin, tanî ku ew li wêderê de çavêdrîya livandinên Elî Murad Xan bide bikirin.

Di gava rûdanên van bûyînan de Elî Murad Xan li Tehranê bû. Gava ku wî ev xebera hanê date bibihîstin,destbicî wî xwe bi Šah ve date bidazanîn û wî ligel leškerekî zor de ruwê xwe ber bi Îsfehanê ve date bivekirin. Gava ku ew nêzîka bajêr bû, Walîyê wêyî taze date birakirin.

Sadiq Xan Orduweke Bîst hezar Kesî date bilidarxistin. Wî ew Lešker li jêr Serpereštîya Teqî Xanê Kurê xwe de date bidanîn. Vî Leškerî hêrîšî ser Elî Murad Xan date bikirin. Wî pêškevtina wî date birawestandin û wî Leškerê wî ji hev jî date bibelavkirin û hinek ji wan jî ji bona nava Leškerê Teqî Xan hatin tevlêbûn. Elî Murad Xan ligel hinekan ji Xizm û Peyên xwe de ji bona Hemedanê hatin bivegerandin û wî ev welatê hanê date biparastin.

Sadiq Xan kaxezek ji bona Kurê xwe date binivîsandin û jê re date biamojgarîkirin, ku ew ji vê biserkevtinê û vî bextê baš ji xwe re sûd bide biwergirtin û Elî Murad Xan bide binabûdkirin. Belam vî Šahzadeyê Nezan guh bi amojgarîya Bavê xwe ve pê neda bidan û ew bi kamwerî ve ji bona nava Îsfehanê hate bikevtin. Wî nêzîka mehekê bi bê agehdarî ve dema xwe date birabuhurandin. Belam Elî Murad Xan bi carekê ve ji vê kêsa hanê ve ji xwe re date bikelkgirtin. Di dema ku Teqî Xan berê xwe ji bona Iraqê date bivekirin, da ku ew vekirinên xwe bide bifirehkirin, Hinekan ji Serokên li nik wî de xwe jê dane bicihêkirin. Ew li nêzîka Hemedanê de tûšî Elî Murad Xan hat û ew zor xerab hate bišikenandin. Bi hezar dujwarî ve ew bi saxê ve ji šer derçû û wî ji bona Šîrazê date birakirin. Elî Murad Xan jî li dawîya vê biserkevtina hanê ve çend vekirinên din jî dane bikirin. Wî ji xwe re Hêzeke zor date bipeydakirin û wî biryarîya dorlêgirtina Šîrazê jî date bidan.

Gava ku Sadiq Xan date bibihîstin, ku Elî Murad Xan xwe ji bona ser paytextê wî dide rakišandin. Bi lez û bez ve wî orduweke Peyadarî date bilikarxsitin û wî ew ji bona dûrbûna Bîst û Pênç Mîlekî ji Šîrazê ve datin binardin. Da ku ew nehêlin, Elî Murad Xan bête bipêškevtin. Gava ku ev leškerê hanê xerikî beškirina xuwarin û vexuwarinê bû, ew tûšî hêrîša Elî Murad bû. Wî date birakirin û ew ji bal Leškerê Suwar ve bi xurtî ve hate bidûkevtin.

Šîraz Hešt Mehan hate bidorlêpêçkirin. Dorlêpêçvana ji bona girtina kelehê xwe hîç nedan biêšandin. Belam liberxwevadanan û Tudeyên kelehê jiber pêwistîya wanî zorî zor bi xwarin û vexwarinê ve wan dev ji remana liberxwedanê dane biberdan û Bešekî ji Liberxwed-anvanan dergeh datin bizeftkirin û wan ew ji bona Elî Murad dane bivekirin. Bi vî rengî ve Bajar bi destên wî ve hate bikevtin û wî bi bašî ve reftar ligel Tudeyê bajêr date bikirin.

Sadiq Xan bi xwe û bi Mal û Mendalên xwe ve xwe di keleha nav bajêr de dabû biqayîmkirin. Belam ewende pê necû, ku ew bi berdestbûnê ve hate bineçarkirin. Ew ligel hemû Kurên wîyî wêdere de di sala 1781 z. de bi sêpîyê ve hatin bidarvekirin. Bes û bi tenha va Cafer Xanê Kurê wî hate birizgarkirin; çunke, ku zor li pêš girtina bajêr de ew ligel Elî Murad Xan têkelîya xwe dabû bipeydakirin.

Sadiq Xan li zemanê Kerîm Xanê Birayê xwe de bi nermbûn, bašbûn û dadwerîya xwe ve li Îranê de navekî baš ji xwe re dabû bisitendin. Bi taybetî jî wî di vegirtina Besra jî de šanekî tirjî bi ser yên çûyîn ve ji xwe re wî dabû bigirtin. Belam di dawî de bi pê tevgera wî û

dan û sitendina wî de beramber bi Xizim û Karên wî ve wî ew nav û nîšanên bašên xwe dabûn biwindakirin. Hêvîya wî bi Serdariyê û serdarîkinê ve hîç nemabû. Di vê zêneta hanê de bi rastî jî ve Merov nizane, magelo bezeyê Merov bi ser Sadiq Xan ve ji bona biwergirtina Tacê bête bikirin, yanjî ji bona çavbiderkirinên Kurên Kerîm Xan ji bal Sadiq xan ve bête bikirin? Ma ne bi saya azaya Kerîm Xan ve Xanedana Zendî ev rumet û nav û nîšana hanê ji xwe re dabû bipeydakirin?

Wer bi vî rengî ve Elî Murad Xan bi Šahê Iranê ve hate bikirin. Ji tomarên kar û biserkevtinên wî ve tête biderkevtin, ku welatê wî çend Salekî di nava Serleškerên wî de bi qada berberîyê û pevçunê ve dihate bidîtin.

Hîç Kesekî di dema Dorlêpêçanê de bi qed Ekber Xanê Kurê Zekî Xan nav û Nîšan nedabû bisitendin. Ew weha çend aza û mezbot bû, wehajî ew zordar û sitemkar bû. Bi radeyekî weha ve ku wî bi lezkirina kuština Sadiq Xan, Sê Kurên wî û hinek ji Serdarên wî ve neda bitêrkirin. Belkî wî ew bi destên xwe ve dane bikuštin. Hêjîbêtir ew bi bidanîna tepekê ji bona kuština Šah ve hate bitawankirin û baweriya Elî Murad Xan bi vê tawanbarîyê dijwar nebû. Wî ferman bi Cafer Xan ve date bidan, ku ew vî Mîrê Xwînrijê hanê bide bidarvekirin, yê ku hêjî destên wî bi Xwîna Bavê û Birayên wî ve hatine bisorkirin.

Elî Murad Xan li dawîya çend Mehan de ji bona Îsfehane çû û wî ew bi paytextê xwe ve date bikirin. Wî zor bawerî bi Cafer Xan ve dida anîn û wi ew li se Isfehanê bi Walî ve data bidanîn. Wî Kurê xwe Šêx Weysî bi Serlešker date binîšankirin û wî parastina sînorê Jorî û çavdêrîya livandinên Aga Mohemed Xanê Qacarî pê date bisipartin. Di pêšî de vî Šahzadeyê hanê biserkevtin dane biwergirtin. Wî Mazenderan date bidagîrkirin û wî Serokê Qacarî date bišikenandin û wî ew bi bazdanê ve ji bona Esteabad date binaçarkirin. Wî Hêzek ji bona dû wî date binardin. Belam Mohemed Zahir Xanê Serdarê vî Leškerî rêya veger û parastina xwe ji xwe re neda biwergirtn. Li dawî de rêya vegerandina Mazenderan hate birîn û ew tûšî hêrîša Qacar bû û ew hate kuštin. Orduwa wî jî hate tefer tunabûn. Hinek ji leškerên wî dercûn û wan xwe bi Leškerê Šêx Weysî ve dane bigihandin. Wî jî ew ji hev dane bela biwelakirin. Šêx Weysî jî bi xwe jî ve neçar bû, ku ew Mazenderan bide bicîhištin û ew ji bona Tehranê bête bivegerandin. Di vî Bajarî de di sala 1199 k.- 1784 z. de ew ligel Leškerê Elî Murad Xan de yekdigîrbû.

Elî Murad Xan tûšî nexwešîyeke zor giran hatibû. Belam ligelvêjî de wî jêhatbûneke pirî berz dida binuwandin. Wî leškerek ji bona ser

Mazenderan date binardin û wî bi xwe jî dida biremankirin, ku ew li dawî vî leškerî de biçe. Di vê bêhnê de wî bihist, ku Cafer Xan serê xwe daye birakirin û wî berê xwe ber bi paytextê wî ve dayite bivekirin. Elî Murad Xan ewende bi vê xeberê ve hate biliberkevtin, ku wî xwe ranegirt. Wî ruwê xwe ber bi Isfahanê ve date bivedan, her çend jî Wezîr û Pijiškê wî tika lê dane bikirin. Gelek negirt, di wê Zivistana sar de û bi wê nexwešiya qurs û siwarbûn û reweštê ve di encam de li rê de di sala 1785 z. de hate bimirin. Serok, Peye û Maqulên Lešker mirina Šahên Xwe dane bivešartin û tanî ew bi paytextd ve hatin bigihaštin, ji nû ve Lešker li mirinê de xeberdarbû. Ew ji hev hate bibelavkirin û wan li hemû layekî de dest bi xerabîyê û talanîyê ve dane bikirin.

Li ser Sincîya Elî Murad Xan ji bal pir Kesan ve hatîye bixuyanîkirin. Weha diyare, ku ew zor mêrxas û gernas bû. Hîç gotinek di vî warî de mîna peyva Dujminekî nala Aga Mehemed Qacarî nayête bidîtin, yê ku wî di jîna vî Serdarî de ji bona parastina Mazenderan zor tûšî azarê hatîye bikirin. Wi her û her beramber bi dilbijandinên Peyên xwe ji bona çûna ser Iraqê digot:"Bînferehbin, tanî ku ev Korê hêja li nav bête biçûyîn, inca li dawîya vê de îšê me tête biserkevtin"[248].

Li paš mirina Elî Murad Xan de bi Pênç Rojan ve Cafer Xan bi Isfehanê ve hate bigihaštin. Di vê behnê de Navnîšana Sahîtîyê ji bal Walîyê Isfehanê Bekir Xan hatîbû bizeftkirin. Belam gava ku cafer Xan bi paytext ve hate bigihaštin, wî date birakirin. Cafer Xan Peye bi šûna wî ve datin binardin û wî ew date bigirtin. Êtir ji bil Šêx Wêsî Kesekîtir pê ve nama, ku ew bi tuwane daxwaza Šahîtîyê ji xwe re bide bikirin. Cafer Xan kaxezeke Biratî ji bona wî date binivîsandin. Li dawîya vê de wî ew ji bona jêr Serdarî û Desthilatiya xwe date bihênanîn. Li paš de wî reftareke wetov bedkar ligel wî de date bikirin, ku êtir wî nema dikarîbû li beramber Mamê xwe de dawxaza Serdarîyê bide bikirin; jiber ku wî ew date bikorkirin.

Aga Mohemed Xan Qacar, Yê ku wî soz bi Hevalbendên xwe ve dabû bidan, date bicihnanîn. Bi rasti jî wî ji wan re gotibû, ku ew dê li dawîya mirina Eli Murad Xan de ligel wan de ji bona ser bête çûyîn. Êtir ji bona bi cihanîna vî sozê hanê ve tu bergir nemabûn. Ew ligel Pêncsed

[248]Aga Mohemed Xan bi vî rengî ve navê Elî Murad Xan dibird. Bi ratî jî ve çavekî wi kor bû.

tanî Šesed Suwarekî taybetîyî xwe de ji Çiyayên Mazenderan hate jêrîn. Di rê de wî dît, ku ligel hêza wî de pir Hevalbend tevlêdibin û ew ber bi pirbûnê ve tête çûyîn. Wî xwest, ku ew xweser ji bona ser Isfehanê bête çûyîn, da ku ew navtêdanê û mêrxasîyê bi Orduwa xwe ve bide bidan. Li berî dawîya Du Mehan de ji mirina Elî Murad Xan de di 6 Gulana sala 1786 z. de ew derbasî nava bajarê Isfehanê bû. Cafer Xan jî li pêš gihiština wî de bi tehluke ve Bajar dabû bicîhištin. Di vê tehlukê de hemû bargiranî, xizne û Ala Šahîtîyê jî ji bal Serhildanên nava bajêr ve hatin bitalankirin[249]. Di dema ku Hemberê wîyî bi hêz ve bi vî rengî ve ji bona nava Isfehanê hate bicigîrbûn, Cafer Xan jî ji bona nava Šîrazê hate bikevtin. Belam dostanîya Seyid Muradê Serdarê Šîrazê jêre zor cihê bawerîyê nebû[250]. Lêbelê Tudeyê Šîrazê bi kêra Maqûl û Gewreyên bajêr ve pištbanî lê dane bikirin. Di nava van Maqul û Gewreyan de ji tevan jî jêhatîtir û xurtir ji bona pištgirtina wî Hacî Ibrahîm bû. Cafer Xan jî destbicî ve Nîšana Kelanter ango Walîtîya Faris bi Hacî Imrahîm ve date bidan.

Aga Mohemed Xan nexwest, ku ew kêsê bide biwindakirin. Wî hinek šer û merên bêkelk ligel Bextiyarîyên welatê Faris dane bikirin. Di encam de ew neçar bû, ku ew bi pele ve ji bona Tehranê bête bivegerandin. Cafer Xan ji vê kêsa hanê kar ji xwe re date biwergirtin. Wî Isfehan date bisitendin û Rehîm Xanê Walîyê Aga Mohemed Xanî date bigirtin û wî ew date bikuštin. Belam di dawîya navekê de wî bajar date bicîhištin, gava ku wî bihîst, Aga Mohemed Xan dîsan ruwê xwe ber bi Isfehanê ve dayite bivekirin. Beramberîya Cafer Xan ligel Aga Mohemed Xan de bes û bi tenha ve di berxwedanê de dihate bidîtin: Çunke, Aga Mohemed Xan zor hêz ji xwe re dabû bipeydakirin. welatên Jorî Iranê û Iraqa Ecem hemû wî dabûn bidagîrkirin. Wî herwehajî dixwest, ku ew Šîrazê jî bide bidorlêpêçankirin.

Cafer Xan beramber bi Serokê Qacaran ve lawaz û bê hêz bû. Wî nema dikarîbû xwe li ber serhildanên hundurû jî de bida bigirtin. Walîyê Hemedanê bi navê Ismaîl Xan ve serê xwe li ber Cafer Xan de dabû

[249]Dibêjin, ku ev Serhildana beramberî wî ji bal hin ji Serokên wî hate bikirin, yên ku ew ji zindana wî hatin birizgarkirin. Di nava van Serokên hanê de Bakir Xanê Walîyê pêšîyî Isfehanê jî hebû.

[250]Ev Seyid Murad Xan hanê Xwarzayê-Xweškezayê Elî Murd Xan bû.

bihiladn û wî ew Leškerê Cafer Xan date šbiikenandin, yê ku wî ew ji bona ser wî dabû binardin. Herwehajî li dawîya ziyaneke zor de bajarê Yezd jî li destên Cafer Xan de hate derçûn. Belam li dawîya Salên serdarîya wî de bext careke din yarmetîya wî date bikirin. Lutuf Elî Xanê Kurê wî di çûneke xweyî biserkevtî de welatê Lar date bidagîrkirin. Dûrbûna Aga Mohemed Xan mêrxasî bi Cafer Xan ve date bidan. Wî bi hêzeke zor ve ruwê xwe ber bi Isfehanê ve date bivekirin. Wî hêza Pasevanîya vî bajarî date bišikenandin. Belam vê biserkevtina hanê ewende neda bidirêjkirin, xebera nêzîkbûna Serokê Qacaran dîsan pê ev bajarê hanê date biçolkirin.

Cafer Xan ji bal Tude zor xweševist bû û reftara wî ligel Biyanîyan de baš bû. Serûštîya wî dilovan bû û ew rûmetdarê Dadgerîyê bû. Kar û barên Serpereštîyê ji bona nava destên Wezîrekî bi hiš û hêja dabû[251]. Belam reftara wîyî naširîn derbarê bi Yekekî ji Serokên wîyî zor dilsoz ve nav û binîšana wî date bibedkirin û hêjîbetir wî bi wê reftarê ve avanîya jîna xwe û serdarîya xwe jî date biruxandin.

Di nava Serdarên Cafer Xan de Hacî Elî Qolî Xanê Kezeronî hebû. Ev Mîrê han ji bal Cafer Xan ji bona temirandin serhildana Kašan hatibû binardin. Ereb Mohemed Husên Xan Serekê vê Serhildanê bû. Wî Hacî Qolî Xan pir tengavkir û ew neçarî sertewandinê date bikirin. Di nava dîlên serhildanê de 1500 kesekî Xurasanî hebûn. Ku wan li dawîya liberxwedaneke pir xurt de û bi mercê parastina avruwa wan ve xwe dane biberdestkirin. Cafer Xan guh bi van sozên Hacî Elî Qolî Xan ji bona wan neda bidan. Wî ev Xurasanîyên hanê tevde ji bona binê zindanê datin avêtin. Her çende Hacî Elî Qolî Xan jî ji bona berdana wan date bihêvîkirin, ew bê sûd bû; jiber ve jî vî Mîrê bi rûmet ve dev ji karê Cafer Xan date biberdan û ew ji bona welatê xwe çû. Di nava demekê de Cafer Xan Leškerek ji bona ser wî date binardin û daxwaza hatina wî ji bona Šîrazê lê date bikirin. Belam wî bi sozên Cafer Xan ve nedida bibawerkirin û ew nehat. Di dawî de ew hate bigirtin û ew ji bona Šîrazê hate anîn û ew ji bona binê zindanê hate avêtin. Hacî Elî Qolî Xan ligel hinekan ji Zindevanan de ji bona hilanîna heyfa xwe jêre tepa kuština wî datin bilikarxsitin. Di nava wan Zindanvanan de Yekek ji wan Seyid

[251]Ev Wezîr Mîrza Husên Bavê Mîrza Buzurk Wezîrê Šahzade Ebas Mîrzayê Šungirê rewayî Îranê bû. Ev Mîrza Husên ji bal Tude de zor xwešewist bû.

Murad Xan bû[252], yê ku wî rolelek pir giring û bi kêr ve ji bona biserkevtina vê vîlika hanê date bilîstin, ya ku ew bi vî rengê hanê ve hate bicihatin: Jineke dîlkirî hinek ji dermanê bêhišitîyê bir û wê ew ji bona nav xwarina Cafer Xan date bixistin. Di wê dema bêhišitîyê de bi alîkarîya Havalbendên xwe ve Zindanvan hatin birizgarkirin û wan xwe bi Oda Cafer Xan ve dane bigihandin û wan ew date bikuštin. Wan serê wî ji nava kelehê ji bona ber dergehê wê datin biavêtin. Wan di nava bajêr de datin bicarînkirin, ku Cafer Xan hate bilinavçûn. Ev di sala 1789 z. de hate bikirin.

[252]Ev Mirovê hanê Ostandarê Šîrazê bû. Wî zor yarmetîya Cafer Xan dabû bikirin. Belam li dawî de nava wan têkçû. Cafer Xan ew ji bona binê zindanê date biavêtin.

## 2. Rojgarîya Lutif Elî Xan

Lutif Elî Xan Kurê Cafer Xan di wê demê de ew li Kermanê bû. Seyid Xan Serokê Bizava Šûrešê xwe bi Šahî ve li ser Îranê de data bidazanîn. Lêbelê li dawîya çend Mehan de serdarîya wî hate biwergerandin. Walîyê gištiyî Faris Hacî Ibrahîm, yê ku ew zor ligel bextîyarî û biserkevtina Lutif Elî Xan de pêwenddarbû, ligel hinekan ji xelkê û Serokên Ešîrên Hundurû peymanek dabû bigirêdan. Gava ku Lutif Elî Xan xebera kuština Bavê xwe bihîst; çunke, bawerîya wî bilLeškerê wî nemabû, wî ji bona layê Šêx Bavê Šeher date birakirin. Wî netuwanî bi bez û bi zûyî ve daxwaza Textê Bave xwe bide bikirin. Šêx Bavê Šeher jî zû hate bimirin. Wî ji bona Kurê xwe Šêx Nasir temînî date bicîhištin, ku ew divê yarmetîya Lutif Elî Xan bide bikirin. Bi rastîjî vî Šêxê hanê jî Leškerekî Biçûk pê date bidan û wî ew ji bona Šîrazê date binardin. Lêbelê ev Leškerê hanê beramber bi hêza Hacî Hašimê Birayê Seyid Xan hate bišikenandin û ew ji hev hate bibelawelakirin. Duwem car gava ku Hacî Ibrahîm Lešker ji bona ser Lutif Elî Xan date binardin, ew li jêr komandariya Elî Mehmud Xan de bû. Ev Serleškerê hanê di nava dilê xwe de Dujminê Hacî Ibrahîm bû û ew di bin re bi soz û peyman ve Hevalbendê Lutif Elî Xan bû. Gava ku ew ji bona nik wî hate bigihastin, wî hevalbendîtîya xwe ji bona Lutif Elî Xan date bidazanîn. Šahzade Lutif Elî Xan di vî karî de omedî pe hate bikevtin. Wî ruwê xwe ber bi paytext ve date bivekirin. Bi alîkarîya Dost û Hevalbendên wî ve bîr û baweriya gištî jê re hatîbû bilikarxsitin. Ew ji bal Tude ve di sala 1789 z. de hate bipêšîwazîkirin. Seyid Xan xwe ji bona nava kelehê date avêtin. Lêbelê zor pê neçû, ew hate biberdestkirin û ew hate bidarvekirin. Lêbelê Hacî Elî Qolî, yê ku ew Yekek ji Gewreyên serhildanê bû, ligel gelekîtiri ji Serdaran de ji bal Hacî Ibrahîm Xan ve hatin bipištrastkirin û Lutif Elî Xan jî nebes tenê ku wî ev sozê Hacî Ibrahîm date bipištgirtin, belkî hêjîbêtir wî dilovanî û pištgirêdana xwe ji bona wan date biderxistin.

Lutif Elî Xan li temenî Bîst Salî de bû. Belam di rojgarîya Bavê xwe de her û her ew di karmendîyê de bû. Ew bi pêlikeke wetov hatibû bigihaštin, ku wî Dost û Dujmin ji hev didan biderxistin. Di wî de ew ji Gernas û Šervanên welatê xwe bû. Wî kar û jêhatiyên weha didan biniwandin, ku bi rastî ew ligel sîncî û nav û nîšanên wîyî bilind dihatin lihevhatin. Rumet û šanên wî zor diyar bûn. Ew bi qam û Qiyafet bû. Ew

Xortekî çalak, bi bejin û bala bû. Ew barîk, gurc û mezbut bû. Ew bi hêz bû û Siwarekî çeleng û çalak bû. Ew li hemû rengekî fêrbûna xwe de hunervan û bê haval û hempa bû. Belam mejîyê wî ji bona Serpereštiya Serdarîyê baš nedida bikarkirin, mîna ku wî di warê šer û ceng de pir bi bašî ve dida bikarkirin.

Ew li pêš hatina ser Text de zor nazik bû û ew derbarê Biçukan pir dilnerm û mehreban bû. Belam lidawîya Serdarîyê ewende pê neçû, ku wî serûštîya xwe date veguherandin û ew li nîšanên xweyî pêšû de nema. Li cîgehê dilnerm û mehrebanîya xweyî kevin de tundî û bê mehrebanî date binuwandin. Wî nema guh bi Qencîvanên xwe ve date bidan. Ew beramber bi Hacî Ibrahîm Xan ve, yê ku ew bi hoyê hatina wîyî ser text ve bû, zor hate veguhertin. Wî bi Dujminatî û gûmanlêkirinê lê dida bitemasekirin. Bi rasti jî evaya pir seyr bû, ku wî bi çavekî kîn ve li wê hêza wîyî gewre dida bitemašekirin, ya ku wê Tac ji bona ser serê wî dabû bidanîn.

Hêšta ew di destpêka pêla serdarîya xwe de bû, ku Aga Mohemed Xan ruwê xwe ber bi Šîrazê ve date bivekirin. Vî Serdarê Nezan mêrxasîyeke zor berz û bala date nuwandin, ku ew bi xwe ve ji bona pêrgîbûna wî çû. Ew li Gundê hezarbîze de tûšî wî bû. Belam ew beramber bi hêza zorî Qacarî ve hate šikenandin û ew pošî pošman ji bona Šîrazê hate bivegerandin. Aga Mohemed bi payebûna vê biserketinê ve ji bona ser Šîrazê hat û ew li dawîya Mehekî ji dorlêpêçanê de ji bona Tehrana paytextê xwe hate bivegerandin.

sala duwayî bi endîsa hêrîšeke tir Lutif Elî xwe ji bona liberxwedaneke bi hêz ve date bilikarxsitin. Belam Aga Mohemed bi hoyê karwerîya xweyî Ezirbêcanê ve nehat. Lutif Elî Xan nexwest, ku ew wê hêza xweyî komkirî bêkar bide bihištin. Wî ligel wê de ruwê xwe ber bi Kermanê ve date bivedan. Ew bi hin mercên Walîyê wê ji bona berdestbûnê hate pêrûniština. Çunke, dema šer hatibû bibuhurandin û Xêrxwazên wî jî lê dane bišîretkirin, ku ew wan mercan bide bigirtin. Yekek ji wan mercan bû, ku ew çavên xwe ji Walî û Hevalbendên wî bide biwirkirin. Belam Lutif Elî Xan ev mercê hanê erê nekir. Li ser vê de wî bi dorlêpêçanê ve di wê Zivistana sext de date demandin. Orduwê Dorlêpêçvanan Wilax û Mirovên zor li ber serma û birsîtiyê li kîs de çûn. Li dawî de baran û berfeke zor bi anîna Xwarin û vexwarinê ve jî hîç rê pê neda bidan. Di dawî de bi zora Hinekan ji Lešker û nerazîbûna hemûyan wî waz li dorlêpêçanê de date anîn û ew bi zîneteke pirî perîšan ji bona Šîrazê hate bivegerandin.

Li pêš rû bi rûbûna wîna de di vê çûna šikestî de wî Birayê xweyî Biçûkî, yê ku ew hišta Menal bû, bi nav ew ji bona Walîye Faris date binîšankirin. Di wê demê jî bi xwe de wî serdarîya Šîrazê û Dorhêla wê bi Hacî Ibrahîm ve date bisipartin û Komandarîya hêza parstina wê bi cihê ve wî bi Serokekî Ešîra Zend bi navê Bextiyar Xan date bisipartin. Wî keleha Hundur jî ji bona jêrdestîya Serokekekî tirî Zend date bixistin. Mebesta wî li biparvekirina van desthilatîyan de nehîštîna bûna bêbextîyê bû. Bextiyar Xan Peyakî lawaz û pozbilind bû. Ew bi cihê xwe û serxwebûna serpereštiya Supahîya xwe ve ji ser xwe çû; jiber vê jî wî xwest, ku ew bi ser Hacî Ibrahîm ve bête zalbûn û fermanê lê bide bikirin. Belam ew bi vê ve nehate biserkevtin. Wî date bidestpêkirin, ku ew Lutif Elî Xan derbarê wî de bide livandin. Van livandinên hanê kêm yanjî bêtir lê kêra xwe dane bidîtin. Lutif Elî Xan li dawîya hatina xwe ji Kerman de di hemû reftra xwe de weha dida binîšandan, ku ew êtir nema pišta xwe bi Wezîrê xwe ve dida bigirêdan.

Bi xwe jî demekê li pêš vê jî de rûdanekê di navbera Hacî Ibrahîm û Lutif Elî Xan de kêrek pir giring di pêwendîyên wan de ligel hev de date bihištin. Lutif Elî Xan li ser tikaya Hacî Ibrahîm de li çend Kesekan de, yên ku gûman li ser kuština Bavê wî de li wan dihate bikirin, hate bibuhurandin. Di nava vanan jî de Mîrza Mehdî hebû, yê ku li pêš de Cafer Xan ew di karmendîya lešker nivîs-Hejmêr lešker- dida bikaranîn. Li dawîya dozandin hin dizîyê de li ser wî de ew hate biderkirin û guhên wî jî hatin bijêkirin. Gava Cafer Xan hate bikuštin û serê wî ji bona ber dergehê kelehê hate bifirêdan, Mîrza Mehdî jî herdu Kuhên wî dane birîn. Belam wî ev karê hanê nayîn dikir. Hacî Ibrahîm, çunke, bi bêgunehbûna wî ve bawer bû, wî daxwaza libuhurandina wî ji Lutif Elî Xan dabû bikirin. Serdar li dawîya vê de soz bi Ibrahîm ve dabû û wî gotibû: heger jî wî ev rûdan û ev pîsîtîya hanê jî dabe bikirin; jiber xatirê te dîsan ez bê dudilî lê têm buhurandin. Li dawîya çend Mehan de Lutif Elî Xan Xelat dane bidabeškirin û wî xelatek jî ji bona Mîrza Mehdî date bidan. Gava Dayika wî evaya bihîst, wê bangî wî kir û wê gotê: "Magelo libuhurandina kuština Bavê te nedida bitêrkirin? Tu biserdejî hêjî nîšanan pê dide bivekirin. Evaya bîrwerîya Bavê dide bibedkirin". Van peyvan zor kêr li Lutif Elî Xan de dane bikirin. Ew ji bona Seraya Serdarîyê hate bivegerandin û wî ji bona Mîrza Mehdî date bibangkirin. Li dawîya gazineke zor de wî fermana sûtandina wî date bikirin. Gava Hacî Ibrahîm evaya zanî, bi pele ew ji bona Serdar çû û ew ev li vê reftara hanê de xeberdar bû. Bi beheti ve wî lašê sûtawîyî Mîrza Mehdî bi çavên xwe

date bidîtin. Li dawîya vêna de- mîna ku Hacî Ibrahîm bi xwe ve ji bona Sêr Malkolm dayite gerandin, êtir hîç bawerîya wî bi Lutif Elî Xan ve nemabû.

Ev cudabûna di navbera Serdar u Wezîrê wî de li layê hemû Kesekî diyar bû. Lutif Elî Xan dida bikarkirin, ku ew wê rêstika kar, ya ku wî tanî wê demê pê dihate rûniştin, bide biberbadkirin. Belam wî di xwe de ew mêranî nedida bidîtin, ku ew bi eškere ve hêrîšî wê rêstika kar bide bikirin; jiber ku ew ji hêz û hinera Wezîrê xwe dihate bitirsandin. Bi rastî jî bicgeh ji pêwendîyên Tudeyê Šîrazê ligel Hacî Ibrahîm de zor ji Ostandarên Welatan û Serokên Ešîran jî ligel de bûn û wan bi germî ve jî pištgirtina wî didan bigirtin. Birayê wî jî Komandarê Orduwa Peyade di Supah de bû. Li gora vê zîneta hanê de Serdar bi serûštî ve mêldarê bikarîna nobûnê nebû. Belam wî torebûna xwe li hemû tištekî de dida biderkirin. Gava ku Wezîr zanî, jiyan û hebûna wî di bin tirsê de tête bidîtin, wî biryara li navbirina Lutif Elî Xan date bidan.

Di vê navê de, ku zînetan bi vî rengî ve didan bidirêjkirin, Lutif Elî Xan reman bi çuna ser Isfehanê ve dida bikirin. Di pêšî de, mîna ku wî çilo li pêš çûna Kermanê de dabû bikirin, vê carê jî wî Kar û barên Mîrîyî Šîrazê date biparvekirin: Ji Malbata xwe wî Mîrek ji bona Komandarê hêza parastina bajêr ve date bidanîn, Yekekîtir jî ji wê wî ew ji bona Komandarîya keleha nav bajêr date binîšankirin. Gûmana wî wer bû, ku bi saya van rêkxistinan pêvetir tu tirs ji Wezîrê wî nema tête bidîtin. Ligel vê jî de wî nedituwanî tištekî tir li ser Wezîr de ji bil dostanîya wîna ligel wî de bide dozandin. Li dawîya vêna de bi rengekî Mîrî ve wî xatirê xwe ji Ostandarê Šîrazê date xwestin. Di dema bi birêkkevtina Orduwê de wî ji Hacî Ibrahîm re got: ku ew Kurê xweyî Gewre, yê ku ew bi navê Mîrza Mehmud bû, ji bona Wargeha Orduwê bide binardin. Ev Kure çunke zor Biçûk bû, bi serûštî bû, ku hîç karek û karmendîyek pê nedihate bikirin. Diyar bû, ku ew bi girawa kar û barên Bavê xwe ve tête bikirin. Tanî vê rûdanê Hacî Ibrahîm di bicihanîna biryara xwe de dudilî dida bikirin. Belam gûmana wîna hîç cihê dudilîyê nema jê re date bihištin. Wî biryar date bidan, ku ew rojeke zûtir vîlika xwe bide bicihanîn. Vîlika wî jî bi vî rengî bû, ku ew Šîrazê ji bona Aga Mohemed Xan bide biberdestbikirin û ew bi vî rengî ve wî bi Serdarê Yekane ve ji Îranê bide bikirin.

Bi rast jî Hacî Ibrahîm êtir hîç bawerîya wîna bi Lutif Elî Xan ve nemabû. Bi xwe jî ew Dujminekî wîyî zor bû. Ji bona parastina jiyana xwe wî xwest, ku ew bi karê xweyî gewre ve parastina Padšahekî xurt ji

xwe re bide bidîtin. Ew ji bona pêškešbikirina vî karê hanê tuwankar bû. Belam gava ku wî li vî karî de dida biremankirin, ya ew ku bi berbatîya Xanedanekê ve dihate bidawîkirin, ya ku ew bi bingehê vejandina hêz û rumeta wî ve hatibû bikirin, pir cerg û bextê wîna dihate bisûtandin[253].

Li dawîya ku Lutif Elî Xan çend qonaxan hate dûrbikevtibin, Hacî Ibrahîm bi hêza bajêr ve, ya ku wî ew dabû pêkanîn û wî ew li jêr serpereštîya Mohemed Hesen Xanê Birayê xweyî Biçuk de dabû bidanîn, keleha bajêr date bigirtin û wî Parêzvanê bajêr û Komandarê kelehê jî bi zor hêsanî ve date biberdestkirin.

Wî ev xebera biserkevtinê ji bona Birayê xwe date binivîsandin, yê ku ew ligel Leškerê Lutif Elî Xan de bû û yê ku wî Ordugaha xwe Pênc Fersexan dûr Li Gundê Komerîša de hatibû biwarkirin. Leškerê Qacarî jî li jêr Komandarîya Baba Xanê Xwarzayê Aga Mohemed Xan de ruwê xwe ber bi wan ve dabû bivedan. Ew Bîst Mîlekî nêzîkî wan bû. Birayê Hacî Ibrahîm ligel Serok û Efserên orduwê de ji bona bêbextîyê hatibûn rêkkevtin. Wan datin biryardan, ku tarîk dahat, divê bešekî Leškerê Peyade Baregeha Lutif Xan ber bi tevingan ve bide bikirin û ew

---

[253]Ev Hacî Ibrahîm Kurê Hacî Hašim bû, yê ku ew Yekek ji Rumetvanen Šîrazê bû. Ew li temenekî zor pîr de hate bimirin. Wî li dû xwe de Maleke zor reben û Perîšan date bicîhištin. Belem ewnede pê neçû, ku Kurê wîna ji bona nava rêza Rumetvanan hate bikevtin. šincî, reftara wîyi baš, jîrbûna wî û liberketina wîna zor pêdane bipêšvexistin û wa ji bona nik pilindaya Kerîm Xan datin bigihandin.Kerîm Xan Hacî Ibrahîm li cîgehê Bavê wi de date bidanîn. Elî Murad Xan ew bi Serokê hemû Gewreyên Heydrî ve date bidanîn, yên ku wan di wê gavê de bigir nîvê Tudeyê Šîrazê bûn. Di dema ku Cafer Xan ji Isfehanê date birakirin û ew ji bona Šîrazê hat, Baja bi hêsanî ve Hajî Ibrahîm jê re date biberdestkirin. Li vê jî de Cafer Xan ew bi Ostandarê gištîyî Faris ve date binîšankirin. Bi saya vê karmendîya gewreyî hanê ve wî gelekî desthilatî ji xwe re date bipeydakirin. Wî beramber bi qencîya Cafer Xan ve Lutiv Elî Xanê Kurê wî bi vê bilindaya serdarîyê ve date bigihandin.

Sêr Malkolm dibêje, ku min bi xwe ve di vi wari de ligel Hacî Ibrahîm dayite peyivandin. Wî wisa date biderxistin: ku mebesta wî di vî karê hanê de rizgarkirina welêt ji šer û pevçûnan bû û nehiština rûxandina Dewlet bû. Wî got:" Her Yekî li Zend û çi Yekî li Qacar de heger ew ji bona ser Tex bênebi rûništin, ew rê li ber talanîya Lešker de nadin bigirtin. Balam ewê ji bona hemûyan pêwiste, ku ew Yekekî pê Îran bête bihêzkirin û ew aramîyê û bêdengiyê di seranserî Welêt de bide bibicîkirin".

dest bi qerîn û qêjîne ve bidin bikirin. Ev jî nîša kombûna Berê Hacî Ibrahîm bû. Bi rastî jî li gora biryarê de hate cûlandin. Hera hate bipeydakirin. Lutif Elî Xan behetî ma û tirs pê ve hate bikevtin. Wî Peye datin binardin, da ku ew bizanibin, bê ka çi ye. Peye hatin û wan pê dane bigotin: Suwarbe û derçe; çuke, Leškerê te ji bona te bi Dujmin bûye. Bes û bi tenha Tehmaseb Xanê Feylî ligel Heftê Suwarekî bi šûn wî ve hatin bikevtin. Serok û Serleškerên mayî ev Serdarê bedbext dane bicîhištin. Lutif Elî Xan bi Omêdîya ku Šîraz bi bestên Komandarên wî ve ye, wî ligel Hevalên xweyî di felaketê de ruwên xwe ber bi paytext de di sala 1792 z. de dane bivekirin. Belam li dawîya çûna wîna de ji Ordugahê bi du rojan ve ew li zînetan xeberdar bû û hêza wîna jî bi Sêsed Suwarekî ve hatibû bigihaštin. Her çilo bû, wî xwe bi dergehê Šîrazê ve date bigihandin. Wî Peyak ji bona layê Hacî Ibrahîm date binardin û wî hoyên reftara wîna jê date pirsîn. Hacî Ibrahîm li bersiva vê pirsê de li ser xwe de wî got: "Li zîneta Lutif Elî Xan û remana wîna de ez hatim têgihištin û biliberkevtin, ku ez ji bona parastina jîna xwe divabû wî ji hêza wîna bidim birûtkirin û wî bidim bidûrxistin. Divê tu wî bide biamojkirin, da ku ew dev ji Xwedanîya Šîrazê bide biberdan. Pê bide bigotin, ji bona rizgarkirina canê wîna bickeh ji rakirinê pêve tu çare nema tête bidîtin"[254].

Belam vî Serdarê peyevan tevî kêmbûna hêza xwe jî ev amojgarîya hanê date bivegerandin û wî date bigotin: "Her çilo be, ev Bêbextê hanê Merevekî Bajarî ye. Hêz û Hinera wî jî di encam de ji Beqal û etaranin, yên ku ew netuwanin beramberî Supahekî aza bêtin birawestandin". Bi vê Nigaša hanê pišta Lutif Elî Xan sitûr bû. Ew li nêzîka Dîwarên bajêr de hate dabezandin û wî Ordugeha xwe date bihildan. Hacî Ibrahîm ku wisa zanî, wî fêlek tiri jê re date bidozandin. Wî ji bona sipahên Xwedîyên Mal û Menalên nav bajêr de xeber date binardin û ji bona wan date bigotin: heger ku ew zû Lutuf Elî Xan bîcînehêlin û ew ji bona nava bajêr neyên, dê ew hemû Mal û Mendalên wan bide bikuštin. Bi rastîjî vê zor kêra xwe di nava Supah de date bikirin û sipah Lutif Elî Xan dane bicîhištin. Serdarê bedbext neçar bû, ku ew ligel çar pênc kesekî de ji bona bajarê Bavê Šeher çû. Belam gava ku ew pê hate bigihaštin, wî date bitemašekirin, Ku Šêxê wêna mîna pêšû dostanîya wîna nema ye; çuke ew jî Hevalbendê Hacî Ibrahîm bû. Jibervêjî ew ji bona Benderîk çû. Serdarê wê zor bi bašî ve pêšewazî lê

[254]mêjûwa Hacî Ibrahîm.

date bikirin û wî tanî dikarîbû yarmetîya wî date bikirin. Bi saya vê yarmetiya hanê ve wî dikarîbû hinek Hêz ji xwe re bide bikomkirin û wî ligel wan de date bixebatkirin, da ku ew Šîrazê bidin bisitendin.

Kêmîya Leškerê Lutif Elî Xan bi saya azaya xwe ve û bi dostanîya Supah jê re ewende derengnekevt, tanî ku kamwerîya wîyî pêšî bi ser Leškerê Bav Šehr ve hate bikevtin[255]. duwem šer wî ligel Serdarê Kazeron date bikirin. Wî ew date bidîlkirin û wî çavên wî datin biderkirin[256]. Vî karê bedkar ne bi kara wî ve hate bidawîkirin. Wî Dujminên wî date bihêzkirin û Dost û Hogirên wî jê dane bidûrkirin. Di vî karê nezan de bedbextîya wî dihate bipeydakirin û ew bi hoyê nemana wî ve dihate bikirin.

Lutif Elî Xan di van kamwerîyan de desthilanînê date biwergirtin û ew dîsan ji bona ser Šîrazê çû. Wî dest bi dorlêpêçanê û tengavîya wê date bikirin. Belam ji kêmbûna Peyade û Topçiyan wî ve Dorlêpêçan pê nehate bikirin. Tevlivêjî de Hevalbendên Dorlêpêçanvan jî li dora wî de dihatin bikomkirin û wan xwe bi wî ve didan bigihandin. Wan hêvîya biserkevtinê û sitendina Serdariyê û layandina Šîrazê jê didan bidaxwazkirin. Lêbelê Qehremanî û xebata vî Šahzadeyê nezan û ji ser xwe çûyî tûšî Mirovekî hatibû bikirin, yê ku wî bi hîš, jîrbûn û tevdîr ve hemû berbatiyek li pêš bûyîna wêna de pê dihate biliberkevtin. Wî nobûn ligel nermbûnê de her û her dida bikirin. Bi bê divabûn, ew ji Duminên xwe nedihate bitirsandin. Her û her ew li ser Hevalbendên xwe de Kervan û Çavdêrvan bû. Van nîšanên berz û pir bilind di jîna vî Mirovê hanê de zor kêrên xweyî giran û giring di hemû qonaxên Jîna wî de dane bikirin.

Li dawîya cihêbûna Lutif Elî Xan ji Leškerê xweyî serhildayî di rûdana Isfehanê de ew Lešker serhildayê bi rebenî û perîšanî ve ji bona Šîrazê hate bivegerandin. Hatina vê hêza hanê hêz û hinera Ešîrên

[255]Ev Šerê hanê li Gundê Tenkestan de hate birûdan. Qolê Suwarê Bavê Šeher, yê ku ew di bin Komandarîya Rida Qolî Xan de bû, ew ji bona nik Lutif Elî Xan hat bigihandin. Li dawîya vê rûdanê de hêza Peyade bê šer hate bišikenandin û wê date birakirin.

[256]Ev Serdarê hanê Hacî Elî Xan bû. Ew ji bal Lutif Elî han hatibû bilêbuhurandin. Dîsan jî bawrîya wî pê nehate bianîn. Wî ji bona layê Aga Mohemed Xan dateb irakirin. Birayê wî Rida Qolî Xan Serdarê Kazeron bû. Di roja rakirina Lutif Elî Xan ji Šîrazê de wî hêrîšî wî kir û wî bargiranîya wî date bitalankirin û çend Welaxên wî jî dane bibirin.

Çekdarîyî Faris date bibêtirkirin û Wê ew bi Duwanzdeh hezar Kesên Suwar ve date bigihandin. Peyade yaxud sipahê bajêr hemû ji Destkar û ji Besdestkevanan bûn. Ew bes û bi tenha ve Pêncyekekî ji wê jimara sipahê Eširan bû. Hacî Ibrahîm jî bes û bi tenha ve pišta wî bi yarmetîya sipahê bajêr ve situr bû; çunke, wan Ešîran dewlemendî û bextiyarîya xwe di demandina serdarîya Zend de didan bidîtin; Jibervêjî hîç nedibû, ku ew li ser remana Hacî Ibrashîm de bin. Ango ku ew pê bêtin birûništin, ku Serdarî û desthilatî ji bona nava destên Qacaran bêtin biveguhestin. Hacî Ibrahîm date bibawerkirin, ku ev hêza hanê nahêle, ku ew bernameya xwe bide bicihanîn; jibervêjî wî date bibiryarkirin, ku ew çekên wan ji wan bide bisitendin û wan ji nava Supah bide biderkirin. Wî ev bernameya xwe liserxwe û bi lez û bez ve date bicihanîn. Wî ji bona dû wan Eširan date binardin û wî ji wan re date bigotin: ku ew divên di demeke nîšankirî de ji bona nava Bajer bên, da ku ew xelat û nîšanan bi ser wan ve bide bibelavkirin. Hemûyan banga wîna dane bicihanîn. Bi kurtî ve bi fêlbazîyeke zor behetî ve bi bê šer û pevçûn ve wî çekên tevan ji wan date bisitendin. Li dawî de wî ew hemû ji bona nava Gundên wanan datin bivegerandin. ji vanan hinek ji bona layê Lutif Elî Xan hatin û bešekî zori jî ji wan bê çek çavrewanîya sernivišta xwe didan bikirin.

Hac Ibrahîm zemanê girtina Šîrazê ji bona Aga Mohemed Xan date binivîsandin, Serokê Qacaran jî di bin Komandarîya Mustefa Xan de Leškerek ji bona yarmetîya Hacî Ibrahîm date šandin. Li layekî din de Lutif Elî Xan di kêseke baš de xwe ji bona ser wî Leškerî date bidan. Li dawîya serekî no û giran de wî ew Lešker ji hev date vejandin. Gava ku Aga Mohemed Xan ev xebera hanê date bibihîstin, wî ceng date dazanîn û wî Hêzeke xurt di bin Komandarîya Can Mohemed Xan û Rida Qolî Xan de date binardin. Li gora pirbûna vî Leškerî de wî dida bitêrkirin, ku ew vî šerî bîne bidawîkirin. Vî leškerê hanê, li dawîya ku ew ligel hêza Šîrazê de yekdigerbûn, ji bona hêrîša ser Lutif Elî Xan rûwê xwe ber bi wî ve date bivedan. Leškerê Lutif Elî Xan zor di çavên wan de biçûk bû. Ew Dehyek ji wan bû. Vî Šahzadeyê bi rûmet ve nexwest, ku ew ruwê xwe bide biwergîrkirin. Belam jiber kêmbûna hêza xwe ve bi remaneke hozanî ve hin ji Bax û dehlên wan navan de date leyandin, tanî ku ew bi vî rengî ve û bi yarmetîya sextbûna cihê xwe ve bikaribe beramberîya vê hêza gewre bide bikirin. Di destpêkê de šer ji bona Dujminên wîna alîkar bû. Wan ji bona nava cihên wîna dane bihêriskirin û wan Liberxwedanvan dane biderperandin û ew bi šûn wan ve hatin bikevtin. Belam Lutif Elî Xan, ku bi rastî ve karîn û bidîtineke wîyî dûr hebû, dît,

ku Leškerê Dijmin bi talanîyê û rûtkirinê ve hatîye bikevtin û Ordugeha wî maye valabûn. Wî ev bi kês ve ji xwe re date bidîtin. Wî çend Siwarek datin bikomkirin. Wî bi hêz û hiner ve xwe bi ser Dujmin ve date birakišandin. Gava çavên Leškerê wîyî šikestî bi qehremanî Serokê wan ve hate bikevtin, hemû bi hev re ji bona ser Dujmin hatin bivegerandin. Wan Dujmin li hemû layekî de dane bišikandin. Bi vî rengî ve kur û gûman bi serkevtina Lutif Elî Xan ve nema. Bi Dujmin ve ziyaneke pirî zor hate bipêkevtin û Bešekî zor jî jê hatebi berdestkirin. Di nava van Bedestvanan jî de Rida Qolî Xan bû, yê ku ew Yekek ji Serokên Qacaran bû.

Hacî Ibrahîm zanî, ku ev kamwerîya duwem šan, nav û banga Lutif Elî Xan dê bide biberz û bibalakirin û ev jî ji bona wî xerabe. Wîna ji bona Aga Mohemed Xan date binivîsandin, ku ew bi pele ve xwe bi Šîrazê ve bide vegihaštin. Ev Serdaraya hate têgihištin, ku zînet di metirsîyê de ye. Destbicî wî bi Hêzeke zor gewre bi Sî hezar Kes ve ruwê xwe ber bi Širazê ve date bivekirin. Ev hêza beramber bi hêza Lutif Elî Xan ve Sedbiyek bû. Ev jî nîšan bû, ku Aga Mohemed Xan bi çavekî pirî bilind ve li mêrxasî û pehlevanîya Dujminê xwe dida bitemasekirin û ji xwe re hilanîneke baš dabû biwergirtin. Belê evaya jî mafeye wî bû. Aga Mohemed Xan bi hêza xwe ve hate bipêšvekevtin û ew bi Gundê Miyanê ve li nêzîka Istexerd- Persepolîs de hate gihaštin. Li wêderê de Ordugeha wî ji nivšekê ve tûšî hêrîša Lutif Elî Xan bû. Vî Šahzadeyê hanê bi mêrxasî û qehremanîyeke weha ve ji bona qada ceng û šer hate xwarîn, ku tê bêje, li layê wî weha bû, ku wî xwe di nava dîlan û govenda xwešbûna jînê de dida bivegevizandin. Wî lingên xwe ji bona Tacgîra Îranê ji bona nava meydana šer date biavêtin. Vê cengbûna Šêrîtî pêšdarîya Aga Mohemed Xan ji hev date bijenandin û biletletkirin. Ew bi šûn wan ve hate bikevtin. Wî bi çend Sed Suwaran ve xwe ji bona ser leškerekî sî yanjî sî û pênc hezar kesî ve date bidadan. Li layekî de tariya Ševê, li layekîtir de tirs û sawa di rêya bazdana pêšdarîya leškerê Aga Mohemed Xan de hate bipeydakirin û herwehajî sawa navê Lutif Elî Xan orduwa Qacarî bi rengekî wer ve date bitawî bikirin, ku wî ew date bitêkûpêkdan. Evaya jî bi xwe jî ve mîna nîšana pêšekîya biserkevtinê dihate bidîtin[257]. Bi xwe jî ve hemû Orduwa Aga Mohemed ji hev hate

[257]Lutif Eî Xan bi destên xwe ve Ibrahîm Xanê Serokê Qacaran ligel Hinekan ji Peyên wî de date kuštin. Vî Serokê hanê li Derbendê di nava Miyane û Ebrez de Boseyek li ber Šahzade Lutif Ei Xan dabû bidanîn.

belawelakirin û Hêrîšvan jî bi Baregeha Aga Mohemed Xan bi xwe ve hatin gihaštin. Di vê bêhnê de Yekekî ji Serdarên Lutif Elî Xan ji Šahzade re got: Ku Aga Mohemed ligel Bazdvana de daye birakirin û wî jê re date bigirawkirin û gotê: Ez hejnakim, ku ew Mal, Dewlemendî û Xizna Šahîtîyê, yên ku ew bi ezyet bi dest ve hatine bikevtin, ji bal Orduwê ve bi talanî ve bête biçûyîn[258]. Sed Heyf ku Šahzade pê date bibawerkirin û dest bicî wî ferman bi Lešker ve date bidan, da ku ew rawestin û ew ji bona nava Baregeha Šah ve neçin. Bi rastî jî Lešker bi fermana wî ve dane bikirin û wan ruwê xwe bi layekîtir ve dane bivekirin û wan dest bi talanîya lidûhištinên leškerê bazdayî ve datin bikirin. Roja duwayî li ber beyan de û li rewšeke wetov de, ku Šahzade bi serkevtî ve bi pišt dujmin ve hatibu bikevtin, ji niškêve bi sersurayî ve wî date bidîtin, ku li Ordugeha Dujmin de banga Sibê hate dan û xelk ji bona nêmêjê tête bibangkirin. Ew Kesên, yên ku ew di nava ordugehê de mabûn, li vê de hatin têgihištin, ku Aga Mohemed Xan di cîgehê xwe de mabû[259] û wî Baregeha xwe nedabû biçîhištin. Bi rastî jî ve gava ku Aga Mohemed Xan çavên wî bi îš û karên orduwa wî ve hate bikevtin û wî dît, ku ew nayêtin biçakkirin. Ew li Baregeha xwe de ligel Hinekan ji Pasevanên xwe hate birawestandin û wî serî Dujminê xweyî mêrxas û bi rêk û pêk ve date bikirin. Lutif Elî Xan ji xewna kamwerîya xwe hate bišiyarkirin. Wî date bizanîn, da ku ew bi berdestîyê ve neyête bigirtin, ji bil xwederkirinê pêve çareyeke din jê re nayête bidîtin. Wî wetov jî date bikirin.

Ev pêrabuna bi mêranî ve ji bona sitendina Serdariyê û bicîkirina Desthilatiyê nabe, ku ew bi karekî bê hêvîtî lê bête bitemašekirin; çunke, karîna biserkevtinê têde nema dihate bidîtin. Lutif Elî Xan bi serpêhatîyên xweyî zor ve bi bašî ve hatibû bitêgihištin. Ku leškerekî hêrîskirî û heger yekcarê jî pešokî û jihevjenîn di nava wî de bête bipeydakirin, êtir xwe bikomkirina wîna nayête bikirin. Dîsan jî wî baš dizanî, ku piranîya Serokên Ešîran hêštajî ew di navbera wî û Aga Mohemed jî de dudilî bûn. Van Serokan her gav û çaxan li gora zînetan û zeman de xwe didane

---

[258]Serdarê Amojvan Mirza Fetih El-lahê Erdelanî bû. Hinek ji Mêjûvanan dibêjin, ku wî ev amojgarîya hanê bi dilekî pak ve dayite bikirin. Hinekî din ji wan dibêjin, ku ew Sîxurê Aga Mohemed bû.

[259]Her gava ku Šah li gel Orduwê de ba, bi vî rengî ve bang dihate bikirin.

bilivandin. lêbelê heger her Yekî ji wan bi azadîya xwe ve ji xwe re di nava Herduwan bida helbijartin, dê wanan bi bêdudilî ve ji xwe re hevalbendîtîya Lutif Elî Xan bidana helbijartin. Li layekîtir jî de Lutif Elî Xan li ser rastiyê bû, ku wî hêvî bi encamê vê biserkevtina bê hempa ve bide bikirin; jiber ku wî hemû destikên bi serbikevtinê ji bona biserkevtina dawî ve bi ser dujminên xwe ve û bi alîkarîya van Serokên Ešîran ve dabû bilikarxsitin.

Ji vî pesnê hanê têtе bidîtin, ku pilana Hêrîša Šahzade bi rastî jî ve bê kêmasî bû û wî pir bi wiryayî ve xwe dida bilivandin. Ji niškê ve wî pêšdarîya leškerê Aga Mohemed Xan date bitarûmarkirin û ew di bêhna pêšî de hate biserkevtin. Ev biserkevtina hanê nîšana karîn û mêrxasîya wîyî berz bû. Belam biserkevtina bi carekê ve bi hoyekî weha ve ji nava destên wî çû, yê ku ew di piranîya encamê man û nemana Serdarîyê û dewletan de dide bikêrkirin.

Bi rastî jî çilo Lutif Elî Xan lihevhatîyê biserkevtinê bû, wehajî Aga Mohemed Xan lihavhatîyê Taca Šahînsahîyê bû, ya ku ji wê rojê û pêve jêre hate bisaxkirin. Ev Serdarê hanê li bêhêvîtî û perîšanîya leškerê xwe de hîç tengav nebû. Ev jî nîšana tebûtbûna wîyî pirî berz bû. Mejîyî wî her û her ligel vê rûdana hanê de karwer bû. Pir caran ew di pêjna wê de bû. Di mêjûwa dawîyî Îranê de bes û bi tenha ve sê tišt divê bi bašî ve ji bona nifšên tên bête bihînkirin:

1. Rêk û pêkbûna Hacî Ibrahîm û xurtbûna wîna bû, yê ku wî ligel çend Dukandaran û Destkaran de Šîraz date bidagîrkirin û wî ew çend Mehan beramber bi hemû Ešîrên Šervan ve date biparastin.
2. Qehremanîya pirî berz û balayî Lutif Elî Xan bû, yê ku wî ligel Carsed yanjî Pêncsed Kesekî de xwe bi ser Orduweke Sî hezar Kesî ve date bidadan.
3. Dilxurtîya Aga Mohemed Xan bû, yê ku wî di dema hemû Kesekî dabû bibazdan, wî Baregeha xwe neda bicîhištin û parastina aramiyê date bikirin. Mîna her car jî di rêya Bangdanê de wî dost û dujmin pê dane bigihandin, ku wî di cihê xwe de xwe daye bigirtin û ne pešokî û nejî šikenandinê pê dane bikêrkirin.

**********************************

Lutif Elî Xan tanî Kermanê nehate birawestandin. Wî li wêderê de dest bi bikomkirina leşker ve date bikirin. Aga Mohemed Xan jî bi xwe ve ruwê xwe ber bi Şîrazê ve date bivekirin û wî leşkerek[260] jî ji bona ser Lutif Elî Xan date binardin. Ew çend Kesê, yên ku ew li dor berên Lutif Elî Xan de hatibûn bikomkirin, gava ku wan ev xebera hanê dane bibihîstin, ji hev hatin bibelawelakirin. Li ser vê de Şahzade di sala 1207 k. de ji bona Xuresanê çû; çunke, Ev Welataya ji mirina Nadir Şah de tanî wê Rojê de bi destên Hinan ji Serokên Serbixwe ve mabû. Yekek ji van Serokan Mîr Husên Xan bû, yê ku ew Serdarê Dever û bajarê Tuwîbos bû. Wî Şahzade date biparastin û wî dused Suwarek jê re date bilidarxistin û şahzade ligel vê hêzê û hin ji Peyên xweyî dilsoz de, yên ku ew hîç jê cihê nebûn, ruwê xwe ber bi Yezd ve dane bivekirin. Ostandarê vî Şahrî leşkerek ji bona rêlibergirtina wî date binardin. Lêbelê Şahzade bi bêdudilî ve xwe bi ser wî Leşkerî ve date bidan û wî ew date bitefir û bitunakirin. Li dawî vê biserketina bi saya leşkerê xweyî biçuk ve wî ruwê xwe ji bona Gundê Ebrekoh date bivedan, yê ku li ser sînorê Farisê de bû. Vî Gundî serê xwe jê re date tewandin. Li wêderê de wî xeber ji bona Hevalbend û Dostên xwe date binardin, ku ew ser li nû de ji bona gorepana xebatê hatîye bivegerandin.. Bi rastî jî bi rengekî veşartî ve hêjî hin Hevalbendên wî mabûn. Li dawîya ku biserkevtina wî di wan navan de date dengîn, zor Kes bi eşkere ve Hevalbendîtîya xwe jê re date bidazanîn. Bi vî rengî ve ewende pê neçû, ku Jimara Leşkerê wî bi hezar û Pêncsed Kesî ve hate gihaştin. Wî ligel vanan de di sala 1208 k. de li Dar Îcurd de date dorlêpêçandin. Her çend jî ev bajarê xweşikî hanê mîna caran gewre û qerebalix nemabû, lêbelê jî hêştajî wî giringbûna xwe dabû biparastin û Serjimara wî bi Deh Panzdeh hezar Kesekî ve dihate biderkevtin. Jiber giringbûna cihê wî Lutif Elî Xan hewilî date bikirin, ku ew wî bide bizeftkirin. Lebelê gava ku di wê navê de xebera peydabûna wî ji nû ve hate bibelavkirin, Leşkerekî Farisî qurs li Teharanê de ji bona ser wî hate binardin. Li layekîtir jî de Hacî Ibrahîm bi Hêzeke Peyade ve ligel Birayê xweyî Biçuk de ji bona xurtkirina Liberxwedanên Darbicurd date birêkirin. Nêzîkbûna vî leşkerê hanê Şahzade date bineçarkirin, ku ew ji bajêr bête bidûrkevtin. Wî date bixebatkirin, ku ew xwe di sextbûna

[260]Komandarê hêza Suwarî vî Leşkerî Welî Mohemed Xan bû. Komandarê hêza Peyadeyî wî jî Eb-Dul-Rehîm Xan Birayê Hacî Ibrahîm bû.

gundê Ronîz de bide bigirtin. Belam. Li paš šerê çend rojan de ew neçar bû, ku ew bi hêrîšeke sêr ve bête birabûn, da ku belkî Bext jê re bête biçurusandin. Lêbelê di encamê pirbûna dujmin de û biserkevtina wî ew neçar bû, ku ew careke din ji bona layê Serdarê Tobos bête biçûyîn. Vî Serdarê hanê dîsan jî bi ruxwešî ve lê pêšewazî date bikirin. Belam di dawî de ji tirsa cihê xwe wî jê re date bitemînikirin, ku ew ji bona Qendehar bête çbiûyîn û ew li wêderê de daxwaza yarmetîyê ji Teymur Šahê Serdarê Efganê bide bikirin; jiber ku ew bes û bi tenha xwe ve dikare wî ji bona ser Textê Bav û Kalên wî bide bixistin. Lutif Elî Xan guh bi amojgariya wî ve pê date bidan û wî ruwê xwe ber bi Seraya Padšahê Afganî ve date bivekirin. Lêbelê li paš çûna çend qonaxan de wî date bibihîstin, ku Temur Šah hate bimirin. Di vê zîneta hanê de wî date bibiryarkirin, ku ew li Îranê de bête mayîn.

Di vê dema ku ew di mana xwe de hêjî dudilî bû, nameyek ji Du Serokên Nermanšîr (herema Rojhilatî Kermanê), ku yek ji wan Mehmud Xan û yê din Cîhangîr bû, bi destê Lutif Elî Xan ve hate bigihaštin. Wan têde jê re dabûn bitemînîkirin, ku ew welatê xwe nede bicîhištin. Wan jê re dane bigirawkirin, Heger ew bête bivegerandin, her yarmetî û karekî pêwist dê ew jê re bidin bipêškeškirin.

Nivîsvanekî Îranî li ser rastiyê bû, gava ku wî dayite bigotin: "Çuruskeke kêm di dilê Šervanekî de agirê hêvîyekê dide bipeydakirin". Šahzade li ser wan sozan de destbicî hate helsandin û wî ruwê xwe ber bi Nermanšir ve date bivekirin.

Di vê bivegerandinê de çend Sed Serbazan xwe li jêr Beyaxa wî de datin bikomkirin. Hêvîya wî hate bixurtkirin û wî biryara girtina Kermane date bikirin. Wî xwe bi lez û bez ve nêzîk Kermanê date bikirin. Wî Mamê xweyî aza, yê ku ew bi navê Eb-Dulah Xan bû û yê ku wî di hemû šerên Lutif Elî Xan de nav dabû biwergirtin, ligel nivê hêza xwe de date bipêšvexistin, tanî ku ew hêrîšekê ji derveyî bajêr bi ser dujmin ve bide bikirin. Wî hêza xweyî mayî ji bona hilanî ligel xwe de date bihištin. Gava ku wî dît, dujmin hemû hêz û hinera xwe ji bona ser Eb-Dulah Xan dayite bigirêdan, wî xwe ligel hêza xwe de bi ser kelehê ve li layekîtir de date bidadan. Bi vî rengî ve wî Komandarê bajêr date bišaškirin û li pêš ku ew bi vê šašbûna hanê bête biliberkevtin, hêza Lutif Elî Xan bi dîwarên kelehê ve hatin bihilkišandin. Bi vî rengî ve wî Parastvanên bajêr dane bitawîkirin. Belam dîsan jî wan zor liberxwedanê dane bikirin. Ligelvêjî de ewende pêneçû, ku hemû cihên wan ji destên wan hatin bisitendin û ew hatin bineçarkirin, ku ew xwe ji bona nava Burcên kelehê

bidin avêtin. Li wir jî de wan xwe nedan bigirtin û zû wan ew der jî dane bicîhiştin.Komandarên keleha Kermanê her çilo bû, ew hatin biderçûn[261]. Belam piranîya hêza wî hate kuštin û hemû bargiranî û malên wan bi destên Šahzadeyê Biserkevtî ve hate bikevtin.

Lutif Elî Xan li dawîya vê kamweriya hanê de zîneta serdarîyê ji xwe re date biwergirtin. Wî ji bona yadgarîya vê kamwerîya xweyî dawî bi navê xwe Pûl dane bilêdan.

Mêjûvanên vê pêlê dane bigotin: "Bextê vî Šahzadeyê hanê mîna birûskekê zor dihate biçurusandin, ya ku wê xwe di dema kujandina xwe de didate bidîtin".

Gava ku Aga Mohemed Xan di sala 1210 k. de xebera bizeftkirina Kermanê date bibihîstin, wî bi hemû hêzên xwe ve ruwê xwe ji bona nava wan navan date bivekirin. Lutif Elî Xan jiber zorbûna leškerê dujminê xwe di xwe de neda biderxistin. Çunke, yekem leškerê wî di rêya çend biserkevtinan de hunerbazî û mêrxasî ji xwe re dabû biwergirtin, duwem jî ew bi šan û qehremanîya xwe ve pištsitûr bû. Belam li dawîya mehekê ji dorlêpêçanê û tengavkirineke zor tûšbûn de hinekan li hêzên Liberxwedanên wîna de bêdilîya xwe dane biderxistin. Hinekan Ji Serbazên Peyade karmendîya liberxwedana çend Buracn ji niškê ve dane bicîhištin û wan ew Burcên hanê ji bona dujmin dane bihištin. Li pêš bihîstina Lutif Elî Xan de ji bona vê bêbextîya hanê du sê hezar kesek ji orduwa Aga Mohemed Xan ji bona nava wan Burcan hatin bikevtin.

Gava Lutif Elî Xan evaya date bibihîstin, destbicî wî xwe ji bona ser wan Burcan date bidadan. Li dawîya šerekî germ û sext de wî Dujmin date biderkirin. Evaya jî bi xwe jî ve biserkevtina wîyî dawî bû. Yekekî ji Serleškerên wîyî zor bawermend ligel wî de date bibêbextîkirin. Vî Serleškerê Bêbext li ber keleha hundur de dida bidan û li layekîtir jî de wî hevbešîya liberxwedana hin Burcên keleha derve jî dida bikirin. Vî Efserê Bêbext dergehê beramberî Dujmin date bivekirin û Aga Mohemed Xan bi deh duwanzdeh hezar Kes ve ji bona nava bajêr hate bikevtin û wî hêza xweyî mayî jî ji bona yarmetiya xwe date bilidarxistin.

Gava ku Lutif Elî Xan li vê Bêbextîya duwem de hate biagehdarkirin, wî bi mêrxasîyeke pirî berz ve ji bona ser Dujmin date bidadan, belam ev serbidadana hanê bi sûd nebû. Kar li kar de tirazû bû;

---

[261]Ev Herdu Komandarên Mohemed Husên Xan Yek jê Qerekozlu bû û yên din Eb-Dul-Rehman Xanê Birayê Hacî Ibrahîm bû.

çunke, Dujmin pirî pirbûn. Di encam de gava ku Lutif Elî Xan dît, ku sipahên wîyî herî aza û bi kêr ve hatine kuštin, wî bi neçarî ve xwe ber bi paš ve date vekišandin.

Mebesta yekaneyî Aga Mohemed Xan nehiština derçûna Šahzade bû. Wî tevaya dor û berên bajarê Kermanê date bigirtin. Wî li ber her dergehekî kelehê de Desteyekê zor xurt date bidanîn. Lutif Elî Xan ligel vê jî de, tevî ku li hemû layekî jî de dor lê hatibû girtn, Sê Demjimaran wî xwe di nava bajêr de date bigirtin. Gava ku šev bi ser wî ve hat, ew ji cihê xweyî vešartî hate derketin û wî bi alîkarîya pereke textî tenik ve, ya ku ew li paš bi karanîna wê ve ji bal Dujmin de hatibû avêtin, hate derçûn. Belam divabû ku ew xêza Dujminî derveyî bajêr jî bide dirandin. Šahzade bi mêrxasîyeke bêhempayî û bêhêvî ve hêrîšî ser wê xêza Dujmin date bikirin. Wî ligel Sî Kesî de ev Xêza derve datin çirandin û ew hatin derçûn û wan xwe bi saxî ve ji bona devera Nermanšîr datin bigihandin.

Li dawîya girtina Kermanê de Aga muhemed Tudeyê bajêr hemû kuštin. Wî ji bil Mendal û Jinan pê ve Kesekî din têde neda hištin. Wî ew Jinên hanê jî ji bona Supah dane bisipartin. Sê Roj û Ševan sipahên wiyî hov û dir di nava bajêr de xerîkî kuštîn, talanî û pîsîtîyê bûn. Mebesta wî jî li vê reftara hanê de ev bû, da ku hîç bajarekî din wê mêrxasîyê di xwe de nede bidîtin, ku ew yarmetîya Lutif Elî Xan bide bikirin.

Lutif Elî Xan di pêšî de ji bal Ostandarê Nermanšîr de bi bašî ve hate bipêšwazîkirin. Belam ewende pê neçû, ku rojekê Ostandar ji bal Birayê xwe ve, yê ku ew ligel Lutif Elî Xan de ji bona Kermanê hatibû biçûyîn, hate bibangkirin. Wî Birayê xwe têde date bigihandin, ku ev biparastin û pêšwazîya Lutif ElÎ Xan jê re pir xerab tête bidîtin û ew dê tûšî bêntengîya Aga Mohemed Xan bête bikirin. Evîndarîya wîna ji bona Birayê wî û tirsa wî ji roja paš biserkevtina Aga Mohemed Xan zora wî date bibirin, ku wî ew soz û peymandanên hanê tevde ji bîra xwe dane bibirin. Wî date bibiryarkirin, ku ew Šahzade bide bigirtin û ew ji bona girawkirin û ayinda jîna xwe wî ji bona Aga Mohemed Xan bide biberdestkirin.

Hevalên Lutif Elî Xan li pêš rûdana vê Bêbextîya hanê de pê hatin bigihaštin. Wan xeber ji bona Šahzade datin binardin, da ku xwe bide birizgarkirin. Belam wî bi amojgarîya wan ve guh lê neda bigirtin û wî pê neda bibawerkirin. Hêjî bêtir bi windabûna Hevalên wî jî ve, yên ku ew di hemû demjimarên felaketê de jê nehatibûn bicêhêbûn, disan jî ew tamara xewa bêagehdarîya xwe nehate bišiyarkirin.

Belam zorî pê neçû, tanî ku wî Mirovên pir bi çek û xwe giradayî ve li dora xwe datin bidîtin. Wêçaxê wî date bizanîn, ku belê Hevalên wî rastî jê re dabûn bigotin. Destbicî wî destên xwe ji bona Šûrê xwe date biavêtin û wî xwe bi ser wan Peyan ve date bidadan, yên ku wan dixwestin, ku ew wî bidin bigirtin. Li dawîya šerkî berzî giran de Šahzade xwe bi Hespê[262] xwe ve date bigihandin û ew suwarê wî bû. Di wê navê de Yekekî ji Hêrîšvanan šurek li Qacê hespê wî date bidan. Šahzade ligel hespê xwe de hate bikevtin. Ser li nû de ew hate bihelsandin û šerekî berzî giran date bidestpêkirin. Di encam de Šahzade li ser mil û qolê xwe de du birînên zor giran dane bixwarin û ew hate bikevtin. Bi wê zîneta hanê ve wan ew ji bona nik Aga Mohemed Xan dane bibirin.

Aga Mohemed Xan di pêšî de bi destên xwe çavên wî dane bihilkirin û li paš de ew ji bona Tehranê date binardin. Li wêderê jî de bi pîsîtîyeke pir zor û hov ve[263] wî fermana linavbirina wî Šahzadeyî di sala 1794 z. de date bidan, yê ku wî di wê zîneta Dîlîtîyê, bikevtinê û dûrandinê jî de disan Dujminê xweyî bi hêz ve dida lerizandin[264].

Lutif Elî Xan li pêš payînbûna temenekî Bîst û Pênç Salî de û li dawîya jîneke pirî berzî bilind de hate bilinavçun. Sêr Con Malkolm dibêje: "Di nava jiyana vî Šahzadeyê hanê de hin alîyên šayanên dilovanî

---

[262]Ev Hespaya bi navê Korrond dihate binavkirin. Ew ji tuxmê Hespên Erebî resnî Ereb bû, lêbelê ew li Îrane de hatibû bizayîn. Ew pir ciwan û çeleng bû û hêza wî šayanî sêrbûnê bû. Lez û beza wî ji xelkê re bi çîrok û çivanok ve bibû. Zor caran wî Šhzade date birizgarkirin. Lutif Elî Xan pir jê dida bihejkirin.

[263]Sêr Con Malkolm dibêje: ga ku Lutif Elî Xan ji bona layê Aga Mohemed Xan dane bibirin, wî pir bi hovîti û pîsîtî ve reftar derbarê wi de date bikirin. Mirov nikare wî reftara hanêyî dir û hov bide binasîn. Her Yekî ku wê Nivîstkê ji xwe re didin xwendin, beramber bi wan hovîtî û dirbûna Aga Mohemed Xan ve dilê wî tête rabûn; jiber ku ew dijî rûmeta Mirovin.

[264]Aga Mohemed Xan derbarê bi hemû Malbata Zend ve bi gištî ve û bi taybetî ji bona vî Šahzadeyîê hanê ve kîneke wîyî piri mezin hebû. Tevlivêjî de wî hêjabûna bašbûnên wî jî didan bikirin. Li pêš girtina Kerman de bi demeke kurt ve xeber pê hate bigihandin, ku Xuwarzê wî û Šûngirê cihê wî Fetih Elî Xan di Yekševê de çend Kur jê rê bûn. Li ser vê de wî date bigotin: "Xwedo! Tu Yekekî ji van Kuran mîna Lutif Elî Xan bide bikirin".

û mehrebanîyê têtin bidîtin û hin alîyên din jî šayanên berz û balabûnê ne. Heger Mero ji xwe re temašeyî kar û tevgerên wî bide bikirin, ji bil rûçikên wîyî Supahî pê ve tištekî din Merov ji xwe re nade bidîtin. Šahzade di nava Welatekî fireh de û di Pêleke weha de ji bona Dunyayê hatibû, ku sertewandîna bi carekê ve ji bona Serdar rewešteke gištî bû. Dibe, ku Nav û nîšanên vî Šahzadeyê hanê mîna Nav û Nîšanên Cengîz û Teymurleng bêtin bidîtin. Belam li gora zînet û mercên dema wî de, ya ku ew têde ji bona ser Tex hate bidîtin, ji bil Qencî û bašîyên Xweyî û karîn û Konebûna Xweyî pê ve nîšaneke tir biserkevtî nebû. Agehdarîya wîna ji bona serpereštiyê, biliberkevtinê û durbînê nebû. Jiber dilbijandinên wîyî bilind ve Jirbûn û têgihiština wîna kêra wan pir di kar û barên wî de kêm bûn. Bi bê sînor ve ew bipayebûn bû. Hêjîbêtir di dema hilkišandina wî de ji bona ser Text wî li xwe de neda bidanîn, ku ew ligel wanên Xwedanên karîn û desthilatîyê di Welêt de bête bibilihevhatin. Ew pir bînteng bû û ew zor serhišk bû. Heger wî berê xwe ji bona layandîna welatekî bida bivekirin, wî pir bi sertî ve hêza xwe dida bikaranîn û biserkevtin li her layekî de pêrgî wî dihat. Wî tundbûn û nobûn bi rengekî wetov ve dida bikaranîn, ku bes û bi tenha ve Serdarekî cigîrbûyî bi hêz û hiner ve dikaribû weha bida bikirin. Belam ev tundbûn û nobûn ji bona wî nedibûn. Wî divabû ew neda bikirin. Wan jê re pir dujmin dane bipeydabikirin. Belkî li ser wî jî de dihate bidîtin, ku ew pir qencîyê bide bikirin û ew li kêmanîyên dujmin û beramberên xwe bête bibuhurandin, da ku ew pir Kes û Dostan ji xwe re bide bipeydakirin. Bi servajî vê jî ve wî bi tundbûn û nobûna karê xwe ve pir Dujmin ji nava Mirovên Gewreyî xurt dane bipeydakirin, yên ku ew jî mîna wî her û her di beramberî rûdanan û veguhertinên demê de di cengê û šer de bûn.

Tevlivêjî de bi kêmanîyeke zor ve tête bidîtin; jiber nîšan û rûçikên bilindî vî Šahzadeyê dawîyî Xanedana Kerîm Xan ku ew ji bal Mêjûvanên vê Pêlê bête bijibîrkirin".

Serdarên Xanedana Zend nêzîka nîv sedsalekî bi ser bešekî zorî Îranê ve datin biserdarîkirin. Belam li dawîya mirina Sazkirvanê vê Xanedana hanê de Serdarî û desthilatîya wê hîç bi carekê ve nehate bidamezirandin. Evejî di pêšî jî de jiber pevçûnên di nava wê Xanedanên de nehate bikirin û duwem jî jiber hoyê jîrbûn û têgihiština Aga Mohemed Xanê Dujminê wan nehate bikirin. Vî Serdarê hanê ji roja ku wî ev Šahzadeyê hanê ji Šîrazê date biderkirin, ji wê rojê û pêve wî her û her dida bixebatkirin, ku ew wî bide binabûdkirin. Di Encam de ew hate biserkevtin. Bi serkevtina wîna bêtir ji hêza wîyî çekdarî ve ew bi saya

pêgîrî û azaya wî ve hate bicîhatin. Wî bi karê xwe ve dida bizanîn, ku ew ji vî Destî yanjî her Yekekî din, yên ku wan belkî çavên xwe ji bona ser Text bida biberdan, hemû[265] çi bi kuština wan ve yanjî bi çavderkirina wan ve ew didan bilinavbirin. Nek bes tenê wî Ešîra Zend belkî hemû Eširên din, yên ku wan bi rastî ve yarmetîya Xanedana Zend dabûn bikirin, bi carekê ve ji welatê Farisê dane bibarkirin û wî ew ji bona welatên dûr dane binardin. Wî li cîgehên wan de Ešîrên Farisî Resen dane bicî û biwarkirin[266].

Bešê zorî van sitemkariyan û kuština giští ew ji bal Hacî îbrahîmê Bêbext ve hatin bikirin. Di vî warî de nivîsta Measir El Sultaniye- Šopên Sultanî- ango mêjûwa Qacaran dide bigotin: ku Hacî Ibrahîm ev karên bêbextî dane bikirin, bi hêvîya ku ew Biserêxwe ve li Šîrazê de bête bihištin. Belam ji tirsa Aga Mohemed Xan newêrîbû, ku ew vê bide bieškerekirin. Bi diyarîya dilsozî ve wî keleha Šîrazê ji bona Aga Mohemed Xan date biberdestkirin. Aga Mihemed Xan ew bi Ostandarê Farisê ve date bidanîn, belam wî hîç li bêbextî û fisitîya wîna de nedida bigûmankirin. Ligel vê jî de wî jiber devavêtina xelkê de xwest, ku ew di kêsekê de li Hacî Ibrahîm bête bizîvirandin.

Hacî Ibrahîm derbarê Mayînên Zendî de zor sitemkarî dane bikirin. Wî çerg û Hinavên Lawên Zendîyan bi sojinan ve dida biderkirin. Xizim û Mirovên wî jî di sitemkarî û kuština zendiyan de bi hev re didan bibêrîkirin. Di encam de Dadwerê bi carekê ve tol jê date bisitendin. Li dawîya mirina Aga Mohemed Xan de bi demeke kêm ve Šah Fetih Elî Xan fermana biderkirina çavên Hacî Ibrahîm, Kur û Pîrekên wî jî date biderkirin. Herwehajî pêrejî wî fermana nabûdkirina Birayên wî û hemû Mirovên wî jî date biderkirin. Wî Hacî Ibrahîm ligel Mal û Mendalên wî

[265] Sêr Malkolm dibêje:" weku ez dizanim, Bes û bi tenha ve di vê navê de Eb-Dulah Xanê Mamê Lutif Elî Xan hate birizgarkirin; çunke, wî Xweška Hacî Elî Qelî Xanê Kezeronî hênabû. Di rêya vî Serokê hanê de lêhate bibuhurandin. Ev Hacî Elî Qelî Xan zor qedir û rumeta wî li bal Aga Mohemed Xan de dihat bidîtin.

[266] Ev Navdana li ser serdarîya Zend piranîya wê ji mêjûwa bi nav û banga Mêcer General Sêr Malkolm ve hatîye biwergirtin. Ev Mêjûvanê bi nav û bang ve li dawîya nabûdkirina serdarîya Zend bi çend Salekî bi xwe ve ji bona Šîrazê hatîye çûyîn. Ew ligel Hacî Ibrahîm û hin Kesên dinê wê demê de hatîye biaxivtin.

Zor sûd jî min ji vê Nivista wîyî pir bi nerx ve dayite biwergirtin.

jî ji bona Qezwînê date bibiveguhestin û wî ew li wêderê de dane bihištin, tanî ku ew hatin bilinavçûn.

Di pêla serdarîya Fetih Elî Šah de Mohemed Xanê Kurê Zekî Xan daxwaza Serdarîyê date bikirin. Wî tanî Isfehanê jî date bigirtin. Lêbelê ew pê nehate biparastin û wî ji bona layê serdarîya Osmanî date birakirin. Bicgeh li vê jî de tištekî din jî nedan birûdan. Xanedana Kerîm Xan ji bal Qacaran ve bi carekê ve hate binabûdkirin.

## Dîtineke Giştî derbarê Zînetên vê Dewleta hanê de

Dibêjin, ku mêjû xwe dide bivegerandin. Ev peyva hanê zor raste. piranîya serdarîyan bi bingehekî pir nuh ve têtin bipêkhatin û ew di zînet û mercên nealîkar de têtin bilinavçûn.

Heger ku em li serdarîya Teymur Celawîrî, Qere û Aq Qoyunlî, Sefewî, Efganî û Nadi de bidin bitemašekirin, dê emê bibînin, ku ew hemû bi cudabûneke kêm yanjî zor ve mîna hevin. Bidestpêkirina wan bi šan û rûmetê ve pir tête bidagirtin û dahatin û bikevtina wan jî pir bi bedbextîyê ve têtin bitijekirin. Hîç gûman têde niye, ku Sazvanên wan bi ser rûçik û nîšanên xweyî ve bext û qird jî ji wan re hogir û yar bûn. Di dema ku Nevîyên wan tanî radeyekî wetov ew ji wan rûçik û nîšanên hanêyî bilind ve yanjî ew ji hogirî û yarbûna bext û qird ve yek ji deh bêpišk û par bûn. serdarîya Zend jî bi xwe jî ew jî mîna nimûneyên xwe bi berbatîya wê rêzanê ve hate bikevtin.

Kerîm Xan bi nîšan û merdbûna xwe ve û bi yarmetîya bext ve li hîçbûnê de Serdarîyeke Gewre date bidamezirandin. Belam di nava Nevîyên wî de bi tenha ve Elî Murad Xan û Lutif Elî Xan karîna wanî bi serdarîkirinê ve hebû. Mirinê ji bona yê pêšî rê pê neda bidan. Ew di temenekî navînîyî ber bi jêr ve bi nexwešîya tisqa ve hate bilinavçûn. Belê karîna wî hebû, ku ew Îranê bi carekê ve ji hemberên xwe bide bipakkirin û ew payedariyê ji bona Serdariya xwe tanî demeke dirêj bide bigirawkirin.

Debera, em ji bona Lutif Elî Xan bêtin bivegerandin. Ev Serdarê hanê her mîna ku Genaral Malkolm dibêje, ku di wî de hemû nav û nîšanên Cengîz û Teymur dihatin bidîtin. Mêrxasî û merdayetîya wîna ji bal dujmninên wîyî xwînî de mîna Aga Mohemed Xan dihate bipêrûništin. Heyf û mexabin, ku ew tûšî Wezirekî pîs û bêbext bû.

Hacî Ibrahîm li layê Sêr Con Malkolm de zor date bixebatkirin, ku ew gerdena xwe bide bipakkirin. Belam bêbextî û pîsbûna wîna hîç cihê gûmanê têde niye. Kerîm Xan Bavê wî ber bi pêš ve date bixistin û wî qencîyên zor pê dane bikirin. Cafer Xanê Kurê wî nîšaneke zor gewre pê date bivekirin û welatê Farîs pê date bisipartin. Bi vî rengî ve li hîçbûnê de ew bi Peyakî serdarîya Zend bû. Belam ev Cewrikê Gur di encam de derbarê Xwedanê qencîyên xwe de tuxmê xweyî bed date

biderxistin, mîna ku Sadîyê Merevan dibêje: "Eqibeti Gurgzade Kerk šud" ango ew Xwedanê xwe dide bifewitandin.

Nivîsvanê mêjûwa Qacaran Eb-Dul-Rezaq Kurê Necif Qelî bi Xameyeke bêlayî û rast ve dibêje: "ku Hacî Ibrahîm ji mêj de tep û vîlik didan bigerandin. Hîc gûman têde niye, ku gava gurê biçûk tête bimezinkirin, berî her tištî ew Xwedîyê xwe dide xwarin". Heger Lutif Elî Xan li bînferehbûn û dûrbînîya Kerîm Xanê Bavpirê xwe de pišk û pareke wîyî bi carekê ve bihata bidîtin û heger jî wî dilê xelkên Širazê jî bi hîš û tevdir ve bi ser xwe ve bida birakišandin, dê wîna bida bikarîn, ku ew siza bêbextîya Hacî Ibrahîm li pêš rûdana wêna de bide bidan û xwe ji wê bêbextiyê bide birizgarkirin. Belam heyf ev ser encamê tarî ji bona vî šêrê ciwanmêr bi qedir bû. Divabû weha bibaya û wehajî bû.

Hovbûn û pîsîtiya Aga Muhemd Xan derbarê Lutif Elî Xan de cihê nefreta mêjûyê ye û ew nifira Nifšên tên bi ser de didin barandin. Ev Mezinê girgire awate xwazbû, ku di nava Malbata wî de Qehremanekî mîna Lutif Elî Xan bête bipeydakirin, ango weha wî didate biderxistin, ku ew meftûnê mêrxasî û merdayetîya wî bû. Belam gava Ku Lutiv Elî Xan destbestî û birîndar ji bona layê wî hate bihênanîn, ew mîna Gornepaš bû, wî xwe ji bona ser wî date biçengkirin. wî bi neynûkên pîsên xwe ve ew çavên wîyî ciwan dane biderkirin. Ew bi vê jî nehate birûništin û wî ligel wî jî de reftareke hovitîyî weha date bikirin, ku mîna Sêr Con Malkolm dibêje: "ku Mêjû di bîranîna vê hovitiyê hanê de šermezar dibe".

## ***Derîyê Çardehemîn***

## 14. Dewleta Mîrnešînîya Biraxweyî ji sala 1172-1300 k. de,

Di bergê yekem de me li ser vê Ešîra gewre de date biaxivtin. Lêbelê em li ser Kok û Serpereštîya wêyî kevnar de neçûn. Li gora Insiklopêdîya Musulmantîyê de li dawîya nema pêla Megolan de di Îranê de hin ji Ešîrên Kurd ruwên xwe ji Rojava ber bi Rojhilat ve ji bona welatê Kerman dane bivekirin. Renge, ku Di nava van Ešîrên hanê de ev Ešira Koç yanjî Kurd di šaxên welate Kermanê de ligel Ešîrên Biluç de hatin bicigîrbûn. (bergê 1, laperê 636).

Di vir de wer tête biderkevtin, ku Insiklopêdîya Musulmantîyê nizane, bê ka ev Ešîrên Kurd kenkî û çilo ew ji bona Kermanê hatine bibarkirin. Belkî Lêgerandinên Mêjûvanan vî alîyê hanê ji me re bidin bisaxkirin.

Mister Curzon-Korzon di Nivista xweyî bi nerx ve dibêjê:
"Li Sistanê de Ešîra Kurdgelî heye, ku ew ji Kurdên Kurdistanê ne û ew di zemanekî nenas de ji bona hêre hatine û wan di walatê Gor de Serdarîyek bi navê Melekê Kurd[267] ve dane bisazkirin. Vê serdarîya hanê ji sala 1245 tanî 1383 k.de ango 138 salan date bidirêjkirin. (Bege 1, Laperê 228).

[267]Vê peyva Padšahên Kurt,yên ku ew di mêjûwê de bi nav û bangin, tevlihevbûnek date bikirin. (M.E.).

Zimanê Ešîra Biraxweyî bi Kurdgelî ve bi nav û bang bû. Hîç dûr niye, ku ev Ešîra Sistanê jî Berek ji vê Ešîrê be. Bi xwe jî ve Sistan û Bilucistan jî yek li teništ yekin.

Insiklopêdî bêtir dide bidiyarkirin û ew dide bigotin: Çunke, ku Eširên Biraxweyî jiberê Dirawîdîyê Hindî nînin, divê ew ji Miletê Koç - Kurd bin, yên ku ew li dawîya layandina Megolan de ji bona Kerman û di paš jî de ji bona Mekran hatine çbiûyîn. Li dawî de Hinek ji Eširên Biluç û Afgan jî li gel wan de hatine bitêkelbûn û Biraxweyî Bilucistan ji wan hatine bipêkhatin. Ev têkelbûn û yekitîya hanê divê ew bere bere hatibe bibûyîn., mîna ku çilo wan jî hin ji Zimanê Dirawîdî jî ji xwe re dane bigirtin. Ešîrên Jorî Bilucê beramber bi van Biraxweyan ve xwe nedan biragirtin. Bere bere wan di Rojhilatê re jiber Biraxweyî ji bona Hindistanê dane bibazdan.

Weha diyare, ku gava Nadir Šah ji bona Hindistanê çû, Biraxweyî yarmetîya wî dane bikirin. Wî hinek ji erdên Kulhurayê Hindîyî zefkirî ji bona Biraxweyî date bipêškeškirin.

Eb-Dulah Xan[268] Gewreyê Ešîrên Biraxweyî ligel Muhebet Xanê Kurê xwe de ligel Bulucê Daracat date bišerkirin û erdên wan date bidagîrkirin.. Di dawîya navekê de ew ligel Ešîrên Kulher de bi šer ve hate bikevtin û ew têde hate bikuštin. Di wê demê de Muhebet Xan û Nasir Xanê Kûrê wî li layê Nadir Šah de bûn û dest li ser wan de bû. Di dawî de Muhebet Xan bi ber destên Ehmed Šahê Dorayiyî Serdarê Efganistanê hate bikevtin û ew di zindana wî de hate bimirin. Nasir Xan kar û barên serdarîya Biraxweyî mîna Serdarîyeke vebestî bi Efganistan ve ji bona nava destên xwe datin bixistin. Wî li Mekran û Keç de Serpereštîyeke xurtî û bi rêk û pêkî Biraxweyî ve date bidamezirandin. Ehmed Šah devera Šal û Mostang jî bi ser devera wî ve date bivekirin. Wî desthilatîya xwe bi ser Las Bîl-la û Keraçî jî ve date bipeydakirin. Hin cîgehên din ji wî li Hindistanê jî datin bidagîrkirin.

[268]Renge, ku ew Nevîyê Qenber Xan be. Ew di dema nema dewleta Sefewî de di Nîvê sedsalê Hivdehê Zayînê de Gewreyê Ešîra Biraxweyî bû. Wî Parastina xwe li ser Raceyekê ji Racên Hindistanê beramberî sipahê Afganî date biderxistin. Wer diyar dibe, ku wî hefsarê kar û baran di Melbendekê wî Mîrê Hindî de bi destên xwe ve dayite bixistin. Em tištekî din li ser pašroja vî Mirê Biraxweyî hanê de nizanin. (Ev ji Nista Deh hezar Mîl yanjî Hešt salan li Îranê de. Mêcer Pursi Molsort Syks-Sayks, London 1902.

desthilatîya wîna li Rojavayî bajarê Pambor jî de, ya ku ew Sed û Bîst Mîlan li Rojhilatî Bajrê Kerman de tête bikevtin, hate bicîkirin. (Deh hezar Mîl Ger li Îranê de, Sykes-Sayks, London 19o2).

Îšê herî gewreyî Nasir Xan rêkxistina Serpereštî û pêkanîna hêzên Biraxweyî bû. Ev Ešîra Kurdîyî hanê du bir bû. Yek ji wan Serwan bû û ya din Çahelewan bû. Wî Gewreyê Ešrîa Rayzanî bi Serokê Bira Yekev date bidanîn. Ji bona Bira duwem wî Gewreyê Ešîra Zehrî bi Serok ve date binîašnkirin. Wî ev biparvekirina hanê bi remaneke Supahî ve date bikirin. Her Birekê di tengayê de divabû, ku ew Leškerekî ji bona Nasir Xan bide šandin.

Gava ku Nasir Xan bi berzbûna hêz û hinera xwe ve hate bigihaštin, bêtir wî nema tu giringî bi Ehmed Šah ve date bidan û wî xwe nema bi Bestvanê wî ve date bizanîn. Li ser vê de Ehmed Šah di sala 1172 k. de lešker ji bona ser wî date birêkirin û wî ew li nêzîka Mostang de date šikenandin. Wî li Nasir Xan de li keleha Kelat de çil rojekî date bidorlêpêçankirin. Belam ew pê nehate bizeftkirin. Ew bi lihevhatînê ve hate bineçarkirin, bi mercekî ve ku Nasir Xan bi Bestvanîya wîna ve bête birûništin û ew ligel Leškerê xweyî Efganî hate bivegerandin.

Bi rastî jî Nasir Xan bi Serxweyî ve welatê xwe dida bigerandin. Bes û bi tenha ve wî di dema cengê de yarmetî ji bona Ehmed Šah dida bipêškeškirin. Wer bi vî rengî ve ew bi xwe û Leškerê xwe ve bi destikê serkevtinên Ehmed Šah ve hate bikirin. Mêrxasî û gernasîya Nasir Xan ligel bašbûna Serpereštî û Siyaseta wîna de zor berz, bala û giring bûn. Bi rastî jî ew ji herî gewretirîn Serdarên Biraxweyî bû.

Nasir Xan di sala 1210 K- 1795 z. de hate bimirin. Mehmud Xanê Kurê wî, yê ku ew hišta Mendal bû, ji bona cîgehê wî hate birûništin. Behram Xanê Kurê Muhebet Xan, yê ku wî hin caran jî di zemanê Nasir Xan jî de tevlihebûn didan bilidarxistin, serê xwe date bihildan. Belam hîç pênehate bikirin. Ligelvêjî de Mehmud Xan sermiyandarîya Mîrnešinîya wî pê nehate bikirin. Hin ji Muklên wî jî dest çûn. Keracî jî di nava wan de bû. Mehmud Xan jî di sala 1821 z. de hate bilinavçûyîn û Mehrebanê Kurê wî bi Mîr bû. Wî ji bavê xwe bêtir karîna xwe date biderxistin. Belam Ehmed Yar Xanê Kurê Behram Xan li ser de raser bû û di encam de li Kelatê de wî ew date bidarvekirin. Zemanê vî Mîrî jî bi bašî ve nehate rabuhurandin. Li ruwê Daud Mohemedê Gulzayî de hin Ešîra Cahelawanê Biraxweyî lê cihêbûn û devera Haranê û Dahîlê jî ji nava destên wî çûn. Li ruwê parastina Šah Šuca El-Melek de têkelîya wî ligel serdarîya Doranîyî Efganî de di sala 1250 k. de hate têkçûn. Li layekîtirî j

î de nebašbûna serpereštîya Daud Mohemed Serdar û di paš wî jî de Cîgerê wî Mohemed Husên û kurtbûna bidîtina wanan hišt, ku pêwendîyên wan ligel Ingilîzan de bêtin têkçûn. Ingilîzan Hêzeke Supahî ji bona ser Muhrab Xan dane birakišandin û wan Kelat dane bizeftkirin û Muhrab Xan jî di vî šerî de hate bikuštin. Hinek ji Mulkên Biraxweyî ji bona Serdarê Doranî hate bidan.

Šah Nuwaz Xanê Nevîyê Muhebet Xan bi Mîrê Biraxweyî ve hate bikirin. Li ser vêna de Kurê Çardeh Salîyê Muhrab Xan hewara xwe ji bona layê Ešrînên Nuširwanî date bibirin. Wan Ešîran ligel hinekan ji Ešîrên Serawan de hêrîsî ser Kelatê dane bikirin û wan ew date bigirtin. Di Encam de Šah Nuwaz ji ser Text hate bidaxistin û Kurê Muhrab Xan bi navê Nasir Xanê duwem ve bi Mîrîtî ve hate bidanîn.

Komandarê sipahê Ingilîzî hate biberdestkirin. Di dawîya navekê de ew di sala 1840 de ji bona welatê wî hate bivegerandin. Li paš Salekê de dewleta Ingilîz bi Mîrîtî ve bi Mîrnešînîya Nasir Xanê duwem date bikirin. Di sala 1843 z. de wî pêwendîyên xwe ligel Serdarnaîya Efganî de date birîn û wî bestîbûna xwe ligel serdarîya Hindê date bidazanîn. Ev bestîbûna hanê tanî vê roja me jî hêjî tête demandin. Nasir Xanê duwem di sala 1274 k.- 1857 z. de hate bimirin û Birayê wî Xwedad Xan šuna wî date bigirtin. Di sala 1893 wî dev ji serdarkirinê date biberdan. Šûna wî Mîr Mohemed Xan di Mîrnešînîyê de date bigirtin û tanî hêstajî ew Mîrnešînîya xwe dide gerandin. (Insiklopêdîa Musulmantîyê, bergê yekem

## *Bešê duwem*

# Mîrnešînîyên Kurd di pêla Musulmantîyê de

## *Bešê duwem*

## Mîrnešînîyên Kurd di pêla Musulmantîyê de[269]

Mirov li xwendekarîya zîneta pêšîyî Miletê Kurd de baš tête biliberkevtin, ku ev Miletê hanê di pêšî û dawî de Serîxweyî nava xwe bû. Ev mafeyê hanê jî mafeyê wîyî serûštî bû. Wî ew tanî dawîya sedsalê Sêzdehemînî Koçî bi cudabûnên kêm yanjî zor ve dabû biparastin. Di sedsalên Navîn de hin caran jî zînetan yarmetî pêdane bidan, ku ew di Perçeyekî welatê xwe de Serxwebûna xweyî Derve jî bi destên xwe ve bide bigirtin.Belam vê zîneta hanê zor neda demandin. Mercên wîyî Rewayî û Civakî ligel hin hoyên din de ew Serxwebûna wî ji dest dane birin û bes û bi tenha ve Serxwebûna xweyî Hundurû bi destên wî ve hatîye bihištin. Ew ji bona parastina vî mafeyê hanê her û her ligel wî Miletê li ser zal de di šer û hera de bû.

Heyf ku em derbarê zemanê zor kevin de beramber bi vê serxwebûna hundurû ve tištekî wetov nizanin. Bes û bi tenha ve di bûyîna hin rûdanan de derbarê vê Serxwebûna hanê de em ji xwe re remanekê didin bipeydakirin. Ji bona nimûne di šerê Qeralê Ašûrî ligel Lollo, Gotî û Nayrî de, li šerê Ferhadê Çaremî Serdarê Eškanî de ligel Madê Biçûk de ... ûhd, di pêla Duwayî Islamê jî de di šer û pevçûnên Yek li duwayî Yek de em Kurdistanê û zîneta wê dibînin, ku Miletê Kurd ji bona li destneda Serxwebûna xwe de her û her xwe dayite bikuštin û bigorîkirin.

[269]Ew Sî û Pênc Mîrnešînin yanjî mîna wanin. Ew di Heft koman de têtin bidîtin. (M. E.).

Belam jiber ku ev rûdanên mêjûyî hanê bi başî ve nehatine binivîsandin, serûştî ye, ku em derbarê wan Mîrneşinîyan û li ser dirêjî û hoyên şerên wan de tiştekî wer nizanin.

Xwedîyê Şerefname derbarê bi zînetên va Mîrnişînîyan ve tiştek daye binivîsandin. Belam ev jî tanî dawîya sedsalê Hewftemî Koçî[270] dide bigirtin. Beşê zorî van agehdarîyan ji çîrok û goyan hatine biderxistin û ewende bawerî bi wan ve nayête bikirin. Ligel vê jî de tanî ku agehdarîyên baştir û bi bingehtir ve bi destên me ve neyêtin bikevtin, em neçarin, ku em bi agehdarîyê Şerefname û hin ji yên Zanistvanên mêjûwê pê bêtin birûniştin.

Mêjûvan û Rojhilatnasê mezin Pirofêsor Minoriskî van Mîrneşînîyan baş dide biparvekirin û me jî wer baş date bizanîn, ku em jî li ser rêya wî de herin û kurtîyekê li ser mêjwûa wan de bidin binivîsandin. Belam derbarê Mîrneşînîyên Badînan, Soran û Baban de me xwestîye, ku em bêtir li ser wan de bêtin birawestandin.

---

[270]Weha di Kokê de hatîye binivîsandin. Rastîya wê sedsalê heftdehemînî zayînê û yanjî sedsalê Yazdehemînî Koçî ye. (M. E.).

# A. Mîrnešînîyên di navbera Cezîrê û Dêrsim de

## 1. Mîrnešînîya Cezîrê

Li gora Šerefnama divê Mîrên vê Mîrnešînîyê ji Xanedana Emewî bin û ew ji Binemala Hêjayê Xalid Kurê Welîdin[271].Belam çunke, Mêjûwa Musulamntîyê derbarê bibûna Hêjayê Xalid û yanjî Sulêmanê Kurê wî li Kurdistanê de tištekî nade bigotin, hêjî bêtir bi xwe jî ve diyare, ku Binemala vî Qehremanê Ereb û Musulamntîyê hatîye binemankirin[272]. Ku weha bû, bawerkirin bi vê vebêja hanê tête bidujwarkirin[273].

---

[271]Binivîsandineke wisa di Šerefname de nayête bidîtin. (M. E.).

[272]Ji xwe re li ser bedbextîkirin û wêrankirina vî Mirovî li Kurdistanê de li Dîroka Kurdistanê ji bal Ekremê Cemîl Paša, Bêrud sala 1973 de, ji r. 122-131 bide bitemašekirin. Cuma.

[273]Li gora Go û Vebêjên dorhêla Sêrtê û Cezîrê de divê Goristana Hêjayê Xalid li nêzîka Sertê de bête bikevtin. Di gava ku mêjûwa rast dibêje, Hêjayê Xalid li bajarê Humisê hatîye bimirin û ew li wêderê jî de hatîye bivešartin.

Belam weha ye, ku ev vebêja hanê ji hejkirina Miletê Kurd ji azayî û qehremanîya Hêjayê Xalid hatîye bikirin; Cunke, Mejû Binemala Hejayê Xalid bi nemanî ve dide bizanîn. Kurên wîyî bi nav û bang ve Sulêman, Eb-Dul-Rehman û Muhacir bûn. Pêšîyê wan li Berê Hêjayê Elî de bû û ew di šerê Sefîn de linavçû. duwemînê wan Ostandarê Humisê bû. Bi fêla Maawiye ve ew ji bal Bijiškekî Cuhu ve hate bijarkirin. (Mêjûwa Xalid Kurê Welîd, Ebu Zeydê Šiblî, r. 208).

Xwedîyê Nivîsta Esed El-Gabe jî, bergê 2, r. 104 dibêje, ku Zarokên Hêjayê Xalid di maweyekî nêzîk de Çil ji wan bi Mirina Reš ve li bajarê Šamê de hatin bilinavçûn. Jiber bê Dondîtîyê Mulkên wîyî di bajêr de ji bona Eyub Kurê Selme Kurê Eb-Dul-Lah hate bidan. Xwedîyê Nista Nihayet El-Erb jî pišta vê gotina hanê dide bikirin û ew dibêje: "Kesek ji wan ne di Rojhilat û ne jî di Rojava de ma. Her Yekekî ku ew xwe bi wan ve dide bigihandin, ew di vê bigihandina xwe de rast niye ûh., her yekekî ku ew vê jî dibêje, ew dide biderewkirin". (B. 2, r. 356).

Zor dibe, ku Ešîrên Cezîrê ji Nevîyên Kaldî-Xaldîyê Mêjûyî bin, yên ku wan demeke zor bi ser Orarto ve dabûn biserdarîkirin û di layandina Miletê Kemmerî serdarîya wan ji nava destên wan hate derçûn û ew ji hev hatin belavbûn. Bi xwe jî ve Hinek ji Rojhilatnasan Kaldî û Xaldî mîna navên hevbeš didin binivîsandin. Ev vebêja Xaldî ji vê di wan navan de hatiye belavbûn.

Kurtîya Šerefname Sulêmanê Kurê Hêjayê Xalid bi Bavpîrê Mîrên Cezîrê ve dide bidanîn. Ew dibêjê, ku di pêla Emewî de ev Mîrnešînîya hanê hatîye bisazkirin. Weha diyare, ku Dr. Frech-Firêc ev Goya hanê bi bingeh ve ji xwe re dayite bidanîn, bêyi ku ew pêwistîyê bi hûrbûnên kanîyên din ve bide bikirin. Wî bîr û baweriyên zor šaš û bê bingeh dane biderxistin. Weha Goya Šerefname û bîr û bawerîya Dr. Frech-Firêc di Kurdeler , r. 143 de beramber li tevaya Bîr û bawerîya Zanistvanên mêjûwê de ji hêjabûna xwe hatîye bikevtin.

Bi kurtî ve Šerefname li ser goya xwe de tête biçûyîn û ew dibêje, ku li dawîya Sulêmanê Kurê Xalid Kurên wî Mîr Ezîz, Mîr Hacî Bedir û Mîr Ebdal welatê xwe di nava xwe de dane biparvekirin. Ji vê jî de Xanedanên Ezîzî, Bedrî û Ebdalî hatîne bipeydakirin.

Xanedana Ezîzî-Ezîzîye Cezîre û dorhêla wêna li paš nemana Silcoqîyan bi destên xwe ve dane bixistin. Belam derbarê pêla Mîr Ezîz, Kurên wî û Nevîyên wî tanî Pišta Çarem de tu agehdarîyên meyî wetov nînin. Mîrnešînîya Mîr Eze El-Dîn Kurê Bedir El-Dîn Kurê Îsa Kurê Mecid El-Dîn Kurê Mîr Eb-dul-Ezîz di pêla Teymorleng de hatîye bidîtin. Ew li Mêrdînê de ji bona layê Teymor çûye, da ku ew welatê xwe ji šerê wî bide biparastin. Belam li dawî de wî serê xwe beramber bi Kurê Teym ve daye bihildan. welatê wî ji bal Teymorîyan hate bidagîrkirin û wi xwe bi hezar bela ve date birizgarkirin û wî xwe date bivešartin.

Li dawîya Teymoriya de Kurên Mîr Ezîz ber bi pêš ve hatin bikevtin û wan Mîrnešinîya xwe dane bivejandin û wê tanî Navînîya sedsalê nozdehemînî Zayînê de date bidirêjkirin. Ew li dawîya Šûreša Bedir Xan Beg de di sala 1847 z. de hate bilinavçûn[274]

Bešê Malbata Bedrî li hêla Gorgîl de hate bidamezirandin û ew tanî zemanê Šerefxanê Bedlîsê hatibû bimayîn û ew li sala 1005 k. de di destê Mîr Ehmedê Kurê Mîr Mohemed de bû. Agehdariyên diwayî vêna diyar nînin.

[274]Ew bi Bedirxan Paša ve bi nav û nange. Ew Bavpîrê Malbata Berdirxanîyane. Ew Malbata Kurdîyî Zanevanî bi nav û bange, ya ku ew li bajarê Šam Kurdistana Turkîyê de dijî. (M. E.).

Bešê Malbata Ebdalî jî di hêla Fênik de hate bidamezirandin û wê tanî pêla Šehrîya Sulêmanê Qanunî date bidirêjkirin. Li dawîya vêna de ew bi ser Mîrnešnîyaî Cezîrê ve hate bixistin.

## 2. Mîrnešînîya Xêzan

Šerefname Xanedanekî Xenes bi Sazvanê vê Mîrnešnîîyêve dide bidanîn. Ji vê Xanedanê Sê Bira Dil Bek, Bel Bek û Bilêc Bek hebûn û ew di Xêzan[275], Mekis û Ispayerde de Mîr bûn. Renge, ku wan di dawîya pêla Silcoqî de ev Mîrnešînî hanê dabin bidamezirandin. Ešîra bi hêzî vê Melbendê ve Nemîran bû.

Vê Mîrnešînîya hanê bi her Sê Qolên xwe ve gelekî dayite demandin û ew di pêla Osmanî jî de Mirnešînî bû. Di dema binivîsandina Šerefname de di sala 1005 k.- 1597 z. de Xêzan di destê Mîr Hesen de bû, Mekis di destê Mîr Ehmed de bû û Perçakî Ispayerd jî ji bona Kurên Mîr Šeref hatibû hilanîn.

Derbarê bi rewš û zîneta dawîyî vê Mîrnešînîya hanê ve tanî hêštajî agehdariyên wetov nînin.

## 3. Mîrnešînîya Šêrwan

Šerefname dibêje, ku gava serdarîya Eyubî li Surî de di sala 626 k. de hate binemankirin, Yekek ji wê Xanedanê ji bona Hesen Kêf hat û wî li wêderê de mîrnešînîya Melekan date bisazkirin. Bav û Bavpîrên Mîrên Šêrwanîyan[276] di wê Mîrnešînîya Melekan de karmendîya Wezîran ji xwe re didane biwergirtin û ew ji Xanedana Eyubîyên Hesen Kêfê bûn. Sê Bira ji vanan Iz El-Dîn, Bedir El-Dîn, Imad El-Dîn di demekê de ew bi hev re ji bona Kifrî hatine û wan bi yarmetîya serdarîya wê navê de li Kifrî de Mîrnešînîyek dane bidamezirandin.

Ji vê Xanedanê Mîrê pêšî Mîr Hesen Kurê Ibrahîm bû. Wî di jîna xwe de Mîrnešînîya xwe di nava Kurên xwe de date biparvekirin û hemû bi Mîrê Kifri ve dihatin bigirêdan.

[275]Xêzan Melbendeke di Ostandara Bedlîsê de bû.

[276]Evaya navê Heremekê ye, ya ku ew li Ostandara Wanêyî kevnar de têtê bikevtin û Navînîya wêna jî Kifri bû.

Ev Mîrnešnîyaî hanê û Qolên wê Šebestan, Îron, Awîl û Kefre di pêšîya pêla Osmanî jî de hêjî mabûn û wan di wê zemanî jî de de tanî demekê datin bidemandin.

## 4. Mîrnešînîya Bedlîsê

Xwedanê Šerefname, çunke, ku ew bi xwe ve ji Nevîye Xanedanê vê Mîrnešînîyê bû, derbarê bi vê Mîrnešînîyê ve gelek agehdarî dane bipeydakirin û wî ew datin binivîsandin.

Šerefxan koka vê Xanedanê ji bona ser koka Xaneda Sasanî dide birin. Belam Dr. Frech-Firêc bi dirêjî û rûnkirinên Šerefname ve nade bibawerkirin. Renge, ku ew jî rast bête bidîtin; çunke, bi rastî jî hin rûdan û nav têde têtin bidîtin, ku ew ewende ligel mêjûwa rastî de yek nadin bigirtin.

Dr. Frech-Firêc dibêje: "Li gora agehdarîyên rastiyî Mejûwê de yekemîn Serdarê nasê Betlîsê Melek Ešref bû, yê ku ew berî bi Mîrê Bedlîsê bête bikirin, ew li nik Eyubîyên Surî de Yek ji Serdarê Leškerê wan bû. Gava ku Celal El-Dîn Xwarzimšah ji bona van navan hat, vî Melek Ešref ew date biparastin. Li dawî de û li ser daxwaza Megolan de wî ew ji sînorên xwe dane biderkirin".
Li layê min de weha ye, ku hûrbûnên Dr. Frech-Firêc jî bi kêmîve têtin ditin, çunke, ku li gora Mejûwa serdarîya Eyubî de hatina Celal El-Din Xwarzimšah ligel zemanê Melek Ešrefê Kurê Melek Adilê Serdarê Surî de tête bilihevrasthatin. Bi xwe jî vî Melekê hanê jî berамber bi Cela El-Dîn ve ligel Ela El-Dîn Kiqubadê Sultanê Silcoqîyê Romê de peymanek dayite bigirêdan û wî li jêr Komandariya Mîr Iz El-Dîn Omerê Hekarî de Leškerek ji bona ser wî date binardin û wî Leškerî li nêzîka Erzencanê di sala 627 k. de date šikenandin. Ca ku weha bû, renge, ku yekemîn Serdarê Bedlîsê Mîr Iz El-Dîn Omerê Hekarî bête biderkevtin, yê ku ew Serdarekî Eyubîyî Surî bû.

Di heyamê Teymurleng de Mîrê Bedlîsê Hacî Šeref Beg bû û wî serê xwe ji bona Teymurleng date bidanîn. Wî ji bal Teymurleng ve zor hêjabûn date bidîtin. Teymurleng Pasîn û Melazkurd jî bi ser xakê wî ve date bivekirin. Belam di dawî de ew ji bal Ayeq Sofîyê Cigirê Teymurleng hate bizindankirin û ew hate bilinavçûn. Mîr Šemis El-Dînê Kurê wî ligel Gewreyên Ešîra Rojkî de ji bona Îranê çûn.

Šerefname dibêje, ku li dawîya Hacî Šeref Beg de Mîr Šemis El-Dîn bi Serdar ve hate bikirin û li zemanê vî Mîrî de Qere Yusifê Qere Qoyonlî ji bona Bedlîsê hatîye û wî xwe ji bona nik vî Mîrî dayite biavêtin û wî Keça xwe jî ji bona vî Mîrî dayite bidan. Wî bi alîkarîya vî Mîrî ve wirde wirde serdarîya Qere Qoyonlîyê ser li nû ve dayite bidamezirandin. Wê bi bê birînek kêm û zor ve tanî navînîya sedsalê nozdehemînî Zayînê de dayite bidemandin. Mîrê dawîyî vê mîrnešînîyê Mîr Šeref Beg bû, yê ku mîrnešînîya wî di sala 1836 z. de ji bal serdarîya Osmanî ji destê wî hate bisitendin.

Yekek ji giringtirîn rûdanên vê Mîrnešînîyê Penabûna Bavê Šerefxan ji bona Îranê û li paš navekê de vegera wîna ji bona Bedlîsê tête bidîtin û ew ji bal serdarîya Osmanî ve bi Mîrê Bedlîsê ve hate binasîn.

Di sala 1066 k. de Melek Ehmed Pašayê Ostandarê Wanê bi xurayî ve šer bi Mîr Eb-Dulxaanê Serdarê Bedlîsê ve date bifiroštin. ew bi leškerekî, yê ku bešê zorî wî kurd bûn, ji bona ser wî çû û wî ew neçarî revê date bikirin. Wî mal û mulkên wî dane bitalankirin û Mîrnešînîya wî jî date bilinavbirdin.

## 5. Mîrnešînîya Sason

Xanedana vê mîrnešînîyê ji nevîyên Mîr Iz El-Dînê Birayê Serdarê Bedlîsê Mîr Diya El-Dîn bû, ango ku ew ligel Mîrên Bedlîsê de Pismam bûn. Herwehajî ew bi navê Mîr Iz El-Dîn ve yaxud Ezî jî bi wan ve dihate bigotin. Ešîra Sasonê beramber bi Ešrîa Rojkî[277] ve Ešîra duwem dihat bidîtin û ew çar ber bû: Šêrwî, Yabosî, Sosanî û Tamokî. Li dawîya vêna de Erzen jî bi ser Sasonê ve hate bivekirin û Eširên Xaldî, Dermeganî û Ezîzan jî bi jêr serdarîya Mîrên Sasonê ve hatin bikevtin.

Li gora Šerefname de Bidanînvanê vê Mîrnešînîyê Mîr Bavê Bekir bû û wî ew di pêla serdarîya Aq Qoyonlî de date bidamezirandin. Li dawî de Mîrên Sasonê parastina Šah Ismaîl ji xwe re pê hatine

[277]Ev Ešîra Rojakî Bîst û Çar Ber û Du Beš bû: Ebasî û Kawalîsî bû. Çar Berên wê di pêšî de li dor û berên Bedlîsê de bûn. Li dawî de Bîst Berên din jî ji bona wêderê hatin bigihandin. Li gora goyeke din de wan Bedlîs ji Qeralê Gorcîyê Dawid de dayite bizeftkirin.

birûniština. Di dema biserkevtina Çaldêran de Mehmud Begê Mîrê Sasonê xwe bi serdarîya Osmanî ve date bigirêdan. keleha Erzen jî jê re hate bidan. Li ser vê keleha hanê de ew ligel Melek Xelîlê Serdarê Hesen Kêfê de bi šer û pevçûnê ve hate bikevtin. vê Mîrnešînîya hanê jî mîna Mîrnešnîyên mayînî tirjî di pêla Osmanî de gelekî date bidirêjkirin.

## 6. Mîrnešînîya Siwêdî

Li gora Šerefname de Mîrên vê Malbatê Nevîyên Bermekî bûn. Di goyeke din de Ešîra Siwêdî ji Gundê Siwêd[278] ji bona Kurdistanê hatine û ev gundê hanê jî du Fersexekî li layê Jorî Medîna Munewer de tête bikevtin. Ev mîrnešînîya hanê, mîna ku peyv li ser de tête bikirin, zor li pêš serdarîya Aq Qoyonlî de hatîye bisazkirin. Pêcemînê Mîrê vê Mîrnešînîyê Mîr Fexir El-Dîn bû. Birayê wî ji bona layê Serdarê Aq Qoyonlî Hesenê Dirêj çû û wî Xan Cok û Cebaqcor pê date bidan. Navînîya Mîrnešînîyê bajarê Kenc bû.

Di pêla Šerefxan de Mîrê Siwêdî Sulêman Beg bû û ew li layê serdarîya Osmanî de zor birûmet bû. Vê mîrnešînîa hanê jî mîna ewanên tirjî di pêla Osmanî de demekê date bidirêjkirin û li paš jî de ew jî hate bilinavçûn.

## 7. Mîrnešînîya Bazokî

Ešîra Bazokî li gora Goyekê de Îranî bû[279]. Li gora goyeke tir de Mîrê vê Mîrnešînîyê ji Ešîra Siwêdî bû. Ešîra Bazokî Du Ber bû: Xalid Beklo û Šukir Beklo bûn. herema Berê yekem Xinês, Melazgerd û Navçeyeke Mûšê bû. Berê duwem bi Mîrên Bedlîsê ve dihate bigirêdan.

Derbarê zîneta kevnî vê Mîrnešînîyê agehdarîyên me nînin. Bes û bi tenha ve navê Sazvanê Berê yekem Hisên Elî Beg hatîye binasîn û ku Xalid Kurê Šehwar Beg Kurê Hisên Elî Beg li nik Šah Ismaîl de bû û wî

[278]Nezîktir ji hiš û rastîyê têtê biderkevtin, ku ew ji keleha Siwêdî hatine, ya ku ew di navbera Amed û Ruhayê de têtê bikevtin û ya ku ew li bal Kurdan de bi Sorak û bi Zimanê Turkî Sêwerek têtê binasîn. Hîç li vêderê de cihê Siwêda Medîna Munewer têgihištinekê nade bigirtin. (M. E.).

[279]Ango ew ji Kurdên Îranê bûn; jiber Šerefname navê vê Mîrnešînîyê jî di nava wan Mîrnešînîyan dide anîn, yên ku Kurd ew li Îranê de dane bisazkirin. Belam Danerê vê Mêjûyê guh bi cihê wêyê ve dayite bidan û wî ew di nava welatê Osmanî Turkîya niha de dayite bianîn. (M. E.).

di šêr û Cengên Šah Ismaîl nav û nîšan date biwergirtin û wî di wan šeran de destekî xwe date biwindakirin û ew bi navê Xalidê Yekdest ve hate binasîn. Ji bal Šah ve Xinês, Melazgerd û dorhêlên Oxkanî[280] pê hatin bidan. Belam li dawî de ew ji Šah Ebas vebû û wî derxwebûna xwe date bidazanîn. Li paš de ew ji bona Šehriyar Selîm Yawiz çû. Zor pê neçû wî serê xwe li ber wî jî de date birakirin û ew bi fermana Šehrîya Selîm Yawiz ve hate bigirtin û bikuštin.

Nevîyên vê mîrnešînîyê jî gelekî dirêj dane biserdarîkirin. Li zemanê Mîrîtîya Qelîç Beg de perçeyekî ji vê Ešîra hanê ji bona nava cihên Ešîra Dumilî dane bibarkirin û ew bi serdarîya Osmanî ve hatin bivegirêdan.

## 8. Mîrnešînîya Mîrdesî-Merdasî-Merdisî

Li gora Šerefname de Xanedana vê Mîrnešînîya hanê ji Nevîyên Ebasî ne. Sazvanê vê Mîrnešînîyê Šêxekî bi navê Pîr Mensur bû, yê ku ew ji Hekarê hatibû û ew li keleha Egîl de hatibû birûništin. Li dawîya vîna de Pîr Musayê Kurê wî Šêxitî ji xwe re date biwergirtin. Li dawîya vîna jî de Pîr Bedrî Kurê Musa Šêxitî ji xwe re date biwergirtin. Wî ji desthilatîya Šxêitîya xwe kar ji xwe re date biwergirtin û wî keleha Egîlê date bidagîrkirin. Çunke, ku Ešira Merdasî zor yarmetîya vê Xanedana hanê dayite bidan; jiber vêjî vê mîrnešînîya hanê jî bi wî navî ve nav û bang ji xwe re dayite bisitendin.

li paš navekê de Silcoqîyan keleha Egîl ji Pîr Bedir dane bisitendin û Pîr Bedir bi xwe jî ve ji bona Miyafarqînê çû. Di wê gavê jî de Leškerê Elp Ersela ji bona ser wî Bajarî hatibû û Pîr Bedir jî di šer de hate bikuštin. Li paš navekê de Boldoqê Kurê Pîr Bedir bingehê Xanedana Egîl date bidanîn û ji vê Xanedanê Berê Palo û Berê Çermoqî jî jê hatin bišaxkirin. Di pêla Šah Ismaîl de ew bi destê serdarîya Osmanî ve hate bikevtin û wê demekî date bidirêjkirin

[280]Weha di Kokê de hatîye binivîsandin. Di Šerefnama Çapa Rusya de Ohkana Mûš û di Çapa Qahire de Ockana Mûs hatîye binivîsandin. (M. E.).

## 9. Mîrnešînîya Cemšukuzk

Xanedana vê mîrnešînîyê bi goyekê ve ji Nevîyên Ebasî ne û ew li gora Goyeke tir de ji Nevîyên Silcoqî ne. Bidanînvanê nasyarî vê mîrnešînîyê Melek Mohemed û Bavê wî bû. Melek Šahê Kurê Melek Mohemed di sala 596 k. de ji bona serxwebûna šer ligel Silcoqîyan date bilidarxistin. Ew di wî šerî de hate bilinavçûn û mîrnešînîya wîna jî bi destên Silcoqîyan ve hate bikevtin. Li paš navekê de Kurê Melek Mohemedê Melekšah mîrnešînîya xwe date bivejandin û wî sî û du keleh û šanzdeh navçe dane bizeftkirin.

Ešîra wî bi navê Melekšahî hate bi nav û bangkirin û li Îranê jî de hezar Malên wê hebûn. Sînorên serdarî û kêra vê mîrnešînîyê weha hate bifirehkirin, ku nav û nîšana Cemšukuzk bi Al ve ji bona tevaya Kurdistanê hate bikirin.

Vê mîrnešînîya hanê di Pêlên Mengolan, Teymuran û Qere Qoyonlîyan de xwe zor bi bašî ve date biparastin. Belam di pêla Aq Qoyonlîyan de hin ji Ešîrên Turkî ji bona nava wan hatin binardin. Pîr Hisênê Mîrê wê her çend jî wî ev Ešîrên hanê jî dane biderkirin û wî serê xwe ji Šah Ismaîl jî re date bitewandin, careke din jî bê sûd bû. Serokitîya vê mîrnešînîyê ji bona nava destên Gewreyên Qilbašan hate bikevtin. Li dawîya navekê de Yawiz Šehrîyar Selîm Mîrnešînîya Cemšukuzk ji bona Mîr Pîr Husên date bidan. Vî Mîrê hanê, yê ku wî bi azayî û netirsa xwe ve Yawiz Šehriyar Selîm dabû biheyrankirin, ji bona ser Serdarê Qizilbašan Nur Elî date bihêrîškirin. Wî ew date bikuštin û mîrnešînîya xwe date bisitendin.

Li dawîya mirina Pîr Husên de mîrnešînîya wî bi Sê Bir - Mecingurd, Portoq û Seqman ve hate bikirin û ew Bir tanî navînyîa pêla serdarîya Osmanî hatin bidirêjkirin. Bîckeh ji Gewreyên van Sê Xanedanan ve Pîr Husên Beg ji bona Neh Kurên xweyî tirjî de ji bona her Yekekî ji wan ji bal serdarîya Osmanî ve Heremek bi Mulkayetî ve date biwergirtin.

## B. Mîrnešînîyên di navbera Cezîrê û Keles de

### 10. Mîrnešînîya Hesen-Husin Kêf

Šerefname dibêje, ku Padîšahên vê Mîrnešînîyê ji Nevîyên Malbata Eyubî ne. Serdarê pêšîyî vê Malbata hanê Padîšah Sulêman bû, yê ku ew di pêla Cengîz de hatîye bidîtin. Ger ku weha bû, divê ku ev Mîrnešînîya hanê li nêzîka 736 k. de hatibe bidamezirandin.

Padîšah Mohemed Kurê Padîšah Sulêman ligel Mengolan û serdarîya Îranê de bi bašî ve dayite birabuhurandin. Padîšah Ešrefê Nevîyê Padîšah Mohemed di pêla Teymurleng de hatîye bidîtin û ew di Mêrdînê de ji bona layê wîna hatîye biçûyîn û wî parastina wîna li ser xwe de dayite biwergirtin. Padîšahê Xelîl Kurê wî ji bona Šahrexê Kurê Taymur de serê xwe dayite bitewandin. Padîšah Xelef-Bavê Sefînê Kurê Padîšah Xelîl zor bi cerg û aza bû. Wî beramber bi leyandina Aq Qoyunlîyan ve ji bona Husin Hesen Kêfê bi merdayetî ve date biliberxwedan. Belam bi bêbextîya Yekekî ji Serdarên Leškerê wîna ve keleh bi destên Dujmin ve hate bikevtin û ev Mîrnešînîya hanê ji bona demekê hate bilinavçûn.

Padîšah Xelîl navê Mîrekî vê Malbatê bû, yê ku wî di pêla Leyandina Aq Qoyunlî de ji bona bajarê Hema date birakirin. Di wê gavê jî de Gewreyên Aq Qoyunlî ji bona hilkišandina ser Textê Šehrîyarîyê bi pêxîrên hevdû ve hatin bikevtin. Ev Padîšah Xelîl ji bona Kurdiastanê hate bivegerandin û wî bi alîkarîya Ešîran ve Sêrtê date bizeftkirin. Li dawî jî de wî Hesen-Husin Kêf jî date bisitendin. Wî ser li nûve de Mîrnešînîya xwe date bisazkirin.

Padîšah Xelîl her çend jî wî ligel Xanedana Sefewî jî de Xizmayetî jî dabû bipeydakirin, belam ew li šerê Šah Ismaîl de nehate birizgarkirin. Šah Ismaîl ew date bigirtin û wî ew Sê salan li bajarê Tevrîzê de date bizindankirin. Li dawîya šerê Çaldêranê de wî xwe date birizgarkirin û ew ji bona ser Mîrnešînîya xwe hate bivegerandin. Šehrîyar Selîm lê hate buhurandin û wî ew date biparastin û ew bi serdarîya Osmanî ve hate bibestandin. Demekê Mîrnešînîya wîna di nava destên Nevîyên wîna date bidirêjkirin. Li dawî de ew ji bal serdarîya Osmanî de hate bilinavbirin.

## 11. Mîrnešînîa Sulemanî-Silêvanî

Šerefname Xanedana vê Mîrnešînîyê ji bona ser Sê Kurên Xelîfê Dawîyî Emewî Merwanê Mohemed dide bigihandin. Ew dibêje, ku ew Sê Kurên hanê li dawîya linavçûna serdariya Emewî de ji bona herema Qolb[281] hatin. Wan bi yarmetîya Ešîra Banokî-Banekîyî Kurdî ve wirde wirde ew navanan tanî Dicle dane bidagîrkirin û wan hin keleh û Navçe jî ji Ermenîyan û Gorcîyan dane bisitendin û wan di nava wan navan de Serdarîyeke baš dane pêkanîn.

Ev Mîrnešînîya hanê ji Hešt Ešîrên Gewre dihate bipêkhatin. Hin ji wan Sunî bûn û hin ji wan jî Yezîdî bûn. Bešê zorî wan Gerok bû û Ešîra Sulêmanî[282] jî ji wan Ešîran bû.

Dîsan Šerefname dibêje, dibe, ku Sazvanê vê Mîrnešînîya hanê Merwan navek be, yê ku ew li zemanê Pêncemî pišta vî Mîrî de Mîr Diyadîn[283] pê gotin, Šah Ismaîlê Sefewî hatîya peydabûn. Mîr Diyadîn ligel Ostandarê Diyarbekrêyî Sefewî de baš dida birabuhurandin û ew bi Zavayê wî ve hate bikirin.. Li paš mirina vî Mîrî de Serpereštyîa Serdarîyê ji bona nava destên Birazayên wî hate bikevtin û Berî têde hatin bipeydakirin: 1. Berê Xanedana Gelab û Batmanê û 2. Berê Xanedana Miyafarqînê hatin bipeydakirin.

Serdarî û desthilatîya van herdu Xanedanên hanê tanî bidestpêkirina sedsalê bîstan tanî radeyekî mabûn. (Insiklopêdîya Musulmantîyê B. 3, r. 161).

---

[281]Ew Melbendeke di nava Wilayeta Bedlîsêyî kevin de bû û ew niha jî Melbendeke di nava Wilayeta Kencî Turkîyî de ye.

[282]Ešîra Sulêmanî-Silêwanî-Silêvanîyîye, ya ku ew niha li Hêla Miyafarqînê de tête bidaništin. (M. E.).

[283]Diyadîn Kurê Ibrahîm Kurê Iz El-Dîn Kurê Beha El-Dîn Kurê Merwan bû.

## 12. Mîrnešînîya Zerakî

Šerefxanê Bedlîsî dibêje, ku navnîša Zerakî ji Ezreqî hatîye bipeydakirin û Bidanînvanê vê Mîrnešînîya hanê Šêx Hesen bû. Ew ji Surî ji bona Mêrdînê hatibû. Ew bi qencî û pêšdîtinan ve hate binav û bibangkirin. Çunke, ku wî cilên šîn didan biliberkirin, jê re Ezreqî pê didan bigotin.

Zorî pê neçû, ku ev Šêxê hanê ji bal Serdarê Mêrdînê, ku dibe, ew Aq Qoyonlî be, hate bizindankirin. Belam ew di dawî de jiber hin karên wîyî pêšbidîtinan hate biberdan.. Wî li dawîya Xezûrê xweyî Serdarê Mêrdînê de serdarîya Mêrdînê bi destên xwe ve date bixistin. Li paš de ji Nevîyên vî Mirovê hanê Çar Xanedanên din hatin bipeydakirin: 1. Derzînî, 2. Kerdekan, 2. Etaq û 4. Tercîl.

Berê yekem ji bal Hayilê Kurê Šêx Hesen li keleha Dêrzînê de hate bipeydakirin. Berê duwem ji bal Nevîyê Hayil ve li keleha Kerdekan de hate bipeydakirin. Berê Syêem ji bal Mîrekî Zerakî li keleha Etaq de hate bipeydakirin. Berê Çarem li keleha Tercîlê de li nêzîka Diyarbekrê de hate bipeydakirin. Van her Çar Beran di pêla Osmanî de demeke zor datin bidirêjkirin.

## 13. Mîrnešînîya Keles û Ezazê

Insiklopêdîya Musulmantîyê dibêje, ku Xanedanê vê Mîrnešînîyê bêgûman ji Merevên Xanedana Mîrnešînîya Hekarê û Imadîyê ne. Šerefname dibêje, ku Tuxmê wan Ebasî bû û ew jî Sê Bira bûn: yekem Šemis El-Dîn bû, yê ku ew Bavpîrê Xanedana Mîrnešînîya Hekarê bû. duwem Beha El-Dîn bû, Bavikê Gewreyî Mîrên Badînan bû. Sêyem Munteša bû, yê ku ew Bidanînvanê Xanedana Mîrnešînîya Keles bû. Navên van Mirovan ji bal Kurdên wan navan de jiber Zaravê wan bi Šemon, Behdîn û Mend ve hate biveguhertin.

Ji van Biran Munteša-Mend hêzeke bašî Kurd date bikomkirin û ew ji bona Misir û Šamê çû û wî serdarîya Eyubî date bikaranîn. Ji bal Šehrîyarî Eyubî de û li nêzîka Entakîyê dê navçeya Qesîr pê hate bidan. Bere bere Mend Yezîdîyên wan navan û Êlên Kurdên Som û Kelesê di ber û hêlên xwe de datin bikomkirin û ew li ser kar û dilsozîya xwe de ji

bona Eyubîyan date biçûyîn. Li ser vî karî û dilsozîyê de Šehrîyarê Eyûbî ew bi Mîrê Kurdên Šam û Helebê jî ve date bixelatkirin.

Di pêla Kolemendên Misrî de Cîgirên Eyûbî de Nevîyên Mend zor ligel Yezidîyan xerîk bûn. Mîr Qasim Beg di zemanê Osmanî de ligel Šêx Iz El-Dînê Serokê Yezîdîyan de bi šer ve hate bikevtin. Di dawî de bi yarmetîya parastina Yezîdîyan ji bal serdarîya Osmanî de û bi saya Qerece Ehmed Pašayê Walîyê Helebê ve Qasim Beg hate bigirtin û bikûštin û Canpoladê Begê Kurê wî ji bona Istenbolê hate bibirin û ew ji bona nava Seraya Šehrîyar hate bixistin, da ku ew li wêderê de ligel Kurên Padîšahan de li ser zanistîya leškerî de bête biperwerdekirin û bihînkirin. Šêx Iz El-Dîn jî bi Mîrê Kurên wan navan ve hate bidanîn.

Li zemanê Šehrîyar Sulêman de inca Mîrnešinî bi destê Canpolad ve hate bikevtin. Tanî zemanê Šehrîyar Ehmed tanî radeyekî Serdarî û desthilatîya Nevîyên Canpolad hatin bidirêjkirin. Di daw de Mîr Elî li ber serdarîya Osamnî de rabû û wî Serxwebûna xwe li Helebê de date bidazanîn Belam zor pê neçû, sipahê Osmanî di bin Rêberîya Serekê Wezîran Qoyoçî Mirad Paša de ew datebi šikenandin Bi vî rengî ve ev mîrnešînîya hanê di sala 1061 k. de hate bilinavbirin.

Kurtîyek ji nivîsta Exbar El Eyan fi Cebel Lubnan- Nûçeyên Gewreyên Çîyayê Lubnanê[284]

"Di vî warî de tête bibîrvexistin, ku li paš penabûna Mîr Elî Paša de ji bona Istenbolê di sala 1607 z. de hin ji Endamên Binemala Canpolad ji šerê Qoyoçî Murad Paša hatin birizgarkirin û wan xwe di hêlên Heleb û Kelesê de dane bivešartin. Di sala 1630 z. de kêš ji bona Seîd Begê Canpolad Zade ligel Kurê wî Rebah pê hate bikevtin, ku ew ji bona Bêrudê bêtîn çbiûyîn û wan xwe li Malbata Meen de datin bigirtin. Jiber ku di nava van herdu Malbatên Mezin de pêwendî û dostanî dihate bidîtin, Maqûl û Gewreyên Lubnanê ji bona serdanîya wan pir rûmet û hêjabûn dane bigirtin û wan ji wan datin bixwestin, ku ew li çiyayê Lubanê de bêtin birûništin. Bi rastî jî ve Seîd Beg li Werzeša Šof de hate bidanîštin. Mîrê Çîyê Mîr Fexir El-Dîn bi bidîtina wî ve hate bidilšadkirin û wî ew ji bona Nava Peyên xweyî taybetî date bixistin. Wî Mîr Seîd Beg bi Serdar ve ji bona ser keleha Šeqîf Ernod ligel pêncî Peyên xwe ve di

[284] Ji vir û pê de di Dana Kurdîyî Soranî de niye, belam ev di Wergerandina Erebî de hatîye binivîsandin. Cuma.

sala 1640 z. de date binardin. Lêbelê Seîd Beg di wê Salê de hate bimirin. Dilovanîya Xwedê lê bête bikirin. Herwehajî Rebahê Kurê wî jî li paš çend salan de hate bimirin. Wî Sê Mîr li dûxwe de datin bihištin: Elî, Faris û Šeref El-Dîn bûn. Elî Keca Šêx Qublan, yê ku ew ji Gewreyên Šêxên Šof bû, ji xwe re date bianîn. Gava ku di sala 1712 z. de Šêx Qublan ji bona ber dilovanîya Xwedê hate biçûyîn, Wî šûna Xezûrê xwe date bigirtin. Weha bi vî rengî ve kês jê re hate bidîtin, ku ew karînê xwe û bašbûna Serpereštî û dadwerîya xwe beramber xelkê ve bide biderxistin. Wetov wî dilê xelkê û Šehabîyan bi ser xwe ve date birakišandin û wan tevan bi dilsozî ve jê re dane bikarkirin. Ew di sala 1778 z. de li Bajarokê Bazeran de hate bimirin. Wî li dûxwe de Šeš Kur dane bihištin. Ji wan Qasim cîhê Bavê date bigirtin. Pêwendîyên wîna ligel Ehmed Pašayê Cezar baš bûn. Lêbelê Kurê wî Bešîr serê xwe li ber desthilatîya Ehed Pašayê Cezar de date birakirin; jiber ku Serbazên wêna pir zor û sitem li ser xelkê de û di Welêt de didan bikirin. xelkê bi neçarî ve xwe li hêl û berên vî Xortê hanê de, yê ku ew hêjî bi çardeh salî ve nehatibû bigihaštin, hatin bikombûn. Wî Serbazên Ehmed Paša Cezar datin bitarûmarkirin. Wî ew tanî bajarê Seyda datin bibezandin. Pir ji talanî û raw û rûtkirina wan Serbazan bi destên wî ve hatin bikevtin.

Gava ku Bavê wîna li barjarê Šamê de hate bimirin. Bi Mîrîtî ve Serokayetî ji bona nava destên wî hate biveguhestin. Nobûnê di navbera wî û Šehabîyan de demekê date bidestpêkirin; jiber vê jî ew neçar bû, ku ew ji bona devera Horana Šamê di sala 1795 z. de bête bipenakirin. Ehmed Pašayê Cezar ew û du Šehabî li bajarê Bêrudê de dane bigirtin û wî ew ji bona Eka dane binardin û wî ew ji bona bênê zindanê li wêderê de dane biavêtin. Belam wî ew li paš rabuhurandina çar salan de di binê zindanê de date biberdan.

Wî nameyeke sipasiyê ji Perestê Papa ve li ser yarmetîya Maronîyan de di tengayên wan de date biwergirtin. Ji šopên wî di Çiyayê Libnanê de kišandina cihokeke avê ji Barok tanî Muxtare di sala 1800 z. de têtê bidîtin, ya ku ew li ser wî de pir bi malekî giran ve hate birawestandin.

Di sala 1810 z. de ew ligel sipahê Sulêman Paša Walîyê Eka de ji bona çûna ser Walîyê Šamê Yusif Pašayê Kurdî hate bibešdarkirin. Ew û Mîr Bešîr ligel Sulêman Paša de li Teberîya de bihev hatin bigihaštin. Di Qetena de šerekî germ di nava wan û Walîyê Šamê de hate bivêketin. Walîyê Šamê hate bišikestîn û wî ji bona Misrê date bibazdan. Sulêman Paša ligel Šêx Bešir de ji bona nava bajarê Šamê hatin bikevtin. Rumeta

Šêx Bešîr Canpolad di çavên xelkê de hate bibêtirkirin û nav û nîšanên wî di Çiyayê Libnanê de hatin bibilindkirin. Di sala 1811 z. de wî desthilatîya xwe bi ser Durûzê Çiyayê Libnanê ve dijî Walîyê Helebê date bivedan; jiber ku Walîyê Helebê dixewst, ku ew ziyanê bi wan ve bide bigihandin. Wî Durûz bi dilê Mîr Bešîr ve ji bona Zehlê datin biveguhestin û wî ew di melbendên wan navan de dane bicîkirin. Wî di sala 1818 z. de Mizgefteke gewre li Muxtarîyê date biavakirin. Herwehajî wî pir Erd û Mal ji bona Maronîyan date bipêškeškirin, da ku ew jî di Muxtarîy deê ji xwe re Kenîštekê bidin biavakirin. Di sala 1840 z. de lihevhatin û dostanîyê di nava wî û Mîrên Imadîyan de hate bilidarxistin. Ew ligel wan de di hemû kar û barên Çiyê de yek bû.

Di dawî de Walîyê Šamê Šêx Bešîr ligel Peye û Serleškerên wî de bi fêlbaziyeke sersurayî ve ji bona Šamê datin bianîn û ew tevde li wêderê de dane bizindankirin. Li paš demekê de wî ew date biberdan. Belam li ser daxwaza Walîyê Eka de wî ew ligel Šêx Emînê Imadî datin bidarvekirin. Temenê wî di wê çaxê de pênçî salî bû. Dilovanîya Xwedê li ser be. Ew pir dadwer, mêrxas û merd bû. Wî qencî ji bona tevan dida bixwestin. Ew bi nav û nîšana Situna Merdîtîyê dihate binavbikirin. Wî pir ji rê, ban, pir û mizgeft dane biavakirin. Di pêla wî de aramî û xwešî di tevaya çîyê de dihate bidîtin. Pir Kesên zorlêkirî û Perîšan xwe lê didatin bigirtin.

Mexabin, ku Mîr Bešîrê Šehabî li paš darvekirina vî Mirovê Mezin de bi zordarîlêkirina Malbata Canpolad ve date bidestpêkirin. Wî gelek ji mal û xanîyên wan û bi serdejî ve Mizgefta Mezin li Muxtarîyê jî de date biherifandin. Wî malê wan û mulkên Ešîra wan date bitalankirin. Vî karê hanê pozê Walîyê Eka date bišewitandin. Wî destdirêjîya nava wî karî de date bikirin û wî fermana veguhestina wan ji bona Sefed date bikirin. Wî ew li wêderê de dane bicîûwarkirin. Herwehajî wî ji wan re Mehane dane binîšankirin û bipêškeškirin.

Di sala 1832 z. de di Hêrîša Ibrahîm Paša bi leškerê xweyî Misrî ve ji bona ser welatê Šamê Gewreyên Malbata Canpolad pišta dewleta Osmanî dane bigirtin û wan tevan xwe ji bona nik Walîyê Šamê dane bigihandin. Šerê Humsê di navbera leškerê Misrî û Osmanî de hate bivêketin. Leškerê Osmanî hate bišikenandin û ji Canpolad Mîr Seîd û Mîr Ismaîl xwe ji bona nava çîyê dane biavêtin. Yên din ji wan xwe ligel Leškerê Osmanîyî šikestî de ji bona Helebê dane bikišandin û Serek Wezîr Mohemed Rešîd Paša zor rûmet ji wan re date bigirtin. Tevî ku Leškerê Serek Wezîr hate bišikenandin û ew bi xwe jî ve hate biberdest-

kirin, Malbata Canpolad dev ji Osmanîyan nedan biberdan, Osmanîyên ku wan her û her Malbata Canpolad bi xelatan ve didan bixemilandin. Di dawî hilanîna pirsiyara Misrî û Turkî de ji Canpoladan Mîr Hesen û Mir Husên ji bona nava çîyê hatin bivegerandin. Belam Mîr Bešîr çavdêrî li ser wan de dabû bidanîn. Wî Mîr Hesen date bigirtin û wî ew date bikuštin. Mîr Husên jî xwe jiber çavan date bibetwetakirin.

Mîr Seîd û Mîr Ismaîl Kurên Šêx Bešîr ji Canpoladan, yên ku wan xwe ji bona nava Çiyê dabûn biavêtin, bi neçarî ve ji bona nik Mîr Bešîr hatin biçûyîn. Wî destbiçî ve ew ji bona layê Ibrahîm Paša datin binardin. Wî jî ew ji bona Misrê dane bisorgonkirin. Belam Seîd dilsozîya xwe ji bona Misrîyan date biderxistin û ew bi nîšana Efser ve ji bona nava sipahê Misrî hate bikevtin. Di sala 1838 z. de Ibrahîm Paša nîšana Yuzbašîyê pê date bivekirin û li paš de wî nîšana Begbašîyê jî pe date bivekirin. Herwehajî Birayekî wî jî bi navê Numan ve, yê ku ew li Istenbolê de bû, ji bona Misrê hate çûyîn û ew bi Nîšana Mîr Alayê ji bona nava sipahê Misrî hate bikevtin.

Di dawî de Seîd Beg ligel Šamîyan de dikarîbû ji Misrê ji bona çiyê bête bibazdan, jiber ku Birayê wî Ismaîl Beg ji bal dewleta Osmanî de li ser çiyê bi Serdarî -Šêxê Šêxan- ji dêlva Bavê wî Šêx Bešîr ve hatbû bidanîn. Wehajî Numan Beg jî dikarîbû xwe ji sipahê Misrî bide bicihêkirin û ew ji bona çiyê bête bivegerandin. Ew ji dêlva Bavê xwe ve li ser çiyê de bi Serdar ve hate bikirin".

## C. Mîrnešînîyên di navbera Cezîrê û Xoyê de

### 14. Mîrnešînîya Hekarê

Derbarê bi koka Xanedana vê Mîrnešînîyê ve agehdarîyên meyî durust nayên bidîtin. Šerefname dibêje, ku Bavpîr wê navê wî Šems El-Dîn bû.( Ji xwe re temašeyî nîvîandina li ser Keles de bide bikirin). Li layekîtir de dibêje, ku ev mîrnešînîya hanê duwemcar ji bal Esed El-Dînê Kulabî de hatîye bivejandin, yê ku ew bi Zêrîn Cenk ve hatibû bi nav û bibangkirin. Ew li Misrê bû û ew bi saya Ašrûrîyên wêderê de bi Mîrîtî ve hate binîšankirin. Dr. Frech-Firêc li gora van agehdarîyan de û navê Šemun-Šembo dibêje, çunke, ku bi Ašûrî ve navê šenbe navê rojekê ye, divê ev Mîrê hanê jî Ašurî be. Wer ev remana hanê zor bi hele ve tête bidîtin, Çunke, ku Šemo Kurdî ye. Heger jî em li gora wekhevbûna peyvê jî bihêlin bête biçûyîn, divê em bêjin, ku Šembo Kurd bû. Bi kurtî ve mîna ku Šerefname di peyva xwe de li ser Mîrnešînîya Keles de dibêje, ku Šemis El-Dîn Bavpîrê Gewreyî vê Xanedanana hanê divê bête biderkevtin; jiber vê jî bi vê Mîrnešînîyê ve Šembo pê hatîye bigotin.

Li dawîya Esed El-Dîn de Melek Iz El-Dîn Šêr-Yezdan Šêr bi Mîr bû. Šêst salekî wî date biserdarîkirin. Li dawîya wî de Zahidê Kurê wîna mîrnesînîya xwe bi jêr parastina destê Šah Ismaîlê Sefewî ve date bixistin. Li dawîya Zahid Beg wer tête biderkevtin, ku Kurên wîna Melek Beg û Seyid Ehmed Beg her Yekekî ji wan li bešekî Hekarê û Šemdînan dane biserdarîkirin. Nevîyên vê Binemalê tanî sedsalê nozedehemî zayînê jî de hatibûn bimayîn û Biserdarîkirina wan jî dihate bidîtin. Ev mîrnešînîya hanê ji gewretirîn Mîrnešînîyên Kurdistana Navînî dihate biderkevtin. Zekeriya Beg û Ibrahîm Beg li Colemerk û Elbaq de serdar bûn û ew di pêla Šrefxanê BedlÎsî de di sala 1005 k. de dihatin bidîtin.

Olya Çelebî zor pesnê vê mîrnešînîyê dide bikirin û ew dibêje, ku hergav deh hezar Tivingçyî wê hebûn. Wê di dema tengavîyê de çil pêncî hezar Šervan didate bikomkirin. Dawîvanê Mîrê vê Xanedanê Nur El-Lah Begê Serdarê Botan bû. Mîrnešînîya wîna li dawîya Šureša Bedirxanîyî bi nav û bang ve li dest hate biçûyîn. Di sala 1945 z. de Helîme Xanim Baš keleh[285] ji bona Turkan date biberdestkirin.Weha bi vî rengî ve roja

[285]Ew keleha Elbaqî kevnare û ew di Wilayeta Wanêyi Turkîya niha de ye. (M.

dawîya vê Mîrnešînîyê hate bidîtin. Mêjûvanê Mezin Hammer di Begrê Nehemînî mêjûwa dewleta Osmanî de navê Mîrekî ji Mîrên Hekarê bi navê Mîr Imad El-Dîn dide anîn, yê ku ew ji bal Serekê Wezîran di Dîwanê de di sala 1049 k. hatîye bikuštin.

### 15. Mîrnešînîya Mehmudî

Derbarê koka Malbata Šahzadeyên Mehmudî de zor Goyîn hene. Belam Dr. Frech-Firêc dibêje, ku Bidanînvanê vê Serdarîyê Behlul Begê Sulêmanîyê bû û ew ji Nevîyên Merwan Kurê Mohemed Dawîvanê Xelîfê Binemala Emewî bû.

Belam Šerefname dibêje, ku Bidanînvanê vê Malbata hanê navê wî Šêx Mehmud bû û ew ji Šamê hatibû û li gora goyeke tir de ew ji bajarê Cezîrê ligel Ešîra xwe de ji bona layê Serdarê Qere Qoyunlî Qere Yusif hatibû. Ji bal vî Serdarî ve keleha Ašot bi Ešîra wî ve hate bidan û wî ew bi xwe jî ligel xwe de date bidanîn. Di nava demekê de wî mêrxasî û merdayetîya Šêx Mehmud date bidîtin. Wî ew bi Mîrê Ašot û Xošab ve date bidanîn û Ešîra wî jî bi navê vî Mîr Mehmudî hate binavkirin.

Mîr Hesenê Kurê Šêx Mehmud Mîrnešînîya xwe date bigewrekirin. Wî Iz El-Dîn Šêrê Hekarê date šbiikenandin û NevçeyaTenyo-Tîno[286] jê date bizeftkirin. Li dawî de Mîrê Bedlîsê yarmetîya Iz El-Dîn Šêr dayite bikirin û di šerê çemê Mîr Ehmed[287] de Mîr Hesen hate bikuštin. Li Paš de ev mîrnešînîya hanê bi du ber ve Mehmudî û Aqe keleh hate bikirin û li dawîya sedsalê dehemî koçî de berekî sêyemî tir jî lê hate bipeydakirin. Bi kurtî ve wê tanî Navînyîa pêla serdarîya Osmanî dayite bidirêjkirin.

Olya Çelebî li ser hêz û hinera gewreyî vê Mîrnešînîyê de dibêje, ku ev serdarîya hanê li layê Rojhilatî Wanê de hatibû bikevtin û ew ji

E.).

[286]Dibe, ku ev ji gotina Šenbo hatibe biderkevtin; jiber ku ew gotin di Šerfname de wetov hatîye binivîsandin: ku wî Wilayeta Šenbjê date bizeftkirin. (M. E.).

[287]Ew Çemê Xošabê ye, mîna ku ew di Šerefname de hatîye binivîsandin. (M. E.).

nêzîka sed Êlî dihate biderkevtin û Leškerê wêyî hergav bi Šeš hezar Suwar ve dihate bidîtin.

Hammer di bergê Šešemî mêjûwa xwe de dibêje, ku Serek Wezîr Qere Mustefa Paša Serdarê Ašotê di sala 1049 k. de date bikuštin.

## 16. Mîrnešînîya Binîyanîš

Insiklopêdîya Musulmantîyê li ser vê Mîrnešînîyê de nade biaxivtin. Dema ku ev Mîrnešînyîa hanê di pêla Osmanî de di nava wan Mîrnešînîyên gewre de dahate bidîtin. Ew bi nav û bang bû û ew Dirawsê Mîrnešînîya Mehmudî bû. Olya Çelebî[288] dibêje, ku hêza wêyî Serbazî hergav Çekdar dihatin bidîtin.

## 17. Mîrnešînîya Dunbulî

Dr. Frech-Firêc di nivîsta xweyî Kutdler de zor bi kurtî ve li ser vê Mîrnešînîyê dayite biaxivtin. Bi xwe jî ve wî guh bi rûnkirinên Šerfname ve pê nedane bikirin[289]. Belam nivîsta Asar El-Šîe El-Îmamîye li gora mêjûwa Dubulî[290] de bi dirêjî ve ji me re li ser vê serdarîya hanê dide biaxivtin û ew ji me re dide biveguhertin û ew dibêje, ku Serdarê yekemî vê Xanedana hanê Melek Tahir Kurê Mîr Isayê Kurê Mîr Musayê Serdarê Šamê bû. Ev Mîr Musayê hanê jî Kurê Yehyayê Bermekîyê

[288]Ji xwe re di vî warî de bi zaravayê soranî li nivista: Kurd le Mêjûwî dirawsêkan de, Siyahetnamey Olya Çelebî, Wergêranî Seîd Nakam, Çapxana Korê Zanyarî Kurd, Bexda 1979 de bidin bitemašekirin. Cuma

[289]Li gora Šerefname de Goya rastir divê weha bête bidîtin: Ku Ešîra Dunbulî ji Hekarê ji bona Ezirbêcanê daye barkirin. Mîr Isa Bavê Melek Tahir ew ji bajarê Cezîrê hatîye barkirin.

[290]mêjûwa Dunbulî li jê navnîšana Riyad El-Cene ji bal Eb-Dul-Rezaq Kurê TEcfeqelîyê Dunbulî bi zimanê Farisî hatîye binivîsandin. Daneyek jê di Nivîstxana Šahînšahî de li Tehranê de tête bidîtin. Bîcgeh li vê jî de Emîn Ehmed El-Zazî di bin navnîšana Heft Iqlîm bi zimanê Farisî ve derbarê mêjûwa Mîrên Dunbulî de dayite binivîsandin.

Wezîrê Haron El-Rešîd bû. Li gora Nivista Ensab El-Ekrad de koka[291] wan ji bona ser Binemala Bermekîyê bi nav û bang ve tête biçûyîn.

Ji vê Ešîra hanê zor ber lê hatine biderkevtin û bi nav û bangtirîn Berên ji wan Dunbulêv Yehyayî (Nevîyê Mîr Yehyayî), Šemsekî (Nevîyên Šems El-Melek Cafer, Îsa Beglo (Nevîyên Mîr Îsa), Begzade (Nevîyên Mîr Firîdon), Eyobxanî.... hd.

Ev Berên hanê ji bal Xelîfe Mamun, Teymurleng, Šehrîyar Selîm de ji bona nava welatên Kašan, Xuresan, Xebošan, Šêrwan, Kence û Qerebax de hatine bibelavkirin. Mîrên vê Xanedana hanê di sedsalê çaremînî koçî de li Kurdistanê û Ezirbêcanê de bi Serxweyî ve dane biserdarîkirin û serdarîya wan tanî zemanê Šêx Heyderê Sefewî de dayite bidemandin. Di zemanê vî Šêxîde Mîr Behlulê Dunbulî bi Arezûwê xwe ve xwe pêve date bigirêdan û ev serdarîya hanê nala Mîrnešînyîke bestevan bi Šêx Heyder ve dihate biderkevtin.

Li ser Serdarên vê Mîrnešnîîyê li jêr de em bi kurtî ve didin binivîsandin. Bi dirêjî ve li ser wan de di Nivista Kurdanê: Nawbank û ya Mešahîr El-Ekrad de têne bidîtin:

Mîr Mohemed:

Çaremînî Mîrê vê Malbata hanê bû û ew li Šamê de Serdar bû. Wî hin Cîgeh jî li Hekarê de ji xwe re dabûn bizeftkirin. Hin Binivîsandinên wî di warên Zanistîyê û Huner têtin bidîtin. Ji šopên wîyî avanîyê de keleha Bayî bi nav û bang ve têtê bidîtin, ya ku ew di sala 378 k. de tê de hatîye bivešartin.

Mîr Šulêman:

Bi ser Kurdistan, Ezirbêcan û Šamê ve desthilatîya wî dihate bidîtin. Li çiyayê Šingarê de Seraya Šulêmanî date bidurustkirin. Wî Mamostê ji Îranê dabûn bianîn û wî Zarokên xwe fêrî xwendinê dane bikirin. Xwediyê Mešariq El-Enwar Šêx Recem Pursî li nik vî Mîrî de dihate bidaništin. Ew di sala 410 k. de hate bimirin.

Mîr Caferê duwem:

---

[291]Ev Nivista hanê ji bal Zanistvan û Mêjûvanê bi nav û bangf Bavê Henîfeyê Dînorî Xwedî Nivista Exbar El-Tiwal hatiye binivîsandin.

Di rojgarîya vî Mîrê hanê de li çîyayê Sengeran de Rehên Zêr hatin dozandin û Zêrê wî bi navê Zêrê Caferî hate binavûbangkirin. Ev çiyayê hanê li nêzîka keleha Dunbulê de tête bikevtin. Ew di sala 441 k. de hate bimirin.

Mîr Yehya:

Šerefname dibêje. ku ji Filan sî hezar mal pê ve dihatin bigirêdan û wî nêzîka hezar û Pênsed Tekî di nava çiyan û Kohustanên Kurdistan, Ezirbêcan û Šamê de datin biavakirin. Ew di sala 477 k. de hate bimirin.

Mîr Isa:

Ew bi navê Selah El-Dînê Kurd hatîye binavûbangkirin. Wî sed hezarek ji malên Yezdanîyên Kurd ji bona Ezirbêcan û Kohustanê dane biveguhestin. Wî piranîya dema xwe li Tevrîzê de dida birabuhurandin.

Mîr Cafer:

Ew bi navê Šems El-Melek ve bi nav û bang bû. Ew Hemsayê dema Minoçeher Šêrwan Šah bû. Xwešxwevanê Xaqanîyî Šêrwanîyê bi nav û bang ve gelekî pesnê wî dayite bidan. Ew di sala 535 k. de hatiye bimirin.

Emîr Beg:

Wî ligel Šehrîyar Sincer de bi bašî ve dayite birabuhrandin. Wî hin ji Avanîyên Gewre li bajarê Xoyê de li dûxwe de dane bihištin. Ew di sala 590 k. de hatîye bimirin.

Mîr Ehmed:

Xwedîyê Mesnewîya bi nav û bang ve Mewlana Romî li nik vî Mîrî bû.

Mîr Ibrahîm:

Navînîya wîna bajarê Tevrîzê bû. Wî Pêwendîyên xwe ligel Cengîz Xan de dabûn bibaškirin. Bi vî rengî ve wî welatê xwe ji wêranîyê date birizgarkirin. Ew di sala 692 de hate bimirin.

Mîr Cemšîd

Ew ligel Mengolan de bi šer ve hate bikevtin. Di sala 725 k. de Gazan Xan Leškerekî zor ji bona ser wî date birakišandin û wî ew li Çiyayê Çele Xane de date bikuštin.

Emîr Behlul:
Ew Kurê Mîr Cemšîd bû. Ew di sala 760 k. de hatîye bimirin.

Šah Mensur:
Ew Kurê Mîr Behlul bû û ew di sala 795 k. de hatîye bimirin.

Mîr Mehmud:
Ew Kurê Šah Mensur bû. Wî li nik Šehrîyar Bayezidê Osmanî de zor rûmet ji xwe re dayite bigirtin. Wî bajarokê Mehmudîyê li Kurdistanê de dayite bidurustkirin. Ew di sala 820 k. de hatîye bimirin.

Emîr Welî:
Ew li bajarê Xoyê de dihate bidaništin.

Haci Beg:
Ew Kurê Mîr Welî bû û ew di sala 822 k. de hate bimirin.

Sultan Elî:
Ew Kurê Hacî Beg bû û ew di sala 835 k. de mirî ye.

Emîr Nezer:
Ew Kurê Sultan Elî bû.

Emîr ferîdon:
Ew bi Mîrê Qîlç ve bi nav û bang bibû. Li gora mêjûwa Cihannema de wî li ser hemû Ezirbêcan û Kurdistan û Erministanê de dayite biserdarîkirin. Navînîya Mîrnešînîya wîna bajarê Xoyê bû. Ew di sala 860 k. de hatîye bimirin û ew li bajarê Xoyê jî de hatîye nijandin.

Emîr Behlul:
Ew di pêla biderkevtina Šêx Heyderê Sefewî de dihate bidîtin. Wî Teberistan û Dagistan jî bi jêr destên xwe ve datin bixistin. Bi arezûyê xwe ve wî xwe bi Šêx Heyderê Sefewî ve date bibestandin. Ew di šerê

navbera Xanedana Sefewî û Šah Xelîlê Aq Qoyunlî de di sala 880 k. de hate bilinavçûn.

Emîr Restem:

Ew bi Šah Wîrdî Beg ve hatibû binavûbangkirin. Ew dI sala 898 k. de hate bimirin.

Emîr Behroz:

Navnîšana wîna Sulêman Xelîfe bû û ew tanî Temenê 95 Salî Mîr bû. Ew li nik Šah Tehmaseb de ji bona nava šerê Osmanî hate bikevtin. Ew di sala 985 k. de hate bimirin.

Eyun Xan:

Ew Nevîyê Emîr Behroz bû. Wî Nîšana Beglerbegîyê û Supahdarî ji xwe re date biwergirtin. Ew di sala 994 k. hate bimirin.

Šah Bende Xan:

........ ...... .......

Behroz Xan:

Ew ji Peyên pir nêzîkî Šah Ebas bûn. Šerefname li ser mêrxasî û jîrbûna wîna de dide biaxivtin. Ew di sala 1014 k. de hatîye bimirin.

Elî Xan:

Ew Kurê Behroz Xan bû. Wî bi nav û nîšana Sefî Qelî Xan ve nav û bang ji xwe re dayite biwergirtin. Gava ku Šehrîyar Murad ji bona ser Ezirbêcanê hate bigihandin, ew ligel Orduwê Šah Sefî de bû. Herwehajî gava ku Ferhad Paša ji bona ser Kurdistanê hate bigihandin, Elî Xan li çiyayên Hekarê de zor liberxwedarî date bikirin. Li paš de ew ligel Ehmed Pašayê Walîyê Begdadê de hate bilihevhatin û ew šer û pevçûnên hanê hatin bidawîkirin. Wî li Ezirbêcan û Erminisatanê jî de dida biserdarîkirin.

Murteda Qelî Xan:

Ew kurê Elî Xan bû û hergav ew li Isfehanê de ligel Šah Ebasê duwem de bû.

Xeyas Beg:

Ew jî Kurê Elî Xan bû û ew Yekek ji Serdarên Leškerê Šah Ebas bû. Ew di šerê Kendehar de nehate biserkevtin; jiber vê jî ruwê wî nedihate hilatin, ku ew ji bona nik Šah Ebas careke din bête bivegerandin. Ew ligel Ešîra xwe ve di nava wan Hêlan de hate bimayîn. Tîra Xerabî ji Nevîyên vî Mîrî hanê ne. Fetih-Ela Xan Keyê Xwešxwevanan di dewleta Qacarî de û Mehmud Xanê Kurê wîna ji vê Tîra hanê bûn.

Šehbaz Xan:

Ew Kurê Mueteda Qelî Xan bû. Di keleha Xoyê de ew ji bal Eb-Dulah Paša dee hate bodorlêpêçanîkirin. Li dawî de ew di sala 1144 k. de hate biberdestkirin û binabûdkirin.

Emîr Ehmed Xan:

Ew di Heyamê Nadir Šah de bû. welatê Bavpîrên wî di nava destên wî de dihate bidîtin. Wî Pêncî salî û šeš mehan li mîrnešînîya xwe de date biserdarikirin.. Gava ku ew li layê Kerîmxanê Zend de bû, Kurên Šehbaz Xan ew datin bikuštin.

Necif Qelî Xan:

Ew Kurê Šehbaz Xan bû û ew Yekek ji Serdarên Leškerê Nadir Šah bû. Ew Beglerbegê Tevrizê bû. Ew Xwešxwevan û Wêjevan bû. Ew di sala 1196 k. de hate bimirin.

Emîr Xweda Dad Xane:

Ew kurê Necif Qelî Xan bû.

Aqa Mohemed Xan:

Ew jî Kurê Necif Qelî Xan bû

Fetih-Elî Beg:

Ew Kurê Xweda Dad Xane bû.

Eb-Dul-Rezaq Beg:

Ew jî Kurê Necif Qelî Xan bû. Ew ji Xwešxwevanekî bi nav û bang bû û ew ji Peyê û Maqûlên Šahzade Ebas Mîrza bû. Hîn ji Nivistên wîyî Wêjeyî têtin bidîtin. Herwehajî wî Nivisteke Mêjûyî derbarê Xanedana xwe de dayite binivîsandin û Daneyek jê jî di Nivîstxana Šahînšahîyê de li Tehranê de tête bidîtin. Ew di sala 1243 k. de hatîye bimirin.

Beha El-Dîn Mohemed Aqa:

Ew Kurê Eb-Dul-Rezaq Beg bû. Ew Mirovekî Zanistvan, Qencvan û Xwešxwevanekî baš bû. Dîwaneke wîyî Xwešxwevanîyê tête bidîtin.

Koçûk Xan.

Ew Kurê Beha El-Dîn Aqa ye.

Šehbaz Xan:

Ew Kurê Murteda Qelî Xanê duweme. Ew li Šîrazê de bi destê Kerîmxan ve hate bidîlkirin.

Mehmud Xan:

Ew Kurê Šehbaz Xan bû. Ew Belerbegê- Mîrê Mîranên- Îsfehanê bû.

Šehbaz Xan:

Ew kurê Mehmud Xan bû. Ew di Heyamê Nasir El-Dîn Šah de bû.

Emîr Husên Qelî Xan:

Ew Kurê Ehmed Xan bû.

Mohemed Sadiq Xan:
Ew Kurê Husên Qelî Xan Beklerbegê Ezirbêcanê bû

## 18. Mîrnešînîya Biradost

Xanedana vê mîrnešînîyê Nevîyên Hesnewî ne. Li dawîya kuština Mîr Hilalê Kurê Nasir El-Dewle Bedir de Kurên Hilal ji bona nava Biradostê hatine bibarkirin. Evanan Sê Bira bûn. Yekek ji wan Tahir bû, yê ku ew li cîgehê Bavê xwe de ji bona Šarezorê bi Serdar ve hate bikirin. Yekekî din jî wan ji bona Serekê Ešîra Agor hate bikirin. Sêyemê wan jî ew ji bona bajarê Selmasê hat û wî ew ji bona jêr destên xwe date bixistin.

Šerefname dibêje, ku Mîrê herî bi nav û bangê vê Xanedanê Gazî Qeranê Kurê Sultan Ehmed bû. Di pêšî de wî ligel Šah Ismaîl de dujminayetî dayite bikirin û li dawî de ew ligel wî de hatîye birêkkevtin. Šah ew bi Navnîšana Gazî Qeran ve dayite bixelatkirin. Herwehajî wî jê re hêlên Tergever, Soman û Dol jî datin bipêškeškirin. Ev Mîrê hanêyî mêrxas tanî šerê gewreyî Çaldêran bi Nîv Serxweyî ve bi Šah ve dihate bibestandin.. Li dawî de wî jî ligel tevaya Mîrên Kurdan de serên xwe ji bona Yawiz datin bitewandin. Šehreyar Selîm zor rûmeta wî date bikirin û wî ji bona wî hin ji melbendên Iyalatên Hewlêrê, Begdadê û Diyarbekrê bi ser mulkê wî ve date bivekirin.

Li dawîya Gazî Qeran de ev Mîrnešînîya hanê bi du beš Somay û Tergever ve hate bikirin:

### 1. Xanedana Mîrnešînîya Somay 1. Xanedana Mîrnešînîya Somay1. Xanedana Mîrnešînîya Somay1. Xanedana Mîrnešînîya Somay

Ev Mîrnešînîya hanê ji bal Šah Mehmud Begê Gazî Qeran ve hate bisazkirin. Ew tanî nemana xwe di nava destên Nevîyên Šah Mehmud Beg ve dihate bidîtin. Di sala 1005 k. de Mîrê Soma Olya Beg bû.

### 2. Xanedana Mîrnešînîya Tergever 2. Xanedana Mîrnešînîya Tergever2. Xanedana Mîrnešînîya Tergever2. Xanedana Mîrnešînîya Tergever

Mîrên vê Xanedana hanê ji Ešîra Biradost bûn. Šerefxan dibêje, ku Nasir Beg Kurê Šêr Beg kurê Šêx Husên navê Mîrekî bû, yê ku ew di zemanê wî de Serdarê Tergever bû.

Yekek ji bi nav û dengtirîn Mirên vê Xanedana hanê jî Liberxwedanvanê keleha Dum Dum Emîr Xanê Yekdest bû. Ew di pêšîya pêla Šah Ebas de hate bidîtin û wî di sala 1017 k. de di keleha Dum Dum de serê xwe berambar bi Šah Ebas ve date birakirin.

## 19. Mîrnešînîya Mukrî[1292]

19. Mîrnešînîya Mukrî[1] 19. Mîrnešînîya Mukrî[1] 19. Mîrnešînîya Mukrî[1]

Šerefname dibêje, ku Seyf El-Dîn navê Mîrekî Somayî bû û ew Bidanînvanê vê Xanedana hanê bû. Vî Mirovê hanê di pêla serdarîya Turkuman de (di Sedsalî Nehemî Koçî de) di pêšî de navçeya Derbasîyê ji Ešîreke Turkumanî date bisitendin. Di dawî de wî Dola Barîk, Ixtacî, Îltimor û Seldoz jî bi ser ve date bivekirin. Bere bere wî mîrnešînîyeke bi hêz û hiner ve date birêkxistin. Wî navnîša xwe, mîrnešînîya xwe û Ešîra xwe bi navê Mukrî ve date binavkirin. Wî demeke pir dirêj bê šer û pevçûn date biserdarîkirin.

Li dawîya Mîr Seyf El-Dînê Mukrî ve Sarim Beg Kurê wî cihê wî date bigirtin. Šah Ismaîl di pêla Sarim Beg de tevaya Kurdistanê date bileyandin. Šah Ismaîl Leškerek ji bona ser Sarim Beg date binardin, belam Leškerê wî hate bišikestin. Li dawî de (di sala 912 k. de) Šah Ismaîl Leškerekî qurstir ji bona ser wî date bikišandin. Vê carê jî Sarim Beg Leškerê Qizilbašî zor xerab date bišikenandin. Belam li paš navekê de ji bona parastina xwe ji šerê Sefewî de wî ligel Mîrên Kurdên mayînî din de parastina serdarîya Osmanî ji bona ser xwe dane biwergirtin. Wî li Istenbolê de serdana Šehrîyarê Osmanî date bikirin.

Li dawîya Sarim Beg de serdarîya Mukrî ji bona nava destên Pismamên wî Šêx Heyder, Mîr Nezer û Mîr Xidir hate bikevtin. Van Hersê Biran waz li serdarîya Osmanî de datin bianîn û ew (di sala 948 K de) bi Hevalbendên Sefewî ve hatin bikirin.. Li ser vêna de Šêhrîyarê Sulêmanê Osmanî ferman bi Mîrê Imadîyê Sultan Husên, bi Mîrê Hekarê Zeynel Beg û bi Ešîrên Biradostî ve date bidan, ku ew xwe ji bona ser

[292]Li gora Goyeke de ev Xanedana Mukrîyi hanê Bireke ji Xanedana Bibe-Baban ye.

wan bidin rakišandin. Li dawîya šerek germ û giran de Hersê Mirên Mukrî hatin bilinavçûn. Li dawîya vî šerî de Šehrîyar Sulêman ev mîrnešînîya hanê bi Emîre Begê Hacî Omer Begê Kurê Sarim Beg ve date bisipartin, yê ku wî nêzîka sî salî di mîrnešînîya xwe de date biserdarîkirin. Li dawîya vî Emîre Beg de mîrnešînî bi destê Emîre Begê Kurê Šêx Heyder ve hate bikevtin. Di dema wî de Mukrî dîsan ji bona jêr parastina Sefewî hate bikevtin.

Li zemanê (Šah Mohemed Xweda Bend) de mîrnešînîya Mukrî ligel Mîrnešînîya Loristan û Erdelan de dîsan bi serdarîya Osmanî ve hatin bibestandin. Emîre Beg ji vê rewša hanê date bikarkirin û wî Mulkê Bavpîrên xwe ligel Šarezor û Wilayeta Musilê de bi pê rûništa Šehrîyar Murad ve date bivegerandin û herwehajî Šahrîyar Murad Hewlêr û Meraxe jî bi Kurên Emîre Beg ve date bidan.

Zor pê neçû, bi hoyê kar û azaya wî ve Šehrîyar ew bi Nîšana Mîrê Mîran û bi navnîšana Paša date bixelatkirin. Emîre Paša demeke zor date biserdarîkirin. Li Paš de ew ligel Cafer Paša Begler Begê Tevrîzîyî Osmadî de têkçû, yê ku wî hinek ji Mulkên Mukrî jê dane bisitendin. Tevlivêjî de demeketir jî vê Mîrnešînîya hanê date bidemandin. Ew di pêla Šah Ebasê yekem de du carî li zemanê Qubad Beg û Šêr Beg de tûšî kuština gištî hate bikirin. Derbarê payanbûna vê Mîrnešînîya hanê de agehdarîyên dûr û dirêj di nava destên me de nayêtin bidîtin.

## 20. Mîrnešînîya Istonî[293]

**20. Mîrnešînîya Istonî[1]20. Mîrnešînîya Istonî[1]20. Mîrnešînîya Istonî[1]**

Šerefname li ser vê Mrînešînîya hanê de nade biaxivtin. Li gora Lêgerandinên Insiklopêdîya Musulmantîyê de Xanedana Kevnarî Šemdînan Ebasî bû. Li dawîya vê Xanebidana hanê de Seyîdên Nehrî-Neyrî Serdarî û desthilatîya vê Mîrnešînîya hanê bi destên xwe ve dane bixistin. Yekek ji van Seyidan bi navê Šêx Bavê Bekir Kurê Šêx Eb-Dul-Ezîz bû û ew li Gundê Istonî de dihate bidaništin. desthilatîya wîyî Rewanî û hêz û hinera wîyî Supahî di nava xelkên wê hêle de ew bi navê Istonî ve hate binavûbangkirin. Bi nav û bangê Šêx Ubey Dul-lahê Nehrî Nevîyê Šêx Bavê Bekir bû. Šêx Ebey Dul-Lahê Nehrî cihê xweyî bilind di nava Šemdînan û Mukrî de ji bona Serxwebûna Milî û bidamezir-

[293]Insiklopêdîya Musulmantîyê li ser Mîrnešînîyên Zarza û Tarza de dide biaxivtin. Belam ew derbarê Serpereštî, Cih û Taybetîyên wan tištekî nade bigotin.

andina Dewleteke Kurdî di Salên 1880-1883 de date bikaranîn. Di encam de ew bi ser ve nehate bikevtin. Ew hate girtîn û ew ji bona Istenbolê hate binardin. Li wêderê de ew ji bona Hicazê çû û ew li wir de hate bimirin.

## D. Koma Jêrî Hekarê

### 21. Mîrnešînîya Badînan:

Bi vê Mîrnešînîya hanê ve Behadinyan jî pê didin bigotin. Li gora Šerefname de divê ku ew di pêla Ebasî jî de hatibe bidîtin. Li gora goyeke din de Šerefname Bidanînvanê vê Xanedana hanê li Xanedana Kurên Ebas bû û navê wîna Beha El-Dîn bû. Bi hoyê navê wîna Beha El-Dinyan-Behadinyan-Badinyan pê hatîye bigotin. Šerefname li layektir de dibejê[294], ku li zemanê Teymurleng Šahrexê Kurê wî de bajarê Imadîyê li jêr serdarîya wan de bû. Šahrexê Kurê wî payîna temenê xwe li wêderê de dayite birabuhurandin û wî bajarê Imadîyê ji bona Mîr Seyf El-Dînê Kurê xwe dayite bipêškeškirin.

Li dawîya Mîr Seyf El-Dîn de Mirnešînî bi destê Mîr Hesenê Kurê wî ve hate bikevtin. Wî zemanê xwe ligel šer û pevçûnên Aq Qoyonlî de dayite birabuhurandin. Li dawî de ew ji bona jêr parastina Šah Ismaîl de hatîye çûyîn

Li dawîya Mir Hesen de Kurê Gewreyê wî Sultan Husên bi Mîr ve hate bidanîn. Ev Mîrê hane li paš navekê de bi serdarîya Osmanî ve hate bibestandin. Ew di Nîšana xwe de Walî bû û sî salekî mîrîtî date bikirin. Di sertewandina Mîrnešînîya Mukrî de û bidûkevtina El-Qas

[294]Ji xwe re li Serefnama Çapa Qahire de bide bitemašekirin, dê tu bi cudabûna vê peyvê bide bidîtin. Ew dibêje, ku di pêla Temurleng û Kurê wî Šahirxî de Mîrê Imadîyê Zeyin El-Dîn bû. Wî bi Dadwerî û bi pêgîrî ve li Welêt de dida biserdarîkirin. Li paš wî de Mîr Seyf El-Dîn urê wî û li paš vî jî de Kurê wî Mir Hesen ... cihê wî date bigirtin. (M. E.).

Mîrza de wî ji bona serdarîya Osmanî karên gewre dane bikirin. Çar salan jî Sinceqa Musilê li jêr destê wî de bû.

Li dawîya Sultan Husên de Qubad Begê Kurê wî bi Mîr ve hate bikirin. Zor pê neçû, ku ew ligel Baram Begê Birayê xwe de bi šer ve hate bikevtin. Baram-Behram Beg ji lawazî û rebenîya Qubad Beg kar ji xwe re date biwergirtin. Wî Ešîrên Behdîna li ser wî de dane birakirin û wî bi xwe jî ji bona layê Šah Ismaîlê duwen date birakirin. Qubad Beg her çilo bû, wî ew Ešîr dane binermkirin. Belam zor pê neçû, ku Ešîrên Mizurî lê rast bûn û wan bi zorê ve Sulêman Beg, yê ku ew Mîrek ji Mîrên Bahdînan bû, bi Mîrîtî ve li ser Mîrnešînîyê ve datin bidanîn. Qubad Beg bi neçarî ve ji Musilê ji bona Sincarê hate çûyîn û wî li wêderê de li ser rûdanan de ji bona Istenbolê date binivîsandin.

Behram Beg di vê kêse de ji bona Imadîyê hat û wî Mîrîtîya xwe date bidazanîn. Qubad Beg demekê li Zaxde hate bidanîštin û ew li dawî de ji bona Istenbolê hate biçûyîn. Serek Wezîrê wê gavê Seyawiš Paša bû û wî fermana Mîrnešînîya wî pê date bidan û wî ew ji bona wêderê date binardin. Qubad Beg ji bona Dihokê hate bigihaštin û wî xwest, ku ew Serhildanvanan bide bilinavbirin. Belam di wê gavê de Sulêman Beg ligel Mîr Melekê Serokê Mizurîyan bi leškerên xwe ve ruwê xwe ber bi Dihoke ve dane bivedan û Tudeyên bajêr dergeh ji bona wan datin bivekirin. Dihok bi destên wan ve hate bikevtin û Qubad Beg jî di sala 984 k. de hate bikuštin. Gava ku Behram eve zanî, destbicî ve ew ji bona layê Ešîra Mizurî hate biçûyîn û wî mîrnešînîya xwe li ser wê de pê date birastkirin.

Kurên Qubad Beg Seyid Xan û Bavê Seîd ji bona layê serdarîya Osmanî hatin biçûynî û wan lê daxwaza vegerandina mîrnešînîya xwe dane bikirin. serdarîya Osmanî ferman bi Serdar Ferhad Paša ve date bidan, ku ew Behram Beg bide bigirtin. Di wê gavê de Serdar ji bona vekirina Gurcistanê diçû. Wî Behram ji bona nik xwe date bibangkirin û wî soz pê date bidan, ger ku ew di vî šerî de ligel wî de bête bibešdarkirin, dê ew li paš de Mîrnešînîya wîna pê bide bidan. Behram Beg bi vê hêvîya hanê ve Seyid Xanê Birazayê xwe li šûna xwe de date bidanîn û ew ligel leškerê xwe de ji bona layê Serdar hate biçûyîn. Li dawîya šerê Gurcistanê de Serdar Behram Beg date bigirtin û wî ew bi boxtana Kuština Birayê wî bi dadwerîya dadgehekê ve li Erzeromê de date bidarvekirin[295].

---

[295]Xwedîyê Nivista Çar sedsalê Dawîyî Iraqê dibêje, li dawîya ku Seyid Xan û Birayê xwe ji bona Istenbolê hatin biçûyîn, Šehrîyar Muradê Sêyem Mîrnešînîya

Bi vî rengî ve Mîrnešînîya Badînan ji bona Seyid Xan di sala 994 k. de hate bimayîn. Ev Mîrê hanê di zemanê Xwedîyê Šerefname de Serdarê Badînan bû û wî demeke zor li ser mîrnešînîya xwe de date biserdarîkirin.

Wer tête biderkevtin, ku li dawîya Seyid Xan de Yusif Xan bi Mîr bûye û ew di zemanê xwe de tûši hêrîša Melek Ehmed Paša Walîyê Diyarbekrê di sala 1048 hatîye bikirin. Wî ew dayite bigirtin û wî ew demekê ji bona binê zindana Diyarbekrê dayite biavêtin. Ew li paš dana bertîleke mezin de û li dawîya mirina Šehrîyar Murad de hatîye biberdan[296].

Li dawîya Yusif Xan de, wetov diyare, kurê wî mîrnešînî bi destên xwe ve dayite bixistin. Di zemanê vî Mîrî de di sala 1070 k. de mîrnešînîya wîna zor hêz û hinera wêna hate bipêškevtin. Leškerê wê ji Hešt tanî deh hezar kes Suwar bûn û ewenjî de Peyade hebûn. Her gav yarmetîya dewletê dida bikirin[297].

Mêjû di sala 1112 k.- 1701 z. de Qubad-Rebat[298] Paša bi Mîrê Imadîyê ve dide binîšandan û ku ew ligel Leškerê Musil û Diyarbekrê de ji bona Jêrî Iraqê hatîye çûyîn, da ku ew têde Šûreša Muntefekiyan bide bitemirandin.

Di sala 1138 k. de Baram-Behram Paša, renge, ku ew Kurê Qubad-Rebat Paša be, bi mîrê Badînan ve hate bidanîn. Wî bi navê Baram-Behramê Gewre nav û deng ji xwe re date bisitendin. Ew li dawîya serdarîya Çîl Salî de di sala 1181 k.- 1767 z. de hate bimirin.

---

Imadîyê bi Seyid Xan ve date bidan. Wî Ferman ji bona Serdar Ferhad Paša date bidan, da ku ew yarmetîya vî Mîrê hanê bi Leškerên Begdadê, Kerkukê û Mîrnešînîyên Kurd bide bikirin. Di encam de Ferhad Paša, her çilo bû, Imadîyê date bigirtin û wî Seyd Xan di sala 1585 z. de bi Mîrî ve li ser de date bidanîn. r. 42.

[296]Olya Çelebî

[297]Nivista Çar Sed Salên Dawîyî Iraqê, r. 98.

[298](Di Dana Kurdî de Du carî Rebat Paša hatîye binivîsandin, Belam di Dana Wergerandina Erebî de Du caran Qubad Paša hatîye binivîsandin. Mîn li gora Dana Erebî de dayite binivîsandin. Cuma).

Li dawîya Baram-Behram Paša de Ismaîl Pašayê Kurê wî bi Mîrî ve hate bikirin û wî demeke dirêj date biserdarîkirin. Di sala 1202 k.-1787 z. de ew tûšî šer û serhildanên ji bal hin Berberên xwe ve hate bikirin. Nedilsozîya Birayên ji bona wîna ew tûsî šer û pevçuneke xwe Malî hate bikirin. Wî Birayên xwe bi darê zorê ve ji Imadîyê dane biderkirin. Ew ji bona keleha Zaxo çûn û wan ew date bizeftkirin.Ismaîl Paša di bin Rêberîya Birayê xwe Elî Beg de lêškerek ji bona ser wan date binardin. Wî ew ji wêderê dane biderkirin û keleha Zaxo ji destên Birayên xweyî dujmin date bisitendin.

Li paš Salekê de Ismaîl Paša ligel Birayên xwe de hate bilihevtin û wî keleha Akrê ji bona wan date bipêškeškirin. Belam ew tevlivêjî de li xwe de nehatin biruništin. Careke din ew hate bineçarkirin, ku ew xwe bi leškerekî ve ji bona ser wan bide birakišandin û wan bide biberdestkirin û bisertewandin.

Di sala 1203 k. de Isamîl Paša ligel Birayê xwe Qubad Beg bi Leškerekî ve ji bona ser keleha Akrê hatin biçûyîn, ya ku tê de Birayên wan Teyfur Beg, Letif Beg û Hacî Xan Beg dihatin bidîtin. Wan dorlêpêçana keleha Akrê dane bikirin û wa hin ji xelkên wê dane bigirtin û wan ew ji bona bajarê Musilê dane binardin. Li paš demekê de di nava wan û Birayên wan de lihevhatin hate bikirin. Išmaîl Paša ji bona wan Birayên xwe Navçeya Kendîr date bidan û wî keleha Akrê ji bona Birayê xweyî Qubad Beg li ser karên wîyî baš de date bipêškeškirin. Belam li baš Salekê de Ismaîl Paša keleha Akrê ji Birayê xweyî Qubad Beg date bisitendin û wî Kurê xwe Murad Xan li ser de date biserdarîkirin. Qubad Beg li ser vê de ji bona nik Mîrê Sulêmanîyê Eb-Dul Rehman Paša hate bipenakirin.

Di sala 1205 k. de Ismaîl Paša xwe bi ser Gundên Šxaên ve date rakišandin û ew ligel Yezîdyîan bi šer ve hate bikevtin. Wî Mîrê wan Temur Aga û Peyên wîna dane bikuštin û wî Xencer Beg Bi Mîrîtî ve li ser wan de date bidanîn. Di sala 1206 k. de wî Mîr Xencer Beg date bixistin û li šûna wî de Hesen Beg Colo bi Mîrtîî ve li ser wan de date bidanîn.

Di sala 1209 de Di navbera Ismaîl Paša de û Birayên wî de lihevhatin û dostanîyê date bidestpêkirin. Di sala 1213 k. de šerek di navbera Qubad Beg Mîrê Zaxo û Mohemed Mîrê Botan de li ser talanîya çend gundên Botan de hate bivêkevtin. Di vî šerî de pir Kes hatin bikuštin. Di vê salê jî de Ismaîl Paša hate bimirin, pištî ku wî sî salî date biserdarîkirin Ji bona ser Mîrnešînînê Kurê wîna Murad Xan Beg šûna

wîna date bigirtin.Belam Birayê wî Mohemed Teyar Beg û herwehajî Qubad Beg serên xwe jêre nedan bitewandin û wan demekê jî šerê wî dane bikirin, tanî ku Mohemed Pašayê Celî Walîyê Musilê ew dane bilihevanîn. Di sala 1214 k. de Qubad Begê Mîrê Zaxo ligel Hesen Begê Mîrê Yezîdîyan de li Šêxan de bi šer ve hate bikevtin. Pir Kes di vî šerê hanê de hatin bikuštin.

Di sala 1215 k. de hêzek sipahîyî xurt ji bona Imadîyê di bin rêberîya Ibrahîm Pašayê Mîrê Sulêmanîyê de hate binardin. Li paš šerekî kurt de Murad Xan mîrnešînîya xweyî Imadîyê ji xwe re date bihištin û keleha Akrê ji bona Qubad Beg hate dan. Di sala 1218 k. de Qubad Beg Mîrnešînîya Imadîyê bi destên xwe ve date bixistin û ew bi navê Qubad Paša hate binavkirin. Elî Paša Walîyê Begdadê Mohemed Pašayê Serdarê Koyesenceqê bi hêzeke sipahî ve ji bona alîkarîya Qubad Paša û pištgirtina wîna ji bona vedana desthilatîya wî li ser Mîrnešînîyê de date binardin. Belam di mîrnešinîya Imadîyê de bajarê Imadîyê, Akrê û keleha Qemer bi destên wî ve bi carekê ve nehatin bikevtin.

Di sala 1219 de Ešîra Mizurîyî kevnar hêrîšî ser Qubad Paša date bikirin û wê ew date bigirtin û wê ew ji bona binê zindana Imadîyê date biavêtin. Wê tevaya mal û mulkên wî û yên Lutif El-Lah Beg, Teyfur Beg û Hacî Beg Kurên Ismaîl Beg jî dane bitalankirin. Qubad Beg di zindana Mîrê Imadîyê Edil Pašayê Mamê xwe de hate bimayîn, tanî ku Xwedê dida bixwestin.

Di wê Salê jî de pir belên mezin ji destên sitemkarî û genîbûna serpereštîya Mîr Serdaran bi ser welatê mîrnešînîya Badînan ve hatin bikevtin. Ehmed Beg Birayê Qubad beg pir Keleš li dora xwe de dabûn bikomkirin û wî bajar u gund didan bitalankirin. Bi ser ve jî wan demekê li Imadîyê jî de dane bidorlêpêçkirin.

Di sala 1220 k. de Elî Paša Walîyê Begdadê Leškereki pêkhatî ji Hêzên Xalid û Eb-Dul-Rehman Pašayên Baban û Mohemed Pašayê Soranîyê Serdarê Koyesinceq ji bona ser Imadîyê date binardin. Belam cudabûnê di navbera Eb-Dul Rehman Paša û Elî Paša Walîyê Begdadê date bidestpêkirin. Šer di navbera Eb-Dul-Rehman Paša û Elî Paša Walîyê Begdadê de hate bivêkevtin. Eb-Dul-Rehman Paša sipahê Musilê, yê ku ew li jêr Rêberîya Birayê wî Xalid Paša de bû, li nêzîka Altun Koprî de date bišikenadin û wî ew navaya date bitalankirin. Gava ku sipahê Elî Paša Walîyê Begdadê ji bona qada šer hate bigihaštin , šerekî germ û giran di navbera Herdu layan de li nêzîka Kerkukê de hate

bidadan, Leškerê Eb-Dul-Rehman Paša pîs hate šikenandin û wî xwe ji bona Derbenda Bazîyanê bi nav û bang ve date bikišandin.

Li paš vê biserkevtina hanê de Elî Paša Mîrnešînîya Imadîyê ji bona Mohemed Pašayê Celîlî Walîyê Musilê date bidan. Wî jî Xelat û diyarî ji bona Edil Paša Mîrê Imadîyê date binardin û wî ew li šûna wî de date bihištin.

Di sala 1223 k. de Edil Paša hate bimirin û ew ji bona ber dilovanîya Xwedê hate çûyîn û Birayê wî Zubêr Paša ji bona šûna w hate birûnitšin. Wî bi pêruniština Walîyê Begdadê Qubad Paša ji zindana Imadîyê date biberdan û wî keleha Zaxo ji bona wî date bidan. Belam Qubad Paša ji Imadîyê nehate biderkevtin û ew li wêderê de hate birûništin.

Di dawî de berberîyê û pevçûnê demekê di navbera Zubêr Paša û Numam Paša Waliyê Musilê de date bidestpêkirin. Vê berberîyê û pevçûnê pir xelk û Hevalbendên Herdu layan datin biêšandin. Weha careke din dujminatîya ji dema Behram Paša de ligel Malbata Celîlîyê Musilê de ji nû ve hate bigûrkirin[299].

Di dema ku Mîrnešînîya Badînan tûšî hêrîša Mîrê Soran Mohemed Pašayê Kor bû, Seîd Paša Mîrê Imadîyê bû. Seid Paša xwe li ber Mohemed Pašayê Kor de nikaribû bida bigirtin. Li šûna wî de Mohemed Pašayê Kor Birayê xwe Resul Paša bi serdarî ve li ser Imadîyê de date bidanîn.

Li dawîya linavçûna Mohemed Pašayê Kor de Ismaîl Pašayê Badînanîyê Serdarê Kevnî Akrê ji bona ser qadê hate biderkevtin û wî Mîrnešînî bi destên xwe ve date bixistin. Wî demekê Ostandarê Misilê Înce Bayer Iqdar Mohemed Paša date bidilnexweškirin û bitengavkirin û wî nedida bihištin, ku ew destdirêjîya nava Mîrnešînîya wî bide bikirin. Belam zor pê neçû, Serek Wezîr Mustefa Rešîd Paša bi Leškerekî ve ji bona ser Imadîyê xwe date rakišandin û wî Çardorî li ser Imadîyê date bigirtin û wî Ismail Paša date bigirtin.Wî ew ji bona Begdadê date binardin. Ew li wêderê de ji bona binê zindanê hate biavêtin û ew têde di

[299]Kurtîya ji Nivista: (Xeraêb El-Eser fî Hewadis Rubu El-Qern El-Salis Ešer-Šopên Sersurayî di rûdanên Çaremîna sedsalên Sêzdehemînî de, Yasîn El-Umrî, Musil, sala 1940 z. de)

sala 1259 k.- 1843 z. de hate bimirin. Weha bi vî rengi ve Mîrnešînîya wî bi carekê ve hate bilinavçûn.

## 22. Mîrnešînîya Dasnî

Li gora Insiklopêdîya Musulmantiye ev Ešîra Dasnî li herema Dihokê de bû û ev bajarê hanê bi destên wê ve bû. Li dawî de Mîrê Badînan Dihok ji Sinceqa Dasenî date bisitendin. Li paš de gava ku Šehrîyar Sulêmanê Qanînî ji bona vekirina Begdadê çû, wî serdarîya Hewlêrê ji Mîr Iz-El-Dînê Soran date bisitendin û wî ew ji bona Husên Begê Serokê Ešîra Dasenî date bidan û wî Mîr Iz-El-Dîn jî date bikuštin. Li dawîya mirina Sulêman Begê Soran Birayê Iz El-Dîn de tevaya Mirnešînîyê ji bona nava destên Husên Beg hate bikevtin.

Di wê navê de Yekek ji Nevîyên Mîrên Soran bi navê Mîr Seyf El-Dîn Kurê Mîr Husên ve li Hela Somaqeleq de rûništi bû, gava ku wî bihîst, Mirnešînyaî Soran bi Xanedaneke din ve hatîye bidan, ew ligel Husên Beg de bi šer û hera ve hate bikevtin. Li dawîya šerekî zor de wî Husên Begê Dasenî date šbiikenandin. Husên Begê Dasenî ji bona Istenbolê hate bibangkirin û ew li wêderê de li ser vê šikenandina hanê de hate bidarvekirin.

## 23. Mîrnešînîya Soran

Šerefname dibêje, ku Binemala Mîrên Soranî ji bona Mirovekî Begdadî bi navê Kewlos-Kolos têtе bivegerandin, yê ku ew Kurê Peyakî ji Maqulên Begdadê bû. Herçilol bû, ew ji bona hêla Ewanê hatibû û wî li gundê Hodiyan de Šîvanî dida bikirin.

Dr. Frech-Firêc dibêje, ku Peyva Kewlos-Kolos mîna Navên Erebî nayête biderkevtin. Lebelê ew peyveke Kurdî ye û ew ji bona wî Kesî têtе bigotin, yê ku Diranên wîyî pêšî hatine bikevtin, yanjî yê ku ew šaš û mašo bête bidîtin. Bi rasti jî bîr û bawerîya Dr. Frech-Firêc ji hiš ve nêziktir tête bidîtin.

Ev Kewlosê hanê Sê Kurên wî bi navên Isa, Ibrahîm û Šêx Idrîs ve hebûn. Isa Kurê wîyî gewre bû û ew zor aza, mezbût, Xwešrû û merd bû; jibervêjî ew zor xwešewist bû. Lihev hate birasthatin, ku di wan navan de Hinan xelk didan biêšandin. xelkên wan navan ji bona rizgarkirina xwe ji wan Kelešan hatin bineçarkirin, ku ew Isa bi Gewreyê xwe ve bidin bidanîn. Isa di demeke kêm de zor Kes li dora xwe de dane bikomkirin û wî li keleha Ewanê de date bidorlêpêçandin[300]. Di wê gavê wî ligel Hevalên xwe de li ser hinekan ji Taše Berdekî Sor beramber bi kelehê ve ji bona šer xwe didane bilikarxsitin. Liberxwedanên kelehê çavên wan hatin bitirsandin. xelkên kelehê ew bi navê Sorberde ve dane binavkirin. Li dawî de Nevîyên Mîr Isa bi Soran ve hatin binavûbangkirin[301].

---

[300]Di Šerefname de Kolos dibe, ku ew ji Kewlos hatibe û ew ji bi têgohiština bikevtina Diranên pêšî ve di wan navan de têtе biliberkevtin. Min bi guhên xwe ve evaya ji Kurdên wan navan di serdana xwe di Payiza sala 1947 z. de date bibihîstin.

Gtona Ewan hîç gûman têde niye, ku ew ji gotina Rewanê hatîye biderkevtin, ya ku ew niha bi keleh û bajarê Rewanduz ve têtе binavkirin. Rewan navê bajêre û Diz bi kelehê di hin Zaravayên Kurdî de têtе biderkevtin. (M. E.).

[301]Nivista Car sedsalên Dawîyî Iraqê dibêje, ku Surxab Beg Serdarê Erdelan Kurê xwe Behram Beg ji bona ser Rewanduz date binardin û wî ew date bigirtin. Behram bi Serdarê wê ve hate kirin. serdarîya Soran ji Behram Beg hatîye biderkevtin û ew Sêsed Salî hatîye bijîyandin.

Bi rasti jî Dr. Frech-Firêc jî dibêje, ku Kurekî Suxrab Beg bi navê Behram Beg hebû û ew di pêla Šah Tehmaseb de Mîrê Erdelanê bû. Mêjûvanê bi nav û

Mîr Isa di dawî de keleh date bizeftkirin. Wî mîrnešînîyek date bisazkirin, û wî demeke zor bi serxweyî ve date biserdarîkirn. Li dawîya mirina wîna de Šah Elî Begê Kurê wî ji bona cîgehê wî hate biruniština. Wî demekê li ser mîrnešînîyê de date biserdarîkirin û li paš de wî Mîrnešînîya xwe di nava Kurên xwe Mîr Isa, Mîr Bodaq, Mîr Husên û Mîr Elî de date biparvekirin. Ew bi xwe jî ve di keleha Herîr de hate bimayîn, ya ku ew ji piška Mîr Isa dihate biderkevtin.

Mîr Isa li paš de tûšî hêrîša Birayê xweyî Pîr Bodaq bû û ew hate bilinavçûn. Mîr Bodaqê Birayê wî ,ji bona cîgehê wî hate biruniština û wî Somaqeleq jî ji Îranîyan date bizeftkirin.

Šah Elî Begê[302] Birayê Mîr Isa Serdarê Šeq Abad-Šeqa Abad bû. Ew Mîrekî aza û zana bû. Da ku ew tola Birayê xwe ji Pîr Bodaq Beg bide bisitendin, ew ligel wî de bi šer ve hate bikevtin û wî di encam de ew date bikuština. Bere bere wî Hewlêr, Musil û Kerkuk jî ji Qizilbašan datin bizeftkirin û wî mîrnešînîyeke gewreyî bi nav û bang ve date bidamezirandin. Bi serxweyî ve wî ew date biserpereštkîrin. Gava ku wîna fermana Xwedê date bicîhênanîn, sê Kurê wî mabûn: Mîr Seyf El-Dîn, Mîr Iz-El-Dîn Šêr û Sulêman Beg bûn.

Mîr Seyf El-Dîn bê Donde hate bimirin; jibervêjî mîrnešînî bi destên Mîr Iz El-Dîn Šêr ve hate bikevtin. Vî Mîrê hanê Hewlêr bi navînîya xwe ve

---

bang Hammer li ser çûna Xusro Paša ji bona ser Hemedanê dibêje, ku Mîrê Erdelan û Soran di vê demê de Xan Ehmed Xan bû. Ji vê tête biliberkevtin, ku Mîrnešînîya Soran di Nîvê yekemî sedsalê Yazdehemînî Koçi de li jêr Siwana parastina Mîrnešînîya Erdelanê de dihate bidîtin. (bergê 9.).

[302]Dr. Frech-Firêc di Nivista xweyî Kurdler de di Rûpelê 260 de dibêje: ku wî Mîrê Soranî, yê ku wî Pîr Bodaq Beg date bikuštin, ew Mîr Sîdî Kurê ŠAh Elî bû. Wisajî ev Mêjûvanê hanê di Nista xwe de û di Rûpelê 250 de dibêje: "Šah Elîyê Soran Çar Kurên wî hebûn: Mîr Isa, Mîr Bodaq, Mîr Husên û MIr Elî". Di Rûpelê pišt de ew dibêje: "Mîr Elî Pîr Bodaq Beg date bikuštin". Heger weha bit,divê navê Mîr Sîdî bi šašî ve bête bidîtin. Gûman têde nîye, ku ev rûdana hanê di zemanê Šehrîyar Murdê Sêyem (982-900 k.de)de hatîye bidîtin.

Wer tête bidiyarkirin, ku Šah Elî divê Kurê Mîr Isa bête biderkevtin; cunke, Mîr Isa bes û bi tenha ve Du Birayên wî hebûn. Yek ji wan Ibrahîm bû û yê din Šêx Idrîs bû.

date bidanîn û wî demekê sermîyandarîya mîrnešînîya xwe date bikirin. Di wê navê de Šehrîyar Sulêmanê Qanûnî ji bona vekirina Begdadê hate biçûyîn. Gava ku ew bi wan nav ve hate bigihaštin, wî buxtaneke gewre lê date bikirin. Ew bi fermana Šehrîya Sulêmanê Qanûnî ve di sala 941 k.- 1534 z. de hate bigirtin û bikuštin.

Li dawîya kuština Mîr Iz-El-Dîn Šêr Šehrîyar Sulêmanê Qanûnî Hewlêr bi Husên Begê Dasenî[303] ve date bidan. Vî Mîrê hanê jî li dawîya demekê de li paš mirina Mîr Sulêman Šah Elî Beg de hemû Mîrnešînîya Soran jî bi destên xwe ve date bixistin. Belam li dawîya navekê de Mîr Seyf El-Dîn Kurê Mîr Husênê Kurê Mîr Bodaq Šah Elî Beg lê raser bû û li dawîya šer û herayeke zor de Mîrnešînîya Bavpîrên xwe jê date bisitendin

serdarîya Osmanî li Mîr Seyf El-Dîn de bînteng bû û wê Sultan Husên Begê Mîrê Imdayê û hin ji Mîrên Kurdên tir jî ji bona ser wî datin binardin. Belam wan xwe li ber wî de xwe nedan bigirtin. Di encam de wî bi gotina Gazî Qeran Yusif Begê Biradostî ve date bikirin û ew ji bona Istenbolê çû û wî xwe ji bona Bextê Šehrîyar Sulêman date biavêtin. Belam Šehrîyar lê nehate buhrandin û wî ew date bikuštin.

Li dawîya mirina Mîr Sulêmanê Kurê Šah Elî Beg de Qelî Begê Kurê wî ji bona layê Šah Tehmaseb çû; Gava ku wî dît, Husên Begê Dasenî Mîrnešînîya Soran ji xwe re date bizeftkirin. Belam li paš demekê de ew ji bal Šehrîyar Sulêman bi serdarê bajarê Semawe ve hate bidanîn. Li dawîya bidarvekirina Mîr Seyf El-Dîn de li Istebolê de xelkê Soran daxwaza lêbuhurandinê ji Šehrîyar dane bikirin, ku ew Qelî Beg bi Mîr ve li ser wan de bide binîašnkirin. Bi rastî jî ve Fermana Mîrîtîya mîrnešînîyê ji bona Qelî Beg hate binardin û Navçeyên Herîrê jî pê hatin bidan. Wî nêzîka Bîst Salekî sermiyandarîyek baš date bikirin.

Li dawîya Qelî Beg de Bodaqê Kurê wî bi Mîrî ve hate bikirin û wî du salekî bê šer û hera sermiyandarî date bikirin. Li paš de Sulêman Begê Birayê wî lê hate birastkirin û Bodaq Beg xwe li ber wî de neda biragirtin û ew ji bona layê Sultan Husênê Begê Mîrê Badînan hate biçûyîn. Li wêderê de hin yarmetî pê hatin bidan û di vegera wî de ew li Akrê hate bimirin

Ji Sulêman Begê Birayê wî re bê berber mîrnešînî jê re hate bisaxkirin. Ew Mîrekî dadwer û tudeperwer bû. Ew di demekê de bi

[303]Dasenî nav û nîšana Ešîra Dasenî-Tasenîyî Yezîdî ye. (M. E.).

leškerekî sêzdeh hezar Suwar ve ji bona ser Ešîra Zerza hate biçûyîn û wî ew date bišikenandin û bitalankirin. Vê Ešira hanê li Istenbolê de lê date bigilîkirin. Šehrîya Murad xwest, ku ew leškerekî bi ser wî ve bide rakišandin. Belam Sulêman Beg di wê gavê de ji bona ser Îranê hatibû çûyîn û wî talanekî zor ji bona xwe dabû hênanîn û wî ji wan hin diyarîyên baš ji bona Peyên Šehrîyar li Istenbolê de datin binardin. Li ser van diyarîyan de di sala 994 k. de wazî lê hate bihilanîn.

Li dawîya mirina Sulêman Beg de Elî Begê Kurê wî bi Mîrî ve hate bidanîn û ew ligel Xwedîyê Šerefname de hevdem bû. Šerefxan tanî zemane vî Mîr li ser Soran de dide biaxivtin. Li dawîya vêna de li Zîneta Mîrnešînîyê de bi wirdî ve lê nema hatiye bigerandin.

Xwedîyê mêjûwa Neîmayî Turkî dibêje: Di sala 1039 k. de, gava ku Serdar Xusro Paša ji bona Musilê hat, Mîre Begê Soran û Seyid Xanê Imadîyê bi Leškerên xwe ji bona layê wî hatin. Ji vê em têtin biliberkevtin, ku li dawîya Elî Beg de Mire Beg bi Mîrîtî ve hatiye bidanîn. Belam em zînet û dirêjbûna Mîrîtîya wîna nizanin.

Li gora Raportê Serpereštîya Ingilîzî de li ser Rewanduz de[304] Navînîya Mîrnešînîya Soran geh ew li Dewîn, geh ew li Herîr, geh ew li Kalîfan û geh jî ew li Rewanduz dihate bidîtin.

Wisa tête biderkevtin, ku Mîrên Soran li sedsalên Dehemînî Koçî de Navînîya wan Dewîn-Devîn bû û ew tanî mêjûwa sala 1143 k.- 1730 z. de li wêderê de hatine bimayîn. Li dawî de serdarîya Bebeyê-Babanê Sulêmanîyê ew dane bitengavkirin. Šekelî Begê Mîrê Soran Navînyîa serdarîya xwe ji bona Herîrê dayite biveguhestin. Sulêmanê Kurê wî li ser Šaxê Herîrê de kelehek sext bi navê keleha So ve date bidurustkirin û wî hin ji avanîyên din de li dû xwe de dane bihištin, ku wan kar ji bona zanistiyê dane bikirin. Di rojgarîya wî de Gewreyê Zanistvanan Šêx Heyderê Mayî bû. Sulêman Beg li Herîrê jî de ji destên Bebe nehate

---

[304]Derbarê zînetên serpereštiya Melbenda Rewadizê de di sala 1919 z. de Raportekî Ingilîzî hatîye binivîsandin û ew di sala 1920 z. de li Begdadê de hatîye biçapkirin Di wî raportî de Kurtîyeke mêjûwa Soran ji sala 1040 k.- 1630 z. de tête bidîtin. Ew Navê Begzadeyên Soran bi Mîran Beg ve dide bidestpêkirin. Ji vê wer têtê biderkevtin, ku Navê Mîre Beg, renge, ku ew navê Kurê Sulêman Beg be, ji bona Xanedana wî bi Nav û Nîšan ve hatîye bikirin. Tevî ku em Maka vî Raportê hanê jî nizanin, bi neçarî ve ji bona peyivandina li ser mêjûwa duwayî Soranî de divê em sûd ji xwe re jê bidin bigirtin.

birizgarkirin û wan ew zor dane bitengavkirin. Wî di Temenekî heftê salî de Fermana Xwedê date bicîanîn û ew li Herîrê jî de hate binijandin.

Li gora goyeke cihî de ev Begê hanê di demekê de di navbera wî serdarîya Begdadê hatîye bitêkçûn û ew hatîye bigirtin. Ew ji bona binê zindana Begdadê hatîye biavêtin û ew li wêderê de hatîye bimirin. Di wê Pêle de Xanzada[305] Xweha wî serpereštîya Mîrnešînîyê daye bikirin û wê pir Šopên Qencîyê li dû xwe de dayite bihištin.

Elî Begê Sulêman Beg berbestîya hêrîša Bebe pê nehate bikirin û wî Mîrnešînîya xwe di sala 1192 k.- 1778 z. de ji bona Gundê Kalîfan, yê ku ew li dola Alana de di ber devê Derbendê Rewanduzê de tête bikevtin, date bibirin. Li paš de Derbendê Rewanduz bi navê wî bi navê Gelîyê Elî Beg ve hatîye binavkirin. Wî li paš de ew li herdu Seran de beramber bi hev ve bi keleha Serderya û Serešeme ve date bisengînkirin. Herwehajî wi li nava herdu avên Rewanduz de li Balekiyan-Balekî jî de kelehek date biavakirin.

Li dawîya Elî Beg Ogoz Begê gewreyê Kurê wî bî Mîr ve hate bidanîn û wî navînîya mîrnešînîya xwe di sala 1201 H.- 1787 z. de ji bona Rewanduzê date birin. Bere bere wî serdarîya xwe ji bona nava Sîdekan, Hewdiyan, dešta Diyana date bigihandin û wî Ešîrên Filên wan navan jî ji bona jêr destên xwe dane bixistin.

Ehmed Begê Kurê wî jî mîrnešînîya xwe date bifirehkirin. Ogoz Begê Biçûkê Kurê wî jî li ser šuna Bave xwe de hate biçûyîn. Di zemanê Mîrîtîya Mustefa Begê Kurê Ogoz Begê Biçûk de ser li nû de šerê Bebe û Soran date bidestpêkirin. Bebe tanî demekê Navînîya Mîrnešînîy wî dabûn bidorlêpêçankirin û bi girtina wê ve wan ew dida bitirsandin. Belam Mustefa Beg di encam de leškerê Bebe date bišikenandin. Ew bi šûn wan ve hate bikevtin û wî kuštareke zor li wan date bikirin.

Li dawî de Mustefa Beg ji bona birîna vî šerê hanê Fatima Xanima Keça xwe ji bona Husên Begê Kurê Muhemud Pašayê Bebe date bidan. Li paš^vê Ašîtîya hanê de wî dest bi çakkirina mîrnešînyîa xwe date bikirin. Wî Teymurê Birayê xwe bi Serdarê Hevdîyan-Hewdiyan ve

[305]Niha Hotêlek nuh bi navê vê Šahzadeya Kurd ve li Havîngeha Šeqlaweyî bi nav û bang ve li Jêrî Iraqê de tête bidîtin. (M. E.).

(Herwehajî hêjî Kavilên keleha wê li nêzîka Hewlêrê de têtin dîtîn. Min Wêne û Filmê wê kelehê jî di sala 1993 de dane bigirtin. Cuma).

data bidanîn û wî Yehya Beg jî bi Serdarê Heremên Sîdekan û Biradost date bidanîn û wî Mohemed Begê Kurê xwe jî li šûna xwe de date bidanîn. Ew di sala 1242 k. de hate bimirin.

## Serdarîya Pašayê Kor

Mohemed li dawîya mirina Bavê xwe de herdu Mamên xwe dane bigirtin. Bere bere wî dest bi firehbûna mîrnešînîya xwe ve date bikirin.Wî Ešîrên Šêrwan û Biradust ligel Šorçîyan de ji bona jêr destîya xwe datin bihênanîn. Wî serdarîya Bebe ji Herîrê date biderperandin. Wî bajarê Hewlêrê date bizeftkirin. Wî Ešîra Dizeyî date bisertewandin. Wî Eltun Koprî, Koye û Ranye jî date bidagîrkirin. Wî Zeyê Koyê di navbera xwe û Baban de bi sînor ve date bidanîn.
Mîrza J. Bailie Fraser- C. Bili Firêzer di sala 1834 z[306]. de ji bona serdana Šino çûbû û wî pêla Mohemed Paša date bixwendekarîkirin. Wî ji raportê Dr. Ross-Ros, yê ku ew ji Begdadê ji bona dermankirina Mustefa Beg Bavê Mohemed Paša hatibû, kar ji xwe re jê date biwergirtin. Ew bi kurtî vê dibêje[307]: Mohemed Pašayê Mîrê Rewadizê mîna hemû Gewreyên

[306](Ji xwe re temašeyî Nivsta J. Baillie Fraser, Travels in kurdistan and Mosopotamia, Richard Bentley, New Burlington st. London 1840. bi Zimanê Ingilîzî bide bikirin. Herwehajî ji xwe re li hin ji wergerandina wêyê Erebî ji bal Cafar El-Xeyat, Çapxana El-Mearif, Begdad sala 1964, r. 10-61, Namaye Pêšî ji Ormiyê di 17 Çêrya Pêšîn û Nameya duwem ji Sulêmanîyê di yekemê Çerya Pašîn de bide bikirin. Di vê Gera wî de li ser Kurdistanê de ji bona vê pêla hanê pir agehdarîyên bi nerx û hêja têtin bidîtin. Her Gervanekî Zanistvan ji vê Nivista vê Gerê dikare ji xwe re pir bi bašî ve di Rewš û Zîneta Kurdistanê de û herwehajî di Zîneta Šehrîyarîya Osmanî û Šahînšahîya Iranê de baš dikare bête biliberkevtin. Wergerandina Erebî hemû Nameyên wî nedane wergerandin. Cuma).

[307](Min di wergerandina xwe de ji bona vî perçê hanê bêtir û bêtir pišta xwe bi wergerandina Cafer El-Xeyat, Begdad, sala 1964, Nameya Pêšî ji Ormiyê di 17 Çêrya Pêšî de, r. 10-28 dayite bidan; jiber di vir de tevaya Nameyê pir bi baši ve hatîye wergerandin. Wî tevaya Nivista wî mîna Naman ji bona Pîreka wî hatiye binardin.  Ev Perçê hanê di Dana Kurdî de niye.Cuma).

Kurdan desthilatîya xwe di pêšî de li ser dereveke biçûk de ji Kurdiastanê date bivedan. Ew pirî jîr û jêhatî bû. Dibêjin, ku rojekê wî bihîst, Birayekî wîyî šêrîn li berdilê wî de ji bona nava Baxekî bê destûra Xwedîyê wî sêvek[308] ji xwe re jê date bijêkirin. Paša bi lez û bez ve ji bona dû Birayê xwe date binardin û wî jê date bipirsîn: Te bi kîjan Destî Sêv dayite bijêkirin? Birayê wî jêre date bigotin: Min bi vî destê hanê ve min ew date bijêkirin. Wî cardî jê date bipirsîn, bi kîjan tilîyan te sêv date bigirtin? Wî got: Min ew bi van tilîyan ve ew date bigirtin. Wê gavê Mîr date bigotin: Divê ew bêtin bijêkirin. Wî destbicî ve tilîyên Birayê xwe dane bijêkirin. Bi rastî ve çîrokeke wisa jî li ser Nadir Šah Šahê Iranêyî Mezin jî tête bigotin.

Em dikarin hin ji agehdarîyên mêjûyîyî pêla vî Mîrê hanê ji Dr. Ross-Ros, yê ku ew Dektorê Baloxana Ingilîz li Begdadê de bû yê ku ew ji bal Mîr Mohemed Paša ji bona welatê Soran hatibû bixwestin, bidin biwergirtin. Ew dibêje: "Mohemed Paša ev Dektorê hanê ji bona dermankirina çavên Bavê xwe Mustefa Beg, yê ku ew hatibû bikorkirin, dabû bianîn. Kesekî ji Bêganan ji bil vî Dektorî û Serheng Tayler serdana vê deverê hêjî nedabûn. Ros ligel Beyazîd Beg Mamê Mohemed Paša de di 15 gulana sala 1833 z. de ji Begdê de berên xwe wan ber bi Hewlêrê ve dane bivekirin. Wî cudabûneke mezin di navbera Karmendên Turkan û Karmendên Mîrnešînîyê de date bidîtin. Wî bi herdû çavên serê xwe ve rewš û zîneta perîšanî û belengazîya xelkên gundîyên jêr destê Rida Paša Walîyê Bedgadê date bidîtin. Pir ji wan gundîyan ji gundên xwe dabûn bibarkirin û bivalakirin û yên mayî ji wanan di perîšanîyê û rebenyê de dihatin bijîyandin. Wan her gava ku rê ji xwe re bidana bidîtin, wan gilî û gazinên xweyî pir didan bipêskeškirin û biderxistin. Hergava ku wan hatina Karmendekî dewletê didan bidîtin, wan xwe jiber çavan didan bivešartin. Lêbelê ew bi destên gulan ve li bajarê Altun Kuprî de, yê ku di nava wî û Hewlêrê de pir gundên ava û xweš dihatin bidîtin. Ji bona pêšîya Bayezîd Beg dihatin bidîtin. Herwehajî gava ku ew ji bona Hewlêrê jî hatin bigihandin. Pêšwazîyeke pir mezin û hêja ji wan re hate bikirin. Di 19 gulana sala 1933 de Dr. Ros ji Hewlêrê ji bona Rewanduzê çû, yê ku ew nêzîka wê pêrgehî Mustefayê Pîr bû. Li paš bi rêkevtina

[308]Di koka xwe de ew di Rûpelê Gera Fraser-Firêser de di Wergerandin Cafer El-Xeyat de di çapa Erbî de li Begdadê de di sala 1964 de ew bi Hinar hatîye binivîsandin. Cuma).

çend demjimaran de di nava çîyayên bi daristan û pir avedan ve ew ji bona keleha Dum Dum hatin bigihaštin, ya ku ew Cî û Wargeha Mustefa Beg bû. Ji vê kelehê dešta Rewanduzê û Sengînîyên wêyî bi nav û bang ve dihatin bidîtin, yên ku ew demjimarekê ji keleha Dum Dum dihatin bidûrkevtin. Dum Dum keleheke biçûke û ew li ser Tehteke pirî bilind bi sengînî ve hatîye biavakirin û di pesarê wê de gundekî bi du sed malên Perîšan ve tête bikevtin, yên ku ew di nava dar û baxan de têtin bikevtin. Ji wêderê Rewanduz bi Du hezar ve dihate biderkevtin û ew mîna Gelehekê di navbera Çiya de Zabê Gewre dihate dîtîn. .... Rê bi Dr. Ross-Ros ve ji bona serdana bajarê Rewanduzê û gera dorhêla wê pê nehate bidan....

Di dawî de ew li ser Tude de dide biaxivtin, ku ew tištekî baš li ser vê Dunyayê de nizanin û cil û bergên perpitî û zivarî têtin bidîtin. Xanîyên wan mîna Axurên Berazan dihatin bidîtin... Cil û bergên dewlemendên wan mîna cil û bergên dewlemendên Begdadê bûn û Cil û bergên Perîšanên wan ji çûtikekî kin, šerwalekî hirîyî fireh û berdilkekê dihatin bipêkhatin.... Her roj êvarê šeš yanjî hešt gundîyan nanê šîvê li mala Mîr dida bixwarin.

Mîr Mustefayê Pîr hatibû bikorkirin û hîç derman jê re nedihate bidîtin. Hoyê korbûna wîna, mîna ku wî bi xwe ve didate bigotin, rojeke pir germ ew bi ser çîyê ve dihate hilkišandin û wî Berf li ser serê xwe de date bidanîn û ew li ser de hate razan...

Mîr Mohemed Paša Çar Birayên wî hene, lêbelê Du ji wan Yek Teymur Xan û yê din Sulêman Beg ji bal Mohemed Paša ji bona binê zindana kelehekê Pênç Demjimara dûr ji Rewanduzê hatine biavêtin. Birayê sêyem Ehmed Beg bû, yê ku ew Serdarê Hewlêrê bû. Birayê Çarem Resul Beg bû û ew Berpirsiyarê Supah bû.... Jiber nebûna Zarokên wîna Resul Bek bi Cîgirvanê wîna dihate bidîtin.....

Wer ji gotinên Dr.Ross-Ros tête biderkevtin, ku çûna wî ne bi dilê wî bû. Guhpêdan pir pê nehatîye bidan. Ew dibêje: "Serûštîya Kurd bi šer ve hatîye bisitirandin; jiber ku ew di dergûšên xwe de li ser šer de têtin bišîrkirin.... Ew pir bi çavekî nizim ve li serdarîya Begdadê û sipahê wê didin bitemašekirin. Ew dibêjîn, herger ku ji wan re bajar têde qazanc bihata bidîtin, dê Turkan di ruwên wan de ji bona vekirina bajêr nikarîbana bes rojekê bihatana birawestandin. Wan hin caran kês ji xwe re ji bona vekirina Hewlêr û Altunkuprî dane bidîtin. Bes û bi tenha ve vekirina Hewlêrê bêtir ji Demjimarekê pêve nehate bidirêjkirin. Ew pišta xwe ji bona pêwistîyên xwe bi hîç Welatekî ve ji bil welatê xwe pêve

nadin bigirêdan. Hemû Pêwistîyên wan di nava welatê wan de têtin biberkirin. Çiyayên wan zor ji bona liberxwedanê sengînin û ew zor li ber Bêganan Vekirvan de pir dujwar têtin bidîtin....".

Dorhêla Hewlêrê ji bal Paša ve ji bona Šêxên heremê ji bona hilanîn û bidanîna wan bi šêweyê derebegîyî cihî ve hatîye bidan. Herwehajî Ešîra Teyî Erebî jî li jêr destîya Paše de têtê bidîtin û ew jê re pir Peyan ji bona leškerê wi dide birêkirin, yê ku ew niha li hêla Akrê de têtê biwarkirin....

Mîna ku têtê bidiyarkirin, xelk ji Pašê didin bihejkirin, yajî ew jê têtin bitirsandin. Dibe, ku evaya ji sertbûna serdariya wîna têtê biderkevtin. Pir kêm li ser dizîyê de têtê bibihîstin. Hîç derîye ji tirsan diševê de nayête bidadan. Tevlivêjî de pir kêm di nava wan de tawankarîya bidarvekirinê têtê bicîanîn. Belê dest li ser dizyê de têtê bijêkirin û pê jî li ser reva ji Serbazîyê de têtê bijêkirin. Çavek yanjî herdu çav li ser tawankarîyên din de têtin biderkirin.

Rojekê ji rojan Šêxekî ji Šêxên Ešîra Erebîyî Tey[309] ji bona nava welatê Mîr hate bipenahidekirin, pîšti ku ew ji hêla xwe ji bona derbaskirina Diclê ji bal Ešîra Cerbayî xurt ve hate bineçarkirin. Ew li wêderê de bi xwešî û bextiyarî ve li jêr saya qanûn û yasayên Mir de hatin bijîyandin. Belam ew ji wê jîna xweš û bêdeng ha bibîntengkirin. Gave ku Kerwanekî mezinî dewlemend di ber Konên wan re hate biderbaskirin, av bi ser devên wan ve hate bikev. Ji niškêve wan xwe bi ser wî ve da bidadan û wan ew kerwanaya da biraw û birûtkirin. Belam di roja duwem de hêjî êvara wê nehatibû bidawîkirin, Nîv destekî ji Kurdan bê destur ji bona nava konê Šêx hatin biderbaskirin û wan serê wî bi bêdengî ve li ber devê kon de dane bijêkirin û ew careke din ji bona cihê xwe hatin bivegerandin.

Gava ku Dr. Ross-Ros li bajarê Hewlêrê de bû, ew Mêvanê Birayê Mîr Ehmed Begê Mîrê Serdarê Hewlêr bû û jê re pir rêz û hêjabûn lê hatin bigirtin. Li wêderê de Sultan Beg Ehmed yekek ji Serokên Serbazan ji bona serdana wî hat û wî date bizanîn, ku leškerê Pašê ji panzdeh tanî bîst hezar Serbazan têtê bipêkhatin û ew li Akrê de bi bê karî ve dihatin biwarkirin; jiber ku wan ew berî demekê dabû bigirtin....Paša bi xwe ve

[309](Weha li nik Fraser-Firêser de di Dana Wergerandina Erebî de, r. 21 de hatîye. Herwehajî hemû Pereçên tên jî ew jî ji vê Dana Erebî têtin biwergirtin. Cuma).

rêberîya Leškerê xwe ji bona hêrîšê date bikirin û wî keleh di nava sê demjimaran de date bigirtin, pištî ku wî bes û bi tenha ve sed û pêncî Serbaz dane biwindakirin. Kurdên Imadîyê ji vê hêrîša xurt û ji nivškê hišên xwe ji serên xwe dane biberdan û wan cih bi bê šer ve dane bivalakirin.

Di roja 30 gulanê de nameyek ji Paša hate bigihaštin, ku ew têde bi mana Dr. Ross-Ros ve li Hewlêrê de dide bifermankirin, tanî ku ew wî bide bixwestin. Herwehajî divê ku jêre pir rêz û hêjabûn bête bigirtin. Vê hišt, ku zîneta jiyan û bênvedana wîna bête bibaškirin. Di 6 axle^vê de xeber hate bigihandin, ku zînet li Imadîyê de hatin bisafîkirin. Seyid-Seid Paša dev ji Cihê xwe date biberdan û Musa Paša ji bona Cihê wî hate bidanîn. Herwehajî Selîm Paša ji bona li ser Akrê hate bidanîn; jiber ku tevaya welatê Badînan ji bona jêr desthilatîya serdarîya Rewanduz hate bikevtin, her tišt bi careke ve hate bibêdengkirin...

Di dawî de di Sê Yulyo-Temûzê[310] de fermana Paša ji bona binardina Dr. Ross-Ros ji bona Baregeha wîyî Leškerî li Akrê de bête bigihandin....Dr. Ross-Ros ligel wî de hate civandin û ew li ser wî de dibêje, ku ew nêzkîa çil û pênc salî tête biderkevtin. Ew Mirovekî dirêjî lihevhatî ye. Ew pir ji qencîyê dide bihezkirin. Ew rusipî ye û nîšanên Xurya li ser ruwê wî de têtin bidîtin. Çavekî wî kor bûye û ew hatîye bikûrkirin. Rêya wî Duwanzdeh Bosa dihate bidirêjkirin. Ew qehwerengekî sivik bû. Jêrî wê nehatibû bišehkirin; jiber vêjî ew di nava hev de hatibû bibadan. Cil û bergên wîyi din bi rêk û pêk bûn. Lingekî wî dihate kulandin; jiber ku ew ji bal Hespekî xwe ve hatibû pênandin. Ew bi dengekî nizim ve dihate peyivandin. Ew ligel Dr. Ross-Ros de bi dûr û dirêjî ve  çend caran li ser Danavên gištî de hate biaxivtin. Wî pirsa šeweyê Xwendin li Ingilistanê de, Oldarîya Tudên Hindistan û Çênê jî jê date bikirin....Wî dixwest, ku ew Pêwendîyên me ligel Iran û Rusa bide binaskirin. Herwehajî wî pir caran pirsa pir tištan dida bikirin, mîna çawa bi karanîna dermanan û kêrên têtin bikirin. Çawan lê dana dil di nexwešîyê de têtin bidîtin. Çawan mirina Reš û Kolêra têtin biberam-

[310](Di Wergeradina mêjûwa Kurd û Kurdistana Erebî de, r. 409 ,410 Mêjû ligel Wergerandin Fraser-Firêserî Erebî de, r. 22 de nayêtin bilihevderkevtin. Min mêjûwa Wergerandin Frseri-Firêserî Erebî dayite biwergirtin; jiber ku ew wê rastir didim bidîtin. Cuma)

berkirin û bidermankirin. Li paš de ew ji bona ser pirsên ceng û šer hate biveguhestin....Ew berî biderkevtina ber beyanê bi carekê ve nedihate birazan; jibervêjî ew tanî Demjimara Neh yanjî Dehê Berî Nivro dihate birazan.

Hêza wîyî çekdarî li kar de, mîna ku Dr. Ross-Ros date bizanîn, bi deh hezar Mêr ve dihate biderkevtin. Ev jî Nîvê wê dihate biderkevtin; jiber ku wî Peyên xwe destura wan ji bona malên wan dabû bidan, da ku ew paleya xwe bikaribin bidin bikirin. Di bargeha wîyî sipahê de hîç rêk û pêkî di nava sipahên wî de nedihatin bidîtin. Bes û bi tenha ve rêk û pêkî di nava bazinê kombûna çadirên biçûk de di dorhêla çadira Pašê de bidîtin. Di nava wan çadiran de Ss hezar Pasevanên wîyî taybetî dihatin bidîtin, yên ku ew herwehajî di wê demê de bi xwe ve jî navmalîyên wî bûn. sipahê wî Peyedar bi tiving û xenceran ve dihatin biçekkirin û sipahên wîyî Suwarî bi rim û xenceran dihatin biçekkirin. Her Serokekî Êlekê bi tenha xwe ve çadirên Êla wî li dor û berên wî de hatibûn bivedan. Vî šêweyê bivedana Çadiran sipehîbûna Supahgah dida binaširînkirin, belam li gora rêzanîn Supahîyî Ewropî de Jimara wî wer bi Pêncî hezar Mêr ve dihate biderkevtin. Lêbelêjî tevnebûna vê rêk û pekîyi jî bê dengbûnê xwe li ser Supahgah de dabû bipošandin. Herwehajî her Mirovekî dikaribû di nava pênc deqîqan de ji bona cihê xweyî nîšakirî bihata bigihaštin. Mirovan jiber xwe her roj xwe fêrî Rimbaziyê û lêdana nîšanê didan bikirin. Her êvarî ji Sed tanî Du Sed Serbazî ji Ešîrên cuda de di nava Konê Pašê de dihatin bišîvkirin. Di nava Supahgeh de hin ji Dilîlên bestandî bi zincîrên hesin ve di host û lingên wan de dihatin dîtîn. Dr. Ross-Ros dibêje , Ku paša her gav tevaya talanîyê û bidestkevtîyên Cengê bi buhayê Du qatî ve dida kirîn.

Di roja 8 Yulyo-Temuzê de Dr. Ross-Ros dev ji Supahgahê Pašê date biberdan û wî rêya Musilê date bigirtin. Wî li alîyê dinî Zab de Sed Suwarên Ereb ji Êla Bavê Sulêman bidîtin, ku ew likarin, da ku ew ligel wî de di nava welatê Mîrê Rewanduzê bêtin biçûyîn. Wî ji wan re got, ku ev Sed Suwar ji bona ligel çuna wî de zorin. Belam Serokê van Siwaran ew date biliberxistin, ku Fermanên Mir li ser wî vê jimarê didin bineçarkirin û ew nikare dev ji Yek Mêrî bide biberdan. Dr. Ross-Ros ji xwe re kês date biwergirtin, ku ew di navbera cudabûnên rabûn û rûništinên Karmendên vî Pašê hanê û Karmendên Turkî de bide biderxistin. Di wê bêhna ku ew ji bona nava xakê jêrdestîya Osmanî hate bikevtin, ew bi daxwaza bexšîšan hate bibarandin. Wan ew ji tevaya

hilgirtîyên wîna dane bitazîkirin û hêjîbêtir wan Xûrîyan tanî vihê rûniština wî jî dev jê nedan biberdan. Wan her û her bêtir je didan bixwestin. Lêbelê di nava welatê Rerdarîya Rewanduz de hîç bexšiš nedihate bidîtin. Weha Dr. Ross-Ros di navbera hemû alîyekî ji alîyan de di navbera serdarîya Elî Paša di Begdadê û serdarîya Mîr de date bikirin. Wî bašbûn bi serdarîya Mîr ve date bidan. Wî date biderxistin, ku hemû peyvdarîyên bêbextîyê bi eškere ve beramber bi Elî Paša têtin bigotin. di gava ku di hemû layekî de pesin û šabašî ji tevan bi eškere ve ji bona Mîr tête biderxistin.

Tanî vî sînorê wisa ez dê dev ji hatinên di rojên Dr. Ross-Ros de bidim biberdan. Lêbelê hemû agehdarîyên, yên ku ew ji bal piranîya Mirovên agehdar ji min re hatin bibigotin, ligel piranîya dirêjîyên hatinên rojanên Dr. Ross- Ros de têtin bilihevkirin. Kesîtîya Mîr û Sincîyên wîna di karên wî de têtin biderkevtin. Ew bê sînor bi dilbijok ve tête bidîtin û ew guh bi rêyên bigihandina mebest û dilbijokîya xwe nade bidan; jiber bi her awayî ve ew dixwaze, ku ew bi mest û dilbijoka xwe ve bête bigihaštin Ew pir jîr, zikreš û gûmankirî tête bidîtin. Tevî dadwerîya wîyî bi rastî ve, ya ku ew hîç ji šelavîyê nade bihezkirin, ew bi bîr û bawerîyên xwe ve dide bigaltekirin, da ku ew bêtir û bêtir dilbijandinên xwe bide bitêrkirin. Hêjî bêtir ew mêldarê rijandina xwînê niye, ku Mirov bi hovitî û dirî ve yanjî bê hoyî bêtin bikuštin. Tevlivêjî ew nade bidilovanîkirin, tev li giringbûna wê jî gava ku pêwistî vê jî bide bixwestin. Tête bigotin, ku Êlekê ji Êlên Kurdan bi xurtî ve šerê wî di dorlêpêçana Imadîyê didane bikirin. Li paš girtina Imadîyê jî de wan dev ji šerê xwe ligel wî de nedan biberdan. Wî sipahê xwe bi ser wan ve date birakišandin. Wî zora wan date bibirin. Wî her Mirovekî ji wan bi destên wî ve hate bikevtin, wî ew dane bikuštin. Weha jimara Kuštîyên wan bi hezaran ve hate bigihaštin. Wî ev karê hane date bikirin, da ku ew xelkên din jê bide bihîn û bifrêkirin.

Bes û bi tenha ve kîna Mîr ji bona wan Bêganan dihate bigihandin, yên ku ew bê diyarbûna kar û barên xwe jê re di nava Welêt de dihatin bigerandin. Lêbelê Bazirgan, Barkêš û xelkên welatên dorhêla wî bê pasport di nava welatê wî de dihatin û diçûn. Belam Mirovên ji dûrhatî û bi taybetî ve ji wan welatên, yên ku wan rojekê ji rojan dujminayetî beramberî wî dabûn biderxistin, divabûn ew bihatina bigirtin yanjî bizindankirin û li wan de mîna bêbextan bihata bitemašekirin. Min ji xelkê date bipirsîn, magelo dê çi bi serê min ve bête bikirin, ger ku ez bê biwergirtina destûrê ji bona nav Welêt bêtim çûyîn? Berseva tevan li ser

vê pêrabûna hanê de dihate bidan, ku ev pir bi dînitî û kurtbînî ve tête bidîtin; jiber ku ew Mirovekî bedreman tête bidîtin. Dibe, ku ew min bi bêbext ve bide bidanîn û ew reftareke xerab ligel min de bide bikirin; jiber ku ezê ji bona nava Welat di Rêya Tebrîzê de bihatama bikevtin. Gava min bi xurtî ve xwest, ku ez bizanibim, bê ka ew dê çi reftarê ligel min de bide bikirin. Wan ji min re gotin: dibe, ku tu di cihekî pir sengîn de bête bigirtin, tanî ku Mîr ji min çi tištê bizanibe, ji xwe re bide biwergirtin. Li paš de dibe, ku ew te ji bona Derveyî Welêt bide biderkirin, bêyi ku tu hîç tištekî ji Welêt bide bidîtin. Dibe, ku tu sertîyekê di nava welatê wî de beramberî xwe nede bidîtin; jiber ku ew naxwaza nav û bangê xweyî baš bide bixerakirin. Lêbelê dibe, ku tu di rêya biderkevtina xwe de ji welatê wî ji bal Çetan bête biêšndin. Evaya jî bi rastî jî pir bi hêsanî ve dibe bête bikirin; jiber di Welatekî wehayî tevlihev de bê ser û binî karên wetov pir bi hêsanî ve dikarin bêtin bikirin.....

Lêbelê daketina wî ji ser serdarîya pir bêtir cîhê gûmanê lê tête bikirin. Hin dibêjin: ku ew bi darêzorê ve ji bal Kurê xwe hatîye biavêtin. Herwehajî Hinekî din dibêjin, ku wî date bibawerkirin, ku dê Kurê wî jê Mezintir bête bidîtin; jibervêjî ve Kalê pîr bi dilê xwe ve dest ji Serdarîyê date biberdan û wî xwe dûrî kar û dilbijandinên vê dunyayê date bikirin û wî Kurê xwe li šûna xwe de date bîcîkirin. ... Mohemed Paša cihê pîyên xwe bixurtî û sertî ve date bigirtin. Tevaya Serdarîyê di bajarê wîyî Rewanduzê de bi carekê ve jê re hate bideskevtin. Wî dest bi xurtbûna desthilatiya xwe ve date bikirin û wî xelk li dor û berên xwe de ji bona šerên hatî de dane bikomkirin. Lêbelê vejandina wîna bi cenga di navbera Îran û Rusya de date bidestpêkirin; jiber Šahzadeyê Cihgirê Šah hate bineçarkirin, ku ew hêz û hinerên xwe ji bona beramberkirina dujminekî bi tirstir li ser welêt bide bikišandin, yên ku wî ew ji bona nabûdkirina Mîr bi serhevdû ve dabûn bikomkirin. Mîr ji vê kêsa hanê kar ji xwe re date biwergirtin, nebes tenê wî heremên, yên ku Šahzadeyê Îranê ew jê dabû bibêpišk û bibêparkirin date bigirtin, lêbelê jî wî heremên Rojava û Jor jî dane bigirtin. Wî bi vî corî ve dikarî bû, ku ew piranîya Bešê gewreyî Jorî Nava Herdu Çeman bide bigirtin. Herwehajî pêrejî wî tevaya deverên dirêjkirî ji Hewlêrê tanî Kerkukê di alîyê Rojhilatî Diclê de date bizeftkirin.

Bi rast û durustî ve niha bêtir ji pêncî hezar Mêr di bin jêr destîya wî de têtin bidîtin. Bêtir ji nîvên wanî baštir ve bi rêk û pêkî ve mehanên wan ji wan re têtin bipêškeškirin û ew bi rengehî hergavî ve têtin bikaranîn; jiber ku ew wan hêjî ji bona vegirtina Heremên Sengîn li ser wî

de dide bikaranîn. Weha bi vî rengî ve welatên jêr destên wî bi lez û bez ve têtin bifirehkirin. ...Nîvê dinî Leškerê wî ji Peyên Ešîran dihate bipêkhatin".[311]

Walîyê Begdadê Elî Rida Paša beramber bi hêz û hinera Mîrê Kor ve hîç pê nehate bikirin. Ew neçar bû, ku ew ligel wî de îšê xwe bi šîrînê ve bide birandin. Ew bi serdarîya wî ve hate birûništin û wî nîšana Mîrê Mîran jî ji Istenbolê jê re date bisitendin.

Di sala 1249 k.- 1833 z. de Mohemed Paša Leškerekî baš û bi rêk û pek ve date pêkanîn. Wî bi dilbijandina Musa Pašayê Badînan ve jê re ruwê xwe ber bi Badînan ve date bivedan. Li dawîya çend šerekî de ligel Ismaîl Pašayê Badînan de wî Akra date bigirtin û ew li wê de ji bona ser Imadîyê hate biçûyîn. Wî Seîd Pašayê Serdarê wê date bidîlkirin û Bajar jî date bizeftkirin. Li paš de wî ruwê xwe ber bi Yezîdîyên alîyê Bašiqî ve date bivekirin. Wî kuštareke zor li wan de date bikirin. Wî Elî Begê Serokê wan jî date bigirtin û wî ew ji bona Rewanduzê date binardin û wî ew li wê derê de du salan date bizindankirin û li paš de wî ew date bikuštin. Bi goyekê ve ew li vê derê de wî ruwê xwe ji bona Cezîra Ibin Umer date bivedan û wî Mêrdîn û Nesêbîn jî li Bedirxanîyan de date bizeftkirin.

Bi kurtî ve Mohemed Pašayê Kor di demeke pir kêm de wî gelek welat dane bidagîrkirin. Ji Ranyê û dešta Pišder tanî Nisêbîn û Mrêdînê û ji Kelešînê tanî Mexmurê serdarîya wî dihate bikirin.

Bi vî rengî ve bi serkevtin û xurtbûna Mohemed Pašayê Kor serdarîya Osmanî date bitengnavkirin. Sultan Mehmud Serek Wezîr Mustefa Rešîd Paša bi leškerekî zor ve ji bona ser wî date binardin û wî Elî Rida Pašayê Begdadê û Mehmud Pašayê Musilê jî ji bona alîkarîya Rešîd Paša datin bikarmendkirin.
Gava ku Mîr Mohemed Paša wisa zanî, wî xwe ji bona Rewanduzê date kišandin. Wî li wêderê de xwe ji bona liberxwedana xwe date bilikarxsitin. Leškerê Serek Wezîr li dawiya bizeftkirina Badînan de ruwê xwe ber bi Rewanduzê ve date bivekirin. Elî Rida Paša û leškerê Musilê jî

[311](Bigir tev de ji Nameya wîyî Pêšî ji Ormiyê di 17 Çêrya Pêšîn de di sala 1834 de, r. 10-28, ji Nivista Wergerandina Erebî, Çapa Begdadê sala 1964 de hatîye biwergirtin. Ez hêvîdarim, ku ez dê rojekê jî Nameyên wîyî Taybetî, yên ku ew bi Kurdan ve têtin bigirêdan, bidim biwergerandin.Coma).

berên xwe ber bi Hewlêrê ve datin bivedan. Bešekî zorî leškerê Serekwezîr û Elî Rida Paša ji Ešîrên Kurd bûn Ev Herdu Orduwên hanê li Dešta Herîrê de berengarî hevdû hatin bikirin. Mîr Mohemed Paša Gelîyê Elî Begê dabû bigirtin. Serekwezîr ligel wî de date bidan û bisitendin. Wî ew ji bona Xwînrijandina Musulmanan û biderkevtina ji fermana Xelîfe date bizinharkirin û wî girawkirin pê datin bidan. Li ser van de Mîr Mohemed Paša xwe ji bona ber destên Mustefa Rešîd Paša date berdestkirtin. Ew ji bona Istenbolê hate birin û li wêderê de lê hate buhurandin û ew hate bivegerandin. Belam li ser nivîsîna Elî Rida Pašayê Begdadê ew di sala 1253 k. de li rêya Terabzûne de hate bigirtin û bikuštin[312].

Li dawîya Mîr Mohemed Paša de Ehmed Begê Birayê wî bi Serdarê Soran bû û Resul Pašayê Birayê wî jî bi Serdarê Imadîyê bû. Ehmed Paša li duwayî Du salan de ji bal Kurmamên wî hate bikuštin û

[312]Gava ku Mêcer Milington di sala 1870 z. de ji bona Wanê hate çûyîn, Resul Paša li wêderê de Walî bû. Wî jê re biserhatinên Birayê xwe bi vî rengî ve da biveguhestin: "Li nêzîka sala 1834 z. de bû, ku Mohemed Paša xwest, ku ew welatê xwe ji nava destên serdarîya Osmanî bide birizgarkirin û ew wî ji bona jêr serdarîya Xanedana xwe bide xis. Mohemed Paša nîšanên Vekirvan û Serpereštvan di xwe de didan bikomkirin. Wî dikarîbû bi Ordowê xweyî Kurdî ve welatên Dirawsên xweyî Kerkuk û Musil jî ji bona jêr desthilatîya xwe bide anîn. Resûl Paša bi xwe jî ve Komandarê Leškerê wî bû û herwehajî ew Šûngîrê wi bû. Dergehê Bilind Leškerek li jêr Serpereštîya Rešîd Pašayê Ser Serbaz de, yê ku ew Dostê Mohemed Paša bû, ji bona ser wî date binardin. Belam Serdarîyê dixwest, ku ew vê heraya hanê bê šer bide birîn. Li jêr perda dostanîyê de Bêbextî li Mohemed Paša de hate bikirin. Mohemed Paša ji bona nava dafên Bêbextîyê hate bikevtin û ew ji bona gift û goyê ji bona Baregeha Rešîd Paša hate çûyîn. Belam ew hate bigirtin û ew ji bona Istenbolê hate binardin. Šehrîyar zor rêz û hêjabûn jê re date bikirin. Dergehê Bilind date bibiryardan, Ku Mohemed Paša bi Walîyê tevaya Kurdistanê ve bête bidanîn û Desthilatîyên pir mezin jî pê hatin bidan.Bi vî soz û biryarê ve ew suwarî Kešteyeke Cengiyî Turkî hate bikirin û ew ji bona welatê wî hate binardin. Eve Sî û Pêc Salin, ku Mohemed Paša li Istenbole de hatiye biderçûn. Belam ew hêjî bi welatê xwe ve nehatiye bigihaštin. Li hîç cihekî de Kesekî ew nedaye bidîtin. Xwedê dizane, bê ka çi bi ser wî û Pênc Peyên wî ve hatîye bikirin.

Li dawîya Mohemed Paša Resûl Paša bi xwe û Leškerê xwe ve xwe date biberdestkirin. Navekê ew li Begdadê hate daništin. Li šerê Qirim-Kirim de wi serdarîya Leškerekî Suwarîyî Kurd dida kirin. Wî di wî ešrî de karên mezin dane kirin. Li dawî de Serdarîyê ew bi Ostandarê Qarsê ve date bidanîn û li Paš de ew ji bona Ostandarê Wanê hate biveguhestin". (Jiyaneke Hoviti di Kurdistan de, r. 85).

Sulêman Begê Birayê wî bi Mîr ve hate bidanîn. Belam bi hoyê bêkarîbûna wîna ve bes šeš mehan tenê Mîrîtî pê hate bikirin. Li paš navekê de û li ser hêvkirina xelkê de û bi alîkarîya Serdaryê ve Resul Paša ji Imadîyê hate bihatin û wî mîrnešînî bi destên xwe date bigirtin. Li dawîya heft salan de bi bê dengî û aramî serdarikirin, dewleta Osmanî li ser nedana Perên Mîrîtî Leškerek bi ser ve date rakišandin. Li dawîya Du šeran de li Dêre û Xeliîfan de wî xwe ji bona Rewanduzê date gišandin. Li wêderê jî de li ser tengavkrina dewleta Osmanî hate bineçarkirin, ku ew ji bona Šino bête biçûyîn. Pênc salekî li wêderê de ew ma. Mîrnešînîya Soran jî mîna Melbendekê rast û rast bi jêr serdarîya Osmanî ve hate bikevtin. Li dawî de û li ser hêvkîrina Cîgirê Šahê Îranê de ji bal dewleta Osmanî de lê hate buhurandin. Ew ji bona Begdade hat û ew li wêderê de hate bidaništin û jê re ji bala Serdariyê Mehane 7500 Qurûš jê re hatin bidanîn. Li šerê Qirim-(Kirim ji 1853-1856 z. de Cuma) di navbera dewleta Osmanî Rus de ew ji bona xebatê çû. Ew li Erzeromê de bi Komandarê Hêzên Esîrên Kurdî û Hêznê Alîkarên Turkî bû. Ew di sala 1275 k. de ji bona Begdadê hate bivegerandin. Li dawîya çûna Hicaz û Istenbolê de ew bi Ostandarê Wanê ve hate bidanîn. Li dawîya Sê salan de ew ji bona Erzeromê hate çûyîn û ew ji xwe re li wêderê de hate bidanîtšin. Di sala 1301 k. de ew li wêderê de hate bimirin.

## 24. Mîrnešînîya Baban

Šerefname Bebên-Babanên Kenar li Iranê de cihên wan dide bidîtin. Ew dibêje, ku Danevanê vê Binemala hanê Pîr Bodaq bû. Wî bingehê Serdarîyeke gewre û xurt date bidanîn, gava ku wî welatê Larcanê[313] ji Ešîra Zerza û welatê Soran ji Ešîrên Šîwê[314] date bisitendin û wî Heremên Mešyagerd û Soldoz jî ji Qizilbašan date bizeftkirin. Navnîšana vî Mrî hanê Bebe-Baba bû; jiber vê jî tevaya vê Binemalê jî bi Bebe yanjî bi Baban ve hate binavkirin. Li paš naveke de li nêçrê de ew ji bal Mîr Sîdî- (renge, ku ew Kurê Šah Elî be) Serdarê Soran hate bikuštin. Pîr Bodaq Kurdûnde bû; jibervêjî Birazayê wî Bodaq Beg Kurê Restem ji bona cihe wî hate birûništin. Li dawîya biserdarîkirina du salan de yekekî ji Peyên wî bi navê Pîr Nezer ve jê Mîrnešinîya wîna date bizeftkirin. Li dawîya mirina Pir Nezer de welatê koka Mîrnešînîyê ji bona Destên Mîr Sulêman hate bikevtin û Mayîna welatê Mîrnešînîyê din jî ji bona nava destên Mîr Ibrahîm hate bikevtin.

Van herdu Mîran di demekê de bi ašîti ve her kesekî di nava welatê xwe de serpereštî dayite bikirin. Belam di dawî de di nava wan de hate têkçûn. Mîr Sulêman Mîr Ibrahîm date bikuštin û wî Bešê welatê wî jî date bidagîrkirin. Wî yanzdeh salan serdarîya herdu layan date bikirin. Mîr Sulaman Çar Kur û Mîr Ibrahîm Sê Kur li dû xwe de dabûn bihištin. Ev Mîrnešînîya hanê di navbera van herdu Xanedanan de her dem û her gav di nava šer û pevçûnan de dihate bidîtin. Di dawî de di pêla Šehrîyar Sulêmanê Qanûnî de (ji 926-974 k. de) Senceq-Melbenda Merge bi destê Xidir Beg ve mabû. Ev Xidir Beg navê Mendalekî Kurê Mîr Husên Kurê

---

[313]Ew di navbera Rê û Teberistana Kevnar de Navînîya Heremekê bû.

(Renge, pêwendîyek di navbera vê Navînîya dûr de û Danavê de neyête bidîtin. Belam bi rastî ve tê bidîtin, ku ev peyva hanê ji Lahîcan (Lacanê Cuma) hatîye biveguhertin. Bi rastî Lahîcan li herema Saceblaqê tête bikevtin, ya ku ew jî bi cihên Zerza ve tête bidîtin. (M. E.).

[314]Wer di koka xwe de ev hatîye binivîsandin, belam ew wer di Šerefname de hatîye binivîsandin: "Wi Sîwê û Mešagerd ji Soran û Wilayeta Seldoz ji Qizilbašan date bisitendin....hd..(M. E.).

Sulêman Beg bû. Li dawîya mirina vî Xidir Begê hanê de Xanedana Sulêman Beg bi carekê ve hate bilinavçûn[315].

### Mîrnešînîya Bebeyî Dawî

Dibêjin, ku binaxeyê vê Mîrnešînîya hanê ji bal Feqe Ehmed hatîye bidanîn û ev Mîrê hanê ji Malbata Soran bû  ew ji Ešîra Nur El-Dînîyî Pišder bû. Derbarê biserguzešte vê Mirovê hanê hin goyên nav Pišder têtin bidîtin. Bi kurtî ve Feqe Ehmed gelek Kes li dor û berên xwe de dane bikomkirin û wî nav û nîšana Bebe bi xwe ve daye bidan û bere bere wî hêz ji xwe re dayite bipeydakirin. Li duwayî de Sulêmanê Bebeyê Kurê wî cîgehê wî ji xwe re dayite biwergirtin û ew bi danîvanê koka vê mîrnešînîyê ve hatîye bidanîn. Ew zor aza û bi rêk û pêk bû. Wî ji sistî û bêkarîya serdarîya Erdelan de ji xwe re date bikarkirin û wî di sala 1106 k.- 1694 z. de hin cîgeh ji Erdelan date bidagîrkirin. Belam di sala duwayî de Leškerekî zorî Îran û Erdelan ji bona ser wî xwe dane birakišandin. Ew hate šikenandin. Li dawîya vêna de Sulêman Beg ji bona Istenbolê hate çbiûyîn. Li paš navekê de ew bi Ostandarê Edernê ve hate bidanîn û ew li wêderê de di sala 1115 k. de hate bimirin.

Li dawîya Sulêman Beg de bešekî ji xakê Bebe bi destên Ešîra Zengene ve hate bikevtin û bešek jî bi destên Kurên Sulêman Beg ve hatebi bimayîn.  Ji van Kuran Bekir Beg hate biserkevtin. Wî bere bere welatê Bebe date bigewrekirin û wî sînorê xwe ji Çemê Sîrwanê tanî Zeyê Koye date bigihandin.

Wer têtе bidiyarkirin, ku Bekir Beg çavên xwe ji bona vekirina Kerkukê dabûn biavêtin; jiber vê jî ew ligel serdarîya Osmanî de hate têkçûn, Leškerê Begdadê ji bona ser wî hate binardin û w di sala 1129 k. de hate bikuštin. Pênc salan xakê Bebe li jêr serpereštîya serdarîya Osmanî de hate bimayîn. Di wê navê de Xane Pašayê Birazayê Bekir Beg hêdi hêdî ligel serdarîya Begdadê û Peyên wî de hate birêkkevtin. Di sala

[315] Li gora agehdarîyên goyên Šerefname de divê Xanedana duwemî Bebe di bidestpêkirina sedsalê Yanzdehemînî Koçî de hatibe linavçûn. Xanedana Sêyemî Bebe di dawîya sedsalê yazndehemînî koçî de û ew li Fiqe Ehmed de hatîye bipeydakirin. Li gora vêna de di navbera Xanedana Mîr Sulêman û Feqe Ehmed de bes û bi tenha ve demek Šêst Heftê Salek têtе bidîtin.

1134 tanî radeyekî wî welatê Bebe ji bona jêr serdarîya xwe date bihênanîn

Xane Paša ligel Hesen Pašayê Walîyê Begdadê de ji bona šerê hate biçûyîn. Beramber bi vê çûna hanê ve mîrnešînîya Erdelanê bi ser mîrnešînîya wîna ve hate bivekirin. Di šerê Ešref Xanê Efxanê û leškerê Osmanî de di sala 1139 k. de wî layê Ešref Xan date bigirtin û ew bi hoyê šikenandîna Leškerê Turk ve hate bikirin. Tanî destpêka pêla Nadir Šah Erdelan di destên wî de mabû û welatê Bebe jî bi destên Xalid Pašayê wî ve mabû. Di zemanê Xalid Paša de Mîrnešînîya Bebe û Soran bi šer ve hatin bikevtin û Bešê Koye bi destên Bebe ve hate bikevtin.

Nadir Šah di sala 1143 k. de Erdelan ji destên Serdarê Bebe date bisitendin. Di sala 1156 k. de wî welatê Bebe ji bona Selîm Pašayê Kurê Bekir Beg date bidan. Serdariya Begdadê jî xwest, ku ew Sulêman Pašayê Kurê Xalid Paša bi ser welatê Bebe ve bide biserdarkirin. Ev dxwaza hanê bi hoyê šer û merekî zor ve hate bikirin.

Sulêman Paša Walîyê Begdadê di sala 1164 k. de bi çar qonaxan ve li Jorî Begdadê de ligel Selîm Pašayê Bebe date bišerkirin û wî ew date bišikenandin. Wî Sulêman Pašayê Bebe bi Serdarê xakê Bebe ve date bikirin. Vi Mîrê han Çardeh salan date biserdarîkirin. Demekê jî ew ji bal Mohemed Pašayê Kurê de Xane Paša û Selîm Bekir Beg hate bisergêjkirin û hin caran jî welatê wî jî ji destên hate biçûyîn. Di dawî de Walîyê Begdadê di sala 1174 de leškerê Mohemed Paša li ser çemê Narîn de date bišikenandin û Mohemed Paša hate bilinavçûn. Selîm Beg jî çend caran ji bona xwe bi ser welatê Bebe ve date birakišandin, belam hîç pê nehate bikirin.

Li dawîya mirina Sulêman Pašayê Walîyê Begdadê de Sulêman Pašayê Serdarê Bebe li ser pirsiyara nedana miravên mîrî de ligel Walîyî Begdadêyi nih de hate bitêkçûn. Wi di sala 1175 k. de bi leškerekî ve ruwê xwe ber bi Begdadê ve date bivedan. Li nêzkaî Kefrî de ew ligel leškerê Begdadê de bi šer ve hate bikevtin. Belam ew hate bišikestin û ew ji bona Îranê hate çbiûyîn. Li wêderê de ew bi Ostandarê Erdelanê ve hate bidanîn. Belam li dawîya Du salan de ji bal Omer Pašayê Walîyê Begdadê dîsan ew bi Serdarê Bebe ve hate bidanîn. Demeke wî Serpereštiyeke baš date bikirin. Wî sînorê Bebe ji bona Zehaw, Ranyê û Koye date bigihandin. Xalid Beg yaxud Elî Begê Kurê wî jî Serdarê Erdelan bû. Li dawî de ew di sala 1178 k. de li keleha Qere Çewalan de bi kuštin ve hate biçûyîn.

Li dawîya Sulêman Paša de Mohemed Begê Birayê wî bi Serdarê Bebe ve hate bikirin. Ew li paš navekê de ligel Ehmed Pašayê Birayê xwe de hate têkçûn û bawerîya bi Biserdarîkirina Begdadê ve nema hate bikirin. Wî serê xwe beramberi wê date birakirin. Di dawî de Walîyê Begdadê Leškerek bi ser wî ve date rakišandin û wî welatê Bebe jê date bisitendin û Ehmed Pašayê Birayê wî bi Serdarê Bebe ve date bidanîn. Belam zorî pê neçû, Mohemed Paša ligel leškerekî Iranîyî xurt de xwe ji bona ser welatê Bebe date bikišandin. Wî keleha Qere Çewalan date bizeftkirin. Di sala 1192 k. de bi yarmetîya Leškerê Iranî ve welatê Bebe bi destên Ehmed Paša ve hate bikevtin û ew çend salan bi destên wî ve hate bimayîn. Di gava ku ew di sala 1193 de ligel Leškerê xwe de ji bona Begdadê dihate çûyîn, ew di rêya xwe de hate bimirin. serdarîya welatê Bebe bi destên Mehmud Pašayê Birayê wî ve hate bikevtin.

Di pêla vî Mîrê hanê de pir šer û pevçûn hatin bivêkevtin. Çend caran wî ruwê xwe ber bi serdarîya Osmanî ve date biveguhertin. Di encam de li Îranê de ew hate bilinavçûn. serdarîya Bebe bi destên Ibrahîm Pašayê Kurê Ehmed Paša ve hate bikevtin. Vî Mîrê jîr û bi hiš ve šarê Sulêmanîyê date bidurustkirin û navînîya mîrnešînîyê ji keleha Qere Çewalan di sala 1199 k.- 1784 z. de ji bona bajarê Sulêmanîyê wî date biveguhestin. Di sala 1202 k. de Osman Begê Kurê Muhmud Paša bi Serdarê Bebe ve hate bikirin. Wî bi Leškerekî ve bešdarîya šerê sertewandina Ešîrên Mutefekî li Jêrî Iraqê de date bikirin. Belam serdarîya Begdadê li dawî de li remana wîyî nebaš de beramber bi wê ve lê hate bigûmankirin. Wê ew date bigirtin û wê ew ji bona binê zindanê date biavêtin. Dîsan wê Ibrahîm Paša date binîšankirin. Belam serdarîya duwemî vî Mîrê hanê ji Salekê bêtir neda bikišandin. serdarîya Bebe ji bona Eb-Dul-Rehaman Pašayê Mehmûd Paša hate bidan. Ev Mirovê hanê zor aza, bikar û çavnêrî biserdarîkirinê bû. Bigir wî li dûhevdû de kêm û bêtir bîst û çar salan date biserdarîkirin. Du caran li Derbendê Bazîyan de û carekê jî li nêzika Kufrî de ew ligel Leškerê Begdadê de bi šer ve hate bikevtin. Li dawî jî de li ser Fermana Dergehê Bilind de ew ligel Halet Efendî û leškerê Musilê de ji bona sertewandina Sulêman Pašayê Walîyê Begdadê hate çûyîn. Li nêzîka Demjimarekê ji dûrbûna rê ji bajarê Begdadê wî Sulêman Paša date šikenandin û Begdad jî date bizeftkirin. Zor wî ji bona Walîtîya Begdadê date bihewilbidan, belam serdarîya Osmanî ew pê neda bidan.

Heyamê Eb-Dul-Rehman Paša zor bi šer û mer ve hate bibuhurandin. Berberî û Dujminatîya ligel Xalid Pašayê Pismamê wî de ew zor dane bixerîkkirin û ew ji bona welatê wî šer û ziyaneke zor bûn.

Ji Nivista Xeraêb El-Eser tête biderkevtin, ku di pêla vî Mîrê hanê de Du Ešîrên Kurdan ji Šahrezorê Zerzarî û Lek hêrîšî ser Ešîrên kenarê Çemê Xaburê dane bikirin û wan ew zor dane biêšandin û li paš de ew careke din ji bona nava cihên xwe li Šahrezorê de di sala 1209 k. de hatine bivegerandin.

Li dawîya Eb-Dul -Rehman Paša de serdarîya Bebe bi destên Mehmud Pašayê Kurê wî ve di sala 1228 k. de hate bikevtin. Li dawîya Çar salan de bi bê hoyî ve ew ji ser šerdarîyê hate bidaxistin. Belam bi yarmetîya hêza Îranê ve wî Eb-Dul-Lah Pašayê Cigirê xwe date šikenandin, lêbelê wî Mîrnešînî bi destên xwe ve neda bixistin. Di zemanê vî Mîrî de Defterdar Dawid Efendî, yê ku ew bi navê Kolemen Dawid Paša dihate binavûbangkirin, ji kîna Walîyê Begdadê ji bona layê Mîrê Bebe hatbû û wî bi yarmetîya leškerê Bebe Begdad ji Seîd Paša date bizeftkirin û ew li ser wê de bi Walîtî ve hate bikirin.. Tanî demekê di navbera Walîyê Begdadê û Mehmud Paša de zor bi rêk û pêk bû. Belam li dawî de di nava wan de hate bitêkçûn. Mehmud Paša bi yarmetîya Îranê ve zor baš xwe date biragirtin. Li paš Penabûna Eb-Dul-Lah Paša de ji bona nik Šahzade Mohemed Elî Mîrzayê Serdarê Kermanšah di navbera serdarîya Begdadê û Mehmud Paša de hate biçaktirkirin. Di gava ku Leškerê Ecem ruwê xwe ber bi Šahrezorê ve date bivekirin, Dawid Paša leškerek bi firyada Mehmud Paša ve date binardin. Belam ev Leškerê hanê xerab hate bišikenandin û Sulêmanîyê jî bi destên Eb-Dul-Lah Paša ve hate bikevtin.

Li dawîya gerandina Leškerê Îranî û mirina Šahzade Mohemed Elî Mîrza de Mehmud Paša hêzek date bipêkanîn û wî Eb-Dul-Lah Paša ji xakê Bebe date biderperandin.

Li dawîya demeke kurt de Begdadê leškerek ji bona ser Mehmud Paša datebi rakišandin. Dîsan wî Sulêmanîyê date bicîhištin. Belam di dawî de serdarîya Begdadê û Îranê di sala 1239 K- de hatin birêkkevtin û Mehmud Paša bi Serdarê Bebe û Eb-Dul-Lah Paša bi Serdarê Koye ve hatin bidanîn.

Li dawîya Mehmud Paša de Sulêman Pašayê Birayê wî bi Serdarê Bebe ve hate bikirin. Wî hešt salekî date biserdarîkirin. Belam wî zor caran Mehmud Paša date biêšandin.

Li dawîya Mirina Sulêman Paša serdarîya Bebe ji bona Ehmed Pašayê Kurê wî hate bidan. Ehmed Paša Šahzadeyekî aza û šahreza bû. Ji bona xurtkirin û firehkirina mîrnešînîya xwewî zor dida biremankirin. Li pêš hemû tištekî de wî binaxê leškerekî rêk û pêk date bidanîn. Her çend jî Mehmud Pašayê Mamê wî jî ji kolê wî nedihate bikirin û wî zû zû Leškerê Îranê ji bona ser wî didate hênanîn. Dîsan jî wî li remana xwe de layî neda bidan û wî di sala 1256 k. de bi carekê ve xwe date bidamezirandin.

Bešê dawîyî dewrana Ehmed Paša ewende diyar niye. Vedibêjin, ku vî Šahzadeyê hanê beramber bi Begdadê ve Serbixwe bû. Di gava dorpêçana Koye de ji bal leškerê bi nav û bangê Kozlekî Necîb Pašayê Walîyê Begdadê ve ligel Eb-Dul-Lah Pašayê Birayê Ehmed Paša de wî zor li berxwe de date bidan. Belam li paš de di ševekê de teq û toqê di nava Leškerê Ehmed Paša de hatin bipeydakirin. Leškerê wî ji hev hate bibelavkirin û Sulêman Paša bi naçarî ve ji bona Sulêmanîyê hate bivegerandin. Wî lešker date bikomkirin û ew ji bona Šahrezorê hate çûyîn, da ku ew Leškerekî nuh ji Cafan[316] bide bilikarxsitin. Tanî ku ew hate bivegerandin, Necîb Paša Sulêmanîyê date bidagrîkirin. Li dawî de Ehmed Paša ji bona Îranê hate çûyîn û bi alîkarîya Balozvanê Osmanî ve lê hate bibuhurandin û ew ji bona Istenbolê hate biçûyîn. (ji xwe re li ser dirêjîya vêna de li nivîsta Kurdên Bi nav û bang de bidin bitemašekirin).

Li paš Ehmed Paša bi navnîša Qaimqamî Eb-Dula Pašyê Birayê wî Çar salan li Sulêmanîyê de date biserdarîkirin. Li dawîya wî de bi wê navnîšanê ve Liwa Ismaîl Paša bi Qaimqamî ve li ser Sulêmanîyê de hate bidanîn. Ji wê rojê de serpereštîya mîrnešînîya Bebe bi carekê ve di sala 1267 k.- 1851 z. de hate bidawîkirin.

[316]mêjûwa Hammer di bergê Nehem de ji Wergerandina Turkî de li ser lihevhatina di navbera serdarîya Osmanî û Îranê de di pêla Muradê Çarem de di sala 1049 k. de li ser vê Ešîra Cafî Kurdîyî gewr de dide biaxivtin. Herwehajî ew li ser biparvekirina wêna de di navbera Îran û Osmanîyan de dide biaxivtin. Ew dibê-je, ku Herdu Êlên Diya El-Dîn û Haronî ji vê Ešîra hanê ji piška serdarîya Osmanî bûn. Herwehajî Nivista Munšeat Sarî Eb-Dul-Lah li ser vê Danava hanê de dide peyivandin û ew Caq ji dêlva gotina Caf dide bikaranîn?...

## 25. Mîrnešînîya Bane

Bi gora Šerefname ve ev mîrnešînîya hanê li pêš heyamê Islamê jî de hebû. Wê bi dilê û kêfa xwe ve Oldarîya Musulmantîyê ji xwe re date bihelbijartin; jibervêjî Xanedanê mîrnešînîyê bi navnîšana Ixtiya El-Din hatine binavkirin. Rewš û zînetên vê Mîrnešînîya hanê ji destpêka zemanê Mîrza Begê Kurê Mîr Mehmud Beg têtin bidiyarkirin. Ev Mîrê hanê Serdarê kelehên Pîroyî û Šobowe bû[317], yên ku ew niha li Melbenda Baneyî Iranê de têtin bikevtin. Ew Zavê Pêke Begê Serdarê Erdelanê bû. Li ser vê Jînanînê de ew ligel Sultan Eliyê Serokê Ešîra Tetlîcî Kurd de bi dujminatî ve hate bikevtin. Li dawî de Sultan Elî zora wî date birin û wî ew ji Mîrnešînîyê date biderperandin[318]. Li šûna wî de wî Birayê wî Qantenmeš bi Mîrîtî ve date bidanîn. Mîrza Beg bi yarmetîya Xezûrê xwe ve welatê Bane date bisitendin û wî demekê têde bêberberî date biserdarîkirin. Li dawîya mirina wî de Bodaq Begê Kurê wî ji bona ser cihê wî hate birûništin. Du Birayên wîyî ji Dayikeke din de bi navê Mohemed û Oxorlo ligel wî de bi šer û pevçûnê ve hatin bikevtin. Wan ew date bezandin û wan ew ji Mîrnešînîyê date biderperandin. Bodaq Beg ji bona layê Šah Tehmaseb hate çûyîn. Wî bi yarmetîya Šah ve Mîrnešînîya xwe date bisitendin. Belam li dawîya navekê de li Qezwînê de hate bimirin.

Šah Tehmaseb Sulêman Begê Birayê Bodaq Beg bi Mîritî ve date bidanîn. Belam li ser dilbijandina Mîr Mohemed Oxorloyê Birayên wî de Ešîr lê hatin birastbûn. Li ser vêna de Leškerekî Îranî bi firyada Sulêman Beg ve hat û wî Serhildan date bitemirandin. Mîr Sulêman bîst salekî date biserdarîkirin. Ew Mîrekî zor dadwer, bi hiš û ji Xwedê dihate

---

[317]Weha di koka xwe de hatîye binivîsandin, belam di Šerefname de bi rengegî din ve hatîye binivîsandin û ew dibêje: ku Ostandara Bane ji keleha Pîroz û Šîwe û Navçeyekê bi tenha ve tête bipêkhatin û ew di nava Ostandarên Erdelan, Mukrî û Baban de tête bikevtin. Navê Navçeyê bi Bane ve tête binavkirin. Herwehajî ew li ser Sultan Elî Begê Ešîra Tetlîce nade biaxivtin, lêbelê ew Sultan Elî Beg bi peyva Xenlîc ve dide bipesindan. (M. E.).

[318]Insiklopêdîya Musulmantîyê vê rûdana hanê bi corekî din ve dide bivegerandin. Li layê min de weha ye, ku goya Šerefname bi hêztir ve tête biderkevtin.

bitirsandin. Di dawîya Serdariya xwe de wî Keça xwe li Bedir Begê Birazayê xwe de date bimarkirin û wî mîrnešînîya xwe jî pê date bidan û ew helsa û ji bona Medîna Munewer hate biçûyîn. Li wêderê de tanî mirina xwe wî xwe bi Mêj û dîndarîyê ve date bikarwerdekirin. Ev Sulêman Begê hanê Hemsayê dema Xwedîyê Šerefname bû[319].

Ev Mîrnešînîya Bane di zemanê Mîr Bedir de bi Erdelanê ve hate bibestandin. Rojhilatnas Rech-Rêç di sala 1236 k. de di Banê re hate biderbasbûb. Wî ligel Nur-El-Lah Xan Serdarê Banê de dîtinek date bikirin. Dawîvanê Xanedana Ixtiyar El-Dîn Kerîm Xan bû, yê ku ew ji bal Yunis Xanê Nokerê xwe hate bikuštin. Bane bi destên vî Yunis Xanê hanê ve hate bikevtin. Li dawîya navekê de Yunis Xan jî bi destên Fetah Begê Birazayê xwe ve hate bikuštin û Mîrnešînîya Banê ji bona nava destên Heme Xanê Kurê Yunis Xan hate bikevtin. Ev Heme Xan jî li pêsîya Šerê Gewre de di sala 1333 k. de ji bal Ibrahîmê Bedlîsî Serokê hêza Osmanî ve li Irane de hate bikuštin. Wehajî Xanedana Yunis Xan jî bi dawî ve hate bikirin û Bane jî bi melbendeke Sablaxê ve hate bikirin.

[319]Di Šerefname de tištekî weha nehatiye binivîsandin. (M. E.).

## 26. Mîrnešînîya Gelbaxî

Ev mîrnešînîya hane ji bala Ebas Agayê Osta Celo hatîye bisazkirin. Di pêšî de wî li devera Merîwanê de bajarê Serçawe ji Pekîye Begê Serdarê Erdelanê date bisitendin û li paš navekê de wî Bîlwer jî ji Ešîrên Kulher date bidagîrkirin. Wî hin ji Ešîran li dor û berên xwe de date bikomkirin[320]. Šah Tehmaseb jî ji bona wî bi mîrnešînîya Bîlewerê ve pê hate birûništin.
Vê mîrnešînîya hanê li paš de bibestandina xwe bi serdarîya Osmanî ve ji xwe re date biwergirtin serdarîya Osmanî Kerend, Šêxan, Çakaran, Xorxora, Nîrezened, keleha Tepe û hin ji cîgehên tir jî bi šêweyê sinseqan ve ji bona Elî Xanê Gelbaxî date bidan. Yar El-Lalah Xan jî mîrnešînîya xwe bêtir date bigewrekirin. Rûdanên dinî vê mîrnešînîyê ji me re ne diyarin.

## 27. Mîrnešînîya Kelher

Ez vê remanê rast nabînim; jiber ku hinek nîšan ji bona Barkirina Cuhan û warkirina wan di wan deveran de bidin derxistin, ku Kelher ji Nevîyên wan Cuhan bin. Belê Bavpîrên wan Kelheran ji xwe re ji rabûn û runištinên wan Cuhan hin rewešt ji xwe re dane biwergirtin; jiber ku ew ligel wan de dihatin rabûn û runištin. Tevlivêjî de Mêjû dibêje, ku Kîros-Kî Xisro pištî vekirina Babil û pêvekirina wêna bi Šahînšahîya xwe ve Cuhuwên dûrkirî ji bona welatê wanî Felestînê datin bivegerandin: Nedûre, ku Kelher Nevîyên Rehamê Kurê Koderzbin, yê ku Šahname wî dide nîšandan, yanjî ku ew Yekek ji Padîšahê Eškanî bû, yê ku wî šer ligel Meherdadê Qeralê Erministanê de dayite bikirin û ew zor bi nav û bang bû

Šerefname dibêje, ku Kelher Nevîyê Kiyo Koderzin û Xanedana vê Ešîra Mîrnešînîtîyê sê bešin:

1. Begzadeyên Pelenkan.

---

[320]Mîna Ešîrên Lek, Sulêmanî, Madekî-Badekî û Wermeziyar. (M.E.).

2. Begzadeyên Derteng.
3. Begzadeyên Mahî Dešt.

1. Begzadeyên Pelenkan

Mîrê nasînî Pelekan Xeyb El-Lah bû. Hin ji kelehên Šehrezorê û kelehên nêzîka vî Welatî bi destên wî ve bûn. Li dawîya wî de ji bal Šah Tehmaseb Mohemed Begê Kurê wî bi Mîrîtî ve hate bidanîn. Vî Begê hanê zor karê zanistîyê û zanebûnê di nava welatê xwe de date bikirin. Li dawî de Šah Tehmaseb Keça wî ji xwe re date bixwestin. Vê Xezûrtîya hanê mîrnešînîya Mohemed Beg bêtir date bigewretir û bixurttirkirin. Di jîna xwe de wî welatê xwe di nava çar Kurên xwe de date biparvekirin. Li paš mirina wî de Mîr Iskenderê Kurê wî ji bona cihê wî hate bidanîn. Bîst Ssalikî wî serdarî date bikirin. Li dawîya Mîr Iskender de keleha Pelenkan bi destê Mîrekî Dinewer[321] ve hate bikevtin û li paš de ew bi Heremeke Osmanî ve hate bikirin.

2. Begzadeyên Derteng[1]

Di koka xwe de li vêderê de li ser Mîrnešînîya Kurê Enan li Helwan de dihate binivîsandin. Ew ji bona Dergehê serdarîyan ve hate biveguhestin, mîna ku berî vê li ser de hatîye biaxivtin. (M. E.).

Ev mîrnešinîya hanê li herema Helwanêyî kevnar de hate bidanîn. Navînîya wêna keleha Derteng bû. Bi nav û bangtirîn Mîrên wê ev bûn: yekemînê wan Zorab-Suhrab Beg bû, yê ku wî di mêrxasî, azayetî û merdbûnê de pir nav û bang ji xwe re date bigirtin. Di pêla wî de sînorên mîrnešînîya wî hatin bifirehkirin.

Li paš wî de Kurê wî Omer Beg hate runištin û wî serê xwe ji bona Šehrîyar Sulêmanê Qanûnê date bidanîn û wî parastina wîna ji bona ser xwe date bigirtin.. Li paš wî de Kurê wî Qubad Beg ji bona cihê wî hate runištin. Wî pir bi jêhatbûn û jîrîtî ve welatê xwe date vejandin. Wî sinorên Mîrnešînîya xwe tanî Dînewer û Begdadê jî date bigihandin. Ew

[321]Ew Solax Husênê Teklo bû, yê ku ew ji bal Šah Ismaîl Serdarê Dinewer bû. (M.E.).

pir jîr, jêhatî, xurt û bi sincî bû. Ew hemsayê dema Mîr Šerefxanê Bedlîsiyê Xwedanê Šerefname bû[322].

3. Begzadeyên Mahî Dešt-Maydešt

Ev Mîrenešînîya hanê li Bajarokê Bîlewer[323] de hate bidanîn. Mensur Beg di pêla Šerefxanê Bedlîsîyê bi nav û bang ve Mîrê wê bû.

## E. Mîrnešînîyên Îrana Rojhilat

Insiklopêdîya Musulmantîyê dibêje, ku Ešîrên Bingehîyî Kurdîyî Îranê Sisê bûn: Siyah Mensur, Çektî û Zengene bûn. Bavpîrên van her Sê Ešîran Sê Birabûn û ew ji Loristanê hatibûn.

Bicke li vanan jî de dîsan her ew Kanîya hanê bi xwe jî ve di bergê xweyî çarem de li ser Ešîr û mîrnešînîya Šivankare jî de dide biaxivtin, ya ku ew li welatê Faris û Kerman de bûn. Bi kurtî ve mêjûwa van mîrnešînîyan eve ye:

### 28. Mîrnešînîya Siyah Mensur

Li gora Šerefname ev mîrnešînîya hanê di zemanê Šah Tehmaseb de hatîye bisazkirin. Šah Tehmaseb Xelîl Beg, yê ku ew navê Mîrekî Sîyahê Mensurî bû, ji bona nik xwe date bianîn û wî navnîšana Xan pê date bidan. Wî ew bi Mîrê Mîran ve date binavkirin û wî hemû Kurdên Îranê bîcgeh li Siyah Mensur de bîst û çar Ešîrên Kurdîyî din jî ji bona jêrdestên wî dane bixistin. Herwehajî wî pir welat û Erd di navbera Ezerbêcanê û Îraqê jî de pê bidan. Herwehajî wî Milk û welatê wî jî pê date bidan. Hergav Sî hezar Suwar di tengala wî de dihatin bidîtin. Ew di

[322]Šerefname dibêje, ku wî serdarîya keleha Pawe, Baske, Alanî, Zencîr, Rewanser, Duwan û Zirmanîkî dida bikirin. (M. E.).

[323]Di cihekî din de di Šerefname de bi Tîlewer ve hatîye binivîsandin. (M. E.).

navbera Qezwîn û Tevrîzê de dihate bidaniştin. Wî parastina Tude û Rê û Banan dida bikirin. Li dawîya Sê salan de bašbûna serpereštîya Xelîl Beg rû xwe ber bi jêrbûnê ve date bivekirin û xerabkarî di nav de hate bizorkirin. Li ser vê jî de Šah Tehmaseb û Sultan Mohemed ji bona Xuresanê Xelîl Beg dane bidûrkirin. Li dawîya vêna de bes û bi tenha ve Ešîra Siyah Mensuri bi destên wî ve hate bihištin. Di dawî jî de ew bi Parêzvanê sînorê Xuresanê ve hate binîšankirin.

Li paš Xelîl Beg de Doltiyar Xanê Kurê wîna ji bona cîgehê wî hate biruništin û ew ji bal Šah bi Parêzvanê sînorê Ezerbêcanê ve hate binîšankirin. Wî bi fermana Šah ve li wan navan de pir çakkirin û avanî dane bikirin. Belam li paš navekê ew li ber Serdarîyê hate birabûn. Li jêr Komandarîya Muršid Qolî Xan de Leškerekî Îranê xwe bi ser ve date birakišandin û wî di keleha Sîstan de dor lê date birapêçandin. Belam rojekê ji niškêve Doltiyar ji kelehê hate biderkevtin û xwe bi ser Leškerê Qizilbašan de date bidadan. Wi ew dane bitarûmarkirin. Wî kuštarekî zor li wan de date bikirin û talanekî mezin wî ji wan date bisitendin. Li dawîya vê biserkevtina hanê de Doltiyar Xan dilê xwe ji bona Ostandara Îraqê[324] date bijandin. Belam Šah Ebas[325] leškerekî Îranîyî zor di bin Rêberîya Mehdî Qelî Xan de ji bona ser wî date binardin. Doltiyar Xan neda bišerkirin û wî xwe ji bona ber Bextê Šah date avêtin. Šah ew û hevalbendên wî dane bizindankirin û li dawî de wî ew tevde dane bilinavbirin. Wer tête biderkevtin, ku li dawîya Doltiyar Xan de ev Mîrnešînîya hanê jî hate binabûdkirin.

---

[324](Di Kurdî de, r.423 weha hatîye:"Li dawîya vê biserkevtina hanê de wî dilê xwe ji bona hin Alîyên Îraqê date bijandin". Cuma).

Ew Yekeke ji Ostandarên Serpereštîyî Îranê bû. Dibe, ku ew Îraqa Ecemî-Çiya be. (M. E.).

[325]("Šah Ebasê Mezin li sala 1557 hatîye bizayîn û ew di sala 1629 z. de hatîye bimirin. Ew ji sala 1587 z. de bi Šahî ve hate bikirin". Mayers Taschen Lexikon A/Z-Insiklopêdiya Elmanîyî Biçûk, Leipzig, 1963, r. 1. Cuma).

## 29. Mîrnešînîya Çekitî

Šerefnam dibêje, "ku ev Ešîra Çekitî di nava Ešîrên Kurdîyî Îran nav û bangekî wanî gewre habû. Belam çunke Serekekî wanî bikar nebû, ew di nava Îraqê û Ezerbêcanê de hatin bibelavkirin û ew ligel xerabîyê û cerdetiyê dihatin bixerîkkirin. Tudeyên wan Welatan li layê Šah Tehmaseb de li ser wan de dane bigilîkirin. Ji bona linavbirina wan bi hemû layekî de fermana Šah hate biderkevtin. Li ser vêna de Pêncsed Malek[326] ji wan ew ji bona Xuresanê hatin biçûyîn".

Di wê navê de Serdarê Heratê Qezaq Xan Teklo bû. Vî Serdarê hanê ewende hejî li Šah Tehmasen de neda bikirin. Wî xwest, ku ew li vê Ešîra sitembar de kar ji xwe re bide bikirin. Bi vê remana hanê ve wî ew li Karcistanê de di navbera Herat û kabul de date bicî û biwarkirin.

Gava ku Šah Tehmaseb weha date bizanîn, wî reftara xwe beramber bi vê Ešîra hanê ve date veguhertin û ruwê xwe ji bona wê date bidan. Wî Bodaq Begê Çektî bi Mîrîtî ve li ser Ešîra Çektî de date bidanîn. Bi saya jêhatbûna vî Mîrê hanê ve Ešîra Çektî ji bona Xuresanê hate bivegerandin û ew li wêderê de hate bicigîrkirin.

Bodaq Beg li šerê Eb-Dul-mumun Xanê Ozbekî de di sala 1001 k. de bi xwe û Ešîra xwe ve zor karekî mezin date bikirin. Li ser vêna de Šah Ebas cihê Mîritîyê ji bona wî û Pênc Kurên wî date bidan wî ew bi Mîrê Mîran ve di lešerê Îranî date binîšankirin. Li gora Šerefname de ev Mîrê hanê Hemsayê dema Šerefxan bû û ew Yekek ji Serdarên herî Maqulên Šah Ebas bû. Mexabin, ku em derbarê Zîneta dawîyî vê Mîrnešînîya hanê de hîç agehdariyek bi destên me ve nehatîye bikevtin.

---

[326]Di Šerefname de hatiye binivîsandin, ku Pêncsed Nefer Begzade û Maqulan hatine çûyîn û hin dirêjîyên din hatine binivîsandin. (M. E.).

### 30. Mîrnešînîya Zengene

Šerefname ji me re dide bigotin, ku ev Mîrnešî tanî pêla Šah Ismaîlê Yek jî bi nav û bang bû. Li dawî de Xanedanên vê mîrnešinîya hanê hatin bilinavçûn û hin ji Ešîrê jî ji bona nava Pasevanên Šahî hatin bikevtin[327].

## G. Mîrnešînîya Xuresan:

### 1. Mîrnešînîya Koçan

Di bergê yekem de û li ser peyvîna ciyografîya Kurdistanê de me date bigotin, ku li welatê Xuresanê jî de Ešîrên Kurd têtin bidîtin. Hon. George N. Curzon di Gernameya xwe de li Îrane de derbarê bi Kurdên Xuresanê ve hin rûnkirinan dide bidan û ew dibêje: Šah Ebasê Gewre ji bona parastina sinorê Jorî Rojhilatî Îranê beramber bi Ešîrên Turkmanan ve hin ji Ešîrên Kurdan ji sinorê Rojavayî Jorî Îranê ji bona Xuresanê date biveguhestin. Ev Ešîrên Kurdên hanê Šahdello-Šahdanlo, Zaferanlo, Kîwanlo-Kîrwanlo û Emanlo bûn.

Xwedîyê Nameya Rojavayî Îranê, Ešîr Peyên wîna dibêje, ku bes u bi tenha ve Serjimara Ešîra Zaferanlo nêzkîa Çil hezar Mal dihate biderkevtin. Bes Berekî ji vê Ešîra hanê serjimara wan hešt hezar Mal dihate biderkevtin û ew li melbenda Çinaran dihate bidaništin. Herwehajî Serjimara Ešîra Šahdello jî li gora amara serjimara sala 1908 z. de 2800 mal dihate biderkevtin. (r. 130-132).

Bešê zorî ji van Ešîran li devera Koçan de dihatin birunistin. Berê Šahdello ji li Bocnord û hêlên wê ve dihate bicigîrkirin. Ešîrên Koçan mîrenešînîyeke nîvserbixwe ve ango li jêr Serpereštîya xweyî Hundurûyî serbixwe ve hebû û Qanûn û Dadgehên taybetî bi xwe ve habûn. Bestandina wan ligel serdarîya Îranê de bes di dana Bêšeke salane de dihate bidîtin.

---

[327]Rûnkirin: Di Kokê de li paš Mîrnešînîya Zengene de li ser Mîrenešînîya Šiwankare-Šivankare dihate biaxivtin. Belam ew di rêk û pêkxistina nuh de ji bona Deryê yekem li ser dewletan de hate biveguhestin. (M. E.).

Nadir Šah xwest, ku ew vê Mîrnešînîya hanê ji bona jêrdestîya xwe bide anîn; Jibervêjî wî Keça Îlxan jî ji bona xwe date bianîn. Belam ev jî bê kar bû. Di dawîya serdarîya xwe de ew bi orduweke gewre ve ji bona ser wan hate biçûyîn. Belam li ber keleha Koçan de ševekê di nava çadira wî de di sala 1747 z. de serê wî hate bibirîn.

Di pêla serdarîya Qacarî de Šah Fetmeelî Xan ji bona ser hate biçûyîn. Belam bi wî jî ve hîç pê nehate bikirin û bi naçarî ve ew ligel wan de hate birêkkevtin.

Di sala 1832 z, de Ebas Mîrza bi orduwekê ve ji bona ser Koçan hate biçûyîn. Wî bi saya hêza topçiyî li jêr serdarîya Efserên Ingilîz de Koçan date bitextkirin. Wî Mîrê Ešîrê Rida Qelî Xan date bigirtin û wî ew ligel xwe de ji bona Tehranê date bibirin. Ji wêderê de ew ji bona Tevrizê hate binardin û ew li wêderê de hate bidarvekirin. Li cigehê Rida Qelî Xan de Sam Xanê Kurê wî bi Îlxanî ve hate bikirin.

Di sala 1886 z. de di pêla Gera Curzon-Kurozonî Îranê de Îlîxan Mîrê Mîran. Šuca El-Dewle Mîr Husên Xan bû. Di navekê de ew ligek serdarîya Îranê de hate têkçûn û ew ji ser cihê wî hate bidaxistin. Li paš de ew careke din ligel serdarîya Îranî de hate birêkkevtin û ew ji bona ser cihê xwe hate bivegerandin. Ew Mîrekî xurt û pir xwedan Desthilat bû. Mîrnešînîya Koçan dewlemend û bi hêz bû. Belam Mîrnešînîya Bocnord-Bexbawerd perîšantir û bi kêm hêztir bû.

## 2. Mîrnešînîya Bocnord

Ev Mîrnešînîya hanê lawaz bû û ew li jêrdestîya hin ji Ešîrên Turkimanan de bû. Navnîšana Mîrên wê Îlxanî bû. Insiklopêdîya Birîtanî di wê demê de Amara Serjimara wan herdu Mîrnešînîyan bi 250 hezar Kes ve dide bidanîn[328].

[328](Di vir de nivîsandina vî bergê duwemî Kurdî tête bidawîkirin, Lêbelê di wergerandina Erebî de bešê F. Mîrnešînîyên Cîyayê Lubnanê tête biservekirin. Cuma).

## F. Mîrnešînîyên Çiyayê Libnanê

Ji Nivîsta (Exbar El-Eyan fi Cebel Lubnan-Agehdarîyên li ser Gewreyên Çiyayê Libnanê de[329] tête biderkevtin, ku li wêderê de çend Mîrnešînîyên Biçûk Kurdan di hêlên Çiyayê Libnanê de dane bidamezirandin. Em li ser vanên tên de didin bibîrxistin:

### 1. Šêxên Îmadîyî Durzî

Pavpîrê van Îmadîyan bi navê Îmad ve dihate binavkirin û wî ji Îmadîyê ji Ostandara Musilê ji bona Çiyayê Bilind di Libnanê de date bibarkirin. Ew li gundê Mertehon de hate biwarkirin. Li paš de ew ji bona gundê Telîna hate biveguhestin. Li paš navekê de ew ji bona devera El-Erqub hate bikoçkirin û ew li Ladeyê El-Zenbeqîyê de hate bidaništin. Di dawî de ew û Hevalbendên xwe ligel Malbata Canpolada bi nav û bang de bi šer û pevçûnê ve hatin bikevtin.. Ji Malbata Canpolad gelek Peyên wê hatin bikuštin; jibervêjî Îmadî hatin bineçarkirin, ku ew ji bona Eyin Wezye û li paš de ji bona El-Barok bêtin bibarkirin. Li wêderê de Îmad hate bimirin û ew ji bona bal Dilovanîya Xwedê hate çûyîn. Wî Çar Kur li dûxwe de datin hištin. Belam Maqultîya Malbata wan ji bona Birayê wî Serhal hate biveguhestin. Di dawî de Xedban Kurê Biçûkî Îmad ligel Mîr Elî Fexir El-Dîn El-Meenî de di šerekî hate bikuštin, yê ku Ehmed Pašayê Biçûk di Xan Hasbiya de dijî Çîyê pê hate birabûn. Herwehajî Birayên wîyî din jî di qadên šer de hatin bikuštin, yanjî wan xwe bi xwe ve dane bilinavbirin.

Di sala 1600 z. de Ehmed Pašayê Kuwêrîlî Šêx Serhalê Nevîyê Îmad ji dêlva Mîrên Meenîyan li ser Šof de bi Serdar ve date bidanîn. Vêna hišt, ku ew ligel Îmadîyan de di bin Serekitîya Mîr Ehmedê Meenî û Hevalbendên wî de bigir tevde hatin bilinavbirin. Lêbelê Yekekî ji wan xwe dikarîbû bida bivešartin û wî di bin navekî din de dikarîbû rêza vê Malbata hanê demeke nekêm bide biparastin. Yekek ji vê Malbata hanê li paš van rûdanan de bi navê Qasim Kurê Šêx Selamê Îmad hate

[329] Nivîsvanê wêna Šêx Tenos Kurê Yusif El-Šedyaqe, ya ku ew li Bêrudê de di sala 1809 z. de hatîye biçapkirin.

binavûbangkirin. Ew zor jîr û jêhatî bû û ew ligel Šêx Elî Canpola de di sala 1788 z. de bi šer û pevçûnê ve hate bikevtin. Vê hišt, ku Tudeyên wan navan ji bona du bendan bêtin biparvekirin, Yek ji van Bendan ji bal Yezbekîyan dihate bisermiyandarîkirin û ew ji jê Komên Kurên Îmad, Kurên Telhoq û Kurên Eb-Dul-Melek dihatin pêkhatin. Benda duwem Canpola bûn. Di sala 1793 de Mîr Qeedanê Šehabî ferman ji bona Šêxên Imadîyan û Nekdîyan date bidan, da ku ew xwe bi ser Canpolan de bidin birakišandin. Ew bi vî karê hanê ve baš pê hatin birabûn. Weha bi vî rengê hanê ve ew di piranîya rûdanên Libnanêyê mezinî wê çaxê de hatin bibešdarkirin. Herwehajî Šêx Xetar ji Nevîyên Îmadîyan ligel Mîr Emîn Erselan de bi Sêsed Serbazên xwe ve ji bona Erzeromê hate çûyîn, da ku ew dijî Rusan di sala 1854[330] de bide bišerkirin. Belam bigihandina Mîr ji bona Istenbolê di wê çaxê de hate bihištin, da ku Šêx Xetar ji bona çiyê bête bivegerandin. (r. 161, Deryê 16).

## 2. Mîrên Kurên Šêfayên Kurd

Ev Mîrên hanê ji Nevîyên Efesrê Cemal El-Dîn Šêfa bûn. Ew li hêla Terablos, Ekar û Husun El-Ekrad de dihatin birûništin. Ew Serdarên devera di navbera çemê Kelb û Îbrahîm de bûn. Gava ku di sala 1528 z. de di navbera Zarwên Šeîb Serdarên Terablos û Zarwên Šêfa de šer û pevçûnê date bidestpêkirin, Zarwên Šêfa hatin bineçarkirin, ku ew ji bona Barok bêtin bibarkirin. Li wêderê de ew ji bal Binemala Esaf û Meenîyan hatin bipištgirtinkirin û wan ji bona ser Šiêbîyan datin bihêrîškirin. Wan Ekar ji wan datin bisitendin û ew li wêderê de hatin bidaništin. Serekê wan Yusif Paša demekê cihê Serdarê Terablosê ji xwe re date bigirtin. Lêbelê di dawî de pêwendîyên wî ligel dewleta Osmanî de hate bitêkçûn û ew hate bineçarkirin, ku ew dev ji cihê xweyî Serdarîyê bide biberdan û ew ji bona Berîya Šamê bide bibarkirin. Di sala 1590 z. de ew ji niškê ve bi Serokîtîya hêzekê ve hate biderkevtin û wî ji bona ser Esafîya date bihêrîškirin. Wî Mohemedê Mîrê wan date bikuštin. Di sala 1602 z. de wî bajarê Balebek date bileyandin û wî ew date bitalan û biwêrankirin. Li paš de ew ji bona Terablosê hate bivegerandin. Di sala 1605 z. de ew ligel

[330](Ev Šerê Kerim-Qerim bû, Yê ku ew di navbera dewleta Osmanî û Rusan de ji sala 1853 tanî 1856 hate bivêkevtin. Cuma).

Serdarê Helebê Elî Pašayê Canpola de hate bilihevhatin. Li ser vê lihevhatina hanê de Du salan nehatin biderbasbûn, tanî ku šer û pevçûn di nava wan de hate bivêkevtin. Di nava wan de šerek li Hema de hate bivêkevtin û têde Yusif Paša hate bišikenandin û ew ji bona bajarê Šamê hate çûyîn. Lêbelê Dujminê wî Elî Paša bi alîkarîya Hevalbendê xwe Mîr Fexir El-Dînê Meenî ve gerden lê date bitengkirin. Di dawî de ew ligel Elî Pašayê Dujminê xwe de bi mercekî ve hate bilihevhatin, ku ew ji bona Husun El-Ekrad bête bivegerandin û ew bes bi tenha ve jê re bête bihištin.

Gava Elî Pašayê Canpola serê xwe li ber dewleta Osmanî de date bihildan, Yisif Paša xweser bi fermana serdarîya Osmanî ve xwe ji bona ser Dujminê xweyî serhildayî date birakišandin. Ew jî ligel hêza Osmanî de di šerê sertewandina wî de hate bibešdarkirin. Heleb hate bivegirtin û Yusif Paša jî ji bona Ekar hate bivegerandin.

Di sala 1618 z. de Omer Pašayê Walîyê Terablos û Mîr Fexir El-Dînê Meenî bi hev re dane biryardan, ku ew ji bona ser Yusif Paša xwe bidin brakišandin. Wan di keleha Humsê de dor lê datin rapêçandin. Belam pir pê neçû, tanî ku dewleta Osmanî lê hate bibuhurandin û wê serdarîya Terablosê ji bona wî date bisipartin. Herwehajî Omer Beg ji Zarwên Šêfa ji bal serdarîya Osmanî de bi Serdarê Humsê di sala 1624 z. de hate binîšankirin.

Yosif Paša li Terablosê de hate bimerin. Xwedê dilovanê wî be. Ew zor di šer de mêrxas û bînfereh bû. Ew Pašayê pêšî bû, yê ku ew li ser Ostandara Terablosê de bi Ostandarî ve hate bidanîn. Li paš wî de ji Heft Zarwên wî Qasîmê Kurê wî cihê wîyî Terablosê ji xwe re date biwergirtin. Mîr Mohemedê Kurê wî Serdarê Husun El-Ekrad bû û Mîr Belekê Kurê wî bi Serdarê Ekarê bû. Gava Mîr Sulêmanê Birazayê Yusif Paša Walîyê Terablosê ji bona Ekarê bi Serdar ve hate binîšankirin, Pismamên wî hatin, neçarkirin, ku ew ji bona Husin bêtin bibarkirin.

Di sala 1625 z. de Mîr Qasim Kurê Yosif Paša keleha El-Merqeb date leyandin. Li paš de wî Husin jî date biwergirtin û di navbera wî û Mîr Fexir El-Dînê Meenî de lihavhatin hate biçêbûn. Ji bona Binemala Šêfan serdarîya Terablosê li ser bešdarbûna wanan de di šerê serdarîya Osmanî de li jêr Rêberîya Ehmed Pašayê Biçûk de di sala 1833 z. de ji bona sertewandina Mîr Fexir El-Dînê Meenî hate bisipartin. Di sala 1634 z. de Qasîm Paša Nîšana Mîrê Mîran date biwergirtin u ew ji bona Serdarê Terablosê hate bidanîn, bi mercekî ve ku ew di šerê ligel Îranê vêketî de bête bibešdarkirin. Belam wî nikarîbû, ku ew di wî šerê hanê de bête bibešdarkirin.

Li paš demekê de Birazayê wî Mîr Elî ji bona cihê wî hate bidanîn, yê ku ew di dawî de ji bal Mamê xwe Mîr Esaf de hate bihêrîškirin. Mamê wî ew bi reva Bêrudê ve date bineçarkirin. Šer û Pevçûnan di navbera Ap û Biraza de demekê datin bidirêjkirin. Di sala 1635 z. de Nîšançî Mustefa Paša li ser Sinceqa Terablosê de bi Mutesirif ve hate binînšakirin. Wî bi bašîya siyasetê ve date bidîtin, ku ew serdarîya welatê Çiyî, Bitron û Dînîye ji bona Mîr Elî bide bisipartin û ew welatê Ekar, Husin û Safîta ji bona Merevên wî bide bisipartin. Herwehajî wî Cîhê Wilayetê ji bona Mîr Esaf date bidan, gava ku ji bona wîna serdarîya Leškerên Osmanî di šerê Îranê pê hate bidan. Bi vî rengî ve lihevhatin demekê di navbera Mîr Elî û Mîr Esaf de hate bilidarxistin. Belam carekere din mîna her car ji nû ve šerekî notortir di nava wan de demekê hate bivêketin. Tude û dewlet bi wan šer û pevçûnan ve hatin bitengavkirin. Gava Šahîn Paša bi Ostandarê Ostandarîya Terablosê ve hate binîšankirin. xweser wî dest bi kuština Mîr Elî Esaf date bikirin. Da ku ew linavbirina vê Binemala hanê bi carekê ve bide bikirin, wî ev karê hanê ji bona Peyên xwe Mîr Ismaîlê Kurdî û Šêx Hamade date bisipartin. Ew pir bi xurtî ve bi vî karê sipartî ve di sala 1640 z. de pê hatin birabûn û wan Kesek ji wan li Terablosê de nedan biberdan. (r. 349-358).

3. Mîrên Rees Nehašê Kurd

Ev Kurdên hanê Šehrîyar Selîmê Osmanî di sala 1558 z. de li Melbenda Kore li çiyayê Libnanê de dane biwarkirin. da ku ew parastin û Pasevanîya Çiyê ji Firengan bidin bikirin. Herwehajî hatîye bidiyarkirin, ku Šahîn Paša bi Ostandarê Ostandarîya Terablosê ve hatîye binîšankirin û xweser wî Ismaîlê Kurê Mîr Musa û Šêx Hemade ji bona linavbirina Binemala Sêfa di sala 1637 z. de dane bikarmendkirin.

Mohemed Pašayê Koberîlî di sala 1654 z. de Mîr Ismaîl ji xwe re date bikaranîn. Belam ew di sala dûwê de lê hate bîntengkirin û wî Leškerek ji bona sertewandina wîna ji bona ser wî date rakišandin. Mîr Ismaîl li ber vî Leškerê hanê de xwe nikarîbû bida biragirtin; jibervêjî ew ji bona nik Mîr Ehmedê Meenî hate bipenakirin. Mîr Ehmed xweser ew ji bona bajarê Sur bi Serdar ve date bidanîn. Di sala 1660 z. de Serdarîyê kêfa xwe jê re dida biderxistin û wê soz û bext pê dane bidan, tanî ku wê ew ji bona bajarê Terablosê date bianîn. Li wêderê de bi fermana Mohemed Paša ve ew hate binabûdkirin.

Herwehajî di pêla Serekwezîr Elî Paša de Mîr Seeb Kurê Husên ji vê Binemala hanê bi Serdar ve ji bona melbenda çiyê hate bidanîn. Lêbelê rojên wî pir nehatin bidirêjkirin: jiber ku ew û Merovên wîna di hêrîšekê ji niškê de tevde ji bal Îmadîyan hatin bikuštin. (r. 164-165).

================================================

Wergerandina vê Benda hanê li bajarê Berlinê de di roja Sêsemba 26. berfbara 1993 de hatîye bidestpêkirin û ew di roja dušemba 18. tîrmeha sala 1994 de hatîye bidawîkirin.

Ez wergerandina vê nivîsta hanê ji bona Dr. Noridîn Zaza didim bidiyarîkirin, da ku bîrwerîya vî Zanistvan û Dizilsozê Kurdistanê di nava bextê Miletê me de bête biparastin. Dr. Cuma